# EVÎNA GERÎLA

**Weşanên Komîteya Xebatên Şehîdan Ya PKK'ê**
**2021**

**Ji Çapê Re Amadekirin: Komîteya Xebatên Şehîdan Ya PKK'ê**
**Cihê Çapê: Matbaya Azadî**
**Dîroka Çapê: 2021**

***"Kesên ku nikarin di xeta şehadetan de bimeşin çalakî û serkeftinên wan bixwe jî zêde watedar nabin û heta metirsiyê di nava xwe de radigirin. Şehadet, ji yek mijarên herî giran bixwe ye. Rakirina barê şehadetê, ji yek barên herî giran bixwe ye. Mirov bixwaze li gorî pêdiviyên şehadetê bijî, ji yek jiyanên herî bi zor e."***

**RÊBER APO**



**Nasnav: Mele Nûrî**
**Nav û paşnav: Firat Varli**
**Cih û Dîroka Jidayîkbûnê: 01.2.1945/Erdîş**
**Navê Dayîkê: Xecê**
**Navê Bav: Mihemed**
**Cih û Dîroka Tevlêbûnê: 2001/Wan**
**Cih û Dîroka Şehadetê: 13’ê Cotmeha 2018’an/Hewlêr-Di Encama Celteya Dil De**

## Pêşgotin

Hevalê Hecî Nûrî (Apê Hecî, Mele Nûrî), bi armanca gelê Kurdistanê bigihêje jiyaneke demokratîk û azad, di şert û mercên herî zehmet de xebitî. Hemû rîsk û xeterî dane berçav. Welatparêz û şoreşgereke ew qasî mezin e ku ne got, 'wê mal û mulkê min, malbata min çibe', tu şayîş û fikar nas nekir, her tiştê xwe kire oxira têkoşîna gelê Kurdistanê ya ku ji bo jiyaneke azad û demokratîk tê meşandin.

Hevalê Hecî Nûrî her tim xwe weke mîlîtaneke Rêber APO dîtiye û hêja di destpêka vê têkoşînê de ciyê xwe girtiye. Di xeta Rêber APO de her tim di nav hewildana xweperwerdekirinê de bûye û xwestiye di zîhniyet û kesayeta xwe de nûbûnê daîmî bike. Hevaleke wisa bû ku di jiyana xwe de bi hişmendiya azadiyê, hestên welatparêzî, xwedî îdea, têkoşer, dilnizm, bidisîplîn, paqij, kedkar, bicoş û moral jiyan dikir. Hevaleke ku her tim birêz û hezkirin nêzî hevalên xwe dibû, xizmeta ji hevalan re wekî dilpakî û fezîleteke mezin didît, her tiştên xwe bi wan re parve dikir, hewil dida ji wan fêr bibe, tu carî kêmasî û şaşîtî layîqê hevalên xwe ne didît bû.

Hevalê Hecî Nûrî, dîtibû ku jiyana rast û azad di xeta Rêber APO û PKK'ê de tê jiyîn û hêja ji destpêkê ve ketiye nav vê têkoşînê. Hevalê Hecî, Komkûjiya Zîlanê ji nêz ve dinase. Dîtiye ku tola kesên di Komkûjiya Zîlanê de hatî qetilkirin, ji hêla Rêber APO û PKK'ê ve tê hildan. Ji bo wê jî bêteredut her tiştê xwe kiriye xizmeta serkeftina vê têkoşînê. Komara Tirk a faşist, dagirker û qirker, li Kurdistanê jiyan qetil kiriye, gelê Kurd aniye ber mirinê, adeta gelê Kurd, nefesa xwe ya dawî dida. Ji bo ku li ser navê Kurd û Kurdistanê çi hebe, ji holê rake, her tiştên xwe seferber kiribû. Rêber APO, mudaxaleyeke mezin û dîrokî li vê rastiyê kir. Ji mirinê jiyan û nemirin afirand. Vê yekê gelê Kurd rakire ser piyan û gelê Kurd kire gelekî têkoşer. Bi Rêber APO re jiyanê careke din wate wergirt. Dema Hecî Nûrî ev pêşketin dît, di asta azwerû û evînê de xeta Rêber APO hembêz kir.

Hevalê Hecî Nûrî, hewil da ku di xeta Rêber APO de bijî û her kesî jî bikişîne vê xetê, ji bo vê xebat meşand. Bi jiyana xwe sekneke mînak raber kir. Li her qada ku lê ye, baweriyeke mezin da hevalên xwe, ji hevalên xwe jî hurmet û baweriyeke mezin bi dest xist. Ew bi xwe mele bû, da diyarkirin ku îbadeta herî mezin; di xeta Rêber APO de, ji bo Gelê Kurdistanê têkoşîn meşandin e. Dît ku têkoşîna di dîrokê de meleyan meşandî, îro Rêber APO dimeşîne. Dît ku tola sêdaran û komkûjiyan tê hildan. Ji bo wê jî li gel ku temenî wî mezin bû jî, qet teredut nekir, hemû rîsk û xeterî dane berçav û bi dest xebatan kir. Bêyî ku bikeve heyra mal, malbat û hwd. hemû tiştên xwe da oxira azadiya gelê Kurdistanê.

Hevalê Hecî Nûrî, li hinek ciyên Bakurê Kurdistanê, namzetên şervanan rêxistin kirin û şandin gerîla. Dema dijmin ev fêm kir, bi ser wî de çû. Yekser çû Stenbolê û li wir jî heman xebat meşand. Dema dijmin li wir jî ew tespît kir, hate çiyan û di nav gerîlayan de ciyê xwe girt.

Dema hate nav refên gerîla, temenê wî pêş ketibû. Lê tu carî ev nekire pirsgirêk. Bi wî re dil, mejî, coş û moralê ciwanekî hebû. Yekser xwest ku hînî xwendin û nivîsandinê bibe. Daxwaza wî ya fêrbûna kompîtûrê û di Dibistana Partiyê de perwerdeya bîrdozî bibîne hebû û ev da diyarkirin. Ev daxwazên wî hatin pêşwazîkirin. Di Dibistana Partiyê de perwerde dît, xwendin û nivîsandina xwe pêş xist, hînî kompîtûrê jî bû. Di da diyarkirin ku "Bi armanca zêdetir û baştir bikaribe xizmetê ji gelê Kurdistanê re bike", van dixwaze. Ji bo ku xeta Rêber APO hê kûrtir

fêm bike û serkeftîtir têkoşînê bimeşîne dixwest. Li gel ku temenê wî pêş ketibû, xwe di her alî de perwerde dikir, pêş dixist, di destpêkirinên nû de tu asteng ji xwe re qebûl ne dikir û xwedî bîryar bû, ev dida nîşandan jî. Bi vê helwest û feraseta xwe her kes bandor kir, hêz da wan û ji bo ku xwe jî perwerde bikin teşwîk kir.

Hevalê Hecî Nûrî, tu carî nexwest ji çiyan û gerîlayan qût bibe. Digot, "Encaq ez li çiyan, di nav gerîla de bijîm, li devereke din nikarim bijîm." Gelekî girêdayî Rêber APO û gerîla bû. Pêşniyar kir ku ew bi xwe biçe nav gelên Rojava, axaftin û civînên Rêber APO ji gel re kirine ji gel guhdar bike, berhev bike û bixe pirtûk. Ev pêşniyara wî pêk hat. Dema ji Rojava vegeriya, bi moral û coşa peywir û berpirsyariyeke gelekî girîng pêk aniye jiyan dikir. Ji bo ku tavilê wan bike pirtûk û çap bike dixebitî. Dema ev xebat dimeşand, hêja xilas nekirî wekî wasiyet got, "Ger ku wefat bikim, teqez vê pirtûkê biqedînin, cenazeyê min jî li Şehîtgeha Qendîlê defin bikin." Beriya ku pirtûkê biqedîne û bide çapkirin, şehît bû. Cenazeyî wê me anî Şehîtgeha Qendîlê û li gel gerîla hate definkirin. Bi vî awayî wasiyeteke wî pêk hat. Ji bo ku pirtûka wî were çapkirin jî xebat hate meşandin, ev jî pêk hat.

Min welatparêz û şoreşgerekî wiha mezin ji nêz ve nas kir û dît ku bi moral û coşeke mezin dixwaze xwe perwerde bike. Ez bûm şahid ku tu carî pêşketinê bes nabîne, astengiyan ji xwe re qebûl nake, hewildanên wî yê pêşketinê bêsînor bûn. Hezkirin û hurmeteke wî ya mezin li hemberî Rêber APO, PKK, gerîla û hevalên li gel wî diman re hebû û xwe ji bo azadiya gelên Kurdistanê feda kir. Min hêzeke mezin jê girt. Ji ber ku min welatparêz û şoreşgerekî ev qasî mezin nas kir û wasiyeta wî tînim cî, gelekî şanaz im. Ez dizanim ku wê gelê Kurdistanê, malbat, xizim û dostên wî jî pê gelekî şanaz û serbilind bin. Wê PKK û hevalên wî yê têkoşînê her tim Hecî Nûrî bijîn û bidin jiyankirin.

**15 Gûlan 2020**
**Cemîl Bayik**

Dilo rabe ji xewê, nebe hevparê xewê
Zeman kine dibore, şîrin neke vê xewê
Ji xwe bike gilî û gazinê, loma neke bapîr û bavê
We da destê min pênûse, fêr kirin ji bo min şerefe

Ez dest bi çîroka xwe dikim. Di serî de ez lêborîna xwe ji we herkesê dixwazim. Ji ber ku xwendin û nivîsandina min kême, bêguman wê kêmasî derbikevin. Lê belê dîsa jî tevî her tiştî ez bi dileke bicoş û keyfxweşî dest bi nivîsandina vê serpêhatiya xwe dikim. Ez bi xêra şehîdan û Rêber Apo fêrî xwendin û nivîsandinê bûm. Alikarêya herî zêde ya xwendin û nivîsandinê min ji dibistana Mazlûm Dogan girt. Her wiha ji hêla giyanwerî ve jî, yanê mamosteyên min ên jiyanê rêheval Şehîd Viyan Soran, heval MustafaKarasû bûn, ez dikarim bêjim ku bi saya van hevalên birêz fêrî her tiştê ku dihatin xwestin bûm. Heval Cûma di danûstandina xwe de ji bavekê hîn birehm û dilhenûntir bû. Tişta herî balkêş ya dema ku ez bi pêşniyara heval Cûma çûm dibistana Mazlûm Dogan di serê min de mayî, dilnizmiya hevalan a li beramberî hev bû. Heval MustafaKarasû mîna hevaleke xwe li min dinêrî û li gorî wê jî nêzî min dibû. Bi vê nêzîkatiya heval Karasû, weke zarokekê dema ku mirov diyariyekê jê re tîne çi qas pê keyfxweş dibe, ez jî ew qas keyfxweş dibûm. Tiştek din a heval MustafaKarasû hebû ku ez gelek kêfxweş dikirim. Dema ku ji min re digot “Tu çawayî, başî?”, wê demê bi rastî jî cîhan hemû dibû ya min di vî temenê min ê 58 saliyê de. Di serî de ji heval Cûma ku li beramberê vê jiyanê ez xistim nava berxwedaneke xurt û her wiha hemû hevalên ku ji bo pêşketina min bi min re bûne alîkar, ez spasiya xwe pêşkêş dikim û di karên hemû hevalan de serkeftinê dixwazim. Ji ber ku serkeftina wan hevalan ji bo min rûmeta herî bingehîn e.

## Geliyê Zîlan

Serhildana Geliyê Zîlan hêdî hêdî dihat dest pê kirin. DewletaTirk dest bi şikandina serhildanê dikir û komkujiyan dikirin. Bi vê bûneyê bang li Mela Mihemedê kurê Mela Mûsa dikin. Paşê bi alîkarêya cehşikên dewlata Tirk jehr danê û çû ber dilovaniya Yezdan. Min ji bav û dapirê xwe fêm kir, nêzikî bîst hezar kesên Kurd ji vê herêma Geliyê Zîlan hatibûn qetilkirin, yên mayîn jî koçber bûn. Dapîra min digot; "xewkirin, cil û berg, xwarin û vexwarin tunebûn, gelek zarokên Kurdan şevê serê xwe datînan ser keviran û sibehê ji xew ranedibûn, ji birçînan canê xwe ji dest didan.

Serhildana Geliyê Zîlan di bin pêşengtiya rêxistina Xoybûnê de hat pêşxistin. Pêşengekeke rêxistinê Birahîmê Hesikê Têlî bû. Eslê xwe ji eşira Celalîyan bû. Yek ji pêşengên Xoybûnê yê navdar jî Îhsan Nûrî Paşa bû. Li gorî rojnameya Cûmhûriyetê ku weke rojnameya fermî ya dewletaTirkiyê dihat naskirin, hêjmara kuştiyên di qirkirina Geliyê Zîlan de ji pazdeh hezaran zêdetir bû. Ev qirkirin di navbera Erdîş û Bazîdê de pêk tê. Di navbera salên 1926, 1927 û 1930'an de ev qirkirin pêkhat û di vê pêvajoyê de15 hezar Kurdên mazlûm hatin qetilkirin. Ji aliyê dewleta Tirk ve hatin şewitandin û tinekirin. Bi awayeke hovane li ser gel hovîtî pêkanîn. Dema mirov li dîroka Tirkan temaşe dike, tiştên ku mirov dibîne hovîtî û komkujî ne. Osmaniyan ji Asyaya Navîn bi koçberî tên Rojhilatanavîn. Li ser pişta hespan, hêstiran û keran tên. Gotinek ya bav û kalên Kurdan heye, wiha dibêje; "ji der ve hatibûn, lê bûn malxoyê malê." Van, bi rijandina xwînê xwe dan jiyankirin. Bi van kiryaran xwe li ser piyan hiştin. Tu felsefeyeke wan nîne, ji bilî desteserkirin, hovîtî û komkujiyan. Dînê wan jî Şamanîzm bûye. Li Rojhilata Navîn bi dînê Şamaniyê jiyanek ku bidest bixin tunebû. Dîn li cem wan ne daxwaz û aramanc bû, tenê weke pergalekê dihat dîtin. Ji bo mirovan dîn di bingehê xwe de jiyane. Lê ji bo wan berevajiyê vê ye. Felsefeyên hemû rêber, pêxember û zanyarên ku hatine li ser rûyê cîhanê ji bo jiyankirina mirovan hatine afirandin. Dema ku kalikên Tirkan di vê dînê Şaman de jiyanek bi dest nexistin, ji bo jiyanekê bi dest bixin Îslamê pejirandin. Rêxistina xwe bi du milan dan meşandin. Milê yekem Îslame, milê duwem jî kapîtalîzme. Bi vê sîstemê xwîna gelan mêhtin. Jixwe bi xwînmêhtinê tên naskirin û bi vê ferasetê bûn xelîfe û împarator û

kozikên mezin bidest xistin. Lê belê di rastiyê de ti girêdana van bi Îslamê re tunebû. Nimûne; Fatîh Sûltan Mehmed ji bo selteneta xwe ji dest nede ji malbata xwe hevdeh kes qetil kirin. Dînê Îslamê aşti û aramî ye, lê bi vê mînakê min xwest desthilatiya Osmaniyan bidim naskirin. Bav û kalên Kurdan gotine; “hirç û govend, rûvî û wezîrtî.” Desthilatiya Osmaniyan li Rojhilatanavîn di cokan de xwîn da herikandin. Gorên bê kêl dan çêkirin. Di navbera Kurdan û Tirkan(Selçuqî) de peymanek hatibû amedekirin. Ew peyman di dîroka 1071’an de hat tomarkirin. Bi vê peymanê şerê Melazgirtê bi alîkarêya Kurdan serkefti bi encam bû û deriyê Rojhilata Navîn li wan hat vekirin. Bi vî rê li ber pêvajoyeke xedar jî vedibe.

### Serhildan

Dema ku dest bi serhildana Geliyê Zîlanê hat kirin, bi keyfxweşî hat pêşwazîkirin. Ji bo wê serhildanê di nava gel de pêşwaziyek pir giranbiha çêbû. Bi keyfxweşî dihat erêkirin. Lê dewleta Tirk şer dabû destpêkirin. Hinek malbat bi darê zorê dihatin koçberkirin. Hinek ciwanên Kurd dihatin qetilkirin. Malbata me jî ji aliyê dewleta Tirk ve hat gunehbar kirin û bi darê zorê ji gundê wan hatin koçber kirin. Pîrka min Seyranê, zarokên xwe girt û berê xwe da bajarê Agiriyê. Di çend rojan de di çiyan re derbasî bajarokê Patnosê bûn û li gundê Nenecaniyê bicih bûn. Axayê gund Eduyê Hûseyn bû. Ji van axan re tê gotin Torin. Pîrê Seyran ji bo debara xwe bike her sal bi veşartî diçe Geliyê Zîlan, gundê Boynuzliyê. Debara xwe bi firotina pirêzeyên zevîyan û giyayên ku difirot nasan û dostan dikir. Pereyê xwe distand û diziviri. Ti car gundê wê ji bîra wê dernediket. Her tim gundê xwe difikirî. Çiyayên gund, zom, deşt, daristan, zevî, avên kaniyan, bostan, bax, mal, hewş, bizin, dewar, berxik û her tiştên li gund ma bûn, weke xewn û xiyal li ber çavên wê re derbas dibûn. Her rondik dibarandin. Mala bavo hatibû şewitandin, ber li ser ber nemabû, her tiştê wan hatibûn talankirin. Di vî gundî de bi hev re meşiyabûn, ji ber van sedeman ji hev dûrketin dibû hesret û kedera dapîrê. Bavê min bi xwîşk û birayên xwe re di temenê xwe yê biçûk de rastî zordarêya desthilatdarêya Tirkan hatibû. Xwîna Kurdan di Geliyê Zîlanê de, bi destê dijmin bi awayeke hovane hatibû rijandin. Tevî ev kiryarên qirêj

ên ku di dema Cûmhûriyetê de pêktanîn jî, pîrê Seyran dîsa jî diçû gundê xwe û weke salên borî berê xwe dida gund.

Bi keyfxweşî dihat pêşwazîkirin, lê nizanî bû ew sal wê bi dert, bela, êş, komkujî û bi xwîn rijandinê derbas bibe. Bi qederê çend rojan li Boynizliyê dimîne, paşê nas û dostê bapîrê yê maye Mela Birahîm serdana wê dike. Piştî keyfxweşî didin hev dibêje; "yadê, hûn dizanin her sal ji rûyê zeviyê we em bac distînin. Ger hûn heta payîzê pereyê wê bihêlin, wê ji bo me baş be. Dapîra min dibêje; "başe." Paşê dizivire malê. Di 14'ê îlona 1930'an de şerê komkujiyê bi temamî destpê dike. Xwîn di cokan de diherike. Gund tên şewitandin û zarokên Kurdan tên qetilkirin, bi serê singuyan ve tên bakirin û li Geliyê Zîlanê dibe qiyamet. Dewleta faşist a Tirk, qiyamet dabû rakirin. Dayikan ne dikarîn li çincîla di destê xwe de xwedî derbikevin, ji ber ku mirin li ser her Kurdekî didin barandin. Ev barana mirinê bû ji bo hemû zindiyên li Geliyê Zîlanê. Kurdistan bibû cihê nêçîra dewleta Tirk. Bi tajî û tuleyên xwe şopa bilbil, şalûl, kewên gozel û xezalan dişopandin. Her çar aliyên Geliyê Zîlan hatibû dorpêçkirin û bûbû cihê nêçîra faşîstan. Bi awayek hovane tevkujiyê didin meşandin. Mîna gurên har û devbixwîn bûn, dema ku devê xwe davêjin berxikên xezalan xwîn di herikandin û bi xwîna berxikan keyfxweş dibûn. Ew dijmin wisa dilxweş û serxweş dibû bi kuştina Kurdan. Yanî leşkerên Tirk tiştên li ber wan biketa lê nediborî, ew mîna gur û hirçên bixof bûn. Zarok, pîr, keç, xort, jin, zilam û her tiştê zindî û nezindî, çi bidîtana yan dişewitandin yan jî talan dikirin. Ew bi kuştinê serxweş, keyfxweş û dilgeş dibûn. Pişt re gotina "em birayê hevin" bilêv dikirin. Ma biratî eve? Bi vê mînakê dixwazim raveya wê bikim. Sîstemên wiha zalimin. Axaftinên wan weke yên Mûsane lê kiryarên wan yên Firewnanin. Birastî zalim û hovin. Pîrê Seyran digot; "kurê min, ji van sîsteman nayê bawer kirin, ji ber ku faşîstin. Li gorî wan ji wan re maf heye, ji bilî wan ji tu kesan re maf nîne. Li cem wan her kes koleyên wan in. Ji xwe re maf dibînin ku keç, bûk, jin û namûsa me û erdê me tecawiz bikin. Ji ber vê daxwaza me rêbereke hemdeme. Da ku were û vê zilm û zorêya li ser gelê Kurd tê kirin bibîne ka çawa Kurd tên qetilkirin û xwîna wan tê mêhtin.

Hovîtiya ku li Gelîyê Zîlan hatî pêkanîn dide nîşankirin ku mirovahî tunebûye nesîbê dewleta Tirk. Kengê qala Geliyê Zîlan bihatiba kirin, rondik di çavên pîrê Seyran de dihatin xwarê. Çavên wê zuha nedibûn ji

şiliya rondikan. Kedera dilê wê weke dîzika li ser agirê darên berûyan bû ku dema agirê vê darê gurbe sekinandina ava di wê dîzikê de nepêkane. Ji ber ku wan ev qirkirin ji dûr ve, ji xwîşk û birayên xwe sehkiribûn, dema mijar vedibû dîsa dihat bîra wan. Ji ber wê rondikên wan bi xwe dibAriyan. Lê belê keder, êş, xem û xiyalên xwe, qêrîn û zarînên xwe di nameyan de dinîvîsandin. Hinekan davêtin gola Wanê û çeman, hinekan jî dixistin dîzikan, devê wê digirtin, dixistin di binê axê de û vedişartin. Daxwaziya wan rêbereke hemdem bû ku hesret û kedera gelê xwe bibîne, van dîzîkan ji binê axê derxîne, nameyên gelê xwe bixwîne û çareseriyekê ji wan re biafirîne. Ji ber ku sîstema dagirkera hov ti tiştek nedifikîrî, ji bilî hovîtî, tinekirin û tevkujiyan. Kuştina Kurdan, wek kuştina çûkan helal dihat dîtin. Dagirkerên axa Kurdistanê weke Ereb, Faris û Tirkan kuştina Kurdan û xwîn rijandina wan helal kiribûn. Dilê wan tejî xem, keser, êş, kul, qêrîn û zarîn bû, ti kesî nedizanî di dilê wan de çi heye, çi nîne. Lê cîhana kapîtalistan koletî, xwînmijî, talankirin û şewitandina mirovan ji xwe re bingeh girtiye. Hov, zalim û xudayên xofê, devletên desthilatdar afrandin û koletî anîn û xistin nava gelan. Her tişt bi destê Firewnan bû. Kurd bê mafbûn û heta mafê wan yê jîyanê jî titunebû. Dil ji van derd û xeman êşaye, xwîna Kurdan di cokan de weke avê herikiye. Weke çîroka SiyApoşê Kurd; dema ji aliyê Îraniyan ve wê bihatiba kuştin, wesyeta xwe ji bo hevjîna xwe wiha tîne ziman; "Dema ku Îraniyan ez kuştim, tu vê cerikê ji xwîna min tejî bike. Wê xwîna min bikelîne, ger li ser devê cerikê de fûrêya bizanibe yek ji malbata min hatiye û wê te xilas bike." Ji bo vê, xwîna Kurdan ji bo azadiyê her keliyaye. Mîna mamoste, zanyar, qelemşorê navdar Ehmedê Xanî aniye ser ziman;

"Eger hebûya ji bo me padişahek
Xwedê layiq bidîtiba ji bo wî kulahek
Wê xemxwarî bikira li me yetîman
Dê em derxistibana ji destê bê eslan"

Ev bangewazî di sala 1697'an de ji aliyê Xanî ve hatiye kirin ku di vê demê de Xaniyê nemir daxwaza rêberekê ji bo gelê Kurd kiriye. Di qêrîna Agirî, Mereş, Dêrsim, Qoçgirî, Helepçe û Mihabadê de, di Geliyê Zîlan de qêrîn û zarîna ku derxistine, daxwaza wan rêberek bû. Daku

devê dilê xwe jê re vekin û vebêjin zordarêya li ser wan tê kirin. Di bawerî û nirxandina min de, hem jî ev rastiyeke ku ew Rêber Apo ye. Eger fereseta wî neba, xilasbûna me ji destê kapitalist û deshilatdaran nepêkanbû. Em di bin rêbertiya Rêber Apo de ji bin destê wan zalim, xwînxwar û zaliman derketin. Di vê ronahiyê de me hêvî û awazên azadî, aştî û demokrasiyê qezenckirin.

**Şehîdên Geliyê Zîlan**

Mizgînî ji bo giyanê wan
Bextewerî ji bo gelê wan
Nalîna wan ji dûr ve dihat bihîstin
Ew dijminê har û hov îro direve ji çiya û newalan
Dema roj diyar bû li cîhan û Kurdistan
Aştî û biratî hat nava gelan
Li dijmin bû gazî û hewar
Lê çiya jê re bûn goristan

Ez sond dixwim bi xwîna şehîdan, tola we tê hildan
Xemxwarê gelê xwe roniye ji bo gelê mazlûm
Evîn û sewdaye ji bo keç û xortan
Keç û xortan dest dane hev
Şopandin rêya Mazlûm Doxan
Bilbil û şalûlan dixwendin
Û li Amedê rakirin ala rengîn
Çikilandin li Botan û Dêrsimê

Serî hildan bi serhildan û dengê wan mîna şêr û pilingan
Bi fikrê rêberê Kurd hişyarbûn ji xewa mirinê
Û jiyanek nû da afirand ji bo gelan
Heram bûye razan li rûviyên bejin kurt û devzirav
Lê hêlîna wî hilweşandin bazan û şêran
Li ser wan xistin toz û dûman
Ji wan fikrên wî yên xweşik
Kurd hişyar bûn li gund û bajaran
Deşt, zozan û çiya li rûvî, hirç û keftaran teng kirin

## Bi Kurtasî Jiyana Malbata Min

Malbata min ji Bazîdê ye. Bapîrê bapîrên min Mela Ehmed e û bi keçikeke Mûsewî re biryara xwe didin, dizewicin. Keçika Mûsewî bi navê Ararat e. Ew dibêje ku "tenê bi şertekê em dikarin bi hev re bijîn, ew jî ewe; tu li ser dînê xwe, ez jî li ser dînê xwe. Tu erê dikî?" Mela Ehmed şertê wê dipejirîn. Li ser vê keçika Mûsevî jî dibêje, "ez jî vê hevjîniyê erê dikim." Gelê Bazîdê pê dihesin û qiyametê radikin. Ji ber wê Mela Ehmed bi malbata xwe re koçî Geliyê Zîlan dikin û li gundê bi navê Eqsê bicih dibin. Zewaca wan ji aliyê civata derdor nehatibû qebûlkirin.

Malbata min ji eşira Xaniyan e. Kureke Mela Ehmed çêdibe û navê wî dikin Reco. Mela Ehmed temeneke dirêj jiyan dike, paşê diçe ber dilovaniya Yezdan. Hevjîna wî Ararat bi kurê xwe ve koçberê gundê bi navê Boynizliyê dibin. Bapîrê min Reco bi dapîr Fatmayê re hevjîn dibin. Pişt re dapîr Ararat diçe ber dilovaniya Yezdan. Bapîr Birahîm li vî gundî çavên xwe li jiyanê vedike. Dema temenê wî digihîje heft heşt saliyê dest bi xwendinê dike. Xwendina xwe li medresan dide domandin heta temenê wî digihîje bîst û pênc saliyê. Paşê bi keçikeke ku navê wê Seyrane re hevjîn dibe û jiyana xwe bi hev re parve dikin. Du keç û du kurên wan çêdibin. Navê keçên wî Cemîle û Heyat, navê kurên wî jî Mihemed û Elî ne. Mihemed bavê min e. Ji ber jîrî û jêhatîbûna wî navê duwem weke zêdenavekê lê dikin û jê re dibêjin "Hoko." Bi Kurdî wateya wê bilindahiye. Ji ber dema Quran dixwend dengê wî pir xweş bûye gelek hatiye heskirin. Dema temenê bavê min digihêje neh deh saliyê bingehê serhildana Geliyê Zîlanê jî tê avêtin û di wê pêvajoyê de bapîrê min Birahîm bi mirinek biguman diçe ber dilovaniya Yezdan. Bapîrê min di wê pêvajoyê de di nava Alayên Hemîdiyeyê de serpêl(yuzbaşî) bû. Ji kurê mamê dapîra min re tê gotin ku Mela Mihemedê mezine. Dibihîsin ku Mela Birahîm, hevalê wî û zavayê wî çûne ber dilovaniya Yezdan. Ew rewş xemginiyeke mezin ava dike. Ew dem wiha dihat vegotin; "ji henûnî û dilpakiyê em her kesê weke xwe dibînîn. Ew jî bi jehrê qetil kirin." Ev axaftinên kurmamê dapîra min li ser zimanê dapîra min nediketin. Her vedigot û pê re digirêya.

Sotin cîger û gurçik, helandin dil
Talan kirin keç û xortên bidil

Şewitandin melayê me yê jidil

Piştî gelek zehmetiyan bavê min dîsa dest bi xwendinê dike û xwe digihîne hinek zanînan. Hinek berhemên weke Quran, Mewlûd û hinek pirtûkên din jî dixwîne. Dapîra min dixwaze li gorî şerîetê kurê xwe, yanê bavê min hevjîn bike. Lê bavê min xwe nade ber vî karî, ji ber ku aborêya wan qelse. Rewşa wan ya aboriyê ew qas xirabe ku tenê fîstanek û şarpeyek dapîra min û du metên min hebû. Ji derveyî destek cilên navmalê ew fistan û kiras hevpar bikartanîn. Pez û dewar titunebûn, nanê genim, pêxwarina ceh û garis dibû. Hîn jî êşandina li Geliyê Zîlanê li ser xwe navêtibûn. Ji ber wê bavê min hevjîniyê napejirîne. Koçber bibûn, bi mehan kar dikirin ku tenê ji bo zikê xwe têr bikin. Bi mehan bi nanûzikî kar dikin, ne ku ji bo pere bidest bixin. Dapîra min çend caran wisa zoriyê li ser dike da ku bi bavê min hevjîniyê bide pejirandin. Di dawiyê de bi zorê be jî pê dide pejirandin.

Malbata dayîka min jî koçberbûne, êvarekê biryara xwe didin ku biçin mala kalikê min Lezgîn, da ku dayîka min ji bavê min re bixwazin. Wê êvarê hevjîniyê bi wan didin pejirandin. Min dayîka xwe nedîtiye. Navê dayîka min Xecê ye. Sê kur û du keçan tîne cîhanê. Navê zarokên dayîka min Emîne, Helîme, Heyder û Abdûlah in. Piştî wan min çavê xwe li jiyanê vekirin û navê min jî dikin M. Nûrî. Piştî jidayikbûna min bi qederê şeş mehan şûnde dayîka min diçe ber dilovaniya Yezdan. Min germahiya dayîka xwe Xecê nedît û ez bi wefata dayîka xwe sêwî mam. Di zaroktiyê de ez bi dilnizmiyê dihatim nasîn. Dema ku li min hêrs dibûn ez digirêyam, wê êşandin bi min re dida çêkirin. Birastî ez zarokeke hestiyarbûm. Her axaftin li min zor dihatin û dibû keder û êş. Wê jî ji xwîşka min Emîneyê re xemgînî çêdikir. Ji ber ku Emîne û xêzana mamê min Elî ez mezin kiribûm û ked bi min re dabûn, xemgîn dibûn û bêzarêya wan di rûyên wan de xwe dida der. Bavê min her du birayên min Heyder û Abdula şandin medreseyan û ew bûn feqe.

Bavê min carek din xwe amede kir ku zewaceke din pêkbîne. Di encamê de bi dayîka Gûrcî re bûn hevjîn. Piştî dayîka min çû ber dilovaniya Yezdan, bavê min gelek heskirin nîşanî zarokên xwe dida. Her wiha ferq û cudahî nedixist di navbera zarokên xwe yên keç û kur de. Ne tênê zarokên xwe, her tim heskirin nişanî zarokên derdorê jî dida û tim digot; "çima hûn zarokan çênakin?" Bi xwe jî pir dixwest gelek zarokên

wî hebin û zarokên gundiyan weke zarokên xwe didîtin. Dayê Gurcî ji wan du keç û şeş kur dayîka heşt zarokan bû. Em û zarokên wê bi hev re mezinbûn. Dayê Gurcî jî ferq û cudahî nedixist di navbera me de. Navê zarokên dayê Gurcî jî yên keç Saniye û Sebîhe, yên kur jî Mihemed Zeki, Mihemed Salih, Hukmetilah, Ûbeydûlah û Farûq bûn. Dema birayê min yê biçûk ji dayîk bû, di her kolanekê de dirûşmên azadiyê dihatin guhê mirov. Lewma navê wî kirin Azad.

Dema temenê min gihişt 20 saliyê bavê min ez bi qîza kurmamê xwe ya bi navê Xanim re dam zewicandin. Pênc kur û şeş keçên me çêbûn. Navê kuran; Mihemed Seîd, Ebdulxefar, Mûrad, Firat û Serhat e. Navê keçan; Zehra, Rahîme, Melîke, Gulê, Ayfer û Berfê ye.

Kurê min ê bi navê Mihemed Seîd ji aliyê hinek hovan ve hat qetilkirin. Piştî qetilkirina wî du heval hatin mala me û bi min re axivîn. Ji min re wiha gotin; "M. Seîd hevalê me ye. Serê Rêber Apo, hemû Kurdên welatparêz û hevalan sax be." Ez pir jê bandor bibûm. Piştî xwarin û vexwarinê me xatir ji hev xwest û heval çûn.

Di dîroka 1999'an de M.Seîdî li Enqerê xwendina xwe berdewam dikir. Piştî salekê wê bihatiba serdana malbatê. Ji berêya ku li Enqerê bixwîne, ji ber ku pirsgirêkên wî yên siyasî derketibûn, ji Erdîşê koçber bibû. Mamosteyê wî banî min kir (wê demê M. Seîd dibistana amadeyi, pola sêyan dixwend) û ji min re wiha got; "kurê te ne xwendekare, bi hevalên xwe re civînên siyasî çêdike û tevliheviyê di nava dibistanê de dide çêkirin. Ji ber vê yekê rêveberêya dibistanê di derbarê kurê te de biryar girtiye ku wî ji xwendinê qut bike û ji dibistanê dûr bixe. Her wiha qedexeya wî ya di herêmê (Kurdistanê) de erê kirine. Bi vî awayî nikare di ti dibistanên herêmê de xwendina xwe berdewam bike. Lê ji derveyî vê, li ku derê dixwaze bila bixwîne."

Ez bi fikar hatim malê û min ji Mihemed Seîd pirskir ka gelo tiştek bi vî awayî heye yan na. Got; "nexêr, şaş daxivin li ser min." Min jî got, "ger tiştek hebe ezê bi te re bibim alîkar." Bi dengekê bilind got, "ma ezê çend caran ji te re bêjim tiştek nîne." Ez di cihê xwe de sekinîm û bêdeng mam. Mala birayê min Mela Abdûla li Enqerê bû. Ji ber vê rewşê xwesteka min ew bû ku wî bişînim gel birayê xwe û li wir bidim xwendin. Piştî demekê min Mihemed Seîd şand Enqerê. Dem derbas bû. Piştî salekê xwest bê Erdîşê serdana me bike. Lewma roja wê bihata ji me re telefon vekir. Bi dilxweşî got, "ezê îro bêm." Ez, dayîka wî û

birayên wî Ebdulxefar, Mûrad, Firat û Serhat bi hev re li tirimpêlê siwarbûn û çûn pêşwaziya wî. Em demjimêrekê li cihê ku wê bihatibayê rawestiyan. Dema ku gihişt, me bi coş û xurûşeke mezin ew himbêz kir. Paşê em bi hev re li tirimpêlek din siwar bûn û me berê xwe da malê. Dema em gihiştin derê malê, xuşkên wî (Zehra, Rehîme, Melike, Gulê, Ayfer, Berfê) bigermî pêşwaziya wî kirin û ew birin danîn di navbera xwe de. Hatina wî gêwilek bilind da dayîk û xwîşkên wî. Em rûniştin û me bi hev re bi suhbetek xweş kir. Piştî demeke dirêj em dîsa li hev civiyabûn, me bi hev re çay vexwar û xwarin xwar. Min ji hevala xwe re got, "ezê biçim bazarê hinek karê min heye."

Bi qasî 10-15 kêliyan bû ku ez çûbûm bazarê. Mihemed Seîd jî dibêje ezê biçim bazarê. Dixwaze biçe gel hevalên xwe. Dema tê bazarê hinek kesên ku me guman jê nedikirin zanyariyê didin dewletê û giliyê wî dikin. Li gorî ya dihat xuyakirin tu pirsgirêk di navbera me de tunebû, lê ew bibûn sîxwurên dewletê. Hinek kesên ji eşîra Hecîderiyan, ji gundê Kara Kilisê bûn. Dewletê ji qetilkirina kurê min pendek hûnandibû û ji vê jî parçeyek erd dan wan kesên sîxwur û ew kirin hevkarên xwe. Bi vî awayî Mela Yaqo û Ehmedî li gel polîsên Tirk derdora kurê min digirin û lê didin heta ku qetil dikin. Paşê xebera reş dan min û gotin; "kurê te kuştine."

Polîsan ez jî bi kul û xemên min yên taze ve girtim û birim qereqolê. Lê mixabin xayînên xwefiroş revîbûn û xwe xilaskiribûn. Bi awayê pêkenok, ji min re digotin; "kurê te hat kuştin." Ez bi qasî rojekê li qereqolê hiştim. Di vê demê de du kes anîn û gotin; "van kesan kurê te kuştine." Min got; "na. Ne van kesan kurê min kuştine, ew kes niha bi keyfan di bazarê de digerin." Bi dengeke bilind bi ser ser min de dikirin qêr, dikenîn û digotin; "ev ne destpêke ne jî dawiye, wê gelek tiştên din bên serê te." Pişt re ez berdam. Du meh pişt re dîsa hinek heval hatin mala me. Di nava wan de hevaleke ku min nasdikir hebû. Navê wî Cimo bû. Ji min re gotin; "M. Seîd hevalê me bû." Wê demê min zanî ku M. Seîdî di nava xebatên partiyê de kar kiriye. Van hevalan ji min re gotin; "ti pirsgirêka te bi van re nîne, pirsgirêk ya me ye." Piştî demekê heval Cimo li Geliyê Zîlan şehîd ket.

Mihemed Seîd hem kurê min bû, hem jî hevalê min bû. Dema min ji kul û kedera dilê xwe helbest li ser wî dinivîsand, hinek xwendekar ji dibistana amadeyî ya Şehîd Koçerîn hatibûn serdana min. Li

nivîsandinên min nêrîn û di nava wan de xwendekara bi navê Heyat, keça Recebê Çelî ew helbest bilêvkir. Dema vedigot ji dilê xwe yê birîndar distira û di çavên wê de rondik dibariyan.

**Bilbilo**
Ax! Ez çi ji te re bêjim, ey bilbilo?
Ez jî weke te bûm evîndarek ji dilo
Li min peydabûn derd û kulo
Li min pêçandin zincîr, li her du milo
De tu bêje ey bilbilê perîşan
Çima li te tarî bû erd û ezman
Berê te jî digotin li her milê cîhan
Çima tu jî niha wek min bûyî bê ziman?
Nizanim çi bêjim ji te re
Her tim li ser serê me ceng û şere
Da tu jî wek min li mafê xwe bigere
Tarîkirin roja me Kurdan
Bindest kirin warê bav û kalan
Tim ji me dikujin xwîşk û biran
Ji ber vê derdê me pir girane
Ez xerîbim, ji welat û Apê xwe
Ezê Apo bikim awaz li ser zimanê xwe
Welat bikim evîn li nav dilê xwe
Ezê bidim can ji bo xaka xwe
Bilbil, dizanim tu jî wek me dixwazî azadî
Hêlînê bibîne bi serfirazî
Li ser hêlînê bêje awazî
Ji bo me welat bûye daxwazî
Bilbilo bû sedsal em mane bindest
Li me tarîkirin zozan û deşt
Ji me standin stran û helbest
Ji ber vê jî dilê me ji cîhanê şikest
Bilbilo bes tu dixwazî azadiya xwe
Bi serbestî bêjî stran û awazên xwe
Em dixwazin Rêber û welatê xwe
Bi serbestî baxivin bi zimanê xwe

Malbata me niha jî piranî koçberin. Yên ku bavê min dabûn xwendin, bûne mela û di ramanên wan de hestên Kurditiyê hebûn. Sedema vê welatparêziya wan Şoreşa Rêber Apo ye. Lê di serhildana Geliyê Zîlanê de êşa ku li bav û kalên me dan kişandin, giranî li wan jî kiribû. Ti kesî weke Rêber Apo Kurd hişyar nekirin. Lê ez bi xwe dinirxînim, Rêber Apo raperîne û evîne ji bo gelan û diyare heta îro ti şoreşek weke ya şoreşa Rêber Apo derneketiye. Her ferdeke Kurd bi derketina şoreşa Rêber Apo şiyar bû. Malbata min jî bi vê şoreşê ji xewa bindestiyê şiyar bû, tîrêjên roja xwe dîtin û li pey wê meşiyan.

**Jiyana Pîrê Seyran**

Pîrê Seyranê digot; "Gundê me, li herêma Geliyê Zîlan e. Serpêhatiya qirkirina ku çêbûyi qet nayê ji bîr kirin." Pîrê Seyran hem digirêya hem jî daxivî û wisa bigirî, keser û axîn vedigot: "Li derdora Geliyê Zîlanê 32 gund hebûn. Malbatên van gundan kêm mabûn, yên din hemû hatibûn komkirin. Li rasta binya gundê Kundûkê dor li van eşîran hatibû girtin û pişt re hatibûn gulebarankirin. Qêrîn û zarîn diket nava mirovan. Kalemêran, pîrejinan li nava çavê xwe dixistin, zarokan bi pêşa dayika xwe digirtin, xwîşk, bira û dayikan bi hev re qêrîn dikirin û hewil didan xwe ji vê hovitîya bê wijdan xilas bikin. Lê dem borîbû, xwîn diherikî, singû li zikê bûkan û dayikên ducanî didan. Zik diqelişandin, zarokên di zikê dayikên ducanî de hildidan ser singuyan, radikirin û bang dikirin; 'hêj mar tunebûye bostek, serê wî biperçiqînin.'Bi vê helwestê bang li gel dikirin. Bi hezaran laş û cendekên mirovên Kurd di nava xwîna sor de mabûn. Dewleta Tirk ti ferq nedixist di navbera bêguneh û bigûnehan de. Tişta tê zanîn yê ku navê wê/î Kurd be, wê di tevkujiyê re derbas bikin. Dema mirov dihatin gulebarandin, her kesî di got; 'em mazlûmin, me nekujin, em bê gunehin.' Lê hovên xwînxwar dîsa dest ji gulebarana xwe bernedidan. Dewleta hov a faşîst bi rojan gel gulebarankir."

Min jî ev gundê bi navê Kundûkê dîtiye. Hê jî li rasta binê gund giya şîn tunebûye. Hestiyên dayîkan, bavan, xwîşkan, pîran, metan, xaltikan, biraziyan û xarziyan li vê rastê dihatin dîtin.

Pîrê Seyranê wiha berdewam kir; "…ti carî ji bîr nakim û ji mejiyê min dernakeve. Dayikekê keça xwe xistibû bin laşê xwe, dayîk zûde bûbû şehîd, du roj di ser qirkirinê re derbas bibûn. Li cihê ku qirkirin lê pêkhatî, li mirovên zindî digerêyan. Di wê kêliyê de dayîkeke di nava wan terman de hîn jiyan dikir hebû û wiha got; "ew dayîka ku zaroka xwe xistî bin laşê xwe de bi qasî du metran ji min dûr bû. Bi zehmetî min nefesa xwe digirt û berdida, ji ber ku gelek laş li ser min bûn ez nedihatim xuyakirin. Dema leşkerên Tirk rastî vê keçikê hatin, zaroka biçûk çiçikê dayîka xwe derxistibû û dimêht. Destê wê girtin, çavê wê wek çavên xezalan bûn, porê wê wek zêr dibiriqî. Yek ji van leşkeran zarok hilavêt, yê din jî bi singuya tifenga xwe lê da û rakir hewa û bang kir, heta zarokê can da.' Du yan sê roj di ser qirkirinê re derbas bibûn. Dîsa jî bela xwe ji me venedikirin. Vê carê jî li derdorê li mirovên zindî digerêyan, bi rastî jî kê bi dîtibana wê bi kuştibana. Bexşandina wan ji bo zarokan, birîndaran, kalan û pîran tutunebû. Heta deh rojan cihê qirkirinê bernedan. Difikirîn ku mirovên zindî mane û wê ji mirinê xilas bibin. Herî dawiyê ji ber ku bêhn ket laşên mirêyan û nekarîn çareyekê ji bêhnê re bibînin neçar man herêmê berdin. Nehiştin kes werin da ku laşên wan mazlûman veşêrin. Eger hinek bihatibana jî wê bihatana qetilkirin."

Navê eşîrên ku malbatên wan hantibûn qetilkirin evin; Hecî Dêrêyan, Bekiran, Mikayîlan, Hemoyan, Xeloyan, Ecoyan, Şêxan, Îsîkan, Kalikan, Cehfuyan û Ebduyan. 32 gund ji holê hatin rakirin. Niha jî ew gund di destê koçberên Avganistanî de ne.

Dewleta Tirk li van bajarokan operesyonên xwe yên leşkerî dan dest pêkirin. Ji milê rastê ve Patnos, Dutax, Agirî, Kevirê Spî, Îdir, Bazîd û heta bigihe Makuyê, ji milê çepê ve Mûradiye, Çaldêran, Wan, Serayê û heta Çaldirana nava Îranê de, ji rojava ve jî Melazgirt, Bûlanik, Elcewaz, Exlat bû qadeke berfireh ya operasyonan. Li van herêmên çiya, bajaran û geliyan li Kurdan digerêyan. Kî vana bidîtiba, yan jî pê re bidaba û bistandiba, sîxûriyê nekiriba û agahî nedaba dewleta faşîst wê ew jî hatiba kuştin. Dewleta Tirk ji bo Kurdan pêla tinekirinê dabû destpêkirin, ya pêkdihat ti tişteke din tunebû. Mij û diman ji Erdîşê ve dihat dîtin. Gundên Geliyê Zîlanê hatin şewitandin. Nexşeya van gundan ji holê hat rakirin. Li herêmê ji bilî dûmanê, şewitandinê û bêhna xwînê tiştekî din diyar nedikir.

Pîrê Seyranê çîroka xwe û welatê xwe tim tanî ziman. Lê wê demê xwendin û nivîsandina min titunebû, em biçûk bûn. Dema ez gihiştim havalan, min fêrî xwendin û nivîsandinê kirin. Min jî çiroka pîrê Seyranê nivîsî.

Ji bo her tiştên ku partiyê bi min dane fêrkirin, di serî de deyndarê şehîdan û Rêber Apo me. Dîsa deyndarê her du mamosteyên xwe me ku bûn sedemê fêrbûna min a xwendinê. Ji heval Cûma û heval MustafaKarasû re spasî û rêzên xwe yên bêhempa nîşan dikim. Ez jî zarokeke vê herêmê me. Misogere ku wê gele Kurd bi xeta bîrdoziya Rêber Apo ji van tevkujî, zilm û zordAriyan xilas bibe û di welatek azad de, li ser xakek azad azadî û aştiyê bidest bixe.

Dema mirov li gundê Kundikê meyze dike û li van herêmên berfireh dinêre, gotina cûmhûriyetê derdikeve ku ne xwediyê bingeheke raste. Ji ber ku sistema kapîtalîst û çapemeniya wê bi derewan xwe li ser piyan digrin. Ger rastîyekê bejin jî, wê bi hilweşînê re rû bi rû bimînin. Ji ber vê jî ti rastiyek di vê cûmhûriyetê de nîne. Di vê tevkujiyê de, bi gotina pîrka min, nêzî 20 hezar kes hatin qetilkirin. Sedema vê qirkirinê tenê pênc şoreşgerên Kurdan bûn. Yek ji wan jî Edoyê Ezîzî û du biraziyên wî bûn, yên din jî Derwêş Ecuyî û Bişarê Ecuyî bûn. Bişar hêj 9 salî bû. Dema Edo Ezîzî bi hevalên xwe re tê mala bavê Hecî Mişîr Ecuyî, dayikek derdikeve pêşiya wan û dibêje, "leşkerên Tirk li vir in." Edoyê Ezizî bersiv dide û dibêje; "em nehatine şer. Emê bizivirin." Di vê navberê de gêrîlayê nehsalî dike qêrîn û dibêje; "li me dan" û dest bi şer dikin. Mudur di nava kulav de xwe vedişêre. 9 leşker bi çawişekî ve bi şoreşgerên Kurdan re şer dikin, 6 ji wan tên kuştin û yên din direvin. Mudur di nava kulav de xwe dilewîtîne û dimire. Navê mudûr Riza bû û başçawiş bû. Lê serfermandar Edo Ezîzî û her çar şoreşgerên Kurd nayên kuştin û bisax û selametî digihîjin baregehên xwe. Ji ber vê sedemê qirkirin dan destpêkirin. Azadîxwaz bi xwînrijandina xwe tên pêşwazîkirin û gelê Kurd her dem aştîxwaze.

**Dîroka Sê Melayên Kurdistanê**

Mêhvaneke me yê hêja û pir giranbiha bi alîkarêya M. Hadî bû mêhvanê malbata Hecî Qokê. Ev bi xwe jî ji gundê Timoqa girêdayî bajarokê Sasona ser bi Êlihê bû. Navê wî M. Abdulah bû. Di dîroka 1986'an de hatibû û di mehên biharê de li mala Hecî Qokê dima. Her du birayên min ên bi navên M. Heyder û M. Abdulah jê hezdikirin û digotin mamosteyê me ye. Di axaftina xwe de zîrek, hêja û delal bû. Ji bo rêxistinê mamoste bû, di piratîka xwe de zîrek bû û herdem civîn çêdikirin. Dikarê Rêber Apo dikir û digot; "eger hûn Rêber Apo nedin naskirin, hûnê li bal Yezdan gunehkarbin. Divê hemû melayên Kurdistanê li ser Rêber Apo binivîsînin û Rêber bidin naskirin. Ev karê melayan e, tu gel ji bo Rêberê we nanivîse, ti kesek jî, lê hûn dikarin bi hezaran nivîsan li ser hinek din binivîsin. Ev yek jî berjewendperestiye. Melayên Kurdistanê wê heta kengê di xewê de bimînin; şiyarbin. Dîrok wê hesabê ji we bixwaze." M. Abdulah ketibû nava ronahiyek bê dawî. Li cem malbata Hecî Qokê bi mehan ma, piştî wê jî bi alîkarêya hinek welatparêzan derbasî Îranê bû. Li Ûrmiyê cihwar bû.

Mamoste M. Abdulah ji aliyê PDK'ê ve hat girtin û xistin zindanê. Bi awayekê birayên min M. Heyder û M. Abdulah pê hesiyan ku Mela Abdulah avêtine zindanê. Ez nizanim tiştekе din ya sedema girtina wî, tişta dihat xuyakirin mijara Rêber Apo bû. Kiryarên M. Abdulah giraniyek mezin li ser mamoste M. Heyder da çêkirin, heta dilê wî da êşandin. Bi hesretek bêdawî mamoste M. Heyder ket rewşek wisan ku bi ti kesî re ne dida û ne distand. M. Heyder bi hewara M. Abdulah çû. Di navbera wan de çi derbas bûbû ez nizanim. Ji ber mamoste di zivirandina xwe de gelek nexweş bû. Dilê wî diêşiya. Ev axiftin ji devê mamoste M. Heyder derket û got: "Min serdana birêz Mesud Berzanî kir. Ez çûm cihê lê dima, min destur ji pêşmergeyên devê derî yên ku hişedarî dikirin, xwest. Min daxwaza xwe ya serdana birêz Mesud Barzanî anî ziman. Ji min re destur ji rêveberêya PDK hat xwestin û pişt re agahî dan, ji birêz Mesud Berzanî destur jê re hatiye standin. Çûm hundirê koşka wî, me silav da cemeetê û wan jî silava min vegirtin. Pişt re ez dame rûniştandin, keyfxweşî dan, min jî keyfxweşî da cemeetê. Birêz Mesud Barzanî çavên xwe li derdora xwe gerand û zivirand ser min. Keyfxweşî da min, halê min pirsî. Min jî got; ji we re rêzdarim, ji bo

min avek sar bihata anîn wê başbûya. Ez têhn bûbûm, piştî vexwarina avê gelek rehetbûm. Weke parastina kevneşopiyekê xwarin û vexwarin danîn ber me. Piştî ku sifreya xwarinê hate komkirin min got; "ger hûn destur bidin hinek daxwazên xwe bi we re parvebikim." Got; "kerem bikin." Min got; "pêşmergeyan bi şaşî M. Abdulahê ji gundê Timoqê, bajarokê bi ser Sasona girêdayê Êlihê girtine. Hatibû Îranê ku hinek bigere, lê ji aliyê pêşmergeyan ve hatiye girtin. Hûn ji kerem û mezinahiya xwe rehmê lê bikin û bidin berdan wê baş be." Bersîva min wiha da; "Ew PKK' yî ye." Min jî got, "Ew mamosteyê hemû Kurdan e." Paşê min xatir jê xwest û derketim. Eger baş bibim hinekî bi te re biaxivim."

Hatina mamoste ji Îranê, êş, kul, keder û xem ji malbatê re anîn. Malbat gelek pê ve girêdayîbû. Lê belê, M. Abdulahê Timoqê bi alîkarêya rêhevalan derbasî sehaya Rêber Apo bû. Li Akademiya Mahsûm Korkmaz, li gel Rêberê gelê Kurd Rêber Apo dima. M. Abdulah xwediyê gelek taybetmendiyên baş bû. M. Abdulahê Timoqê, M. Heyder û M. Abdula bi sosyalistiyê dihatin naskirin. Bi olê îslamê ve girêdayî bûn her sê mamosteyên Kurdistanê. Yek ji taybetmendiyên M. Abdulah, M. Heyder û M. Ewdila ew bû ku navê hevalan nedigotin. Di dewsa wê de digotin; "yên ji me çêtir in." Ji ber ku hevalan zilm û êşandina li ser gelan nedipejirandin. Ferq û cudahi nedixistin di navbera mîrovan de. M. Abdulah, M. Heyder û Abdulah digotin: "Ji van çêtir nehatine û wê neyên jî." Yanî behsa rêhevalên Rêber Apo dikirin. Heroj rondik dibarandin ku me pêşengê gelê xwe û cîhana xwe nedît, dibe ku em negihijin Rêberê xwe. Lê şervanên azadiyê jî, mereqa dilê wan bûn. Ditîna wan şêr û egîdan hesret û meraqa dilê wan bû. M. Abdulah xwe gihand Rêber Apo. Di bawerêya min de M. Heyder hinek şervanên azadiyê dibîne, piştî vê seferê diçe Ûrmiyê û yek ji van şervanên pîroz dibîne. Ez ne şaş bim navê wê Leyla bû û ji Serhedê bû. M. Heyder digot ku; "kulîlkên ji baxçeyê biheşta Kurdistanê bûn. Ji baxên Kurdan hatibûn afirandin." Li Ûrmiyê nexweşxaneyeke taybet a hevalan hebû. Digot; "xwezî ez nexweşê vê nexweşxaneyê bûma, wan bijîşkên exlaqpîrozên weke ferîşteyan ez derman bikirama." Her sê melayên sosyalîst di demên cuda de çûn ber dilovaniya Yezdan. Rêber Apo di derbarê M. Abdulahê Timoqî de gelek nirxandin kirine. Rêber Apo çinara bê qirêj e.

M. Abdulah ji aliyê malbata Hecî Hokê ve gelek dihat hezkirin û bi keyfxweşî pêşwazî dikirin. Derketina M. Abdulah ji malbatê û dûrketina wî xemginî û êş bi xwe re anî. M. Heyder di nava melayên rêxistinê de endam bû. Bi hemû derfetên xwe karê rêxistinê dikir, carna diçû Îranê. Li Ûrmiyê ji bo dîtina hevalan ji min re got: "Tu jî were, hinek tiştên biqîmet bibîne."

Yek ji wan hevalan navê wê Leyla bû. Gelek behsa heval Leyla dikir. Ji ber vê yekê tim gotina bav û kalan tanî ziman û digot, "Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e." Heval Leyla xezala çiyayê Araratê bû. Wê demê min tam zanî ku M. Heyder di nava karê partiyê de dixebite. Di sala 2011'an de min ji heval Leyla ya li Akedemiya Jinê ya li Xinêre dima pirsa M. Heyder kir. Wê jî bi dengeke xurt û biheybet bersiva min da û got, "Belê, min M. Heyder li nexwaşxaneya Ûrmiyê, dema hatî serdana hevalan dîtibû."

**Bîranîna Mela Abdûlah**

Carekê Mela Abdula diçe serdana Mekeh û Medineya Hz. Mihemed. Dema dizivire, miftiyê Êlihê gotinek wiha di derbarê wî de dibêje. "M. Abdulah kevir ne avêtiye kortikan." M. Abdulah axaftina miftî dibihîse û paşê pêşa xwe û destên xwe tejî kevir dike, berê xwe dide mala miftî. Diçe li ber deriyê miftî, jina miftî li devê derî dibîne. Ji xêzana miftî re; "Ez çûbûm serdana hezretî Mihemed. Mihemed Pêxember hat xewna min, ferman da min û wiha got: "Kortika mezin li Êlihê ye. Tu here wir û mala miftiyê Êlihê bide ber keviran. Lewma ezê ji ber fermandayîna Pexember mala we kevirbaran bikim."

Bi vî awayî dest bi barandina keviran dike. Heta kevir tavêje û cama pencereya xaniyê miftî jî dişkîne. Ji ber keviran pencereyên xaniyê miftî yek lib saxlem namînin. Miftî bi êvarê re tê mal. Çi bibîne! Rewşeke perîşan. Ji jina xwe pirs dike ka çi rewşe li malê qewimiye. Jinik dibêje; "Pîremêreke rihspî hat vir û got, "Pêxember di xewna wî de ferman daye ku ew mala me kevir bike. Li ser fermana pêxember mala me kevir kiriye. Navê xwe jî ji min re got ku navê wî M. Abdulahê Timoqê bû."

Miftî bi dileke tije sawm ji hevsera xwe re dibêje dibêje; "Ji şikandina caman bigere. Ger em bi şikandina wan xilas bûne ne tiştek e, gelek ziyanê nade me. Ya zor ew e ku wî di nava gel de ez bi naletê dame gunehbarkirin."

M. Abdulahê Timoqî demek dirêj li akademiya Mahsûm Korkmaz dimîne. Pişt re li Şamê di sala 1993’yan de çû ber dilovaniya Yezdan. Mamosteyê mezin ji aliyê gelê Rojavayê Kurdistanê ve bi girseyeke mezin tê oxirkirin û li qebristana gundê Berkevirê yê girêdayî Dirbesiyê tê veşartin. Mamoste keser xist nava dilê gelê Kurd, lewma dema koça dawî kirî li ser gora wî gel amedebû û bi dilgermî û minetdarî ew teslîmê axa pîroz a Kurdistanê kirin. Gel hemû bi hev re sond xwarin ku wê rêya şehîdan û Rêber Apo ji me re bibe armanca jiyana azad. Gelê Kurd wê rêya wan bişopîne. Hevalê wî M. Heyder jî pêşiya hevalê xwe M. Abdulah çûbû ber dilovaniya Yezdan. Giraniyeke mezin a van her sê melayên sosyalist di nava gel de hebû. Lê M. Heyder digot, “Ev şoreşa ku Rêber Apo dide meşandin wê her berdewam bike. Her çendî min Rêber Apo nedîtiye jî, lê min şervanên wî yên azadiyê ditîn. Ev ji bo min keyfxweşiyeke mezin bû.” Ew jî di sala 1989’an de çû ber dilovaniya Yezdan. Termê wî ji aliyê girseyeke mezin ve hat veşartin. Qebristana li axê hatiye spartin qebristana Erdîşê ya bi navê goristana mala Reyîs e. Gelê ku tevlê merasîma oxirkirina M. Heyder ya ber bi rêya bêdawî wiha ew raber dikirin; “Ew tiştên we tanî ziman rastiya şehîdan û Rêber Apo bû. Emê rêya şehîdan û Rêber Apo bişopînin û bernedin.”

Çûyîna wî rê li ber xemgîniyke mezin vekiribû, xatir ji mamosteyê mezin hat xwestin û bikul û kederan gel vegerêya malên xwe. Lê wasiyetek giranbiha ya seydayê mezin M. Abdulahê Timoqî hebû. Wesiyeta wî ew bû ku ez tevlî refên gêrîla bibim û her du birayên min ên din jî di nava rexistina Partiya Kurdan de kar bikin. Ji min re gotibû “Tuyê soza xwe bidî û tevlê bibî.” Min jê re soz da ku ezê tevlî refên şervanên azadiyê bibim. Lê wê demê rewşa me ya aborî pir ketî bû. Min jî got, “Bila demek derbas bibe, heta me hinek xwe ser hev de anî paşê ezê wesiyeta wî bicih bînim.” Fermana seydayê mezin weke guharekê di guhê min de bûbû nîşana azadiyê.

Hevalekê ji berêya tevlî şoreşê bibe ev hersê mela nasdikirin. Dema min ev nivîsandin ji bo van meleyan dinivîsî, wî jî hestên xwe wiha herikandin:

**Dewrana Bêbext**

Ger hebûn biwate be jîn xweş e
Ger mirov bê heskirin keyfxweş e
Ger bi hêvî û bawerî be dilxweş e
Va ez li vir im ka dewrana bêbext li ku ye?

Digerim ez li cîhana pir tejî
Jîna xwe dihûnim her bi hevbeşî
Armanca min ne keyf e ne jî dilxweşî
Va ez li virim ka dewrana bêbext li ku ye?

Ez dildarim evîn sebra min tine
Sermest bûme sedem yara zer nîn e
Besta pîroz doza welatê min e
Va ez li virim ka dewrana bêbext li ku ye?

Canfidame ez, ji methan dûrim e
Ji bo azadiyê ez can gorîm e
Mirin çi ye, ez ji qebran borîm e
Va ez li virim ka dewrana bêbext li ku ye?

## Wateya 14’ê Tîrmehê

Di destpêka mirovahî û pêşketinên wê yên di jiyanê de, hê rastir dema mirov li dîroka mirovahiyê ya nivîskî bimeyzîne, dibîne ku di kesayeta Hz. Îdrîs û Hz. Eyûb de gelên MezApotamyayê li hemberî zilm û zordarêya ku qiral, Nemrût û Firewnên zalim li ser gelên Mezopotamyaya jêr û jorîn dikirin derketine û serî hildane. Her wiha dîrok jî dide diyarkirin ku kesayetên weke van pêxemberan pêşengî ji berxwedanê re kirine û çalakiya xwe ya dîrokî pêkanîne. Yanî di dîroka van pêxember û gelên Rojhilata Navîn de yekemîn car di keseyata van pêxemberan de ji qiral û xudayên bi xof re tê gotin; “Hûn mirovan dixin şûna morêyan, hûn mirovan wekî lawiran bikartînin.” Ya herî giring jî, ji bo ew êşa ku mirov dikişîne bi qiralan bidin hesandin di quncikên zindanê de bi salan xwe bê xwarin û vexwarin hiştin. Sebra ku bi xwe re çêkirin heta niha jî, ji bo mirov wekî nirxekê tê bikaranîn û parastin. Erê, di dîroka şaristaniya Rojhilata Navîn de di navbera mirovan de, bi wateyeke din, di navbera hêzên desthilatdar û gelên bindest de ji wê rojê heta îro bênavber li hemberî bêrûmetiya zilm û dagirkeriyê di nava têkoşîn û şereke mezin de ne û ala çanda berxwedaniyê bilind kirine. Eger em bi kurtî bêjin, di dîroka gelê Kurd a nêzik de, li wê çanda berxwedaniyê xwedî derketin heye û îro gelê Kurd di cîhanê de serbilind e, pêşengiya şaristaniya hemdem a Rojhilata Navîn dike.

Gelo ev denydarê çi nirxî ye? Em bi kurtî bêjin û lê meyze bikin. Di dawiya s.s 19'an û destpeka s.s 20'an de cîhana me bi du şerên mezin re rû bi rû ma û ji van her du şeran re “Şerê Cîhanê” hat gotin. Di nava hêzên desthilatdar de ji nû ve parvekirina cîhanê çêbû û di encama van şeran de şêweyeke nû dan cîhanê. Bi taybet welatê Kurdan û gelê Kurd, di şert û mercên wê demê de, tunebûna rêbereke zana û hemdem di nava gelê Kurd de bû sedema bingehîn ku gelê Kurd ji hemû gelan zêdetir di warê siyasî, netewî, civakî û çandî de ziyanek mezin bibîne û derfetên dîrokî ji dest bide. Plana herî metirsîdar ya li ser welatê Kurdan ew bû ku gelê Kurd û xaka wan hate perçekirin û welatê Kurdan tune hate hesibandin. Bi piştgirêya Hêzên Hevpeyman ên Rojavayî, Tirk, Ereb û Farisan bi peymanên Saykspîko û Lozanê Kurdistan kirin çar parçe û di nava xwe de parve kirin. Di rewşeke wiha de ew gelê Kurd ê ku li ser van axan bi hezaran salan jiyan kirî, ji bo jiyaneke azad tim û tim li hemberî

dagirker û hêzên desthilatdar têkoşîn dayî, li gorî hêza xwe ya heyî ew berxwedaniya nîşandayî û li çanda xwe xwedî derketî, bi dagirkerî, xwînmijî û bindestiyê re rû bi rû ma. Bêguman geleke wiha xwedî dîrokeke kevnar û çandeke bikok, dagirkerî û hovîtiya van dagirkeran napejirîne. Lewma di tevahiya dîrokê de bi dehan car li hemberî van hêzên hegemon û dagirker serî hildane û bi şoreşan têkoşînên bêhempa raberkirine. Lewma, her çendî van dagirkerên Kurdistanê di dirêjahiya dîrokê de xwestine desthilatiya xwe mîsoger bikin û Kurdan ji rastiya wan dûr bixin jî, lê belê her tim li rastî berxwedan û têkoşînên pir xurt ên Kurdan hatine. Ji ber wê yekê neçar mane ku hebûna Kurdan bipejirînin.

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn, di sala 1920’an de, di bin pêşengiya MustafaKemal de bi alîkarêya Kurdan şerê rizgariyê hat biserxistin û DewletaTirkiyê hat damezrandin. Lê belê bi qasî pênc sal piştî damezrandina komarê, bi peyman û leyîstokên veşartî yên Tirkan û hêzên weke Ingilîz û Rûsyayê gelê Kurd bû qurbanê berjewendiyên wan û bi tenê hate hiştin. Ew jî nebes bû, Kurdan bi qetilkirin, tinekirin û mandêlkirinê re rû bi rû hiştin. Hemû kiryarên dijmirovahiyê li ser wan pêkanîn. Ji ber vê yekê Kurd ji bo parastina hebûna xwe û pêşeroja xwe neçarî lidarxistina şoreş û serhildanan bûn. Lewma piştî vê pêvajoyê li ser xaka Kurdistanê serhildan û raperîn bûn parçeyek ji jiyana rojane ya gelê Kurd. Di şerên s.s 20'an de li tevahî Kurdistanê, ji Bakûr bigre heta Başûr, ji Rojhilat heta Başûrê Rojava di nava Kurdan de raperîn, serhildan çêbûn. Eger ku em hinek ji van raperînan diyarbikin an jî bi nav bikin, dibe ku zordarêya hêzên dagirker hê baştir were fêmkirin.

Li Bakurê Kurdistanê di sala 1921’an de serhildana Koçgîrî, di sala 1925'an de ya Şêx Seîdê Pîran, piştî wê jî serhildana Geliyê Zîlan, serhildana Agiriyê. Dîsa di sala 1937-38'an de raperîna Seîd Rizayê Dersimî û li Başûrê Kurdistanê jî serhildana di navbera salên 1919-22’an de ya Şêx Mehmûdê Berzencî. Her wiha serhildana Mela Mistafayê Berzanî. Dîsa li Rojhilat jî serhildana Simkoyê Şikakî, avakirina dewletaMihabadê ya bi serpereştiya Pêşewa Qazî Mihemed ku heta niha jî ew şoreş tesîra xwe berdewam dike. Eger em bi tenê li şerên s.s 20'an û van serhildanan bimeyîzînin, emê bibînin ku gelê Kurd çi qasî bi çanda xwe ve girêdayî ye. Di rastiya wê çandê de serê xwe netewamdine, zilm û zordarêya dewletên dagirker nepejirandine.

Bitaybet piştî serhildana Agirî û Seyîd Rizayê Dersîmî dewleta Tirk a faşîst digot; "Me serhildanên Kurdan û rêberên Kurdan li çiyayê Agirî binaxkirin û li ser gorên wan beton kir."

Dewleta Tirk bi vî awayî xwe da rizgarkirin, serkeftî bû û dixwest wê buyerê bi gelê Kurd bide pejirandin. Lê bi qasî 20-25 piştî wê pêvajoyê, yên di wê gora bi betonê hatî sergirtin de hêdî hêdî ji xewa bêdengî û mirinê şiyar dibûn. Di gorê de derz çêdibûn, di nava van derz û qelşan de dengê serhildan û berxwedanê dihat û mizgêniya azadiyê li her çar aliyên Kurdistanê belav bû. Ev mizgînî, hilatina Rêberê gelê Kurd Abdulah OCALAN bû. Di bin pêşengiya Rêber Apo de partiya PKK'ê hat damezrandin. Bi vê re, weke Rêber Apo gotî; "Dara hişk hat şînkirin û di nava kevir de gul hat çandin." Wateya wê hevokê pir kûr bû; gelê Kurd ê ku dijmin digot me xistiye bin betonê û êdî ew nikare serî hil bide, me ew ji zindîbûnê xilaskirine û hişk kirine, bi rêberek hemdem û xwedî taybetmendiyên pêxemberwarî derket pêşberî dijmin û ew gel ji xewa mirinê şiyar kir. Dewleta dagirker a Tirk xwe bi gotina, "28 car serî hildane, lê hatine têkbirin. Ev serhildana 29'emîn e, emê wê jî di demek kurt de têkbibin û ji holê rakin" dixapand. Dewletê bi çavê serhildanên berê li PKK'ê û Rêber Apo dinêrî. Lewma di salên destpêkê de digotin; "emê di çar pênc rojan de ji holê rakin û tine bikin." Lê nedizanîn dê vê carê serê wan li kevirek mezin bikeve!

## Kurdistan Bi Xwînê Xemilandin

Kurdistanê bi xwîna keç û xortan avdan. Xaka welat bi xwîna pîran û kalan, keç û xortan hêvên kirin. Çem, robar pêl davêtin ser pêlan û diherîkin bi xwîna Mazlûman, nalîn û keser bilind dibûn. Kurdistan bi dengê zarokan, qêrîna dayikan, pîr û kalan, keç û xortan şiyar dibû. Bi hesreteke kûr dinêrîn ka wê kengê Nûhê duwemin derbikeve û Kurdan ji van tofanan rizgar bike.

Dibêjin dema her der di bin avê de dimîne Nûh pêxember keştiyek çêkiriye, gelê xwe li wê keştiye siwar kiriye û dema av daketiye yekemin car li herêma Cizîrê ji keştiyê hatine xwarê û li wir bicih bûne. Bi vî awayî gelê xwe ji ava tofanê xilas kiriye. Çîroka Nûh peyxember rastieyeke dîrokî û civakî raber dike. Gundên bi navê Heftan û Heyştan piştras dikin ku Nûh pêxembereke li Kurdistanê jiyankiriye. Di Qurana pîroz de navê

van gundan hatiye nîvîsandin. Heftan û Heyştan navên Kurdî ne û gundên li qontarên Cudiyê ne. Sefîna Nûh peyxember li serê Cûdiyê hatiye sekinandin.

Dema di Rojhilata Navîn de Kurdistan di bin lingê dagirker û xwînxwaran de difetisî û li ser gelê Kurd komkujî û hovitiyên bêeman dihat meşandin, pêwîstiya xilaskereke hemdem û bihêz xwe da der. Lewma ji nava wî gelê bindest qêrîn, hewar û gazî bilind bûn. Daxwaza wan xilaskereke hemdem bû ku wan ji zilmê rizgar bike û bigihîne ronahiyê. Ji ber ku ev gel di bin zilma dagirkerên kapîtelîst de ber bi tunebûnê ve diçû. Van hovan Kurd dikuştin, dişewitandin, malên wan wêran dikirin û çav berdabûn ser ax û hebûna wan. Bi zorê gundên wan didan valakirin û kes tunebû bi hewara wan ve bê. Ji ber bêxwedîbûna Kurdan hêzên hegemon û dagirker, Kurdistan ji Kurdan vala dikirin, ji serxak û binxak ve dewlemendiyên Kurdistanê didizîn û dibirin welatên xwe. Kurdistana hatibû çar parçekirin û li ser çar welatan hatibû dabeşkirin. Her welatek dagirker bi siyaset û şêwazên cuda zor û çewisandin li gelê Kurd dikirin. Bi qirkirinên fizîkî û çandî re rûbirû dihiştin û bi rêbazên curbicur polîtîkayên bişaftin, tinekirin û mandêlkirinê li ser gelê Kurd didan meşandin. Ya herî nexweş jî, van kiryarên xwe beşek mezin bi destê Kurdên xayîn û xwefiroş didan kirin. Dîsa di bin navê Îslamiyetê de pend û bêbextiyên mezin li gelê Kurdê mazlûm hat kirin. Ji ber ku Kurdên bûne misilman bi rastî û durustî bi bawerêya xwe ve girêdayîbûn, dijminên gelê Kurd bawerêya olê Îslamê jî weke çekeke bişaftinê li hember wan pêkanîn. Lê di rastiyê de tu eleqa van desthilatên xwînmij bi rastiya olê Îslamê re tutunebû. Berde misilmantiya wan, bawerêya Îslamê di xizmeta desthilatiya xwe de bikartanîn. Lê belê keç û xortên Kurdan serî li hember zilm û zordarêya dagirkerên hov netewandin û di dirêjahiya dirokê de bi dehan car şoreş pêkanîn û têkoşîna rûmetê meşandin. Bi van şoreşan nehiştin hêzên dagirker û hegemon bi daxwaza xwe hespê xwe li ser xaka Kurdistanê bajon. Ev jî ji giyanê bi vîn û rûmetê yê ku diyardeyek a çanda Kurdewariyê tê. Her pêvajoya ku dijmin bi hovîtî û xedarî li ser gelê Kurd de hatibe, li hemberî wê gelê Kurd weke volkanekê serî li hemberî wan hildaye, li kerameta xwe xwedî derketiye. Yek ji van volkanên mezin şoreşa PKK’ê, ya ku di bin rêbertiya Rêber Apo de mîna teqîna volkanekê li hember dagirkerêya dewleta Tirk a xwînmij û dagirker

derketiye ye. Belê, pêvajoya bindestiya dihat jiyankirin, zilm û zordarêya dihat meşandin, bi kiryarên hovane serdehatinên dihatin kirin, ji bo gelê Kurd neçarêya derketina mesîhekê, pêwîstiyeke ji nan û avê zêdetir bû. Ji ber ku Kurdistan di bin piyan de dihat perçiqandin. Mînakên wê yên herî berbiçav, komkujiyên ku di dîroka nêz de li her çar aliyên Kurdistanê li ser gelê Kurd hatin meşandin in. Nimuneyên wê; komkujiya Dêrsim, Koçgirî û Geliyê Zîlanê ne. Li Iraqê di encama kîmyabarana rejîma dîktator a Sedam de tevkujiya li Helepçeyê hatî kirin. Her wiha li giştî Başûrê Kurdistanê tevkujiya Enfalê ya ku tê de bi sed hezaran Kurd bûne qurbanî.

Ne tenê li Kurdistanê, bi giştî di Rojhila Navîn de zilm û çewîsandina hêzên kapîtalîst, bi feraseta ji hev cuda bike, parçe bike û rêvebibe; parçekirina xaka neteweyên Rojhilata Navîn pêşxistin. Di encama vê de dewletokên girêdayî xwe û hatine kolonîkirin avakirin. Dîsa dest danîna li ser dewlemendiyên wan ên serxak û binxakên wan pêkhat. Aha ji ber van sedeman tevan, pêwîstî bi pêşengek xwedî rê û rêbazên nû, xwedî fikir, paradîgma û bîrdoziyeke ji ya her kesê cuda hebû ku bibe bedîlê sîstema kapîtalîst a heyî ku xwe li ser keda kedkar û rêncberan dide jiyan kirin.

Lewra şevek ji şevên tarî, ronahiyek di 4’ê Nîsana 1949’an de li gundê Amara bilind bû, bi heyva çardehşevî şemal û ronahiya wî li cîhanê belav bû. Lawikeke bi navê Abdulah Ocalan ji dayîk bû. Bi jidayîkbûna wî lawikî re mazlûman çavên xwe li jiyanê vekirin. Gelên Rojhilata Navîn û herçar parçeyên Kurdistanê hatina wî bi xweşbînî û hêviyên mezin pêşwazî kirin. Ji ber ku hebûna xwe di fikrên wî de dîtin û di hatina Rêbertiyê de aşitî, azadî, aramî, dadwerî û wekhevî dîtin. Jê bawer bûn û pê serbilind û şanaz bûn.

## Hîlala Zêrîn Mezrabotan

Hey dergûşa şaristaniyê, tu dizanî di encama îxanetê de çiqas evîn û evîndar li ser te hatine şewitandin û bûne xwelî. Belê, waletê dayîka mîrovahiyê; 15 hezar sal ji bo mirovahiyê dayîktiyê bike, tişta herî pêwîst biafirîne, pişt re belavî rewşa koleyên herî bêçare bibe! Welatê afranakar, hemû xweda û xwedawendên yekem ji bo pêwîstiyên mîrovahiyê her tişt afirandin. Pişt re bibe pateyek ku herkes bikarbîne û bavêje kolanekê welatê qedîm, hemû kes bike kar ji xwe re. Hemû mezinahiyan biafirîne, pişt re bibe koleyê herkesê yê herî bêçare. Ji bo her kesî hûner û fêrbûnê bafirîne, pişt re bimîne birçî. Li her derê û ji bo herkesê avahiyan çêbike, pişt re bimîne bê avahî û bê welat. Bibe mûmek ya zanistê û pişt re jî ji tarîtiyê xilas nebe. Ji bo her kesê bibe mûzîk, helbest û deng, pişt re ker û lal bimîne. Ji bo her kesê zanist, rêzdarî û teknîkê biafirîne, pişt re yê herî cahil û bêçare bimîne. Ji bo her kesê koşk û xanî û sarayan ava bike, pişt re bila bihostek xaka te nebe ku tu tê de xwe biparêzî.

Belê, şaristaniyên Mezopotamyayê bi navê wan nexweşî û tirajediyan hatine hûnandin. Çima eşq û evîn li ser hatine şewitandin û bûne xwelî, di nava van nakokiyan de veşartiye. Li gel ew qas nirx û rumetan mezin bibe, pişt re bibe cuce. Nexêr, tenê şewat û şewitandin wê te paqij bike. Tu bibe yê yekem yê ku yekitiya xweda û xwedawendan afirandî, pişt re bibe jin û mêrên gerok yên herî bêçare. İncax şewat û şewitandin dê paqij bike. Gelên Mezopotamya û Rojhilata Navîn gelek digirîn. Ew qas nirx û rûmetê biafirîne û winda bike, li hember vê xweza wê bigirî. Bi taybetî Rojhilata Navîn van hezar salên dawiyê girêya mirina bêdeng dike. Bang, selawat, helbest, mûzîk, stran û saz hemû bangên mirinê ne. Yek tenê jî ne ji ber xwe de çêbûne û derbasbûna xwe tîne ziman, ji çêbûn û derbasbûnên di cîhanê de ne. Çima li Rojhilata Navîn bandor nekirine? Hinek tê fêmkirin, gelê bingeh têr bû, rêza wan ew qas mezin û kûre ya din fêm nake. Gelê Mezopotamya dibin qalibên olî de fetisîne û pêşkeftinan bi xwe re çênakin. Yanî ne vexwarine, herdem serxwe ve diçin, yan jî dema xwedê didin mîna morêyan in. Yan jî mirî xwedê didin. Serborêya ew qas pelixî wê neyê azadkirin. Jixwe çima azad tunebûne diyare. Ev dîrok û

şaristanî bi vî awayî li erdê namînin. Yên li erdê bihêlin di nava îxanetên herî mezin de ne. Belê, wê çi vê xilas bike?

Di Rojhilata Navîn de şerên tolhildanê tên meşandin. Bimre û bikuje ji derveyî zêdekirina tirban kêrî çi hatiye? Li Rojhilata Navîn şerên olî, mezhebî, namûs, xêzan, milk û malan heye. Ev şer bitevahî sedemên xwe tejî sîska hejîrekê nake, rastî tê de nîne û xwînê dirijînin. Di bin van xwînrijandinan de windakirinên mezin hene û di binê wan de îxaneta ji cewherê civakê razaye. Çanda tolhildanê nehêsane, kuştinên tore gelek tên bikaranîn, vana hemû dîsa bingehê xwe ji wê dîroka bi lanet digirin. Jixwe li ser hemû nirx û rumetên şaristaniyê dest hatiye danîn. Destdirêjî bi namusê kirine. Ev rastî li ser gelek qadan pêkanîne û li ser keç û jinan mîna sembolekê pejirandine. Nexwe tişta sembol be, pîrozbahiya herî mezine û gemarkirina wê tê pejirinadin. Çavkaniya van nexweşî û tirajediyan ji vê derê û ji vê dîrokê ye. Ev rewş siyaseteke girêdayî cewher û şaristaniyane; çi Avrûpa, çi Rojhilata Navîn be, yên bi nirxên şaristaniyê tez û dijîtezê, bi tayên rastiyê ve girêdayîbin, ji bo herêmekê tenê na, pêwîste ji bo hemû mirovatî, cîhanê derketinên dîroka rojê sazbikin û fêmbikin.

Di dîrokê de derketinên mezin di vê wateyê de ne: Îbrahîm, Mûsa, Zerdeşt, Soqrat, Îsa, Muhamed S.S, xwediyên Ronesansê û gelek pêşengin din yên girêdayî nirxên civakê. Rojhilata Navîn bi van destkeftên dîrokî destpêka şaristaniyetê gelek jiyaye û çanda wê bihêz kiriye. Di vê çandê de derketina dîrokên mezin xelek bi xelekin, lê ji hezar salan zêdetire ji van xelekan qutbûn hatiye jiyankirin. Li nava beşek dirêj li gel xwe gelek zeng û rizîbûn girtiye û bi vî awayî herikiye. Belê, pêxemberê azadiya mirovê hemdem deng û daxwaza rizgarêya van nexweşî û tirajediyan hemûyane.

## Baweriya Kurdan Ya Ji Beriya Îslamê Û Ola Zerdeştî

Zerdeşt pêxemberê Kurdan û Îraniyan bû. Tê gotin ku beriya zayînê di sedsala 7. De li bakurê rojhilatê Kurdistanê, li deverên bajarê Urmiyê jidayîk dibe. Navê pirtûka Zerdeşt ya bi nav û deng Zend Awesta ye. Ev pirtûk ango Awesta li ser çermê lawiran hatiye nivîsandin. Di olê Zerdeştî de du xalên girîng hene; tarîtî û ronahî (Ehrîman û Ahuramazda). Ahuramazda tê wateya ronahiyê, xêrê, aştî û aramiyê.

Her wiha sembola agir û rojê ronahî ye. Ehrîman jî wateya tarîtî, şev, mirin, xapandin, durûtî û xiyanetê dide. Dema ku mirov li urf û edetên Kurdan dinêre mêranî, rastî, paqijî û mêhvanperwerî ji aliyên xwe yên baş in. Her wiha roj û agir pîroz in. Tiştên weke kuştin, girtin, bêbextî, durûtî û şer jî tiştên nebaş in. Ev her du tişt her tim li dijî hev rawestiyane. Bingehê bîr û baweriya Kurdên Êzidî ji olê Zerdeşt tê. Lê belê pergala niha gelek guhertin di ola Zerdeştî de daye çêkirin. Bi derketin û berfirehbûna ola Îslamê re gelek guhertin çêbûn. Bi Kurdan jî ev ol bi darê zorê dane pejirandin. Her çiqasî ola Îslamê hatibe pejirandin jî, lê heta niha urf û edetên ji ola Zerdeştî mane tên bikaranîn. Weke di roja me ya îro de jî Kurdên misilman agir, roj û ronahiyê ji xwe re pîroz dibînin û gelek caran sonda xwe bi van nirxan dixwin.

## Bi Derketina Ola Îslamê Re Rewşa Gelê Kurd

Ji ber di hêla erdnîgarî de Kurdistan nêzikî Erebane, di demek kurt de bandora ola îslamê li ser gelê Kurd çêbû. Bi xurtbûn û firehbûna ola îslamê re artêşên îslamê berê xwe dan welatê Kurd û Îraniyan. Gelên Rojhilata Navîn di vê pêvajoyê de ji ber şerên Bîzans û Sasaniyan pir êş dijiyan. Ji ber ku di van şeran de gelek windahî didan. Şert û mercên jiyanê ji bo wan giran bûn. Ji ber vê çendê, dema ku artêşa îslamê daket van herêman tê de bicih bûn. Ji aliyê gel ve jî weke artêşa azadî û aştiyê hatin pêşwazî kirin. Piştî zayînê di sala 656’an de, bi despêkirina şerê belavbûnê re Kurdistan gav bi gav ji aliyê fermandarê îslamê yê bi navê Xalidê kurê Welîd ve hat dagirkirin. Her çiqasî artêşa Ereban ji aliyê Kurdan ve bi aweyeke xweşbînî û keyfxweşî hatibûn pêşwazî kirin jî, piştî demek kurt armanc û niyeta wan eşkere bû. Heta pêvajoya hatina Ereban, tu hêzên ku Kurdistan dagirkirin yên weke Persî, Makedonî, Ermenî, Romayî, Sasanî û Bîzansiyan dest dirêjî li ser ola Kurdan nekiribûn. Lê dema ku Ereb bûn desthilatdar, ola Kurdan hêdî hêdî qedexe kirin û ola îslamê bi zorê dan ferzkirin. Ev jî bû sedema nerazîbûnên Kurdan. Ji ber vê sedemê, li gelek deverên Kurdistanê berxwedanên dijwar çêbûn. Artêşa îslamê bi şêwazeke hovane çû li ser gund û bajarên Kurdan. Bi zora şûr mejî, raman û baweriya wan guhertin. Ji ber vê jî, hemû kesên ku di bajar û deştan de jiyan dikirin

neçar man ku ola îslamê bipejirînin. Lê belê herêmên çiyayî baweriya xwe ya olî parastin. Bi vî awayî heta sala 737'an Kurdistan bi tevayî ji hêla artêşa Ereban ve hat dagirkirin.

## Di Dîroka Îslamiyetê De Du Kesayetên Girîng Yên Kurd

### Ebû Muslimê Xoresanî

Ebû Muslum, miroveke Kurde û ji Xoresana Îranê ye. Di dîroka îslamiyetê de xwedî girîngiyek pir mezine. Ebû Muslum di sedsala 8'an de jiyaye. Di vê pêvajoyê de xelifetiya îslamê di destê Emewiyan de bû. Piştî ku desthilatdarî ket destê vê malbatê, ji xelifeyan cudatir nêzîkatiyan di dema desthilatdariya xwe de nîşan kirin. Di vê pêvajoyê de nijadperestiya Ereban derxistin pêş. Zilm û zordarî bi awayeke diyar dan meşandin. Armanca wan, tunekirina ziman û çanda gelên di bin desthilatdariya wan de bû. Dixwestin li şûna ziman û çanda wan, çand û zimanê Ereban bi zorê bi wan bidin pejirandin. Vê jî bi çewisandinê dikirin. Li hember van kiryarên xirab ên Emewiyan, gelên herêmê nerazîbûn nîşan didan. Girîngî û rista Ebû Muslimê Xoresanî di vê pêvajoyê de derket holê. Hêzên herêmê yên ji xelifetiya Emewiyan ne razîbûn, rewşa heyî dîtin û xelifetiya Îslamê ji destê Emewiyan girtin. Di sala 750'an de ev xelifetî ket destê Ebasiyan. Piştî demekê Ebasî jî ketin rewşa Emewiyan. Ebû Muslim vê carê jî xwest li hemberî kiryarên xirab ên Ebasiyan raweste. Lê belê vê carê serneket û ji aliyê Ebasiyan ve hat girtin. Piştî demekê, di sala 755'an de bi destê Ebasiyan laşê wî hat parçekirin û avêtin çemê Dicleyê.

### Selehedînê Eyûbî

Selehedînê Eyûbî li Başûrê Kurdistanê, nêzîkî bajarê Hewlêrê ji dayîk bûye. Ji ber girîngî û navdariya wî Tirk, Ereb û Fars her yek ji wan Selehedîn ji xwe dihesibînin û lê xwedî derdikevin. Selehedîn di sedsala 12'an de jiyaye. Weke fermandar, rêveber û siyasetmedareke mezin di nava rûpelên dîrokê de cih girtiye.

Selehedînê Eyûbî, di serî de li welatê Misrê, di sala 1174'an de xweseriya xwe îlan kiriye. Piştî demeke kurt Sûriyê jî bi dest dixe. Bi

demê re ji çemê Nîlê heta çemê Firatê împaretoriyeke xurt û berfireh didamezirîne. Selehedînê Eyûbî ji Kurdîniyê zêdetir, bi misilmantiya xwe dihat naskirin. Di vê demê de bandora ola îslamê ew qas xurt bû ku gelek kesayetên bi vî awayî bandor dikir. Selehedînê Eyûbî di nava Ereban de hat bişaftin, xwe weke miroveke Ereb didît û Ereb bûyîn weke cudahiyekê dihesiband. Di demê desthilatdariya Selehedîn de xaçperestên Ewrûpî dixwestin di serî de Qûdsê û pişt re jî tevahîya Rojhilata Navîn dorpêç bikin. Bi vê boneyê, artêşek ji sed hezar kesan pêkhatî şandibûn herêmê û bajarê Qûdsê dagir kiribûn. Artêşa îslamê ya di bin rêveberiya Selehedînê Eyûbî de, di encama şereke demdirêj û bi xwîn de hêzên xaçperest ji Qûdsê derxistin. Bi vî awayî ev bajarê pîroz ji bandora xaçperestên Ewrûpî hat rizgarkirin. Ev serkeftina Selehedîn hem di parzemîna Ewrûpa, hem jî di Rojhilata Navîn de dengek mezin veda. Dema ku Selehedînê Eyûbî di sala 1193'an de li Şamê koça dawî kir, împaratorî di navbera kurên wî de hat parvekirin.

## Taybetmendiyên Gelê Kurd

Mirovên Kurd demek dirêje bi awayeke azad jiyan nekirine. Sedema vê jî îxanet û dagirkerî ye. Dagirkeran derfet nedane ku em li ser van xakên dewlemend xwe birêxistin bikin. Ji ber vê çendê, taybetmendiyên ku ji aliyê dijmin ve hatine ferz kirin çêbûn. Taybetmendiyên weke ji nirxên xwe yên netewî dûrketin, ji rastiya xwe biyanîbûn, ji bo dijmin xîzmeta bêsînor kirin taybetmendiyên ku dagirkeran li ser gelê Kurd dabûn ferzkirin in. Pêwîste ev fêrbûn ji nava xebatên me yên netewî bên dûrxistin. Ev taybetmendî bûne sedem ku netewa Kurd ji xwe bêbawer bibe. Li şûna ku pirsgirêkên xwe bi rêyên zanistî çareser bikin, şêwaza jiyana xwe ya li hember rewşên heyî bêdengmayinê weke çarenûsekê dîtine.

Belê, civaka me ji nû ve li xwe xwedî derket û dîroka xwe di ber çavan re derbas kir. Ji nû ve diroka xwe girt dest, welatparêzî pêşket û yekîtiya netewî tê afirandin.

**Jîrbûn**

Armanca me ya sereke ewe ku mirov pêwîste xizmeteke bêdawî ji bo malbat û netewa xwe bike. Ji bo vê beriya her tiştî xebat pêwîste. Bê xebat tiştek nayê bidestxistin. Aştî û wekhevî armancên me yên girîng in. Heta ku em van armancan bi destbixin, pêwîste em di nava hewildanek mezin de bin.

**Rastgoyî**

Di nava civaka me de derew û fesadî xirabiyên herî mezin in. Her kes rastiyê bi çavên xwe dibîne. Li ser derew û fesadiyan pêşiyên me gelek tişt gotine, weke; "Lawikê derewîn carekê dixwe firavîn.'' Pêwîste her ferdek yê civaka me xwe ji vê nexweşiyê dûr bixe û di jiyana xwe de rastiyê biparêze.

**Dilnizmî**

Em nikarin daxwaz bikin û bibêjin, bila her kesek weke me bihizire. Em nikarin hêvî bikin û bêjin bila her kesek li gel me hewil bide ku weke me be. Dibe ku di jiyana rojane de em li rastî kesên weke me bibîr neyên. Dibe ku baweriyên wan yên olî, eşîrtî û paşerojên wan ji yên me cudabin. Di rewşên bi vî awayî de pêwîste em ji hev re rêzdar bin û pêwîste em vê ji bîr nekin, divê her kesek xwedî hinek mafên xweser û azadiyê be. Li hember hevdu rêzgirtin pêwîstiyeke jiyanê ye. Dilnizmî, pêwistiyeke ji bo têkiliyên di hundirê xwe û yên ji derveyî xwe de, pêwîste her kesek vê pêk bîne û li hev bike. Di vê mijarê de netewa me mînakeke herî balkêşe. Netewa me li gel netewên din û di nav hev du de jiyaye. Hertim ji hev re bi dilnizmî û bi rêzdarî nêzîkatî nîşan dane. Tu carî li beramberê ol, ziman, eşîret, irf û adetên hev du nebûne asteng. Netewa Kurd her tim rêzdariyek pir mezin û girîngî li hemberî ol û nirxên wan nişan kiriye.

## Wêrekî

Her çiqasî gelê Kurd ev demeke pir dirêje ji serxwebûn û azadiyê dûr mabe jî, lê her tim ji bo jiyaneke serbixwe û azad li berxwe daye. Di vî warî de hemû rêyên lehengî, wêrekî û fedekariyê raber kirine. Di dîroka netewa gelê Kurd de mînakên qehremaniyê gelek in. Lê mixabin her çiqasî di berxwedanên borî de wêrekiyên bê hempa ji aliyên Kurdan ve hatibin nîşandan jî, lê ji ber zanebûneke li gorî wê demê tunebû, di armanc û daxwazên xwe de bi serneketine. Vê rewşê heta salên 1970'an berdewam kiriye. Lê bi derketina serhidanên gelê Kurd re ev rewş hatiye guhertin. Îro şervanên azadiyê bi şerên xwe yên bi zanabûn bala tevayî cîhanê kişandine ser xwe.

## Alîkarbûn

Di nava netewa Kurd de hestê alîkarîyê gelek pêşketiye. Pêwîste em van taybetmendiyên wan ji bîr nekin û hîn bêhtir xurt bikin. Dibe ku rojek were hemû pêdiviyên me bi rêya alikariyê çêbibin. Eger em alîkariyê nedin derdor, wê demê em nikarin alîkariyê jî bixwazin. Erkê me, destên kesên hejar û xizan girtine û alikarî bi wan re kirine.

## Mêhvanperwerî

Taybetmendiya mêhvanperweriyê xala herî girînge ku gelê Kurd pir pê tê nasîn. Pêwîste em vê xwuya xwe tu caran ji bîr nekin û biparêzin. Pêwîste em hertim ji bo mêhvanên xwe xizmetê bikin û rêzdariyê nîşanî wan bidin. Pêwîste em ji mezinan re rêzgirtin û ji biçûkan re jî heskirinê nîşan bidin. Çawa ku dema mirovek rêz dide me em keyfxweş dibin, pêwîste em jî bi wî awayî ji bo kesên li beramber xwe rêzdar bin. Netewa Kurd mezine û rêberên xwe yên ji bo welat û netewa xwe xizmetkirî tu caran ji bîr nekirine. Her tim wan bi hezkirin û rêzdarî bi bîr anîne. Bibîranîn, hezkirin û rêzdariyên me deyneke netewî ye. Ger neteweyek mezinên xwe di dilê xwe de jiyan bike, wê di demên tengav de jî mirovên mezin û pêşeng biafirîne. Ji ber ku keyfxweşiya civakan bi girêdana hezkirin û rêzdariyê pêktê.

## Kurdistan Ji Aliyê Neyaran Ve Hat Parçekirin

Kurdistan bi peymana Qesraşîrîn ya di navbera Împaratorêya Osmanî û Safewiyan de di sala 1639'an de pêkhat bû du parçe û her hêzek ji wan parçeyeke Kurdistanê xistin bin dagirkerêya xwe. Parçeyê mezin yê Kurdistanê di bin desthiltiya Osmaniya de ma, parçeyê din jî bû qadek ku desthilatiya Safewiyan xwe li ser pêkbîne. Bi vî awayî Kurdistan dibe du parçe û rêya pêkhatineke bi êş û kelem tê hunandin.

Di şerê cîhanê yê yekemîn de Împaratorêya Osmaniyan li gel Alman û hevalbendên wan cih girtibû. Di encama şer de Alman û hevalbendên xwe têkçûn. Dewletên Fransa, Brîtanya û Îtalya biserketin. Dewletên ku biserketin jî bi Împaratorêya Osmaniyan re di 19'ê Tebaxa 1920'an de li bajarê Sewrê peymanek pêkanîn. Li gorî wê peymanê Împaratorêya Osmanî şer winda kiribû. Ji ber wê jî sînorên wê bi fermî hatin diyarkirin. Di vê peymanê de li ser Kurdistanê sê biryarên ku hatin girtin evin: Ya yekemîn; wê ji aliyê dewletên hevpeyman ve komîteyeke amadekar were sazkirin. Wê ev komîte li bajarê Stenbolê bi cih bibe. Wê di nava 6 mehan de serjimarêya gelê Kurd were kirin û di herêmê de otonomiyek were sazkirin. Ya duwemîn; pêwîst e Împaratorêya Osmanî di nava sê mehan de biryara otonomiyê bipejirîne. Ya sêyemîn; eger gelê Kurd di nava salekê de bixwaze ji dewleta Osmaniyan cuda bibe û dewleteke serbixwe ava bike, pêwîste daxwaza xwe bibin Cemiyeta Netewan. Ger Cemiyeta Netewan bawer bike ku Kurd dikarin bixwe xwe birêve bibin, wê demê Împaratorêya Osmaniyan pêwîst e ji herêma Kurdan derbikeve. Lê belê, her çiqasî ji aliyê Ewrûpa ve ev hatibe pejirandin jî, ji ber ku ev biryar li ser kaxezê dimîne li biryarê xwedî dernakevin û ji ber vê çendê ev biryar nayên sepandin.

Lê rewş diguhere, şer di gelek qadan de encamên cuda bi xwe re tîne, Tirk dikevin şerê rizgariyê û biserdikevin. Piştî wê hin peymanên din tên îmzekirin. Peymana Lozanê di 24'ê Tîrmeha sala 1923'an de, di navbera dewletên Ewrûpa û yên weke Îngiliz, Fransa, Îtalya û Tirkan de tê pêşxistin. Bi vê peymanê Kurdistan bi fermî di navbera çar hêzên cuda de tê parkirin. Kurdistan dibe çar parçe û di navbera Iraq, Sûriye, Îran û Tirkiyê de tê parvekirin, dibe mêtingehek di bin desthilatiya van dewletên dagirker de. Parçeyê herî mezin di destê Tirkan de dimîne. Ev peyman li bajarê Lozanê ku girêdayî dewleta Siwîsreyê çêdibe. Ji ber vê

çendê weke "Peymana Lozanê" hatiye binavkirin, ango navê bajarê ku lê hatiye çêkirin girtiye. Di dîroka gelê Kurd de vê peymanê weke bextreşiyeke mezin cih girtiye. Her çiqasî tevlibûna nunerên Kurdan ji bo vê peymanê ji aliyê dewletên Ewrûpa ve hatibe xwestin jî, lê belê ji ber ku Kurd di wê demê de ne yekbûn, ango parçe parçe bûn nedikarîn hêza xwe bikin yek. Ji ber vê çendê kesên ku di vê peymanê de nunertiya Kurdan bikin tine ne. Dewleta Tirk hem li ser navê xwe, hem jî li ser navê Kurdan tevlî vê peymanê dibe. Dema ku dewletên Ewrûpa li hemberî vê rewşê derdikevin, nunerê dewleta Tirk Îsmet Înonî dibêje; "Di navbera gelê Kurd û Tirk de ti cudahî nîn e. Ez wekî nûnerê her du gelan tevlî vê peymanê dibim." Bi van gotinan Înonî Ewrûpayê razi dike. Jixwe tu derdeke Ewropayiyan ji bo azadiya gelê Kurd tu tunebû. Hinek biryarên şirîk ku gelê Kurd û Tirk jê sûd werbigirin tên girtin. Lê belê dewleta Tirk dîsa îxanetê li Kurdan dike. Biryarên ku ji bo wan hatine girtin bi cih nayînin. Berevajî vê dewleta Tirk van biryaran di aliyê xirabiyê de bikartîne, tundî û tunehesibandineke mezin li ser Kurdan ferz dike.

**Serhildanên Kurdan**

Serhildanên gelê Kurd yên ji bo bidestxistana serxwebûn û azadiyê dihatin berdewam kirin bi qetlîamên mezin hatibûn pêşwazî kirin. Bi taybet piştî serhildana Dêrsîmê ya li Bakurê Kurdistanê ku bi tevkujiyan hat fetisandin, gelê Kurd yê li beşa Bakurê Kurdistanê dikeve nava bêdengiyek kûr û ev bêdengî ji wê pêvajoyê heta despêka salên 1970'an berdewam kir. Di wan salan de, di parzeminên cîhanê de gelên bindest yên ku pirsgirêkên wan nehatin çareserkirin li dijî dagirkerêyan dest bi şerê azadiyê kiribûn. Li parzemîna Asya, li Afrîqa û li Amerîkaya Latîn serhildanên bi vî awayî berdewam dikirin. Ev pêşketinên di cîhana me de çêdibûn, gelê Kurd jî jê bandor dibû. Ji ber vê sedemê hêvî û daxwazên Kurdan yên azadî û serxwebûnê ji nû ve şiyar dibûn. Di wê demê de Rêber Apo di Fakulteya Zanistên Siyasî ya di zankoya Enqereyê de xwendina xwe berdewam dikir.

Di salên 1970'an de şoreşgerên Tirk û Kurd yên bi navê Mahîr Çayan, Deniz Gezmîş, Îbrahim Kaypakkaya, Huseyin Înan, Yûsûf Aslan, Omer Ayna û hevalên wan ji aliyê dewleta Tirk ve hatibûn qetilkirin.

Rêber Apo ji ramana berxwedana van şoreşgerên Tirk û Kurd, ji bo domandina armanca wan rêxistinekê dihunîne. Bi vê boneyê, bi çend xwendekarên zankoyê yên Kurd û Tirk re biryara damezrandina rêxistinekê tê dayîn. Di sala 1973’an de li bendava Çibûqa bajarê Enqerê civîna despêkê ya komika Apoyî tê çêkirin. Di bin rêbertiya Rêber Apo de, bi şeş kesan kom tê civandin. Piştî komcivînê demekê çar ji van bixwe ji nava komê derdikevin. Ji komika destpêkê Rêber Apo û heval Fûat (Alî Haydar Kaytan) tenê dimînin. Piştre cara duwemîn komik tê civandin, gelek heval tevlî komikê dibin. Hevalên di bin rêveberêya Rêber Apo de tevlî civîna Tuzlûçayira Enqerê dibin; Fûat (Elî Heyder Qeytan), Hâkî Karer, Kemal Pîr, Mazlûm Doxan, Mehmet Xeyrî Durmuş, Cemîl Bayik, Doxan Kiliçkaya, Dûran Kalkan, Mustafa Karasû, Riza Altun, Muzafer Ayata û Şahîn Kilavûz in. Ji bilî vana gelek havalên din jî tevlî civînê dibin. Biryar tê girtin ku weke komika şoreşgerên Kurdistanê tevger bikin. Dedestpêkê di bin rêveberêya Rêber Apo de komikên Kurdistanê xwe bi rêxistin dikin û alîgiran kom dikin. Ji bo pêşxistina xebatên şoreşgerî û rewşa gelê Kurd di cih de bibînin lêkolînan pêşdixin. Rêber Apo di sala 1977’an de ber bi bajarên Kurdistanê ve gerekê pêk tîne. Di dawiya vê gerê de yek ji milîtanên vê rêxistinê heval Heqî Karer li Dîlokê, di 18’ê Gulana sala 1977’an de ji aliyê nokerên dewleta Tirk ve tê şehîdxistin. Heval Heqî di nava rêxistinê de kesayetiyeke girîng bû. Şehîdbûna Heqî Karer di nava rêxistinê de tesîreke mezin ava dike. Li ser şehadeta Heqî Karer Rêber Apo ji bo bîranîna şehîdan damezrandina PKK’ê dide destpêkirin.

**Jînameya Rêber Apo**

Abdulah Ocalan, rêberê gelê bindest û Mazlûman, pêşengê gelên Rojhilata Navîn. Mîna Roja li ezman şewq da û ronîkir tarîtiya li ser rûyê xaka Kurdistanê.

4'ê Nîsana 1949'an li gundê Amarayê çavên xwe li jiyanê vekir. Gulên baxçeyê Ruhayê pêşwazî kirin bi rengan. Kurdistan bû kelha berxwedanê û tolhildêrê gelên bindest ji Ruhayê vejiya. Keç û xortan silav danê û gotin: "Tu şeng û ramanî Rêberê gelê Kurd." Keyfxweşî ket nava Rojhlata Navîn; pêşwazîkirin keç û xortên Elewî û dayîkên navçeya Xelfetiyê. Gotin;

"Amara ziyaretgeha hemû cîhan,
Ruhayê pejirand biryara wan bi vîna dilan
Ji dayîk bû ferîşteyê gelan."

Navê dayika Rêber Ûveyş e. Binevşa çiyayên Kurdistanê, çinara devê kanî û çeman. Navê bavê Rêber Emer e. Malbata Rêber Apo bi tevayî ji heşt kesan pêktê; penc xwîşk û du birayên Rêber Apo hene. Rêber Apo xwendina xwe ya dibistana seretayî li gundê Cibînê, di sala 1956-1957' an destpêdike û li heman cihî asta seretayî diqedîne. Dema ku zivistanê diçe dibistanê, li mala dostê bavê xwe, Aqoyê kurê Nîsanê dimîne. Hîn wê demê Rêbertî pêşengtiyê ji zarokan re dike, her tim wan rêxistin dike û li pêşiya wan nimêjê eda dike.  Pêşengiya Rêber Apo di axiftina wî de eşkere dibe. Her wiha di xwendekarêya xwe de jî gelek zîrek û jêhatî bûye. Ji bo xwendina xwe berdewam bike di nava hewildanek gelekî mezin de ye. Lewma, piştî ku dibistana seretayî diqedîne li Nîzîpê di sala 1963'an de li gel xwişka xwe Gulistan, dapîra xwe Hewa û xalê xwe yê bi navê Silêman dimîne. Di wê salê de dest bi dibistana navîn dike û li heman cihî bidawî jî dike. Bavê wî jî ji ber rewşa xizaniya xwe naxwaze dibistanê berdewam bike. Lê dîsa li ser daxwaz û mikurêya mamosteyê wî, di sala 1966-1969'an de li Enqerê derbasî dibistana Tapû Kadestroyê dibe. Dema tevlî ezmûna derbaskirinê dibin, Rêbertî di nava 20 hezar beşdaran de di pileya 18. de pile digire. Piştî qedandina Tapû Kadestroyê, di sala 1970'an de li Amedê dest bi karmendiyê dike. Di heman salê de tevlî ezmûnên derbasbûna zankoyê dibe û di encamê de beşa dadê ya Zankoya Stenbolê bi dest dixe. Li wê derê hem dixwîne hem jî karmendiya xwe berdewam dike.

Dîsa di sala 1971’ê de dûbare tevlî ezmûnên zanîngehê dibe. Vê carê Fakulteya Zanistên Siyasî ya Enqerê qezenc dike. Du salan li wê derê xwendina xwe berdewam dike. Di wê demê de, di sala 1971’ê de dibe endamê DDKO’yê û têkîliyên xwe bi çepên Kurd û Tirk re pêş dixe. Bi boneya qetilkirina Mahîr Çayan û hevalên wî, Serok Apo di serperiştiya meşa pirotestyî de cihê xwe digire û rêvebertiya piratîkî ya meşê dike. Lewra ji aliyê polîsan ve tê girtin û bi qasî heft mehan di zindana Mamak a Enqerê de dimîne. Piştî tê berdan, di sala 1973’an de li gel ciwanên çepgir yên Kurd û Tirk dest bi xebatên rêxistinî dike.

Êdî dema pêşîgirtina zilm û zordariyê, xwînmijî û dagirkeriyê hatibû. Dem dema şoreşê, dema xwedî derketina li rûmet û kerameta xwe û gelê xwe hatibû. Lewma keç û xortên şoreşger dest dan destê hev û bêyî ku ti ferq û cudahiyê bixin nava bawerî, zayend û nijadê, di bin rêbertiya Rêber Apo de dest bi têkoşîna azadiya gelê Kurd û gelên bindest dikin.

**Rêberê Cîhanê Rêber Apo**

Li kapîtalistan kir qêrîn û hewar, dest û mil li wan kişiyan. Dawî li text û bextê wan hat. Qirêjiya xwe dîtin bi çavan, ronahî nema li rûyê wan. Ji Rojhilata Navîn heta aliyê din yê cîhanê, dijmin dilerizî û ditirsiya ji pêşengê Kurdan. Li hember dijminê ku bê aramiyê çêdikir, mamosteyê herî mezin Rêberê Kurdan aramî, aşitî û wekhevî ji bo mazlûm û bindestan bi xwe re anî. Ji bo bindest û mazlûman bijîşkek ku bibe dermanê nexweşiya wan diyarbû. Ew bûye evîndarê dilê hemû mirovan. Rêberê gelan aramî û aştiyê bi xwe re anî. Rêberê hemû qadan, evîndarê welatê keç û xortan. Hûn Awesteya destê kal û pîran, vîn û evîna dilê mirovan, dermanê nexweşan. Gul û sosin şînbûn li deşt û çiyan, reng da gund û bajaran; deng belavbû li hemû quncikan, Kurdistan kir cihê jîn û vejîna nû ya bi azadiyê hatî xemilandin. Ew bû hêvî ji bo azadiya gelan û bû awaza gelên bindest.

Feraseta Rêber rengê jiyana azad xist nav dilê pîr û kalan. Şirîniya bazan pêşwazî kirin keç û xortên dilovan. Hûn pêşengin Rêberê Kurdan, hûn in peyva destpêkê ya li ser zimanê zarokan. Hûn Kawayê Hesinkar, agirê çiyan in û xwediyê rêgezên bêhempa ne. Gula li nav destê bêkesan, zanyarê mazlûman, we gelên Rojhilata Navîn ji xewa mirinê ya

hezaran salan xilaskir. Dema meha Nîsanê diyar bû, li cîhanê hemû gelên bindest ji nişka ve şiyar bûn. Gel li te civiyan. Çiya bûn warê gêrîlayan. Geş bû agirê evînê, ronahî da dilê Mazlûman. Şêr û bilbilan bi hev re mezin dikirin meznahiya rêberê gelan. Evîna te ronî kir derdoran û mizginiya te dane bindestan. Di nava baxçeyên gulistanên sorgulan de bêhna xweşik werandin. Navê te Ocalan, roja Kurdan, şewqa te ronahî da her çar perçeyên Kurdistan. Botan bû cihê gêrîlayan. Çiyayê Araratê tîrêjên vê rojê hilda nava dilan. Li cîhanê hemû gelên bindest û mazlûm bi we serbilind û şanaz in. Çem û kanî diherikîn û mizgînî didan gund û bajaran. Roj derket ji Ruhayê. Heskirina Rêber ket nava dilê tevan. Erd û esman hejiyan, xwînxwar di cihê xwe de lerizîn û man. Gelê Kurd bi hatina we dilşad, bilbil bi rihanê re şad bûn. Navê te pir giranbiha ye roja Ariyan.

**Îbrahîmê Kurdan**

Îbrahîmê Kurdan, tu ji bo zarokên Kurdan dilhenûnî û pêşeroja civaka wanî. Te ew ji zilma xwînxwar û zaliman xilaskirin û azadiyê ji bo wan xelat kir. Tu ji bo gelê xwe yê mazlûm hem bûyî şervan hem bûyî rêber. Lewma keç û xortên Kurdan bêyî ku bikevin nava dudiliyê, ji bo azadî û serfiraziya gelê xwe bûn şopdarên rê û rêbaza te û gotin; "Em şervanên Rêber Apo ne, me soz daye wî, emê heta serkeftinê li pey şopa wî bimeşîn."

Ev şoreşa hemdem weke tîrêjên rojê şewqa xwe daye li ser nexşeya Kurdistanê. We vejîn, mêjî, felsefe, exlaq û çandeke nû afirand. Vê germahiya xwe da li ser nexşeya cîhanê û hemû gel civandin li qadan. Deşt û çiya bûn cihê egîdan. Mamosteyê mezin, nasnameya Kurdan bi vîna xwe şiyar kir û Kurd kirin xwendekar. Wî, jina bi hezaran salî hatiye çewisandin bi rastiya wê hesand û fersenda xwedî derketina li vîn û kerametê da jinê.

Di diroka şoreşên cîhanê de gelek kesayetên cangorî derketine, lê ciwanên şoreşger ên Kurd ji ber evîn û hezkirina rêberê xwe û niştîmana xwe, bi qehremanî canê xwe feda dikin. Belê cangorêyên we gelekin, lewma bi sedan kesan, kal û ciwan, jin û zilam, ji bo rêberê xwe agir bi canê xwe xistin.

Agirê dilê dostan bi we re gur bû rûmeta gelan. Jina xwedawend, zilamên evîndar, keç û xortên Kurdan bi evîna şoreşgeriyê derketin çiyan. Hûn mamosteyê heri giranbiha, zanyarê Ariyan in. Hûn in ew danê tovçandina gul, binevş, sosin û nêrgizan. Hûn in daxwaza gelan. Li gund û bajaran we şemal da û pêket li her çar aliyên Kurdistanê. Zarokên Kurdan agir dan gurkirin û bişkavtin hemû rengên gulan. Em deyndarê we ne bişev û rojan. Hûn Kawayê Hesinkar, ferman dixwînin ji Dehakan re. We ji her çar parçeyên Kurdistanê şopa sîtemkar û kedxwaran rakir. We hêviya dilan, ronahiya çavan, hewara xwîşk û birayan hildaye ser milan. Lewma hûn in Rêberê bargiran, dermanê dilê bêkesan û mesîhê gelên bindest û mazlûman. Hûn daristana deşt û çiyan in, we bax û bostan xemiland bi sorgulan. We li welatê bindestan ji nû ve çem, kanî û rûbar dan herikandin. We Kurdistan bi rengê biheştê xemiland. Rêber Apo, Zerdeştê me Kurdan, parêzerê baxçeyê biheşta Mezra Botan. Bi hatina we re mizginî ket nava gelan. Herran bû cihê gul û sosinan, germahiya evîna we da her çar parçeyên Kurdistan.

**Dayîka Uveyş**

Dayîka dilgeş, gula baxê Kurdan
Binefşa dayîkan li bajarok û bajaran
Nav şirîne Uveyş
Pêşenga jinan, şepala dayîkan
Bejn û bal dara selviyê
Xwedewenda roniya dilê keç û xortan
Hûn in taca serê jinan, rûmeta bindestan
Kenê li ser lêvên zarokan
Cihê we warê pêxemberan
Dergûşa we tirs xist nava neyaran
Dayîka Uveyş cîhan bi gul û binevşan xemiland
Ocalan, wateya wê tolhildan
Ji zalim û neyaran re bû tirsa dil û hinavan
Kurdistan xemilî bi rengan
Vaye hat Roja Kurdan
Dayîkê niha mizgînî da mazlûman
Wa hat ferîşteyê bindestan, daxwaza gel û civakan
Rêhevalê keç û xortên li serê çiyan.
Şahî ket nava gelan
Mizgînî dan Kurd û Ermen û Keldan

**Ji Bo Rêberê Min**

Sosin şînbû li Amara
Deng veda li nav gund û bajaran
Gelê Kurdistanê pêşwazî kirin bi qefîleyan
Silav danê bi evîna dilan
Bi hev re gotin:
"Ew e xilaskerê cîhanê"
Hûn in roja cîhanê, afirênerê jiyana azad
Û parêzvanê mafên gelên bindest
Bi têkoşîna we mizgîniya azadiyê ket nava gelên bindest
Û hûn bûn dermanê kul û derdên wan
Hûnê biratî û hezkirinê bînin nava civakan
Hatina we pîroz be li her çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê
Hûn in Rostemê Kurdan
Dirûşmeya li ser lêvên zarokan û bawerêya gelan

**Rêberê Dilxwaz Apo**

Rêberê min, hûn in evîndarê Gulistanê û biheşta ser zimanê min. Hûnê aştî û aramî bînin û derman bikin kul û derdan. Hûn hêviya gelên cîhanê yên bindestin. Hûn hêvî û awaza azadiyê, bawerî û vîna gelan in. Bi dayîkbûna we re ronahîbûn taritiyên şevan, tîrêjên ronahiya we şewqa xwe avêtin serê çiyayên Kurdistanê. Bi raman û bîrdoziya we ya hemdem û pêşverû, gelên Kurdistanê ji xewa giran şiyar bûn û zanist ket nava gelan. We hebûna wan mîsoger kir û ji bo wan cîhan ronî kir. Lewma bi hev re dibêjin; "Bijî Ocalan."

**Rêbertiya Germahiya Heranê**

Heranê germahiya şoreşê da Rojhilata Navîn û ev germahî li çar parçeyê Kurdistanê belav bû. Rêberê Kurdan hate dinê, Mûrad û Firat bi evîna dilan herikîn. Roj derket ji nava gelê Kurdan, hezkirina Rêber ket nava nexşaya cîhanê. Gel bi hev re bûne bira. Kurd û Tirk bi hev re mezin dibûn, wê ronahî dida serê çiyan.  Li baxê gulistanê mizgîniya berxwedanê ji bo gelan hat. Erd û esman lerizîn, xwînxwar ji mijara xwe

direvîn. Gelên cîhanê bi hatina Rêber dilşad, bilbil bi gel şad... Navê we pir giranbihaye li ser ziman awazê teyran.

**Evîna Rêber Li Tendûrekê**

Çiyayê Tendûrekê bû hêlîna şervan û egîdan. Keç û xortên hêja ji bo azadiya Kurdan dabûn soz û peyman û ji bo azadiya welat û gelan xwe diavêtin himbêza mirinê. Şal û şapik, şûtik, qilêş û gulî li wan pîroz be. Hûn şervanê canfeda, canê xwe ji bo doza gelên bindest feda dikin. We kozikên neyaran şewitandin û pîr û kalên Kurdan ji zilma neyaran xilaskirin. Ey rêberê gelan! Kulîlkên Kurdistanê bi navê we sond xwarin û belavbûn li welat. Hûn in rêberê gelan, bi tîpên zêrîn navê we hat nivîsandin di nava rûpelên dîrokê de. Bi wan tîpan pirtûk hatin nivîsandin. Şopdarên we xwendin û gotin; "Em bi te re ne û emê bi dil û can her bi te re bin ey Rêberê Kurdan."

**Baweriya Kurdan Bi Rêber**

Bîr û baweriya gelê xwe, afirînereke pir şîrînin ji bo hemû gelan. Îlham û daxwaza mîrovanî, sorgul û simbila Geliyê Zîlanî. Misk û emberî, binefşa Kurdistanê, sebra dilan, afînerê Kurdan, bazeke kesk, sor û zerî, reng didî şervanan bi rengê evîna dilan. Parezerê welatan, şirînî, sozdarî, bêtirsî; hûnin qehramanê gelan. Bi rih û can ser bilindî, hêviya keç û xortanî, te jîn û jiyan da welatan û rêhevalan. Zanyarê dilan, xilaskerê mazlûman. Dengê rêya we zelale, rûmeta bindestanî. Sozdarê feqîr û belengazan, rêberê gelên cîhanê, pêşengê mirovan, rêya rast bal we ye şeng û şepala Kurdan.

**Rêberê Rojhilata Navîn Ocalan**

Rêberê cîhanê, daxwaza dilê hemû gelan, gula destê ciwanan. We kor kir çavên kedxwaran, gulistan bû hêlîna şalûl û bilbilan. Şehîd Zîlan, Berîtan, Ronahî û şervanên li serê çiyayan rêhevalên te ne. Seyrangeha cîhanê erêkirin gelê Kurdistanê, reng ji te hildidan bi rengê azadî û aştiyê. Hemû çem û kaniyên Kurdistanê keyfxweş bûn û lot tavêjin. Li çiyayan evîna te dimeşe, hildan keç û xortên hêja ala azadiyê, hûn in

jiyana me tevan. Heyva çardehan, biriqandinê didî bi rengê gulan, dimeşin şervan wek ba û bahozan, diherikin ciwan. Kulîlk, sorgul û simbilên li nav gelan, deşt û zozan bûye warê wan. Hûn ji bo azadiyê îlham in rêberê civakan, şemala daristanan, agirê dilan. Roj hat, şemal da warê gelan, serî tewandin Tirkên xwînxwar û zalim. We ji bîr nakin ji dil de, we bibîr tinîn şev û rojan. Dara selviyê, sorgula Kurdan. Bi hatina we rengên kesk û sor û zer li çiyayên Kurdistanê geş dibin.

**Tu Baweriya Gelê Kurdî**

Gel bi we bawere serbilindê nexşeya Kurdan. Têkoşîn pîroz e doza nava gelan, bi daxwazeke rûmeta ji dil we ronîkir deşt û çiya. Ciwanan canê xwe fedakirin, zarokên gelan. Welat jiyan dike bi rûmeta wan, bibiryarin dilgeşin ciwanên Ariyan. Dagirker dînbûn li hemû qadan. Welatê min Kurdistan, xwediyê bêhna sorgulan. Dema navê we tê ser ziman disekinin çem û kanî li dol û newalan. Ji bo me hizir û ramanî, canê xwe feda dikin ji bo hebûna we jina xwedewend û zilamê evîndar.

**Wê Her Tu Bî Rêber**

Aşitî danî li nava dilan, tu car feraseta we naçe ji bîra dost û yaran. Tu car dernayê ji nav mêjiyan, weke şewqê lêda zanist û bîrdoziya rêberê dilan. Şevên tarî çûn bû ronahî, geş bû rûyê mazlûman, ji xewê hişyar bûn bi hezaran evîndar. Ji xewê rabû Kurdistana zêr û zîv, evîna pîr û kalên gelan. Dayîk digirêyan, bav dihejiyan, welat diheliya li bin destên sîstema Tirkan. Bişkînin destê zordaran, dil têşe hewar ji bo şêran. Birûxînin qereqolan, rizgar bikin gelan.

Evîna dilên Rojhilata Navîn î, jiyana gelê Kurdan î. Dil xweş e, daxwaziya we wekhevî û biratiya gelan e. Ez nikarim tiştekê bibêjim, bilbilan şewitandin cîger û dil. Li me sekinand dest û mil, evîndarê li nava dilan. Ez mîroveke sermestim, bêwar, bêzevî, bêxanî û bêgor im. Ez bi kul û birîndar, îro li welatê xwe evîndar, lê digerim rêberê dilan, hûnin ronahiya çavan. Evîna dil kûr çûye, ez nizanim çima ji evînê dûr çûme. Hêsir ji çavan hûr dibarînim ji destê kedxweran.

**Damezrandina PKK'ê**

Wek tovên gulan hatin çandin
Da ku ew gul bên avdan bi ava Dîcle, Mûrad û Firatê
Û bêhnê bidin Rojhilata Navîn û Kurdistanê
Da ku ev gul bibin bax û bostan
Şemal bidin vejîna gelan
Di nav bax û bostanan de sorgul vebûn bi rengan
Biriqandin dan bi rengê birûska biharan
Afirînerê vî agirê pêxistî Rêberê Kurdan
Eşkerekirin nişana serkeftinê
Her ku diçe berfireh dibe kom
Baz û egidan hêlîn vedan li serê çiyayan
Komika şoreşgeran agirê Newrozê hildan
Derketin serhildanê bi hêza şehîdan û Rêberê Ariyan
Û bûn hêza gelan
Reng da hêza gêrila li Kurdistanê, li gund û bajaran
Hêdî hêdi şemal didan li nava cîhanê
Roj li welat şahî û germahî xist nava gelan
Tîrêjên rojê xwe dan li ser bajar û gundan
Mûrad û Firat av herikakandin ji bo sorgulan
Şervanên Apo, zarokên gelan hêlîn vedan li Zagros û Botan
Bûne piling li ser serê neyaran
Çiyayên Kurdistanê bûn cihê gulan
Şervanên Apo hildan nava dilan
Ku hatibûn afrandin ji xaka zêr û zîvan
Malavahî dikir çiyayan ji bo şêr û şepalan
Bi dileke geş hildabû ber sîngan
Himbêz dikir bi eşq û evînê
Hêdî ewrên reş û tarî radibûn li ser gelan
Wê nehêlên qirêjî û êşkence biwerin li ser gelan

Wekheviya gelan barî bi raman û bîrdoziya Rêber Apo. Baraneke tejî şaristanî, fereseta demokratîk, rastiya gelan. Rêxistinê pêşxistin di bin pêşengiya Rêber Apo de. Dewletên dagirker poşman kirin ji biryara wan. Li ser xaka Kurdistanê nema cihê kedxweran. Nedihat erêkirin

qirêjiya desthêlatdaran. Bi gişti xilaskirina Kurdistan û Kurdan hat armanckirin. Gavên serxwebûnê, evîna jin û keçan.

Piştî şehîd Heqî Karer helwest nîşandan, lez dan biryara rêxistina bi rengê karkeran. 27’ê Mijdara 1978’an li gundê Fîsê yê girêdayî bajarokê Lîceya ser bi Ameda paytexta Kurdan, li mala Seyfedîn Zoxûrlu şêr û pilingan komcivîna xwe vedan. Tevgera Apoyî hat hûnandin bi peyvên zêr û zîvan. Ji herêmên cuda cuda, bi qasî 23-25 heval beşdarî cîvînê dibin. Di vê civînê de biryara damezrandina PKK’ê tê dayîn. Rêzikên ku ji aliyê Rêber Apo hatibûn diyarkirin di civînê de ji aliyê heval M. Xeyrî Durmûş ve tên xwendin. Hevalên ku tevlê civînê bûne vê pêşketinê dipejirînin. M. Xeyrî Dûrmûş û Şahîn Donmez weke cîgirê Rêber tên erkdarkirin. Piştî vê dîroka pîroz damezrandina PKK’ê bi fermî tê ragihandin. Bi xebatên giranbiha rêxistiniya bi partî tê îlankirin ji bo gelan. Di havîna sala 1979’an de, bi çalakiya li hember nokerên Bûcakan damezrandina PKK’ê ji gelan re tê eşkerekirin. Lê xiyanet li kesên zeîf digere, di berdewamê de Şahîn Donmez ixanetê dike û derdikeve ji nava komika Apociyan.

Kesk, sor û zer ji rûyê ezman hat xwar. Lerizandin dijminê xwînxwar û wan dest ji qirêjiya xwe berdan. Ji hesabdayînê xilas tunebûn. Gelê Kurd bi hatina we keyfxweş û dilşad bû. Gul û sosin, şêr û egîdan reng dan çiyan. Navê we pir şirîn, mina pîvoka li çiya û zozanên Kurdistanê. Zimanê we dermanê derdê mirovan e. Ji bo mirovahiyê dikin kar û xebatan. Gelên cîhanê bi we bawerin, dilgeşê Ariyan. Mazlûm bi te re dibin xwediyê maf. Rêhevalên te Heqî Karer, Mazlum Doxan çi xweşik û delal in, bi biryar û dilsoz in. Hildan ala rengîn û bilindkirin li ser milan. Daristan bi xwîna pekrewanan xemilîn, bi rengên kesk, sor û zer geşkirin û belav bûn li erd û esîman. Weke Bêritan, Zîlan û Zekiyeyan hilgirtin ala serkeftinê ji bo gelan. Çem, kanî û robar herikîn ji bo şoreşa we ya giranbiha û helbest anîn li ser zimanê dengbêj û hunermendan. Rûyê keç û xortan geş bûn; qêrin, hewar, mizgîniyî ji bo gelan. Vaye hat rêberê çerxa bîst û yekan, reng da bi rengê gulan, kulîlkan bêhn werandin ji bo wan. Avên sar herikîn bi rengê şîr, we danî li nava dilan ey Rêberê Kurdan bi awazên keç û xortên Botan. Keç û xortên Ariyan reng bi reng, qefle bi qefle, berbi çiyayan ve meşiyan. Vaye xilaskerên gelan.

Bi pêşketina xebatên PKK’ ê re roj bi roj di nava gelê Kurd de hestên netewî şîn dibûn û pêşdiketin. Ev jî dibû sedem ku dewleta Tirk bikeve nava tirs û fikaran. Bi vê boneyê artêşa Tirk di 12’ê Îlona 1980’an de dest danî ser rêveberêya dewleta Tirk. Ji wir û pê de artêşa Tirk bi awayeke hovane êrîş bir ser şoreşgerên Kurd û Tirk. Zindanên Kurdistanê bi şoreşgeran tejî kirin. Dagirkeran li ser girtiyan çewisandinên bê sinor pêkdanîn. Di nava van zindanan de ciheke taybet yê zindana Amedê hebû. Girtiyên Kurd, bi taybet endamên PKK’ê di vê zîndanê de hatibûn komkirin, ji ber vê sedemê li dijî girtiyên wê zîndanê helwestên cuda dihatin nîşandan. Ji bo teslîmgirtina milîtanên PKK’ê yên di vê zîndanê de serî li hemû rêbazên ji derveyî mîrovahiyê didan. Milîtan û qehremanên Kurdan ji bo parastin û berdewamkirina rûmeta netewa xwe, berxwedaniyek mezin didan nîşankirin. Ji aliyê dewletaTirk ya faşîst ve siyaseta girtin, qirkirin, koçberkirin, tinekirin û tine hesibandinê weke polîtîkayeke bingehîn hatibû destnîşankirin. Ya herî giring ew bû ku, gelê Kurd xwedî çandeke bi hezarê salan bû ku li Mezopotamyayê dijiya. Bi van polîtîkayên qirêj û gemar dixwestin vî gelî ji derveyî dîroka mirovahiya Rojhilata Navîn bihêlin. Bi damezrandina PKK'ê re bawerêya gelê Kurd çêbû. Rastiya komarê, şert û mercên Rojhilata Navîn rewşên nû pêşdixistin. Dadgeha leşkerî ya 12'ê Îlonê li ser komeke şoreşger di zindana Amedê de hovîtiyeke mezin pêktanî. Bi taybet li ser çend qadroyên pêşeng yên PKK'ê hovîtieyeke herî dijwar dimeşiya. Di 12’ê Îlona sala 1980' an, di bin fermandarêya Kenan Evren de artêşa Tirk ya faşîst li ser gelê Kurd û bi taybet jî tevgera PKK'ê weke ewreke reş bû. Careke din bi hovîtiya xwe ya li ser gund û bajarên Kurdistanê derketibû pêş, bi darbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê welatê wan dagirkiribûn. Dewleta Tirk dixwest tevgera azadiyê ya Apociyan tine bike. Di zindana Amedê de bi fetisîne û dawiyê lê bîne. Tişta diqewimî ji gelê Kurd re bêşansiyek mezin bû. Her yek ji van hevalan pêşengên girîng yên navenda rêxistinê bûn. Ev şoreşgerên Apoyî her yek bi bûyerên cûr bi cûr û di encama zextên dewleta dagirker de hatibûn girtin.

Tevgera PKK'ê têkoşîn û berxwedaniya xwe li ser xaka Kurdistanê hêdî hêdî belav dikir û tovên şoreşgeriyê direşand. Berhemên vê berxwedaniyê ew heval bûn. Ew hevalên yekem yên Rêber Abdulah Ocalan bûn. Li ser PKK'ê, qadroyên pêşeng û gelê Kurd, dewleta zilimkar

ya Tirk vê carê jî zindana Amedê ji xwe re kiribû qeleya zilmê. Dixwestin milîtan û şoreşgerên Kurdistanê tine bikin, teslîm bigrin û îxanetê li ser wan ferz bikin. Ji sala 1980’yan heta 1983'yan li Kurdistanê salên hebûn û titunebûnê bûn. Zindana Amedê ji bo dewleta Tirk ya rûreş bûbû navenda êskence û pêkanînên li dijî mirovahiyê. Êdî di girtîgehan de jiyana ku heyî bûbû şêweyeke êşkencê û êşkence bûbû parçeyek ji jiyana wan. Bi taybet jî ew êşkence, zilm û zordarî li ser komeke şoreşgerên Apoyî yên weke Mazlûm Dogan, Ferhat Kurtay, Eşref Anyik, Necmî Oner, Mehmûd Zengîn, M. Xeyrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Elî Çîcek û Akîf Yilmaz pêkdihat. Bi rêbazên şerê taybet û psîkolojîk bi ser wan de diçûn û şert û mercên zindanê roj bi roj li wan teng dikirin. Dijmin hewil dida karê xwe yê qirêj berdewam bike û ya herî girîng jî di kesayetiyên wan hevalan de PKK’ê tine bike û dawiyê li berxwedaniya di zindanan de bîne. Li zindana Amedê pêkanînên hovane li ser girtiyên siyasî dihatin meşandin. Ji bo ku rûyê rastî yê dewleta Tirk were zanîn, li hemberî bêdengmayina cîhanê ya li beramberê gelê Kurd û PKK'ê, berpirsyarêya herî bi şeref milîtanên Apoyî dabûn ser milên xwe. Wan hevalan bi berxwedana xwe ya bêmiriniyê biryara çalakiya mezin ya rojiya mirinê girtibûn. Di 14’ê Tîrmeha sala 1982’yan de rojiya mirinê xistin piratîkê. Mirin, kirin agirê jiyan û evînê. Wan hevalan li zîndana Amedê di bin êşkenceya li ser mirovan dihat kirin de ji bo parastina doza xwe çalakiya dîrokî ya mirinê dan destpê kirin. Ji aliyeke din ve, wan hevalan bi vê çalakiya xwe ya dîrokî li gorî şert û mercên Kurdistanê têkoşîn kirin û li himberî dewleta dagirker bersiva pêwist dan. Pîvana şoreşê û şoreşgeriyê zelal kirin. Bêguman di tevahiya dîroka mîrovahiyê de hêzên desthilatdar û çîna serdest, ji bo desthilatdarêya xwe berdewam bikin zilm û zordariyê dikin. Kesên azadîxwaz û parastina nirxên xwe yên jiyanî dikin jî li himber desthilatdaran têdikoşin. Dema têkoşîn didin û mafên xwe dixwazin, wan bi hemû cureyên êrîşên li dijî mîrovahiyê re rû bi rû dihêlin, bi mirinê dixwazin bêhêz bikin û ji armanca wan dûr bixin û wan bi mirinê bitirsînin. Lê dema hevalan çalakiya jiyanê bi lehengî dan destpêkirin, çeka mirinê jî ji dest dijminê xwe standin. Ew tê wê wateyê ku tu êdî li hemberî dijminê xwe serkeftiyî. Ev heval jî ew bûn ku di zindana Amedê de li hember êşkenceyên mezin, li hember zebaniyê hemdem Esad Oktay Yildiranê ku digot; "Ez peyva berxwedaniyê naxwazim bibîhîsim, peyva

berxwedaniyê bilêvkirin nepêkane" li ber xwe dane. Yanî li ser wan hevalan roj bi roj, demjimêr bi demjimêr ji bo teslîmgirtinê, ji bo îradeya wan were şikandin hemû cureyên êşkencê dihat bikaranîn, lê dîsa jî teslîmkarî nepejirandin. Bi vê çeka ku dijmin pê bi ser wan de diçû bêwate hiştibûn. Lewra wan hevalan bi çalakiya mirinê jiyanê didan qezenc kirin. Mirin xistibûn bingehê jiyaneke birûmet. Bi gotina heval Kemal Pîr, "Em, bi qasî di oxira wê de bimirin ji jiyanê hez dikin." li tevahî giyanan serwer dibû. Van hevalan dijmin di kesayeta xwe de binxistibûn û serkeftin bidestxistibûn. Van hevalan, bi vê çalakiya xwe ya dîrokî ku biryara rojiya mirinê girtibûn û di şert û mercên zindana Amedê de tevî ku roj bi roj laşê wan hevalan diheliya jî, ji titunebûnê hebûn çêdikirin. Bi hemû zext û êşkenceyên ku dihatin kirin re dijmin dixwest li cihê jiyanê mirinê hilbijêrin û ev yek li ser girtiyên azadiyê didan ferzkirin. Lê li himberî vê biryara berxwedaniyê hatibû dayîn, bi vî awayî hemû zext û êrişên dijmin vala hatin derxistin. Rêya şeref û jiyaneke azad ji bo partiyê, gelê Kurd û cîhanê destnîşan kirin. Ji mirinê jiyan ava kirin, her çendî roj bi roj laşê wan diheliya jî, lê wan hevalan heta dilopa xwîna xwe ya dawî hîma Rêber Apo ji xwe re kirin bingeh û parastin. Ji herkesê re serkeftina milîtanên Rêber Apo çawaye raberkirin. Dema ku mirov çavê xwe digre û wan bibîr tîne dibêje; gelo ew çi îrade û baweriyeke ew qas xurt bû ku ew heval bi hev re ketin rojiya mirinê? Ji bo xilasiya gelê xwe, xwe kirin cangorî. Gelê Kurd û tevgera azadiyê bi saya Rêber Apo û wan hevalan gihiştiye roja îro. Ew bûn bingeha şopandina hemû şehîdên Kurdan û berxwedana wan.

Li zîndanan zext her roj kûrtir dibûn. Li dijî êşkence, teslimiyet û îxanetê di 21'ê Adara 1982'yan de heval Mazlûm Dogan çalakiyekê pêktîne. Bi gotina, "Berxwedan Jiyan e" rêya berxwedanê vedike. Piştî çalakiya heval Mazlûm Dogan êşkence nasekinin û bênavber berdewam dikin. Di 18'ê Gulana 1982'yan de heval Ferhat Kurtay, Eşref Anyik, Necmî Oner û Mahmûd Zengîn rêya Mazlûm Dogan dişopînin. Bi peyameke nivîskî diyarkirin ku armanca çalakiyê li nirxên têkoşîna azadiya xwedî derketine û vê peyamê ragihandin dijminê xwe. Dema agir bi bedena xwe dixin dibêjin; "Agirê gewdeyê me gurbikin, tefandina agir îxanete."

Weke xelekên heman heyînê hev dişopînin pêşengin nemir. Di pêşengtiya M. Xeyrî Durmûş de çalakiya dîrokî di 14'ê Tirmeha sala

1982'an de bi ragihandina rojiya mirinê tê destpêkirin. Di zindana Amedê de zilm û êşkence di asta herî jor de tê sepandin, mafê xwe parastin û xwe vegotinê ji berxwedêran re nayê dayîn. Pêvajoya li xwe mikurhatinê û îxanet pêşxistinê zêde dibe. Bi van çalakiyên mezin cardin giyanê berxwedan û raperînê derdikeve holê. Di nava girtîgehê de xebatên rêxistinî tên pêşxistin. Lê dijminî sîstema xwe ya bi êşkence dabû rûnişkandin. Di encama rojiya mirinê de M. Xeyrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Akif Yilmaz û Elî Çîçek şehîd dikevin. Lê di bedenên faşîzmê de derzên mezin vebibûn, êdî nema dikarîn weke berê zilma xwe bidin berdewamkirin. Lê dîsa jî ji armanca şikandina vîna berxwedêran nebibû. Dijminî di sala 1984'an de dîsa êrîş kir, di wan êrîşan de Necmedîn Buyukkaya, M. Emîn û çend hevalên din bi rojiya mirinê şehîd dikevin. Necmedîn Buyukkaya ne PKK'yi bû, ji gelê welatparêz e. Dijminî piştî vê berxwedanê û şûn de xwe xurt kir. Lê belê girtiyên siyasi her ku diçû xurt dibûn û her ku diçû rêxistinê di hundirê zindanê de bihêz dikirin.

Berxwedan xûrtir dibûn, zilm û zorî her ku diçû kêm dibû. Vê şiyariyê jî bîr û bawerêya li hemberî serkeftinê diyar dikir. Tîrêjên rojê şewqa xwe vedida û Amed bi gulan vebû. Giya şîn bûn, gel şiyar bû û hemûyan bi hev re gotin; "Berxwedan jiyan e." Heman diruşme di roja îro de jî şîara têkoşîna azadiyê ye.

**Şehîdên Amedê**

Kurdistan biheşta cîhanê
Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava welatê bav û kalan
Sînga wê Botan, keziyên wê Mûrad û Firat in
Gulistan şirîne li ser zimanê keç û xortan
Dengê çemên wê bûne stran li ser lêvên dayîkan
Daristan bûn hêlîna baz û pilingan
Kurdistan kirin vîn û evîna dilan
Gulistan kirin warê jiyana gelan
Bû vîna vejîna şehîdan, biheşta zarokên mazlûman
Ew nazike nazenîne
Lê hene kaniyên zêr û zîvan
Rengxweşik e, nav dayîk e

Lê digerin şervanên Rêber Apo
Gulistan êş û zoriyê dikişîne
Reng gewhere, ew hatiye xemilandin bi derya û çeman
Kurdistan tu dizanî kê te binav û deng kir?
Şervanên Apo
Ku li ser sînga te dikin ceng û şer
Xemilandin bejn û bala te

Cûdî, Ararat, Zagros û Qendîl hêlînên şervanan in. Serkêşên berxwedanê Mazlûm Doxan, M. Xeyrî Dûrmuş, Kemal Pîr, Alî Çîcek, Akif Yilmaz, Ferhat Kurtay, Mehmûd Zengîn, Necmî Oner, Eşref Anyik yên ku Kurdistan bi nav û deng kirin. Bilbilên Rêber Apo ne Zekiye, Rewşen û Viyan Soran; hemû hevalên dozê.

Amed hesreta dilane, wê rizgar bikin şêrên gelê xwe. Rêber Apo serkêşê wijdanê ye, ji tutunebûnê jiyanek nû afirand ji bo gelan. Kurdistan bû xwediyê egîd û şervanan. Hat parastin bi xwîna şehîdan. Rêber Apo mamosteyê gul û rihanan, gulistan bû cihê dilgeşiya mazlûman. Rêbere zanyarê hêja, navê feraset û jiyaneke nû. Welatê agir û rojê herdem tu serbilind î bi keda şehîdan. Her şervanek hemtayê lehengekê ye, ciwanên dilsoz in, axîn û keser hesreta sorgulan. Cîhan xwazgîniyên te ne, destgirtiya keç û xortên Kurdan, sond xwarine bixwîna şehîdan. Delala cîhanê tu kirin evîna germahiya dilan. Wê te bidin jiyankirin her deman. Canfedayên te gelek in, wê te rizgar bikin Kurdistan. Sifreya ji zêr û zîvan; rewneqa Kurdan, bi bax, bostan û daristanan tu yî biheşta gelan.

**Derketina Rêber Apo Ji Bakurê Kurdistanê**

Rêber Apo di roja 2'yê Tîrmeha 1979'an de diçe Sûriyê, yanî derdikeve ji derveyî welat. Dema derbeya 12'ê Îlonê pêktê Rêber Apo li Lubnanê ji bo têkoşîna azadiyê derfetan ava dike. Endamên partiyê yên neketibûn destê dewleta Tirk derbasî Lubnanê dikirin. Li wê derê ew kadro ji aliyê Rêber Apo dihatin perwerdekirin; perwerde li ser bingehê vegera welat û destpêkirina şerê çekdarî dihat dayîn. Dema perwerdeya hevalan qediya, amedekarî hatin temam kirin û komikên Apoyî yên despêkê tên şandin. Wê herêmên ku biçinê û rewşa gel bişopandina û

hêdî hêdî derbasî welat bibûna. Di heman demê de tevgerên dijmin jî dişopandin. Hevalên ku derbasî welat dibûn di nava gel de diman. Di derbarê pirsgirêka Kurdan de gel dihat şiyarkirin. Dema amedekarêyên hevalan bi dawî bûn refgerên çekdar di 15'ê Tebaxa 1984'an de êrişî baregehên leşkerên dewleta Tirk yên li Erûh û Şemzînanê kirin. Bi vî awayî li dijî dagirkerêya Tirk şerê çekdarî tê despêkirin. Fermandarê gêrîla yê wê demê heval Egîd (Mahsum Korkmaz) bû. Guleya yekemîn bû vejîna gelan û bi awayeke xweşbînî ji aliyê gel ve tê pêşwazîkirin. Gelên cîhanê bi zanîna hebûna Kurd û Kurdistanê şiyar dibin. Ev jî di bin rêveberêya Rêber Apo de pêktê.

Di encama çalakiyên gêrîla yên li hemberê baregehên leşkerên Tirk çêdibin de gelê Kurd şiyar bûbû. Êdî piştgirî didan tevgera azadiyê. Şerê ku bi armanca azadiya Kurdan hat li darxistin, her ku diçû mezin dibû. Bi hezaran ciwan tevlî refên gêrîla dibûn. Ji bo azadiya welatê xwe şer dikirin. Di sala 1990'an de li Nisêbînê, paşê jî li Cizîrê gelê Kurd raperîn dan dest pê kirin. Serhildan li hemû bajar û navçeyên Bakurê Kurdistanê belav bûn. Dema ku gel li hember dagirkeriyê rabû, bandorên dagirkeran yên li ser gel jî lawaz dibûn. Li gel vê gêrîlayên azadiyê jî tevgera xwe mezin kiribûn. Bandor û hêza xwe ji her alî ve didan avakirin. Bêguman vê rewşê rayedarên dewleta Tirk bêzar dikir û ew dixistin nava tirs û xofan. Bi vê kîna xwe ve êrîş dibirin ser gel. Bi hezaran kesên welatparêz, rewşenbîr û Kurdên bêguneh hatin qetilkirin. Bi hezaran gund û mal hatin şewitandin. Gelê Kurd ji cih û warên wan derxistin û koçber kirin. Bi milyonan Kurd derbasî welatên Ewrûpa û bajarên Tirkan bûn. Dewleta Tirk ya dagirker û hov bi van kiryarên xwe yên qirêj dixwest bandora gêrîla ya li ser gel bide şikandin, gel û gêrîla ji hev qut bike. A herî girîng jî, dixwest Kurdan bike neyarê hev.

Ji Kurdistanê ber bi cîhanê ve feraseteke nû hat belavkirin. Ji ber ku di feraseta Rêber Apo de cudahî navbera ol, kes, qewim û netewan de tunebû di demeke kin de rastiya vê rêxistinê hat dîtin û gel jî tevlibûna xwe ji têkoşînê re çêdikir. Ji ber vê çendê her kesê berê xwe dida vê ferasatê ku afrankarê wê Rêber Apo bû. Rêbertiyê jî bi gotinên xwe bal dikişand ser têkoşînê û digot; "Werin, çi dibe bila bibe werin li cem me cih bigrin û pir rengiyê çêkin." Ev axaftin ji her kesî re dibe weke bangekê, her kesê bersîva vê banga pîroz bi tevlêbûyîna xwe ya ji têkoşînê dan.

**Fermandar Egîd**

Hêrsa we pir dijware lehengê Kurdan, şehîdê gelan. Egît, serfermandarê gêrîlayan, tu wê her bijî li nav dilan; bi rengê gulan, hêsirên çavên dayîkan, ronahiya çavên rêheval û hogiran. Keç û xortan rêya we şopandin bi agirê azadiyê. Qendîl cihê serpereştiyê, Amed paytexta gelan, Dêrsim, Xerzan, Botan û Serhed biryargehên egîdan. Kêlamemê, Heftenîn, Xinêre û Zap cihê pilingan. Bi guleya yekem we şerê jiyanê da destpêkirinê ji bo azadiya gelan. Bû bahoz û bagera li ser serê desthilatdaran, guleya yekem şiyarkir dijmin û dostan. Reng zer bûbû ji ber êşa evînê. Derya zanistê rabû bi pêlan ji bo jîna li çiyayên Botan. Cîgera min da kerkirin bi evîna dilan. Bi xwîna şehîdan bişkaftin hemû rengên gulan. Tuyî tirêjên rojê, derketî ji Êlihê. Tu yî serfermandarê Kurdan, şêr, piling û lehengê serê çiyan, hûnê rizgar bikin welatê jaran. Hûn Şahsiwareke bipergal in, leheng in, bi nav û deng in, şer û ceng dikin ji bo gelên bindest. Nayê ji bîrkirin Şahsiwarê Kurdan. Navê we hat nivîsandin li dîrokê evîna gelan, dara selwiyê, xewn û xiyalên gulistanê. Navê we şirîn e, li xwe kirin zarokên Kurdan û hûn hildan nava gulan. Hat nivîsadin li ser zimanê zarokên Êlihê, serfermandarê qehreman. Axîn dikim, nalîn dikim ji dil, naçe ji bîra pîr û kalan. Keç û xort hemû di hesreta we de ne bi evîn û heskirina dilê xwe. Evîna dilan, mêjî giran, lehengê giranbiha, rêya rast bi fereseta Rêber we da şopandin li Kurdistan. Wê bişopînin têkoşîna we zarokên gulistan, her hûn in fermandarê gelan, wê şopa we bimeşînin ferişteyên biheştê. Li welatê gulistanê kedera dilê evîndar û rêhevalan. Jana dilê pîr û kalan, mêjiyê keç û xortan wê bişopînin bazên serê çiyan.

**Eledax**

Eledax bûbû hêlîna şervanên azadiyê. Şervanên azadiyê di her quncikên Tendûrekê de cihê xwe girtibûn. Ji her derê Serhedê, dengê bazan û şêran bilind dibû. Heskirina her mirovekê ji PKK’ê re çêdibû. Germahiya şoreşgerên Apoyî di nava gel de belav dibû. Hakimiyeta herêma Serhedê di destê şervanên azadiyê de bû. Bi taybet gêrîla bi çand û terbiyeya partiyê dihatin naskirin. Gelek gerêyam, min zehmetî kişandin, paşê min xwe gîhand hevalekê ku bi navê Birûskê Pêmezin dihat naskirin. Yek ji wan hevalan bû ku di pêşiya kozikan de karê piratikî di nava gel de dimeşand. Ez bi ditîna heval keyfxweş bûm ku bi alîkarêya heval Birûskê ji Amûda Rojavayê Kurditanê gihiştim armanca xwe û keyfxweşiyê di rûyê min de xwe da nîşankirin. Wek gulan geş bûm.

Rêzdarêya hevalan û danûstandinên wan yên bi me re bû sedem ku ez bi rêxistinê re bêm girêdan. Rastiya şehîdan û Rêber Apo hindik be jî bi min dan fêmkirin. Tiştekî pêwist bû û wateya wê gelek giranbiha bû, lê eger ez bibêjim min her tişt fêmkiriye wê nerast be. Zatunebûna şehîdan û Rêber Apo derya ye û cahileke weke min her tiştî nikare baş têbigihe û baş fêm bike. Mîna zaroka li pey dayika xwe digirî, bawerî û hêviya wê dayika wê ye, ji bo min jî hêvî û bawerî şehîd, Rêber Apo û rêxistina partiyê ye. Bihêvîme, ji xwe hêvî jî nîvê serkeftinê ye. Heval Birûsk di nava gel de pir dihat heskirin.

Rêya şehîdan, Rêber Apo û naskirina rêhevalan weke dersekê ji aliyê heval Birûsk ve dihat vegotin. Bi alîkarêya heval Birûsk hat erêkirin ku serdana fermandar heval Eliyê Dirêj bikim. Derengiyê rojê têbîniyek ji fermedar rêheval Eliyê Dirêj re hat şandin, di demek kurt de bersiva me hat dayin. Çûyîna me ya li gel wan hatibû erêkirin. Fermandarên eyaleta Tendûrekê nêrîna rêhevalan pejirandibûn. Erê, serdana rêheval Eliyê Dirêj rûyê min da kenandin. Em rêketin û gihiştin cem şikefta binê tehtê, sarinc li rex şkeftêbû. Ji vê şkeftê re di gotin “Şikfeta Nêrêyan.” Li gorî gotinên gelêrî, “Şêr bi hêlîna xwe tê naskirin.” Şopên bav û kalan ne hatibûn jibîrkirin. Mêhvanperwerî di astek bilind de bû. Bi rastî dema mirov li nava çavên hevalan dinêrî ew qas xweşik, nazik û rêzdar bûn, bi vê rêz û mêvanperweriyê em dane şermê. Cihê mêhvanan bi kulavên sor hatibû raxistin û bi wêneyên şehîdan, bi wêneyên Rêber Apo hatibû

xemilandin. Dîwarê şikeftê hatibû neqişandin, binê diwar bi balif û xalîçeyan hatibû raxistin û xemilandin. Binê şkeftê bi mahfûr û xaliçeyên Kurdan hatibû xemilandin. Bêhneke xweşik difûrêya. Em rûniştin, fermandarê rêzdar rêheval Eliyê Dirêj hat. Em tev rabûn ser xwe û yek û yek bi destê me girt, em himbêz kirin, pirsa rewşa me kir û li pêşberê me rûnişt. Hevaleke reng esmer bû. Axaftina xwe berdewam kir, bi van xalan ve em hatin girêdan. Behsa heskirina şehîdan, Rêber Apo, ferasata Rêber ji bo Kurdistanê dikir. Di wê rojê de du caran ders ji bo me hat dayîn. Ji aliyekê din ve çay û xwarin ji me re danîn. Axaftina heval Eliyê dirêj li civatê gelek xweş dihat, bi şirînahiyek nazenîn û edebiyata wî mirov gelek aşna û dilxweş dibû. Ew di bihara sala 1993’an de hatibû herêma Serhedê. Di derbarê çeteyan de pirs ji min kirin. Ji bol i gel hevalan xwe bidim qebûlkirin, xwe şîrîn nîşan bidim min ji çeteyan re dijûn dan. Ev jî ji bêçandiya min hatibû. Heval Elî got; “Bisekine! Dijûn di nava rêxistina Rêber Apo de qedexeye, yên dijûn didin qelsin, qelsbûna xwe didin nîşankirin. Em şerê leşkerê Tirkan dikin, dijûn nakin, lê ew dijûnan ji me re dikin. Eger tu bixwazî bibî şoreşgerek Apoyî, tu wê dijûnan nekî.” Piştî vê min gelek şermkir, rengê min gelekî zer bû ji qehran, ji ber ku min kêmasiyek mezin kiribû. Piştî axaftina heval Elî min daxwaz kir ku ez biçim. Destura min hat dayin, me xatir ji fermandar rêheval Elî xwest û ez ji şikeftê derketim. Heval Birûsk ji min re got; “Du pîvanên partiyê hene ew jî evin; min nedîtiye, nebihîstiye.” Ev jî pîvanên ewlehiya hevalan bûn. Derketina ji cem hevalan xem, keder û êş ji min re anîbû. Çima ez zivirîm?

Piştî çend mehan heval hatibûn şandin ku li nava gelê Erdîşê xebat bikin. Heval Rojhat û Tajdîn ji bo vî karî hatibûn. Di vê navberê de hilbijartina şaredariyan jî nêzik bibûn. Wê demê min dixwest dest bi karê partiyê bikim, lewma min dixwest heval Eliyê Dirêj bibînim. Lê bû zivistan û dîtina heval Eliyê Dirêj nepêkan bû. Jixwe di sala 1995’an de, di mehên pênc û şeşan, di navbera Dêrsim û Erzeromê de bazê Kurdan, lehengê mezin rêheval Eliyê Dirêj tevlî karwanê nemiran bû. Dema min heval dîtibû, min mijara wesiyeta birayê xwe û vîna xwe ya tevlîbûna nava refên têkoşînê pê re parvekiribû. Wî jî gotibû; “Baş e. Dema tu careke din hatî ezê te bişînim.” Lê mixabin dîtina me bû cara dawî û min êdî ew nedît.

## Şehîd Eliyê Dirêj

Heval Elî, hûn gula têkoşeran, bêhna mîsk û emberan. Hûn nasekinin wek ba û bahozan, li ser dijmin dibarînin fîşekan. We herikand agirê dojehê li ser wehş û cehşan. Gulbinefşa zozanan, şîrîniya zimanê dayikan, hestên pîran, kalan, keçan û xortan. Em heyranê te ne şêrê çol û çiyan, birûska erd û esîmanan, çîroka navdaran. Rêheval Eliyê dirêj şirîn e, tu caran naçe ji bîran. Tîrêjên rojê ye, gerden zirav e, fermandar e, reng esmer e; hêlîn veda li Serhedan. Vaye zarokên agirê rojê, ronahiya gelan, fermandarê Tendûrekê, bazê Geliyê Zîlan. Rêheval bişkavt rengê kulîlkan, kaniyê û çem stran digotin, awazên şoregeran wek heyvê ronîkir şevên tarî li zozan û deştan. Daxwaz û biryara we geşbû û dilê rêhevalan şewitandin. Mamosteyeke pir şîrînî, kewê rêbate, şirîniya li ser lêvên rêhevalan. Wek bazan difirêya û dijmin ji welat derdixist. Gel we ji bîrnake bilbilê Kurdan. Gel li we gerêyan, ketin çolan û zozanan. Heval, dost hemû evîndarên gulanin. Ji mamosteyê mezin hilaniye derya zanînê. Hûn stêrka Ariyan, hêviya gelan, şervan û şehîdê bindestan. Hûn ketin nava karwanê nemiran. Hûn Kelha Dimdimê, hûn dijîn di dilê me Kurdan de û hûn in ronahiya rêyên rastiyan. Herdem şiyarbû li ser zimanê zarokên gelan, rêheval Eliyê Dirêj, hûn evîna dayikan. Hûn bûn dîroka zêrîn, ronahiya şev û rojan. Şehîd, bazê li serê çiyayan, biriqandina gul û sosinan, hûn in stêrka li erd û esîman. Hewildanên we yên bi mêrxwasî, pêşeroja keç û xortan. Wek heyva çardehan derketî li Tendûrekan, dengê şêran û egîdan. We hêz û cesareta xwe ji Rêber Apo hilda. Daristana Agirî bû hêlina keç û xortên Ariyan, hûn in rondikên xwîşk û birayan. Xilaskerê Geliyê Zîlan derket li Rojava. Daxwaza we serfiraziya gelan, bijîşkê Kurdan. We rijand xwîna haran, bîrindarê dilan, serleşkerê mazlûman, bêhna gulan, evîna Rêber Apo li nava dilan bû mûma li cîhanê, hingivê Serhedan. Li Eledaxê dara selwiyê, li Qendîlê ji bo gel dikî kar û xebat. Bazê Xinêre û Zapê li serê Tendûrekê difirin. Xwîna we rijiya li Dersimê, pêxist agirê jiyanê. Dayîkan gazî we kirin bi awazên bilbilan. Te li ber xwe da bi roj û şevan. Ji bo gelê xwe yê hêja, te sond xwar bi şopandina rêya şehîdan û ketî dilê Serhedê. Tu evînî, bawerêya te vîne ji bo keç û xortan. Xaka we afirand Rojavayê Kurdistanê bilbilê gelan, pilingê Kurdan. Serkêşê

evîndaran, berxwedêrê Geliyê Zîlan, evîna Rêber Apo bû agirê jiyanê, bilbilê leheng, şêrê Kurdistanê, we şînkir bi vejîna gulistanê.

**Dizê Navdar**

Xalê Mihemedê Celalî dizeke navdar bû. Ew bi talankirina malan, bi diziya xwe meşhûr bû. Di nava eşîra Celaliyan de dizeke bin av û deng bû. Jê dipirsin; "Rewşa te çawa ye?" Dibêje; "Ez gelek başim." Paşê dibêje; "Lê pergala PKK'ê ji nû de dizî heram kiriye. Keçên Kurdan êdî nayên firotin, êdî ji aliyê mêr, bira û bavê xwe ve nayên lêdan. PKK'ê pîvanek daniye navbera jin û mêran. Jin kirine xwediyê mafan. Pirsgirêkên gel bi hevalan re tên çareser kirin. Lê rast e, me û fermandarên dewleta Tirk bi hev re û bi alîkarêya wan dizî pêkdanî û li hev parvedikir. Niha pergala Apoyî dizî, talankirin, kuştin, derew, qîz revandin, bi cîranan re pevçûn qedexe kiriye. Ez bi xwe nikarim diziyê bikim, alîgirên min nînin. PKK bi xwe diziyê nake û nahêle kesek din jî diziyê bike. Gelê me jî ji wan biryarên partiyê re rûgeş e, gel bi xweşbînî pêşwazî dike, di asta bidil de hêjî birêzdarî tên pêşwazîkirin. Lê min dizî dikir bi alîkarêya dewleta Tirk, li pişta me disekinî, ez bi xwe êdî nikarim diziyê bikim. Dîsa jî bikevim nava gel parsekiyê bikim wê îdara min bibe. Pêşiya diziyên fermandarên dewleta Tirk jî hatiye girtin, wan jî bi diziyê xwe didan jiyankirin, lewma ew jî wê hilweşin. Dizî jiyana wan bû. Lê niha diziyê nikarin bikin, li pêşiya wan PKK heye. Aborêya min ji berê hîn xweştir e, niha gel ji min hez dike û Apoyî jî ji min hez dikin. Wek guleke nava gel de rûgeş im. Ji Apoyiyan re sipas dikim ez ji nava jiyana qirêj derxistim û xistim nava jiyanek paqij. Niha ji bo her kesî mînak im û wê sûd ji min bigrin."

**Bîranînek**

Hevalan pêşiya pira Çaxirbegê girtin û gundiyên Çaxirbegê û Qere Kilîsê kom kirin. Ji wan re gotin; "Banî wê hêza ku li hemberê me şerdikin leşkerên Tirk û çeteyên wan bikin, bila werin." Gundiyan bangî qereqolê kirin. Lê wan gotin; "Em nayên." Ne ku dûrbûn, di navbera qereqolê û gund de yek kîlemetre hebû. Gotin, "Hûn li ber xwe bidin, emê sibê demjimêr 8:00'an de werin." Gundiyan ew axaftin ji hevalan

re ragihandin, çeteyan lawahî ji hevalan dikirin ku wan bibexşînin û digotin; "Me bibexşînin, emê çekên dewletê bidinê." Hevalan bi gotinên, "Pirsgirêka me bi we re nîne. Em ji bo azadiya we û ji bo ku we ji bin koletiya desthilatdaran xilas bikin hene. Pirsgirêka me bi dewletaTirk û leşkerên wan re heye." Ev bersîvandin. Heval çûn. Roja paştir sibehê leşkerên Tirk hatin û ji gundiyan pirskirin; "Kanê ne ew terorîst?" Wê çaxê dayîkeke welatparêz bi ser leşkeran de qîrkir û got; "Em gundîne lê hûn leşker û çeteyên bêşeref in, hûn kûçikên mol in, dema şêr derkeve li diyaran kûçikên mol dikevin qelexan."

Gelê Kurd di rastiya Rêber Apo de keyfxweşin û wê her dem bi serfirazî jiyan bikin. Ev rastiyeke ku ez rave dikim, di nava hevalan de giyanê Apoyî li pêşiya her tiştî ye.

**Kurdên Comerd Û Mûsayê Melakan**

Gotinek ya bav û kalan heye, dibêje; "Mîrê Cizîra Botan banî Mûsayê Melakan kir. Mûsa diçe dîwana mîrê Cizîrê. Li wir Mûsayê Melakan tê tewanbarkirin û bifermana mîrê Cizîrê wî bi stuna dîwanê ve girê didin, sermilê wî diqelişînin û mûman datînin ser û agir berdidinê, bi qederekê dişewite. Mîr di ser de dizivire û dibêje, "Ji vê rewşê zortir çi heye?" Mûsayê Melakan bersiva wî dide û dibêje, "Ji vê zortir ew e ku mêvanê mirovan werin, baran bibare, mal dilop bike û jina mirov jî razê. Ev ji vê halê min zortir e.''

Ev tê wê wateyê ku Kurd heta dawiya dilopa xwîna xwe mêhvanperwer in, ji her mirovan re rêzdar û hurmetkâr in, ji mêhvanan hezdikin, herdem aşitî û aramiyê daxwaz dikin. Heskirina mirovan bû sedemê komkujiya Kurdan. Rêber Apo ji mirovahiyê hezdike, afirînerê heskirinê ye. Çanda Rêber Apo ya heskirinê ji bo mirovahiyê di cihê xwe de ye. Mînak Seydayê Cigerxwîn wiha dibêje; "Wexta Kurd hebûn û xwedan dewlet bûn Tirk, Ereb û Faris titunebûn." Bi mêhvandarî hatin bûn cîranên me, ji ber heskirina ji mirovahiyê ya Kurdan. Lê li Kurdan civiyan hirç, rûvî û gur, dev ji wan bernedan dewletên deshilatdar, hatin avakirin ku Ereb, Ecem û Tirk in. Kurd hatin talankirin bi mal milkan, bi komkujiyê hatin perçiqandin. Kal, pîr û zarok, keç û xurt û jin; xwîna wan rijandin, talan kirin Kurdistan, bêbext bûn xwedanê defikan.

Heskirina mirovan û mêhvanperwerêya Kurdan bû sedemê ji holê rakirina wan, lê her wê berdewam bike çanda Rêberê hemdem.

### Çîroka Gur Û Xezalê

Carekê xezalek dikeve devê gurekê, gur bi hemû hêza xwe ve zilm û êşkenceyek dijwar li ser xezalê dike û perçe perçe dike. Ji xezalê pirs dikin; "Çi li te zor hat?" Ew jî dibêje; "Ez ew qasî ciwan û xweşk im, ew qas bazvanekî xurt im, lê ez çawa ketim devê gur ku gur jî bi zilma xwe min bixwe."

Min ji bilî şervanên azadiyê û welatparêzan ti dost û bira ji xwe re nedîtin. Xwezî weke xezalê pirs ji Kurdan bihatiba kirin. Lê belê Kurdan bê dadgeh, bê parastin û bi darê zorê parçe parçe kirin. Zimanê wan jê kirin ji bo ku nekarin xwe biparêzin, çavên wan derxistin ji bo ku rastiyan nebînin, dest û lingê wan şikandin ji bo ku bêhêz bimînin. Daxwaza Kurdan aramî û aşitiye ku hovîtî û zilm li ser wan tê pêkanîn. Bi tinekirinê re rûbirû mane, bi hezaran sal e xwînrijandina wan berdewam dike. Divê hesab ji van were xwestin. Dem hatiye, êdî keftar, hirç û gur ji şopa xwe tirsiya ne.

## Serpêhatiya Şehîd Birûsk

Di nava gel de heval Birûsk bi navê Rostem dihat zanîn. Navê duyem Birûskê Pêmezin bû. Rojek wê biçûba gundê Ebexê. Gundiyên wê derê hemû cerdevan in. Zilamê ew mala ku biçê jî cerdevan e. Di navbera zilam û hevjîna wî hevkişandin hebû. Jinik ji navenda Erdişê bû û di dil de hezkirinekê li hember Apociyan jiyan dike. Zilamê cerdevan herdem devê xwe li hevalan xirab vedike. Hevjîna wi vê erê nake û zilam lê dide, êş pê dide kişandin û her jê re dibêje; "Eger terorîstên te bibînim, ezê bi vê qilêşê bikujim." Jinik jî dibêje; "Eger şervanên azadiyê werin wê tola min ji te hilînin." Vekişandin di nava wan de her berdewam dike. Heval Birûsk diçe wî gundî û bitesadufî diçin derê wê malê. Bi çend hevalan re li derî didin û banî dikin.

- Jinik: Hûn kîne?
- Heval Birûsk: Em heval in.
- Jinik: Ez bawer nakim hûn heval bin.
- Heval Birûsk: Em terorîst in.

Dema jinik axaftina terorîstiyê jê sehdike bawer dike, tê pêşberî mêrê xwe.

- Jinik: Heval hatine ber derî.
- Zilam: Ez xwe li kû derê veşêrim?
- Jinik: Were bikeve bin fîstanê min.
- Zilam: Na, ger tu rabî û rûnê wê min bibînin. Ka bêje ez çi bikim?
- Jinik: Bikeve nav kulavî, kes wê nebîne.

Dema dikeve nav kulav dipêçe dide ber dîwarê odê û diçe derî li hevalan vedike. Xêrhatinê li hevalan dike, ji bo rûniştinê cih nîşan dide. "Keremkin werin rûnên û pişta xwe bidin vî kulavî." Dema pişta xwe didinê, hest pê dikin ku zindiyek di nav de ye. Jinik radibe xwarinê amade dike, sifrê datîne ber hevalan, sifreyekê xweşik û dewlemend. Hevalan dest bi xwarinê dikin. Heval Birûsk ji jinikê dipirse. "Ev çiye di nava vî kulavî de?" Jinik serpêhatiya xwe ji serî heta dawiyê ji wan re vedike. Kulav vedikin û zilam derdixin. Lê zilam li ber mirinêye, dest û lingên wî diricifin. Paşê tê ser hemdê xwe û wisa lawahiyan ji hevjîna xwe dike;

- Zilam: Ez bextê te de me, dest û lingê te maç dikim, bila heval min nekujin.

- Jinik: "Ha! Te îman bi hevalan anî?
- Zilam: Belê, belê.
- Jinik: Na, na heval te nakujin.
- Zilam: Ez xwe nelet dikim, soz carek din kêmasiyan nekim."

Heval Birûsk wî dawetî ser sifreyê dike ku xwarinê bixwe. Lê xwarin di gewrêya wî de naçe xwar. Heval Birûsk dibêje; "Eger tu careke din wisa nekî û soz bidî, wê partî te bibexşîne." Zilam jî lê vedigerîne: "Ez soz didim heval." Heval Birûsk û hevalên pê re xatir dixwazin û diçin.

Heval Birûsk ji Başûrê Rojavayê Kurdistanê bû. Di payîzê de li Serhedê giha karwanê şehîdan.

**Şehîd Heval Birûsk**

Şoreşgerê giranbiha meşand rêya Zekiye û Rewşenê, geşkir rengê gul û sosinan. Dayê negirî ji ber evîna şehîdan, rondikan dibarinî ji dilê birîndar. Rêheval Birûsk, şeng û şepalê Kurdan. Gulberfîne li jîna gelan. Dîcle û Firat bi xweşikbûna şehîdan û bi awazên şalûlan stran hûnandin û li ser zimanê keç û xortan distiran. Rêheval Birûsk, bazê serê çiyan, qêrîn kir li ser dijmin, hewar û gazî ket nava dilê dagirker û xwînxwaran. Bihar bi kulîlkan xemilî, ronîkir rêya rast ya rêhevalên şoreşger. Çekdaran hildan ala rengîn, çikilandin li Kurdistanê. Agir berdan dil û cîgerê cehşan. Dijminê tirsonek hewar kir û nikare serî hilde li beramberî şehîdan.

Serhed bi te serbilinde heval Birûsk, Tendûrek warê bav û kalan. Şoreşgerên Rêber Apo ne, bi canfidayî ronahiya çavên gelan. Binefşa Serhedê, fedekarê Kurdan; Eledax bi te geşbû bijîşkê canê nexweş, daxweza dilê gelan. Xunava li ser kulîlkan, rondikên li ser çavên xwîşk û birayan. Têkoşer û birîndarê bihestiyar. Carek serdan bikim gula cîhanê, dijmin bidefike, roviyên bajarokan. Dijmin direvin ji kozikan, perîşan man li çolan, keftar, gur û hirçê bajaran çêdikin defikan. Şehîdan firset nedane van xiraban, zanîna xwe hildane ji Rêberê Kurdan. Bazên lehengin, sorgulan bidin destê wan. Hewar dike Dîcle û Firat. Li çiyayan şoreşgerên binirx bawerêya dilê keç û xortên Kurdan in; ew şervanê welat e, hêviya Geliyê Zîlan e. Hatiye afirandin ji xaka Rojava, Rostemê gelan. Dixwîne û rastiyê digihîne dost û yaran, serkêşê evîndaran. Canfedayê gelan, berxwedana egîdan, xilaskerê civatan. Bi xwîna

şehîdan gul hatin çandin, şînbûn reng dan cîhanê û jiyanê biwate kirin. Gulistana Kurdan, pê re jî cîhana giranbiha, bawerî û rûmeta gelan, bijîşkên şoreşger soz dane Rêber Apo bisond û peyman. Hatin pêşwazîkirin birêzdarî, coşek mezin xistin nava dilan. Bi hezarî salan Kurd têhnî bibûn bi têhna azadiyê, bi aramiyê û aşitiyê. Cîhan jî wisa bi daxwaza lehengan, rizgarkirina gelan ji destê kapîtalîst û neyaran. Ji ber ku xwîna mazlûman diherîkî wek herikîna çem û kaniyan. Daxwaza şehîdan ew bû ku gul û simbilan bide destê Mazlûman. Hesreta şehîdan, jiyanê bidin gelan. Bi dîtina her du çavan fedekarê rojêne, kar dikin şev û rojan ji bo mazlûman. Bilbil û şalûlê gelan, şehîdê rihan û binefşa destê Rêberê Kurdan. Berdevkê Kurdan, şêrê çiyayan, hêstirên her du çavên dayîkan. Bêhna gul û sosinan ket nava karwanê şehîdan. Diherikî weke Dicle û Firat stêrka Kurdan. Di şerê xwe de Rosteme bijîşkê nexweşan.

Hem bayî hem bahozî li ser serê dijminê xwînxwar. Bilbil keyfxweşe bi bedewiya xwîşk û birayan. Wek baranên biharê dibarî li ser Tendûrekê û şîn dikî hemû rengê gulan. Serhed dilgeş, Tendûrek serbilinde bi te. Sîpan û Ararat bi te keyfxweşin. Eledagê hildabû nava dilan şehîd. Ewe gula deşt û zozanan, ronahiya rojê, bîranînên xwîşk û birayan. Geşbûna li ser lêvên dayikan, rengê sorgulan, delalê li ber dilê rêhevalan, serkêş û pêşengê bazan, xilaskerê bindestan. Bi sond û peyman bi xwîna te sond xwar gelê te, dê bişopînin rêya te. Dara çinarê şîn bû li Heftenînê, deng da cîhanê. Xwîna te nayê pîvan cangoriyê mazlûman. Xwîna te rengê gulê şîn kir li welatê Ariyan. Bi hatina rojê cîhan zelal bû li keç û xortên Kurdan. Te ji bo xwe girt Rêberek meşhûr yê bi nav û deng, di eslê xwe de ji neslê Kurdan. Kesê ku yara wî nebe, mecnûne li dinê. Yara te Rêberê Kurdistan. Rûgeş û piling, şêrê çiyan. Welat bi xwîna te hat xemilandin şehîdê Kurdan, xwîna te reng da cîhanê. Te bi bawerêya xwe rêzikên Rêber Apo hilda nava mêjî û dil. Tu hertim di dilan de diyarî gula çiyayê Tendurekê, şehîdê Geliyê Zîlanê, bêhna gulên li diyarê Erdîşê. Dayika te Kurdistan, bi rengê xwedawendan. Armanca te xilaskirina dayikan, hêviya bindestan, bawerêya dilan. Hêsirên çavan, stêrka gelawêj, rêya serkeftin û azadiyê te nîşan da. Dixwînin li kelha rêhevalan, li gund û bajaran aşitî û biratî cewherê te ye li nava gelan. Wek aşûtan li ser serê zaliman dijwar î.

Heval wê şopa we bidomînin heta serkeftinê. Tuyê hertim di dilan de bimînî, tu yî awazê dayîkan. Gel te ji bîr nake lehengê mazlûman.

## Hilbijartına Serokên Şaredariyan

Meha yazdehan bû, bangewaziya partiyê ji bo gel hebû û hinek hatibûn vexwendin ku herin perwedeyekê bibînin. Yanî ew kesên hatine vexwendin yek jê heval Sefqan bû. Heval Sefqan biryara tevlîbûna partiyê da û wê demê çû Zelêya Başûrê Kurdistanê. M. Abdûla Varli ji aliyê gelê Erdişê ve ji bo serokê şaredariyê hatibû vexwendin. Hilbijartina serokên şaredariyan li Tirkiyê nêzîk bûbû. Giraniyeke zêde li ser Erdîşê çêdibû. Ev sal, saleke zehmet bû.

Gerîla li herêma Serhedê serdest bû. Germahiya hevalan li herêmê xwe gihandibû asteke bilind. Zextên dewleta Tirk li ser malbatên Kurdan zêde dibû. Germahiya hevalan li van navçe û bajarên weke Mûradiyê, Çaldiran, Erdîş, Agirî, Patnos, Bazîd, Kevirê Spi, Îdir, Xamûr, Kara Kilîse, Melezgirt, Bûlanik û heta sînorê Erziromê û sînorê Qersê zêde bûbû û danûstandinên wan bi hevalan re pêşketibûn. Di vê navberê de Sefkan ji Zelê zivirîbû. Malbata wî bi biryara ku wî dabû keyfxweş bû. Min jî biryar da ku ji partiyê re kar bikim. Min biryara xwe da. Bi roniya rêya şehîdan min sond xwar ku ezê di rêya wan de bimeşim.

M. Abdûla Varli ji Enqerê hatibû. Li Wanê berf barêya bû, nêzikî metreyekê li ser rûyê erdê qeşa girtibû. Sir û seqem, bahoz, sermayê gelek zehmetî çêdikirin. Didanên mirovan dikirin çike çik, ji sermayê li hevdu diketin û sermayê jiyan fetisandibû. Pileya sermayê daketibû bin sifirê 11'an. Heval Îsmet Erîşen bi gelek welatparêzên Erdîşî ve çûbûn Wanê ji bo pêşwazîkirina M. Abdûla Varli. Bi pêşwazîkirineke qelebalix hildan û anîn navenda Erdîşê.

Zana lawikeke biçûk bû, bi dayik û bavê xwe re hatibû Erdîşê. Ji ber nêzîkbûna hilbijartinên serokên şaredariyan bavê wî jî hatibû vexwendin ji bo serokê şaredariya Erdîşê. Zana di temenê xwe yê biçûk de zarokeke xweşik bû. Min gotê, "Tu nehatiba wê ji bo te başbûya. Te yê xwendina xwe berdewam bikira." Bersiva min wiha da; "Her ciwan pêşeroja civaka xwe ne." Yên xwînxwar û sîxûrên ku xwe xistine rengê mirovan ji xwînrijandina mirovan têr nabin. Ez bi xwe ji malbata Hecî Hokê me, ezê rêya rast bişopînim; ew jî rêya şehîdan û Rêber Apo ye.

Gelek serhildan çêbûne, lê weke şoreşa Rêber Apo tunebûne. Feraset û pirtûkên Rêber pîroz in, ji bo cîhanê bes e, ew daxwaza gelan e. Zanista Rêber Apo ku hemû gelan weke hev dibîne, ji bo Kurdan

şanseke mezine ku hatiye afirandin. Ji bo azadiya gelê Kurd yê li her çar beşên Kurdistanê zanista Rêber Apo tekane rê ye, me rêya rast dît û erkên mezin dikevin ser me. Ger em li pey şopa şehîdan û Rêber Apo biçin, wê koletiya ku li ser me hatî ferzkirin xilas bibe û ewê bibe rêya me ya rast. Bi nêrîna min di serî de azadiya gelan di wir de dît, ji bo bindestan şoreşa Rêber Apo xilasî ye. Sebra wan ji dagirkerên desthilatdar yên weke Ereb, Tirk û Faris re nîne û wê dawiyê li wan bînin. Ciwanên Kurdan di binê ala wê partiyê de civiyane ku ala PKK’ê ye. Ev rojên pîroz in ku hatine bidestxistin. Sîstemên hov xwîn rijandin. Wê rojekê were lêpirsîn, wê hesab bidin rêxistinê. Ciwanên Kurd gelek bihêz xuya dikin.” Di dawiyê de jî got, “Ezê tevlî nava refên gêrîla bibim. Em Kurd tiştên dîrokî jibîrdikin, ez sond dixwim bi xwîna şehîdan ku ezê tevlî refên gêrîla bibim.”

Dîtina min û Zana bû ew roj. Piştî demek dirêj ez jî tevlî refan bûm. Min nedizanî nasnavê wî çiye. Pişt re şehîd ket, li Lîcê tevlî karwanê şehîdan bû. Dema em li welat bûn, bi rûgeşî û devbikeniya xwe dihat naskirin, hem jî rexne li min dikir ku karê rêxistinê nakim. Lê ew çû şehîd ket û min nedît. Paşê min zanî ku nasnavê wî Şervan e. Dor li malbatê pêçandin.

Wê demê heval Rojhat û heval Tajdîn hatibûn nava gel. Her du bibûn mêvanên malbatê, gelek keyfxweş bûm. Min bi wan re cure dikir, lê tecrûbeyên her du hevalan giranbihabûn, cesareta wan pir bû. Di destpêkê de di nava gel de serdana li malbatan pêktanîn. Heval Rojhat û heval Tajdîn bi mehan li herêmê man, li nava Erdîşê û li gundên Erdîşê kar dikirin.

Leşkerên xwînmij ji bo haval Rojhat xefikek danîn, haya heval Rojhat jê tutunebû. Hesoyê Bekirî hişedarê Çelebîbaxê bû. Bi alîkarêya wî ji aliyê dewleta faşîst ve xefikek hat amadekirin. Heso xwe weke welatparêz nîşan dide, lê di bingehê xwe de sixûrê dewleta Tirk bû. Ji gundê Elcewazê, ji eşîra Bekiran bû. Navê gundê wî Arinckose, girêdayî bajarê Elcewazê bû. Bi planeke veşartî di meha remezanê de, li ser şîva remezanê bi binê tifengê li serê wî didin û ew bê libat dihêlin. Bêgiş di nava destê dijmin de dimîne. Heval Rojhat bi dehfika Heso hişyar dibe, lê tê zeft kirin. Li ser vê Hesoyê sîxûr bi muxtarêya deh salan tê xelat kirin. Malbatin me di vê rojê de hatin êşandin, tişta dewleta faşîst digot; “milîtanê PKK’ê ye.” Vê tesîreke mezin çêkir. Di Erdişê de gelek

welatparêz hebûn, ji biçûkan heta mezinan heskirina şehîdan û Rêber Apo wek germahiya jiyanê di dilê xwe de dihewandin. Heroj polîsên Tirk telefon ji zarokên welatparêz re vedikirin, li malbatê zext dikirin, moral û pîskolojiya zarokan tevlîhev dikirin. Lê nikarîbûn pêşiya ciwan û welatparêzên Kurd bigirin. Gelek diçewisandin, ji lêdanê keç û xortan, jin, zilam, pîrejin, pîremêran û heta zarokan para xwe digirtin. Wan wê hovîtiyê ji xwe re maf didîtin. Dewleta Tirk şiyar bû, li ser Kurdan ferz dikirin ku bibêjin; "Bir Türk dunyaya bedeldir." Di xwîna wan de nijadperestî hebû. Lê mîmarê vê çerxa 21'an nedihat zeftkirin. Yanî şehîdan û Rêber Apo rêya rast nişanî gelê xwe dabûn. Di milê sistema Tirkan de Kurd dihatin qetilkirin. Kurdan ev hovîtî didîtin, ji sedhezaran zêdetir bi rêya şehîdan û Rêber Apo ve girêdayîbûn û li pey şopa wan dimeşiyan.

Partiyê serokê şaredariyan paşve kişandin. Ji ber ku M. Abdûla Varli endam bû ji Erdîşê çû Anqerê. Pişt re, Salihe, Semra, Hikmet, Ûbeydulah, Farûq û pêşiya wan jî, Mehemed Zekî hatibûn girtin. Her du zavayên Cahît Basut û Ebûbekîr jî hatibûn binçavkirin. Ew bi alîkarî dayîna PKK'ê û milîstiyê dihatin gunehbarkirin.

Reşad di nava hêzên taybet yên polîsan de komser bû. Nêzî 30 kesan xist binçavan. Kesên welatparêzbûn û dikanên wan jî hatibûn girtin. Danûstandin dan sekinandin. Ji malbatê bes ez mabûm, kesek nemabû. Yên ku derketibûn ji derveyî bajarokê Erdîşê nehatin girtin. Ez li malê tenê mabûm. Diqehirîm ji êşandina dewleta faşîst, zilm û hovîtiya dewletaTirk ya ku li ser gelê Kurd dida domandin. Bi hemû rengan lêdan, tazîkirin li ser girtiyan dihat ferzkirin, ava germ bi wan de dikirin, lingên wan bilind dikirin bi daran lê didan, lingê wan li hewa girê didan, serê wan berjêr dikirin, tiştek nedima ku li ser girtiyan pêknetanîn. Ev kîna sîstemên desthilatdarên Tirk, Ereb û Faris in, ewên ku qaşo birayê me yê musilman in. Lê biratiya wan aha ev e, ji derveyî vê tişteke din nîn bû. Eger were pirsîn, ezê bi vê minakê ji herkesê re ravebikim gurên devbixwîn.

Ez di kargeha şekir de dixebitîm. Dema ji kar hatim, li cihê sekinîna tirimpêlan ji tirimpêlê peya bûm. Hevalek nêzikî min bû, min û wî hevdu nasdikir, me hevdu dît, min pirsa rewşa wî kir. Me yek du gotin kirin, lê her weke ku tiştek di binê zimanê wî de veşartî bû. Ez ketim gumanan min got, "Çiye, rewşa te pir zelal nîne, ma tiştek heye?" Got; "Birastî

nizanim çawa ji te re bêjim, birayên te ji aliyê dewleta Tirk ve hatine binçavkirin." Ez qet şaş tunebûm, min dizanî ku wê her carekê bên binçavkirin. Ji ber ku tim di bin lêgerînê de bûn. Pişt re min xatirê xwe ji hevalê xwe xwest û ez ber bi malê ve çûm. Di wê demê de ku ji berêya mehekê birayê min yê bi navê M. Zekî (ji min biçûktir e) di bin çavan de bû, ew jî hêj ji odeya êşkenceyê derneketibû. Hemû cureyên êşkenceyê li ser dabûn meşandin. Ji ava germ û kel heta ceyranê û hemû êşkenceyên ku dûrî mirovahiyê li ser bikaranîbûn û di dawî de jî gotinek yê dewletaTirk nepejirandibû.

Ji gundê Doxanciyê heval Hûseyîn ku welatparêzê gelê Kurd bû, bi hev re hatibûn binçavkirin. Ev jî bi heman êşkenceyan re rû bi rû mabû. Piştî 40 rojan her du bi hev re şandibûn girtigeha Çewlikê. Ji ber ev bûyera hatibû serê M. Zekî û heval Hûseyîn li hember agahiya hatî ez şaş tunebûm. Piştî ku ez çûm mal, min dît mala me di nava bêdengiyekê de ye. Ti kes li malê nîne, ji bilî dayika min ku navê wê Gûrciye. Min jê pirsî; "Çima kesek li mal nîne, ka birayên min?" Wê jî got, "Dema tu sibehê çûyî kargehê, hemû birayên te û keçên birayên te ji aliyê dewleta Tirk ya Faşist hatin girtin. Dewleta Tirk wiha digot: "Em birayê hevin, ji ber ku tevahiya Mûsilmanan birayên hevin." Di vê biratiyê de tenê tişta ji dewleta Tirk dihat xwestin, naskirina nasname, çand û zimanê gelê Kurd bû. Lê li şûna wê kuştina Kurdan esas girtin û rewa dîtin. Rast e, gelê Kurd bîst û neh serhildan kirine ji bo mafên xwe yên xwezayî bidest bixin, lê di komkujiyan û kuştinên nediyar re derbas bûne. Ji ber ku Kurd mafê mirovahiyê dixwazin û lêdigerin ku ev mafê mirovan û hemû zindiyên li ser rûyê cîhanê ne Yezdan ji bo wan bexşandiye. Lê tişta li xweşa wan neçûba, tiştên Yezdan jî weke maf dayî wan mirovan erê nedikirin. Di ola misilmanan de bingehek girîng heye. Lê Yezdan wekî wan ne gotiye û Yezdan wiha ferman kiriye; "Min mirov afirandin bi gelek reng û zimanan, min zimanên cuda afirandine ji bo ku hevdu nasbikin." Wan deshilatdaran tişta Yezdan afirandibû erê nedikirin. Li ser van gotinan Tayîb Erdogan ketma axaftina Yezdan dike. Hemû tişt weke ku sîstema Tirkan afirandibe, her gotina wan raste, her tişt helale ji bo sîstemên kapitalîstan. Lê di cîhanê de hemû tişt ji bo Kurdan nehelale, ji ber ku mafê xwe dixwazin û dibêjin; "em hene." Mîrovên li van xakan ji kuştin, talanê pêdetir tiştek din jiyan nekirine. Xala duwemin, xaka Kurdan pîroz û biheşta li ser dinê ye, çi Misilman çi

Xirîstiyan, çi Yahûdî, tevan çavê xwe berdane Mezopotamyaya jêr û jor ya ku warê bav û kalên gelê Arî ye. Lê dema birayê wî bigotiba, ka mafên min, wê demê dibûn armanca kuştinên kujerê wan nediyar û xwîna wan helal dibû. Bi rastî ferq nedixistin navbera zarok, keç, xort, kal û pîran. Ev tevahî di kuştinê re derbas dibûn û li gorî wan kuştina wan jî helal bû. Bav û kalan wiha ragihandine: Kurik dibeje, “Bavo dema diçim aş ku arê xwe bihêrim tu kes nikare pêşiya min bigire.” Di zivirandina xwe de zirt dikir. Bavê wî jî dibêje, “Tu li rastî gulîzeran û simbêl reşan nehatiyî.” Roja paştir dîsa diçe aş. Dayîk û bav cilên xwe diguherin û pêşiya wî diçin aş. Lê dinêrin lawik hat, hêj xwe negihandî aş dibêje; “aş dora min e.” Bavê wî dibêje; “nexêr, dora min e.” Ew û bavo hev digirin, bav wî davêje erdê, li nava çavên bavo dinêre simbêl reşe, li nava çavên dayîkê dinêre ku gulîzer e. Gotina bav tê bîra wî, paşê dayîk çend sîleyan li nava çavên wî dide. Lê dide, dinêre keziyên wê jî zerin. Bi xwe dibêje; “belê rast e, min kezî zer û simbêl reş dîtin.”

Heta niha Tirk rastî rêxistineke wiha nehatibûn. Belê, şervanên azadiyê hem keçin û hem jî xort in. Lê dawiya xapandina wan hat, şehîdên Kurdistanê û Rêber Apo, şervanên azadiyê bi gelê xwe dane ravekirin ku xapandin û defik danîna wan bêbextan wê têk biçe. Wan xwe weke gurên di postê mîhê de didan nîşankirin gelê xwe dane xapandin ku tu rastî li ba wan nîne.

Gotina demokrasî ya ji devê dewleta Tirk derdiket mîna çîroka vê çûkê ye. Çûka xapînok, ji ber nêçirvanan qaşo radibe xwe vedişêre. Serê xwe dixe nava xakê, gewdeyê xwe ji der ve dihêle. Mirov nikare bêje xwe veşartiye. Demokrasiya komaraTirk dişibe piratika vê çûka xapînok. Ev demên wisa borîne êdî nayên domandin. Vaye şehîdên gelê Kurd, Rêberê gelê Kurd; ji ber muqedesiya wan êdî dawî li xapandina dewletaTirk tê. Eger ji Kurdan were pirskirin wê tenê vê gotinê bibêjin; “Birîndar ji êşa birîna xwe dizane.” Zilm û hovîtiya dewletaTirk hîna berdewam e, xwesteka wan ya aramî û aşîtiye nîne.

Welatparazên Kurdan li Erdişê û gundên derdorê dihatin binçavkirin. Ew kesên ku di bin çav de bûn, piştî mehekê şandin Wanê. Ev kesane li Wanê bi qasî bîst rojan man. Pişt re Semra Varli şandin girtigeha Amedê, Hikmet Varli, Ebûbekir û heval Rojhat şandin girtîgeha Çewlikê. Ji xwe M. Zekî Varli jî li wir dima. Bi giştî sih kes bûn, bîst û şeş

ji wan hatin berdan. Bi hemû zordarêyên xwe li ser wan êşkenceya ku li dijî mirovahiyê ye pêk anîbûn.

Bi kurtasî, heskirina mirovan dibe xilaskirina gelan. Bi rastî jî min ev heskirina mirovan bê guman di vê rêxistinê de dîtiye. Dema ez pirtûkên Rêber Apo dixwînim, bêhna heskirina mirovan jê difûre. Rêxistina vê şoreşê bi heskirina mirovan hatiye damezradin. Bêguman ev heskirin ji hêla Rêber Apo ve hatiye afiradin û wî daye hûnandin. Gelê Kurd di nava hewildaneke mezin de ye ku layiqê vê heskirinê bibe. Rêber Apo ferman kiriye; “Dema kesek ket nava heriyê de, bes muyek yê serê wî jî bimîne, hûnê destê xwe bavêjinê û ji vê kêmahiyê xilasbikin.”

Hêza ku daye jinê navnîşana heskirana mirovan e, ev heskirina gelan li cem Rêber Apo ye. Dema ku em li despêka sîstema desthilatdariyê heta roja me ya îro dinêrin, hertim jin ji ber tiştekê ve nehatiye hesibandin. Tenê weke jina malê, her wiha xidama zilam, makîneya anîna zarokan û xwedîkirina wan hatiye dîtin. Cihê jiyana jinê tenê di malê de ye, pîvanên nenivîski yên ji aliyê malbat, şêx, mela, axa, beg, rihspî û zilamên malê ve hatibûn diyar kirin, ji bo wê derbas dibûn. Jixwe ew kedkara malê ya her rojiye, bêyî ku ti heq û destekê bistîne dixebite. Tu kesekê ev keda wê ya giranbiha nedîtiye. Belê bi derketina PKK’ê re jina Kurd jî çavên xwe li jiyanê vekir. Ji ber rêz û rûmeta Rêber Apo dayî jinê, ev bawerî pêş ket. Heskirina bi hezaran keç û dayîkên Kurdan jê re çêbûn, bi hezaran keçên Kurdan tevlî tevgerê bûn. Ji wan bi hezaran şehîd ketin. Ji ber ku Rêber Apo azadiya jinê weke azadiya welat dibîne û dibêje; “heta jin azad nebe welat jî azad nabe.” Rêber Apo hevaltiyek rast bi jinê re kir. Ji bo jin têkoşina azadiyê bidin û xwe bikin xwedî vîn û perwerdeyek baş. Ew hevalên ku di perwerdeya Rêber Apo re derbasbûyîn, gelek ji wan bi qehremanî şehîd ketin, gelek ji wan jî hîna jiyan dikin têkoşîna azadiyê dimeşînin. Jinên ku rast heskirina Rêber Apo fêmkirin, bersîvên mezin û çalakiyên pîroz pêkanîn. Nimûneyên weke Heval Zîlan, Heval Sema, Heval Ronahî, Heval Berîvan, Heval Zekiye, Heval Meryem, Heval Zinarîn, Heval Ezîme, Heval Nûda, Heval Viyan û Heval Çiçek’an pêşengî û qehremaniyên mezin kirin. Artêşa jinê bi wê evîna xwe ya mezin ava kirin. Jin di nava xebatên rêxistinî, cîvakî, siyasî û leşkerî de bûn xwedî gotin û seknek bihêz. Cardin mirov dikare beje, êdî dikarin biryarên di derbarê jiyan û pêşeroja xwe de bidin. Bibin xwedî erk û berpirsyarêyên siyasî. Bûyîna

pêşeng hişt ku kesên li hember wê heskirin û rêzdariyê nîşanî wan bikin. Jina Kurd di nava civak, welat û netewan de bi qehremanî û bi berxwedana xwe hate naskirin. Bi girêdan û heskirina rast ya li hemberî Rêbertiyê jina Kurd xwe gihand nirxên herî pîroz û giranbiha. Jina Kurd bû xwedî ziman, nasname, çand, wêje û dîrok. Jixwe, xwe perwerdekirin û xwe gihandina perwerdekariyê xaleke sereke bû. Li xwezayê û xweşikbûna xwe ya cewherî veger jî pîvanek biwate ye. Dilsozî û girêdana bi Rêber Apo re, pîvanên azadiya zayendan bingeh digirin. Her dem armanca sereke serkeftin bû. Rêber Apo tevahî jiyan xist warê perwerde û hîndekariyê. Ji bo ku mirov şev û roja xwe bide perwerdeyê, bibername be û vale jiyan neke kedek mezin dida. Heskirin û rêzdari li ser her tiştî re bû. Dilsoziya bi têkoşîna azadiya jinê re bi heskirina ji dil pêktê. Heskirin rastiye, serkeftine, fêrbûna jiyana raste, hevaltiye, pêşketine, azadiye, yekbûn û gihiştina pêşerojek azade, jiyane. Bê heskirin jiyan, pêşketin, fêrbûn, serkeftin û azadî nayê bidestxistin. Rêber Apo dibêje; “xebata min ya ji bo jinê di nîvî de maye.” Divê em temambikin û daxwaza Rêber bi cih bînin.

Em hinek behsa zextên dewleta Tirk û hovîtiya dewletaTirk yên li ser mamê Hesen û hevalên wî bikin.

Temenê mamê Hesen zêdetirî 70 sal bû. Li gundê Eqsê dima. Bi taybet ev gundê ku min navê wî gotî welatparêz bûn. Mamê Hesen pêşiya xwe baş nedidît, xwe li ser gopal digirt, nedikarî bê gopal bimeşe. Ev gund gundeke li Geliyê Zîlanê, girêdayî bajarokê Erdîşê bû. Ji ber wê jî dixwestin gundiyan bidin çewisandin. Bi hovîtî û zilmeke giran bi ser mamê Hesen de çûn ku hema tiştekê pê bidin qebûlkirin. Xwesteka dewletê ew bû ku mamê Hesen bixistina helîkopterekê ku li ser xwe îfade bide û bi wê hecetê jî wî bigirin. Bi vî awayî li qereqolê êşkenceyek bêhempa lê kirin û mamê Hesen jî xwe li ber nedigirt. Paşê kirasekê bêmil û derling lê dikin û wî dibin gund. Lê nikarîbû bimeşe. Bi alîkarêya cehşikan peyayî erdê dikin û davêjin nava heriyê. Li wan deran neviya wî ji xwe re di nava zarokan de dileyist ku dibîne pîremêrek di nava heriyê de ma ye. Diçe temaşe dike, dibîne ku bapîrê wê ye û dike qêrîn. Wextê bapîrê xwe wisa dibîne xwe davêje himbêza wî, zarîn dike û dest bi girînê dike. Li wê derê bi qêrîna keça porzerîn re dayîka porspî derdikeve ji der ve, dinêre mamê Hesen di rewşeke perîşan de ye. Dema dibîne di nav heriyê de ma ye, dilê wê dest bi şewat û girînê dike.

Leşkerên Tirk û cehşikan bi hev re destê mamê Hesen digirin û dibêjin: “Cihê ku te li helîkopterê xistiye nişanî me bide.” Mamê Hesen, qêrîn, hewar û zarîn dike û dibêje: “Çavên min nabînin, min çawa li helîkopterê xistiye?” Paşê mamê Hesen vedigerînin qereqolê. Wexta dizivirînin davêjin zîndanê û nêzikî 15 rojan di zindanê de dimîne. Gelek êşkence lê dikin. Ne xwarin û ne jî vexwarin dabûnê û bi rewşa xwe ya kalbûnê ve gelek serma hildabû. Dema berdan hat malê, ket nava cihan û piştî demekê çû ber dilovaniya Yezdan.

## Qela Elo

Sal 2000, dawiya heyva nehan bû. Hevalê Botan bi alîkarêya Şêroyê şivanê gund dixwaze derdor nas bike, ji xebatan re zemînê ava bike. Dema behsa min dikin, şivan dibêje, ez dinasim. Heval Botan hatibû Eledaxê. Heval Botan ji xelkê Şemzînanê bû. Heval Botan her tim bi zimanê xwe yê ew qas xweş û şirîn dihat nasîn. Bi rihê hevaltiyê, hevparî û fedakariyê, bi rihê wî yê Apoyî weke mamosteyeke rûgeş dihat dîtin. Bi rastî keseke leheng bû, xwedî şeref bû, bi wî awayî dihat nasîn. Di piratîka xwe de herdem weke nimûne dihat dîtin. Dema heval Botan derbas dibe notekê dide şivan. Di wê notê de gotibû; "Ezê heta dilopa xwîna xwe ya dawiyê bi vê tevgerê ve girêdayî bimînim, ji ber ku ev tevger hêviya hejar û bindestan e, xweziya ji canê min zêdetir tiştek din hebûya, min di vê rêka bişeref de bidabûya. Ji ber ku vê rêxistinê berdêlên mezin dane û bi hemû nirxên xwe yên giranbiha jiyan daye afirandin. Mamê Mela ez dixwazim em bi hev re kar bikin, eger tu dixwazî were qela Elo, em hev bibînin."

Heval Botan di sala 2003'yan de li Xinêre ji ber êşa dilê xwe şehîd ket. Ez di wê baweriyê de me ku eger mirovek bêje ez xwedî şeref û namûs im, wê li hember wan mirovên feqîr û bêgûneh yên di nava agirê zaliman de dişewitin bê helwest nemînin. Ez bi vê notê yan jî bi nameyê pir keyfxweş bûm. Wê zivistana derbasbûyî min heval nedîtibûn. Cihê ku ez biçûbamê, min ziyareta wan bikira min nedizanî. Herêma Qela Elo berfireh bû, lê di nameya xwe de cihê xwe venekiribû. Şivan ji min re got; tu werî wê gelek baş be. Em li tirimpêlekê siwar bûn û çûn Geliyê Zîlanê. Li wir min heval Gabarê Batmanî ku li wê derê bi navê Şivan dihat naskirin dît. Ji min re da diyarkirin û dihat xwestin hevalê Botan bibînim. Min axaftina heval Şivan erêkir, ez bi Şivan yanî heval Gabar re meşiyam. Min di meşe de gelek zorî û zehmetî kişandin. Em bi qasî pênc demjimêran meşiyan. Demekê em di nava taritiyekê de man, gund jî di nava bêdengiyekê de bû, lê xurxura esîman bû. Dengê ewran mirov ditirsand. Rêya me hemû evrazî bû, bi ber bû, bi dar û bi daristanan hatibû dorpêçkirin. Piştî meşeke dirêj, seyên şivanan em dîtin û êrişî me kirin. Şivanekê ji hevalê xwe re got; "Seyê xwe bide sekinandin, ne biyanîne, heval in." Şivan xwe gihand me, bi destê heval Gabar girt û got: "Hêviya gelê bindest in, PKK hêvî û bawerêya gelên perişan e." Van

gotinan bi mirovan dida fêmkirin ka hevaltî, welatparêzi û sozdayîn çiye. Şivan got; "li gorî min ji wan re tê gotin pêşengê gelan. Di nava gelan de, di aliyê ziman û çanda gelan de tu cewaziyê naxin navbera reng û rêgezan. Evane lehengên şoreşger ên Apoyî ne, hem keç in hem xort in, çi cewazî nexistine di navbera wan de. PKK hatiye hûnandin bi her du zayendan, bi yek navî tê nasîn, yanî gerîla. Ew ferqa di navbera zayendan de Rêber Apo da rakirin. We navê şoreşgerên Apoyî li ser Kelha Memê, Çarçela, Heftanîn, Agirî, Sîpan, Dêrsim, Botan, Qendîl, Serhed û her çar parçeyên Kurdistanê, li cîhanê bi pênûseke bi xwîna şehîdan reng girtiye û bi zanyarêya Rêber Apo da nivîsandin. Feraset û felsefeya rêxistina Apoyî we bi gelên Rojhilata Navîn da nasîn. Karker mezinên gelan in." Şivanî destur û xatir ji me xwest û çû ser rêya xwe.

**Dîtina Heval Botan**

Ez, heval Gabar û Şêro gihiştin tivingê. Piştî ku heval Gabar sê fîtik lêdan hevalan jî bersiva me bi fîtikan dan û em gihiştin gel wan. Hevalan em bi germahî û xweşbînî pêşwazî kirin. Êdî nîvê şevê bû, me serê xwe danî û em razan. Bi şefeqê re em rabûn, piştî taştê xwarinê heval Botan got; "hûnê sê rojan li vir bimînin." Min got; "baş e, ezê hinek bi we re bidim û bistînim, wek perwerdeyekê." Du rojan min perwerde dît, ev perwerde ji aliyê heval Botan ve hat dayîn. Min fêmkir ku di vê şoreşa giranbiha de danîna pîvanên wek wekhevî, biratî, aşitî, aramî û demokrasiya gelan, daxwaz û xwesteka Rêber Apo ye. Ji bo Kurdan, Ereban, Tirkan, Farisan û cîhanê. Piştî dem derbas bû heval Botan ev ders dan min. Piştî xwarin û vexarinê min destur ji heval Botan xwest ku ez biçim malê. Me bi hev re heta payîza dereng kar kir. Cardin min ziyaret kir, min encama karê xwe pê re parve kir. Piştî sohbetan min nêrina xwe jê re vekir ku ez biçim dîtina Medînê û Mekehê. Destur ji min re hat dayîn, me xatir ji hev xwest û em ji hev veqetiyan. Heval Botan notek da min ji bo ku bidim hevalên li Medînê, da ku li min xwedî derbikevin. Dema ez hatim malê min karê rêwitiya xwe da destpê kirin, derfetên rêwitiya min derketibûn.

Ez ji wir çûm Enqerê, min karê xwe pêkanî. Paşê birayê min Mela Abdûla bi min re hat balafirgehê ku ez ber bi Mekke û Medîneyê ve biçim. Lê birayê min Ûbeydûlah jî bi min re hatibû, berêya ku ez siwar

bibim me xatir ji hev xwest û ez bi rê ketim. Piştî çar demjimêran em gihiştin Medîneyê, em li balefirgeha wê hatin xwarê. Bi min re telefon hebû, min telefonek ji bo kurê xaltika xwe vekir. Ew hat û ez ji balefirgehê birim mala xwe. Bi qasî sê rojan bûm mêhvanê wan. Pişt re ez birim mala partiyê. Li vî cihî hinek heval disekinîn, heval Azad li wir amede bû. Min nota ku heval Botan dabû min da heval Azad. Piştî xwendina notê ji min re got; "tu bixêr hatî heval Hecî." Gotina wî ji min re ew bû ku "emê pişt re baxivin û ezê paşê bersivê bidim te." Paşê heval Azad got; "li cem me bimîne, lê tu wê kar bikî." Min xwesteka hevalan erêkir. Lê min bawer nedikir cardin heval Azad bibînim. Dîtina wî bû nesîbê min. Li Balayanê me hevdu dît, lê nexweş bû, bi nexwaşiya şekirê ketibû.

**Gotina Jina Ereb**

Taxekê bi navê taxa Kurdan hebû ku dihat gotin ji berê de, ji dema Hz. Elî û vir ve hatiye binavkirin. Piştî em çûn wê taxê şûnde, min û mela Şefîqê Wanî li taxa Kurdan di nava gel de dest bi xebatê kir.

Carekê em li rastî jinek Ereb hatin. Jina Ereb li me meyzand, ber bi me ve hat û got; "Xwedê alîkarêya Apo bike. Selahedînê duyemîn e, bi heskirina Xwedê wê, we ji bindestiyê xilas bike, wê me jî xilas bike. Xwaziya we ez jî tevlî şoreşa Rêber Apo bikirama." Keçikeke biçûk di destê wê de bû, min ji mela Şefiq re got; "ka bipirse tu çima ew qas ji Rêber Apo hez dikî." Dema mela Şevfîq ev pirs jê kir jinikê wiha got; "weke rojê ye, ronahiya wî di dilê hemû mirovan de heye, di dilê min de jî wisa ye" û meşiya çû. Ew gotin hemû wê jina Ereb gotin. Min ji Mela Şefîq pirs kir ku ka ewê jinê çi got Ji min re ew axaftinên jinê bi Kurdî werger kirin. Birastî min nizanîbû ew qas Kurd li wir hene, min bawer nedikir ku jê re bê gotin taxa Kurdan û min bawer nedikir ku navek bi vî rengî hebe. Ji min re weke gundeke Kurdan dihat. Weke gundeke Geliyê Zîlanê. Bi zimanê dayîka xwe ve girêdayî bûn, dawetên xwe bi stranên Kurdî û dîlanên Kurdî dikirin. Di kolanên Medîneyê de bêhna Kurdistanê dihat, dema min ev tişt didîtin, rondikên min dihatin xwarê. Rengên zer, sor û kesk li vir weke zêr dibiriqîn ku Kurdistan li bîra mirovan tanî. Bi taybet bi şoreşa Kurdistanê ve girêdayîbûn. Di nava lêvên wan de navê Rêber Apo derdiket. Zarokên ku hêj nû nû fêrî axaftin û rêve çûyînê

dibûn, bi her du tiliyên xwe nîşana serkeftin û aşitiyê didan. Ez di nava gel de digerêyam û karê min di taxa Kurdan de bû. Ne tenê Kurd bi vê şoreşê ve giredayî bûn, Ereb jî girêdayî şoreşa Rêber Apo bûn. Bi zimanê xwe girêdana xwe didan diyarkirin. Her wiha danûstandina wan bi hevalan re pir xweşik bû. Ez jî bi wan ve hatim girêdan. Min qet nedixwest ji heval Azad û wî cihî qut bibim û ew rojên ku min li wir derbaskirin hemû hîna li bîra min in.

## Dîtina Hevalan

Dema ku ez ji Mekehê zîvirîm Medîneyê min xwest bizivirim welat. Min daxwaza xwe ji heval Azad re vekir. Got; “baş e.” Di navbera çar pênc rojan de ez zivirîm malê. Hevaleke min hat serdana min û notek ji min re anî. Got “ev not berê çend rojan ji te re hatiye şandin.” Min da destê xwe û jê re got; “ka were em herin odeyê ji min re bixwîne.” Hevalan tê de gotibûn; “dema te not girt, tu me bibînî wê gelek baş be.” Min şivanê gund Şêro dît, dîsa çûm Geliyê Zîlan. Ez, Gabar û Şêro bi hev re ketin ser rêya Kelha Elo, bihewaketina gimika Kelha Elo pir bi zehmet bû, lê em hêdî hêdî ber bi gimikê ve diçûn û kêm mabû. Ez û her du hevalên xwe di serê kelhê de rûniştin. Heval Gabar fîtikek lêda, tu kesî dengê me nebihîst. Cara duyem lêda, bersîva me bi fîtikê hat dayîn. Em gihiştin gel hevalan, li gel heval Çetîn.

Ji bo pêkanîna hinek pêwîstiyan em hinek axivîn, lê me biryar da ku di navbera me de danûstandina bi telefonê çênebe. Ji ber ku telefon dihatin guhdarkirin. Lewma min daxwaz kir ku ger tiştek bê xwestin bi têbiniyan binivîsin û rêkin. Li ser vê mijarê em gihiştin fêmkirineke zelal. Em nezî 4-5 demjimêran li gel hevalan man, me xatir ji hev xwest û ketin ser rêya vegerê. Lê belê dûrketina ji hevalan gelekî zor û zehmet bû. Li gorî min ji hevalan dûrketin weke mirineke bêwext bû.

Karê partiyê dihat meşandin, dihat xwestin ku pere ji gel neyê standin û ev biryara partiyê bû. Li cihê wê çareserî were afirandin. Ez bi karên DHP’ê ve têkildar dibûm, ji aliyê din ve bi çiya ve girêdayî bûm. Di nava gel de weke melayekê dihatim nasîn. Di DHP’ê de min, M. Kemal, M. Mahmûd Çelebî, Mihemed Sedîq Geçer, Cevdet Balikçi, Cevdet Avci û Muhtula Dagê bi hev re kar dikir. Ez û heval Muhtula berpirsyarê aborêya DHP’ê bûn. Min û hevalê xwe me hinek nirxandin kirin.

Aborêya partiyê gelek di zoriyê re derbas dibû û em difikirîn ka emê bi çi awayî aborêya partiyê pêk bînin. Tê zanîn ku her kar bi aboriyê tê birêvebirin, bi hevalan re piştî gelek guftugoyan em gihiştin biryarekê ku em ji gel bixwazin. Me bi gelek welatparêzan re axaftin kiribûn, ew jî tevlî nêrîna me bibûn ku ew xwesteka me bi navê zekatê were pêkanîn.

**Şehîd Botan Û Şehîd Gabar**

Di mislê we de min nedîtin şêr û egît ey xort!
Kurdistan nû da avakirin bi xwîna keç û xort

Hûn milîtanên şehîdên rengê gulên şîlanan
Hûn wek kanî û çeman diherikin barana biharan

Tirsa we li ser dijmin, hejandin dilê wehş û haran
Wek ba û bahoza zivistanê çûn li ser dijmin û neyaran

Şehîd Gabar hertimî hûn jîn in di dilê dayîk û birayan
Axîn dikim, xwîn ji kezeba min tê şervanê gelê Ariyan

Bilbilê ji ber dengê we yê şirîn rondik dibarandin bi xwîn
Geliyê Zîlan bi axîn û nalîn ji we dûr ketin û dizarin

Şehîd Botan bi keyfxweşî şopand rêya Mazlûm Doxan
Xwezî rojekê bihatibama serdana pakrwanên hêja

Şalûl û zanyarê Kurdistanê şehîd Botan
Bila hertim rûyê we geş be, we jibîrnakin tu caran

## Parastina Gelekê

Niha ez dixwazim li ser pirtûka Rêber Apo ya bi navê “Parastina Gelekê” hinek tiştan bibêjim. Di serî de jî berî ku ez hinek tiştan bibêjim, pêşniyar dikim hemû kesên Kurd vê pirtûka pîroz bixwînin. Yanî ez ferz dibînim ku her kesê Kurd vê pirtûkê bixwîne. Çawa ku nan û av pêwîstiyên ji bo mirovan yên di rojê de neçarin ku pêk bînin in, pêwîste xwendina vê pirtûkê jî bi vî awayî were dest girtin. Me berêya niha jî dabû diyarkirin, dema mirov bi kûrahî li dîroka Kurdan dinêre, wan êşên pir mezin kişandine. Lê dema mirov dixwîne vê rastiyê hîn baştir dibîne. Ji ber ku dewlemendiya xaka welatê me Kurdistanê zêdeye, her tim cîranên derdor çav berdane xaka wê. Welatê ku ew qas delal û şirîn, mîna biheştê ye. Ev jî bûye sedem ku xaka vî welatî bibe qada şer. Dema ku em bi kurtî li dîroka Kurdistanê binêrin, dibînin ku 29 Serhildanên Kurdan yên pîroz çêbûne. Ya ku herî li ber xwe da û wê li ber xwe bide, her wiha ya herî zêde li hember zilm û zordariyê xweragir bûye û li ser piyan maye, tevî hemû îxanetên hundirîn û derve, şoreşa Rêber Apo ye. Bê guman hemû serhildanên Kurdan jî ji bo azadiya Kurdan çêbûne, her çiqas di hin serhildanan de berjevendiyên kesî, desthilatdarî li pêş bin jî karaktereke Kurdî jî her hatiye dîtin. Ji lewra hemû serhildan bi tundî hatine çewisandin. Ji lewra li her çar parçeyan serhildan û raperînên hatine pêkanîn pîrozin.

Belê, piştî ku tevgera Rêber Apo hat naskirin dewletên Tirk, Îran û Ereban roj bi roj zext, êşkence û qirkirinên xwe li ser Kurdan hîn zêdetir kirin. Bêguman sedema vê yekê tirsîna ji ramanên Rêber Apo ye.

## Pêvajoya Salên 2oo1- 2oo2’an

Nêrîna heval Botan ew bû ku ger ez biçim û perwerdeyekê bibînim, wê ji bo min gelek baş be. Hem jî bi vî awayî dê serdana hevalan bikim û wan bibînim. Min ev daxwaza heval Botan di cih de dît û erê kir. Min heta payîza dereng karê xwe yê di nava partiyê de berdewam kir. Heval Botan herdem behsa hevalan dikir, dixwend û bi rêzê ve digot; “bawerim ku hûnê heval Cûma bibînin, silav û rêzên min bigihînin heval Cûma û tevahiya hevalan.”

Ez dixwazim ji we re mamê Eliyê kurê Silêman bidim naskirin ku bû rêhevalê rêya min. Komek şoreşgerên Apoyî tên gundê bi navê Keçelan (Mûsabegê) a girêdayî bajarokê Xamûrê ya bi ser Agiriyê û li mala Zûrbe dibin mêhvan. Ev kom ji 14 hevalan pêk dihat. Lê Zûrbe sîxûrî ji dijmin re dikir û ew bi sedan leşkeran bi tob û firokeyan tîne ser hevalan. Hevalan bi qehremanî şer kirin û 12 heval şehîd ketin. Du ji wan xilas bûn. Şehîd heval Subhan jî di nava wan 12 de şehîdan de bû. Navê wî yê malê Mehemed bû, navê dayîka wî Sebîhe, navê bav Eliyê kurê Silêman bû û ji gundê Arinc-Kusê, ji bajarokê Elcewazê bû. Min û mamê Eli gelek ji hev hezdikir, dema em digihan gel hev, ger ziman bisekinîba jî dîsan em dizivirandin li ser şoreşa Rêber Apo. Ji ber ku şoreş her tim di nava mejiyê me de hatibû stirandin, bûbû xweşiya mêjiyê gelan. Her tim li bîra me bû. Demek pir dirêj bû me hev nas dikir. Her digot; "xwezî min heval Subhan bidîtiba", lê min dizanî heval Subhan şehîd bûye. Heval Zeynel Abidîn ji gundê Şahbazara giredayi Geliyê Zîlane, navê bavê wî Şêx Sidîqe, navê dayika wî Kemaliye ye. Wî şehîdbûna heval Subhan ji min re gotibû. Min dizanî, lê min ji mamê Elî re nedigot, ji ber ku partiyê şehadeta heval îlan nekiribû. Rojekê ji min re got, "ger tu bixwazî ji me re destur bigire ku em bi hev re serdana heval Subhan bikin." Min her jê re digot; "tiştek ji destê min nayê." Lê min daxwaz û hêviyên mam Elî ji heval Botan re ragihandin. Heval Botan jî mam Elî ji dûr ve nas dikir. Carekê got; "Ji mam Elî re bêje, ger bixwaze bila were serdana hevalan bike." Min vê gotina heval Botan gihand Mamê Elî û min got; "Di demekê kin de were em biçin serdana Subhan." Mamê Elî ev gotin got; "ji ber ku daxwaza min pejirandin, ez di serî de li beramber şehîdan bejna xwe ditewînim, spasî û minetdarêya xwe pêşkêşî Rêber Apo û hevalan dikim."

Min piştî deh panzdeh rojan heval Botan dît û min mijara mam Elî jê re vegot. Heval Botan jî got; "ezê têbiniyekê bidim we ku hûn pê herin serdana hevalan." Têbiniya heval Botan piştî du mehan gihişt destê min. Wê demê karê heval hebû û çû, lê got ku; "ezê telefona heval Mehsumê Mêrdînê bişînim." Ez bi tena xwe zivirîm û hatim malê. Dema ez gihiştim malê, min ji hevjina xwe re got, "ez rêwiyê biheştê me." Bi qasî du mangan mam. Tiştên ji bo min dihatin xwestin hevalan şandibûn. Rojekê pîroz bû, wê rojê li malê mam û pişt re min ji hevjina xwe re got; "êdî divê di sibehê de mam Elî bibînim." Paşê min mam Elî

dit û min jê re got; "dem hatiye, emê biçin." Mam Elî jî got; "de ka têbiniyê bide min ezê hilgirim, tuyê winda bikî." Bi vî awayî têbiniyê ji destê min girt. Bi du rojan şûn de em ketin ser rêya ziyaretgehê ku qiblegeha Kurdan e. Jixwe bav û kalan gotine; "cihên bilind, cihê bicih hatina niyazane." Me jî dixwest niyaza me were pejirandin.

Em li tirimpêlekê siwar bûn, ji Erdîşê berê me ket bajarê Ûrmiyê. Li van çiyayan rêhevalên Rêber Apo hebûn. Li van çiyayan diman, xwendin û perwedeya gêrîlatiyê li van deran ditîtin û ew zarokên Kurdan yên qehreman û cangorî ne. Dema em li kêleka Gola Wanê re derbas dibûn pêlên deryayê mizgînî didan me, ji dengê pêlan dihat fêmkirin ku digotin; "silavên me jî bigihînin hevalan. Ew kevokên aşitiyê ne." Ew qas sar û seqem bû, lê li me tu bandorê nedikir. Min rewşa mam Elî pirsî. Got; "berê min ketiye çiyayan, ezê çawa bicemidim? Çiya vîna gelê Kurd e." Birastî jî ev çiya bi bedewiya şervanên Rêber Apo hatine xemilandin. Heskirina wan dilê herkesê şewitandiye, ew mûma jiyana Kurdan in û emê serdana wan hevalan bikin. Ma wê ev evîn û heskirin çawa bihêlin em bicemidin!

### Hatina Heval Mehsûm

Me xwe gihand Ûrmiyê û em li mêhvanxaneya Xoremê bicih bûn. Piştî rojekê min telefon li heval Mehsum kir û jê re got; "ger we bibînim wê gelek başbe, cihê em lê radiwestin jî mêhvanxaneya Xoremiyê ye." Piştî du demjimêran heval Mehsum hat gel me. Gelek bi keyfxweşî em pêşwazîkirin û li ser kursiyekê rûniştin. Piştî me keyfxweşî da hev min jê re got; "eger hûn destur bidin, dixwazim sedemê hatina me bi we re parve bikim." Got; "belê keremke." Min got; "em ji bajarokê Erdîşa girêdayê Wanê hatine. Ez ji bo perwerdê hatime, hevalê min jî ji bo serdana hevalan bike, paşê jî ger pêkan be serdana heval Subhan bike hatiye." Di vê navberê de min têbînî ji mam Elî xwest. Li ser xwe gerêya, lê mixabin nedît. Em her du jî cemidîn, weke ku ava sar bi me de bikin, em qerisîn û man. Ez hizirîm ku lêgerîna tişta ji dest mirovan ketî deryayê şaşe. Dema heval Mehsum ev rewş dît gav paşde avêt. Dîsa min daxwaz kir û armanca serdana me biberfirehî vekir. Ji min zêdetir mam Elî bêgêwil bû. Ji ber ku têbiniya heval Botan dayî me winda kiribû. Min ji heval Mehsum daxwaz kir û min got; "em du pîrin, ger hûn rewşa me li

ber çavan bigirin û me bişînin emê keyfxweş bibin.” Got; “zor e, lê dîsan jî ezê hewl bidim ku we bişînim.” Mam Elî ji ber em neçûn Dola Kokê li gel hevalan, bêgêwiliyek pir mezin û bêzariyek giran dikişand. Ez jî wek mam Elî xemgin dibûm, lê çare nemabû.

### Em Li Benda Bersiva Heval Mehsûm Man

Em li benda bersiva daxwaza xwe bûn, lê neyê jibîrkirin ku windabûna têbiniya me bi serê xwe pirsgirêkek mezin bû. Heval Mahsum ji Mêrdînê bû, cara duyemîn bû me hev didît. Bersîva daxwaza me hat, ji ber tunebûna desturê, daxwaza ma nehatibû pejirandin. Lewma xiyalên min tev di avê de çûn ku min ew qas dixwest biçim Dola Kokê, lê ev daxwaza min nedihat pejirandin.

Her çi qas kêmahiyên me hebûn jî, lê em bi dîtina hevalan gelek dilxweş û şanaz bûn. Hêvî û daxwaza me du kesên bitemen bû ku em havalan bibînin. Em diqehirîn û digirêyan, rondikên me dihatin xwarê. Min ji mam Elî re got; “ger mirov bihêvî û bawerî be, wê her rojek were ku mirov bigihêje armanca xwe. Pejirandina kêmasiyan nerast e.” Piştî çend rojan me hêviya xwe ji heval Mahsum birî û em zivirîn mala xwe. Piştî zivirînê ez gelek xemgînbûm, ji ber ku min silavên şehîd heval Botan negihandin heval Cûma. Min bi van hevokan kedera dilê xwe ya nedîtina heval Cûma anî ziman.

### Ji Bo Heval Cûma

Evînê ez sewdakirim, jiyana dilê min hejandin nûra çavan. Li min winda kirin, bêhal hiştim, keyfxweşî nema di rûyê min de. Dikim axîn û figan, deng nagihêje çirûska dilan. Rondik nema di çavên min de, perîşan mam li van çolan. Evîndarek pir hêja, tu dilê Kurdan, ziman şirînî gula çiyan. Bejindirêje wek çinara devê geliyan, gul binevşa li Qendîlan, pir henûne dildarê keç û xortan. Germahî û geşbûna şer û cengan, bazê serê çiyayan, rênasê Ariyan. Li min nema jiyan, dilê min birîndare bi derba şûran. Siwarkirin li tirimpêlê, nehiştin bibînim nûra dilan. Nêrîna we pir dijware, korkir her du çavan. Çi evîndareke reng xweşik, zarîn û nalîn ji min diçe bi kelecan, ez hildam, min nedît sorgula yaran. Şemalê çerxa bîst û yekan, reng zêrîn, şervanê hêja. Birîndar kir gewdelaşê min,

şewitand dilê belengazan. Daxwaz û armanca min dîtina birêz Cemîl Bayiq e. Ji bo min giyan û jiyan e, dibiriqe, reng yaqût e mamosteyê gêrîlayan. Mamoste lawê bargiran e, reng cewher e, stêrka gelavêj e. Biriqandina agirê azadiyê ye. Di destpêkê de rêhevalê Rêber e, mehbûbê rast e, rênasek bêhempa ye.

Ji rastiyê re rêzdar e, rêhevaleke nazdar e, nazenîne reng beybûn. Nav zelal e, jiyana dilan e, xweşik e û rê nîşanker e. Heval Cûma gula şervanan, zanyarê rengbedew e, bilbilê kalan e. Min nedît di nava bax û bostanan de, bazê li serê Kêla Memê. Lê berhev dibin şalûl û bilbil û rihan. Rengê xwe mîna Kawa ye. Evîna dildaran, nazikê Ariyan. Te li min şewitand kezeb û dil, heskiriyê zarokên Kurdan, defter û pênûsa destê mazlûman, xûnava biharan, şînahiya daristanan, baz egîdê Xinêrê, awazên çemê Geliyê Zîlan. Pênûsa destê keç û xortan gula narin dixwîne, dinivîse bi hubra xaniyan, qelemşore şoreşgerê Kurdan. Zanyar, rewşenbîrê gelan, evîna Kurdan.

Di sala 2002'an de min karê partiyê dikir. Tevlîbûyîna gêrîla ya keç û xortan li Geliyê Zîlan pir zêdebû. Di wê salê de tevlîbûn di astek bilin de bû. Kurê xalê min Silêman tevlî refên gerîla bûbû. Xalê min gumanê ji min dikir ku min kurê wî tevlî refên gêrîla kiriye. Bi ser min de dihat. Di dawiyê de li Erdişê ez dame lêdan. Bi xwe û hinek din jî alîkarêya wî kirin. Bi tundî bi ser min de hatin, aqil di serê wan de nemabû. Bi daran li serê min dan heta bikevim erdê. Wê demê temenê min şêst û du sal bû, ez li binê daran bi xwe ve çûm. Pişt re malbatê bihîst û bi hawara min ve hatin, ez birim nexweşxaneyê. Bi qasî heft rojan di nexweşxaneyê de mam, pişt re ji nexweşxaneyê derketim. Polîsan ji min pirsîn gotin; "Kê li te daye?" Min got; "Ez nizanim, ji piştê ve li min xistin, lewma min nedît ka kî ne." Piştî lêpirsînê ez çûm malê. Paşê min banî xalê Silêman kir û min jê re got; "were ez û tu li hev bên." Wî daxwaza min ne pejirand û nehat. Lê nizanîbû doza min û ya kurê wî yeke. Ez çûm mala kurê mamê wî Ehmed. Ez wisa fikirîm ku ezê vê rewşê ji wî re bêjim, dibe ji me re bibe alîkar ku ez û xalê Silêman li hev bikin. Tiştek wisa mezin di navbera me de nîne ku çareser nebe, lê wî li pey min de xeber û gotinên nexweş jî dikirin. Di derbarê rewşên bi vî awayî de gotinek ya bav û kalan heye, dibêje; "golikê malê ji gayê malê natirs e."

Navê kurê xalê min Şakir bû, di nava hevalan de jî nasnavê wî Demhat bû. Di sala 2005'an de li Behdînanê tevlî karwanê nemiran bû. Li ser gilîkirina xalê Silêman dewletaTirk bi ser min de dihat, zext li min dikirin û êş bi min didan kişandin. Derdor li min hat girtin, êdî min zehmetî dikêşandin, ez ketim rewşeke pir zor de.

**Çûyîna Wanê**

Ez ji bo civînekê ji aliyê partiyê ve hatibûm vexwendin û çûm Wanê. Min serokê şaredariya Wanê ji dûr ve nasdikir. Lê belê xebatkarê partiyê bû, yek du caran me hev ditîbû. Serokê şaredariya Wanê dihat rexnekirin. Ji ber ku kêmasiyên wî gelek bûn navbera wî û navendê tine bû. Serokê şaredariya Wanê di têkiliyên xwe yên nepaqij de dihat rexnekirin, ji ber wê jî dilê min jê sar bûbû. Min zêde jê hez nedikir, nexweşî di navbera wan de her berdewam dikir. Di salên 2002-2003'an de, ji bo civînekê ya partiyê bi hinek hevalan re çûm Wanê. Wê êvarê li Wanê mabûm. Wê êvarê me bi hevalên ku em bi hev re ji Erdîşê hatibûn re dem derbaskir. Dema razanê em li cihê bêhnvedanê rûniştibûn, xebatkarê razanxaneyê gazî min kir û got; "mêhvaneke te heye." Ez çûm, min temaşekir, xortek li wir rawestiyaye. Min jê re got, "Keremke." Bersiva min da û got; "Şihabedîn Ozaslaner (serokê şaredariyê) gotiye eger heta mala me were, wê baş be." Ez û hevalê xwe yê bi navê Cewdet rabûn çûn mala wî, me li derî da. Şihabedîn derî li me vekir got; "keremkin hevalno."

Ez neşaşbim Cewdet ji Erdîşê bû, yan jî ji Filistana Elcewazê bû, min kêm dinasî. Piştî keyfxweşî da me, em rûniştin. Nêzikî neh deh deqiqeyan min lê nêrî yekê li deriyê mala Şihabedîn da. Çûn derî vekirin. Min temaşekir, hevalek ku bawarêya min heta dawiyê pê hebû ji derî ve hat, ew jî tevlî me bû. Em tev di odeyekê de rûniştibûn, piştî ku me keyfxweşî da hev hevalê ku nû hatî dest bi axaftinê kir. Li ser karê partiyê behsa kêmasî û zêdahiyan hat kirin. Min guhê xwe dida wan, di dawiya gotubêjan de Şihabedînî berê xwe da min, bi min re dest bi axaftinê kir, ji min re got; "Du têbiniyên min hene, ger tu bigihînî hevalan wê gelek baş be." Min got; "ev tiştа we aniyî ziman ti rastiya wê nîne." Weke roviyê di dolekê de bi tena xwe dimîne, dibêje ez şêrê vê dolê me. Min ev jî nekir, kêmasiya min kirî, divê neçûbama mala serokê

şarederiyê. Axaftina jina Şihabedîn Ozaslaner çi qasî ji dil yan jî ne ji dil bû ez nizanim, diaxivî û girêdana xwe ya bi partiyê re dida diyarkirin. Digirêya, rondik dibarandin. Digot, "rexneyan li me dikin, gunehên kurê min kirî dixin stuyê me." Dibêjin; "we kurê xwe daye revandin û teslimê YNK'ê kiriye, lê ev rexneya li me tê kirin nerast e, evên ku rexneyan li me dikin Reşidê Zêwkî û hevalên wan in. Ev îxaneta kurik kirî bila ji me neyê xwestin, bila neavêjin ser malbata me. Her kes bi gunehê xwe û xêra xwe tê sezakirin."

**Dîrok 2002**

Li Wanê bûm. Ji ber ku hinek pêdiviyên min hebûn ezê biçûma gel hevalan, bes vê carê bêyî ku pirsgirêkek derbikeve. Min hevalê xwe dît û jê re got; "eger tu nikarî bê tu pirsgirêk nîne. Têbiniya Şihabedîn Ozaslaner neyne, emê bi devkî ji hevalan re bêjin." Min ji berêya du heyvan têbiniya me ya desturê amade kiribû. Ji ber em û heval wê ji hev dûr biketibana du têbinî dabûn min. Yek ji bo heval Hemze bû, ya din jî ji bo hevalên berpirsyarên perwerdeyê bû ku minê perwerde bidîta. Paşê jî hevalek têbiniya Şihabedîn Ozaslaner ji ber israr û hêviyên wî digire û bi xwe re tîne.

Pişt re em derbasî Îranê bûn. Hevalekê ji min re got; "min têbinî anîne, yek ji bo Osman Ocalan e, tuyê bidî wî, ya din jî tuyê bidî heval Cûma. Lê Şihabedîn Ozaslaner gotiye, daxwaza min ji we ewe ku hûn rApora min bi destê xwe radestî heval Cûma bikin, nedin destê tu kes din." Ez û hevaleke xwe bi hev re li Makoyê bûn, pişt re em çûn Ûrmiyê. Wê demê birayê şehîd Hemze (Hesen Bîndal) li wir bû. Bi çend rojan şûn de bizehmetî li Ûrmiyê me dît, me kefxweşî dayê, pişt re me têbiniya xwe radestî wî kir. Xêrhatina me kir, kêfxweşî da me. Min daxwaza xwe ya vê carê anî ziman, lê dîsa jî rê neda ku em biçin. Min di dilê xwe de got; "sedemê ku nehiştin em cara din biçin, me têbiniya xwe winda kiribû û em bêdestur bûn. Vê carê têbinî li gel me heye, çima me naşînin?" Heval Hemze berdewam kir û got; "dem ji bo çuyîna we ne guncaw e." Heval Hemze destur nedida ku em biçin Dola Kokê ziyareta hevalan. Ev tişt ez û hevalê li gel min dida fikirandin, çima desturê nedidan me? Çima daxwaza me ya ku em serdana hevalan bikin bicih

naynin? Moralê me ketibû asta jêr, çima ji hinekan re destur tê dayîn, lê ji bo me nayê dayîn? Bi rastî jî wê rewşê em didan fikirandin.

## Mala Xalê Şukrî Li Dêmo

Em zivirîn Makoyê, ji wir em çûn Zêlikê ku gundeke girêdayî Makoyê, nêzikî çemê Aras bû. Çiqasî dûr jî bû lê belê em çûn. Ji vir jî em çûn gundê bi navê Dêmo, di bin perên Dembatê de bû. Dembat bi xwe jî nêzikî Agiriyê ye. Em bûn mêhvanê mala mamê Şukrî, temenê wî 80 sal bû. Rûyeke spî û poreke spî, deveke biken, gêwileke mezin pê re hebû. Gêwil dida mêhvanan, rewşa wan feqîrtiya wan dida diyar kirin. Keseke porspî, welatparêzek baş bû. Xwarina me bi darê dûrûngan dihat pêjandin. Ji ber êzing, sergîn û gaz titunebû mal gelek sar bû, şewatekên wan tunebûn, lê welatparêziya wan, mêhvanperwerêya wan bêhempa bû. Bi germî mirov pêşwazî dikirin. Dayika porspî ya pîrejin xwarina me danî ber me. Min gelek şerm dikir, dayîkê bi min re daxifî û digot; "Welatparêzî, heskirina şehîdan û Rêber Apo, heskirina şervanan û hevaltiya bi şoreşgeran re, di piratîka mirovan de xwe dide nîşandan. Welatparêzi jî evîne, eşqe ji ber wê jî ne bi cilan e, ne jî bi peran e, lê bi bawerî û girêdana şehîdan û Rêber Apo ye."

Piştî xwarinê, di vê navberê de dawiya axiftina dayîka welatparêz jî hat, me daxwaziya xwe ji hevalan re vekir, lê heval Hemze destur neda em biçin gel hevalan. Heval Serxwebûnê Erdîşî li wir bû. Min û wî li welat demek dirêj hevaltiyek baş bi hev re kiribû. Heval Serxwebûn got; "Hinek sebir bikin. Emê hewil bidin desturê ji we re bigirin. Paşê emê xebera xêrê bigihînin we." Êvarê em li gel hevalan man. Sibehê xeber dan me ku xeberek ya xêrê bû, destura çûyîna me hatibû dayîn. Ez ne şaşbim destura me ji aliyê haval Mûrad KARAYILAN (Cemal) ve hatibû dayîn. Destura ku hatî dayîn ji bo me keyfxweşî û şanazî çêkiribû. Têbiniyek ji me re şandibû ku ji hevalan daxwaz dikir em biçin serdana haval Cûma û wî bibînin. Min ji heval Serxwebûn re anî ziman ku daxwaza me jî dîtina heval Cûma ye. Me xatirê xwe ji hevalan xwest û me berê xwe da Ûrmiyê. Em ji Dêmo zivirîn, me heval Hemze dît. Gelekî xwe aciz kir û got; "Minê hûn bişandibana, hûn ew qas dûr çûn ji ber desturekê." Min bersiva heval Hemze da û min got; "Tu di van gotinên xwe de şaş î." Heval Hesen (qorye) amade bû, em hildan û birin garaja

Ûrmiyê, em li tirimbêlê siwar kirin û berê me da Şino-Mîrovayê. Em ji Şino derbas bûn, hê me xwe negîhandibû Mîrovayê em peyabûn. Paşê em çûn gund, mala Hesen. Li pêşiya me heval Deniz Binevş du şervanên nû li vir civandibûn. Berf metreyekê li erdê stur bûbû; sermayê, ba û bahozê li rûyê me dida, dilê me dida qerisandin. Me bi keyfxweşî pêşwazî dikir, bi dengê qerisandinê û sermayê binê pêlavên me deng derdixistin. Bi keyfxweşî me guhdarî dikir, ew qasî em dilşad bûn.

Min zehmetî dikişand. Em ji wir bi qasî du demjimêran rê çûn. Em çûn mala Hekîm. Pişt re dîsa rêwitiya me berdewam kir, heta em gihiştin payîgeha Îranê. Di wê demê de em derketin serê çiyayê Dola Kokê. Dol ji berfê rast bûbû, di wê demê de jî aşût hatibû. Dol tejî bûbû, me xwe gihand Çiyayê Mirazan, lê ez perişan bûbûm, pir westiyabûm, bi destê min girtibûn û min li ser berfê dikişandin û ez jî wek zarokan dikeniyam. Berêya hingê bi çend rojan li wê derê pênc milisên partiyê ji ber serma, seqem û bagerê rêya xwe winda kiribûn û ji berk u nikarîbûn xwe rizgar bikin şehîd ketibûn. Ev rewş hevalek nû tevlî refên gêrîla bûbû ji min re got. Em gelek bêgêwil bûn. Em gihiştin mêhvanxaneyê. Heval Ferhat, bavê Mazlûm em pêşwazî kirin, bi me re pir keyfxweş bûn, ji me pirsin; "Hûnê xwarin û çayê bi hev re bixwin?" Me got; "ger hûn pêşiyê çayê bînin wê gelek baş be, ji ber ku em pir westiyane." Çaya me danîne ber me. Ez pir westiyabûm, min serê xwe danî ser balîf û bi xew ve çûm. Heval Ferhat betanî avêtibû ser min, carekê ji nişka ve ez rabûm, min temaşe kir ku danê nîvro ye. Rabûm ser xwe, min dest û rûyê xwe şûştin, em bi hevalan re rûniştin, min behsa hatina xwe û Cewdet kir. Min bi berfirehî vekir. Li Dola Kokê aşût hatibû li ser mangên hevalan. Nexweşxane, pirtûkxane, dirûnxane dibin aşûtê de mabûn. Di navbera sala 2002-2003'an de ku em bi kurtahî bêjin manga 12'an bû. Têbiniya Cevdetî anîbû, min da heval Ferhat ku bigihîne cihê wê. Paşê min got; "em dixwazin serdana heval Cûma bikin." Heval Ferhat jî got; "heval wê sibe bi we re cure bikin." Min têbiniya ji bo Osman Ocalan û ya ji bo perwerdeyê anîbû da heval Ferhat. Lê min fêmkir ku têbiniya heval Cûma li gel xwe hiştiye û ew têbinî gihiştiye destê Osman Ocalan.

**Mêvanxaneya Dola Kokê**

Roja duyemîn Elî Dûrsun û Berxwedanê Serhedî hatibûn ku bi me re cure bikin. Min bi Elî Dûrsun re di derbarê serokê şaredariya Wanê Şihabedîn Ozaslaner re çi dizanî parvekir û min got: “Navenda DEHAP’ê daxwuyanî dane ku Şihabedîn Ozaslaner endamê wan nîne, bi zimaneke zelal û bi axaftineke ku jê were famkirin, ka di derbarê wî de nêrina we çiye, dixwazin bizanin. Ger hûn ji bo me vekin dê gelek baş be.”

Di têbiniya xwe de çi nivîsandibû, ez nizanim.  Eli Dûrsun got: “Me deh caran xeber şandiye tu kes nikare tevlî karê wî bibe, em li piştа wî ne. Silavên Osman Ocalan jî wî re bibin û jê re bibêjin.” Min guhdarêya axaftinên wî kir. Lê weke ku rûyê xwe li min tal dikir, di rûyê wî de bêzariyê xwe dida nîşan kirin. Me bi qasî sê demjimêran guhdar kir û berdewan bû, min tiştek ji daxwaziya wî famnekir, matmayi mam. Min ji Eli Dûrsûn daxwaz kir ku serdana heval Cûma bikim. Bersiva min wiha da;“Qey bawerêya te bi hevalan nîne?” Ez gelek tirsiyam, ew axaftin pir li min giran hat, êdi min nizanî çawan bêjim, em ne li bendê bûn ku reftarek wisa nîşan bikin. Daxwaza me ya çûyina gel heval Cûma nehat pejirandin, ji ber wê em matmayi man. Hevalê min gelek bêzar bû, di rûyê wî de bêzarêya wî dihat xuya kirin. Mebesta min jî ew bû ku têbiniya me ji bo heval Cûma anîbû bigihînimê. Ji ber Şihabedin Ozaslaner wiha axivî bû. Min ji hevalê ji xwe re got: “Şihabedîn gotibû têbiniya min bi destê xwe bidin heval Cûma, nedin ti kes din.” Cara yekem bû ez hatibûm serdana hevalan, min ti kes nas nedikir, êdî min dizanî ku nikarim têbiniyê bigihînim heval Cûma. Pişt re Elî Dûrsun ji me re got; “Hûn biçin mala xwe wê gelek baş be.” Di wê demê de ez fikirîm, çima ev qas zû Elî Dûrsûn dixwaze me rê bike? Me ji hatina xwe tiştek fêmnekir, dibe kêmasiyên me hebin. Di vê ravekirêna pirsgirêka rewşa Şihabedîn Ozaslaner de zatunebûna min ew qas bû. Me xatirê xwe ji heval Ferhat xwest û bi awayeke xemgîn bi rê ketin.

Berf ne dibarêya, lê gelek bahoz û serma hebû. Heval Muslim ji min re kefiye anî, li serê min pêça û lepik xistin destê min. Gelek xizmet ji me re kir û em radestî milîsan kirin. Heval Muslum li wir amade bû, em maçkirin û himbêz kirin, ji me re serkeftin xwest û em hatin. Lê dîsa jî nedîtin û serdan nekirina heval Cûma ji min re bû xem û keder.

## Ji Bo Heval Cûma

Bilbilê çiyayê Zagros û Xinêre, hêlîna dilan. We sotand keç û xort û kalên bi kul, bi evîna şoreşgeran. Ez mam li hêviya yaran bi hewar û qêrînan. Name negihişt evîndarê şalûlan. Dixwîne, dizane binefşa Ariyan. Ji her kesan re deftera rastiyan. Rûspiyekê kamil, derd û êş li min belane. Rondik dibarînim li hêviya evîna dilan. Ezê bimeşim bi eşq û evîn, da ku bibînim evîndarê Zagrosan. Bazeke pir şîrînî, daxwaz dikim bibînim rihana çiyayan. Ez pir melûl im, ji ber ku nezanim. Lê daxwaz dikim dîtina gulpêltanan. Ez bûme evîndarê we, her divê hûn bizanin jiyana şervanan. Hûn dil germ, rûgeş, rûken, evîna gelan in. Temenê min şêst û sê, dîtina we wê jiyanê bide min bisalan. Gula deşt û çiyan, reng da bi rengê sorgulan. Dibêjim bila we bibînim carek, nemînim bisaniyan. Ax ji derdê vê bêhêziyê, dame paşvexistin ji wan şêr û egîdan. Ji wê zortir negihiştina yaran, delalê Kurdan. Ka bêje, awazên çem û kaniyên Kurdan. Hûn mamoste ne, bijîşk in, dilnizim û fedekarê gelan. Hûn dûrnas in, hewce nîne pir bilêv bikim hêviya jaran. Axîn ji min tê bi keser û hesret. Ez li kê bikim naz, gilî û gazinan. Çavo kor nebe, hûnê bibînin û himbêz bikin gulan. Ev çi derd û kule we ji bo min anîn. Bihêza zorê ji refan dûr ketim, mirin bêwefaye. Rabûn û rûniştina wî kêmbûye, hesretê nikare bîne ziman. Ax nizanim ew halê min çawa bû. Sorgula dilan, nêrgiza biheştan. Xwezîka min bidîta li çiyayan. Eger tu min bavêjî pişt derêyan, ezê dîsa bisekinim li ber deriyan, pênûsa destên kal û pîran, deftera li nav destên xwendekaran. Awazên xwîşk û birayan li Geliyê Zîlan. Dixwîne û dinivîse ji bo zarokên Kurdan, qelema destê şoreşgeran. Ewê dibêje Heciyê kal e, li benda bersîva yaran.

**Ez Rêwiyê Rojê Me**

Li pey te ketim ez bûme dildar
Ji bo şoreşê ketim bin bar
Ketim cengê ji bo te ey yar
Ez im ez rêwiyê rojê me

Bêhna çiyayên te ez ciwan kirim
Eşqa azadiyê li pey xwe birim
Axa te bi xwîna xwe dikirim
Ez im ez rêwiyê rojê me

Serî rake gelê mino li ser xwe bisekine
Dengê xwe bilindke ji dil bikene
Pêşengê te yên wek heval Cûma hene
Ez im ez rêwiyê rojê me

Çûyîn nêze dema xatira
Ezê herim dil maye li vira
Destên min nabe ji hogira
Ez im ez rêwiyê rojê me

Demê veqetînê tê ku her gava
Janek dikeve nav dil û hinava
Barê min ketiye ber bi Rojava
Ez im ez rêwiyê rojê me

**Bîranîna Heval Muslim**

Dîrok 2003 bû, li Dola Kokê aşût hatibû ser mangeyên hevalan, mange di bin aşûtê de mabûn. Wek min dabû diyarkirin, nexweşxane, dirûnxane, hemû di bin aşûtê de mabûn. Li cihna biqasî 20 metre aşût hatibû li ser mangan, mangeyên hevalan dorpêç kiribû û rêya wan ya ketin û derketina mangê jî girtibû. Heval Muslum xelkê Rihayê bû ku di bin aşûta berfê de mabû. Bi cihazê bi hevalan re peywendiyê çêdike. Heval dizanin ku heval Muslum li kĵjan rastê di bin aşûtê de ma ye. Hevalan cihê wî dîtin, çûn ser mangê, banî kirin. Heval Muslum got; "min xilasbikin." Dema dengê wî bihîstin ew ji bin aşûta berfê derxistin. Hevalên ku bi hawara wî ve çûbûn, daxwaziya pênc qaz û pênc ordekan ji heval Muslum kiribûn, yanî hevalan di wê derê de jî dixwestin sûd ji qaz û ordekên heval Muslum bigrin. Paşê heval Muslim çare nedît û daxwaza wan pejirand. Hevalan jî dest bi kolana berfê kirin, heta heval ji nava berfê derxistin. Şerbetek dimsê dan heval û heval jî spasiya xwe ji hevalan re diyar kir. Lê hewl dida xwe xilas bike, ji ber ku soz daye hevalan wê pênc qaz û pênc ordekan bide wan ku heval ji xwe re ser jê bikin. Heval Muslum ji hevalan re wisa got; "malê min nîne ku ez bidim we, malê partiyê ye." Bi vî rengî, bi awayê henekî heval Muslum ji bin barê qaz û ordekan xilas dibe…

**Vegera Malê**

Ez û Cewdet bi xemgînî zivirîbûn malê. Du birayên wî di nava refên gêrîla de bûn, me ew nedîtibûn, nedihat bîra me jî. Daxwaziya ku em serdana heval Cûma bikin ji aliyê Elî Dûrsûn û Osman Ocalan ve nehat erêkirin, ev di dilê me de dibû xem, lê dîsa jî biryara partiyê ji bo me girîngbû. Em gihiştin Mîrovayê û roja din em gihiştin Ûrmiyê. Nedîtina heval Cûma di dilê me de keser û hesret çêkir. Hem jî minê perwerde bidîta. Ezê biçûbama serdana gelek hevalan. Hem ji saftiya min, hem jî ji nezaniya min ev şans ji destê min çû. Li Ûrmiyê heval Hemze em dîtin, bi me re keyfxweş bû û ji bo çûyîna me got; "Ez dizanim hûn ji bo serokê şaredariya Wanê Şihabedin çûne, pirsgirêka wî nîne." Di wir de mejiyê min rawestiya. Çima Şihabedîn di dilê Osman Ocalan, Elî Dûrsûn û Hemze de reh daye, çima van nehiştin ez biçim serdana heval Cûma? Bi

rastî van guman ji min re çêkirin, ez dame fikirandin. Êdî min xatir jê xwest, ez û Cewdet ber bi Wanê ve çûn. Piştî ku em gihiştin Wanê, em derbasî Erdîşê bûn. Di heman rojê de ez hatim binçavkirin, matmayî mam. Tişta baş, min têbinî li gel xwe nehilgirtibû.

Piştî du rojan Cewdet xwe digihîne gel Şihabedîn û mijara çûyîna me jê re vedibêje. Şihabedîn ji Cewdet dipirse; "ka têbiniya min?" Cewdet dibêje; "min negihandê." Rengê Şihabedîn diçe, bi qederekê difikire û dibêje; "xwezî min hûn neşandibana. Ka Hecî?" Cewdet dibêje; "binçav kirine. Sê roj in di bin çavan de ye."

**Kâmil Komser**

Daxwaza Kâmil komser ew bû ku ji devê min axiftinan bigire, lê ev yek nepêkan bû. Wan gelek îşkence li min kirin, bi lêdanê ez perîşan kirim, lê belê nekarîn tu gotin, yan encameke dixwestin ji min werbigirin. Lewma pişt re ez berdam. Di pêvajoya piştî wê de jî, hema bêje her du sê rojan ez binçav dikirim. Ez di êşkenceyên giran re derbas dikirim, canê min têşiya, ez bi rewş kiribûm ev kiryarên dewleta faşist a Tirk, ji ber wê yekê êdî li vê derê ji min re jiyan zor dihat û êdî naçar bûm ji vê derê bicih bihêlim û biçim. Li ser vê yekê hevsera min amadekarêyên min kirin, lê nedizanî ezê bi ku ve biçim. Heval Serxwebûn bi rewşê hesiya û têbiniyek ji min re şand. Di têbiniya xwe de wisa gotibû; "Ger ji Erdîşê biçî, wê ji bo te gelek baş be, tu eşkere bûyî, lewma divê tu xwe baş biparêzî." Piştî vê yekê min dest bi rêwîtiya xwe kir, lê min nedixwest kesek ji ber min bê êşandin. Ez li tirimpêlekê ku bawerêya min pê dihat siwar bûm û çûm garaja Bûrsayê û ji wir jî derbasî Bûrsayê bûm. Mala kurê xaleta min Fehîmeyê û mala kalikê min Hecî Şûkrî li Bûrsayê bûn. Kalê min Hecî Şûkrî bi sosyalîstiyê dihat naskirin, lewma jê re Hecî Şûkriyê Komînîst jî digotin. Zarokên wî Emîn û Abdûla jî weke bavê xwe xwedî hizir û bîrên sosyalîstî bûn. Min telefon ji kurê xaltika xwe Salih re vekir û min got; "ez li garaja Bûrsayê me." Wî jî ji min pirsî; "Tuyê ku ve biçî?" Min got; "Ez hatime serdana we."

Wî jî got; "baş e, li benda min be, ezê di demek kurt de bêm." Bi qederê demjimêrekê şûnde hat gel min û em bi hev re li tirimpêla wî siwarbûn û em çûn mala wan. Xaleta min li ber deriyê malê sekinîbû, li benda me mabû. Di peyabûna me de kefxwaşî da min, ez himbêz kirim

û got; "De kerembike." Em çûn hundir, di rûniştina min de zarokên xaltika min li dora min kombûn û min jî dikara Erdîş û geliyê Zîlanê ji wan re dikir. Malbata xaleta min welatparêz bûn, bi taybet gundê wan li Geliyê Zîlan welatparezên hêja bûn. Di heman demê de xizmê min bûn. Keça min Zehra hevjîna kurê wê Abdulcebar bû . Min û xaleta Fehîme, me hêdî hêdî ji xwe re suhbet dikir. Çay anîn, zarokan dest ji min bernedidan. Neviyên min (zarokên keça min Zehra) Botan, Baran, Hêlîn û zarokên Saleh Şiyar, Zana û Mizgîn, tev li min kombibûn û ez dorpêç kiribûm.

Ji ber ku gelek westayî bûm, hinekê bêzar dibûm. Xwarina me danîn, me axaftina xwe berdewam dikir. Piştî me xwarin xwar cihê min danîn odeya mêhvanan û razam. Ji ber ku ez westiyabûm zû bi xew ve çûm. Ji bo min ew şev gelek kurt bû, ji ber ku min lê nêrî spêde ye. Piştî min taştê jî xwar, kalo jî hatina min bihîstibû, kalo û kurê xwe jî hatin mala ku ez lê mêhvanbûm. Kalo ji derî ve hat, silav da min, ez himbêz kirim, keyfxweşî da. Min jî keyfxweşî da kalo û paşê me bi kalo re dest bi suhbetê kir. Hûn jî dizanin, bi kalan re suhbet gelek xweş û bi sebre. Me dûdirêjî behsa welat û hevalan kir. Lê di wê naverokê de gelek pirs di derbarê havalan de ji min dikirin, ji ber ku gelek ji hevalan hez dikir. Paşê ji min pirs kir û got; "sedema mêhvaniya te çiye?" Min got; "min bêrêya we kiriye, lewma min xwest bêm serdana we." Kalo li min zivirand û got; "serdana we ji bo me keyfxweşiye, wê keyfxweşiyê hertim ji me re bîne. Ger tu min weke kalikê xwe bibînî, ji bo me keyfxweşiye." Min sedema hatina xwe dîsa dubare kir û min got; "Tu sedemek taybet ya hatina min a vê derê nîne, mebest û armanca min tenê serdankirina we ye."

## Dostanî Û Fedekarî

Di zorî û zehmetiyan de êdî dost û nedost ji hevdu cuda dibin, ev yek ji helwestên wan tên zanîn. Di wê demê de keç, xort, kal û gelê welatparêz bi Rêber Apo ve girêdayî bûn. Girêdayîneke mezin ji bo rê û rêzikên Rêber Apo hebû û ew ji xwe re weke despêka vejineke nû didîtin û dipejirandin. Gêwil û keyfxweşiyek bilind didan derdoran. Ji min gelek hez dikirin, ez li vir bi qederekê mam. Di vê navberê de havalê Serxwebûn ji min re têbiniyek şandibû, min ew têbinî girt û da xwendin.

Pir keyfxweşbûm, ger baskên min hebûna ezê bifiriyabama. Di têbiniyê de hatibû gotin ku ez dest bi karê xwe bikim, ji ber wê ez gelek keyfxweşbûm. Zêde li wir mayîn nerast bû. Ji ber karê min jî derketibû min xatir ji mala xaleta xwe xwest û çûm Stenbolê. Li wir derbasî mala zavayê xwe (hevserê keça min Rehîme) bûm. Piştî çend rojan min xatirê xwe ji wan jî xwest û çûm ser karê xwe. Bi qasî 9-10 mehan min karê xwe bi awayeke nehênî berdewam kir. Lewma kesê nedizanî çi karekê dikim.

**Têbîniya Heval Serxwebûn**

Heval Serxabûn ji min re têbîniyek din şandibû. Di têbîniya xwe de wiha gotibû: “Ger tu biçî Başûrê Kurdistanê wê ji bo te gelek baş be. Lê ji berêya tu biçî karê xwe biqedîne.” Min jî karên xwe yên mayî bi encam dikirin. Piştî ku karên min xilasbûn, min dest bi amadekarêyên xwe yên çûyîna Başûrê Kurdistanê kir. Malek pir welatparêz hebû, ji bajarê Bidlîsê bûn, ez gelek caran li mala wan mabûm û ji hevalan re mêhvanperweriyek pir baş dikirin. Navê zilamê malê Medenî bû û hevsera wî jî xwîşka mela Îbrahîmê Hîzanî bû. Temenê herduyan 70 sal derbas kiribûn û bi Rêber Apo ve pir girêdayî bûn. Min xatir ji dayê û bavo xwest û ez çûm Enqerê mala birayê xwe mela Abdûlah. Bi qasî çend rojan li wir mam. Di vê navberê de li mala birayê min zarokeke şehîdan hebû, temenê wî hê 6 mang bû, bavê wî şehîd ketibû û dayika wî tevlî refên gêrîla bûbû. Navê wî Diyar bû, neşaşbim ji Amedê bûn. Zarokek zerîf, porzer û xweşik bû. Birayê min ji ber demek dirêj bû ez nedîtibûm dixwest ku ez zû serdana wan bikim.

Jinbiraya min navê wê Xanim bû. Lawikeke wan jî tevlî refên gerila bûbû. Keça wî Seîde û her du kurên birayê min Mihemed û Daran, kurê birayê min mela Heyder, M. Sadik û birayê min M. Zekî digotin; “çend rojan li vir bimîne, pişt re here malê.” Min pêşniyara wan pejirand. Gihiştibû salekê ku ji mal derketibûm. Lê kekê min di nava dudiliyê de bû, digot; “yan here malê, yan here çiyê.” Her du rê difikirîn. Min tiştek vekirî ji wan re nedigot û min diyar nedikir. Min pişt re xatir ji wan xwest û berê xwe da Sêrtê.

Heval Serxwebûn di têbîniya xwe de dikara kesekê kiribû û pêwîstbû min ew kes bidîta. Ez gelek lê gerêyam û min pirsa wî kir, heta

ku min ew dît. Navê wî Hecî Xelîl bû. Bi alîkarêya Şêx Izedîn û hevjîna wî, min Hecî nas kir. Malbata Hecî Xelîl gelek welatparêz bû. Ez çend rojan li gel wan mam. Ez carna li mala Şêx Izedîn dimam. Mala wan li gundê Ziyaretê bû. Karê Hecî Xelîl xilasbû, gazî min kir û ez çûm gel wî. Ez hatim gel wî da ku em bi rê kevin. Em di du rojan de gihiştin Geverê. Hecî Xelîl ez li wê derê radestî Elî kirim. Elî destê min girt û bi keyfxweşî li min nêrî, xêrhatina min kir. Min jî xêrxwaziya wî xwest. Min jê re got; “di sala borî de ji heval Mehsûm Mêrdîn û Hemze min destur xwestîbû, lê wan destur nedan ji bo ku ez biçim Dola Kokê. Pirsgirêk derxistin û nehiştin ez biçim wî cihê pîroz. Ji ber vê sedemê eger zehmet nebe tu min bigihîne gel hevalan.” Elî got; “ji bo çûyina li gel hevalan çi tiştek ji min were xwestin an jî ez bikarim bikim, ez amademe.”

Ez di milekê de pir keyfxweşbûm, di mileke din de Hemze dihat bîra min û ez bêgêwil dibûm. Min di hundirê xwe de digot; “eger dîsa Hemze li wê derê be û nehêle ez biçim, ezê vê carê çi bikim?” Elî çend rojan ez li gel xwe hiştim. Piştî wê ez û Elî bi hev re ketin rê û em bi ser sînorê Esenderê re derbasî Urmiyê bûn (di dîroka 10.10.2003’an de). Li wir berdevkê partiyê heval Mehmûd Mêrdin bû. Em çûn gel wî û heval Elî Gever mesela min û rewşa min bi awayeke berfireh ji heval Mehmûd re vekir û pişt re Elî xatir ji me xwest û çû. Piştî Elî çû, em bi hev re man, heval Mehmûd ji min re got; “bi keyfxweşî armanca te wê pêk were.” Di wê demê de tirsek çêbû, ez ditirsiyam, ez difikirîm yan erê, yan na ye. Heval Mehmûd gelek keyfxweşbû, bi dilekî nizim, bi germahiya hevaltiyê ez pêşwazî kirim. Ew têbîniya ku heval Serxwebûn ji min re nivîsandî, min dayê. Heval Mahmûd ew bikêfxwşî girt. Bi zimaneke nazik, bi axaftineke xweşik, nazenîn nişanê min da û got; “li vir bisekine.” Ez di wê demê de fikirîm ku dema ez çuyîm Dola Kokê, nehîştibûn ez biçim serdana heval Cûma.  Ger yên hingê li wir bin, wê dîsa min paş ve bizivirînin. Heval Mahmûd got; “ew qas nefikire.” Min got; “ez rastiya fikrandina xwe ji te re vekim ku tu min fêm bikî. Di zivistanê de dema ez çûm Dola Kokê Osman Ocalan, Alî Dûrsûn û Hamze li wir bûn. Her çendî nota min jî hebû, lê ez paşve hatim zivirandin. Aha ji ber vê yekê ez gelek ditirsim.” Wî jî wiha got; “ezê we bişînim cem heval Cûma ku evîndarê herkesan e û ez bawerim ku ewê jî vê yekê bi erênî pêşwazî bike.”

Êdî min bawerkir ku wê heval Mehmûd min bigêhîne hevalan. Paşê heval Mahmûd pirs ji min kir ka li ser min pere hene yan na. Min xwe bêdeng kir, li min temaşe kir û têra demekê pere da min. Heta ez hebim ji bîr nakim ew fedekarî û xizmeta ku heval Mehmûd ji bo min kirî. Bêhna min fireh bû û min xwe bihêz didît. Nayê jibîrkirin. Heval Mahmûd got; "ezê te bişînim Dola Kokê." Ez pir keyfxweşbûm, bi çend rojan şûnde heval Mehmûd ez şandim Dola Kokê. Bi hemû kêmahî û lawaziyên xwe yên fizîkî ve, min xwe avête himbêza hevalan. Di wê demê de heval Cûma ne li wir bû, çûbû civînê, piştî çend rojan wê cardin bihata Dola Kokê.

**Hatina Heval Cûma**

Piştî çend rojan Heval Cûma hat û banî min kir. Ez pir ditirsiyam, ji ber ku dê bi min re cure bikira. Hatina min ya li gel heval Cûma û nîqaşkirina min bi wî re keyfxweşî, xurûş û kelecan xiste nava dil û hinavê min. Dema ji derî ve ketim hundirê manga heval Cûma gotina "dembaş" bêyî ku ferq bikim ji devê min derket. Bersiva min da û got; "ji we re jî dem baş." Min destê heval Cûma girt, keyfxweşî dayê û min xwe da naskirin. Piştî ku min xwe da nasîn, min dixwest ez li jêrî mangê rûnim, loma jî min paşve gav di avêt. Heval Cûma milê min girt û ez birim jorê mangê, ji min re bi rûkenî got; "ma tu qet tunebûyî mêhvan li tu deran?" Ez birim jora mangê û dame rûniştandin. Berdewam kir û got; "Mêhvanên ku tên gel me, em rojekê weke mêhvan dipejirînin, lê mêhvan piştî rojekê êdi weke me dikeve nava kar û xebatê. Hem mêhvantiya te, hem jî rûspîtiya te cihê te di vê şoreşê de daye çêkirin." Min gelek şerm dikir. Şermê derfet ji min re çênedikir ku ez bi heval Cûma re bipeyîvim. Xweziya derfet ji min re çêbiba cardin min serdana heval Cûma bikira û bi min re cure bikira. Dema firavînê bû, li ser sifra xwarinê heval Cûma amede bû. Xwarina me goştê mirîşkê bû. Bi gotina "keremke" ez dawetî ser sofreyê kirim. Her ji min re digot; "dê goştê mirişkê bixwe." Min jî hêdî hêdî dixwar. Bi wan tiliyên zirav û nazik, destên xweşik goşt ji hev diqetand û didanî ber min, lê min gelek şerm dikir.

**Daxwaza Dilan**

Min dît, daxwaza dilan û warê gulan
Dibistana rêhevalan, rêberê gelên cîhanê
Hûn dişopînin rêya Mazlûm Doxan

Çinara kevnar, beybûna mêjû û dilan
Wan fikrên we yên nazik, find û çirayan
Ziman şirîn zelal û ronahiya van çavan

Lê civiyan keç û xort, nazdarên dayîkan
Şopvanên rêya şehîd û hevalan
Kurdistan rûmete kaniya zêr û zîvan

Hûnin evindarê ferîşteyên Ariyan
We şîn kir welatê kalan bi kulîlkan
Jî bîr nekirin wesiyeta Xaniyan

Ji we dûrketin, hilweşîn nalîn û êşan
Geşa rojê heval Cûma, gula çiyayan
Mamoste, gul û rihana destê çekdaran

Min xwest bisekinim li gel birêzan
Got; bisekine li dibistanan
Stêrka li ezmanan biriqandina hevalan

Evîndarê Rêberê mêrxwasan
Ez wê rojê ji bîr nakim tu caran
Mêjû afirand ji bo pîr û kalan

## Tevlêbûna Min A Partiyê

Êdî dema bicihanîna xewn û xiyalên min hatibû. Êdî dem hatibû ku ez wesiyeta birayê xwe yê hêja û birûmet pêkbînim. Xewnek bû ji bo min tevlêbûna partiyê. Her çendî ku niha jî weke kadroyeke tevgerê di nava xebatan de me, lê bi awayekê fermî soz dayîn û bûyîna milîtanek yê têkoşîna azadiyê, şeref û serbilindiyek pir cudatir bû. Lewma min dixwest li gel heval Cûma vê biryara xwe bînim ziman û bi destura wî tevlî şoreşê bibim. Dema min daxwaz û biryara xwe bi heval Cûma re parvekir, wî bi xweşbînî û dilgermî daxwaza min pêşwazî kir û erê kir.

Li vir dixwazim hinekê dikara xwe bikim. Ez di temenê 63'yan de bûm. Di fîzîka xwe de lewaz bûm, gewdeya min westiyayî bû û bi zorê xwe li ser lingan digirt. Zimanê min ê ku ez xwe pê bidim ravekirin tutunebû. Ne bejin û bal, ne cil û bergên li ser min, ez xurt û bihêz nîşan didam. Pirç û rih tevlihev bibûn, heta bibûrînin, çete (rişk) jî li min peyda bibûn, lê dîsa heval Cûma nirx da min û ez li pêşberî xwe dam rûnişkandin. Lalika xwe ya xwarinê bi min re parve kir û du kevçî xwestin, yek dirêjî min kir û yek bi destê xwe girt û got; "Kerem bike em bi hev re bixwin." Aha ji ber vê yekê heval Cûma kesek heta dawiyê dilnizm, dilbirehm û şareza bû. Min ji xwe şerm dikir. Ev rêxistin, di serî de şehîd û Rêber Apo, hemû wisa ne. Daxwaza vê rêxistinê û dîtina wê ji bo hemû zindiyane, çi mirov çi heywan, çi daristan çi zevî, heta ji bo çûka mirîşkê, ji bo jiyaneke hevbeş û komînal bafirînin hewil didin. Daxwaza wî ji bo min wisan bû, dixwest jiyanekê bide min; ev dilnizmiyên wan îlahî ne.

## Gotinên Min Ji Heval Zaza Re

Heval Zaza: "Erê hevalno hûn pir kêmasiyên min dibînin rast e, lê hema hûn hemû dilrevîn in. We dilê min jî girt cem xwe, heta gihiştim wan cihan. Girêdana şehîdan û Rêber Apo, hezkirina rêhevalan; tiştek ku li pêşiya heskirina li beramberî wan bigire tine ye. Ez bawerim hûn tişteke din nafikirin, ji min re bejin." Min jî got; "Heval Zaza, hatina we ya serê van çiyayan rûmet e. Lê binêrin girêdan, heskirin, eşq û evînê hûn anîne heta vir. Rêzdarî li ku derê hebe, wê heta dawiyê fedekarî jî li wir hebe û wê heta dawiya dilopa xwînê li gel evîna dilê xwe bimîne."

Xweziya hêj ez nemirimî, min carek din xwarinek li gel heval bixwara. Ez ji mirinê natirsim, gava mirin were jiyan xilas dibe. Tirsa min ew e ku niha nexweşim, mirin jî li pîrîtiyê henek dike, bi wan re di nava şerekê de ye. Axaftina heval Cûma gelek nazik bû. Pişt re di nav gotinên heval Cûma de derket holê ku çûyina min ya Mexmûrê hatiye erê kirin. Her çendî min nedixwest ji van deran biçim jî, lê min nedixwest biryarên partiyê binpê bikim. Gotina ku “ezê biçim Mexmûrê”, li min pir giran dihat. Heval Zaza li gel Heval Cûma dima. Di aliyê rewşa min û nerehetiya min de wî alîkarî dida min. Gûz anîbûn, dişkandin dida min, hêsirên çavê min diherikîn û nedisekinîn. Wê şevê xew neket çavê min. Heval Zaza ji ber nerehetiya min nediraza û çavên wî jî nedihatin girtin. Xema wî ew bû ku min gelek zorî kişandibû, heta ez gêhiştibûm nik hevalan.

Ezê çawa ji vir biçim, difikirim. Lê dîsan jî, di dawiyê de, piştî van kul û qehran, min bi heskirin û girêdana bi şehîdan û Rêber Apo re xwe îqna kir û çûyîna pejirand. Lê kî dibêje bila bêje ji vê zortir mirin e, ji çiyan qutbûn, erê ji çiyayan qutbûn weke mirinê bû. Ew çiya dibûn gewdeyê vejîna min. Heval Heqî nêrî ku ez nerazame, ew jî hat manga me. Heval Heqî bi rewşa min gelek êşiya. Du demjimêr ji bo sibê mabûn, heval Heqî demeke dirêj li gel me ma, piştî demekê stêrka sibehê di sihara welatê Rojê de rûyê hevalan geş dikir, hêdî hêdî şeva tarî xatir dixwest. Demjimêr 4:30 bû. Heval tev amade bibûn. Me li gel hev xwarin xwar, piştî xwarinê heval Cûma banî min kir û têbîniyek da min. Êdî min dizanî ku ezê biçim. Ji bo min hêstir amadekiribûn ku lê siwar bibim. Hêstirek spî bû, navê wê ‘gulê’ bû. Di vê navberê de min heval Ronahî ya ji Erdişê dît. Ji bo karekê hatibû Dola Kokê. Bi qasî salekê bû me hevdu nedîtibû. Li Erdîşê di nava ciwanan de kar dikir, piştî ku tevlî refên hevalan bibû, cara yekem bû ku min ew didît.

### Ji Bo Heval Cûma

Hewar ji destê yaran! Nalîn, axîn û ji dil dihat xwîn, herîkî wek kaniyan. Şewitîm bi agirê dildaran, ji derdê eşq û evînê bûm kebab li nav kozan. Bi evînê şewitîm, xwîn herikand li nava dilan. Gazî, qêrîn û hewar tunebûn derman, nêrgiz û binefşa Xinêrê û Qendîlan. Ax ji destê rênasê Xarpêtan, li min nema deng û xewa şevan. Dîn û harim li van çiyayan,

mêjî nema li pîran, bi evîna mamosteyê rêhevalan. Ji destê we dihelim, evîndarê Kurdan. Mamoste û zanyar e, rewşenbîrê gelan e. Wê rewşa min çawabe ji van derd û kulan. Çem û kanî diherikin bi evîna şervanan, bêhna gulê ji dûr ve tê min. Rewşa min perîşane. Kederê şewitand dilê belengaz. Mil dane hevdu xezal û şêran, girtin deşt û çiyayan. Mame bêpar li van dolan, rengê delalan û gulan bêhn didan, bêhna misk û emberan.

Dema ku min heval Ronahî dît bêhna min gelek fireh bû. Ji min re got, "Bêhna xwe fireh bike, wê ji bo te gelek baş be." Me xatir ji hevdu xwest, ew çû karê xwe, ez jî zivirîm li gel heval Cûma. Min xatir jê xwest, ez û heval Cahîd ku ew jî wê li gel me bihata Mexmurê, em ketin ser rê. Heval Cahîd ji Başûrê Rojavayê Kurdistanê bû. Hinek hevalên din jî hebûn, bi hev re em ketin ser rêya Maxmûrê. Di serê rêya me de Kanîşîlan hebû, cihê PYD'ê bû. Bi qasî demekê li hêstirê siwarbûm baran barî, rengê kevir û daristanan, giyayê xweşik û xwezayê rûwê mirovan dida kenandin. Ba û bahoz diherikîn; xem, xeyal û kederên di serê mirovan de direvandin. Ji ber xweşikbûna çiyayan kewên ciwan dixwendin, hemû teyr û tilor li çiyayan difirêyan, dikirin qîr û teyrên baz xwe xul dikirin bi ser kêvroşkan de. Xwezayê xweşikbûn diafirand. Hevalan reng didan van çiyayan ku rengên kesk, sor û zer bûn, daristanên li ser rêya me bi hemû rengên fêkiyan hatibûn xemilandin. Darên hilû, şîlan, sêv, tirî, guhîj û hinaran pelên xwe werandibûn. Bi rengên xwe yên cur bi cur diketin ber çavên min. Hêdika min xwe ji hêstirê berda xwar da ku ez li wan dîmenan binêrim. Ji xwe ez wiha difikirîm, belkû ez careke din van cihan nebinim!

Berfê xwe berdabû bilindahiyan, baran û berfê xwe nîşan dida. Lê Heval Cahîd bi qederekê paş ve mabû û her ku diçû Kanîşîlan nêzîk dibû. Ez dihizirîm, çiya cihê azadiya bindestan e. Kerêyên pez, berxik, karik û bizinan di çiyan de diçêrêyan. Baranê ew şuştibûn, ba û bahozê li wan dida û hirêya wan difirêya. Axîn ji kezeba min dihat, lê vê axînê jî ti fayde nedida min. Hêdî hêdî ji wan hevalên ku min di dilê xwe de ew qas jê hez dikir, dûr diketim. Rengê spîtiya berfê jî her ji min dûr diket. Em hatin Kanîşîlanê. Hevalan bi gokê dileystin. Dema dîtin em hatin, wan jî dest ji leyîstinê berdan û em pêşwazî kirin. Heval Cahîd ew heval piranî nasdikirin, bi keyfxweşî em hatin pêşwazikirin. Min dixwest

demek kurt be jî li wir bimînim. Eger qasî çend deqîqeyan jî be li rex havalan mayîn gelek xweşbû. Lê ez neçar mam û min ji xwe re got ku "wê heval Cahîd ev hesreta min û daxwaza min bigire ber çavan ku bi qederekê be jî em rûniştiban wê başbûya."

Serpêhatiyek kevin heye ku dibêje; "Silêman Pêxember kewekê digire û jê re qefesek bi zêr çêdike, kewê dixe vê qefesa zêr. Ji vir şûnde kew dibêje; ax welat, ax welat." Bi rasti jî wisa ye. Me xatirê xwe ji hevalan xwest, em ketin ser rêya ku ber bi Maxmûrê ve diçû, lê emê pêşiyê biçûna Şehîd Harûn. Em ketin ser rêya Şehîd Harûn û em hêdî hêdî dimeşiyan. Hevalên bi min re hatibûn diaxivîn û min jî guhê xwe dida wan, bi vî awayî em dimeşiyam. Em nêzikî Şehîd Harûn bûn. Ji Kanîşîlanê bigre heta Şehîd Harûn, rêya em tê de dimeşiyan hemû serjêr û bikevir bû. Bi hevalan re meş bi serê xwe pîroz û giranbiha ye. Ji ber ku pir birêkûpêk dimeşin. Ev pîrozahî bû nesîbê min jî. Bi rastî layiqe ku mirov di rêya van de bimeşe. Di şûna lingên wan de li erdê şûnpêlavên wan çêdibûn, wek nexşeya lingên şêrê sêsalî bûn. Ev jî rastiyek e. Di nava daristanê de gelek dengê teyran dihat. Ev daristan li serê rêya me bû, şalûl û bilbilan dixwendin. Em nêzikî mêhvanxaneyê bibûn, li mêvanxanê heval Musa yê ji Mêrdînî berpirsyar bû. Bikeyfxweşî nêzî me bû. Bi nêrîna min Mexmûr jî li wir bû. Ji ber ku dema min gundê Meredo dît, bi awayeke hêsan min nefesa xwe stand. Min got nêzî hevalan e, pirsgirêk nîne. Piştî bi qederekê em rûniştin, çay anîn û me vexwar. Xwarin danîn li ser sifrê û me xwarin jî xwar. Min dixwest piştî taştê em biçin serdana Şehîdgehê.

### Hatina Min Ya Şehîd Harûn

Min ji hevalan daxwaz kir ku min bibin serdana goristana şehîdên nemir. Hevalan ev dawxaza min pejirandin. Em çûn serdana goristana şehîdan ku biheşt bû. Weke zumrut, yaqut û mercanan dibiriqîn. Min ji keyfan xwe li ser piyan nedigirt. Binefş, beybûn, nêrgiz, rihan û sosin; bi hemû kulîlkan gorên şehîdan xemilandibûn. Bêhna wan difûrêya, dema mirov nêzik dibû, bi xweşikbûna bêhna wê, mirov dil nedida ji wê xweşikbûnê dûr bibe. Belê, ew bêhna gorên şehîdan bûn. Mirov dil nedida ku temaşeyî vê xweşikbûnê bike, ew qas giranbiha bûn. Min di dilê xwe de digot; "ka ezê ciheke wiha li ku derê bibînim." Heval Cahîd

gote min; "piştî serdana şehîdgehê tu gelek keyfxweş î." Min got; "tu dizanî min biheşta şehîdan dît, ma çawa keyfxweş nebim?"

Heval Yado perbirsyarê baxçeyê şehîdgehê bû, bi hinek hevalên din re kar û xebatên baxçe dikirin. Gorên şehîdan dixemilandin. Heval Yado em pêşwazî kirin, keyfxweşî û gêwilê wî coş dida min, bêhna min fireh bû û şanazbûm. Çaya hevalan amade bû, anîn danîn ser mêzê, me dest bi vexwarina çayê kir. Bi rastî çaya li çiyayan pir xweş bû. Ez gelek keyfxweş bûm, em demekê li gel şehîdgehê man, me serdana hemû gorên pakrwanan kir, vê serdanê keyfxweşiyek mezin dida me. Min digot; "Ev biheşta li nêzikî min e, heroj ezê serdana wan bikim, ew jî wê jiyaneke xweşik bidin min." Lê kalbûnê her tişt ji min standibû. Hey wax li min!

Mam Hesen em vexwendin manga xwe, ji bo me zebeş anîbû. Me zebeşê xwe kerkir û me dest bi xwarina zebeşê kir. Lê hîna xilas tunebûyî mam Hesen ji heval Cahîd pirskir û got; "heval Hecî wê bi ku ve biçe?" Heval Cahîd got; "wê here Mexmûrê." Ez nû ketim wê ferqê ku Mexmûr ne ev der e. Hêdî hêdî rengê min xwe diguhert.

Ez wiha fikirîm, ma ji hevalan dûrketin tişteke ew qas hêsan e. Mam Hesen ji min pirsî; "çima wiha li te hat? Di carekê de rengê te çû." Min got; "Serê min têşe." Min destê xwe ji xwarina zebeşê kişand, piştî dest kişandina min hevalan jî dest ji xwarina zebeşê kişandin. Min ji heval Cahîd daxwaz kir ku em biçin Dola Şehîd Harûn, serdana heval Dîrok û Jiyanê. Daxwaza min pejirand û got; "baş e mam Hecî." Me xatir ji mam Hesen xwest û me berê xwe da Dola Şehîd Harûn. Di Dola Şehîd Harûn de av diherikî, gelek asê bû, di sê aliyên wê de teht û kevir hebûn. Ez bawerim koviyan jî nedikarîn tê de bimeşin. Lê heval di cihên herî bilind de dimeşiyan. Ez difikirim ku baz jî nikarin xwe bigihînin hêlîna hevalan. Min nedikarî bimeşim, rêya wê gelek teng bû, hem evraz hem jî berjêr bû. Cara yekem bû li rastî tehteke 200-300 metre bû dihatim. Dola Şehîd Harûn ku gelek asê bû, ji bilî esîman tişteke din xuya nedikir. Li derdora Şehîd Harûn hemû teht bûn. Min tu car ciheke weke wê dolê asê nedîtibû. Em çûn cihê ciwanan ku perwerde didîtin, me daxwaz kir ku em hatine hevalan bibînin, bi taybet jî dixwazim heval Dîrok û Jiyan bibînim. Daxwaziya me hat erêkirin, li ser daxwaziya me hevalan banî heval Dîrok û Jiyan kirin. Salek bû me hev nedîtî. Wê êvarê ez li Şehîd Harûn mam, li gel hevalan şeva me derbas bû. Min êvarek pir rengîn û

xweşik derbas kir. Şîva me anîn ber me, paşê jî çay û fêkî danîn ser maseya me. Di vê demê de gêwilê min bilind bû, gotebêj û axaftinên me berdewam dikirin. Hêdî hêdî şevê cihê xwe ji rojê re berdida û nedihêla em vê êvarê xew bikin. Serê sibehê me taştêya xwe bi hevalan re xwar, me xatirê xwe ji hevalan xwest û em ketin ser rêya xwe. Bi qederekê şûn de min serê xwe zivirand û min dît ku em gelek ji hevalan dûrketine. Her weke ku min hertiştê xwe winda kiribû. Ez û heval Cahîd bi hev re dimeşiyan, em ji hevalan dûrdiketin. Dûrbûna ji hevalan ne tiştek asayibû. Dilê min dixwest ji gel hevalan dûrnekevim. Em gihiştin mêvanxaneyê. Heval Mûsayê Mêrdînî berpirsyarê mêhvanxaneyê bû. Piştî em gihiştin mêhvanxaneyê, heval Mûsa ji me re got; "hûnê vê êvarê biçin."

## Çûyîna Wargeha Mexmûrê (24.10.2003)

Ber bi êvarê tirimpêlek hat, em lê siwarbun û ber bi Mexmûrê ve birêketin. Ez ne şaşbim, ajovan ji Başûrê Kurdistanê bû. Bi hemû hêza xwe ji me re alikarî dikir. Em di gelek navçeyan re derbas dibûn. Li cihekê tirimpêla xwe sekinand û ji bo bêhnvedanê em peyabûn. Me av, çay û hinek tişt xwarin û vexwarin û bêhnek veda. Lê tişta min ferq kirî ew bû ku hemû heval li hember hevdu û li hember kesên cuda nêzîkatiyên birêzdarî û reftarên pir bedew raber dikirin. Her wiha her hevalekê li gorî hêz û kêrhatina xwe, çi xort çi jî keç, hewil didan karê xwe bi awayeke herî baş bimeşînin. Lê her di hizrê min de pirsa "min çima heval hiştin û hatim" hebû. Ax kalbûn! Lê belê çi bikim, ev jî rastiya min e.

Dema em hatin Mexmûrê li ber deriyê manga heval Qasim peya bûm, ew der cihê sazûmaniya hevalan bû. Wî jî di nava rêveberêya Maxmûrê de cih digirt. Di peyabûna me de axîn ji cîgera min hat, rondikên çavên min diherikîn. Piştî hevalan keyfxweşî dan me, me jî keyfxweşî bi dil henûniya xwe pêşkêşî hevalan kir. Heval Qasim em li derê malê dan rûnişkandin. Taştê amede kiribûn. Çay, nan, zeytun û penîr anîn ser sifrê, piştî xwarina taştê heval Qasim bi min re axivî û got: "Ez dixwazim te bişinîm mêhvanxaneyê. Ew der cihek xweş û vehêse. Tuyê bi rehetî li wir jiyana xwe bidomînî." Min jî erê kir û em her du bi hev re ber bi mêvanxaneyê ve meşiyan û gihiştin wir. Li mêvanxaneyê

heval Bedran berpirsyar bû. Ev heval ji bajarê Mêrdînê bû û di danûstandina xwe de xwedî reftarek rêzdar û hêja bû. Piştî me keyfxweşî da hev, heval got; "wê mam Hecî li gel we bimîne." Heval Bedran jî bi dilnizmî û keyfxweşî erê kir. Ez bi qedera çend rojan li mêhvanxaneyê mam. Paşê heval Bendran hat û bi min re ev tişt parve kir: "Me bi hevalan re cure kir, mêhvanxane pir qelebalixe, ji ber wê hevalan ji bo te manga heval mela Heyder pêşniyar kirin ku tu li gel wî bimînî." Li ser vê yekê ez û heval Bedran çûn manga mela Heyder.

Heval mela Heyder ji navçeya Bismila Amedê bû. Dema em çûn ber deriyê mangê, me li derî xist. Mela Heyder em li ber derî pêşwazî kirin. Em derbasî hundir bûn. Piştî silav û keyfxweşî dayînê heval Bedran mebesta çûyîna me vegot: "Hevalan mam Hecî şandine ku li manga we bimîne." Mela Heyder ev bi gotinên "heval bixêr hatiye, ser seran ser çavan." bersîvand.

## Nebaşî Û Qirêjiya Tesfiyekaran

Bi qasî mehekê li gel Mela Heyder mam, hinek tiştên nebaş bala min dikişandin. Hinek kes hebûn daxwaza wan ew bû ku partiyê belav bikin û ji bo vê yekê biser bixin jî di xwe de hêzek didîtin. Lê xwe dixapandin. Mîna gotina bav û kalan ya ku dibêje: "Dema beq xwe dinepixîne, hêzekê di nepixîna xwe de dibîne. Lê di rastiyê de ji xeyrî nepixandinê ti tişta beqê nîne." Daxwaza wan belavkirina partiyê bû, lê mîna beqê ji derveyî qurequr derdixistinê tiştek din nîn bû, nikarîbûn tu tiştkê jî bikin. Ez bi qasî du mehan li manga mela Heyder mam, bi rastî mejiyê min tevlîhev dibû, pîskolijiya min xiradibû. Ji ber ku cara yekem bû min rewşeke wisa bi çavên xwe didît û bi guhê xwe dibihîst. Hinek kesan bêrêzî li beramberê şehîdan, Rêber Apo û gelê Kurd dikirin. Vê bêwujdaniyê û bêşerefiyê pir eşkere û ji dil jî dikirin.

Dema min didît qehirîn û bêzarî di min de çêdibû. Min xwe di nava sir û seqemê de hîs dikir. Nimûne; dema ez û Cewdet çûn Îranê, tevî ku em demek dirêj li benda Hemze man û me gelek hêvî û tika jê kir jî rê neda em biçin serdana heval Cûma. Paşê bi alîkarêya heval Serxwebûn û erêkirina heval Cemal ku ji me re têbînî nivîsand em çûn. Lê vê carê em li rastî astengiya Elî Dûrsûn, Osman Ocalan û Berxwedanê Serhedî hatin. Hem nehiştin em serdana heval Cûma bikin, hem jî bi uslûbek

nexweş em pêşwazî kirin û danûstandin li gel me kirin. Her wiha qaşo xwe li cihê heval Cûma didanîn û digotin; "ma em jî heval in." Evê nêzîkatiyê hingê ez dabûm fikirandin. Aha heman rewş li vir jî, yanî li Mexmûr jî hebû û vê rewşê ez pir didam fikirandin. Pêhesên min tiştên pir metirsîdar û xirab bi min didan hîskirin. Gelek kesên xirab yên ku zincîrên xwe qetandibûn li van deran diçûn û dihatin. Kesên baweriyê kêm bûn. Kesê cihê baweriyê heval MustafaCizîrî mabû. Car car dihat manga me û li gel mela Heyder bi nehênî û ji min veşartî daxivîn û min jî tiştek ji wan fêmnedikir. Car car mela Heyder li min dinêrî û digot; "di serî de heval Cûma, heval wê bersiva van kesan bidin û wê van pirsgirêkan di nava xwe de çareser bikin." Lê dîsa jî dilê min ne aram bû. Mela Heyder û heval MustafaCizîrî bi dilsozî bi rêxistinê ve girêdayî bûn. Lewma vê yekê hinek bêhna min derdixist û aram dikirim.

Mayîna min a li gel mela Heyder keyfxweşî dida min, lê tevî vê jî hevalan tiştek bi min re parvenedikirin. Lê hêviya min hebû ku hevalên ku bi dil û can û bi rastî û durustî bi bîrdozî û paradîgmaya Rêber Apo ve girêdayî ne, wê bersiva van derdoran bidin û pêşî li wan bigirin. Ji xwe vê rastiyê jî xwe dida der ku wê di demek kurt de nefesa van tesfiyekaran di qirika wan de bimîne û pê bixeniqin. Wê armanc û daxwaza wan pûç bibe û wê di nava hêz û vîna gelê welatparêz û girêdayî xeta rast ya têkoşînê de têkbiçin û hilweşin. Bi taybet gelê Mexmûrê bêzarî û nerehetiya xwe li hember van tesfiyekaran dida nîşandan û digotin; "bila Celalê Şirnexî (wê demê rêveberê wargehê bû), Osman, Botan, Kanî Yilmaz û yên bi wan ve girêdayî ji wargehê derbikevin. Em van kesan di nava xwe de napejirînin."

Di wargehê de ji biçûk heta mezin, her kesê hêrs û bêzariya xwe li hember van kesan tanîn ziman û bi serbilindî bang dikirin ku ev xayîn û xwefiroş ji wargehê derbikevin.

**Hatina Pênc Keçên Ciwan**

Rojekê ez û Mela Heyder li mangê rûniştî bûn, min dît ku pênc hevalên keç hatin manga me. Min nasnedikirin, min heval pêşwazî kirin. Piştî keyfxweşiyê min çay ji wan re demkir, îskan tejî kirin û danî ber wan. Mela Heyder bi wan re cure dikir, ez jî li gel wan rûniştim. Hevalek ji wan zivirî, berê xwe da min û got: "Mam Hecî em ji bo azadiya gelê xwe hatine van deran, eger me mêrek bixwesta, em ji mala bavê xwe dernediketin, nedihatin. Hindek dibêjin; ma hûn nizanin Osman birayê Rêber Apo ye, em li fikrên wî binêrin, jê re rêz bigirin û kar bikin. Lê ev nerast e. Mane kurê Nûh pêxember jî li pey Nuh neçû, bi gotina bavê xwe nekir, tofanê ew xeniqand. Mirov nikare bêje ev tesfiyekar rêhevalên Rêber Apo ne, ev tesfiyekar wek kurê Nuh pêxember in, yek ji van li pey Rêber naçin, dibêjin hûn li pey me werin. Li pey van çûyîn qutbûna ji şoreşê ye, ji xwe re pejirandina zilameke qirêj e."

Belê rast e, îxanet û berxwedan bi hev re dimeşin. Wan nezanan û îxanetkaran fermana şehîd Mazlûm DOGAN a ku dibêje; "Berxwedan Jiyan e" ji bîr kiribûn. Emê li ber xwe bidin. Neşaşbim navê wê Bêrîvan bû. Dilê min germ kir û keyfxweşiyek bêhempa da min. Qutbûna ji hevalan hat bîra min û ev hest ketin ser zimanê min:

**Evîndarê Rêya Te Me**

Evîndarê rêya te me
Doza te û welatê te me
Ji te re soz didim hevalê
Ji te re û xakê re bikim kar e

Lê îro dil birîn e
Bi keser û bi axîn e
Carek din we nabîne
Li wan rojan digerim e
Lê ew bext li min nîne

Bê te ez jîn nakim dilo
Li gel te kar bikim lo

Ezê karê te gotî serxim lo
Hetanî bêjî bese lo

Çavên te yên reş û geş
Ez kirim evîndarê şoreş
Bê te nameşe ev rewş
Bêje min de were bimeş

Bila te bibînim carek
Ji we re bibim evîndarek
Ezê gihiştime yarek
Ew evîna dil şewatek

Rojek geşbû min tu dîtî
Evîndarek ji dûr hatî
Lê çi bikim îro ji we dûr im
Dengê dilê xwe nagihînim

Ez kalbûm ji evîna we
Bawer im êdî nabînim rûyê we
Ji nexweşî û kedera xwe
Dê bimrim êdî, nagihêjim we

**Mejiyê Min Têşiya**

Ez di hiş û mejiyê xwe de têşiyam. Hinekan ên di nava tesfiyekaran de xwe bi şêran wesif didan, lê ne rovî jî bûn. Mirov dikare wan bi vî rengî bide naskirin. Tu du melûyên kaya şilêr şil bikî û bixî afirê gamêşekê, dîsa jî têr nabe. Tesfiyekar jî ji xwarinê têrnedibûn, daxwaza van şikandina jinê bû. Evên tesfiyekar xwe bi kirinên xwe li holê diyar bûn. Mînakek gelêrî heye ku dibêje; "Dayikek ber bi gorîstanê ve diçû û hêdî hêdî digirî. Melayek li rastî tê û di navbera wan de guftugoyek wisa derbas dibe.

Mela: Tu çima digirî?

Dayîk: Ji bo kurê xwe digirîm.

Mela: Wê Yezdan wî bibexşîne.

Dayîk: Na. Kurê min misilman bû lê çû ser dînê Hz. Îsa. Hz. Îsa jî wî nas nake, Hz. Mihemed jî ew ji bîr kiriye. Lewma ji bo halê wî digirîm.

Mela: Ji bo we tiştekê bibêjim. Ne Hz. Îsa, ne Hz. Mihemed, ne jî Yezdanê dilovan ji îxanetê hez nakin û bexşandina xayînan nîne. Tu jî xwe jê biparêze û razîbûna Yezdan bipejirîne û heroj lenetê li wî bike."

Aha mirov dikare herî baş û zelal van îxanetkaran bi vê mînakê bide ravekirin. Karê mirov nerast be, meşandina wê rast nabe, tu kes guhdarêya mirov nake. Weke pêşiyên me gotine; "navek giran gundek wêran." Di nav de xwe mezin didan diyarkirin, lê di naverok û cewherê xwe de vale û ne tu tiştek bûn. Lewra dema Amerîkayê jî cewherê wan yê vala dît, ew ji pêşiya xwe avêtin, rût û tazî man û hatin lanet kirin.

Wan xayîn û tesfiyekaran derfetên partiyê di xizmeta kadroyên xwe de bikartanîn. Li pey keyf û lezeta xwe ketibûn. Tiştek ji xwe kêm nedihiştin. Pere, tirimpêl, têkiliyên bê exlaq, gerêyan û … Hemû tişt ji xwe re rewa didîtin. Qaşo pergalek nû, ferasetek nû û şêweyê jiyanek nû diafirandin. Lê di rastiyê de ew û kesên li derdora wan kombibûn kesên lewaz, ketî, bêrûmet û basît bûn. Lewra nekarîn li beramber vîna rast ya Apoyî li ber xwe bidin. Ji ber ku di wargehê de hem kadroyên rastî girêdayî xetê, hem jî bi giştî gelê wargehê pêşiya wan girtin û ew di nava wargehê de tengav kirin. Rê ji wan re nehiştin. Êdî di wargehê de du bere çêbibûn. Bereya xeta Rêber Apo û bereya tesfiyekar û xayîn ya Osman, Botan û hevalbendên wan. Lê weke her carê dîsa rêya rast, felsefeya Rêber Apo ya jiyana rast rave dike biserket.

## Xebatên Tesfiyekaran Tunekirina Partiyê Bûn

Daxwaza wan tinekirina rêxistinê bû, ji xeyrî vê daxwazeke din tunebû. Mirov dikare bêje ku, ketiyê mal û mulk bûn û daxwaza wan jiyanek modern, maldarî û pere bûn. Cara yekemîn min dît ku ji bo rêxistinê belav bikin destên xwe yên qirêj dirêjî keç û xortên şoreşger dikirin û digotin: "Ger em ji nava şoreşê hebûna jinê xilas bikin, wê yên din jî li pey wan werin." Di rastiyê de evana kesên neletîbûn. Mirov dikare rewşa van bêrûmetan bi çîroka beqê baştir rave bike. Wihaye; "carekê mirovekê beqek ji nava deryayê derxist û jê re got ku ezê rûyê te bi tifa xwe şil bikim. Beqê jî jê re got ku ser û çavên min di nava behrê de şil tunebûne, wê çawa bi tifa te şil bibe?" Van bêrûmetan ji şehîdan, ji Rêber Apo û gelê Kurd şerm nekirin, tu bi hezaran carî neletê lê bikî û tifbikî ser û çavên wan jî şilnake. Ji ber ku bêşeref û bêfedîne. Lê durûtî û derewê di nav wan de cihê xwe di asta bilind de girtibû. Bes divê tu car û bi tu awayî mirov îxaneta wan jibîr neke û her dem wan binelet bibîrbîne. Ji xwe dîrokê jî kiryar û bêrûmetiya wan nivîsandiye. Gotinek heye dibêj; "beniştê xwe cûtiye û li eniya xwe daye." Wan jî benîştê xwe cûtine û li eniya xwe dane.

## Digotin "Em Qencîxwazin!"

Digotin heval ji qenciyê fêmnakin, weke yê gotî werin em we bibin biheştê, wan jî gotî çarşeme. Haya wan ji qenciya me nîne. Ew jî weke bav û kalên xwe nezanin. Emê ji gaziyan re hefsed xaniyan çêbikin. Lê hevalên gazî jî nerehetiya xwe tanîn ziman û digotin; "em hatine ji bo gelê xwe kar û xebatê bikin." Bi vî awayî li hemberî van nêzîkatiyan derdiketin, hêrsa xwe li hember wan tanîn ziman û tawîz nedidan wan. Her wiha hevalên li bereya xeta Rêber Apo bi zanyarî tevdigerêyan û xwedî li rê û rêgezên rêxistinê derdiketin. Evana ew hevalbûn yên ku rêya Rêbertiyê rast dişopandin û li hember gelê xwe û doza xwe rêzdar bûn. Êdî hêdî hêdî li vê derê dengê van hevalan gur dibû. Ev beşa hevalan bi tu awayî neketin bin badora wan xayînan. Heta dawiyê rûmeta xwe û xeta partiyê parastin û lê xwedî derketin. Çav nedan mal, xweşî, cil û berg û pereyan. Tevî ku zorî jî dikişandin, lê tawîz nedidan wan xwefiroşan. Wê demê birçîbûn bibû parçeyek ji jiyana hevalan. Di

gewrêya wan de xwarin nediçû xwarê. Lê ev ji bo wan negirîng bû, ya girîng parastina rêxistinê û xwedî derketina li wê bû.

Gelê Mexmûrê deng derdixistin weke şêran û dest didan destê pilingên birîndar bibûn, li beramberê wan derdiketin. Digotin; “hûn tesfiyekar û îxanetkarin, hûn ne di vê ferqê de ne.” Lê di bingehê partiyê de tovê henûniyê hatibû reşandin û mîmarê vê henûniyê jî Rêber Apo ye. Hevalên konseya rêvebir heval Cûma, heval Fuat, heval Ebas, heval MustafaKarasû û heval Cemal tu carî fermanên Rêber Apo ji bîr nekirin. Li ser fermana Rêber Apo ya ku digot; “eger mîrovek bikeve nava îxanetê ku mûyeke tenê yê serê wî ji der ve bimîne, destê xwe bavêjinê û wî xilas bikin ji îxanetê.” bi baldarî dihat sekinandin. Hevalên konseyê vê henûniyê dihizirîn û tevahiya rêxistinê jî bi vî awayî bû. Lê mixabin mûyekî paqij di serê wan de nemabû. Gel jî ev tesfiyekar erê nedikirin û bi dengeke bilind digotin; “ji kampê derbixin û bavêjin van xayîn û xwefiroşan.”

Pêşengên wan tesfiyekaran Osman Ocelan, Nizametin Taş, Celalê Şirnexî û yên weke wan bûn. Ev nirxandin di her cihî de çêdibûn, evana wek tolê ji partiyê bigrin xwe didan nîşandan. Feraseta wan ya azadiya civakê wisa bû; “ger ne ez bim, bila azadiya Kurdan jî nebe. Yan ez yan qet.” Yanî van xayînan azadiya tevahiya gelê Kurd qurbana xwe dikirin. Bêrêzbûn, hem jî di bin siha Rêber Apo de xwe vedişartin û xwe weke ku rêzdarêya wan ji bo Rêber Apo heye nîşan didan. Osman Ocelan digot, “ma hûn nizanin birayê Rêber Apo me! Hem jî min di nava vê têkoşînê da cihê xwe girtiye.” Ev gotina wî weke mînaka bav û kalane ku dibêje; “kirin yên Musayane, lê piratîka wan ya Fireewnane.” Navê Rêber Apo li ser zimanê wan kêm nedibû. Bi diruşmeyan navê Rêbertiyê digotin û di çavên gel de xwe wisa didan nîşandan. Yanî, li keştiya Rêber Apo siwar bibûn, lê di nîviya deryayê de gemî hildiweşandin. Ma qet nedihat bîra wan bi hezaran heskirêyên vê gemiyê hene. Wê xwedî li gemiya xwe derbikevin û wan biqewitînin. Dengê tesfiyekaran wê di qirika wan de bimîne, ewên weke wan lewazin bi kêri tu kesan nayên, ji ber bi kêrî xwe jî nehatine. Dixwestin di cîhana kapîtalîstan de cih bigrin, ji xwe cih girtibûn jî. Destê xwe dirêjî Amerîkayê kirin, lê ji wan re hat gotin; “ewên bikêri xwe neyên, bikêrî ti kesî jî nayên.” Mirovê lewaz her amedeye ku xwe bavêje himbêza dijminê xwe, hîç berjewendiyên gelê wî jî tê de tunene. Rewşa wan jî li çîroka rûvî ve diçe. Dibêjin, dema rûvî

xwe dola şêran de dibîne, xwe mina şêran dihesibîne. Lê di rastiyê de rûvî her rûviye.

Ez bawerim mirovê ku xwe bavêje himbêza dijminê xwe, wê ji holê rabe û wê bi mirinê re rû bi rû bimîne. Di dîroka nêz de tecrûbeyên giranbiha derketine holê. Rêberê me bi xwe şervanê gelê xwe ye, gelê wî pê bawere. Mînak; Mela MustafaBerzanî girêdana xwe bi Îranê re da çêkirin. Qazî Mihemed jî girêdana xwe bi Rusya re da çêkirin. Evana bi vana bawer kirin, ji ber wê nekarîn karê şoreşê berdewam bikin û rêxistina wan di dawiyê de têk çû. Xwesteka van tesfiyekaran îxanet bû. Bawerêya gelê Kurd bi şehîd, Rêber Apo û şervanên wê hebû. Ji ber wê vana nekarîn Kurdên welatparêz û gêrilayên ku bi dehan salan xwe li nava çiyayên azad dîtine belav bikin. Ji ber ku vîn û bawerêya wan xurt bû. Gelê Kurd, di girêdana xwe de bingehek avakiriye û canfedayê şehîd û Rêberê xwe ye.

**Keç Hildan Li Ber Çavan**

Di serî de tesfiyekaran destê xwe yê qirêj dirêjî keçên xwedavend kirin. "Eger keç ji nava wan derbikevin wê gelek hêsan be", wisa difikirîn ku jinên xwedawend bila nebin xwediyê kar û xebatan. Dema azadiyê hîs bike, wê kes nikaribe wê ji azadiya wê bide dûrxistin. Bila hînê hevparêya zanistê nebin. Ew tesfiyekar weke sîstema desthilatdar difikirîn ku jinê qet qetî bike, bi her cureyê qirêjiyê biêşîne. Ma nedizanîn wê gelê Kurd helwestek tund û hişk bide nişandan. Qaşo bi armanca gaziyan bikişînin gel xwe, soza çêkirina xaniyan û avakirina jiyanek vehês ji wan re dikirin. Lê belê hevalên gazî ev yek red kirin û bi tundî li hember rawestiyan. Vê carê jî her weke ku qenciyê dikin û tên redkirin, digotin; "em dixwazin jiyanek xweş û vehês bidin we." Tişta başlkêş jî ew bû ku qaşo bi navê rêxistinê ev tişt digotin û dixwestin bikin. Jixwe bi van nêzîkatiyan tesfiyekaran qirêjiyên xwe derxistin holê û xwe eşkere kirin.

Herî dawiyê mijara zewacê derket holê. Jixwe bi nehênî tu bêexlaqî nemabû ku nekirin, vêca ev yek êdî bi eşkereyî digotin. Di Mexmûrê de tesfiyekeran mijara zewaca şoreşgerên Apoyî dixistin rojevê. Tu xirabî neman ku nekirin. Gêwilê min diket asta herî jêr. Ma keç û xortên Kurdan ji bo zewacê hatine vir, ma tê qebûl kirin? Nexêr, ev tu caran di

nava vê partiya bi şeref de nehatiye pejirandin. Ev partî bi şerefa keç û xortan hatiye parastin. Gelê Maxmûrê digot; "em dereng man, hê demjimêrek li pêşiya demjimêrekê helwesta xwe bi tundî bidin nişan kirin." Lê gelê Mexmûrê li ber teqînê bû.

Heval Rustem Cûdî û heval Remzî Kartal hatibûn Mexmûrê. Wê rojê keyfxweşiya gelê Mexmûrê gihiştîbû asta herî jor. Gaziyan pêşengî hildabû ser milên xwe. Heval Rustem û heval Remzî Kartal li navendê bi Nizamedîn Taş û Celalê Şirnexî re nîqaş dikirin. Di wê demê de Osman Ocelan li Silêmaniyê bû. Bi qederekê nîqaşa heval Rustem û Remzî bi Nizametîn Taş û Celalê Şirnexî re berdewam kir. Hevalên gazî ketin gumanan. Du hevalên gazî serî li Celalê Şirnexî didin ku bi heval Remzî re biaxivin. Lê Celalê Şirnexî qebûl nekir. Di vê navberê de gelek heval li benda van hevalan bûn ka wê daxwaziya wan bê pejirandin yan na. Hemû di nava gumanan de bûn. Derî hatibûn girtin, da ku kes nekeve hundir. Pişt re deriyê navendê hat vekirin. Ji gel jî gelek kes hatibûn, gel ket hundirê merkezê. Ji ber ku hejmar gelek zêdebû, derî mabû vekirin. Gel bi hevalan re ket hundir, destê Nizametîn û Celal girtin û avêtin ber derî. Ji Osman Ocelan re bûyerê ragihandin. Dixwestin mij û dûmana li ser serê wan were rakirin, gelê wargehê ew nêzikatiyên wan yên kirêt li ser xwe nepejirandin.

### Mexmûr Gelek Sar Bû

Sermayê Mexmûr dorpêç kiribû, gelek sarbû, lê havîna wê jî pir germ bû. Van îxanetkaran nedikarîn di vê sarmayê de cihê xwe li Mexmûrê çêbikin, ne jî di demên germahiyê de. Di dawiyê de hemû kesên îxanetkar û tesfiyekar ji wargehê hatin derxistin û bi vî awayî wargeh ji îxanetkaran hat paqijkirin. Evîna gelê wargehê şehîdên Rêber Apo û şervanên azadiyê ne. Ew xayînên bêrûmet jî li kolanan belav bûn û hinek li Başûrê Kurdistanê hinek jî li Awrûpa bi cih bûn. Lê belê wê her rojekê gelê Kurd qirika wan bigire û ji ber îxaneta ku kirine hesabê ji wan bipirse. Bêguman wê dîrok vana nebexşîne. Gelê Mexmûrê li ser piyan bû, kom bi kom dihatin serdana hevalan. Hevalên li wir diman, heval Rustem Cûdî û heval Remzî Kartal bûn. Nîqaş bi hemû kesên ku diçûn wir re dikirin. Ji ber ku dixwestin guhdarî gelê gilî û gazinên gelê xwe bikin. Bi rastî jî her kesê ku diçû gel hevalan, wan rexne dikirin û

digotin; "çima heta niha ev îxanetkar û tesfiyekar ji nav rêxistinê nehatine avêtin û qewitandin?" Wan rexneyên wisa li heval Rustem Cûdî û heval Remzî Kartal dikirin, wan jî bersiva gel wiha didan; "PKK hêza gele, ew biryarên ku gel bigre wê partî bicih bîne. Ji ber ku em heta dawiyê li beramberê biryara gel rêzdarin."

**Derketina Ji Mexmûrê**

Min dixwest serdana rêveberêya wargehê bikim. Bi taybet di vê demê de ji bo min derfetek derketibû holê. Li vir hevalan pêşniyara xwe dikirin ku dîsa bizivirin çiyê. Ez gelek difikirîm ku wê dîsa rêya çiyê xwe nişanî min bide yan na? Min jî daxwaz dikir ku carek din biçim çiyê. Min biryara xwe da ku ez biçim gel heval Rûstem Cudî û heval Remzi Kartal. Ber bi merkezê ve ketim rê. Heval Rustem Cûdî ji Başûrê Rojavayê Kurdistanê, ji gundê Dirbesiya Serêkaniyê bû. Heval Remzî Kartal ji Bakurê Kurdistanê, ji bajarê Wanê û ji eşîra Bûrûkan bû. Min deriyê merkezê vekir û dembaşî li wan da. Hevalan jî bersiva min dan, me keyfxweşî li hev da. Cihê rûniştinê nişanî min dan, ez rûniştim û çayek dan min. Heval Rustem ji min pirsî, "dikarim we nas bikim?" Min got; "ez ji Geliyê Zîlana Erdîşê a bi ser bajarê Wanê me." Vê carê heval Remzî berê xwe da min û pirsî; "tu mela Nûrî yî?" Min got, "belê." Got; "tu ji kengê ve li vir î?" Min got; "bi qasî çend mehane li vir im." Di vê navberê de heval Rustem berê xwe da min û bi awayek henekwarî ji heval Remzî re got; "tu nabêjî em hemşerêyên hev in?" Vê gotinê Rûyê min da kenandin û gêwilê min bilindkir. Heval Rustem ji heval Remzî pirskir û got; "tu Hecî dinasî?" Heval Remzî: "belê, ez dinasim." Suhbeta me demek dirêj ajot. Ji gelê Mexmûrê jî hinek hatibûn serdana hevalan. Jixwe ji çiyê hinek hevalên nû li wargehê hatibûn şandin. Hinek hevalên li wargehê jî daxwaz kiribûn û çûbûn çiyayên azad. Min jî biryara xwe dabû ku biçim çiyê. Her çendî temenê min gihiştibû pîrîniyê jî, lê dîsa jî min dixwest xwe bigihînim hevalan û wan çiyayên azad. Min vê pêşniyara xwe arasteyî heval kir û hevalan jî erê kirin.

Heval kom bi kom ber bi navendê (merkez) ve dimeşiyan. Pêşniyara min hatibû erêkirin, min daxwaziya xwe ji hevalan re biribû. Rûyê min ji keyfxweşiyê geş dibû. Lê rûyê hevalan jî geş bû, dema mirov li wan dinêrî, diyar dibû ku çiqas keyfxweş û dilşadin. Her weke ku ji agirê

dojehê xilas bibûn û biheştê xwe nîşanî wan dabû. Di rûyê wan de fedekarêya çiyayan dixuya. Rêya çiyayan ji bo min hat diyarkirin. Min dixwest demek ji dema zûtir bizivirim li gel refên şervanên azadiyê û dilxwazên gelên bindest. Êdî her demjimêra ku li vir dimam, li min zor dihat. Her wiha min ji hevalan xwestibû ku heval Cûma jî bibînim. Ji ber ku ew bû sedem ez bibim gerilayê azadiya Kurdistanê. Ew bû navbeynkarê min û doza min ku ez bigihim daxwaza xwe ya şervantiyê.

**Heval Cûma Jiyan Da Min**

Di ciwantiya xwe de tişta ku min dixwest bikim, di kal bûna xwe de gihiştimê. Ew tişta ku min dixwest, di xewn û xiyalên mirovan de derbas nedibûn. Lê di dawiya temenê xwe de jî be gihiştina min ya li gel heval Cûma, dîtineke herî watedare di jiyana min de. Ez li pêşiya xwe dam rûniştandin. Bi dîtina wî re ew qas bihêz bûm, xem û derd di dilê min de neman. Dîtina heval Cûma hêzeke pir xurt dabû min. Mîna zarokekê ji nû ve ji dayîk dibûm li ser rûyê erdê. Min ew qas ji heval Cûma hezdikir ku veqetandina min ya ji wî ne di bawerêya min de bû. Lê mixabin ew roj wê bibûya, di wextê xwe de çêtunebû. Heskirina wî di nava dilê min de hêlîna xwe çêkiribû. Min dixwest layiqê şehîdan, Rêber Apo û hemû hevalan bibim. Keyfxweşiyek herî mezin dida min, di rastiya min de pîrbûn hebû, di gewdeyê min de nexweşî jî hebûn.

Sal 2004 bû. Sibata reş hêdî hêdî cihê xwe ji Adarê re dihêla. Gelê di wargeha Mexmûr de gelek dilşad bûn. Li ser mijara ew pirsgirêkên ku tesfiyekeran di nava wargeha Mexmûrê de derxistibûn nirxandin çêbibûn, ji aliyê gelê wargehê û gelê Kurd ve ew tasfiyekar ji holê hatibûn rakirin. Gêwilê gelê wargeha Mexmûrê pir bilind bû. Ji ber ku kolanên wargeha Mexmûrê ji bêbextan û îxanetkaran hatibûn paqijkirin. Wiha dihat gotin; “gel serkeftinek mezin bidest xistiye.” Ji ber di dîroka Kurdan de şoreşên dihatin afirandin, di hundirê xwe de bi îxanetê hildiweşiyan. Lê vê carê îxanet serneket, îxanet hilweşiya. Ciwanên Kurdan, çi keç çi xort, çi jin, çi zilam tu wextî ji dijmin netirsiyane, li ber xwe dane û têkoşîna xwe bi serbilindî domandine. Heskirina gelê Kurd ji bo şehîdan û Rêber Apo bêhempa ye û heta dawiya dilopa xwîna xwe girêdayîne. Bawerêya xwe bihêz kirine û

tevayî gelê Kurd heskirin û girêdana bi şoreşa Rêber Apo re nîşan daye. Şopandina rêya şehîdan û rêzikên Rêber Apo ji xwe re erê kirine.

**Derketina Min Ji Mexmûrê**

Derketina ji wargeha Mexmûrê ne xweş bû. Ew, parçeyek ji şoreşê ne. Lê pêwist bû fêrî xwendin û nivîsandinê bibûma. Dîtina perwerdeya hevalan wê ji bo min gelek başbûya, hem jî di dibistanên hevalan de kesên nexwendine fêrî xwendinê dibin û ev jî serkeftinek girîng e. Perwerdeya rêxistnê ku mamosteyên wê hevalin, wê gelek pêşketinê di min de bidin çêkirin. Hêjaye her kes di van perwedeyan re derbas bibe. Ji ber ku ew perwerde bi fikir û ramanên Rêber Apo hatine kildan.

Hevalan têbîniya min a çûyîna çiyê nivîsandibûn û teslîmê heval Mordem ê ajokar kiribûn. Heval Mordem hat ber derê mangê û banî mela Heyder kir. Min got; min bersîv da. Heval Mordem li min vegerand û got; “xwe amade bike, tu wê ji bo perwerdeyê biçî çiyê.” Min jî bi keyfxweşî bersiva heval da û ez gelek dilxweş bûm. Lê mixabin xwendin û nivîsandina min tune bû û min bawer nedikir ku ezê bikaribim di vî temenî de fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê dayîkê bibim. Tevî vê jî, ji bo fêrbûna xwendinê dilxwazî û coşek mezin a min hebû. Lê min gelek bêrêya hevalan kiribû. Ewên ne ji bo berjewendiyên xwe, ji bo berjewediyên gelê xwe li ber xwe kardikin. Dilovanên dilşewitî yên gelê Kurd bûn ew, bi keyfxweşiyeke mezin, bi germahiya dilê xwe, bi dilsoziya bi şehîdan û Rêber Apo re min xwe avêt himbêza heval Mordemê ku wê min bihinêre çiyê. Ji Mexmûrê çavek bi girî derketim, lê her çendî çavên min digirêyan jî, dilê min şad bû û dilsoz bûm. Ji ber ku ezê biçûma li gel şervanên azadiyê. Ew, evîndarên gelê Kurd û gelên bindestan in. Wan, ji bo bindestiyê ji nava cîhanê rakin û wekhevî û biratiyê bafirînin soz dane şehîdan û Rêber Apo. Soz dane û bibiryarin ku heta dilopa xwîna xwe ya dawiyê ji bo gelê xwe û gelên bindest kar bikin. Soz dayîn ne tiştek hêsane, lê fedekarî û cangorîtî daxwaza hevalan bû. Her cihê ku ez jê qut dibûm, xemgînî û girî ji bo min tanî. Gelek dilhenûn bûm û gelek tengbûm, ez bawerim ev hestiyarî ji temenê kalbûnê dihat.

Em li tirempêla heval siwar bûn, me berê xwe da Qendîlê û em çûn gel hevalan. Bi dilekî germ em hatin pêşwazî kirin. Cihê em lê sekinîn

mêvanxaneya Sûredê bû. Dîrok 24'ê Adara 2004'an bû. Cihê ku heval Cûma lê disekinî, Sûredê bû. Bi xwezayî hatibû xemilandin derdora heval Cûma. Bi gelek rengên daran hatibû dorpêçkirin. Hem jî bi çem, kanî û şînatiyan hatibû xemilandin. Her weku mirov şalpek şîn bavêje ser van cih û waran, şînahiyê xwe di rûyê mîrovan de dida xuyakirin. Bi kulîlkên binefş, rihan, nêrgiz û beybûnê hatibûn xemilandin. Bayê berbanga sibehê li gulan dida û hêdî hêdî dihejandin. Pê re bêhnek xweşik bi lêdana bayê berbangê jê dihat. Ew bêhn li wan çiyayan û waran difûrêya. Ya rastî heval Cûma di nava gulan de ya herî xweşik bû. Bêhna wî ji bêhna her gulekê xweştir bû. Li xwezayê giya şînkiribûn. Giyayên dihatin xwarin yên weke rêvas, guhîj, mendik, heliz, cax, kêvark û tirşok lê hebûn. Ev nehatibûn çandin û hemû jî xwezayî bûn. Daristanek pir gur bû, spêndar bi metreyan bilind bibûn. Di wan dolan de bax û bostan bi rengê darên fêkiyan hatibûn xemilandin. Darên sêv, gûz, zerdele, hilû, hinar, behîv, berû yanî hemû cureyên darên fêkiyan lê peyda dibûn. Daran kulîlkên xwe vekiribûn, hê nû dibişkivîn. Xakê jiyan dafirand, berf diheliya, av jê di xulxulî. Jiyanek nû ji bo mirovan dida afirandin. Avên çem, kanî û robaran diherikîn di wan dol û newalan de û vexwarina wan avan giyan peyda dikir di cesteyê mirov de.

**Dîtina Heval Cûma**

Siyaset, têkoşîn, çand, hûner, jiyan, bi hev re dimeşiyan, hem jî di bin van mercan de. Şerek dijwar û demdirêj bû. Dibistanên ji bo fêrbûna zimanê dayîkê hatibûn damezrandin bi xwîna şehîdan hatibûn afirandin. Hemû bi hev re dimeşiyan. Heval Cûma ji xwezayê gelek hez dikir, erd radikir, çandina gulan bi destê xwe pêktanî. Digot; "ked jiyane, rûmeta mirovan e." Ev çandinî ji bo heval Cûma jiyanek bû, ev jî rastiyek ya têkoşînê ye. Ev jî tu caran nedihat jibîrkirin û bi kurtî çiyayên Kurdistanê bi van rengan hatibûn xemlandin. Ev xelata xwezayê ji bo gelê Kurd hatibû diyar kirin. Bi kurtî, biheşt bû. Birastî xweşikbûna heval Cûma ji mirovan re daxwazek ya dîtinê bû.

**Mêhvanxaneya Sûredê**

Min li mêhvanxaneyê nêrîna xwe bi heval Eliyê Amedî re parve kir. Nêrîna min ew bû ku heval derfet bidin min serdana heval Cûma bikim. Min û heval Eliyê Amedî li ser vê mijarê cure dikir. Mijar serdana heval Cûma bû. Bi vê cureyê em gihiştin encama dawiyê. Heval Elî got; "ezê ji bo desturê têbîniyekê binivîsim û ji bo hevalan bişînim. Dema bersiv hat dayîn emê daxwaza te bi encam bikin." Bi vî awayî ji bo daxwaza min a dîtina heval Cûma, heval Elî têbîniyek nivîsand û şand. Ji min re jî wisa got; "hinekê sebir bike heta bersiv bê dayîn." Jixwe ez li mêhvanxaneyê bûm. Ev mêhvanxane jî ji mêhvanan her tim tejî bû. Ji her çar parçeyên Kurdistanê û cihên cuda yên derveyî welat kes û komên ku hesreta wan dîtina heval Cûma bûn, li wir kom dibûn. Jixwe her tim deriyê partiyê ji bo herkesê vekirîbû.  Pêdiviyên mêhvanan di pêşiya hertiştî de dihatin û mêhvandariyek pir baş ji bo her kesên ku dihatin dikirin. Li cihê mêvan tê de disekinîn pêdiviyên weke cihê razanê, aşxane, serşû, çapemenî û weke din yên rojane dihatin pêkanîn. Jixwe di çanda gelêrî ya Kurdewariyê de mêhvanperwerî heye. Vê çanda gelêrî di nava hevalan de jî bi layîqî xwe dida berdewam kirin. Li vê derê mêhvan bi rengeke xweşik dihatin pêşwazîkirin. Min hinek mêhvan dîtin, bi hatina xwe gelek keyfxweş bûn, rûyê wan geş bibû û nedixwestin hevalan bihêlin û biçin. Ji ber wê, dema dibû wextê veqatana ji vir, di rûyê wan de xemgîniyeke kûr dihat dîtin.

Carekê min ji mêvanekê pirsî; "dema hûn hatin rûyê we geşbû, lê çima niha rûyê we bi xemginî diyar dike?" Wî jî wisa bersiva min da; "mamê Hecî, dîtina wan hevalan hesreta dilê hemû Kurdan e. Temenê min pênciye, ezê carek din bikaribim serdan bikim yan na, nediyare. Çawa melûl nebim. Bi hezarî sale di nava cîhanê de hêza me tunebûye. Desthilatdaran xwîna me rijandine û mêhtine. Berde anîna wekhevî, azadî û jiyanek aram, li ser gelê Kurd tim komkujî û kuştinên kiryarên wan nediyar pêkanîne. Niha evîn û hêvî ji me re çêbûye. Hêviya jiyanek azad û xweş ya di bin rêbertiya Rêber Apo û têkoşîna azadiyê de. Ma ger bi dûrketina ji vana xemgîn nebim, ezê kengê xemgîn bibim? Ew hêzên parastina me û rûmeta me ne. Mirov çawa dikare wan li vir bihêlin û biçe?"

**Hatina Têbîniya Heval Cûma**

Di vê navberê de hevalan bersiva têbîniya min anîn, ez gelek pê keyfxweş bûm. Min stran digotin, mîna mozên li ser daran vinge ving jê tên bibûm, lê tiştek ji min nedihat fêmkirin. Gelek dilgeş bûm. Heval Elî ji min re got; "çima tu ev qas dilxweş bûyî?" Min got; "ma tu nizanî heval Cûma bersiva daxwaza min şandiye û gotiye bila were? Çima keyfxweş nebim? Ji vê keyfxweşiyê zêdetir, ma tiştek din ji bo min heye di cîhanê de?"

Ez pîremêrek 63 salî bûm, lê wisa keyfxweş bûm ku nayê vegotin. Ji ber heval Cûma banî min kiribû, gelek dilşadbûm û min hewil dida bixwe bimeşim û biçim, lê ez pîr bûm, dihat xwestin ku hevalek alîkarêya min bike. Min fedekarêya qadroyên partiyê li vir dît. Di rojê de sê caran xwarin dihat amedekirin. Di rojê de ji bilî sê danên xwarinê, gelek caran di navberan de xwarin dihat dayîn. Jixwe anîna çayê bêhesab bû. Du beroşên ji sifra Sêrtê û çaydan dihatin kelandin. Li ser kuçikê ji çar beran pêkhatibû û di binê wan de agirê darên berû pêxistibûn çay dihat kelandin. Ji bo fedekarêya hevalan heyran dimam û min di dilê xwe de wisan di got; "ji min re jî ciheke wisa heba ku min tê de kar bikira wê gelek başbûya."

Dema çûyînê bû êdî. Hevalê ku wê alîkarêya min bikira heval Berxwedan bû û ji Wanê bû. Heval Berxwedan got; "Mam Hecî ger em biçin wê başbe. Derenge, sîha êvarê xwe berdaye ser mêhvanxaneyê, rabe em birêkevin." Ez rabûm ser piyan, hevalek di pêşiya min de bû û ez jî li pey heval hêdî hêdî dimeşiyam. Em bi hev re daxivîn û wî jî ji min re dikara hevalan dikir. Em gihiştin seytera pêşî û li wir hevalan em dan sekinandin. Çend hevalên jin li wir bûn. Ji min pirsîn; "ka têbîniya we heye yan na?" Min got; "belê têbîniya min heye." Piştî dîtina têbîniyê em ketin ser rê û hêdî hêdî meşiyan. Me xwe gihand lingê pirekê ku av di bînî de diherikî. Ji wê avê re digotin çemê Sûredê. Ava wê gelek boş bû. Li ser avê bi hêsinên dirêj pir hatibû çêkirin. Dema em gihiştin ser pirê, êdî em gihiştibûn nêzî heval Cûma.

**Dîtina Heval Cûma**

Belê, em ji pirê derbasbûn, li pêşiya me evraziyek diyar dikir. Bi qasî pêncî metreyan li serê vê evraziyê heval Cûma rawestiya bû. Li binê

dareke gûzê bû, lê min nedîti bû. Ji ber kalbûnê bêhnvedan dihat xwestin û me hinek bêhna xwe veda. Hevalê Berxwedan li min zivirî û got; "Tu heval Cûma dinasî?" Min got; "belê, dinasim. Dema ku ji Bakûr hatim heval Cûma li Dola Kokê bû. Min hingê serdana birêz kiribû û nasbûna min çêbibû." Min di dilê xwe de wiha digot; "ger heval Berxwedan min weke Kurdeke welatparêz bibîne wê keyfxweşiyekê bide min, ji ber ku şoreşger ciwan in. Heval Cûma wê çawa pîreke şêst û sê salî ji bîr bike? Lê ji aliyê heval Cûma ve hat erêkirin ku tevlî refên gêrîla bibim. Lewma ez xwe weke şervanê wî dibînim û her tim hewil didim ku bibim şayanê şehîdan, Rêber Apo û gelê Kurd. Eger heval Cûma tunebûya ev ji bo min nedibû nesîb. Henûniya heval derya bû, daristan bû, çem û kanî bû, bi xwe dara selwiyê bû."

Dema heval Berxwedan dît ku rondik ji çavê min dibarin, got; "qey tu ji min aciz bûyî, yan min tiştek xelet kir ku tu pê hêrs bûyî û girêyayî?" Min got; "nexêr, hinek girî hene ji keyfxweşiyêne, ji ber wê niha rondik ji çavê min tên xwarê. Ev girî ji keyfxweşiya min tê." Bi van axaftinan re me xwe gihand nêzî heval Cûma. Yanî mesafeyek kêm mabû. Min nêrî li derdora heval Cûma seyek reş hewil da xwe, bêdeng ber bi me ve meşiya û hat pêşiya me. Seyek paqij bû û muyên wî dibiriqîn. Ji min ne ditirsiya, ne jî hêrs dibû. Heval Hesen Zaza ez şiyarkirim û got; "ev seyê ku tê wê li ser we lêgerînê bike, heta lêgerîn neke we bernade. Şaş neyê fêmkirin, em we berdin jî ew bernade. Netirsin tiştekê li we nake."

Ez bitirs diçûm, min nêrî hat û tirsiyam lê ew ji min qet neditirsiya. Bi qural û qayde li ser min lêgerîn kir, paşê wek lêborînê ji min daxwaz bike, bi min şabû û stuyê xwe dirêjî aliyê heval Cûma kir. Her weke ku bibêje min; "kerembikin." Navê wî 'qaptan' bû. Me xwe gihand gel heval Cûma. Min xwest destê heval maç bikim. Lê nehêla, ji ber ku hemû mirov yekin di sîstema Apoyî de. Em çûn rûyê hevdu. Gelek bi hatina me keyfxweş bû, li beramberê heval Cûma rûniştim. Min gotinên xwe hemû tevlî hev dikirin, tiştek nedihat bîra min ku bibêjim. Hem jî di rê de min gelek zehmetî kişandibûn. Hêz di min de nemabû. Zimanê min lal, guhê min ker bibû. Tişta ji min hatî, tenê min li çavên heval Cûma dimeyzand. Ew e xwedî bejn û bala xweşik û şopdarê Rêber Apo. Ew Kawayê Hesinkare, Zale li ser serê Dehakan, neviyê Zerdeşt pêxembere ku her dem ji bo gelan daxwaza aramî û aştiyê dike. Ji bo wekhevî û dadê şev û roj di nava ceng û şer de ye.

Serdana van egîdan nehêsane. Ew weke bazan li hewa difirin û ji bo nêçîran çav naneqînin. Zanyarên di ilmê sosyalîst de ne û bêhna wan wek bêhna misk û emberan difûrêya. Evîn û daxwaza wan, xilaskirina bindestan e. Guhdarkirina heval weke şîrîniya hingivê Geliyê Zîlanê ye. Wek bilbilan daxivî, dengê wî mina dengê şalûlan bû. Vina wî weke awazên çem û kaniyên Kurdistanê bû. Remzeya aramî û aşitiyê bû. Bîranîna li ser zimanê kal û pîran, jiyanek nû dafrandin ji bo gelan. Xezala li çiyayên Xarpêtê bû, hûnê hertim li ser zimanan bimînin.

Lê ji evraziyeke bilind hatibûm xwar û di vir de hûn dizanin kalbûn jî heye. Di rê de gelek westiyabûm û nefesa min teng dibû. Ji ber wê min nekarîbû baxivim. Minê destê haval maç kiriba, lê nehêla bû. Xwe ji kesan mestir nedikir, di dilê wî de her hêvî û evîn hebû. Ji ber wê, min gelek jê şerm dikir. Lê carnan min lê temaşe dikir. Ji min re digot; "mam Hecî ka baxive, em guhdarêya te bikin." Lê tu axaftin ji devê min dernediket. Heval Cûma ew qas nazik, zerîf û xweşik bû, min nedikarî raste rast lê binêrim. Di bin çavan re min lê dinêrêya. Bi min re daxivî û carna jî em li ser hemû mijarên ber bi çav daxivîn. Carek din li ser van tesfiyekaran axivî. Lê taqet û qûweta min titunebû ku ez baxivim. Herî dawî tiştek ji devê min derket û min ev serpêhatî anî ziman.

Dibêjin carekê ji dayîka lawekê bilorvan dipirsin; "ka kurê te yê bilorvan?" Dayîk jî bersiv dide û dibêje; "kurê min bûye tendûrvan." Weke vê meselê, ew xayîn û tesfiyekar xwe ji fermandariyê xistin û bûn tendûrvan. Yanî bûn kesên revok û di dawiyê de bûn 'nanpêj.'

**Dîtina Heval Mustafa Karasû**

Min li vê derê heval MustafaKarasû dît ku wê bibûya mamosteyê min yê perwerdeyê. Lê tişta balkêş min zimanê wî nedizanî. Bi dîtina wî re min gelek jê heskir. Her weke dibêjin; gula ew qas heskirina te jê re çêdibe, lê nikarî pêre baxivî. Lê belê ev yek li hember heskirina te nabe asteng. Ji ber ku bêhna ji wê gulê tê têra heskirinê dike.

Heval Cûma heroj bi dehan hevalan re daxivî. Min jî dixwest demek kurt jî be, li vê derê bimînim.

Ew cihê heval Cûma lê dima bi temamî bi xwezayî hatibû xemilandin. Çiyayên Qendîlê ji ber girîngiyên xwe weke çiyayê herî binirx û pîrozin. Lewma dîtina wan çiyayan hesreta her Kurdekê ye. Cihê

ku heval Cûma jî lê dima di nava van çiyayan de, li geliyê Sûredê bû. Ev der bi çem û kaniyan hatibû xemilandin û bi rastî jî mirov ji xwezaya wê têr nedibû.

Mêza ku heval Cûma li ser rûniştî bû du metre dirêj, 70 cm bilind bû. Ev mêz ji kevirên gewr û reş hatibû çêkirin. Ew qas dibiriqîn, mirovan rûyê xwe di wan keviran de didît. Ser mêza xwarinê bi kevirên reng û reng hatibû xemilandin. Di nîva wê de guldanka gulan hatibû danîn. Li nêzî vê mêza xwarinê kaniya avê diherikî û ava wê gelek sar bû. Bi qederê metreyek û nîv ji mêza xwarinê dûr bû. Mirovan nedikarî destê xwe bi deqîqeyekê di nava vê avê de bihêlin. Sîha dara gûzê li ser me dikir sîhber. Li dora sifrê 12 kursî ji kevirên gewir û reş bi çargoşeyî hatibûn çêkirin. Mêza xwarinê bi kevirên delal hatibû hûnandin û bi kevirên kesk, sor û zer hatîbû xemilandin. Rengan hevdu dixwarin û van rengan xemleke pir ciwan dida rûyê mirovan. Derdor bi daristanan hatibû xemilandin. Hemû di rengê xwe de keyfxweş bûn. Bi van hemû xweşikiyan min hewil dida betaniyekê bînim da ku heval Cûma li ser birûne. Hevalekê ji min re got; “tuyê çi bikî?” Min got; “dixwazim ji bo birêz betaniyekê bînim.” Wî jî li min vegerand û got; “mamê Hecî, ji vê xwezayê xweştir tiştek heye yan ne?” Dema firavînê bû, bi hatina xwarinê re sifre bi lalik û kevçiyan hatibû raxistin. Hevalan dest bi amadekirina xwarinê kirin. Firavîna me nîsk bû. Beroşa nîskê di destê hevalan de û çemçika dar di nava beroşê de bû. Nanî hevalan bi destên xwe di tenûrê de pehtibûn, hûnerê tiliyên hevalan di rûyê nan de diyar dikir. Nan danîn ser sifrê. Tuzikên ku dermanê dilanin, li ser sifrê kom bi kom bicih kiribûn. Hemû lalik bi şorbeya nîskê dagirtîbûn. Lalik danîn ber me, me wê dest bi xwarinê bikira lê em li benda heval Cûma bûn. Heval Cûma hat û bi dengê xwe yê nazik got; “hevalno! kerembikin.” Me hemûyan dest bi xwarina şorbeyê kir. Min gelek ji şorba nîskê hezdikir. Her wiha hevalan jî jê hez dikirin. Hevalan kevçiyek mezin dabûn min. Lê firefir ji min dihat û evê yekê bala hemû hevalan dikişand. Li aliyê din bi xwarin xwarina min dilxweş bûn. Hevalan hemûyan têr xwarin û xwe ji sifrê vekişandin. Lê ji bo şerm nekim heval Cûma bi min re berdewam kir. Min ji ber dilopên bi ser xwe de rijandin cil û bergên xwe kiribûn şûna şorbeyê. Lê loman li min nekin. Bi rastî jî, bedewî û delaliya hevalan û bi taybet heybeta heval Cûma ez xistibûm nav xurûşek mezin. Lewma dest û laşê min dilerizîn. Ger yek din ba li

cihê min, dibe ku lalika şorbeyê bi ser xwe de rijandiba û dibe ku nekarîba qet xwarinê jî bixwe. Lê min lalîka xwe xilaskir. Şorbe di lalîka heval Cûma de mabû, heval lalîka xwe danî ber min û me bi hev re lalîka wî jî xilas kir. Heval Cûma ji min pirsî; "tê hinek din jî bixwî?" Her çendî dilê min dixwest jî, lê min got; "nexêr." Dilnizmî û xweşbîniya heval Cûma, heskirinê bi mirov re dida çêkirin. Ev reftar û taybetmendiyên bêhempa di dilê mirovan de heskirin û girêdanek bê dawî didan çêkirin. Cilên li ser min pir qirêj bibûn. Li aliyê din, por û rihên min tevlî hev bibûn. Bi qasî du mehan bû min xwe neşuştibû. Hîn zîhniyeta paşverû ya ku dibêje "karê zilam ne cil şuştine" di min de hâkim bû. Min ev paşverûtî û qirêjî li ser xwe neavêtibû. Lê ev nêzîkatî li vir derbas nedibû. Jixwe, ji ber van tiştan ji min re perwerdeyek şert bû.

### Çaya Bi Hevalan Re Xweş Bû

Piştî xwarinê heval çûn ser kaniya li gel mêza xwarinê û dest û rûyê xwe şûştin, destê xwe zuhakirin û yek bi yek îskanên xwe girtin û ji çaya li ser kuçik tejî kirin. Li dora sifrê rûniştin û çaya xwe vexwarin. Ji xwe re suhbet dikirin. Zêdetir mijara suhbetê bîranînên hevalan yên di nava têkoşînê de bûn. Bi nazikî û delalî rû dikizirandin û dil bi evîn dikirin. Di vê komê de heval MustafaKARASÛ, Zubeyir Aydar û Remzî Kartal jî hebûn. Ewên navê wan tên bîra min ev bûn, lê hevalên din jî hebûn. Suhbeta wan bi awayek xweşik derbas dibû. Xebata rojane ya heval Cûma berdewam dikir.

Rojane bi dehan mêhvan dihatin. Ez westiyabûm. Hevalan gotin "herin mangê, bêhna xwe vedin." Hevalê Berxwedan dîsa alîkarî da min. Heval ez birim mangê û ji min pirsî; "dema em ji mêhvanxaneyê rêketin, di rûyê te de bêzarî hebû. Ma min li beramberî te şaşiyek kiriye?" Min got; "nexêr heval, ez ji te bêzar tunebûme, tu kêmasiyên te nînin. Ez ji xwe bêzar bibûm." Dema min li hevalan dinêrî ku hemû ciwan in, difikirîm ku min îxanet li xwe kiriye. Çima ez di ciwaniya xwe de nehatim van çiyayên azad û tunebûm şervanê azadiya gelê xwe? Ez di vî temenê xwe yê kal de hatim. Ger ez xemgîn nebim û negirîm, ma kî wê vê yekê bike? Hêvî û daxwaza min ji ciwanên Kurd ewe ku weke min nekin. Di ciwaniya xwe de werin û tevlî şoreşê bibin.

## Hevalan Ez Paqij Kirim

Hevalan ava serşoyê germ kirin û ji min re gotin; "av û serşû amadeye. Ger bixwazî here ser û cilên xwe bişû. Por û rihê xwe kurt bike." Her wiha hevalên li gel min bi devkenî û dilnizmî gotin; "ger destur bidî emê di cilşuştinê de alîkarêya te bikin?" Her çendî di vê pêşniyara xwe de israr kirin jî lê min nepejirand û min ji hevalan re got; "alîkarêya we dayî min geleke û ji bo we spas dikim." Pişt re min dest bi paqijiyê kir û bi encam kir. Paşê ez çûm mangê û me bi hevalan re dest bi cureyan kir. Ez li vir gelek keyfxweş bûm û min di nava pîremêrên Kurdistanê de herî zêde xwe bişans û bextewer didît.

Ez gelek xwedî şansbûm û gêwilê min pir bilind bû, ji ber ku bi temenê xwe yê borî bibûm şagirtê akademiya Mazlûm Dogan. Hem jî dîtina heval Cûma bû nesîbê min. Ewên di televizyonê de dîtina wan ji bo me hesret bûn, yên ku pêşengtî ji bo me dikirin, min dîtin. Min digot; "xewne, xiyale yan rastiye?" Ji vê tiştê xweştir tiştek nîne. Di serî de heval Cûma, hemû mêhvan li wir kom bibûn, bi wan re xwarin serfirazî û serbilindiyek cuda bû. Li gel birêz mayîn ji bo min rûmet û şanazî bû. Min xwe gîhandibû cihê heval lê dima û bi qasî heftiyekê li gel heval Cûma mam.

Rojekê ji bo ku heval Cûma bi min re cure bike, banî min kir. Ez keyfxweş bûm. Wê ji min re hinek tişt bigotana û karek bidaya pêşiya min. Ev ji bo min serbilindî bû. Ez bi rê ketim û çûm gel heval Cûma. Min rojbaş dayê û wî jî li min vegerand û ji bo rûniştinê ez vexwendim. Ez li kêleka heval Cûma rûniştim. Qederekê bi min re axivî. Paşê min got; "daxwaziya we ji min çiye? Kerembikin bêjin." Heval Cûma jî li min vegerand û bi zimaneke delal û şîrîn got; "pêşniyara min ji te re wisaye ku tu biçî dibistanê." Min di dilê xwe de digot; "ma mirovên kal dikarin bixwînin?" Lê di nava partiyê de temen nedibû asteng. Çi kal çi ciwan, her kesî/ê didin xwendin û pêşdixin. Jixwe yek ji prensîbên rêxistina me xwendin û zaniste. Min bersiva heval Cûma wisa da;"belê, ezê biçim perwerdeyê." Lê di rastiyê de bi xwe zêde nebawerbûm. Lê min ji nirxandin û vegotinên heval Cûma fêmkir ku ev perwerde ji bo min pir girînge. Heta merce jî. Ji ber ku di nava vê rêxistinê de tiştekî nabe, nîne. Lewma ezê jî bikaribim fêrî xwendin û nivîsandinê bibim û xwe pêşbixim.

## Heval Cûma Diyar Kiribû

Ji aliyê heval Cûma ve çûyîna dibistanê ji bo min hatibû erêkirin. Min xatir ji heval Cûma xwest û ez zivirîm mangê. Êdî dem hatibû ku ez biçim perwerdeyê. Minê li dibistana Şehîd Mazlûm Dogan perwerdeya xwe bidîta. Ez bi vê biryarê gelek dilşad û şanaz bûm. Di rûyê min de şadî diyar dibû. Li aliyê din bi awayek ji dil alîgirê çûna min a perwerdeyê û fêrbûna min a xwendin nivîsandinê bûn. Lewma zor be jî ezê biçim perwerdeyê. Me xatir ji hevalên li wir xwest. Bi alîkarêya hevalan min amadekarêyên xwe kirin û em ber bi Xinêre ve ketin rê. Her çendî ez bêhêz û lewaz jî bûm, lê dîsa min dixwest bimeşim. Heval Hesen Zaza, Berxwedan Wan û hindek hevalên din jî bi min re hatin. Me xwe gihand nêzîkî heval Cûma, bi temaşekirinê re em dîtin û banî me kir. Got; "ka were mam Hecî." Ez li nêzikê wî rûniştim. Li ser perwerdeyê hindek agahî dan min. Ez di dilê xwe de wiha fikirîm; "ma ezê çi bikim, bila daxwaza min jî fêrbûna zimanê dayîkê be ku bi hezarî sale zimanê xwe parastiye û daye meşandin. Di dirêjahiya dîrokê de her tim dijminan hewil dane zimanê me tine bikin û bidin jibîrkirin. Lê li beramberî vê, dayîkan ev ziman parastine heta roja îro." Piştî vê suhbetê me xatir ji heval Cûma jî xwest û me meşa xwe berdewam kir. Her çendî min xatir jê xwest jî, lê evîna hevalan dilê min dagirtibû û ji min re zor dihat. Ji ber ku Sûredê ji min re bibû xewn û xiyal. Pişt re em ketin ser rêya Kanîcengê. Bi qasî du demjimêran em meşiyan û me xwe gihand tabûra Kanîcengê. Em du rojan li tabûrê man. Li wir jî heval Newroz, Viyan û Hewlêr xwe ji bo perwerdeyê amade kiribûn û wê li gel me bihatibana Xinêrê. Di êvara şeva sêyan de me berê xwe da Xinêrê. Gelek hevalên din jî bi me re hatin. Hindek keç û hindek jî xort bûn. Piştî em ketin rê, em li rastî seytereya pêşmergeyan hatin. Her weke ku em ne Kurd û ne şervanên gelê Kurd in, em dane rawestandin û mijûl kirin. Piştî em rûniştin çay ji bo me anîn û gotin; "fermo, çay vexwin." Lê di serî de hevalên jin, hemû hevalan bertek nîşandan û ji wan re gotin; "hûn keyfîtiyê dikin. Hûn me radiwestînin û mijûl dikin. Di ser de jî pirsan ji me dikin. Mane bi salane em li hevin û em rojane di van rêyan de tên û diçin." Her çiqas zimanê xwe şirîn dikirin jî, lê diyar bû ku tevgerên wan û gotinên wan ne weke hevin. Bi qasî sê demjimêran em li wir rawestandin. Lê me jî ji ber vê nêzîkatiya wan, tişteke wan ne xwar

û ne vexwar. Bi taybet hevalên jin pêşengiya vê helwest û nêzîkatiyê dikirin. Herî dawiyê destur dan û em derbas bûn. Em demjimêr 12:30'ê şevê gihiştin Sîdekanê û li mêhvanxaneyê peyabûn.

Ev mêhvanxane ya Xinêrê bû. Heval Ferman berpirsyarê mêhvanxaneyê bû. Li wê derê amadekarêyên hevalan ji bo mêhvanan her tim hebûn. Em ji dengê pêşmergeyan dûrketibûn û êdî dengê şalûl û bilbilan û bazên serê çiyayan dihatin. Awazên wan xweş, weke helbestên Ehmedê Xanî bûn. Sala 2004'an, dawiya meha Adarê bû. Nîvê şevê bû, gelek tarî bû, çav çavan nedidît. Di bin van zehmetî û zorêyan de westandina me di rûyê me de xwuya dikir û di bin barîna baranê de em hatin pêşwazîkirin. Hevalan gêwil û keyfxweşî didan me. Di serî de heval Ferman, hemû hevalên li mêhvanxaneyê diman bi destê me girtin, keyfxweşî û dilgermiya xwe nîşanî me dan. Rûkeniya wan ji bo me bû coş û keyfxweşî. Li dora agirê ku pêxistin cihê rûniştinê nîşanî me kirin. Em li dora agir rûniştin û çirûskên agir di navbera me de radibûn hewa. Sifre anîn, raxistin, xwarin anîn danîn ser sifrê. Me hemûyan dest avêt boçikên kevçiyan. Xwarina hevalan gelek xweşbû. Baş hatibû pijandin û ji reqe reqa kevçiyan birçîbûna me diyar dibû. Piştî xwarinê sifre hat rakirin. Hewa gelek sar û bi seqem bû. Heval Ferman pêdiviyên me yên razanê pêkanîbûn. Pêşniyar kir û got; "hûn westiyane, ger hûn razên wê ji bo we baş be."

Mêhvanxaneya Xinêrê bi rengên gelek xweşik hatibû xemilandin. Bi dîwarên wê ve wêneyên şehîdan û Rêber Apo hatibûn hilawêstin. Binê mêhvanxaneyê bi xalîçeyan hatibû raxistin. Li nêzikî mêhvanxaneyê du darên spîndarê hatibûn çandin. Bilindahiya wan 10 metreyan derbas dikir û bi serê yek ji wan spîndaran ve wêneyê Rêber Apo hatibû hilawêstin, bi yê din ve jî ala PKK'ê. Bi vî awayî dîtina van wêneyan hesreta dilê her ferdeke Kurd bû. Ez jî wek ferdeke Kurd, bi dîtina wêneyê Rêber Apo û ala PKK'ê bi hesret bûm. Bi dîtina wan dilê min tejî rewnaq bû. Ew al bi serbilindî li hewa dihejiyan. Dîtina vê, hesreta dilê bindestan û gelê Kurd bû. Ev, nîşaneya serkeftina gelê Kurd e. Hevalan hevdu dinasiyan, xew nedihat bîra wan û li ser girêdana bi şehîdan, Rêber Apo û şoreşê re cure dikirin. Min jî dixwest tevlî van cureyan bibim. Sermayê tundiya xwe berdewam dikir, ez bawerim kes neraza bû. Cureyên hevalan bigermî berdewam dikirin, lê hevalan serma guhdar nedikir. Li ber agirê gur sekinîbûn û weke her carê germahiya

azadiyê xwe li giyanê wan yê delal pêçabû. Cureyên hevalan ez jî germ dikirim. Ne serma û seqem, ne jî ti hêzê nedikarî bandorê li min bike. Min bi baldarî guhdarî cureyên hevalan dikir û ez wisa difikirîm; ev têkoşîn, bi girêdana bi şehîdan, heskirina Rêber Apo û giyanê hevalbendiya rast wê aşitî û wekheviyê ji gelên bindest û mazlûm re bîne. Aha ji ber van tiştan ez bi çûyîna xwe keyfxweş bûm. Minê perwerde bidîta û ger xwe baş bidim vê perwerdeyê, ezê bikaribim pêşketinên mezin bidest bixim. Ez têhniyê zanistê bûm, ji ber ku min nexwendibû. Lewma wê têhniya min ya zanistê di perwerdeya akademiya Mazlûm Dogan de bê şikandin.

Şevê hêdî hêdî cihê xwe ji rojê re dihişt û stêrkên berbangê geş bibûn. Cîhan ber bi ronahiyê ve diçû. Dema cîhan ronî dibû derdora mêvanxaneyê dihat xuyakirin. Dema rojê zerbûna xwe li derdora mêhvanxanê rijand, min lê nêrî ku cihê em lê disekinîn daristane. Daristana gur û tejî derdorê mêhvanxaneyê pêçabû. Min temaşekir ku li jora mêhvanxaneyê, li pala çiyê wêneyê Rêber Apo diyar bû. Pir ciwan û xweşik diyar dikir. Dema tîrêjên tavê xwe bi ser wêneyê Rêber Apo de dirijand, wêne dibiriqand. Wêne li ser rûyê erdê hatibû çêkirin. Nêzikî mêhvanxaneyê robarek diherikî û dengê xûşina avê dihat. Belê, raste Kurdistan biheşt e. Eger Kurdistan çol bûya, kesê çav bernedidayê. Hey Kurdistana nazik! Tu çiqas nazdar û nazenînî? Tu bişewitî bi agirê dojehê, belaya serê keç û xortên Kurdan. Min dixwest ji bo hevalan karekê bikim, lê min bêdengî ji xwe re bingeh girtibû. Sedem kalbûn bû û nezanîna min pêşî li zatunebûna min jî digirt. Lê dîsa jî ez pir bi hêvî bûm û min dizanî ku wê bidestxistina zanîn û zanistê bi destê mamosteyên perwerdekar pêkbê. Ji ber ku ew mamoste, mîna deryaya zanistê bûn. Min pêvajoya perwerdeyê û dibistana zanistê ya Mazlûm Dogan xiyal dikir û vê xiyalê coş û xurûşek bêhempa bi min re dida çêkirin.

Em wê êvarê li wir man. Piştî ku heval ji xewê rabûn, me bi hev re taştê xwar. Piştî xwarina taştê me xatir ji hevalan xwest û em meşiyan. Çiya hemû şîn bibûn, kulîlkên biharê xwe vekiribûn. Dema zerêya rojê lê dida, mîna rengê zumrutê diyar dibûn. Em gihiştin avekê, min navê vê avê ji hevalan pirsî. Ji min re gotin; "ev av, ava Lolanê ye." Li Lolanê derketina pîvokan, fermandarê mezin û şehîdê nemir heval Egîd (Mahsum Korkmaz) tanî bîra mirov. Xwezî min jî serdana baxçeyê şehîd

heval Egîd bikira. Birastî wê rojek were ku bikaribim wir serdan bikim? Ji ber ku hevalên li gel heval Cûma diman jî behsa baxçeyê Fermandar kiribûn. Derdora ava Lolanê bi darên fêkiyan hatibû xemlandin. Kulîlk bişkivîbûn û bêhna xwe berdabûn ser erdnîgarêya Lolanê. Li wir dikan hebûn û hevalan pêwîstiyên xwe pêktanîn. Em bi hev re çûn dikanek ji wan û hevalan pêwîstiyên min bi cih anîn. Piştre jî em derbasî manga hevalan bûn û em qederekê li gel wan man. Bi rastî jî Lolan pir xweş û balkêş bû. Bi taybet bi xweşikbûna baxçeyê fermandarê mezin heval Egîd Lolan hîn xweşiktir û bedewtir dibû.

**Em Ji Lolanê Derketin**

Me xatir ji hevalên li wir xwest û em ketin rê. Baran jî dibarî, ji ber wê derfet nedida ku heval bimeşin. Li wê derê heval Rubar û heval Îhsanê Îdirî diman. Ez wiha difikirîm, ger vegerim dîsa jî ezê van hevalan bibînim yan na? Heval her dem di nava karê piratîkî de bûn. Me meşa xwe berdewam kir û em gihiştin Kendakolê. Axîn ji hevalan dihat. Ez pir xemgîn bûm. Her kes bêdeng bû û min li pêşiya xwe dinêrî. Dema min serê xwe rakir, min wargehek dît û min pirsa wê ji hevalan kir. Yekê bersiva min da û rondik ji çavên wê dihatin xwarê. Bi dengeke melûl got; "li vê derê tevkujiyek çêbibû. 27 kurdên sivîl ji aliyê Tirkên hov ve, bi balefiran hatibûn qetil kirin." Paşê min nêrî ji aliyê wargehê ve keçikek porzer, çavşîn û xweşik ber bi me ve hat. Banî me kir; "heval! Neçin, neçin ez dixwazim we bibînim." Navê wê Bêrîtan bû û temenê wê 9 sal bû. Dayîk, bav û hemû ferdên malbata wê ji aliyê dewleta Tirk ve hatibûn qetil kirin. Dema heval derbas dibûn her tim dihat pêşiya wan û dirûşme davêt û ji bo serkeftina şoreşê diqêrêya. Min jê pirsî û min got "tu çima ev qas ji hevalan hez dikî?" Got; "bêhna dayik û bav, xwîşk û birayên min ji hevalan tê û ev partî ji bo min dayîk û bav e. Dema malbata min hate qetilkirin, heval li me xwedî derketin. Ev nayê jibîrkirin." Hevalan jî wiha digotin; "dema em di vir re derbasdibin tê pêşiya me. Heta me himbêz neke nazivire. Zarokên Kurdan bi evîna şoreşa Rêber Apo mezin dibin." Dîsa hevalekê wiha berdewamkir; "em Kurd hemû pêwîste axînê bikişînîn.  Divê em hovîtiya dewleta Tirk tu carî ji bîr nekin."

Em hêdî hêdî dimeşiyan heta gihiştin dirûnxaneya ku cilên hevalan lê dihatin dirûtin. Hevalên dirûnxaneyê hatin pêşiya me. Navê yek ji wan hevalan Candan bû. Em birin manga xwe, dane rûnişkandin. Lê xemginiya bûyera Kendekolê hîn di dilê me de bû. Heval Candan jî bûyer vekir û dikara keçika sêwî kir û xemginiya me dîsa serî hilda. Di wir de ev hat bîra min. Ev axîn û nalîna hevalan a ji bo keçika sêwî piştrast dikir ku ev şoreş û rêberê wê, bi hemû hêz û şiyana xwe ve ji bo gel û niştîmana xwe kar û xebat dikin. Her wiha bêyî ferq û cudahî, ji bo Kurdê her çar parçeyên Kurdistanê bi felsefeyek xurt û bihêz têkoşînê dimeşînin. Piştî ku me li gel hevalên dirûnxaneyê çay vexwar, me destur ji heval Candan xwest û me berê xwe da dibistana Mazlûm Dogan. Li pêşiya me bi qederê demjimêrekê evrazî mabû. Heval ketin pêşiya min û em ketin rê. Me xwe gihand dibistana Mazlûm Dogan ku cihê zanist û felsefeya Rêber Apo bû.

**Akedemiya Mazlûm Dogan**

Dema em gihiştin akademiya Mazlûm Dogan, em derbasî manga rêveberêya dibistanê bûn. Em gihiştin cihê zanist û ronakbîriyê. Li wir mamosteyên pir hêja û birûmet hebûn. Heval MustafaKarasû û heval Denîz li wir bûn. Em bi dileke germ hatin pêşwazîkirin. Me êvarbaş li hevalan da, wan jî bersiv li me vedan û em rûniştin. Paşê çay anîn û me bi hev re çay vexwar. Wan dilxweşiyek ku dilê şagirtên xwe şad bike, ji me re nîşan kirin. Pêşwaziyek germ û ji dil ji bo me kirin. Vê pêşwaziyê, keyfxweşî û coşek mezin da dilê me. Min dan manga heval Serxwebûn ku li welat min bi wî re kar kiribû. Banî heval Serxwebûn kirin û heval hat û ez birim manga xwe. Bi henekwari got; "tu bixêr hatî. Min qet bawer nedikir ku tuyê heta vir bê." Min jî got; "Ji xwe bipirse, mane we ez xistim nava xebatê."

Êdî dema xwe fêrkirin û perwerdeyê hatibû. Di roja destpêkê ya perwerdeyê de, di asta herî jor de keyfxweşiyê xwe di rûyê şagirtan de dida der. Li aliyekê gul û kulîlk, li aliyê din jî keç û xortên Apoyî rengên bedew didan derdorê. Dibistana Mazlûm Dogan hatibû xemiladin. Fikir, felsefe û paradîgmaya Rêber Apo reng dabû her aliyên dibistanê. Gotineke gelêrî heye, dibêje; "mirov dikare dar di teratiya wê de bitewîne, eger hişk bibe wê bişkê." Lê belê dibistana Mazlûm Dogan li

beramberê vê gotinê rawestiya û got; "na, pêwiste em pîran jî fêri zanistê bikin ku ew jî weke ciwanan bibin xwediyê zanista Rêber Apo." Ez di temenê xwe yê 64'ê de bûm. Kêm be jî ezê fêrî zanista Rêber Apo bibim û bi zimanê dayîka xwe biaxivim.

Sedema ku navê Mazlûm Dogan li vê dibistanê hatiye kirin çibû? Ev pirs ket hişê min. Min mereq kiribû. Lê ev yek ket hişê min. Têkoşîna azadiyê ya ku di Bakûrê Kurdistanê de, di bin rêbertiya Rêber Apo de hatî destpêkirin, di zindana Amedê de bi pêşengiya berxwedêrê mezin rêheval Mazlûm Dogan, bi giyanê wî yê berxwedêrî û diruşma wî ya "Berxwedan jiyane" hat tacîdar kirin. Ev berxwedan û çalakiya Mazlûm Dogan di mercên herî zor de, ji parastina rûmet û kerameta kesayeta giyanê Apoyî di zindana Amedê de bû remza serkeftinê û ji bo berdewamiya têkoşînê bû hîmên bingehîn û vîna serkeftina li hember neyar û dagirkeran. Lewma heval Mazlûm Dogan bi vê çalakiya xwe zindana Amedê zivirand cihê berxwedana dîrokî. Aha ji ber vê yekê tenê jî be, li dibistanan danîna navê şehîdan nêzîkatiyek etîk, exlaqî û wijdaniye. Ji ber vê yekê, li her cihên Kurdistanê bi navê şehîdan dibistan û sazî tên vekirin û ji bo gel û rêxistinê dikevin nav kar û xebatan. Ji ber ku pakrawanên me şayanê her tiştî ne. Şayanê wê yekê ne ku em wan ji bîr nekin û wan her tim dilê xwe û hişê xwe de bidin jiyan kirin. Dema min van şehîdên pîroz û birûmet anîn bîra xwe ev hest ketin nava dilê min:

**Cangoriyên Kurdistanê**

Ne tirsiyan ji mirin û zindanê
Agir kirin remza jiyanê
Bi wêrekî agir berdan bedenê
Bûne navnîşana wijdanê

Navê we bû tirs ket nava dilan
We serî netewand li ber dijminan
Agirê mirinê we ji xwe re kir jiyan
Gotin berxwedan jiyana nemiran

Bi bedena xwe gurkirin agirê Newrozê
Bi navê we ciwan didin soz û peymanê
Hûnin cangorêyên Kurdistanê
Ne tirsiyan ji dijmin, dikin berxwedanê

Navê we li cîhanê belavbû bi serhildanê
Hûn nayên jibîrkirin tu caranê
Zindî man li ser zimanan
Bûn xwendin û nivîsandin bo gelanê

Evîna xwîşk û birayan
Hûnin awazên çem û kaniyan
Ronahiya şev û rojanin
Bi navê we hat hunandin

Partiya karkerên Kurdistan
Gelê Kurd we da naskirin
Belavbûn li tevahiya cîhan
Ji bo pêşeroja gelan

(Ji bo bîranîna şehîdên Zindana Amedê)

Belê, dibistan bi navê şehîd Mazlûm Dogan hatibû avakirin. Ev dibistan ne tenê cihê fêrbûna keç û xortan bû. Li vê derê biçûk mezin, jin, zilam di her temenî de û ji her cureyî mirov dihatin perwerde kirin. Her wiha hemû cureyên zanistan dihatin dayîn û lêkolînên cur be cur dihatin meşandin. Ji ber bilindiya asta perwerdeya vê dibistanê, şagirtên pir jêhatî û xurt jê derdiketin. Dema min ev tişt didîtin serpêhatiya filozofê Kurd, nivîskar, wêjevan û helbestvanê binav û deng Ehmedê Xanî hat bîra min. Di kovara Hewar de Dr. Nûredîn Zaza vê serpêhatiya Ehmedê Xanî wiha vegotibû; "rojekê Ehmedê Xanî 60 zarokan dibe mala xwe û ji wan re ziyafetekê dide. Ji wan zarokan hinek keç hinek jî xort bûn. Xanî du şîret li wan kirin. Şîreta yekem ew bû ku xwe fêrî heskirinê bikin û ji heval, dayîk û bavê xwe hez bikin. Bi vî awayî bi wan daye zanîn ku hûnê fêrî hezkirina dayîka me tevan, Kurdistanê bibin. Şîreta duwem jî ew bû ku pir bixebitin, da ku hem wijdana we vehês bibe, hem jî mamosteyê we ji we hez bike. Bi vê jî da fêrkirin ku ew bi wan zarokan

bextewere û ji wan daxwaz kiriye ku zarok jî li beramberî wî dilxweşbin da ku welat jî bi heskirinê tim şad bibe. Mamosteyê mezin, bila dilê we şad be. Daxwaz û wesiyetên te yek bi yek di bin rêbertiya Rêber Apo de bicih dibin. Ew zarokên te li xwe kom kirin û perwerde kiribûn, neviyên wan niha di perwerdeya Rêber Apo re derbas dibin. Weke te daxwaz kirî, ciwanên Kurd ji heskirinê têkûz bûne û di oxira heskirina dayîka xwe Kurdistanê de canê xwe feda dikin. Bila dilê we şad be mamosteyê mezin, filozofê Kurdan.

**Kêmahiyên Min**

Gotinek gelêrî ya Kurdan heye, dibêje; "zimanê leq leqo dibe bela serê mirov." Min ji vê gotina gelêrî ti encam negirtibû. Ya duwem jî, axiftinên bêpîvan dibin bela serê mirovan. Hîna jî dilhenûn û şervanên Rêber Apo kom bi kom dihatin. Em ji hevdu hatibûn cudakirin, dersa xwezayê ji bo min hatibû pêşniyar kirin. Hat pirsîn; "tu ji çi hez dikî?" Min bersiva hevalan da; "gelek ji lawiran hez dikim." Hevalan jî gotin; "wê demê bikeve dersa xwezayê." Min erêkir. Di wê demê de pêşniyara heval Çalak jî ew bû ku cihê xwe di vê dersa xwezayê de bigre. Ew jî hat erêkirin. Bi xwe jî ji rojhelatê Kurdistanê bû. Hemû heval kom bibûn, her komekê wê dest bi perwerdeya xwe bikira. Paşê wê her komê li ser dersên xwe xebat jî bikirana. Roja yekemîn bû ku em li dibistanê kom bibûn û me dest bi perwerdê kir.

Xwe rexnekirin, kêmasiyên xwe û yên hevalên xwe ji holê bidin rakirin! Eşkerekirina kêmahiyan ne tiştеke hêsane, ji vê zortir tiştek nîne. Xeta Apoyî û şervanên azadiyê bi awayek ji dil wê pêktînin. Lê ev jî bi girêdana şehîdan û Rêber Apo dibe û pêkanîneke raste. Li ser kêmahiyên xwe û hevalên xwe sekinîn, girêdayî wan kêmasiyan rexne û rexnedayîn pêşxistin tiştek gelek baş û pîroze. Ev, feraset û têgihiştina binirx ya şoreşgerên Apoyî ye. Ji ber ku rastiya xwe eşkere dikin. Wê rojê di bin rêveberêya hevala Xezal û heval Karker de perwerde hat meşandin. Heval Xezal ji Ozalpa Wanê bû, heval Karker jî ji Batmanê bû. Komên hevalan di dibistanê de rûniştibûn, nêrîn û kêmahiyên xwe tanîn ziman ku min jî dixwest tiştekê bînim ziman.

## Zimanê Min Belaya Serê Min e

Ev zimanê leq leqo belaya serê mine. Roja yekem ya perwerdeyê bû, perwerde reng bi reng hatibû xemilandin û germahiya xwe pir hebû. Min dixwest ez jî baxivim. Lê binezanî axaftineke ne di cihê xwe de ji devê min derket. Minê wan kesên di nava tesfiyekaran de cihê xwe girtibûn, rexne bikira. Lê min bi awayeke nezanî tevahiya hevalên keç û xort rexne kirin. Lê min ne bizatunebûn ev gotin gotin. Dema ev gotin ji devê min derketin haval Xezal bi ser min de hat. Gelek ketim nava şermê. Min hêrsa heval Xezal li vê derê bi çavên xwe nedîtiba, tu car min bawer nedikir wê carekê ew qas hêrs bibe. Lê min bixwe barê xwe giran kir. Şaşîtî jî nayên erêkirin. Ji ber wê şaşîtiya min, heval Xezal bi tundî bi ser min de hat. Ez bi melûlî çûm manga xwe. Min xwe li nexweşiyê girêda û bi heceta nexweşiyê derneketim der ve. Mesele nexweşî tunebû, tirsa ji keçên Kurd yên reng esmer wek sorgul û rihanan bû. Min dixwest rexnedayîna xwe binivîskî bidim, lê nivîsandina min titunebû. Lewma min gazî heval Karker kir. Bixwe gazî bû û ji Batmanê bû. Min jê xwest ku rexnedayîna min ji min re binivîse. Bi vî awayî min renxnedayîna xwe bi alîkarêya heval nivîsand û pêşkêşî hevalan kir. Hevalan jî rexnedayîna min pejirandin. Lê dîsan jî, ji şerman min nedikarî ji mangê derbikevim. Heftiyekê di mangê de mam. Her carê heval Fûad xwarina min tanî. Ev heval ji Rojavayê Kurdistanê bû. Wî hem gêwil dida min hem jî di aliyê rewanî de bi min re dibû alîkar. Min gelek hêz jê digirt. Gotineke pêşiyên Kurdan heye û dibêje; "lingê xwe li gorî berika bavê xwe dirêj bike." Lê min lingê xwe ji berika bavê xwe zêdetir dirêj kiribû. Bi alîkarêya heval Karker ev pirsgirêk hat çareserkirin.

Hevalên jin banî min kirin û ez vexwendim manga xwe. Ez jî çûm manga wan. Bi germahiyeke mezin hatim pêşwazî kirin. Lê dîsan jî, ji awirên wan şêran ditirsiyam. Wek dibêjin; "şêr şêr e, çi jin e çi mêr e." Awirên wan jî mîna yên şêran bûn. Bi keyfxweşî çay danîn ber min û min dest bi vexwarina çayê kir. Lê rexneyên hevalan li ser min hebûn ku di perwedeyê de diponijim. Ev jî rastiya min bû, ji kalbûnê dihat. Tu pirsgirêk tunebûn ku jê re çareserî nehatiba dîtin. Di mijara ponijînê de çareserî hat dîtin. Pênûs û kaxez dan min û gotin; "divê rojê sê pelan binivîsî." Bi vê boneyê fêrî zimanê dayika xwe bûm. Hevalên jin bi min

dan zanîn, di bin rêveberêya Rêber Apo de hêza jinê hatiye damezrandin. Ji vê hêzê tirsiyam. Min sond xwar bixwîna şehîdan, minê tu car cesaret nekira axaftineke wisan çewt bikim, lê ev jî rastiyeke sîstemên deshilatdarane ku bi hezaran sal jin dane perçiqandin. Tu caran bi awayeke wekhev û demokratîk nêzîkatî li jinê nekirine. Di nava gelan de herdem mirov kole hesibandine û hertim şerê serdestiya zayendî hatiye kirin. Hertim jin weke namûsa zilam hatiye dîtin û hatiye binavkirin. Lê li çiyayên azad nasnameya jinê bi têkoşîn û berxwedaneke bêhempa hatiye îspatkirin. Ev têkoşîn û berxwedan jî di bin pêşengiya jina têkoşer de li hemû cîhanê belav bûye. Bingehê vê bi ferasata Rêber Apo hatiye nîşankirin. Lewma ez bi xwe lêborîna xwe ji hemû jinan dixwazim û li beramberî wan rexnedayîna xwe didim. Sond dixwim bixwîna şehîdan, tu caran cesaret nekim ku bi awayeke nezanî rexneyan arasteyî xort yan jî li jinan bikim. Lê rastiya şoreşgerên Apoyî bi rexne û rexnedayînan pêşketiye. Rêber Apo hêzek ji bo jinê afirandiye û ev hêz bûye parçeyek mezin a têkoşîna azadiyê. Lewma her tim ji wan karxezalên Apoyî şerm dikim.

### Hezkirin Û Minetdarî

Heval Viyan Soran û heval MustafaKarasû, we mirovatî çiye bi min da naskirin û hebûna mirovan bi min da heskirin. Ev hezkirin li ser xeta şehîdan û Rêber Apo we bi min da fêrkirin. Mamostayên min yên hêja; we em fêrî gelek tiştan kirin ku hûn tu carî ji dilê me dernakevin. We em fêrî zimanê dayîkê kirin. Ji hemûyan zêdetir, we em fêrî rastiya Rêber Apo kirin. We di dilê me de hezkirina şehîdan û Rêber Apo da şînkirin. Wek gulên ku her dem kulîlkên xwe şîn û nû dikin, we bi me da zanîn ku emê çawa bi xwe re nûbûn û guherînê çêbikin. Mamosteyên min ên hêja û birûmet; nizanim hezkirina we çawa bikim peyv û hevok û li ser rûpeleke spî xêz bikin.

Hezkirina şehîdan û hezkirina Rêber Apo li pêşiya her tiştiye. Hezkirin, birastî jî peyveke gelek xweşe, hezkirin ji her tiştî cuda ye. Hezkirina gulan ji hev cudaye. Tişta ku Rêber afiradiye, hezkirina li beramber mirovan û hezkirina jiyanê ye. Keda heval Cûma ji bo min dayî, ji keda bavekê zêdetire. Henûniya heval Cuma ji aliyê min ve tu car nayê jibîrkirin. Alîkarêya heval Cûma, heval Viyan Soran û heval

MustafaKarasû nayê jibîrkirin. Wan zanîn, xwendin û nivîsandin bi min dan fêrkirin.

### Min Ji Dersan Hezdikir

Hevalê Çalak bi awayeke xurt cihê xwe di vê komê de girt. Wê Parastina Gelekê ji me re bixwenda û şîrove bikira. Meyê bi qasî heft heyvan di perwerdeyê de hevaltî bi hev re bikira. Bi germahî wê dest bi perwerdeyê bihata kirin. Lê hevalan pêşniyarek dabûn rêveberêya dibistanê. Hîna perwerde nehatibû destpêkirin, hevalan dixwestin karên piratîki werin pêkanîn. Mange, tenûr, aşxane, cihê serşoyê, av anîna ji bo dibistanê û hwd. Werin çêkirin. Rêveberêya dibistanê di civîna xwe de li ser pêşniyara hevalan cure kirin û li ser hat rawestandin. Berdevkê rêveberêya dibistana Mazlûm Dogan heval Mahîr ê ji Ruha yê bû. Di encama nîqaşan de derket holê ku du roj perwerde paş ve hatiye avîtên. Di du rojan de wê ew karên pratîkî bihatibana kirin.

Dibistan hat reşandin û bi avê hat paqijkirin. Gul li derdora dibistanê hatibûn çandin û bêhna gulan difûrêya. Roja çarşemê ji bo bêhnvedanê hatibû diyar kirin. Ji aliyê rêveberiyê ve hatibû curekirin û biryar hatibû girtin ku çarşem roja betlanê be. Vê ez dam fikirandin, dema mirov behsa çarşemê dike çi tê bîra mirov? Di serî de bîranîna şehîdan, serlêdana Rêber Apo û Çarşema Sor tê bîra Kurdan. Di vê roja pîroz de şahî û xemgînî bi hev re derbas dibûn. Di vê rojê de bîranîna şehîdan û dîtina parêzeran bi Rêber Apo re çêdibû. Çareşema Sor cejna gelê Ariye, yên bi ser bawerêya Ezdayetiyê. Hevalan xwe amede dikirin ku di vê rojê de şehîdan bibîr bînin. Nameya Rêber Apo dihat xwendin. Çarşem rojek pîroz û paqije. Hemû hevalan di vê rojê de serê xwe û cilên xwe dişûştin. Paşê hevalan şehîd tanîn bîra xwe û helbestên li ser şehîdan dihatin xwendin. Nameya Rêber Apo dihat xwendin. Herdem wiha bû. Her yek ji van ferîşteyek yê Rêber Apo bûn. Piştî xwarina nîvro dixwarin hinekî bêhna xwe vedikirin. Lê berevaniya dibistanê nedihat jibîrkirin. Du doçkayên dibistanê hebûn, her yek ji wan di cihên pêwist de hatibû bicihkirin. Parastina dibistanê di bingeh de dihat girtin. Wek karê berevaniyê, karê nan pehtinê, xwarin û aşxaneyê bidorveger dihat meşandin. Hinek jî kişik dileyîstin. Bi taybet ji ber ku di leyîstoka kişikê(satranç) de mijara şer heye hevalan dileyîstin. Hinek hevalan

Parastina Gelekê dixwendin û cure dikirin. Ji bo fêrbûna zanista Rêber Apo hevalan hewil didan bibin layiqê şehîdan. Zanista Rêber Apo ji bo şagirtan di pêşiya her tiştî de dihat. Weke çawa nan û av ji bo jiyana mirovan pêwiste, şervanên azadiyê jî bê fereset û felsefeya Rêber Apo jiyan nakin. Hevalan bêhna xwe di roja çarşemê de bi van mijaran derdixistin. Lê dema min li çarşemê dinêrî, bîranîna şehîdan di wê rojê de pêkdihat, çûyîna parêzeran ya li gel Rêber Apo di wê rojê de pêkdihat. Ev tişt dihatin bîra min. Xemgînî û şahî bi hev re derbas dibûn. Roja çarşemê ji bo şervanên Apoyî hatibû hilbijartin. Rojeke pîroz bû, cejn û xemgînî bi hev re derbas dibûn.

**Li Dibistanê Her Sibehê Diçûn Êzingan**

Heroj sibêhê di demjimêr çar û nîvan de heval diçûn êzingan. Em derdiketin girê li jora dibistanê, me êzingên hişk berhev dikirin. Min carekê nêrî du hevalên jin tên, yek ji wan heval Viyan Soran bû ya din heval Besê Hozat bû. Bi dîtina wan re axaftina min hat bîra min. Xwihdan û kelecanê ez girtim, di nava şermê de mam û ji şerman min xwe li pişt darek berûyê veşart. Çek û rext hildabûn ser milên xwe, wek stêrka gelavêjê ronî didan û dibiriqîn. Guliyên wan ji ber bayê wek du baskên bazan li hewa badibûn û herikandina Firat, Mûrad û Dicleyê tanî bîra mîrov.

**Xwedavendên Reng Esmer**

Hey şengê şepalê, bar giran ê!
Cewher jiyanê, dil bi kul ê
Hûn dîroka xwe dizanin dil zelal ê
Xwedavendê, dil xweşikê, reng esmerê
Bi hezarî salan hatî dor pêçandinê
Pir xweşike ser leşkera cîhanê
Sîstema kapitalist, zilamê qirêj bizane
Êdî ferman waye dawiya zilma we ye
Nîşana qetil û wehşetê, ji hovîtiyê şiyar be!
Hûn bizanibin em keç û xortên Apoyî ne
Hevaltiya we gorin, xwarina we jehr e

Bi te re meşandin xwe ji holê rakirine
Di rêya zatunebûn û feraseta Rêber de
Hûnê hilweşin, perîşanên kêm mejîne
Binevşin, sorgulin şervanên Rêber in
Têkoşerin li çiyayan bo azadiya gelan
Emin keç û xortên konfederalizmê
Emê jehra we bi we bidin xwarin
Hûnin, keçên bawermend in
Bawermendên reng henûnin
We da ser milan barê giran
Hêviya dayikan, bav û gelan
Reng gewherên wek axê dibiriqin
Şal û şapik, şûtik pîrozin, lehengin
Rozerîna dayikan in, germahiya dilan
Rondikên çavan in, tîrêjên rojê ne
Şîrînahiya rêzikên pirtûka Rêber in
Dişopînin rêya Mazlûm û Rewşenan
Nayê jibîrkirin pratîka Apoyiyan
Bi milyonan gel kirin bi yek evînê
(Diyarî ji bo hevalên jin)

## Dibistana Mazlûm Dogan Cihê Zanistê Bû

Di vê dibistanê de ji seretayî bigre ta zankoyê, waneyên weke felsefe, sosyolojî, tib, fermandarî û leşkerî dihatin dîtin. Komên ku dihatin bi evîn û hezkirinek mezin beşdarî perwerdeyê dibûn. Perwerdeyê ji min re pir keyfxweşi tanî. Şagirt kom bi kom dihatin, wek kulilkên kesk, sor û zer bûn. Şêr û pilingên Zagrosê bûn di dibistana şehîd Mazlûm Dogan de. Dîtina wan jî bi serê xwe keyfxweşiyek bû. Tişta ku difikirîm ew bû; bi tîpên Kurdî fêrî xwendin û nivîsandinê bibim. Ev fêrbûna bi zimanê Kurdî, di temenê min yê biçûk de nebibû nesîbê min, lê di temenê min yê kalbûnê de bû nesîbê min. Di dibistana Mazlûm Dogan de fêrbûna zimanê Kurdî ji bo min serbilindî bû. Di nava partiyê de fêrbûna zimanê Kurdî bingeh dihat girtin. Bi gelek zaravayên Kurdî perwerde dihat dayîn. Hevalan hewil didan ku xwe zana bikin.

Du dibistan hebûn. Yek bi zimanê Kurdî, ya din jî bi zimanê Tirkî bû. Di her du dibistanan de jî perwerde dihatin dayîn. Ji hevdu bi qederekê dûr bûn. Bi daristanan hatibûn dorpêçkirin û kanî di nava her du dibistanan de diherikî. Ev av jî, mîna avên kaniyên zozanên Geliyê Zîlanê bûn. Ji bo gel ferzên olî pêkbînin, her tim melayên Kurdan dikara biheştê dikin. Lê nabînin ku biheşta li ser rûyê erdê welatê me Kurdistan e. Ewên ji biheştê hezdikin, werin çiyayên Kurdistanê bibînin. Ev çiya bi xeml û xêla xwe û xweşikbûna xwe mîna biheştê ne. Nimûne; di serdema şoreşa Îslamê de Xalidê Bîn Welîd tê Kurdistanê û li çiyayê Sefînê yê ku dikeve pişta bajarê Hewlêrê bicih dibe. Dema bedewî û ciwaniya xweza û xaknîgarêya Kurdistanê dibîne, ji Hz. Emer re nameyekê dişîne. Di nameya xwe de wiha dibêje; “min biheşt û ferîşte li ser erdê dîtin.” Mebesta wî ji vê yeke ewe ku Kurdistan biheşta ser zemîne û keçên Kurdan jî bi bedewiya xwe mîna ferîşteyên biheştê ne. Aha, ev der jî mina biheştê ye û dibistana Mazlûm Dogan jî parçeyek ji vê biheştê ye. Birastî jî ev cih û war, ev xweza û ev şînatî di hiş û xiyalên mirov de biheştê zindî dikin. Li aliyekê xwezaya ku xwe bi hemû rengên bedew pêçayî, li aliyê din gul û çiçekên ku hevalan li derdora dibistanê çandî, hewayeke biheştê di giyan û bedena mirovan de digerand. Ev heskirin bi serê xwe keyfxweşî bû ji bo min. Di van rojan de hewa gelek sar bibû. Tişta bala min dikişand, di navbera wan de tu cudahî tunebû û hevalên keç û xort di hemû mijaran de wek hev bûn. Her wiha di danûstandin, curekirin, rexne û rexnedayînan de li hember hev rast û ji dil bûn. Hemû hevalan hewil didan xwe bi feraseta Rêber Apo pêşbixin û zana bikin. Ew, şoreşger û têkoşerên rast bûn. Ti car qelsî nîşan nedikirin. Ti ferqa şervanên nû û fermandaran tunebû.

Ji berêya mamoste bê, hemû şagirt di hola perwerdeyê de amade dibûn. Bi hatina mamoste re hemû şagirt radibûn. Dema mamoste rojbaş li şagirtan dida, wan jî digotin “saxbin.” Paşê rêzgirtin ji bo giyanê şehîdan dihat girtin û diruşmên “şehîd namirin, şehîd roniya gelan in, şehîd rûmeta gelan in û berxwedan jiyane” dihatin avêtin. Pişt re şagirt ji bo rûniştinê dihatin vexwedin.

Mamosteyên me heval Viyan Soran û heval MustafaKarasû bûn. Du kesayetên nazik, rûken û hêja bûn. Hewildana wan, di xeta Rêber Apo de pêşxistin û zanekirina hevalan bû.

## Ew Dibistan Mîna Deryayê Bû

Deryaya Wanê bi avê dewlemende, dibistana Mazlûm Dogan bi zanista Rêber Apo û giyanê şehîdan dewlemende. Hinek heval hebûn ku nedikarîn xwe rave bikin. Lê mamosteyên me bi kêrhatin û serborêyên xwe yên binirx, wan hevalan vedikirin û dehfê xweravekirinê didan. Wan mamosteyan ziman didan vekirin, guh didan bihîstin.

Li vê derê mirov nedikarî bi veşartina kêmasiyên xwe xilas bibe. Kê çi kêmasî kiriba, dihat şiyarkirin û rexnekirin. Bi vî awayî mirov kêmasiyên xwe fêmdikir û hewil dida xwe jê xilas bike. Li kêleka wê, hevalên ku karê xwe baş û serkeftî bi encam dikirin jî dihatin xelat kirin. Aha ev, nîşaneya serkeftinê ye. Bi rastî min jî dixwest xwe bigihînim pileyek wisa ku şayanê standina xelatê bibim. Lê temenê min ê borî ev derfet nedida min. Ji ber vî temenî, hevalan tu kar nedidan pêşiya min û ev jî li zora min diçû. Di vê perwerdeyê de hevalan rexne û rexnedarî nîşanî min kirin. Êdî min pir bi rehetî dikarî girêdayî kêmasiyên xwe, rexnedana xwe pêşbêxim.

## Rabûna Ji Xewê

Li dibistanê rojbaş di demjimêr 4:30'an de dihat kêşandin. Di demek kurt de xwendekaran xwe amade dikirin. Dema mirov ber bi temenê kalbûnê ve diçe, zêde xewa mirov nayê. Evê jî ji bo min firsendek çêdikir. Ez spêdê zû, di demjimêr 3:30'an de radibûm, min werzîş dikir û diçûm gel hevalên nobedar. Dema heval radibûn di serî de karê berevaniyê dihat rêkûpêkirin û berevanan hevdu vediguhertin. Ev kar bi awayek rêkûpêk berdewam dikir. Fermandarê rojane dihatin û rojbaş ji komcivîna şagirtan re dikêşandin. Piştî her gotina rojbaşê "saxbin" li dibistanê olan dida. Pişt re tekmîla komcivînê dihat girtin. Paşê heval diçûn êzingan. Di nava daristanê de heval belav dibûn û êzing komdikirin. Lê birîna darên ter qedexe bû. Ne tenê li vir, li tevahiya Kurdistanê ev yek derbas dibû.

Hevalan zerer nedidan xwezayê û kuştina lawirên kovî jî qedexe bû. Her wiha qutkirina gulekê jî çênedibû. Berhevkirina darên hişk pêdiviyek bû. Ji ber ku germkirina avê û çêkirina xwarinê bi êzingan çêdibû. Dema darvan di nava daristanê de belav dibûn, her yek ji wan li gorî hêza xwe

êzing tanîn û li ber aşxanê datanîn ser hev. Dema ji piratîka êzingan dizivirîn dest û rûyê xwe dişûştin, bi qederekê bêhna xwe didan, pişt re tevahiya hevalan bi hev re diçûn aşxaneyê û dest bi xwarina taştê dikirin. Piştî xwarina xwe dixwarin di demjimêra nêzî 8’an de derbasî perwerdeyê dibûn. Karê xwendin û nivîsinê esas dihat girtin. Hemû heval, çi jin çi xort, defter û pênûsên xwe didan destê xwe û ber bi dibistanê ve dimeşiyan. Meşvan weke kewên gozel ên Serhedê bûn, dengê wan yê şalûlan bû û bêhna wan ya rihanan bû. Tu carî nayên jibîrkirin dema ber bi dibistanê ve dimeşiyan. Dildarêya xwe ji bo şehîdan û Rêber Apo didan nîşankirin. Dema mirov li dîroka gelê Kurd dinêre, dibîne ku gelê Kurd her tim hatiye perçiqandin û koletî li ser wan hatiye ferzkirin. Lê Rêber Apo bi fikir û ramaneke pêşketî û xurt gelê Kurd ji vê rewşê rizgar kir. Ev yek jî mezinahiya Rêber Apo dide nîşankirin. Yên ku di van dibistanan de tên perwerdekirin, hemû di bin lehengên mezin. Li vê derê di navbera kesan de cudahî nîne. Dema min li vê nêzîkatiyê dinêrî, gotina filazofê Kurd Ehmedê Xanî dihat bîra min ku wiha anîbû ziman; “van exlaq melakan.” Sekna şagirtên dibistana Mazlûm Dogan layiqê vê axiftina pîroz bûn. Zanista Rêber Apo ji bo gelan jiyan kirin û vejînek nû bû. Ev vejîn di nava gel de bû gul û sumbulên di destê her zarokê Kurd de. Lê ez tunebûm xwendekareke zîrek, ji ber ev cewherê zanistê di min de nînbû. Barekê girane, ew qas quwet bi min re nîne. Lê ez bihêvî bûm, min hewil dida bibim layîqê şehîdan û Rêber Apo. Lê belê, mayîna min ya di nava hevalan de bi serê xwe rûmetek bû ji bo min. Dema şoreşa Apo tê ser ziman, xilasiya bindestan û têkçûyîna desthilatdaran tê bîra mirov.

**Bîranînek Li Gel Heval Viyan Soran**

Ezê ji we re bîranîna xwe û fedekarêya xwedavenda jin, heval Viyan Soran bînim ziman. Rojekê ji bo taştê ‘xwarina fermandaran (salçe)’ hatibû çêkirin. Mîdeya min têşiya û min nedikarî vê xwarinê bixwim. Ji ber wê min destê xwe ji taştê kişand. Heval Viyan li min zivirî û ji min re got: “Ma tu nikarî bixwî?” Min bersiva heval Viyan da û min got; “mîdeya min têşe, nikarim bixwim.” Carekê din li min zivirî û bi devkenî got; “Nabe tu bibî mêhvanê biryargeha partiyê?” Min got, “belê.” Heval Viyan dîsa bersîva min da, “ezê ji te re mirtoxa Serhedê çêbikim.” Min bi devkenî got; “ka?” Got; “bila dem were, ezê te bibim biryargehê.” Di navbera nîvro de heval Viyan banî min kir û got; “were em biçin biryargehê.” Du hevalên jin jî bûn hevalên me. Ez, heval Viyan Soran, heval Zozan û heval Viyana ji Rojava bûn. Em ketin rê û meşiyan. Di rê de lingê min şemitî û li erdê ketim. Xwîn ji pozê min hat. Heval Viyan bi destê min girt û ez erdê rakirim. Lê xwîna min nedisekinî. Dema em gihiştin biryargehê, heval Heyder li wir bû û hinek pembû anî û xist difna min. Bi vî awayî xwîna min sekinî. Ez wê êvarê li wir mam. Heval Viyan ji min re mirtoxa Serhedê çêkiribû. Em spêdê zû rabûn û min mirtoxa xwe hilgirt. Heval Viyan bi dilnizmî got; “ma tuyê hilgirî?” Bi vî awayî nehişt ez hilgirim û ji min stand. Em ketin ser rê û gihiştin dibistanê. Piştî em gihiştin gel cihê xwe, hevalan bi henekwarî ji heval Viyan re gotin; “me mam Hecî paristî teslîmê we kir, lê we kepî şkestî vegerand.”

Min ji bo helwest û nêzîkatiyên heval Viyan Soran ji hest û hizrên xwe ev malik rêzkirin:

**Tu Viyanî Tu Jiyanî**

Mamostaya min ya hêja
Tu Viyanî, tu jiyanî
Tu mamosteya rêhevalanî

Tu sembola gelê Medyayî
Tu mamosteya gêrîlayanî
Mamosteya hêja tu namirî

Tu gula nava bexçanî
Tu evîndara hemû evînanî
Tu nefesa hemû gêrîlayanî

Te şopand rêya Ronahî
Tu bûyî stêrka dilê şagirtan
Te şagirt zanakir bi derya zanistan

Em bi te şanazin jiyana dilan
Da domandin şemala Newrozan
Te da şopandin rêya Mazlûman

Bi qederê çend rojan mîdeya min dîsa êşiya. Hevalan nêrîna xwe dan rêveberêya dibistanê da ku ez biçim gel hevalên şivan û şîr ji xwe re bînim. Di vê navberê de mîdeya min dest bi êşandanê kiribû. Hevalên rêveberiyê jî vê pêşniyarê erêkirin. Min jî xwe amadekir ku biçim gel şivanan û şîr bînim. Bi tenê çûyîn qedexe bû. Ji ber wê yekê heval Senger jî bi min re hat. Ev heval ji Başûrê Kurdistanê bû. Em ketin ser rê û çûn gel hevalên şivan. Heval Erdal, heval Osman û heval Fewzî li ber pez bûn. Êdî ji wir û şûn de, her sê rojan carekê em diçûn û me şîr tanî. Hevalên li ber pez du se xwedî dikirin. Navê yekê 'cem', navê yê din jî 'qolo' bû. Kengî em diçûn, van seyan pêşiya me digirtin û nedihêlan em biçin. Lê dema em bêhn dikirin ku bêhna hevalan ji me tê, dengê xwe nedikirin û her weke ku lêborînê ji me bixwazin, serê xwe bi şalê me ve dibirin û ji me re rê vedikirin. Karê me her berdewam kir. Dema em diçûn gel hevalê şivan bi dilgeşî û rûkenî em pêşwazî dikirin. Bi taybet razana li ser kulavên hevalan gelek xweş û watedar bû. Dema min ev dîmen didîtin, jiyana gund a li welat dihat bîra min. Min jî serê xwe datanî ser kulav û xewa şîrîn dilê çavê min dadigirt û dirazam. Her carê hevalan ez şiyar dikirim û me bi hev re çay vedixwar. Min di wan rojan de jiyan gelek xweş û biwate borand. Her carê dema pez dihat hevalan pez didotin, bîdonê min tejî dikirin û didan destê min. Piştî demekê, ji ber zehmetiya rê û temenê min ê kal, car caran dereng dimam. Ji ber wê hevalan kerek ji bo min anîn. Ji wir û şûnde ez li kerê xwe siwar dibûm û diçûm şîr anînê. Kerî rêya xwe naskiribû. Gelek zîrek bû û navê

Tirşo lê kiribûn. Dema min ker bir dîsa seyên şivanan hatin me. Weke her carê lêgerîna xwe dikirin û rê didan me. Lê ji ber ku ez biberdewamî diçûm gel şivanan, cem û qolo jî naçar man ji min hez bikin. Jixwe min baş naskiribûn. Vê carê ev her du se bûn hevalên min yên rê jî û di çûn û hatinê de hevaltiya min dikirin. Dema ez ji gel şivanan dihatim, ew jî bi min re dihatin heta ber deriyê manga ku tê de dirazam. Piştî bêhna xwe vedikirin, her weke xatir bixwazin, du sê car deng dikirin û diçûn. Bi vî awayî her cara ku ez diçûm, wan jî alîkarî bi min re dikirin û hevaltiya min dikirin. Dema min ev rewş dît wisa fikirîm; "kêrhatin û hêza hevalan ew qas xurte, netenê mirovan, lawiran jî perwerde dikin û pêşdixin."

Dewreya perwerdeyê hêdî hêdî bidawî dibû. Belê, her hevalek li gorî kêrhatina xwe fêrî feresata Rêber Apo bibûn. Hemû hevalan di xeta şehîdan û Rêber Apo de, di zanistên hatine dayîn de xwe pêşxistibûn. Bi awayek dilsoz, bi rêya şehîdan û Rêbertî ve hişk û hişk girêdayî bûn. Bi hevalên xwe û rêxistina xwe bibawer bûn. Bi hevdu re yek gewde û yek fikir bûn. Bi xwestekek mezin xwe zanakirin û pêşxistin.

## Vesaziya Hevalan

Dema xwendin û perwerdeyê bidawî dihat. Ji bo herçar beşên Kurdistanê heval dihatin şandin û belavkirin. Ew şêr û pilingên di nava serma, berfê, seqem û bahozê de gihiştin, tu hêzek nikare wan zeft bike. Tu hêzeke dijmin nikare li pêşiya wan hevalên li dibistana Mazlûm DOGAN perwerde dîtîn, raweste. Dema berbanga sibehê radibûn, kefiya xwe li ser serê xwe dipêçan, şûtik û rext li pişta xwe girêdidan. Bi rabûna xwe di nava berf û seqemê de dimeşiyan, tu hêzekê nedikarî pêşî li wan bigre. Dijmin şaş û maş dikirin, li nava çavan de lê dixisitin, kezeb li wan diqetandin. Heval di jiyanê de hevparbûn, di xwarin û vexwerinê de yek bûn û hêviya gelê Kurd bûn. Dixwestin hîn zêdetir bibin hêvî û daxwaza gelê xwe. Bi taybet li ser şêwazê axaftinê disekinîn û ji hevdu nedixeyîdîn. Ji axaftinên hevalên xwe bêzar nedibûn. Kêmahiyên hevalên xwe bi zimanê xweş û bi şêweyeke delal û bêhêrs tanîn ziman û destnîşan dikirin. Kêmasiyên xwe û hevalên xwe nediparastin. Weke bav û kalê me gotine; "ger di roja mehşerê de ziman rast neaxive, wê gewdeya mirov hemû şahidiyê li ser mirov bike." Lewma merce ku mirov di derbarê hevalan de bi zimaneke rast û pak biaxive. Ji ber ku

bûyîna şoreşgerek Apoyî nehêsane. Ger mirov ne rast û durist be, wê pêlên deryaya vê şoreşê li mirov bixe û bavêje ji derve. Di nava vê rêxistinê de vegotina rastiyan hîmê bingehîne.

Her hevalek ji bo vesaziya xwe pêşniyara xwe ji rêveberiyê re dikir. Cihê her hevalî dihat eşkerekirin, êdi wê her yek biçûna cihê jê re hatibû diyarkirin. Lê divê neyê jibîrkirin ku, hevalên vesaziya wan hatin çêkirin êdî endamên bingehîn yên têkoşînê bûn. Ji ber ku êdî wan bawerêya rêxistina xwe qezenc kiribûn. Her çiqas hevalan demek zû vesaziya min ranegihadibûn jî, min dixwest li dibistana Mazlûm Dogan bimînim.

Ji hevalan dûrketin ne tişteke hêsan bû. Di rûyê her hevalekê de cesaret û mêrxwasiyê xwe dida der. Pêşiya bi dawî lê hatina perwerdeyê ezmûn hebûn. Her wiha di wê rojê de hevalan helwesta xwe nîşan dikirin, rexne û rexnedayînên xwe vedigotin. Mirov dikare bêje qiyamet radibû. Her hevalekê ne kêmaniyên xwe, ne jî yên hevalên xwe venedişartin. Car car em dikeniyan û her tim ken û girîn bi hev re dimeşiyan. Mamosteyên me yên dibistana Mazlûm Dogan, heval Viyan Soran û heval MustafaKarasû amade bûn. Her hevalê/î herêma ku dihat şandin bi keyfxweşî pêşwazî dikir. Zanista Rêber Apo bi wan dabû fêrkirin ku her zanist û kêrhatinên xwe bi hevalên xwe re parvebikin. Gelek keyfxweş dibûn. Di perwedeya dibistana Mazlûm Dogan de, mamostayên me keyfxweşiyek germ didan çêkirin. Lewma bi serkeftî dawî liv ê dewreya me hat. Wê dest bi dewreya perwerdeyek nû bihata kirin û ew jî, ji bo mamosteyan keyfxweşiyek nû bû.

Min tişteke pir balkêş dît. Ew hevalên ku vesaziya wan hatibûn çêkirin, xwe bi rext û çek xemilandibûn û ji keyfxweşiyê bi hewa diketin. Hevalên erkdar aşxane vekirin û heval Tîrêjê Rojhilatî pênc pez serjêkiribûn û ji bo firavîna hevalan amade kiribû. Ev amadekarî jî hemû ji bo pîrozbahiya serkeftina perwerdeyê û vesaziya hevalan bû. Lê ji keyfxweşiyê tu hevalê guh nedida xwarinê. Paşê heval li cihê civînê kombûn. Êdî dema diyarkirina vesaziyan hatibû. Mamosteyên me çûn pêşiya hevalan û dest bi xwendina navan kirin. Her hevalên ku navê wî dihat xwendin, diket nava livînekê. Bi vî awayî ragihandin hat bidawî kirin û her kesê cihê xwe zanî. Paşê hevalan bi berdana fîşekan pîrozbahiya hevalên ku wê biçûna dikirin. Her kesê dest bi amadekarêyên xwe yên çûyînê kirin û gêwilê wan heta tu bêjî bilind bû. Di rûyê hevalan de wêrekiyê û kîna li hember dijmin xwe dida der. Ji

hêrsa di çavên wan de diyar dibû ku ka wê kengê biçin çeperên xwe û li hember dijmin têbikoşin. Daxwaza wan xilaskirina bindestan ji bin destê dagirkeran bû û wan dagirgeran ji welatê xwe derbixin. Armanca wan wekhevî û biratî bû.

**Heval Mustafa Karasû**

Mamosteyê me, we jiyanek nû bi me da fêrkirin. Sorgul û binefşa daristanên çiyayan, we reng dabû birengê evîna rojê, ev rengê berxwdanê bû. We zanîn, bawerî û hezkirina gelan bi me da zanîn. Hûn evîna li ser zimanê şagirtan in. Helwest û hewildanên we hemû di rêya rêzikên Rêber Apo de bûn. Dayîn û standinên bi şagirtan re, çi jin çi xort her tim yek bûn. Mamoste, we ronahî da dilê xwendekaran. We li ser hestên zarokên Ariyan bêhna sumbul û rihanan da barandin. Fêrbûna evîna şoreşa Rêber Apo, we kir hest û li nava dilê xwendekaran çand. Nirxandinên we ji bo me pêşketinbûn û we ji me re zanîn afirand. Hûn bûn mejiyê şoreşa gelan. Mamoste, hûnê hertim di dilê me de bijîn.

Ji bo zarokan ya yekem dibistana dayîkê tê, di vê derê de civakên cîhanê çanda xwe bi zarokên xwe didin fêrkirin. Lê ya herî girîng jî hûnerê mamosteyan e. Ev şagirtên ku hûnerên xwe ji mamoste digrin, weke şitla darê ne ku tên çandin. Avê dirêjin binê şitilan, ev ji wan re dibe ava jiyanê. Mamoste zatunebûn, çand, exlaq, urf, adet û feresatê ji şagirtan didin qezenckirin û ev jî dibin bingehê jiyana şagirtan. Zanînên ku xwendekar ji mamoste digirin, ji bo wan dibin hîmên bingehîn yên jiyan û zanistê. Aha dixwazim bêjim ku mamosteyên me heval Viyan û heval MustafaKarasû jiyan bi me dan fêmkirin.

Li binê spîndarekê bûm. Li kêleka min darên hinar û behîvê hebûn. Heval MustafaKarasû hat hizra min û bi dileke kelecan min hestên xwe bi van malikan rijandin ser kaxezê:

**Mamosteyê Min**
Tuyî mamosteyê min
Zanînê her gav didî min
Li ser îdeolojiya Rêberê min
We got me bixwînin û binivîsin
Da ku hûn serbilind bijîn

We îro em zana kirin
Rêya rast nîşanê me kir
Roja me ya reş, we ronî kir
Ji cahiliyê we em rizgar kirin

Mamosteyê min ê rûbiken
We herdem da me geşî û rewş
Lê belê dijminê bextreş
Nahêlin bi serbestî û xweş
Em bixwînin û binivîsin

Lê emê tolê hildin
Bi zimanê xwe bixwînin
Pênûsa xwe wek şûran
Herdem li dijmin bihejînin
Emê bi ziman serbixin

Sipas ji bo te mamosteyê min
Tuyê herdem di dilê me de bijî
Dê bi we rizgar be ev cîhan

**Vesaziya Min**

Min ji bo cihekê ku bikaribim lê karbikim pêşniyara xwe kiribû. Wê hevalan jî li ser pêşniyara min nirxandin bikiribana û wê encama wê ji min re ragihandibana. Lê daxwaza min ew bû ku li dibistana Mazlûm Dogan bimînim. Temenê min ê borî û gewdeya min ê lewaz diyar bû. Em ber bi demsala zivistanê ve jî diçûn.

Di desteke heval Viyan Soran de têbîniya vesaziya min, di destê din de jî Pirtûka Rêbertiyê, Parastina Gelekê hebû û ber bi min ve hat. Banî min kir û têbiniya min li gel pirtûkê dirêjî min kir. Min jî ew ji destê heval girtin. Birastî bi pirtûka ku hevalan wek xelat dayîne min gelek şanaz bûm. Lê pêşniyara min ya mayîna li wir nehatibû pejirandin.

Min gelek xweşî li dibistana Mazlûm Dogan derbaskirin. Ez bi hevalan ve hatibûm girêdan. Em bi qasî şeş mehan li gel hev mabûn. Ew rojên li wir, weke xewnekê di ber çavên min re diborîn. Gotinek heye

dibêje; “fêrbûn di landikê de destpê dike.” Lê wê heta gorê hezkirina xwendin û fêrbûnê di mejiyê min de be. Van hevalan hezkirina xwendin û zanistê bi min dan fêrkirin. Ez vê qet jibîrnakim. Ji ber ku jibîrkirina qenciyê nankoriye.

Ez naçarbûm biryara hevalan bicih bînim. Di vê navberê de min tu heval di cihê civînê de nedîtin. Vê yekê êş û xem ji min re çêdikir. Êdî ew hevalên ku me ew qas demên xweş bi hev re derbaskirî, nedixuyan. Lê ji derveyî rijandina rondikan tiştek ji destê min nedihat.

Dema çûyîna min bû. Ez bi xemgînî û wek nexweşekê ber bi rêya Lolanê ve ketim ser rê. Beriya rêbikevim, min destê mamosteyên xwe girt û xatir ji wan xwest. Lê dûrbûna min ji mamosteyan xem û keder ji min re tanî. Her çendî pişta min li wan bû jî, serê min li wan vedigeriya. Bi qederekê şûn de mamostayên min li ber çavên min windabûn. Axîn ji cegera min dihat, lê tu feyde nedida. Ji hevalan dûrketin nehêsane. Rêya Lolanê bi qederekê kişand. Du demjimêr bûn ku ji hevalan û dibistanê dûr ketibûm. Lê keser û xemên min pir dibûn. Şewata dûrketinê li min peyda bû û ji dil dernediket. Em bi piyan çûn Lolanê. Em gihiştin cihê heval lê diman, di nava van hevalan de heval Rubar û Îhsan jî hebûn. Min silav da hevalan, wan jî silava min vegirtin û bi dilgermî em pêşwazî kirin. Min bêhna xwe veda. Hevalan jî xwarin ji me re anîn. Xwarina wan; penîr, zeytun û nanê ku hevalan bi destê xwe pehtibûn bû. Xwarin danîn ser sifrê. Hêj rast dikirin, me dest bixwarinê kir. Di vê navberê de ajovanê tirimpêlê banî kir û got; “yên ku biçin Sûredê bila siwar bibin.” Hema bêje min têr xwarin xwarî bû. Min dest ji xwarinê kişand, xatir ji hevalan xwest û li tirimpêlê siwar bûm û em bi rê ketin. Min ji ajovan pirsa navê wî kir. Wî jî got; “navê min Şiyarê Efrînî ye.” Min got; “tu ji kû derê yî?” Bi devkenî got; “ji Başûrê Rojavayê Kurdistanê me.” Şev bû. Dema em li tirimpêlê siwar bûn, heval Şiyar dendikên kulindan li me belav kiribûn û me jî xwe bi wan mijûl dikir. Em gihiştin mêhvanxaneya Sûredê. Hîn tarî bû, lê heval hemû şiyar bûn. Hevalan em bi awayek germ pêşwazîkirin. Çay ji me re anîn. Hîn me çaya xwe xilas nekirî, taştê ji me re anîn. Lê belê ez di hizrên xwe de hîn li dibistana Mazlûm Dogan bûm. Mamosteyên min dihatin ber çavên min. Ew gotinên wan yên xweş û suhbetên wan yên germ dihatin bîra min.

Piştî xwarina taştêyê hevalan ji me re gotin; "hûn serbestin." Demek dirêj bû em di rê de bûn û em bêxew mabûn. Lê nerazam, dîsa jî min hinekê xwe dirêj kir. Heval Elî Amed berpirsyarê mêhvanxaneyê bû. Gelek rêzdar bû û her tim bi mêhvanan re keyfxweş bû. Her weke ku mêhvanên tên nasên wî ne û bi salane nedîtîne, ew himbêz dikirin û keyfxweşî nîşan dikir. Ev rewş pir li xweşa min diçû û pê şanaz dibûm. Min dixwest karek wisa bikim, lê min dizanî temenê min dest nade û partî jî tiştek wisa napejirîne.

Serpêhatiyek heye û wisaye; "rojekê du zarokên xwîşk û birayê hev diçin kerengan. Xwîşkê kerengan radikir, birayê wê jî kom dikir. Bi vî awayî xwîşkê her kereng radikir û dixist turikê birayê xwe. Carekê li turik dinêre valeye û tu kereng tê de nînin. Roj jî derenge û êdî nikarin hinek din kom bikin jî. Radibe darekê li serê birayê xwe dide û birayê wê dimire. Paşê ji Yezdan daxwaz dike ku wê bike balinde. Yezdan jî daxwaziya wê dipejirîne û dike balinde. Dema dibe balinde, bi dengekê bilind wiha qêr dike; kê kuşt? Min kuşt. Kê veşart? Min veşart." Vêca min jî bi xwe li xwe kiriye. Ez di kalbûna xwe de hatim û rewşa min jî eve.

## Dîtina Heval Cûma

Ez bi dileke keyfxweş û pir germ hatibûm Sûredê. Her çendî veqetîna ji mamosteyan xemginî û hesret bi min re da çêkirin jî, lê belê wê dîtina şalûl û bilbilên Kurdan ji bo min bibin derman. Dema min zanî ku ezê heval Cûma bibînim, min xwe pir vehês hîs dikir. Mîna zarokê ku dayîk û bavê xwe dîtî, ez êmin dibûm. Ji ber ku heval Cûma mîna dayîk û bav bi birehm bû. Her tim bi zimaneke şîrîn û nazik daxivî û dikarî bi hevalekê re bi rojan biaxive. Dema mirov diaxivî, hêj axaftin ji devê mirov derneketî dizanî xwesteka mirov çiye.

Berpirsyarê mihvanxaneyê heval Elî bû. Ji bo hevdîtina min a bi heval Cûma re têbînî şandibû. Pişt re hevalan gazî kirin û ez çûm serdana heval Cûma. Gelek bi min re axivî, min şerm dikir. Hem jî difikirîm ku wê min bişîne cihekê. Evê jî ez ditirsandim. Di rûyê heval Cuma de şirînî û henûniyê hevdu dixwarin; rêzdarî, hezkirin û xweşî nîşanî hemû mêhvanan dida. Ji bo mirovan mêhvanperwerî cewherê heval Cûma bû. Kêmahiyên min gelekbûn, ji ber hîn çanda gundiyan bi min re bû û min heta niha jî li ser xwe neavêtibû. Min gelek dixwest li gel heval Cûma bimînim. Ger bi qederekêbe jî, ji bo min keyfxweşiyek bû. Ji ber ku ji tama şîrîniya ew guftugoyên ku li gel mirovan dikirin tu carî têr nedibû. Lê ji ber ku gelek bi mihvanan re mijul dibû û gelek mirov bi rojan li gel birêz diman, dor nedigiha min ku ez jî weke dixwazim bibînim. Ji ber heroj her demjimêrên wî tijî bûn. Axaftinên heval Cûma ji pirtûkên pîroz yên Rêber Apo bûn. Axaftinên Rêber di dilê wî de hatibûn nivîsandin. Dema behsa şehîdan û Rêber Apo dihat kirin, ji şîrînahiya wan axaftinan zêdetir, tiştek ku mirov bianiya ser ziman nedihat fikirîn. Ji ber pîroziya wan axaftinan her kesê dixwest li gel heval Cûma bimîne. Dema firavînê hatibû, mêhvan gelek bûn û hemû mêhvan ji aliyê heval Cûma ve ji bo xwarinê hatin vexwendin. Em çûn aşxaneyê, sifre hatibû raxistin, heval Cûma li pêşiya mêhvanan li ser piyan sekinîbû û hemû mêhvan li ser kursiyan dabûn rûniştandin. Hemû mêhvan li ser kursiyên xwe rûniştibûn û kursî ji heval Cûma re nemabû. Her mêvanekê kursiya xwe dida heval Cûma, lê heval Cûma nedipejirand. Heval Cûma li ser piyan dest bi xwarinê kir, hemû mêhvan jî li ser kursiyan rûniştî bûn û xwarin dixwarin. Di demek kurt de kursî ji bo heval Cûma hat anîn. Di hezkirina gelan de ferq û cudahiyê nedixist

navbera kesê. Reng, xweşikbûn û delaliya wî di piratîka wî de xwe dida diyarkirin. Ew şepalên Apoyîne û rengê wan zerîfbûn. Ziman şîrînbû, hezkirina mirovan jê re bingeh bû.

**Rêheval Cûma Yusifê Kurdan e!**

Dema min ev aşxane û nerûniştina heval Cûma dît, bedewî û dilnizmiya Hz. Yusif hat bîra min. Bedewiya Hz. Yusif di cewherê heval Cûma de diyar dibû û li gorî nêrîna min, bedewiya heval Cûma ji ya wî hîn zêdetir bû. Ez dixwazim bedewiya Hz. Yusif bi vê mînakê ji we re rave bikim.

Di serdema ku Hz. Yusif li Misrê, ji ber tengasiyên ku gel dikişandin gazindan ji Zuleyxaya Misrê dikirin, Zuleyxa jî ji bo van gazindan bidawî bike ji gel re dibêje; "sibe hûn hemû mêhvanên min in." Roja paştir Zuleyxa mêzekê dide raxistin û li ser mêz sêniyên tejî fêkî û kêrên tuj dide bicihkirin. Paşê banî gel dike. Dema gel tê ziyafetê û li ser sifrê rudinin Zelîxa dibêje; "her yek ji we kêrekê û sêvekê bigirin destê xwe." Li ser daxwaza Zuleyxayê her kes vê dike. Paşê banî Hz. Yusif dike û tîne li pêşberî wan. Dema Hz. Yusif tê, hingê bedew, delal û xweşike, çavê her kesê li wî dimîne û li şûna sêvê her kes tiliyên xwe dibirin. Heta xwîna rijayî li ser mêz nehat dîtin, kesê birîna xwe hîs nekir. Li gel heval Cûma jî rewşa me ji ya Hz. Yusif zêde cuda tunebû. Dema heval Cûma li ser piyan xwarin dixwar, mêhvanan lêvên xwe gez dikirin, parêyên wan di gewrêya van de diman. Yên ku xwarin dixwarin, destê xwe ji xwarinê kişandin. Lewma dikarim bêjim ku heval Cûma Yusifê Kurdan e. Xweşikî û zerîfiya gul û nêrgizan bû.

Piştî çay vexwarinê heval Cûma banî min kir, têbîniya ku nivîsandibû da min û pîrozbahî li min da. Min xatirê xwe jê xwest, lê xem, keder û hesret di dilê min de kom bûn. Ji bo min dûrketina ji heval Cûma pir zor bû. Ji nava heval û hogiran, ji nava dar û daristanan, ji nava gul û kulîlkan derketin êş û keder bû. Lê belê ev keyfxweşiya min li vî cihî dîtî, di jiyana xwe de tu caran min nedîtibû. Ji ber ku nêzî şervanên azadiyê û rêhevalên Rêber Apo bûm. Ev cîhan çiqas xerîbe, heta mirov dimire nizane wê çi bê serê wî. Wê bi ku ve here, wê li rastî kîjan mirovan were, wê çi bibîne û çi were pêşiya wê/î, nikare pêşbînî bike. Xwezayê gelek bext dabû min ku min ev partî naskir. Min Rêber Apo

nedît, lê min pirtûka Rêber dixwend, di cewher de ew tê wê wateyê weke ku min dîtiye. Min gêrîlayên tevgera azadiyê dîtin, min gelê welatparêz û berxwedêr dît, min fermandarên artêşê naskirin. Ma êdî ezê çi bixwazim? Ez êdî bimirim jî ne di xema min de ye. Tiştên ku min di temenê xwe yê ew qas borî de nedîtîn û jiyan nekirin, min di ciwantiya xwe de jiyan nekirine û nedîtine di vê demê de min jiyan kirin. Ji ber ku bi şervanên tevgera azadiyê re rûniştim û rabûm. Min bi wan re xwar û vexwar. Ez bi wan re kenîm û girêyam. Min jiyana wan ya wekhev dît. Lê dîsa jî ji heval Cûma dûrketin di nava mejiyê min de hesret, keser û nalîn ava dikir.

**Rêhevalê Rojê Heval Cûma**

Da bibînim derya evînê tirêjên wê rojê ye
Belav bûn li deşt û çiyayan, newal û cîhanê

Ez digerim li heval, wa xezala sergirane
Dozgere, bargirane, pêşengê şoreşgerane

Min dan ber xwe deşt û zozan, çiyayên bilind e
Min nedît derya zanistê ew bostanê dilane

Ew jiyane, evindarê dozê ye, lê bargirane
Lê ji ber ew pêşenge, tu minet ji bar nîne

**Rêya Mexmûrê Xwe Nîşan Da**

Ji bo min rêya Mexmûrê xwe da diyarkirin. Ez ketim ser rêya mêvanxaneya Sûredê û min xwe gihand misafirxaneyê. Du rojan mam, piştre hevalê ajovan gazî min kir. Emê wê rojê biçûna wargeha Mexmûrê. Min xatir ji hevalan xwest, li tirimpêlê siwarbûm û me berê xwe da wargeha Mexmûrê. Hevalê ajovan wek berê rêzdarêya xwe nîşanî hevalan dida, lê rêzdarî û danûstandina ji bo hevalan ji xwe re kiribû pîşe. Em anîn mêvanxeya Mexmûrê. Piştre ez himbêzkirim û serkeftin ji min re xwest û got: “Tu wê li vir bimînî.”

Dema vê carê min li wargeha Mexmûrê nêrî û min li Çiyayê Qereçoxa ku piştepaliya wargehê dikir meyzand, destanên dîrokî yên gelê Kurd dihatin bîra min. Deşta Mexmûrê, ava wê ya germavê û Çiyayê Qereçoxê serpêhatiyên bi berxwdan û bi jan tanî bîra mirov. Di van serpêhatiyan de destanên bêhemta jî hene. Dîroka Kurdistanê bi van destanan dagirtiye. Bi qederekê li mêhvanxaneyê mam. Heval Bedran ji bo mêhvanxaneyê xebatkareke baş û hêja bû. Bi biçûkan re biçûk bû, bi mezinan re jî mezin bû, lê biryarên partiyê tu carî ji bîr nedikirin. Rojekê cihê xebatkirina min hat diyarkirin. Cihê ku ezê lê kar bikim 'saziya pîremêran' ya wergeha Mexmûrê bû.

**Saziya Pîremêran**

Belê, vesaziya min di vê saziyê de bû. Ji vî cihî re mala Rêber Apo jî dihat gotin. Pir xweşik bû, bi wêneyên şehîdan û Rêber Apo hatibû xemilandin. Binê komelê bi mehfûran hatibû raxistin û tişta pêwîst hatibû kirin. Ji vê komelê re rêz dihat diyarkirin, ji ber ku mala Rêber Apo bû. Gelê Mexmûrê rûmet didan vê komelê. Kesên ku temenê wan borî bûn, ew kesên xwediyê tecrûbeyên pir giranbiha û bi bûyerên ku hatibûn serê wan ji pêşerojê re bibûn ronahî. Ew saziyên wiha di vê demê de hatibûn avakirin. Bi fermana Rêber Apo ya ku dibêje; "hûn xwedî temenê borî ne û tecrûbeyên we û bûyerên bi serê we re derbas bûne, ji bo civakan rê nîşankerin." Ji pîremêrên wergeha Mexmûrê re jî 'rihspî' dihatin gotin. Pîremêran karên saziyê bi xwe didan meşandin. Her sibehê li saziyê kom dibûn. Komcivîna xwe pêktanîn, bernamesaziya xwe çêdikirin û cureyên xwe dimeşandin. Evane şêwirmendên gel bûn. Di wargeha Mexmûrê de wek rûspiyên wargehê dihatin naskirin.

Wargeha Mexmûrê wek giravekê bû, bi awayê civaka xwezayî jiyan dikirin. Li dora girav û civaka xwezayî dijminê wehş xwe bicih kiribû. Çima me jê re di got girav, ji ber weke giravekê şîn dikir. Girava wergeha Mexmûrê ji xwe bi şînahiya xwe dihat diyar kirin, ewên li dora vê giravê girtibûn Tirk, Ereb û Faris bûn. Çav birçîbûn, koçber û şinkahiya vê wargehê di çavên wan re diçû. Min jî cihê xwe di nava vê saziya hêja de girtibû. Dema min li Mexmûrê temaşe dikir, ez dihizirandim. Li ser xaka xwe bibûn koçber. Jiyana wan bixemginî, kul û êşê derbas dibû. Ji bo min jî kelecan û girî tanî. Koçberêya wan ji ber zora desthilatidarêya

Tirkan çêbibû. Li vê derê jî bi kuştinê re rûbirû mane, zarokên wan hatine kuştin, bi dehan şehîd bûne û hatine binaxkirin. Gundê wan bi darê zorê hatibûn valakirin û şewitandin, ew li ser axa xwe hatibûn koçberkirin. Her weke ku xewnek di mejiyê min re derbas dibû. Mexmur li bin sînga çiyayê Qereçoxê bê av û bê dar bû. Koçber gelek bi dûpişkan û maran mirin. Piştî zor û zehmetiyên giran kişandin, wargeha Mexmûrê hat paqijkirin ji mar, dûpişk û lawirên ku zerer didan mirovan. Gelek zarokên wan bi dûpişkan, maran şehîd ketin. Di dewsa van lawiran de gul û kulîlk hatin çandin û şînahiya wergaha Mexmûrê reng û reng geşdibû.

Girîngiyeke taybet ya penaberên Mexmûrê û bi nirxên şehîdan û Rêber Apo ve girêdayîbûn. Di demên borî de talanên vî gelî hatibûn birin, malên wan ji wan hatibûn standin, zar û zêçên wan hatibûn perçiqandin, gelek ji wan şehîd ketibûn ji ber êrîşên ji aliyê dewleta Tirk ve pêkdihatin. Lê xwe radestî dijmin nekiribûn û teslimiyet erê nekiribûn. Bawerêya xwe ya bi Rêber Apo re xurtir kirin. Her çi qas ji aliyê PDK'ê ve zordarî li ser vî gelê mazlûm hatibû kirin û pîremêr, pîrejin, keç û xort, zilam heta zarokên wan hatibûn qetilkirin jî, tu carî ji şoreşê qut tunebûn û bi dilsozî rêya berxwedan û azadiyê li ser şopa şehîdan û Rêber Apo şopandin. Bi vê boneyê zarokên penaperan her demê serdana rûspiyan dikirin. Wek bapîrên xwe didîtin. Ji nava zarokên wargehê keçika bi navê Rûheyv, navê dayikê Rûxweş, navê bav Ferîd ku ji Rojavayê Kurdistanê, ji bajarê Efrînê bûn, ji bo penaberêya wargeha Mexmûrê hestên xwe wisa aniye ziman:

**Penaberim**

Penaberim, bargiranim
Dil bi êş û bi kovanim
Bi qêrîn û bi hewarim
Ax! çendî melûl û jarim
Weke aveke zelalim
Ne dijminim û ne jî harim
Em dixwazin yekîtiyan
Ne bêçare û bê xebatin
Lê binêre, ey zalimê nezan!

Çendî feqîr bin, lê evîndarin
Çima tu dibêjî terorîsit in?
Emê nekin karên qirêj û pîsîn
Nebêjin ew nezanin, em dizanin
Wilehî birastî em dizanin
Heger em nezan bin
Emê tim li bindestan bin
Divê em bibin yek parçe
Ji dijmin heyfê rakin
Heyfa me pir giran
Lê ne bi qilêş, tank û topan
Aştî xwazim bi evîna dilan
Bi peymana Rêberê me
Dê azad bibe welatê me
Bi xemile bi rengên xweşe
Rêber Apoye serokê me
PKK ye hêvi û hêza me
Şehîdin rûmeta me
Gêrîlane jiyan û hebûna me

Gelê penaber gelek zehmetî kişandibûn. Ji aliyê PDK'ê ve serê pîremêrên wergehê bi kupên zêran hatibûn firotin. Bi siyaseta dewleta Tirk a faşîst, bira teşfiqê kuştina bira dikirin û birayên xayîn jî vê yekê erê dikirin. Xelata pere li ser kuştina gerîla û welatparêzên wargehê danîbûn. Lewma di Nîsana sala 1998'an de, li wargeha Nînowa PDK'ê li kêleka wargehê du kesên birayên hev yên bi navê Ehmed û Mihemed Hilalî dema diçin êzingan girtin, serê wan jê kirin û birin firotin dewletaTirk. Zêdetirî sê rojan gelê wargehê li wan gerêyan. Di dawiyê de laşê wan yê bê serî dîtin. Du kesên kal bûn. Weke vê, gelek bûyerên nexweş û biêş di nava vî gelî de hatine jiyan kirin.

Di saziyê de kêmasî dihatin nîqaşkirin, karên rojane dihatin parvekirin. Di van civînan de, ger rûspiyan erê bi kira, niqaşên ku dihatin meşandin dihatin nivîsandin û ji meclisê re dihatin şandin. Eger ez çi qas kêmbim jî min cihê xwe di nava vê saziyê de girtibû. Me karê saziyê bi hev re dida meşandin. Lê stuyê min li aliyê çiyê ve xar dibû. Daxwaza pîremêrên di saziyê de dîtina heval Cûma bû. Daxwaza min ya kesî jî ew

bû ku biçim çiyê û venegerim. Lê ev biryar ya partiyê bû. Lê belê ev hesret û kulên di dilê min de, di dilê hemû hevalên me yên rûspî de hebû. Hemûyan jî dixwestin heval Cûma bibînin. Lê ev hesreta di dilê hevalên me yên wek mam Ehmed, mam Emer, Yehya û yên din de xilas tunebû, negihiştin mirada xwe û çûn ber dilovaniya Yezdan. Ev hesret di dilê hemû rûspiyan de bû, lewma mirov nikare vê evîn û hesretê bigire. Ji ber vê yekê em hemû rûspî kombûn, me di nava xwe de nirxandinek kir. Di dawiya van nirxandinan de me hemûyan bi hev re pêşniyar kir ku em biçin serdana heval Cûma. Di wê demê de heval Mehsum û heval Zeydîn di rêveberêya wergehê de bûn. Min pêşniyara rûspiyan ji bo wan hevalan bir. Hevalan jî bi awayeke erênî pêşniyara me erêkirin. Bi vê erêkirinê me gelek gêwil girt. Naskirina min û heval Mehsum ji xwe demdirêj bû. Heval Mehsum li wargehê dima, ez gelek caran diçûm serdana wî. Ji bo min gotin û axaftina wî weke şîretan bû. Her dem ji bo min dibû alîkar. Bi şêwazeke nerm gotinên Rêber Apo ji min re şîrove dikirin. Bi hemû mirovan re weke hev nêzîkatî dikir. Bi biçûkan re biçûk, bi mezinan re mezin bû. Ya herî girîng, bi pîremêran re jî pir keyfxweş bû û bi ciwanan re jî ciwan bû. Mijara pîremêr biçin serdana heval Cûma dereng ket û pîremêran ez tengav dikirim.

Rojekê wê heval Karkerê Batmanî çûba Qendîlê. Min li ser navê saziya rûspiyan têbîniyek nivîsî û da wî hevalî, da ku bibe bide heval Cûma. Weke zarokan li me hatibû. Dema ku bav û dayîka zarokan diçin cihekê, çavên van zarokan li rêya wan dimîne heta ku tên. Bi rastî jî çavê me hemûyan li bersiva heval Cûma bû. Temenê borî mirovan wek zarokan lê dike. Me digot; "gelo wê bi pejirîne an na?" Rojekê em hemû li saziyê rûniştibûn. Heval Zeydîn hatibû gel me. Çavê me hemûyan zoq li heval Zeydîn mabûn. "Gelo wê çi bêje?" Paşê got; "heval Cûma gotiye dikarin werin serdana hevalan. Xwe amade bikin, destura çûyînê ji we re hatiye dayîn." Em hemû keyfxweşbûn. Hejmara me 117 kes bû. Hejmara me gelek zêde bû. Derfet, şert û merc dest nedida ku em hemû bi hev re biçin. Pêwîst bû ku em şeş heval biçûna. Me di nava xwe de biryar da ku em şeş kesan hilbijêrin. Ez, mam Qutas, hecî Elî, mam Xezayî, mam Şehbaz, şêx Tahir û mam Emer Nêrwehî hatin destnîşankirin ku biçin serdana heval Cûma. Piştî gelek cureyan ev kesên ku biçin hatibûn erêkirin. Min ev nav birin gel kesên berpirsyarê tirimpêlan. Saziya rûspiyan ji hemû hevalan hezdikirin û eger bihatibana

êşandin, hewara xwe digihandin heval Cûma û gazinc û giliyên xwe pê re parvedikirin. Yanî xilasiya xwe li gel heval Cûma didîtin û digotin; "ew gula li ber bêhna me ye û şîrîniya li ser zimanê me ye."

Sibehek zû tirimpêl hat û banî van hevalan kir. Gelek keyfxweş bûn, bi awayeke dilxweş û bi gêwileke bilind hatin. Min got; "hûn çima ev qas keyfxweşin?" Bersiva min wiha dan; "ma tu nizanî me berê xwe daye herêma Qendîlê, çima em keyfxweş nebin? Emê biçin serdana lehengên çiyayên Qendîlê. Emê biçin li gel heval Cûma." Ajovanê tirimpêlê heval Mordem bû, neşaşbim Torî bû, ji Mêrdînê bû. Em ketin ser rê, em gihiştin cihekê ku bi navê Koysancaq bû. Heval Mordem em li vir rawestandin da ku em pêdiviyên xwe pêkbînin. Heval li wir xwarin da me, me çay û cigara xwe vexwar, me hinek bêhna xwe da û em ketin ser rêya xwe. Piştî demekê em gihiştin mêvanxaneya Qendîlê ku li Sûredê bû. Jixwe heval li benda rûspiyan bûn. Em di rê de gelek westiyabûn, di peyabûnê de me dest û çavên xwe şûştin, çay vexwar û paşê hevalan penîr, şîr, zeytun, tiriyê reş, hingivîn û nan danîn ser mêza xwarinê û me xwarina xwe jî xwar. Heval Elî ji xelkê Amedê bû û berpirsyarê wir bû. Ji me re got; "hûnê niha biçin gel heval Cûma. Xwe amede bikin, ji ber ku di rêzê de hinek mêhvan hene ku ji cihekê gelek dûr hatine ji bo serdana heval Cûma û li benda we ne." Me jî got; "başe." Em rabûn ser xwe û me dest bi meşê kir. Heval Berxwedanê Wanî li gel me hat. Dema em nêzî heval bûn, me temaşe kir heval Cûma hat pêşiya me û em pêşwazî kirin. Weke zarokan em pir keyfxweş bûn ku heval Cûma bi vî awayî em pêşwazî kirin. Ji ber ku em di nava tirimpêlê de gelek westiyabûn, me nedikarî em di rê de bimeşin. Heval Cûma gazî hevalan kir ku bên destê me bigirin. Heval hatin û em heta cihê heval Cûma birin. Birastî jî dilnizmiya heval Cûma cewhereke giranbihabû. Zanî ku em gelek westiyane û ji hev ketine. Ji me re got; "niha ez nikarim li gel we guftugo bikim, ji ber ku hûn westiyane. Herin li mangên hevalan bêhna xwe vedin." Dema em çûne mangê heval Berxwedan got; "serê xwe bişûn û hinekê razin." Em çûne serşûyê, me xwe şûşt û paqij kir, bêhna xwe veda heta ku bû êvar. Hevalek hat gazî kir û got; "rabin ser xwe, heval Cûma ji bo xwarinê banî we dike." Em hemû rabûn ser xwe û ber bi cihê xwaringehê ve meşiyan. Me temaşekir ku heval Cûma li ser sêfra xwarinê ye, lê dest bi xwarinê nekiribû. Li benda rûspiyan bû. Min gelek şerm kir. Dema ku me ev rewş dît, şermê di rûyê me de xwe diyar dikir.

Em çûn gel heval Cûma. Pîremêran şevbaş li heval dan, heval Cûma jî got; "şeva we jî baş be." Paşê got; "kerembikin, rûnin." Em bi hev re rûniştin û me dest bi xwarinê kir. Piştî xwarinê hevalan çay anîn. Êdî me hem çaya xwe vedixwar hem jî li gel heval Cûma guftugo dikir. Pîremêran xwe wisa hîsdikirin ku nû jidayîkbûne, ewqas keyfxweş û dilşadbûn. Heval Cûma rewşa wargehê pirsî, rûspiyan jî bersîva heval Cûma didan.

Cihê heval Cûma bi şînatiyeke kesk hatibû dorpêçkirin û sîber bû. Xûme xûma avê, qîje wîja çûkan nedihişt em baxivin. Weke ku ji me re digotin; "naxivin! Guhdarî dengê heval Cûma bikin, hûnê wê demê bersîva pirsên xwe bibînin." Ez şaş dimam, bi rastî jî zimanê zarokatiyê ketibû devê hemû rûspiyan, li gel heval Cûma xwe azad hîsdikirin. Weke zarokên di cejnan de şekir dibînin û pê dilxweş dibin. Daxwaza pîremêran ew bû ku her tim heval Cûma ji wan re biaxive. Wê êvarê li dora heval Cûma kom bibûn, di rûyê heval Cûma de weke her caran keyfxweşî û henûniyê xwe dida der. Biqederê heftiyekê pîremêr li wir man û her roja xwe bixweşî derbas dikirin. Dema emê bizivirîbana ji her pîremêrekê re diyariyek amade kiribûn. Ji ber ku pir karên heval Cûma hebûn û dem jî kurt bû, em naçar man vê xwezaya bedew li pişt xwe bihêlin û bizivirin. Heval Cûma bi şêweyê ku em pêşwazî kirî, wisa jî em oxir kirin. Lê di ew kêliyên xatir xwestinê de rondik di çavên pîremêran de dibAriyan. Bi vî awayî tîma pîremêran ketin ser rêya wargehê û çûn û ez jî li wir mam.

**Pêşniyara Min Çûyîna Dibistanê Bû**

Min li vê derê pêşniyara xwe ji bo heval Cûma kir ku ez biçim dibîstana zimanê dayikê. Pîremêrên hevalên min zivirîbûn, lê belê ez li wê derê ji bo xwendin û nivîsandinê mam. Min li vê derê dest bi dibistanê kir. Dewreya yekem ya komîteya ziman û perwerdeyê ya KCK'ê ya havîna sala 2005'an bû. Mamosteyên me heval Zeyneb û heval Egîd bûn. Heval Zeynep endama konseya rêvebir bû û berpirsa komîteya perwerdeyê bû. Heval Zeyneb di hemû aliyan de, di aliyê xwendin û nivîsandinê de, di aliyê jiyanî de bi min re gelek dibû alîkar. Hevaleke gelek hêja û binirx bû. Perwerdeya me wê sê mangan kişandiba. Rojekê heval Cûma hatibû serdana şagirtan. Min daxwaza

xwe jê re kir ku ez li gel wî bimînim. Ji ber ku min gelek jê hezdikir û min ev hezkirina xwe jê re ravekir. Heval Cûma ji min re got: “tu gelek ji min hez dikî?” Min got: “belê, ez gelek ji we hezdikim.” Bersiva min wiha da; “ger tu ji min hez bikî, tuyê biçî karekê bikî.” Bi rastî jî wiha bû. Hezkirina zuha û tenê li ser lêvan çênedibû, pêwîst bû min vê hezkirina xwe xistiba nava kar. Heval Zekî Yêzîdî endamê dîwana Kongra Gel bû û li nêzi cihê me bû. Mêhvaneke wî yê bi navê Mîhrab hatibû. Dema ku demjimêrên xwendin û nivîsandina min xilas dibûn ez diçûm gel wan. Me bi hev re guftugo dikir. Heval Zekî bi rastî jî xwedî zimanek xweşik bû. Min digot ezê çawa ji van hevalan qût bibim. Hêdî hêdî dawî li perwerdeyê dihat. Çavê min mabû li rêya heval Cûma, gelo ezê wî bibînim yan na?

Di dawiya perwerdeyê de pileya min ya ezmûnê hatibû diyar kirin. Pileya min ya ezmûnê heştê bû. Heval Cûma têbîniyek ji min re şandibû. Hevala Besê Hozat jî ji min re xwend. Di têbiniyê de heval Cûma wiha gotibû; “bila mamê Hecî dîsa biçe wargehê û di saziya pîremêran de kar bike.”

Bi vê re ev hest di serê min re derbas bûn:

**Mamosteyê Mezin Rêber e**

Tuyî azadîxwazî, keyfxweşî bo zarokan dilgeşê gelan
Neçirvanê heja û delal, we nêçîr meşand li serê çiyan
Zarokên Kurdan bûne neçîrvan, ketin pey hirçê û guran
Pêşdixistin lîstokên azadiyê, li her çar aliyên Kurdistan
Hûn Rêberê pir şîrînin, temenê we heft digotin

We tovên binevşan û rihanan reşandin li gundan
We şînkir dara zuha, we hêjakirin kal û pîrên Kurdan
We li xwe civandin zarokên xwendekar li Botan
Hûn bûn helbestên li ser zimanê zarok û dayîkan
Hûnin gula li destan, we şîn kir welatê bav û kalan

Hûn aşitî, aramî û biratiyê dixin nava gelên cîhan
Ji tirsan reviyan keftar, gurî û rûvî ji çiyayan tevan
Şervan belavbûn li Serhed, Botan û Qendîlan

Sernexêmbûn firewn, şahî ket nava dilê gelan
We da şikênandin kevneşopiya kevneperestan

Mamosteyê mezin, zaniyar û rêberê cîhana
Cewher girane, konfederalizm sistema wî ye
Xweziya zarok bûma, min bi destê wî bigirta
Min bêhna wî hildaba, keyfxweş û zîrek bibûma
Bi gotinê fêrbûma, pir bileyîstima, zana bûma

Şîrîniya zimanê wî fêrbibûma derya zanista
Mamoste pir şîrîne, ramana xwe aniye zimana
Yê bi me da zanîn ziman, mamoste û Rêbere
Dayîka mezin Kurdistan nazenîn, bihagirane
Bûye parêzvana zarave û lehçeyên Kurdane

Biskên wê dirêj dibûn ser rûyê şeng û şepale
Wî bi zimanê xwe jiyan daye me
Zimanê Rêber Apo navnetewiye
Belê ew bi her zimanî diaxive
Destnişan dike meznahiya wî ye

Zimanê Apo Kurmaciya jorîne
Kurd ji tutunebûnê anîne hebûne
Rêber Apo Kurde, ji Ruhayê ye
Hey mamê Haci yê bê heveskare!
Tu dizanî ziman çiye? Ala te ye

**Ziman**

Şagirtim fêrdibim, pênûs di destê min de ye
Mamoste şîrîne, ew Rêbere, taca gelê xwe ye
Zimanê dadê jiyane, evîne, awaze, axîna dile

Zimanê wê çande, binevşe, baxe, sorgula dilane
Kevnare, Xubra Xaniye, ziman jiyana Kurdane
Gula Dersîmê, rihana Garzane, sorgula Botane

Wek cewhere, zimanê dayikê, gulnare awazê li çiyane
Bixwînim, binivîsim, bi sond we belav bikim li cîhane
Emê bişopînin rêya şehîdan ku me soz daye wane

**Şehîd Ferhat Kurtay**

Ferhat Kurtay bi Kurdî li pelê çirûskan nivîsiye
Belê şehîdan bi xwîna xwe nîvisî li zindane

Kurdî li çiyayên Kurdistanê, bûne sterka esmane
Roni daye deşt û çiyayên welatê me Kurdistane

Li Bakur, Başur, Rojhilat û Rojavaye zimanê me
Ziman xemla Kurd û Kurdistanê, zimanê Ariyane

Nalîna Cigerxwîne, helbest ji bo gelê Kurde
Evîna Melayê Cizîra Botan û Feqiyê Teyrane

## Mamoste Zeynep

Dema em di perwerdeyê de di navberan de min pirsa dibistanên wargeha Mexmûr ji mamoste Zeynep dikir. Wê jî ez nedişkandim û daxwaza min paş de nedizivirand. Em li binê dara gozê rûniştin, bi qederê 15 rojan li gel heval Zeyneb mam û heroj biqasî perekê ji min re digot û min jî dinivîsand. Bi vî awayî min ev zanyarî ji mamoste Zeynep girtin.

"Di sala 1994'an de em ji ber êrişên dewletaTirk û hevalbendên wî neçar man koçberî Başurê Kurdistanê bibin. Her çendî em koçberbûn jî, lê tu caran min dest ji xwendina xwe berneda. Herdem hezkirina min ya xwe pêşxistina xwendin, nivîsandin û zanistê hebû. Dema di wargehê de dibistan hatin vekirin, min di sala 1996'an de li gorî pêdiviyan dest bi karê perwerde dayinê kir. Li gorî hêz û pêdiviyan min di nava meclîsa gel û rêveberêya dibistanan de cih girt. Ji dibistana dayîkê heta ya navîn yekê min ders daye xwendekaran. Di sala 2005'an de min di nava konseya rêvebir a KCK'ê de cih girt. Du deman min di nava rêveberiyê de cih girt. Di vê dema xebata xwe ya rêveberiyê de, min berpirsyarêya komîteya ziman û perwerdeya KCK'ê hilgirt. Jixwe biryara avakirina vê komiteyê di kongreyê de hat girtin. Dema komîte hat avakirin, ji bo hevalan perwerdeya zimanê dayikê bi zaravayê Kurmancî hat dayîn. Dewre li ser daxwaza hevalên serlêdan kiribûn hat despêkirin. Me dewreya despêkê li herêma Qendilê, li dola Sûredê û di dibistana ku ji bo cihê kongrê hatibû çêkirin de pêkanî. Ew dewre gelek bi coş û rengîn bû, çend xwendekarên zankoyê yên ji Rojhilatê Kurdistanê hatibûn û hejmarek hevalên jin bûn. Hevalek ji Ukraynayê bû. Heval Mela Nurî jî wê demê ji Mexmûr hatibû, wî jî daxwaza tevlîbûna perwerdeyê kir. Dema hat gel me û got; "ez dixwazim tevli perwêrdê bibim", min got; "ka we daxwaza xwe ya bi nivîskî nedaye ku em bipejirînin." Mela Nurî bersîv da û got; "mane min destur ji heval Cûma xwestiye." Min yarî kir û got, "heta tu daxwaza xwe bi nivîskî nedî, em napejirênîn." Mela Nuri got; "başe ez biçim notekê ji heval Cûma bixwazim." Min got; "na, ez yAriyan dikim, mafê her hevalekê/î heye, ger bixwaze fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî bibe." Wê demê Mela Nurî bi rûkenî û coşek pir mezîn got; "sipas heval, ez pir keyfxweşim. Ji ber ku dê fêrî xwendin û nivîsandina zimanê dayika xwe bibim."

Birastî yê di nava dewreyê de herî bicoş û li ser dixebitî ew bû. Jixwe yê ji tevan temen mezîntir jî ew bû, ji ber wê hevalan gelek rêz didan wî. Dema xwe gelek tejî derbas dikir, her dem yan dixwend yan dinivîsand. Ji hevalan pirsên li ser rewşa siyasî û ziman dikirin. Ji ber wê, di dewreyê de şagirteke jîr û serkeftî bû. Ji ber vê daxwaza wî, min xwe neçar dît ku nivîsandinên ji min dixwaze jê re bêjim û gelek keyfxweşim bi xebata heval."

Piştî vê vegotinê, heval dîsa berê xwe da min û wiha got; "Mam Hecî, hûn amadene ji were behsa kurtedîroka dibistanên wargeha Mexmûrê bikim?" Min jî bi dileke xweş got; "belê." Hevala Zeynep berdewam kir û vegot; "Birastî ez nizanim çawa û ji kû derê dest pê bikim. Ji ber ku gelek êş û zehmetî hatine jiyankirin. Xwendin di bin şert û mercên gelek nexweş de hat despêkirin. Perwerdeyê li wargeha Bihêrê destpê kiribû. Zarokên wargehê nedizanîn dibistan çiye, ji ber ku weke xelkê dibistanên bi zimanê dayîka xwe nedîtibûn. Wan tenê jiyana koçberiyê dîtibûn. Tenê dizanîn barkirin çiye. Hîn dengê top û tifengan di guhê wan de dubare dubare deng vedida û wêneyên agirê ku bi mal û gundên wan ketî dihatin ber çavên wan. Di mejiyê wan de tenê dengê zilm û zordarêya dijmin hebû. Zarokên penaber tu caran hizir nedikirin ku wê carekê fêrî xwendin û nivîsîna bi zimanê dayîka xwe bibin. Ji ber ku tenê bi zimanê dewleta faşîst perwerde dîtibûn. Li gor wan, tu zimanên din titunebûn, ji ber ku wisa di mejiyê wan de hatibû çandin. Pergala dijmin hilweşe, çawa dil dan wê hovîtî û qirkirina xwe bixin mejiyê zarokên Kurdan.

Belê, li wargeha Bihêrê pêngava perwerdeya bi zimanê dayîkê bi hêjmarek kêm ya zarokan destpêkir. Perwerde destpêkê bi hinek stran, helbest, marş, leyistokên zarokan yên li binê siha darekê û bi rûniştina li ser keviran hat destpêkirin. Zarok û mamosteyên xwe kom dibûn, cih çêdikirin. Zarokên keç û kur hemû bi hev re dest didan hev û bi vî awayî gava yekemîn ya perwerdeyê hat avêtin. Êrîş û gulebaranên dewletaTirk bênavber li ser gel berdewam dikirin, jin, zarok, ciwan û pîran ji ber topbaranên balefir û baregehên artêşa Tirk yên heroj pêktên neçar man wargeha Bihêrê berdin. Jixwe çend kesan li vê wargehê ji ber kêm derfetiyan jiyana xwe jidest dabûn. Hinek dema ji sinor derbas dibûn û hinek jî ji ber ketina ser mayinan şehîd ketin. Ji ber ku derfetên jiyanê neman, gel careke din neçar ma bikeve ser rêya penaberêya bêdawî.

Dema ji vê derê rabûn, despêkê li wargeha Bêrsîvê bicih bûn. Bêrsîvê deşteke rast û rût bû, tev zevîbûn û gelek baran lê dibarêya. Mirov nedikarî di nava heriyê re derbas bibe. Ji ber ku em bê destura Neteweyên Yekbuyî hatibûn, tu derfetên jiyanê nedidan me. Jixwe gelê heremê navê wargeha me kiribû Zorava û digotin we bi zora xwe ava kiriye. Li vê wargehê jî perwerde tevî kêm derfetiyan jî di bin kolikan de hat meşandin. Hîn saleke me temam tunebûyî, em derbasî Etrûşê bûn. Nîvê gelê wargehê hatin Etrûşa jêr, nîvê din jî li Etrûşa jor ya bi navê Geliyê Qiyametê bicih bûn. Xebatên ji bo xwendin û nivîsandina bi zimanê dayîkê hatin despêkirin. Mirov pêwiste hewildanên ku mamosteyên despêkê yên weke heval Yekbûn, Koçerîn, Viyan û Xalid ji bîr neke. Van hevalan gelek hewildanên bêhempa dan meşandin. Ji bo ku zarokên penaber fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê dayîkê bibin, kedek pîroz didan. Heval Koçerîn di sala 1994'an de bi komek ji yazdeh kesan pêkhatî tevlî nava refên gêrîla bibû. Heval Yekbûn û hevala Viyan di 1995'an de bi komek hevalên xwe re biryara ku digirin ji malbata xwe ragihandin û bi awayek eşkere tevlî nava refên gêrîla bûn. Heval Xalid jî bi komeke ciwanan re di sala 1995'an de tevlî nava rêxistinê bû. Heval Kamuran jî piştî dîlketîna Rêber Apo, bi biryardariyek pir mezin li pêşiya bi hezaran gelê penaber soza xwe da. Jixwe ew zarokê sêyem bû ku ji malbatê tevlî dibû; birastî jî gelek jîr û jêhatîbû. Vê biryardarêya wî gelek bandor li ser gel, mamoste û xwedekaran kir. Jixwe gelek xwendekar jî wê demê tevlî nava rafên rêxistinê bûn, ji ber ku hêrs û kîna li hember dijmin pir zêdebû.

Li wergeha Etrûşê jî di despêkê de tu derfetên zêde tunebûn. Bi alîkarêya mamoste û malbatên zarokan perwerde dihat meşandin. Dibistanên wargehê xêvet (çadir) bûn. Mêzeyên wan di despêkê de ji heriyê hatibûn çêkirin, sernivîsên wan jî çend pelên kaxezan bûn û pênûsek li ser çend xwendekaran dihat belavkirin. Xwendekarên penaber bi vî awayî xwendina xwe didomandin. Bi destê hevdu digirtin, hev diparastin, hezkirina wan ya ji bo hevdu dihêla ku ev xwendin û nivîsandin berdewam bike. Çi roja derbas dibû, sîstema xwendinê pêş ve diçû. Mamosteyên wan jî di sîstema dewleta Tirk de xwendibûn; lê belê bi neçarî ew Tirkiya xwe kirin Kurdî û xwendevan perwerde dikirin.

Em hatin wargeha Nînowayê, dîsa dest bi perwerdeya dibistanan hat kirin. Ji ber vê cihguhertinê û koçberêyan nivîsandina wan

xwendekaran paşde dima. Dema ku diçûn cihekê li wê derê dest bi xwendinê dikirin, heta astekê dihatin. Lê dîsa ji wê derê diçûn wareke din û ji nû ve dest bi dibistan çêkirinê dikirin.

Navê dibistanên seretayî; Dibîstana Dr. Nûrî Dersimî, Dibîstana Ş. Mihemed KARASÛNGÛR, Dibîstana Ş. Saleh Kandal bûn. Li Nînowayê xwendekaran nedikarîn bi awayeke xurt dest bi xwendinê bikin. Ji ber ku gelê wargeha Etrûşê nekarîn hemû bi hev re bên. Ew, kom bi kom dihatin, yanî belavbûn. Ji ber ku heta komî serhev dibûn ji nişka ve dibistan dihatin vekirin, xwendekar dihatin qeydkirin, heryek diçû dibistana xwe û li gorî semtan xwendekar ji hev dihatin cudakirin. Çavkaniyên wanedayinê kêmbûn û pirtûkên wan tutunebûn; lê belê dîsa tevî kêmahiyên heyîn jî berdewam dikirin. Ev berdewamkirina xwendin û nivîsandinê bênavber bû.

Ji wargeha Nînowayê jî koçberî pêkhat; vê carê gel berê xwe dabû Nehdaran. Nehdarê cihek nêzîkê Mûsilê bû. Ez çîroka Nehdarê ji bo we bejim, çima jê re dibêjin Nehdarê. Li Nehdarê darek mezin heye. Di despêkê de bi vê darê ve deh çiq hebûn, zilamek jî li rastî vê darê tê, temaşe dike gelek ciwane, diçe çiqekê ji vê darê dibire û dimînin neh çiq. Di dema Sedam Huseyîn de bû, dema ku Sedam dibihîse vî zilamî çiqeke vê darê biriye gazî wî dike. Zilam jî çawa xeberê dibihîse, radibe diçe gel wî. Ji derî ve diçe silav dike. Sedam jî silava wî bi eleykum selamê vedigerîne. Zilam dibêje "we gazî min kiriye, xêr bû?" Sedam jî dibêje; "belê raste, keremke rûne." Zilam rûdine. Sedam dibêje; "çima te çiqê dara dehdarê biriye?" Zilam dibêje: "çima, ma wê çi çêbibe." Sedam xwe bêdeng dike, piştre destê zilam jêdike û dibêje; "kesê ku destê xwe dirêjî vê darê bike, ezê wî destî bibirim."

Wargeha penaberan li Nehdarê li binê wê bi cih bûn. Em ji ber zilm û zordarêya xayinan reviyan û derbasî milê Nehdaran bûn. Li vê derê jî me xwendekarên xwe kom kirin. Leyîstok dihatin leyîstin, stran dihatin gotin û hinek waneyên werzişî dihatin dayîn. Hinek waneyên wêjeyî jî dihatin dayin. Belkî perwerdeyeke wisa berfireh nehat dayîn, lê belê dîsa jî ji perwerdeyê re navberek dirêj nehat dayîn. Jixwe em li vê derê gelek tengav bûn, em bi şert û mercên gelek bi êş re rû bi rû man. Li vê derê jî koçberiyê careke din xwe da nîşandan û em ji vê derê derbasî Wargeha Mexmûrê bûn.

Mexmûr bi xwe tê wateya xemil û xweşikbûnê. Lê belê li vê derê mexdûrî hebû. Ji ber ku cih û warê mirinê bû, ne warê jiyanê bû. Gelek zarok ji ber bê aviyê, tozê, mar û dûpişkan mirin. Mexmûrêyan li vê derê jiyan dan avakirin, li cihê mar û dûpişkan gul û kulîlk dan şînkirin. Bi hevkariyek pir mezin ji bo her malbatekê xaniyek biçûk ji bilokên heriyê hat çêkirin. Ji heft salî heta heftê saliyê di nava tevgerê de bûn. Li vê derê biryar hat dayîn ku her semtek li gorî derfetên xwe dibistanên xwe çêbikin. Gelê welatparêz rabû bi alîkarêya mamosteyên xwe ji herî û daran, yanî ji bilokên axê dibistanên zarokên xwe çêkirin. Xwendekaran dest bi perwerdeya xwe kirin. Sê dibistanên seretayî hatin avakirin, her yek ji heft refan û cihê rêveberiyê yanî cihê mamosteyan pêkdihat. Dibistana Ş. Mehmet Karasûngur ji aliyê semta yek ve hat çêkirin. Dibîstana Ş. Jiyan ji aliyê semta duyan ve hat çêkirin. Dibistana Dr. Nurî Dersimî ji aliyê semta sêyan ve hat çêkirin. Dibîstana Ş. Salih Kandal ji aliyê semta çaran ve hat çêkirin. Bi awayek dorveger zilam, jin, ciwan, kal, herkes li gorî hêza xwe tevlî çêkirina xebatên dibistanan dibûn. Dema ku dibistan hatin çêkirin û xwendekaran carek din dest bi dibistana xwe kirin, keyfxweşî û coşek pir mezin di nava mamoste, xwendekaran û gel de çêbû. Neteweyên Yekbuyî qet bawer nedikir emê bikaribin di nava van bêderfetiyan de karek wisa mezin bikin. Bi rastî dema ev fedekarêya bê hempa dîtin, gelek ji nêzikatiyên xwe şerm kirin û soza alikariyê dan. Ez dixwazim ka ev dibistanên Mexmûr çawa hatin avakirin, hindik jî be vekim.

Dema ku civîna mamosteyan hat çêkirin, tê de biryara çêkirina dibistanan hat girtin û di vê civînê de komîteyek ji bo çêkirina dibistanan hat hilbijartin. Hevalên di nava vê komîteyê de cih girtin mamoste Yusif Hîlalî, mamoste Mihemed Tahir Hîlalî, mamoste Zeynep Hîlalî, mamoste Sediq Hîlalî û mamoste Hecî Ehmed Gundikî bûn. Hevalên din ji bo binyana dibîstanan ji çolê kevir kom dikirin. Me dest bi çêkirina dibistanan kir, lê belê di nava wê bê aviyê de kolana axa ewqasî hişk û zûha, çêkirina herî û wê heriyê kirina bilok gelek zor bû. Di mehên Hezîran, Tirmeh û Tebaxê de xebitîn ne hêsan bû, kesekê li wargehê werza havînê de jiyan nekirî, nizane ka çend zorêyên karkirinê hene. Dibe ku em kêm bênîn ser ziman, yan jî em bi temamî nikaribin rewşa heyî weke wêneyekê rabêxin ber çavên we. Belê, xweziya herkesê me dîtiba ka me çi rewş jiyan dikir, lê ev rastiya me û gelê me ye. Heroj ji

semtekê taxek dihatin û dixebitîn. Lê em hevalên mamosteyên endamê komîteyê heroj dihatin gel karkeran, ji bo pêwistiyên wan yên rojane pêkbînin û xebat bi awayek baş bimeşe. Bi awayeke dorveger gelî tevlibûna xwe ji xebatê re dida çêkirin. Heta hinek malbatên ku zarokên wan tutunebûn jî dixwestin para xwe tevlî vî karî bikin. Digotin, zarokên me nînin, lê ji ber kareke pîroze em dixazin bixebitin.

Despêkê qasî têr bike her semtekê bilokên xwe çêkirin, ji gel hosta û karker hatin derxistin û dest bi çêkirina dîwarên dibistanê kirin. Piştî ku dîwar temam bûn rêxistinê jî dar, hesir, tel û çîmento anîn û dibistan hatin temam kirin. Dayîkan jî xwestin para xwe bixin nava vî karî, bi destên xwe yên nazik û ciwan ji der ve û hundirê dibistanê bi heriyê kurtan kirin. Her dibistanek ji heft refan pêkdihat. Mêzên ku di nava wan refan de hatin çêkirin ji heriyê di şeklê mêzeyên rastî de hatibûn çêkirin. Temamkirina dibistanan û despêkirina perwerdeyê coş û xurûşeke gelek mezin di dilê hemû zarokan de dabû çêkirin. Zarok roj bi roj li bendê bûn ku wê kengê dibistan vebin, cil û bergên xwe li xwe bikin û biçin dibistanên xwe. Dibistana Mehmet Karasûngûr, Dr. Nûrî Dersimî û Salih Kandal dibistanên seretayî bûn. Dibistana Şehîd Jiyan jî weke dibistana navîn û dibistana Amadeyî ya Şehîd Koçerîn hatin rêxistinkirin. Her roja ku diçû jimara xwendekaran zêde dibû, derfetên dayîna perwerdeyê jî her ku diçû zêdetir dibûn. Ji ber pirbûna xwendekaran pêdivî bi zêdebûna mamosteyan jî çêdibû. Di aliyê peydakirina mamosteyan de jî gelek zorî dihat jiyankirin, ji ber ku kesên xwendekar di nava wargehê de kêm bûn. Barê mamosteyan jî pir giran bû, ji ber ku her mamosteyek xwedî malbat bûn û di aliyê jiyanê de jî gelek zorî dikêşandin. Gelek kesan jî zêde bawerî nedidan ku wê perwerde bigihe asteke wisan ku ji dibistana dayîkê heta digihe dibistana amadeyî hebe. Wê bikaribe heta dibistana amadeyî biqedîne û biçe bajarê Hewlêrê û zankoyê bixwînin. Bi rastî jî ew asta ku heta perwerdeya zankoyê biçe bi hêsanî nehat bidestxistin. Weke me aniyî ziman, bi alîkarêya gelê qehreman û bi alîkarêya ramanên Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ev serkeftin hatin bidestxistin. Tu kesê ku li ser van dibistanan kar dikirin, di aliyê aborî de tiştek negirtin. Hemû jî bi fedekarî û serbilindî, bê heqdest tê de xebitîn. Êvarî jî bi dileke xweş û rûyek biken karê xwe diqedandin. Dema ku Neteweyên Yekbuyî dîtin me hemû dibistanên xwe temam kirin, pir bandorbûn. Ji ber ku wan

digot ew nikarin çêbikin, derfetên wan tunene. Belê, dibistanên wargehê di encema kedeke bêhempa de hatin çêkirin. Gelê penaber bi fedekarî û kedkarêya xwe, Neteweyên Yekbuyî matmayî hiştin. Pişt re ji hêla wan ve ji sala 2000’an heta 2004’an çar dibistan hatin çêkirin. Dibistana herî dawî di sala 2005’an de çêbû. Dibistanên ax hatin xirakirin û perwerde êdî di van dibistanên nû de hat domandin. Hatina heyetên ji der ve bû bingehê naskirina dibistanan. Car car hevdîtin bi Neteweyên Yekbuyî re çêbûn û pêwistiyên ku heyîn ji bo wan dihatin ragihandin. Wan jî car carî serdan dikirin û perwerdeya me bi rêkûpêk dişopandin.

Me gelek zorî û zehmetî kişand, eger em binivîsin bi rastî û dirêjî, wê tu sernivîs û pênûs xwe li ber negirin. Di aliyê rewşa xwezayî de kombûna kesan û bernameyên dibistanê de jî zorî dihatin kêşandin. Rewşa tenduristî ya xêzan û malbatan jî bandoreke nebaş li ser xwendekaran dikir. Ji ber ku pirsgirêkên jiyanî di astek jor de bûn, gelek caran zarok birsî û bê pêlav dihatin dibistanê. Yan jî pêlava dayîka xwe, bavê xwe, birayê xwe li xwe dikirin. Gelek caran jî cilên hev bi awayek dorveger li xwe dikirin. Jixwe di nava pêvajoya perwerdeyê de me gelek caran di bin gulebaranan de waneyên xwe didan. Bi mehan me nan nedît, bi dehan caran em ji birsînan bi mirinê re rû bi rû mane. Dewletên dagirker û faşîst nedihêlan xwarin, cil û berg û pêdiviyên me yên jiyanî bikevin wargehê. Gelekan kes û karên xwe di vê pêvajoyê de windakirine. Hûn bi fikirin ka sêwîmayîna di pêvajoya penaberiyê de çi qasî zore. Birastî jî ez gelekê êşê dikişînim, dema ku ez van bûyeran dibêjim. Lê belê em çi bikin, ev rastiya jiyana me ye.

Ji van xwendekaran bi sedan tevli refên gêrîla bûne. Gelek ji wan şehîd ketine, gelek ji van jî niha li ber xwe didin. Mamosteyan jî gelek zehmetî dikêşandin, ji ber ku me fêrdikir û em fêrdibûn. Me û malbatan alîkariyeke gelek mezin da hev, heta em gihiştin astek bi vî awayî. Me bernameyên waneyan çêdikirin, xwendekar jî li ser waneyên xwe dixebitîn. Malbatan jî girîngî didan xwendina zarokên xwe. Em niha dikarin bêjin, ev sîstema perwerdeya Mexmûrê ya ku bi zimanê Kurdî tê dayîn, bûye model û semboleke Kurdistanê. Ji ber ku li tu cihek din sîstemeke perwerdeyê ya bi Kurdî nehatiye dayîn, bi taybetî jî di nava gelên penaber û rewşên penaberiyê de. Nemaze di nava penaberî û bêderfetiyan de ev derfet bi alîkarêya tevgera me hatibûn bidestxistin.

Em di wê baweriyê de ne, wê hîn zêdetir pêş de biçe, dewlemend bibe û bigihe astek wisa ku tevayî gelê Kurd jê sudê bigire. Jixwe hûn dizanin, Rêber Apo dibêje; zarokên Mexmûrê zarokên min in. Pêwiste her kes li wan xwedî derbikeve û wan baş perwerde bikin. Navendên çand û hûnerê, lêkolînên zanist û ronakbîriyê ava bikin. Em weke mamosteyên Mexmûrê van amojgarêyên Rêber Apo ji bo xwe bingeh digrin û li ser vî bingehî xwendekaran perwerde dikin û pêşdixin. Em dikarin bêjin ku pergala me ya perwerdeyê hatiye rûnişkandin. Sê mamosteyên me yên ku me bi hev re van zorêyên jiyanî derbas kiribûn, em bi hev re kenîbûn û bi hev re girîbûn şehîd ketin. Her sê mamosteyan êşek gelek mezin û bi bandor li ser gel dan çêkirin. Mamoste Hemîd di sala 1996'an de di bin dîwarê xanî de ma û bi birîndarî hat rizgar kirin, lê dîsa jî wî piştî salekê ji ber birînên xwe yên kûr û kêmderfetiyan jiyana xwe jidest da. Mamosta Mihemed Repinî jî bi nexweşiya pençeşêrê ket, gelek caran çû nexweşxaneyê û hat, lê tu çareserî jê re nehat dîtin. Ew demek bû zewicîbû û bê zarok bû, jixwe du caran bi emeliyatê lingê wî qut kirin, lê dîsa çareserî jê re nehat dîtin û jiyana xwe ji dest da. Mamosta Nusret di bêhndana havînê de ji bo pêdiviyên malbatê pêk bîne çûbû ji derveyê wargehê kar dikir. Cihê ku lê kar dikirin, ji ber bi salan li ser şer çêbibû bermayên çekan di nava xakê de winda bibûn. Dema ku ew xakê dikolin, hema di vê navberê de fişekek ya tankê di nava destê wan de diteqe. Li cihê bûyerê bavê wî jiyana xwe ji dest dide. Mamoste Nusret jî bi giranî birîndar dibe û piştî çend rojan li nexweşxaneyê şehîd dikeve. Li pey xwe rewşeke gelekî giran dihêlin. Mamoste Nusret zewicîbû û bavê çend zarokan bû, lê ew hîna gelek ciwan bû. Bi rastî jî mirov nikare ked, êş, xebat û destkeftiyên hatin bi dest xistin bi çend demjimêran vebêje. Mirov dikare li ser van xebatan bi rojan baxive. Xweşî, nexweşî, bi hev re kar kirin, hevaltî, hezkirin, dilxweşî û hevkarêya wan rojên ku me bi hev re jiyan kirine,, em digihandin serkeftinê. Eger em îro hene, sedema wê ew taybetmendîne. Hevalên ku me bi kinahî navê wan anîn ser ziman, heryek ji wan kedkarê pêşxistina zanista civakî û pêşeroja gelê xwe bûn. Kesayetên dilpak û pêşketî, gelek girêdayî nirxên xwe yên welatparêziyê bûn. Gelo her carî belavbûn, xirabûna pergala perwerdeyê çi qasî zor û zehmet bû? Bi rastî çi qasî mirovan êş dikêşandin! Di heman demê de carek din sazûmankirina vê çi qasî ked û hewildan dixwestin! Jiyana penaberî û derûniya wê gelek zor bû,

perwerdekirina zarokên bê dayîk, bê bav yan jî bê Yezdan çi qas zor bû, ew qas jî bicoş bû. Ji tevayî pêdiviyên wan re bûyîna bersiv sebrek û kedek mezin dixwest. Cardin xizaniya malbatan gelek bandor li ser xwendekaran dikir. Gelek zarok ji bo alîkaryê bidin malbatê, heta êvarî ji bo hezar dînaran dixebitîn û ev rewş dibû sedema qûtbûna hindekan ya ji dibistanê."

## Kurik Dixwîne Digihîje Armanca Xwe

Dema li ser daxwaza heval Cûma ez çûm wargeha Mexmûrê ji bo xebatê derbasî saziya pîremêran bûm û bi qasî du mehan li wir mam. Di wê demê de ev serpêhatî hat bîra min. Rojekê li gundekê zilamek destê kurê xwe digire û dibe cem mela û dibêje; "melayê min, min kurê xwe aniye li cem we, wê bixwîne û tu jî wî fêrî hemû tiştî bikî ku miroveke zana ji kurê min derbikeve." Mela got; "ser seran û ser çavan, lê belê ez bi pere kar dikim." Bavê kurik jî got; "başe. Tu çend pere digirî?" Mela jî got; "ez salê sed dolaran digirim." Bavê kurik dîsa erêkir û got; "başe. Bila kurê min dazdeh salan li gel we ders bixwîne, ezê pereyên her dazdeh salan bidim we." Bi vî awayî mela û bavê kurik li hev dikin. Kurik jî gelek zana û jîre, di nava dazdeh salan de her tiştê ku tê xwestin fêr dibe. Rojekê diçe li beramberî melayê xwe disekine û dibêje; "Mamoste, eger destura te hebe ezê êdî biçim malê." Mela jî jêre dibêje; "kurê min, belkî tu niha li gel xwe dibêjî ez jîrim, zana me, her tiştî fêr bûme, lê belê zanistek maye ku tu fêr bibî, ew jî ilmê turmaye ye." Kurik jî dibêje; "Mamoste, ez wî ilmî naxwînim." Xatir ji mamosteyê xwe dixwaze û roja înê diçe malê, destê dayîk û bavê xwe maç dike. Bavê wî jê re dibêje; "kurê min, xwarina xwe bixwe rabe em biçin mizgeftê, îro îne." Kurik jî xwarina xwe dixwe, ew û bavê xwe bi hev re dikevin ser rêya mizgeftê. Diçin mizgeftê, hemû kes rûniştine. Mela jî dest bi axaftina xwe dike, behsa Yezdan dike. Kurik temaşe dike mela çi qas bi Erebî diaxive û rastiyê nayîne ziman. Kurik radibe ser xwe û dibêje; "Mamoste şaş diaxive." Mela jî got; "ev fesade hatiye nava me de, ger hûn lê nedin wê Yezdan ji we hesab bixwaze." Hemû bi hev re êrîşî kurik dikin. Dest û lingên wî dişkînin. Bavê kurik, kurê xwe radike û tîne malê, li ser rawşa teduristiya wî bi qederekê disekine, pak dibe û kurik dîsa radibe diçe serdana melayê xwe yê berê. Mela dibêje; "tu bi xêr hatî. Min digot tu careke din nayê vê derê." Kurik ji serî hetanî dawiyê mesele ji bo melayê xwe got. Paşê li gel melayê xwe du salên din jî dixwîne, vê carê her tiştî dizane. Dema dizivere malê, dîsa rojeke înê diçin mizgeftê. Mela dîsa bi Erebî diaxive, dîsa kurik li beramberî wî radibe. Kurik vê carê difikire; "ezê çawa gundiyan ji vê rewşê xilas bikim?" Fikrekê derdixe holê, diçe hemû gundiyan kom dike û ji bo wan dibêje; "gelê gundê me, guhdarî min bikin, ezê tiştekê ji we re bêjim. Hûn dizanin her

muyeke mela mifteya biheştê pê ve girêdayî ye, kî muyekê ji rûyê wî rake, mifteyeke biheştê qezenc dike." Gundî jî bawer dikin û diçin êrişî mela dikin. Mela di binê wan de difetise û ew qas hatibû rûçikandin, rû lê nemabû. Bi vî awayî kurik digihîje armanca xwe. Gundî jî ji wî melayî xilas dibin. Lê belê kurik bi zanîna xwendinê gihişt armanca xwe ku feraseta mela têkçû. Eger mirov ji ferasetên qirêj û qurnaziyan re nebin bersîv serkeftin zore. Ez hebim tunebim ferq nîne, êdî min ne dîkarî ji ber nezaniya xwe tiştekê bikim. Erdê zuha bi baranê şîn dibe, mejî bi xwendinê kar dike.

### Di Dawiyê De Min Biryara Xwe Da

Xewn û xiyala min ew bû ku di dibistanên Apoyî de bixwînim. Ew dibistanên ku li binê daran hatine avakirin û li kêleka wan de kaniyên avê diherikîn. Di vê pêvajoyê de heval Metîn berpirsê wargehê bû. Min jê xwest ku biçim çiyê û êdî nezivirim. Heval Metîn ev daxwaza min erê nekir. Li aliyê din didanên min jî gelek têşiyan û min gelek zorî dikişand. Ji ber vê nexweşiyê min carek din serî li heval Metîn da ku biçim doktor, ji bo vê jî min bişîne Mexmûra jêr, yan jî Hewlêrê. Heval Metîn got; "emê te bişînin Qendîlê." Min jî spasiya xwe jê re diyarkir. Ev ji bo min fersendek mezin bû. Jixwe min jî dixwest ji bo perwerdeyê biçim Qendîlê, li wê derê bixwînim û zana bibim. Raste, li vir jî hevalên ku bikaribin alîkarêya min bikin hene, lê daxwaza min çûyîna jor bû. Di vê navberê de Xalê Silêman ji Erdîşê hatibû serdana kurê xwe yê di nava rêxistinê de. Navê kurê wî Demhat e. Çû çiyê û kurê xwe Demhat dît. Pişt re heval Demhat ji bavê xwe re dibêje; "kurê xaleta min li Mexmûrê ye, ger biçî wir û wî bibînî, başe."

Hingê ez li saziya pîremêran bûm. Hevalên mêhvanxaneya wargehê banî min kirin û gotin; "mêhvanê te heye". Ez rabûm çûm mêhvanxaneyê û min lê nêrî ku xalê Silêman li wir e. Me silav da hev û min xêrhatina wî kir. Bi qasî du rojan li gel min ma û paşê çû. Çend roj derbasbûn û rojekê min mela Heyder dît. Got; "tu qet li gel malbata xwe diaxivî?" Min got; "nexêr." Wî jî wisa li min vegerand; "telefona min heye. Ger bixwazî, dikarî li gel malbata xwe biaxivî." Di wê demê de dema xalê Silêman diçe malê, serdana malbata min dike û ji hevsera min re dibêje; "min mela Nûrî dît. Hevalan mangeyek dayê û tiştek jê

kêm nîne.” Min bi telefona mela Heyder jê re telefon kir. Du sê caran bersîv neda. Paşê dema bersiv da, min jê re got; “Çima bersîva telefona xwe nadî, ma te ez nasnekirim?” Wê jî got; “belê min tu naskirî, lê min zanî tu ne PKK’yî yî. Hevalên te li serê çiyê di nava serma û seqemê de têdikoşin, tu jî xwe di mangê de dirêj dikî. Ma tu nikarî çayekê jî ji wan re çêbikî, yan avekê bidî wan?” Heta hevsera min Xanimê gotinên xwe xilas nekirin min gotinek nekir. Ev yek ji gotinên xalê Silêman jêder bibû. Dema xalê Silêman wan tiştan jê re dibêje pir hêrs bibû. Lewma di dawiya gotinên xwe yên di telefonê de got; “careke din telefonê ji min re veneke” û telefon di rûyê min de girt. Min, ev helwesta wê ya tund li ber çav re derbaskir û biryardarêya min a çûyîna çiyê xurtir bû.

Piştî demekê ez dîsa çûm gel heval Metîn. Çûyîna min a Qendîlê hatibû erêkirin û heval Metîn têbiniya min radestî min kir. Min jî têbiniya xwe girt û ketim ser rêya Qendîlê. Hevalan ez birim mêhvanxaneya Suredê. Wê demê heval Şahînê ji Rojavayê Kurdistanê berpirsê mêhvanxaneya Suredê bû. Ez çûm gel wî û min jê re got; “ez dixwazim biçim perwerdeyê.” Hevalan jî pêşniyara min pejirandin û ez şandim li gel heval Elî yê ku li mêhvanxaneyê kar dikir. Ez gelek keyfxweşbûm û min gelek ji xebata mêhvanxaneyê hez dikir. Ez fikirîm ku li mêhvanxaneyê wê her karek ji bo min hebe. Her çawa be ez her bikaribim çayek, yan avekê bidim mêhvanan. Di vê navberê de, min dixwest serdana heval Cûma bikim, lê bi cih hiştina saziya pîremêran a wargeha Mexmûrê ez ditirsandim û di min de dudiliyek cidî çêdikir. Carekê, dema ez li ber deriyê lojîstîkê rasewtiyabûm, min dît heval Cûma ji tirimpêlê peya bû. Ez çûm gel, min destê wî girt, mesela xwe jê re got û bexşandina xwe jê xwest. Heval Cûma jî got; “we kêmasî kiriye, lê karê xwe berdewam bikin.” Dema heval Cûma çû, keyfeke bêhempa ez girtim, min lotik avêtin û çûm ber deriyê mêhvanxaneyê. Hevalan gotin; “çima ev qas keyfxweşî?” Min jî got; “heval Cûma ez bexşandim. Ew gelek dil birehme.” Gelek heval dihatin û diçûn. Ji ber wê naskirina min bi hevalan re her diçû fireh dibû. Rêxistinê heval Elî şand perwerdeyê û li wê derê ez û heval Agirî man. Pişt re jî heval Sozdar û hinek hevalên din jî hatin gel me. Me bi hev re karên mêhvanxaneyê dida meşandin. Ji serê 2005’an heta dawiya 2007’an li wê derê mam. Ez gelek bi heval Birûsk û heval Demhat re hatim girêdan. Her wiha nasîbûn û danûstandina min bi gelek hevalên cuda re jî çêbûn.

Wê demê heval Rustem Cudî berpirsê qadê bû. Dema dihat gel me gelek şad û dilxweş dibûm. Lê birastî jî di çavê min de hemû heval weke hev bûn. Tenê ya ku min xwest, bûyîna şayanê Rêber Apo, şehîdên şoreşê û têkoşerên azadiyê bû.

Piştî demekê nexweşiya şekir li min peyda bû. Her weke ku kalbûn û nexweşiyên din nebes bûn, ev jî bû serbarê hemûyan. Roj bi roj vê nexweşiyê bandorêya xwe li ser min zêdetir dikir. Ez gelek têşiyam û gelek bêrewşbûm. Lê belê dîsa jî min xwe li ser lingan digirt. Ji ber ku min heroj bidehan heval didîtin. Ev ji bo min dibû derman. Ez ditirsiyam ku bi vê nexweşiya xwe biçim ber dilovaniya Yezdan. Min digot; "pêwîste ev nexweşî bandorê li min neke." Heval Rustem Cudî dihat û diçû. Min dixwest daxwaza xwe pê re parvebikim û li ser rewşa xwe ya nexweşiyê destur jê bigirim û biçim Kortekê. Di hundirê xwe de wiha difikirîm, "eger ez biçim gel heval Demhatê Wanî û Birûskê ji Rojavayê Kurdistanê, ezê baş bibim. Ezê nexweşiya xwe derbas bikim." Rojekê min ji heval Rustem Cudî re got; "Eger destura we hebe ez dixwazim biçim Kortekê." Heval jî bi erênî bersîv da. Di wan rojan de heval Bîrûsk hat Suredê li gel me. Dema ku min heval dît, hemû jan û êşa min li ber bayê çûn, daxwaza min ji çûyîna Kortekê re ew qas hebû. Min û heval Birûsk hinek gotubêj kir û min jêre got; "ezê bêm gel we, min destur ji heval Rustem xwestiye." Heval Birûsk got; "ser seran û ser çavan." Min xwe amade kiribû û min cil û bergên xwe û çeka xwe danîn nava tirimpêlê û em bi rê ketin. Em ketin ser rêya Kortekê. Em li girekê rawestiyan. Ji ber ku rêya tirimpêlê bi dawî bû, ji wir û şûn de em bi lingan meşiyan. Heval Demhat li wir bû û berpirsê karên piratîkî bû. Dema heval Demhat em dîtin bilêvkenî nêzbû, xêrhatin me kir. Min ji Kortekê pir hezdikir. Darîstanên Kortekê bi destê rejîma Sedam Huseyîn hatibûn şewitandin. Ji ber ku Kortek dermanê nexweşiya min bû, min jê re di got; "Girê Xwedê." Hevalan herdem digotin, "emê te bişînin nexweşxaneyê", lê belê min erê nedikir. Eger min gotiba belê, wê demê ezê ji Kortekê biçûma û ezê ji gel wan hevalên ku min ew qesî jê hezdikir dûrketibama. Dûrketina ji hevalan min erê nedikir. Min dixwest ku heval min bibin nexweşxaneya rêxistinê, li gel doktor Mazlûm û Orhan. Ez ji wan piştrast bûm ku wê min ji nexweşiyê xilas bikin.

Ji ber ku manga lê dimam ji hemû cureyên xwarinê tejî bû, hevalan digotin; "dikana mam Hecî." Bi rastî jî ji ber nexwşiyê hevalan her tişt ji

min re tanîn û tiştek ji min kêm nedikirin. Her hevalê ku ji cihekê bihata tiştek ji min re tanî. Ji ber wê yekê li derdora cihê min tejî tiştên xwarinê bibûn. Ji goşt bigre heta fêkî û tiştên din yên xwarinê ji min re dihatin kirîn, lê min nedikarî bixwim. Her ku diçû nexweşiya min giran dibû û hestiyên min diheliyan. Ez gelek diêşiyam û jana canê min weke kirasekê xwe li ber min kiribû. Xwîn poz û devê min diherikî. Min nedixwest heval pê bihesin. Lê her çi qas min vedişart jî dîsa diyar dibû. Tenê daxwaza min ew bû ku ji hevalan dûr nekevim. Lê carekê ez ketim di rewşek pir xirab de. Hêdî hêdî li ser dest û çokan ji mangê derketim û çûm ber tirimpêlê. Heval Birûsk di nava tirampêlê de razayîbû, min destê xwe dirêjî beteniya wî kir û li ser rakir. Heval Birûsk ji nişka ve ji xew şiyarbû, temaşe kir ezim û got; "Mam Hecî çi bûye.?" Min bi îşaretan xwîna ku ji dev û pozê min hatîbû nişan da. Bi awayeke lez rabû ez xistim tirempêlê û çû ji heval Demhat re got; "ezê mam Hecî bibim nexweşxaneyê, rewşa wî nebaşe xebera te jê hebe." Em çûn nexweşxaneyê. Heval Mazlûm li wê derê bû, serûmek li min da, hêdî hêdî zimanê min vebû û ez hatim ser hişê xwe. Min gazî heval Birûsk kir; "were min bibe, em biçin tepeyê Yezdan. Min bibe manga min." Heval Brûsk dîsa min li tirimpêlê siwar kir û em ji nexweşxaneyê zivirîn û hatin cihê xwe. Ji bo ku gêwilê min bilind bike û keyfa min xweş bike, heval Birûsk bi min re henek dikir û bîranînên xwe ji bo min digotin. Di rûyê min de nexweşî hebû û êşa wê nexweşiyê nedihêla ji rûyê min ken derbikeve. Carekê bi henek ji devê heval Birûsk derket û got; "ezê vê çîroka nexweşiya te binivîsim. Bi deveke ken min jê pirs kir; "bi rastî tu wê binivîsî?" Di dilê min de derbas bû, xweziya yekê çîroka min binivîsandiba. Min bi dengeke bilind ji heval Birûsk re got; "xweziya yekê çîroka min binivîsandiba." Dema ku heval Birûsk li min temaşekir bi keyfxweşî ji min re got; "ger tu cidîbî, tu dikarî ji bo hevalan pêşniyar bikî." Em gihiştin cihê xwe. Heval Demhat neçûbû ser kar, dema ku dît em hatin, hat gel me, xêrhatina me kir û got; "mam Hecî rawşa te çawaye?" Min got; "ji bo we hemûyan sipas dikim, niha başim."

Piştî çend roj derbas bûn heval Mizgîn Amed û Sozdar Awesta hatin gel me. Min daxwaz ji wan kir ku hevalek çîroka min binivîse. Herdu hevalan jî gotin; "fikreke gelek başe. Belê emê di navbera xwe de binirxînin û di demeke kurt de bersivekê ji bo te bişînin." Nexweşiya min nedizanî rawestan çiye. Êdî min nedikarî tiştekê bikim. Karên ku min jê

hez dikir, êdî min nedikari pêkbînim û ketim. Rewş gelek xirab bû, min dilê hevalan diêşand û min bi wan re xwe aciz dikir. Carna min bêrêzi jî dikir. Ez ji her tiştî hêrs dibûm, keyfa min li tiştekê nedihat. Lê belê, heval Birûsk û heval Demhat dîsa jî weke bavekê, weke bapîrekê, weke hevaleke xwe nêzîkatî li min dikirin. Tu carî nedihêlan tenê bimînim. Ji ber ku hişê min ji serê min diçû. Êdî bijîşkên partiyê heval Orhan û heval Mazlûm nedikarîn tişteke cudatir ji bo min bikin. Paşê hevalan ez teslîmê heval Necîbê ji Ozalpa Wanê kirim ku min rêkin Kerkûk yan Hewlêrê. Her ku diçû xwîna min kêm dibû. Êdî ji gewrêya min kêm xwîn dihat. Heval jî ketin tevgerê. Birastî jî gelek hewildan kirin ku ez baş bibim. Ji bo vê qet ji mesrefê nedireviyan. Lê belê tu encameke baş dernediket. Bi berdewamî serî li bijîşkên nexweşxaneyê didan û ji wan dixwestin ku min ji nexweşiyê xilas bikin.

Di vê navberê de gelek roj derbas bûn. Hevalan ji bo nivîsandina çîroka min bersîva min nedabûn. Pişt re têbîniyeke hevalan gihişt destê min. Min naveroka wê xwend ku di nava xwe de nirxandin kirine û gihiştine wê encamê ku wê çîroka min bidin nivîsandin. Ew hevala ku wê binivîse jî, heval Deniz bû. Ev heval ji Başûrê Rojavayê Kurdistanê bû. Piştî çend rojan heval Denîz hat gel min û me li ser mijarê cure kir. Heval Denîz wisa ji min re got; "hevalan ji bo nivîsandina çîroka te, ez erkdar kirim. Ev kar wê ji bo min jî bi sûd be." Me bi hev re cihê vê xebatê cure kir û em gihiştin wê encamê ku em li gel heval Ronahî Serhed bixebitin. Heval Nilufer jî li wir bû. Ez neşaş bim, heval Nilufer ji bajarê Qersê bû. Heval Zekî Batmanî, Xebatê ji Başûrê mezin jî li wir bûn û ew jî wê tevlî xebata nivîsandina çîroka min bibana. Cihê wan fireh bû, lewma ji bo xebata me vehês û guncav bû. Lê belê ez bi xwe nebawer bûm, dîsa jî tevlî nêrîna hevalan bûm. Nexweşiya şekirê jî li ser rewşa min çewisandin dikir. Li aliyê din jî min zêde nedixwest ji cihê xwe yê li Kortekê dûr bikevim. Hezkirina hevalên li wir ez dixistim bin bandora xwe. Ez difikirîm ka ezê çawa wan bihêlim û biçim. Lê ev rastî jî hebû, ez nexweş bûm. Rewşa min di nava toz û dumanê de winda bibû. Ew Korteka ku ew qas min jê hez dikir, navê wê di dilê min de ew qas şîrîn bû, min nedikarî jê qut bibim. Di çavên min de girê Xwedê, danûstandina bi hevalan re xwe didan der. Pir teng bibûm. Sedemê vê yekê jî nexweşiya min bû. Lê tevî van jî, hevalan qet bêzarî nîşanî min nedikirin û rûyê xwe li min tal nedikirin.

Me bi heval Denîz re biryar da ku em biçin cihê komîteya siyasî û li wir çîroka min binivîsin. Dîsa bêbawerî di hundirê min de çêdibû û bi xwe nebawerbûm ku li wir jî bimînim. Lê belê dîsa jî tevlî nêrîna heval Denîz bûm. Piştî çend rojan me bernamesaziya xwe ya nivîsandina çîrokê danî û me ji bo desturê serlêdan ji komîteya siyasî re kir. Her wiha me sedemê hatina vê derê jî ji heval Ronahî re rave kir. Heval Xebatê ji Başûrê Kurdistanê pirsî û got; “çima hûn ji bo vê xebatê hatine komîteya siyasî?” Min jî got; “ez nexweşim û nikarim di nava gengeşeyê de bimînim. Ev der ji bo min guncawtir bû.” Li ser van axaftinan hevalan mijar girtin dest û bi erênî pêşwazî kirin. Ew çend rojbûn me li wir dest bi xebata xwe kiribû. Demek dirêj bû min xwe neşuşti bû û min dixwest ser û cilên xwe bişum. Ji berêya biçim serşuştinê, çûm aşxaneyê û bi qederekê li wê derê rawestiyam. Li wir sê hevalên jin hebûn; yek ji wan Sozdar Gever bû, hevalên din jî Ronahiya ji Mexmûrê û Hêvî ya  Mêrdînî bû. Min silav da wan hevalan. Wan jî ji min pirskirin; “heval Hecî tu çima ew qas westiyayî diyar dikî?” Min bersiva wan da û got, “ez ne westiyame.” Ez wê demê gelek têşiyam, êşa canê min ez westiyayî didam diyarkirin. Dema ku wan hevalan pirseke bi vî awayî kirin, gelek bêçare bûm û min gelek fedîkir. Hevalan rewşa min ferqkirin ku gelek nexweşim. Ji min re gotin, “bila hevaleke xort bi were bê, ji bo ku alîkarêya we bike.” Min got “na, ji bo nêzîkatiyên we sipas dikim.” Ez ji wê derê çûm cihê serşûyê. Min nekarî xwe li ser piyan bigirim. Dema gihiştim cihê serşûyê, bi xwe ve çûbûm. Pişt re şiyarbûm, hatim ser hemdê xwe, rabûm û hêdî hêdî berbi aşxaneyê ve hatim. Hevala Sozdara Geverî ji min pirskir; “ma çi ji te hat, ev çend demjimêrin tu çûyî?” Min bersiv da û got; “nizanim çi li min hatiye.” Heval Hêlîn Mêrdîn gazî heval Birûsk kir da ku tirimpêlê bîne û min rake nexweşxaneyê. Li cihê serşûyê ji piyan li ser dev û lêvên xwe li erdê ketibûm, hemû cilên min bibûn xwîn. Min xwe êdî gelek bêçare û weke barekê bêsûd didît. Ji ber ku min hevalan bi xwe ve mijûldikirin. Lê vê carê gelekê nexweşbûm, êdî cîhan li ber çavê min tarî bibû û min digot; “vê carê dawiya jiyana min e.” Min têbîniyek ji heval Cûma re şand û min di vê têbîniyê de ev tişt nivîsandin.

“Mamosteyê min, evîna dilê min, ez pir nexweşim. Ez ji mirinê natirsim. Di vê cîhanê de tirsa min ewe ku ez we nebînim û ji vê cîhanê biçim. Dixwazim hûn destur bidin ku serdana we bikim. Ez bi awayeke

germ ji dil û can silav û rêzên xwe ji we re dişînim û bi van malikan hestên xwe ji bo we tînim ziman."

**Ew e Bijîşkê Min**

Herê çiya tu bi evîna Rêber Apo re ronî dibî
Ma qet li min meyze nakî hevalan himbêz dikî
Carek li min diyarnabe, ji evîna kê ye nasekinî
Da bizanim tu vê eşqê ji kê re dixwînî û diyar dikî
Hêza we qet nasekine, pê re bêhna mîskê dibarînî
Baz, tu difirî hilgire nameyê bide evindarê dilan
Sond bixwe bi hezkirina evînê, hilgire dilê feqîran
Bi xwîna şehîdan sond dixwim agirê dilê min
Nexweşim reng li min nemaye, ew e bijişkê min
Daristana merdan dûr ketim ji birêz ne bidilê min
Kesê xeber neda, ew sorgul û sumbula dilê min
Bihar hat li Kurdan, roj derketiye li cîhana min
Şînkirî gul, sosin û rihane rêheval Rêberê min

Têbiniya min ji aliyê heval Şiyar Zaxo ve hatibû rêkirin. Di vê navberê de hevalê Denîz li ser navê me têbîniyek nivîsandibû ku em biçin Xaxurkê serdana heval Derwêş, Siwar û Bawerî. Hevalê Denîz têbîniya me da heval Demhat ku berpirsyarê karê piratîkî bû. Roja çûyînê hat, em ji bo serdana heval Derwêş, Siwar û Bawerê Sehedê (ji ber ku li Serhedê mabû) çûn Xarkurkê. Dema wan hevalan em dîtin gelek keyfxweşbûn. Em jî bi dîtina wan hevalan keyfxweşbûn. Cihê ku heval lê disekinîn hemû şînahîbûn û xwezayê xemla xwe weke zincîrekê li derdora Xarkurkê biribû û dorpêç kiribû. Hemû darên fêkiyan lê hebûn, rengên gul û kulîlkan şîn bibûn. Dema ku mirov nefes hildida, tenê bêhna sosin û beybûnan dihat. Şekîf, Karker û Evdilkofî xwe nîşanî me didan. Ew çiya hêlîna bazan bûn û her wek e ku ji me re digotin; "temaşeyî me bikin, em jî azadin û biserfirazî jiyan dikin."

Herêmên Xakurkê gelek kûr û berfirehbûn. Dolên wê gelek kûr û mezin in. Xaka Xarkurkê bi keç û xortên girîla hatibû xemiladin û şervanên Apoyî bûn ku di nav de dimeşiyan. Tenê wan dikarî di nava wê xwezayê de bimeşin û tevger bikin. Xwezayê tenê rê dida şervanên

azadiyê li ser xweşikbûna wê bimeşin. Dema ku Îskenderê Makedonî hatiye çiyayê Medyayê, nekarîbûye xwe li hemberî ba û bahoza çiyayên Zagrosê, Zap û Kelha Memê bigire. Ji ber ku xwezaya asê rê nade hildiweşin, paşde dizivirin û diçin Şamê.

Min nedikarî di rê de bimeşim. Du hêstirên hevalan li gel me bûn. Li yekê siwarbibûm ku navê wî Ereb bû. Em bi qederê sê demjimêran meşiyan û gihiştin biryargeha partiyê. Bi rastî jî mirov ji newalên wê ditirsiya, ewqas kûr û mezinbûn. Cihê mêvanxaneyê li binê dareke guzê hatibû çêkirin, dara guzê xwe bi ser mêvanxaneyê de tewandibû. Aşxaneya wan jî li wê derê hatibû çêkirin. Li binê darê sifreya xwarinê ji berê de hatibû çêkirin û li ser mêzê guldankên gulan hatibûn bicihkirin. Cihê rûniştina mêhvanan ji beran hatibû çêkirin û bi hemû rengên beran hatibûn neqişandin. Mêwa tiriyê, tureyên xwe avêtibûn ser dara guzê û wûşiyên tirî xwe berdabûn ser mêza xwarinê. Mirov dikarî ji erdê destê xwe bavêje wûşiyê tirî û jê bike. Tama tirêyê wê derê jî gelek xweş bû. Kulîlkan serê xwe rakiribûn û berê xwe dabûn rojê û bêhna xwe li derdoran belavdikirin. Berpirsyarên biryargehê haval Derwêş, Siwar û haval Bawer bûn. Birastî jî gelek rêzdarî û keyfxweşî nîşanî me dan. Hemû jî xwediyê lêhûrbûnek kûr ya bîrdozî û felsefeya Rêber Apo bûn. Xwesteka wan tevan aşitî û biratiya gelan bû. Ez û heval Denîz çend rojan li wê derê man, pişt re me destur ji berpirsyarê mêvanxaneyê heval Feysel ê ji Rojavayê Kursdistanê xwest ku em biçin. Wan hevalan ji mêhvanperweriyê pir hezdikirin. Min gelek ji vê derê hezkiribû, lê pêwîstbû ku em ji vê derê biçin. Her cihê ku ez diçûmê min komek heval didîtin, min nedixwest ji wê derê qut bibim. Weke ew zarokên ku her şekira dibînin ji diya xwe re dibêjin; "ji bo me bînin" lêhatibûm. Min jî her hevalên ku bidîta dixwest li gel wan bimînim. Lê belê em neçarbûn ku bikevin ser rê. Me xatirê xwe ji heval Derwêş, Siwar, Bawer, Feysel û hemû hevalên din xwest û em ketin ser rêya Lolanê. Em hatin cihê rêveberêya piratîkî. Hevalek bi navê Pelşîn ji Bakurê Kurdistanê hatibû wê derê. Ji min re got; "were manga me." Min jê re got; "ez cihê we nasnakim." Ji min re got; "cihê me çapemeniye, mamosteyê te heval MustafaKarasû jî li wê derê ye, tuyê wî bibînî." Min êdî gelek tişt ji bîr dikir. Lewma li heval Pelşîn zivirîm û min got; "ez hatime serdana heval Cûma." Dîsa heval Pelşîn li min vegerand; "ka were, tê her duyan jî bibînî." Di wê kêliyê de rojên ku me li dibistana Mazlûm Dogan

derbaskirin hatin bîra min. Perwerdeya ku heval MustafaKarasû dabû li ber çavên min re derbas dibû.

Ji bo biçim çapemeniyê, min daxwaza xwe ji Karkerê Tilorî(niha reviya ye, çûye îxanetê) re anî ziman û min tikaya alîkariyê jê kir. Karker jî got; "temam heval, madem tu wisa dixwazî, emê daxwaza te pêkbînin." Paşê wî gazî Aslanê(reviyaye çûye îxanetê) ajovanê tirimpêlê kir û jê re got; "heval Hecî bibe cihê ku dixwaze." Bi vî awayî Aslan hat ji cihê lê dimam ez hilgirtim û em çûn cihê çapemeniyê. Dema em gihiştin wê derê, heval Şiyar Zaxo hat pêşiya me û ji min re got; "tu dizanî mamosteyên te li vê derê disekinin?" Ez bi vê gotina wî gelek keyfxweş bûm. Min xiyal nedikir ku carek din herdu mamosteyan bibînim. Em çûn rûniştin, me bêhna xwe vekir û me xwarinek xwar. Êdî min xwe amede kir ku biçim serdana mamostayên xwe. Şansê min hebû, felekê cejnek ji bo min afirand, heval Cûma jî li wê derê bû. Ez çûm li gel wan herdu birêzan, lê belê dîsa laşê min hemû sekinî, zimanê min tevizî, min nedikarî axaftinekê tenê jî bikim. Min pêşniyareke xwe ji bo heval Cûma anî ziman û min got; "ez dixwazim biçim gel heval Fermanê Sasonê." Heval Cûma got; "tu nexweşî. Niha biçî nexweşxaneyê baştire. Pişt re tu dikarî bê Lolanê jî." Dîsa heval Cûma bi hestewarêya xwe ez keyfxweş kirim. Birastî jî nexweşiyê ez gelek bê rewş kiribûm. Her ku diçû mirinê xwe nîşanî min dida. Bi qasî sê çar rojan li wê derê mam. Pişt re vegeriyam cihê xwe, Kortekê. Paşê çûm cihê koma ferasetî, min li wê derê hevala Deniz dît û min jê re got; "min bibexşîne, ji ber ku nexweşiyê ez gelekî bê rewş kirime, nikarim çîroka xwe ji te re vebêjim. Ezê biçim Mexmûrê." Heval Deniz got; "madem tu wisa dibêjî, ser seran û ser çavan biçî." Min xatirê xwe ji heval Ronahî, Nilûfer, Zekî û Xebat xwest û hatim Kortekê li gel heval Birûsk. Heval Demhat ne li wir bû. Heval Birûsk rewşa min pirsî. Min got; "başe gelek sipas, dema we dibînim baştir dibim." Heval Birûsk got, "emê te rêkin nexweşxaneyê." Min heval Demhat nedît, lewma min hest û hizrên xwe ji heval Demhat re bi vî awayî nivîsandin û li şûna xwe hêla. Ger hat wê bibîne û bixwîne.

**Silav Li Şoreşgeran**

Ketim ser rêya we, da bibînim bejn û bal û rûyê we
Zarîn û qêrîn ji min dihat, meşiyam bo dîtina we

Pir nazik û delale, şeng û şepale, finde lale û çiraye
Rojeke xweşik, pîroz derbas dibû mam benda te

Name gihişt heval hêvî bibînim dîsa li hêviya te
Ez pêhesiyam hatina te, dimeşim werim pêşiya te

Rabûm linga, piyan min girt dar gopal bi dîtina te
Min nêrî hatiye heval Birûsk, tu bixêr hatî ser çavane

Ka birêz li ku man, ma li vir nîne li deverek dûr maye
Min kişand axîn keseran ku bihatiba rojeke cejnane

Liviyam bi êşa nalînan neşandiye bo min silavên germe
Ez bi hatibam dîtina we, dûre nikarim bi meşim kale
Rêheval pîremêreke kale, heyf mixabin nikare û jare
Çima we wisa kir ne bilbilim mala min kêleka şalûlane
Min bidîta bijîşk wê derman bikira kêmaya kale
Bêhna we dihat ji dûr ve wek bêhna rihanan û gulane
Min kemer girêda bi destan, nêrî deşt û zozan û newale
Tejî bûn keç û xortên ciwan, silav dikim li şoreşgeran

## Li Kortekê Sekinîn

Xweşiya dema min derbaskirî dihat bîra min. Dema ku min heval didîtin, li ber saziya ewlekariyê re diçûn û dihatin û didan wî evraziyê Kortekê, ez sermest dibûm. Çûn û hatina hevalan a kom bi kom, danûstandina bi hevalan re ku ew şagirtên Rêber Apo bûn, coş û keyfxweşiyek mezin li derdor dibarandin. Pêşwazîkirina wan, kenê li ser lêvên wan û henekên wan dibûn diyarî ji bo min. Ji bo wan karkirin, ji Heca Laleşa nûrani pîroztir bû. Nan xwarin û çay vexwarina bi wan re, hest û awazek wisa bû ku nayê bilêvkirin. Xweşiya li gel hevalan û bîraninên hevalan tu caran nayên jibîrkirin. Ew hevalên weke ferîşteyan, çavê wan yên reng bi reng, ji bo welatê xwe kar dikirin û canê xwe feda dikirin. Ne tenê ez, tu kes wan jibîrnake. Axiftinên li gel wan qet nayên jibîrkirin. Hemû bi evîna şehîdan û Rêber Apo dikeliyan. Fedekarêya wan hevalan, weke xewn û xiyalan di mêjiyê min de diman. Di exlaqê xwe de, di çûyîn û hatina xwe de weke ferişteyan bûn û bikeyfxweşî ji bo gelên bindest û mazlûm kar dikirin, têkoşîn dimeşandin û bi van nêzîkatiyên xwe hezkirin diafirandin. Jiyankirina bi şoreşgerên Apoyî re bi serê xwe şanaziyeke ji bo mirov. Girê Kortekê bibû bîryargeha serdana hevalan. Rastî wisa bû, Kortek deriyê pêşwazîkirina hevalan bû. Deriyê Qendilê bû û pir sitratejîk bû. Ji ber ku jora Kortekê bibû cihê hizirandin û biryardayîna hevalan, mîna cihek pîroz bû. Ez jî li vê derê dimam û bawer nakim ku kesekê weke min serdana hevalan kiribe. Lê hîna jî dilê min jê têr tunebûye û rehet tunebûye. Felekê bextê min yê xweş veguherand bexteke reş. Felekê dabû min bi destê xwe yê rastê, lê bidestê çepê lêda û ji min sitand ew xweşî. Ka werin wan xweşiyan bihêlin di cih de û jê dûr bikevin. Gelek li zora min diçû. Sala 2007'an bextê min yê xweş zivirand nexweşiyê û wek bahoza zivistanê ez cemidandim. Nexweşiya şekirê êş, elem, keser, kul û hesret ji min re anîbûn, dest û lingên min girêdabûn. Nexweşiyê lewaziyek bi min re dabû çêkirin û bi mirinê re rû bi rû hiştibûm. Ji ber vê sedemê, mayîna min ya li Qendîlê nehatibû pejirandin. Dilê vê nexweşiyê rehet tunebû, hê jî nebesbû û holkirim heta wergeha Mexmûrê. Ger dest û lingên min daba girêdan, bavêtîma binê dareke ji darên Qendilê, wê j imin re xweştirbûya. Ji ber Qendîl biheşta Kurdistanê bû, lê vê girêdana min nesekinî, erê nekir û avêtim heta wergeha Mexmûrê. Ji hevalan dûr

ketin ji bo min mirin bû. Daxwaza min ya çûyîna li gel hevalan û mayîna min jî li gel wan jiyanek nû dida min. Ji ber sedema nexweşiyê şandina min a Mexmûrê li zora min diçû. Lê belê vê yekê rastiya min dida nîşankirin ku nexweşim û naçarim. Heval Demhat dixwest ez biçim û nexweşiya xwe tedawî bikim. Lewma heval Demhat vê nêrîna xwe bi rêxistinê re parvekir û rêxistinê jî erêkir. Bi çend roj şûn de tirimpêla heval Birûsk amade bû, ez lê siwarkirim û berê min dan wargeha Mexmûrê.

Birastî ev hat bîra min. Gotinek ya Kurdan heye û dibêje; “dema mirî dimire, ruhê wî bi gundiyan re dimeşe. Mirî nizane ew bixweye. Gundî dibêjinê, were xwe di vir de direj bike ji bo em bizanin gor tenge yan firehe. Dema ew kesê mirî xwe di gorê de dirêj dike, gundî beran datînin ser sînga wî û ew nû bi xwe dihese ku mirî ew bixwe ye. Dema gundî wî vedişêrin, radibin û diçin malên xwe. Mirî jî dixwaze rabe, lê serê wî li ber dikeve, bixwe dihese û dibêje; ay ez mirîme!” Dema ez jî derketim ne di vê ferqê de bûm. Heta serê min li ber ket, êdî min zanî ku ez birastî vê carê ji hevalan dûr ketim. Birastî ji mamoseteyan û hevalên çiyê dûr ketim. Lewma, di wan kêliyan de ji ber hezkirin û girêdana min a bi heval Cûma re ev malik ji hestên min herikîn:

**Dûrketim**

Heyrana wan bax û bostanan, gul şînkirin bi rengan
Bûne stêrka li esman, ronahî dan gund û bajaran

Dema bêhna yarê dihat, dil ji evînê bûne agirê pêtan
Bayê bakur di berbangê de lêda, sosin û nêrgizan reng dan

Şikandin çerxa vê felekê, çep dizivirî û rast zivirandin
Dûrketim ji xem û xiyalan, yeqîn şewitîm bi dojehan

Bawer kirin biyeqîn, gul binefşan bêhn diherikandin
Nexweşê sumbulan, dîtina yaran dermanê nexwaşan

Nema ronahî di çavan de, bûm cihê lome gazinan
Da bibînim zilf û xalan ku bi rengan rehmet bike jaran

Agirê dilê min rakirin, hesret û keder li min kûr kirin
Ez gerêyam devên derêyan, bi dîtina hevalan hogiran

Min gelek bihar dîtin çûn û hatin, negihiştim yaran
Ne bilbilim qêrîn zarîn dikim, dengê min negihişt yaran

Ronahî dan erd û esman, şemala mamoste geşa dilan
Nêçîrvanê rastiyan, koşka we li çiyayên Zagros, Qendilan

Bisk yaqût zimrûtin, ji zilfan difirêya embera Kurdan
Jiyan birêz ya Tacdîn, Memê şemal yarê hîva çardehan

Dev şîrîn peyv şîrîn, evîna dilan şoreşgerên Apoyan
Ewê dibêje Heciye, bexşandina xwe dixwaze bidil û can

Dema min zanî ku ez diçim wergeha Mexmûrê, min zanî ku êdi ji çiyayan dûr dikevim. Ne ku ji wergehê bêzarêya min hebû. Tu car û bi tu awayî bêzarî yan nehezkirineke min ji gelê wargehê re çêtunebûye, çênabe jî. Jixwe mijar ne eve jî. Tişta dixwazim rave bikim ewe ku, germahiya zêde bi kêrî nexweşiya min a şekir nedihat. Ji ber ku germahiya zêde dijberî vê nexweşiyê ye û nexweşiyê gur dike. Vê nexweşiyê ew qas zorî li min dikir, deriyê jiyanê li min dida girtin. Lê deriyê çiyayan yê ku heval Cûma ji min re vekirî hiştibû, dilê min germ kiribû.

Heval Birûsk ji min re got; "heval Hecî tu çima digirî?" Min got; "ma eger ez îro negrîm ezê kengê bigirîm?" Paşê heval Birûsk ez anîm wergeha Mexmûrê. Wê demê heval Rohat rêveberê wargehê bû û min serdana wî kir. Min li wir ji heval Rohat daxwaz kir ku biçim saziya ewlekariyê. Dema heval Rohat ji rêveberêya saziya ewlekariyê re daxwaza min ragihand, wan jî mijarê girtin dest, nirxandin û bi erênî pêşwazî kirin. Ez jî rabûm û çûm gel hevalên ewlekariyê. Min li wir hem karê xwe dikir hem jî tedawiya xwe didît. Di rêveberêya saziyê de heval Akîfê Wanî û ji gel jî Fadîle Mijînî û Şahînê Gabarî hebûn. Bi rastî jî wan hevalan pir baş û jidil karê xwe dimeşandin. Her wiha hevalên din yên saziyê tev jî hema bêje tevahiya rojê di xizmeta gelê xwe de bûn. Min li

wê derê dest bi çîroka xwe kir. Lê belê min ne dikarî vegotina wê bi awayeke baş bidim herikandin, lewma min hewara xwe digihand heval Cûma û heval MustafaKarasû. Li aliyê din, nexweşiyê canê min derdixist. Ji ber wê yekê ez çûm gel hevalên rêveberêya wargehê, min heval Rohat dît û jê re got; “havîna vê derê pir germe û ez pir zêde zorî dikişînim. Her wiha ev germahî bi kêrî nexweşiya min jî nayê. Nexweşî û germahî di bin yek û mirov dikuje. Birastî ez ji mirinê natirsim, ji felçbûnê ditirsim. Ger di vî temenê xwe de felç bibim, ezê çi bikim?” Heval Rohat jî wisa bersiva min da; “heval Hecî, tu nexweşî, divê tedawiyê bibînî, lewma nabe ku bi vê rewşa xwe ve biçî çiyê.” Piştî van gotinên heval, min li bîra wî anî ku heval Cûma gotibû; “tu dikarî biçî gel heval Ferman û li wir bimînî.” Heval Rohat jî hinek fikirî û got; “hinekê sebir bike. Niha zûye, ezê pişt re te bişînim.” Dema ev gotin ji devê heval Rohat derketin gelek şa bûm. Paşê jî, ji bo derdê xwe û gilî û gazindên xwe bi heval Cûma re parve bikim, min têbîniyek jê re nivîsand û şand.

## Ji Bo Heval Cûma

Birastî jî ez nizanim ezê çawa nêrînên xwe bênim ser ziman. Ez nizanim ezê çawa bi pênûsa xwe hest û dilsoziya xwe birêjim ser kaxezê. Xwesteka min ewe ku hûn desturê bidin min ez gilî û gazinên xwe bi we re parve bikim. Ji ber ku min gelek bêrêya we kiriye. Dema ku ez hatibûm ji bo serdana we, di vê serdanê de min ji we daxwaziyek kir ku li cem heval Ferman bimînim û we jî daxwaza min erê kiribû. Hê li gel we bûm, gelek diêşiyam, bijîşkê me yê nexweşxaneyê ji bo tedawiya xwe bibînim ez şandim Mexmûrê. Li wir derfetek baş ji bo min hat dayîn û ez bi awayeke rêkûpêk hatim derman kirin.

Dîsa, ez dixwazim bi kurtî be jî hatina xwe binivîsim. Dema cara yekem hatim gel we, min biryara tevlîbûna nava rêxistinê da. Paşê çûyîna min a dibistana Mazlûm Dogan çêbû, piştî wê jî derbasî wargeha Mexmûrê bûm. Di van deman de çi hevalên ku min didîtin bi min re dibûn alîkar. Lewma, ez dixwazim van serpêhatî û bîranînên xwe bidim nivîsandin û bikim pirtûk. Ji bo vê xebatê jî ez dixwazim hûn desturê bidin min û di aliyê afirandina derfetan de ji min re bibin alîkar. Jixwe heta dawiyê bi merhameta we jî bawerim. Temenê min jî hêdi hêdi ber bi werza payîzê ve diçe. Xalên reş yên li ser rûyê min û destê min çêbûne nîşanên vê yekê ne û ez jî mîna bav û kalan ber bi mirinê ve gav davêjim. Lê dema ev pirtûk bê nivîsandin jî dixwazim hinekê xweş be. Ger ji bîra we neçûbe, wê heval Denîz pirtûka min binivîsandiba. Lê ji ber ku nexweşî ser ji min stand, min ev xebat da rawestandin.

Rêheval Cûma, hestên we gelek bedew û xweşik bûn. Lewma ez jî helbestekê li ser Rêber Apo, dayîka Uveyş û herdu mamosteyên xwe dinivîsim û arasteyî we dikim. Ji ber ku wan jiyana min ya nexweş vegerandin jiyaneke xweş.

## Rêberê Min, Taca Serê Min

Amara hûn pir şirînin, hem hêjayî û delalî
Çarê Nîsanê roja me, deng da gula Kurdanî

Rondik barandin ji keyfan, şad kir dilê karkeran
We zanist da koman, li we civiyan xortên gelan

Govend girtin jin û mêran, werin govenda şêran
Gul şînbû li Amara, gazî kirin li her çar hêlan

Sosyalîzm pir şirîne, aşitî aramiyê bi xwe re tîne
Dijmin ji Rêber tirsiya, warê dilê wan weşandine

Kulîlkên daristanê geşin, Rêber hat bi gulên geşe
Ezman ji stêrkan geşe, Rêber xemil da cîhanê

Gelê mazlûm her bi we dimeşin, bi we bawerin
Roj ji Ruhayê ye, hemû kesên cîhanê jê bawerin

Navê we pir şîrîne, ser lêvên zarokan, keç û xortane
Hûnin Rêberê aşitiyê, bo herkesê bawerî û hêvîne

Hûnin taca serê me, ji bo herkesê rehmet dibarîne
Xemla we Sîpan, Agirî û Zagros bo Kurdan jiyane

Avên çem û kaniyan, bi awazên we deng vedane
Daristan bi bilbilan şa, Kurdistan bi we reng dane

Ewê dibêje Hecî kale, li hêviya bersiva xwe ye
Lewma wê Hecî şabe, bi bersiva bê dayîne

Roja salvegera komploya navdewletî ya li ser Rêber Apo hatî meşandin nêzik dibû. Kurdên her çar parçeyan xwe di nava cil û bergên reş de pêçabûn û hemû ji ber vê roja reş birojî bûn. Li Wargeha Penaberan jî ji heft salî heta heftê saliyê li ser pêya bûn û ew roj şermezar dikirin. Roja 15'ê Sibatê bû. Divê rojê de xwînmijan dixwestin çiraya me bitemirînin. Azadiya me û vîna me xistibûn destê xwe. Hemû gel bi kîn û hêrseke pir mezin diqêrêyan û digotin; "Kesek nikare roja me tarî bike. Ew destê dirêjî Roja me bibin, emê bişkînin." Her ku diçû diqêrêyan, dengê wan xume xum dixist guhê mirovan. Ji ber qêrîna zarokan dilê mirovan têşiya, ew qas bi kîn qêr dikirin, hêrsa mirov zêde

dikirin. Dema min ev dîmen dîtin û ev kêlî jiyankirin, van hestan bi min re xwe dan der û min ev hestên xwe bi helbestekê rijandin ser kaxezê.

**15'ê Sibatê**

Gel tevahî rabûn bi kincên reş
Serî rakirin Kurdan, ji bo roja reş
Bi qêrin û zarîna xwe yên geş
Nepejirandin bo dijmin ev rewş

Gel tev rabûye ser xwe
Rojî girtin ji bo roja xwe
Ji bo xem û êşa dilê xwe
Napejirînin ji bona xwe

Rabin gelê Kurd, de rabin
Da bibin yek û bihêz bin
Bi yek deng û yek peyv bin
Vê roja reş şermezarkin

Ji Mexmûr ta Amedê
Ji Wanê ta Batmanê
Gelê me hertim şiyare
Ji bo azadî û serhildanê

Rêberê gelê xwe heta dawiyan
Em bi şoreşa we soz didin
Serhildan û berxwedanê bikin
Hetanî em rizgar û azad bikin

Bi yek deng û bi yek renge
Bi can bi xwîn em li gel te ne
Ey Rêberê çerxa bîstan
Rêberê me û roja me

## Dîtina Kulîlkên Azadiyê

Germahiyê weke kirasekê xwe li wargeha Mexmûrê pêçabû. Roj bi roj rewşa min xirabtir dibû. Heval Rohat gazî min kir û got; “Tu dikarî biçî çiyê?” Min got; “belê, dikarim.” Lê belê hinek pêdiviyên min hebûn, pêwistbû min bicih anîbana. Demek dirêj bû min heval Muslum nedîtibû. Ez çûm cihê heval Muslum, min li derî da. Heval Muslum; “keremkin, hûn kî ne?” Bi devek ken û bi henekwarî min got; “Ez im, mam Hecî.” Got; “ha, mam Hecî hûn in? Bixêr hatin. Kerem bikin werne hundir.” Ez ketim hundir, me keyfxweşî da hev. Got; “mam Hecî xêre, xwestekên te çine?” Min jê re got; “hinek pêdiviyên min hene.” Ez hê diaxivîm, hevalekê li derî xist û hat hundir. Heval Rûbar bû. Min keyfxweşî li wî jî da, pişt re dîsa heval Muslum berê xwe da min û got; “mam Hecî te behsa pêdiviyên xwe dikir.” Min berdewam kir û got; “Belê, hinek tişt ji bo min pêwistin.” Wî jî got; “ser çavan” û pêwîstiyên min bicih anîn. Piştî çend rojan, ez bi tena sere xwe li tirimpêlekê siwarbûm û ketim ser rêya çiyayên Kurdistanê.

Em di rê de ji nav bajarê Elî Herîrî re derbasbûn. Herîra bedew. Cihek gelek xweşik û rengîn bû. Ji wê derê jî çûm Diyana. Hevalan jimara telefona kesekê ku xelkê wê derê bû dabûn min. Kesek welatparêz bû û navê jî Sabir bû. Li vê navçeyê neşareza bûm. Lewma dema li qeracê peyabûm, min telefona Sabir kir û min jê re got; “ez mam Hecî. Dibe ku xebera we ji min hebe.” Sabir jî bersiva min da û got; “belê, xebera min ji we heye” û pirsî; “hûn niha li kû derê ne?” Min got; “niha li qeracê me.” Got; “başe. Li wê derê be ezê bêhnek din bêm.” Ez bêhnekê li çayxaneyê rûniştim, min çayek vexwar. Nêzî demjimêrek derbasbû, paşê min temaşekir zilamek bi Soranî daxivî hat û li nêzî mêza min danişt. Wî ez nasnedikirim min jî ew nasnedikir. Telefona min lê da, min telefona xwe rakir. Çawa ku min dest avêt telefonê zanî ezim. Hat gel min û got; “hûnin heval Hecî? Min got; “Belê, raste.” Wî jî got; “hûn bi xêr hatin. Werin ezê we bibim malekê.” Min spasî jêre kir. Em çûn malekê li taxeke hinek dûr bû. Dema ku wê malê zanî hevalim, dayikê got; “li gel gêrîlayan rûniştin keyfxweşî û şanaziyeke.” Gêwilê wê bilind bû û gelek hezkirin nîşan dan û qedrek gelek mezin ji bo min girtin. Min li dîwarê koşkê nêrî, wêneyê Rêber Apo û ala PKK’ê hilawêstî bûn. Gelek ji şehîdan û Rêber Apo, ji şervanên azadiyê hezdikirin, bi saya wan ez jî

hatim hezkirin. Malek bi eslê xwe ji gelê başûrê Kurdistanê bû, ji bo min gelek xwe westandin. Xwarin û çay anîn û li kêleka min rûniştin. Axaftina wan û suhbeta wan li ser şehîdan, Rêber Apo û şervanên azadiyê bû. Bi germahî em ketin nava nirxadinan. Zarokên malê hebûn, navê zarokên xwe danîbûn Berxwedan û Şervan û vana jî ji hevalan girtibûn. Yek ji van zarokan digot; “ez kurê Rêber Apo me.” Ev zarok li ser çoka min nedihat xwarê. Herdem destê xwe dida rûyê min û dikeniya. Digot; “ezê bibim şervanê Rêber Apo.” Dayîka wê jê re digot; “li ser çoka heval were xwarê kurê min, tu heval bêzar dikî, bila bêhna xwe vede.” Dema ku dayîka wî wiha jê re digot zarok digirêya. Min jî digot; “wisa lê nekin, ez ji zarokan hezdikim, tu bêzarêya min jê nîne.”

Hemû ferdên malê li derdora min kom bibûn, her deh deqîqeyan ji bo min tiştek tanîn. Gelek bi mêhvanan keyfxweş dibûn. Birastî jî mêhvanperwerêya wê malê ez didan fikirandin. Mezinahî û heybeta Rêbertiyê dibe sedem ku gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê ev qas pê ve bên girêdan û jê hez bikin. Em li ser şervanên azadiyê diaxivîn û me behsa jîrî û jêhatiya wan dikir. Heval Sabir hat got; “heval Ferman û Azad hatine gundekê û li benda me rawestiyane.” Min xatir ji mala welatparêz xwest û heval Sabir ez birim cem heval Ferman. Min heval Ferman dît, me hev himêzkir û me keyfxweşî da hev. Paşê em bi hev re çûn cihê wan yê li Sinînê. Heval Ferman di rê de got; “we bêrêya mamosteyên xwe kiriye?” Min jî bersiv da û got; “Raste, min pir bêrêya her du mamosteyên xwe û hemû hevalan kiriye.” Paşê min ji heval Ferman pirsî; “heval dikarin rojekê min bibin ku ez serdana mamosteyên xwe bikim?” Wî jî got; “belê, em dikarin te bişînin.” Heval Ferman kesek gelek mirovperwer û fedekar bû. Di xebata xwe de gelek jêhatî bû. Heta kar hebûya, bêhna xwe venedida. Westan çiye nedizanî û her tim bi dilxweşî û keyfa xwe karê xwe dimeşand. Dema dibihîst hevalek nexweş ketiye, hema wî xwe digihandê û di cih de ew radikir nexweşxaneyê. Gelek caran heval Ferman ji ber giraniya kar nedihat cihê xwe. Lewma nedigihişt razê jî. Ji ber wê gelek caran di nava tirimpêlê de xew dikir. Dema ku em serê sibê radibûn me gelek caran didît ku heval nehatiye mangê. Di vê navberê de, nexweşiya min dîsa serî hildida û ez têşandim.

Sal 2008, meha 8’an bû. Em li herêma Berbizinan diman. Herêmekê pir xweşik bû, xwezaya wê bi rengên curbecur hatibû xemilandin. Her

wiha ava wê pir bû. Mangeyên me di nava şînatian de winda bibûn. Dema bayê li wan gul û kulîlkan dida, bêhna misk û emberan jê dihat û mirov tim dixwest bêhn bike. Rojekê ez û heval Azad li ser lateke çiyayê Berbizinan rûniştibûn. Birastî jî ew dîmenên min bi çavên xwe dîtin, ez nikarim bi ziman rave bikim, belkî tenê mirov bi jiyankirina wê kêliyê hest pê bike. Dema ku rojê tîrêjên xwe yên zêrîn berdida ser wan gul û kulîlkan, gulên xwe dibişkivandin û berê xwe didan rojê. Dema ku ew tîrêjên ew qas zêrîn şewqa xwe didan rûyê avê, mîna yaqût û mercanan dibirîqîn. Rengê kesk, sor û zer derdixist û ew biriqandin li hemû derdoran belav dibû. Dema ku li rûyê mirovan dida, weke ku tirêjên rojê li rûyê mirovan dibarandin.

## Hatina Heval Ebas

Min û heval Azad dest bi axaftinê kir. Heval Azad got; "belkî îro hinek heval bên vir." Min jî got; "xwezî li wê rojê." Min jî bêrêya hevalan kiribû, ev qederê çend rojan bû ku kesê serdana me nekiribû. Birastî jî bi hatina hevalan re em keyfxweş dibûn. Jixwe cihê em lê diman mîna mêvanxaneyekê bû. Ji ber dengê avê, dengê baya ku li daran dixist û dengê teyr û tuyaran me tiştek nedibihîst. Em wisa li ser hevalan dipeyîvîn. Me carekê temaşekir hinek kes bi aliyê me ve tên. Me serê xwe rakir û ji wan pirs kir; "hûn kîne?" Hevalekê bersiv da û got; "em hevalin." Me dengê wî naskir ku heval Ferman bû. Min ji heval Azad re got; "dilê te ronîye. Te çima zûtir nedigot wê heval werin gel me." Em her du bilez çûn pêşiya hevalan, me bi dilek germ ew pêşwazîkirin. Hevalek hinekî bitemen bû, li derdora wî çend heval hebûn. Lê min nedizanî ev heval kî ye. Hevalan gotin, "heval Ebase." Ez gelek keyfxweş bûm. Hevalê Ebas weke gula sor bêhn dida. Birastî bi bejin, şeng û şepal bû û mîna bazeke nêçirvan bû. Heval hinek westiya bû û dihat xwestin ku hinek bêhna xwe bide. Hevalê bi navê Edîp lîsteya hevalên ku nobetê bigirin diyarkir. Li gorî listeyê hevalan cihê xwe girtin. Min jî dixwest xwarina spêdê bi destê xwe amade bikim. Min ji heval pirsî; hûn çend heval hatine vê derê." Heval Edîp got; "ew mêhvanê ku we her car behsa wî dikir, ew e. Bila dilê we rehet be." Gelek şabûm ku heval wê bi min re biaxive. Ez bi gotina heval Edîp gelek dilşad bûm. Ez zû razam, ji bo ku zû rabim û xwarina hevalan sibezûyê amede bikim. Ez di demjimêr çaran de rabûm. Çi bibînim, heval hemû rabûne, xwarin amadekirine û heval Ebas jî li ser lingan e. Ez şaş mam, gelek êşiyam, ji ber ku min pilan kiribû ez xwarinê amade bikim, lê hevalan nehiştin. Hevalê Ebas wê dest û çavên xwe bişûştiba. Min bilez xwe gihandê da ku avê li destên wî bikim, lê hevalan nehiştin. Ji ber ku di nava tevgera azadiyê de dilnizmî bingeh tê girtin û karê wan ewe ku ji bo gel xizmetê bikin. Hemû wek hevin di hemû mafan de. Lê min dixwest ji van hevalên hêja re xizmetekê bikim. Mexseda min ew bû ku li gel heval biaxivim. Ez têhnî bibûm û peyvîna wî dermanê nexwaşiya min bû. Heval hemû bi cil û bergên xwe yên leşkerî ve li ser sifrê rûniştibûn. Hevalê Ebas di navbera xwarin xwarinê de serpêhatiyên şehîdan tanî ziman û behsa ramanên Rêber Apo dikir. Carnan em keyfxweş dibûn û carnan jî

kelecanê em digirtin. Ez difikirîm, çawa ev tevger hatiye astek wisa berz! Li beramberê ev qas zehmetiyan, berxwedana şehîdan û ramanên Rêber Apo ji titunebûnê hebûn dan afrandin û ji tarîtiyê ronahî dan xuliqandin. Van pêşengên Kurdan têkoşîn û xîret pêşxistin.

Cihê ku me xwarin lê dixwar bi beran hatibû xemilandin. Heval Ebas bi hevalan re gelek dilhenûn bû, lê di nava çavan de du mû hebûn ku weke du ezraîlan bûn. Hinek heval paşde mabûn, min gazî wan kir; “werin li gel hevalê Ebas xwarinê bixwin.” Hevalan xwarin xwarin, heval Ebas rabû ser xwe û got; “destê hevalan saxbe û ji we tevan re noş û can be.” Hevalan bi “saxbin” re bersîvandin. Heval Ebas çû mangê ku xwendin û nivîsînê bike. Min ji dûr ve temaşeyî heval dikir. Ji ber ku min dixwest bi birêz re biaxivim û di derbarê jiyana wî de hinek tiştan fêr bibim. Lê belê birêz serê xwe ji ser defterên li pêşiya xwe ranedikir. Ez li rêyekê digerêyam ku biçim gel heval Ebas û di dawiyê de min rêyek dît. Ez çûm min çayek û hinek fêkî xist tepsiyekê û ji bo heval bir. Lê belê hevalan xwe aciz kirin û gotin; “em li vê derê ne. Çima tu çay dibî? Şerme ji bo me hevaleke bitemen xizmetê bike, nayê pejirandin.” Lê hevalan nedizanîn ku min çima wisa kiriye. Min di dawiyê de ji bo heval Edîp got; “dixwazim jiyana heval Ebas binivîsim. Ger hinek bi min re bibî alîkar, wê baş be.” Wî jî got; “nabe ku kes li cihê kesê biaxive, her kes bi xwe nêrîna xwe tîne ziman.” Ji ber vê nêzîkatiya heyî, kesê alîkarêya min nekir û gotin, “bixwe pê re baxive.” Piştî demekê heval Ebas rabû ku biçe. Heval Derwêşê berpirsyarê biryargehê got, “ezê alîkarêya te bikim.” Bi gotina wî re min xwe gihand gel heval Ebas û bi nîv Kurdî nîv Tirkî min li ser pêyan derdê xwe pê re parvekir. Lê heval Ebas got; “tênegihiştim.” Min dubare kir. Dîsa ji min fêmnekir. Min nekarî carek din dubare bikim. Weke ku hinek zimanê min bigirin, min nekarî êdî yek gotinê bikim. Çêtunebû, di cihê xwe de tevizîm, zimanê min lal bû û heval Ebas jî di ber min re derbas bû û çû. Ez jî di cihê xwe de bêtevger mam. Qehrê xwe li qirika min pêça. Nefesa min teng bû. Hema hêdîka di cihê xwe de rûniştim.

Piştî çend rojan dema heval Derwêş hat gel me, heval Ferman jê re got; “mam Hecî dixwaze hevalan bibîne, li gel xwe bibe, bila bêhna wî derkeve.” Heval jî erêkir. Ji ber ku nexweşiya şekirê bi min re hebû, min nekarî bi lingan biçim. Ji ber wê, em li tirimpêla heval siwar bûn û ketin ser rêya Xakurkê. Min di rê de ji bo heval Derwêş got; “we soz daye

min." Heval Derwêş got; "min soza xwe ji bîr nekiriye." Em bi tirimpêlê heta cihekê çûn, pişt re em bi lingan ketin ser rê. Em nêzî du demjimêran li rê çûn. Heval Ebas li wê derê bû. Heval Derwêş ji berêya min çû gel birêz û gotê; "mam Hecî dixwaze we bibîne." Heval Ebas jî got; "bila were." Heval Derwêş hat û got; "heval gotiye bila were." Ez gelek keyfxweş bûm û min spasiya heval Derwêş kir. Çûm gel hevalê Ebas. Min ji heval Ebas re got; "dixwazim hinekê li jiyana we guhdar bikim û fêrbibim. Ev yek jî ji bo min pir giranbihaye." Got; "dîroka min çiye?" Min got; "yanî jiyana we." Ji min re got; "dîroka min tuneye, ji te re dîroka partiyê bibêjim." Min got; "niha daxwaza min ewe ku dîroka we binivîsim, ji ber ku hêza min tuneye dîroka partiyê binivîsim." Ji min re got; "birastî jî ez nizanim ji we re çi bêjim, ji ber ku dîroka min nîne." Min got; "di derbarê jiyana we de hinek tiştan fêrbibim bese. Ji ber ku jiyana we li gel Kurdan giranbihaye." Got; "başe. Niha nikarim bi devokî ji were bêjim, ezê pişt re bi têbiniyekê hemûyê ji we re binivîsim û bişînim. Başe?" Min got; "gelek keyfxweş û şanazim." Bi vî awayî me xatir ji hevalan xwest û em çûn. Ez demeke kin li benda têbîniya heval Ebas mam. Paşê heval Ebas têbîniya min teslîmî heval kir û wî jî ji min re anî. Ez gelek pê keyfxweş bûm. Lê rastiya xwe bêjim, hêjî ji axaftinên heval Ebas têr tunebûme û kalbûnê jî her deriyekê ji bo min dabû vekirin.

Heval Ebas di têbîniya ku ji bo min şandî de jiyana xwe bi vî awayî anîbû ziman.

**Jînameya Heval Ebas**

"Kîme ez, yanî ez kîme?

Navê bav: Yusif

Navê dayîkê: Safiye

Cihê ji dayikbûnê: Samîbeylî / Edene

Qeyda Nifûsê: Tufanbeylî /1'ê Çile / 1954

Gundê lê ji dayik bûyî: Gundê Guzelim

Em di malê de çar zarok bûn. Sê bira û yek xwîşk. Em di eslê xwe de Serhedî ne. Kalkê min li Kaxizmana Qersê ji dayîk bûye û navê wî Mewlûd bû. Ez li ser girên Torosan, di sêkuça Edene, Qeyserî û Mereşê

de, li gundeke ku modernîteya kapîtalîst zêde nasnekirî, di sala 1954’an de ji dayîk bûme. Niha jî malbata min li bajarê Edenê dimîne.

Ez di refa dawiyê ya dibistanên mamosteyên bilind ya Enqereyê de bûm. Kesê ku PKK destpêkê bi min dayî naskirin, heval Cûma bû. Min heval Cûma di refa dawî ya dibistanê de naskiribû. Di havîna sala 1972’an de ez ketim zanîngeha Enqerê, fakulteya Fenê. Min li wê derê heval Heqî Karer naskir. Di Cotmeha sala 1973’an de, di nava maleke bi baxçe de min Rêber dît. Li ser doşekekê rûniştî û pora wî qutkirî bû, simbêlên wî yên stur û reş rûyê wî tarî kiribûn. Heval Cûma ji bo em bixwînin ez birim wê malê. Em çûbûn pirtûk bigirin. Mal, mala heval Heqî bû. Rêber Apo li wê derê weke mêhvan dima. Ji vê demê û şûn de min Serokatî naskir, yekser di xebatên ADYOD’ê de. Êdî em weke komeke hevalan bûn. Dema komelaya me hat dagirkirin, em û Serokatî bi hev re hatin girtin û ketin girtîgeha Mamakê.

Di zivistana sala 1975-76’an de di çend malan de em bi cih bibûn. Em herdem diçûn û dihatin. Serokatî herdem dihat mala me ku rênasê wî heval Heqî bû. Di wê mala ku li Dikimeviyê de şevekê Serokatiyê ji min re got; “tu wê li Kurdistanê şer bikî?” Di meha zivistanê de me civîneke ji 15 hevalan pêk dihat çêkir û ez jî tevli wê civînê bûm. Serokatiyê li wê derê sicîlên me pirskir. Dema ku Serokatiyê ew pirs kir, min nû zanî ku ez bi şêweyeke fermî tevlî tevgerê bûme. Di Kanûna sala 1975’an de cara yekem ez hatim Kurdistanê û derbasî Dîlok, Ruha, Wêranşarê bûm û gihiştim Serêkaniyê. Lê mixabin ew kesên ku ez derbasî van qadan kirim, hemûyan îxanet li min kirin. Di havîna 1976’an de ez çûm Amedê û demeke dirêj li Amed, Mêrdîn û Êlihê mam. Tevlî civîna li gundê Fîsê bûm, tevlî kongreya avakirinê bûm. Di 22’yê Avrêla sala 1980’an de jî li nêzî Qiziltepeyê derbasî derveyî welat bûm. Di havîna sala 1986’an de dîsa vegeriyam welat. Ez beşdarî sê kongreyên PKK’ê bûm. Piştre derbasî Ewrûpa bûm. Ez li Elmanyayê nêzî şeş salan di girtîgehê de mam. Ez ji berêya Newroza sala 1994’an derbasî qada Serokatiyê bûm. Di Kanûnê de derbasî welat bûm û çûm Heftanînê. Di 15’ê Sibata sala 1999’an de, li Xinêrê ez beşdarî kongreya şeşemîn bûm. Pirsa ku herî zêde min ji xwe kirî ev bû; “gelo wê serhildanên Kurdan bi vî awayî berdewam bikin?” Min bi rojan vê pirsê ji xwe kir û hizirîm. Bersiva ku min di dawiyê de dîtî ev bû: Rêber Apo hemû tişt daye me.

Çareserî di destê me de ye. Ji wê rojê heta îro, ez bi vê nêzîkatiyê kar bi rê ve dibim."

**Armanca We Azadiya Gel e**

Xwe di westîne roj û zemane
Herdem bi rêgez û pîvane
Armanca mamoste li ber çavane
Herdem pêş dixe xwedevandane

Aqil û exlaq dide şervanan
Rê nîşan dide ji bo şagirtan
Keda we tim li ser çavan
Mejiyek azad dide rêhevalan
Şev û rojan we zehmet kişand
Bi aqil û hestan domand
Kirasê reş û kevin qetand
Agirek nû ji bo me raçand

Mamosteyî pir şîrînî
Rêyên xirab tim dişkênî
Gelê me her bi evînî
Ji rêyên xirab me dizivirînî

**Nameya Qîza Min Berfê Ji Bo Heval Ebas**

Ez zarokekê Kurdim ku ji derdê azadiyê dihelim û dixwazim nameyekê ji bo mamosteyê xwe heval Ebas binivîsim. Mamosteyê min yê hêja û delal; xweziya carekê min bikarîba we bibînim, minê wê demê baştir bikarîba xwe bînim ziman. Lê mixabin ji bo me ew derfet û şans çêtunebû. Çavê dijminan birije, ne kêmasiya me ye. Ez dixwazim bi çend hevokan gilî û gazindên xwe bi we re parve bikim. Ezê ji kû derê dest pê bikim û ezê çawa van derd û kulên ku di hundirê xwe de bi pênûsekê birêjim ser rûpeleke spî, nizanim.

Temenê min neh sale. Lê belê dilê min têşe. Êşek ketiye hundirê min. Ez nizanim wê çawa ev êş derbikeve ji der ve. Em dibêjin êdî bila

Kurdistan rizgar bibe, bila Rêberê me rizgar bibe. Em weke bav û kalên xwe desthilatdarêya tu kesan napejirînin. Xwesteka me zarokên Kurdan yên her çar parçeyan, dîtina Rêber Apo û şervanên azadiyê ye. Em di wê baweriyê de ne, wê di demek kin de ev xwesteka me bicih were. Dema ku Rêberê me di 4'ê Nîsana sala 1949'an de ji dayîk bû tirs ket dilê dijmin, wê demê dijmin har bû. Felsefe û bîrdoziya Rêber Apo li ser hemû desthilatdaran bandorêya xwe çêkir. Mamosteyê min, hûn herdem li beramberî hemû zorî û zehmetiyan, mij û dumanan li ser wan çiyayan di nava têkoşîn û berxwedanê de ne, ji bo ku zarokên weke min êdî bes binalin ji dilê xwe yê birîndar, xebat dikin. Berxwedan û têkoşîna we ji bo hemû mirovahiyê ye, ji bo parastina exlaqê mirovahiyê ye. Rêya we ya şeref û namûsê ye.

Ez bi ser navê hemû zarokên Kurdistanê û zarokên penaber yên wargeha Mexmûrê silavên xwe ji bo we dişînim. Ez sala 2009'an li we pîroz dikim û di hemû xebatên we de serkeftinê dixwazim. Ez keçikekê ji bajarê Wanê me. Bi girêdayî Erdîşê, ji gundê Geliyê Zîlan im.

**Silav û rêz.**

**Berfê Hecî Nûrî**

**28.11.2009**

**Silav Li Serokê Min**

Em zarokên welatin
Tim bi xerîk û xebatin

Li Bakûr û Başûrin
Rojava û Rojhilatin

Ji bo Apo dil şewatin
Bi derd û kul û xemin

Rih fidayê gelê min
Silav li serokê min

Ronahiya van çavên min
Evîna gel û welatê min
(**Ji hestên keça min Berfê yên di derbarê Rêber Apo de. Berfê, vê helbesta xwe diyarî kiriye ji bo heval Ebas)**

**Kawayê Dilan**

Şalûlê çiyayên Kurdistanê, şewitand dilê dijmin bi kulan
Ez lez dikim bi hewar, nagihîjim evîndarê dilê şoreşgeran
Rûsteme şalûlê ceng û şeran, xof xist dilê cehş û neyaran

Keç û xortan xwe xemilandin bi rengan, gihiştin egîd û şêran
Ez têm bikeyfxweşî, da ku bibînim biserfîrazî kawayê dilan
Hûn bazekê pir şîrînin, her piratîka cengan dizanin
(Ev helbest raveya hestên min yên di derbarê heval Ebas de ye.)

**Çûyîna Cejna Remezanê**

Perwerde ji bo heval Ferman hatibû pêşniyarkirin, heval Fermam jî bi erênî bersiv dabû. Ez ne şaş bim, heft heyvan li gel heval Ferman mabûm. Cejna qurbanê nêzîk bibû, heval Ferman got; "ezê biçim cejna gundiyan." Ji ber ku têkiliyên wî bi gelê Başûrê Kurdistanê û gundiyan re xweş bûn. Min jî got; "eger destura we hebe, dixwazim li gel we bêm." Got; "başe." Roj hat, em çûn gundan, ji heft salî heta heftê saliyê tiliyên xwe rakirin û ji bo şoreşê û Rêber Apo serkeftin daxwaz dikirin. Dema çavên wan bi hevalan diket, diruşmên "bijî Rêber Apo" diqêriyan. Dema ku wan gêrîlayan didîtin weke ku biçin biheştê, bi gerîla keyfxweş dibûn. Her yek ji gundên Diyana ji aliyê xwe ve dihatin û digotin; "werin mala me, bibin mêhvanê me." Zarokan destên me bernedidan. Em bi heval Ferman re diçûn malên hemûyan. Ew rê û rêzikin Rêber Apo afiradibûn, ji xwe re esas digirtin. Her mala ku em diçûnê, digotin; "heval, hûn bixêr hatin, kerem bikin werin danişin, tiştekê ji xwarina me bixwin û vexwin, malên me bi we rengîn dibin." Lê belê bi rastî jî me nedikarî em li her malê rûnin. Em di rê de rastî berpirsyareke PDK'ê hatin, me cejna hev pîroz kir, em bi hev re li malekê rûniştin. Heval Ferman bi wan re fereseta Rêber Apo dinirxand.

Heval Ferman bi ew kesê berpirsyar re diaxivî, feraseta Rêber Apo pê dida fêmkirin. Berpisyarê PDK'ê jî digot; "hûn çi dibêjin raste." Min jî guhdarî wan dikir. Heval Ferman behsa tevgera azadiyê û şervanên Rêber Apo dikir, wî jî guhdar dikir. Piştî ku em ji wê derê zivirîn em hatin cihê xwe. Raste, rêxistina PKK'ê bi jîrî û jêhatiya xwe tê nasîn, ev jî bi perwerdeya şehîdan û Rêber Apo hatiye bidestxistin.

Dîrok 29'ê Tebaxê bû. Rojek ji meha 9'an re mabû. Ew roj ji bo min gelek watedar bû. Dibêjin, "roja xweş ji serê sibê ve destpê dike." Ew roj, ji bo min rojek gelek xweşbû. Mamosteyê min yê ku min ew qas dixwest serdana wî bikim, wê bihata cihê ku em lê diman. Şefeqê rojê tîrêjên xwe avêtêbûn gimikên çiyayan, ji jor ber bi jêr dihat xwar û zereya xwe li derdor belav dikir. Vê zerahiya tavê em ji xewa şîrîn şiyar dikirin. Di latên Berbizinan de kewên ribat dixwendin. Min ji wan kewan re got; "hûn ji bo kê dixwînin? Yan, ji bo wan evîndaran dinalin û dixwînin." Me hîsdikir ku mêhvanên me nêzîk bûne. Hatina hevalan mîna tîrêjên rojê xwiya dikir. Gelek keyfxweş bûm û beziyam pêşiya

wan. Li gel min hevalek bi navê Azad jî hebû. Dema em gihiştin pêşiya hevalan, me xêrhatina wan kir. Wan jî bersiva me dan û hatin li binê sîha wan daran rûniştin. Heval Azad jî dest bi amadekarêyên xwarin û vexwarinan kir. Wê rojê, min bi hevalan re demek gelek xweş û bi coş derbas kir. Ew roj ji bo min vejîn bû. Heval jî gelek keyfxweş bibûn. Di vê navberê de min dixwest jiyana heval Cûma jê bipirsim ku binivîsim. Paşê dema min ev daxwaz arasteyî heval kir, wî jî bi xweşbînî pêşwazî kir. Paşê hevalek jin bi Tirkî dest bi nivîsandina jiyana heval Cûma kir. Dilê min gelek şa bû û ez şanaz bûm. Dema min li pênûsa destê wê hevalê dinêrî ku jiyana heval Cûma pê dinivîse, şad û dilxweş dibûm.

**Dermanê Derdan**

Rengê hebîbe, li bejna wî diyar dibe
Qet nasekine, her dilive dike kar xebate
Şev dimeşe xew çiye, betal nîne bilbile

Nazîke, keyfxweşe, reng zêrîn û delale
Nûr di dil de vêketî min şemal dîtiye
Fedekare, tam dermanê derdan û êşane

Bayê lê bida hilda ba perdeya şefafê
Min têr bidîta xal û xetên li rûdanê
Belkî dil şad biba bi dîtina miradê

Wek şalûl û bilbil û çûkan dizarim
Dîroka mamosteyê xwe jê dixwazim
Kurte jiyana heval Cûma dixwazim

## Jînameya Heval Cûma

Di sala 1955'an de li Elezîzê hatime dinê. Li gundê Çaqmaqa jêr min çavên xwe li jînê vekirine. Navê bavê min Mistefa, navê dayîka min jî Rihan e. Ji zarokên malê yê herî mezinim û xwîşkek û sê birayên min hene. Min dibistana seretayî sê salan li gund xwend. Refa çaran min li Afyonê xwend û di ya pêncan de ez vegeriyam gund. Piştî ku min pênc sal xilaskirin, êdî ez li yurdan mam. Piştî ku min pênc salên din xwend, li ser biryara mamosteyan ez ji dibistana bilind ya Enqerê re hatim şandin. Di ezmûna li wê derê de ez biserkeftim. Min salekê refa amadeyî xwend. Piştî wê ez ketim ezmûnên zanîngehan û min fakulteya ziman, dîrok, erdnîgarî û beşê wêjeya dîroka Tirkî qezenc kir. Piştî ku min sê salan xwend, ji vir û şûn de min dest bi şoreşgerêya profesyonel kir.

Heta refa pêncan ez misilmaneke tam bûm. Min herdem nimêj dikir û rojiyên xwe digirtin. Tevî ku li dibistanan qedexe jî bû, min ev xebatên xwe yên olî dewam dikirin. Piştî ku min refa seretayî pênc qedand, heskirina min ya ji bo sosyalizmê pêşket. Di encama pevçûneke pêşketî de, min heval Kemal Pir naskir. Heval Kemal jî ez bi Serokatî re danasandim. Piştî ku ez hatim gel Serokatî, min rastiya Kurd û Kurdistanê naskir. Ji wê demê heta niha min hewil daye ku ez bibim şopvanê Rêber Apo.

Malbata min bi zorî debara xwe dikirin. Di malbatê de bav serdest bû û dayîk bêhtir dihat hezkirin. Ji derveyî dibistanê, ez di hemû karên gund de xebitî me. Ez di nava malbatê de pir dihatim hezkirin. Ji ber ku ez hem di dibistanê de, hem jî di nava kar de gelek jîr û jêhatîbûm. Der û cîranan jî ji min pir hezdikirin, ji ber ku ez miroveke pir xizmetxweş bûm. Çi qasî ji destê min bihatiba, min xizmet dikir. Dema ku bavê min ji bapîr û pîrika min cudabûn, ez çûm gel wan, ez hem li gel wan dixebitîm, hem jî bi rastî min gelek ji wan hezdikir. Wan jî ji min pir hezdikirin, ji ber ku ez neviyê wan yê despêkê bûm. Dema ku ez çûm ezmûna yekemîn ya mamosteyan, bavê min cileke pir xweşik ji min re anîbû. Min ji van cilên xwe pir hezdikir. Min qet nedixwast qirêj bibe û min baş diparast. Tişta ku herî min jê hezdikir, xwendin bû. Lê belê şert û mercan derfet nedida min ku ez di malê de bixwînim. Ez neçar mam ku di yurdan de xwendina xwe berdewam bikim. Vê rewşê ez pir xemgîn dikirim. Min di demekê de ji wêne çêkirinê pir hezdikir. Ez ji xizaniyê pir

bêzar dibûm, ji bêdadiyan jî bêzar dibûm. Min qet nedipejirand ku bavê min li dayîka min bixe. Min carekê ji dayîka xwe re got; “ji bavê min re bêje bila carek din li te nexe.” Dayîka min got; “kurê min tu bixwe jê re bêje.” Ez çûm û min ji bavê xwe re got; “Êdî tu li dayîka min nexî.” Bi vî awayî, bavê min li ser vê gotina min êdî li dayîka min nexist. Heta dikarim bêjim, bavê min dest ji lêdanê berda. Di wê demê de ez pir biçûk bûm. Bavê min dixwest ez bixwînim, ne dixwest ez bibim şoreşger. Ji ber vê çendê, herdem li dîjî min radiwesta. Min dikarî ez bi dayîka xwe bidim pejirandin, lê belê bavê min zû bi zû nedipejirand. Dixwest pêşiya min bigire. Ji ber ku ez keseke jîr û zanabûm, hêviyên bavê min ji min hebûn. Bavê min herdem wiha ji min re digot; “ne tu şêx, ne jî tu melayan nekarîne vî karî bi ser bixin. Hûnê çawa biserbixin? Dibistana xwe bixwîne û me ji vê rewşê rizgar bike.”

Min guhdarêya van gotinên bavê xwe nekir û ez ji rêya xwe ya şoreşgeriyê derneketim. Lewma ji wê rojê heta niha, di nava tevgera azadiya Kurdistanê de bêyî rawestan ji bo gelê Kurd û hemû gelên bindest kar û xebatê dimeşînim.”

**Axîn Ji Dil Tê**

Ez bûme evîndarê sumbula sorgulan dizanim
Ez dilgerm, rûgeş û rûkenim bo we evîndarim

Ax ji derdê kalbûnê dûr xistim ji xezal û gulan
Ma ji wê zortir çiye ka bêje jiyana dilê Kurdan

Mamostene, bijîşkin fedî nakin hercaran bêjim
Hûn dûrnasin, zanyarên, rênasin gulim dizarînim

Axîn ji dil tê bixwîne li kê bikim nazan û keserê
Çavo kor nebe tu dê bibînî xemê ji min re pir tîne

Kalbûn zore, dûr dimîne, rabûn û rûniştina wî kême
Hesret nikare bînim ziman, nizanim hal çawa be

Sorgula dila, nêrgiza buhişta, maçkira herdu destane
Ewê dibêje Hecî yê kale ew li benda bersiva weye

## Çûyîna Perwerdeyê Ya Heval Ferman

Heval Ferman çû perwerdeyê. Piştî heyvekê min xwest ez biçim serdana heval Ferman. Min daxwaza xwe ji bo heval Mistafa Cizîrî bir. Heval got; "başe, emê bi hev re biçin." Em bi hev re çûn cihê heval Ferman, li dibistana ku perwerde tê de didît. Min li wê derê heval MustafaKarasû jî dît. Min gelek dixwest ez li gel wî biaxivim, lê belê pir bêtaqet bûm û min nedikarî zêde baxivim. Min nedikarî li ser kursiyê jî rûnim. Heval MustafaKarasû hat û ez himbêz kirim, şîfa ji min re xwest. Paşê çûm gel heval Ferman. Piştî keyfxweşiyan, rewşa min pirsî û babat anî ser nexweşiya min. Min got; "nexweşiya min ne di xema min de ye, ji hevalan dûrketin nexweşiya herî mezine. Hevalno, hûn dizanin ji şervanên azadiyê dûrketin mirina li ser rûyê cîhanê ye. Raste, min di ciwaniya xwe de nasnekir, di temenê xwe yê kalbûnê de li gel wan mam. Min Rêber Apo jî nedît, min pirtûkên Rêber xwendin. Lê belê min di temenê xwe yê 63 saliyê de rêheval dîtin û bi wan re jiyan kir. Min fedekarêya wan dît, min rihê hevaltiyê dît, min cara yekemîn dît ku mirov ne ji bo berjewendiyên xwe kar dikin, ji bo netewa xwe kar dikin û ji bo azadiya bindestan li serê van çiyayan têdikoşin. Di nava van çiyayan de şoreşgerên Rêber Apo hene û têkoşîna azadiya gelê xwe didin, ji vê jiyanê xweşiktir û bi rûmetir çi heye? Êdî bimirim jî ne di xema min de ye. Tişta ku min dixwest jiyan bikim, min jiyan kir." Paşê min xatir ji heval Ferman xwest û min ji wir berê xwe da wergeha Mexmûrê û ez li wergehê bi cih bûm.

Rojekê hinek heval hatin manga me û heval Melsa bi wan re bû. Heval Melsa berpirsyara nexweşan bû û bi xizmeta nexweş û nexweşxaneyê re xerîk dibû. Ji bo serdana min bike hatibû manga me û qederekê li gel me rûnişt. Hemû hevalan daxwaza derbasiyê dan min û gotin; "em dixwazin we bibin nexweşxaneyê." Min got; "ez naçim nexwaşxaneyê. Ev çend salin ji bo nexwaşiya xwe diçim û têm, lê min tu encam jê negirtiye û nexweşiya min her berdewame. Ji ber vê, ez naxwazim hevalên xwe bêzar bikim." Heval Melsa got;" nabe. Hûnê biçin nexwaşxaneyê. Em jî bi vî karî ve mijûlin." Hevala ku wê min bibaya nexweşxaneyê, heval Kurdistan bû. Ev heval ji gundê Mizê yê ser bi bajarê Sêrtê bû. Dîsa min got; "birastî jî naxwazim heval bi min re xerîk bibin û bêzar bibin." Lê hevalan gotin; "ger em bizanin hûnê

mîsoger şehîd bibin jî, emê dîsa we bibin nexweşxaneyê û emê nehêlin tiştek bi we bê. Ji ber ku ji bo me jiyana mirovan pir girînge û ev jî karê me ye. Ger em karê xwe nekin, emê bikevin kêmasiyan. Rêxistina me ji bo mirovan jiyan afirandiye û em jî li ser vî bingehî dimeşin."

Piştî van gotinan min nexwest zêdetir hevalan tengav bikim û min erêkir ku biçim nexweşxaneyê. Hevala Kurdistanê ez birim Nexweşxaneya Rizgarî ya li Hewlêrê. Lê birastî jî, ji ber ku demek dirêj bû çûyîna nexweşxaneyan bandorek erênî li nexweşiya min nedikir, min nedixwest heval mezaxtinê li min bikin. Lê hevalan tu carî guh nedidan mesref û peredayînê. Lewma ji bo tendirustiya min û her hevalê nexweş çi bihatiba xwestin, amadebûn ku bikin. Heval Kurdistanê jî bi vê nêzîkatiyê hewil dida xizmetek baş û encamdar ji min re bike.

Di vê navberê de hevalek nêzî me bû û silav da min. Xorteke zerik bû û porê wî qederekê dirêj bibû û navê wî Sunulah bû. Vî xortî jî alîkarêya hevalan dikir. Diyar bû ku hevalan nasdike, ji ber wê bi serbestî xwe nêzî me kir û hat gel me. Dema hat gel me heval Kurdistanê got; "hevaleke karê wî tuneye bila heval Hecî bigire gel xwe û biçin kelhê û xwarinekê bidinê." Sunulah jî li heval Kurdistanê zivirî û got; "tirimpêla min heye. Bi destura we ezê mam Hecî bibim kelhê, dema we banî kir, ezê bînim."

Heval Kurdistanê got; "başe. Mam Hecî bibin, lê dema me banî kir binîn." Ez û hevalek din, em li tirimpêla wî siwarbûn û çûn kelha Hewlêrê. Em li cihekê rûniştin û me bêhna xwe veda. Her weke ku Sunilahî ez nasdikirim, rêzdariyek mezin nîşanî min dida. Min jê re got; "ez te nasnakim. Hûn kîne?" Wî jî got; "ez kurê Îsmet im, navê dayîka min Gozele, navê min Sunilah e. Mane em û hûn li Erdîşê cîranê hev in. Bawerim we ji bîr kiriye. Mam Hecî, min dizanî we em ji bîr kirine, ji ber wê min destur ji heval Kurdistanê xwest ku we bînim kelhê. Min telefona xwe jî da heval Kurdistan. Dema karê wan xilas bû, ezê we bibim gel wan." Piştî vê vegotinê min jî ew naskir.

Em li aşxaneya binê kelhê rûniştin. Me behsa welat, av û agirê wê, xweşikbûna wê û nan û penîrê wê kir. Sunilah got; "dema mirov li roja Kurdan dinêre, xweşikbûna wê û delaliya Kurdistanê tê de dibîne." Diyar bû ku Sunilah welatparêzek rast bû. Kurê mamê wî yê bi navê Kemal, li Serhedê şehîd ketibû. Nasnavê Kemal, Cemşîd bû. Heta êvarî li

gel Sunilah mam û bêhna min gelek fireh bû. Min jê rewşa wî pirsî. Got, “ez zewicîme û min keçek bi navê Zîlan heye.”

Piştî sê sal derbas bûn keça wî Zîlanê ji bo min nameyek şand û di nameya xwe de hezkirina xwe ya ji bo şehîdan, Rêber Apo û gêrîla anîbû ziman. Di nameya Zîlana biçûk de dihat diyar kirin ku malbateke welatparêzin û gelek meraqa şervanên Apoyî dikin. Dîsa, anîbû ziman ku pir dixwaze serdana hevalan bike û rêzdarî û mînetdarêya xwe ji bo şehîdan diyar kiribû. Her wiha wisa gotibû; “Şehîd heyv û stêrkên Kurdan, Rêber Apo roja Kurdan, heval gul û kulîlkên Kurdistanê û rêhevalên zarokên Ariyan in. Weke ku hûn bi xwe jî dizanin, têkoşîna wan, sekna wan ji bo pêşeroja me zarokên Kurdan in. Ew rêya şehîdan ya ku diçe azadiyê, nayê jibîrkirin. Armanca wan serkeftina me ye û bi rêya wan emê serbikevin. Di wê baweriyê de me, rojên azadiyê nêzîk bûne. Di wan demên pêşiya me de tişta herî zêde hêz dide me, silogana ku Rêbertiyê diyar kiriye “Yan serkeftin Yan serkeftin” e. Emê serbikevin, em herdem di bin dirûşma serkeftinê de dijîn. Em di wê baweriyê de ne ku her roja derbas dibe em zêdetir nêzîkî azadiyê dibin. Li gorî ku em jiyana rojane dibînin, diyare ku bêhna azadiyê tê û xiyalên şoreşgeran yên bi salan wê bindestan ji bin destê dagerkran xilas bikin. Ji ber fedekarêya hevalan çi kar bikeve ser milê min jî ezê pêkbînim. Bila dilê rêhevalan rehet be, ew rêya hûn dimeşînin wê hertim hebe û wê tu caran ala wan nekeve erdê. Wê heroj bayê berbangê lê bide, bihejîne û wê bibe şemala rûyê zarokên Kurdan. Di dawiyê de jî silav û rêzên xwe, girêdana bi şehîdan û Rêber Apo re tînim ziman. Rêber Apo taca serê Kurdane û sedemê azadiya gelên Mezopotamyayê ye. Hûnin hebûna gelan, silavên xwe ji we re dişînim, bejna xwe li ber şehîdên şoreşê ditewînim. Rêya heval dişopînin rêya azadiya zarokên Kurdan e. Li xwe baş binêrin. Bimînin di xêr û xweşiyê de.”

**Silav û rêzên şoreşgeri**
**Zîlan Sunilah**
**27/9/2011**

## Dîtina Heval Fuat

Dîrok 1/10/2010 bû, cîhê em lê diman bi hemû rengên xwezayê hatibû xemilandin. Cihê koma me lê dima nêzî zozanên Sinînê bû. Ev der bi rengên xwezayê hatibû xemilandin û biriqîn didan bi rengên kesk û sor û zer. Birastî jî kulîlka beybûnê, sumbul û sorgulan bêhn diwerandin. Xwiş xwişa çem û kaniyan û dengê avên rubaran awaz diafirandin. Ev dengê xweş dibû awazên keç û xortên Amed, Serhed, Qoçgirî û Xerzanê. Ew şoreşgerên rêya Rêberê xwe ne û deng û awazên wan dibû dermanê bindestan. Li gel wan şoreşgeran ji her nexweşiyê re derman hebû. Ew xilaskerên gelan û şopdarên rêya şehîdan bûn. Miraza dilê wan û armanca wan, gel û niştîmana wan bû.

Li nêzikî cihê me zozanên Biradostan û Şêxbiziniyan hebûn. Konên wan yên reş weke mija biharê erdê zozanan tejî kiribûn. Wan nû dest bi hatina zozanan kiribûn. Dema min ew didîtin, zozanên welêt dihatin bîra min û rondikên çavên min weke baranên Nîsanê dibariyan. Hemû mamoste, heval û hogir bûn, bejna wan weke rihanên devê geliyan dihat dîtin. Dema min ew nedîtibana, dibû keder û hesret. Vê hizirandinê dil dişewitand.

Zozaniyan konên xwe danîbûn. Jin, zilam, kal, ciwan û zarokan bi hev re berê xwe dabûn zozanên welatê rojê. Li derdora zozanan pez diçêrandin. Keç û xortên Biradostan û Şêxbiziniyan bûn li van zozanan diman. Lê di rastiyê de rewşa wan zozanan keç û xortên Apoyî bûn. Tu car nayên jibîrkirin ev heval, tev wek şepalên şêran bûn. Dûxan ji çar berên cihwarên hevalan, tenûrên koçerên Biradostan û Şêxbiziniyan ber bi ezmanan ve bilind dibû. Di çavên wan hevalan de serfirazî û azadî dihat dîtin. Dayê Kurdistan em himbêz kiribûn û hildabû nava sînga xwe. Reng û dengê hevalan rewş dabû van zozanan. Li aliyê din hoke hoka şivanan, berxvanan û gavanan ji min re weke derman dihat. Bi van hemû kesan re heval û hevparbûn, şervanên Apoyî bûn û ji mirovan re jiyan didan afirandin. Derketina dengê hevalan mirov sermest dikirin û evîna şervanên Apoyî ji mirovan re jiyan, keyfxweşî û gêwil dida raberkirin. Her komeke hevalan dema dihatin ji min re jiyan tanîn, bi van hemû xweşiyan ve serdana mamoste ji bîra min dernediket.

Ez û heval Heqî li ser ava li ber deriyê manga me rûniştibûn û me li bedewiya herikîna avê dinêrî. Di rûyê min de xemgînî hebû û vê

xemginiyê bi awayek vekirî xwe dida der. Heval Heqî ji min pirsî; "çima hûn wisa xemgînin?" Min got; "dixwazim serdana heval Fuat bikim." Bi awayek nazik bersîva min da û got; "tu dikarî biçî serdana heval Fuat bikî." Di wê kêliyê de rûyê min weke gula nû hatî avdan geş bû û min spasiya xwe ji heval re diyarkir. Piştî wê her tim vê serdanê dihizirîm, lê derfet nediket destê min. Paşê derfet çêbûn û destura çûyîna min hat dayîn. Ji keyfxweşiyê gewdeya min dilerizî. Pişt re hevalan gotin; "bila heval Amed bi we re bê." Heval Amed kesek rûbiken û bicoş bû. Rabû xwe bi çek û rext pêça û ji bo çûyînê amade bû. Heval Neşetê ji Başûr, Deyndarê Sêrtî û Rizgarê Amedî jî wê heta cihekê hevaltiya me bikirana. Ji bo em rêbikevin heval Heqî amadebû. Hevalan tembîha min li heval Amed kirin û kopalê min dan destê min. Heval Deyndar jî li pey me de av rijand. Heval Heqî di nava hevalan de hezkirin dida afirandin. Lewma ji aliyê hemû hevalan ve dihat hezkirin. Paşê heval Rizgar ket pêşiyê, me xatir ji hevalan xwest û em ketin ser rê. Rêya me evrazî û berjêrî bû. Pirsgirêkek tutunebû ji bo rêya ku em tê de dimeşiyan, ji ber ku rêyeke xweş hatibû hilbijartin. Hêz û gêwilê min jî di astek jor de bû. Ji ber ku wê heta cihekê heval Rizgar bi me re bihata, dema em gihiştin li ser avekê, heval Rizgar paş ve ziviri. Lê beriya biçe ji me re got; "hûnê di vê rêyê de bimeşin. Li pêşiya we gundek xirabe heye. Ev gund ji berê de ji aliyê rejîma Sedam Husên ve hatibû şewitandin û vala ye. Hûnê gund derbas bikin, paşê hûnê li rastî du darên gûzan û du darên çinarê bên. Wan jî derbas bikin û rêya xwe bernedin. Hûnê bigihin cihê hevalan." Paşê xatir ji me xwest û çû.

Di wê kêliyê de îlhamên min serî hildan û ev rêzikên helbestê ketin nav hestên min.

**Dil Dixwaze We Bibîne**

Daxwaz dikim bibînim, gulên tîrêjên rojê ye
Evîndar kirim wî jî, rihan û sumbulê rojê ne
Dîtina wî ji bo min, giranbiha evîna dilane

Ew e mamosteyê derya zanistê
Bazê gelan, ronahiya dilan, cewherê Kurdan
Mamosteye, pêta agirê azadiyê yê gelane

Evîn sebra min tîne, dermanê selameta gelane
Mirazê dilane, bibînim biriqandina gelê Ariyane
Li min nemaye reng, heland dil ciger û berg

Çêkirin hêlîn, bişkivandin sorgul û rihan û sosine
Ew mamosteyê hêja û delale, biryara wî pîroze
Xem û xiyalên min ronahî bûn bidîtina mamoste

Em ketin ser rêya dibîstana Apoyiyan û me xwe gihand gundekê yê herêma Sîdeka ku ji aliyê Sedam Hisên ve hatibû şewitandin. Jixwe heval Rizgar dikara wî gundî kiribû. Xem, keder, êş û kulê di erdnîgariya gund de xwe dida nişankirin. Ew gund jî yê Kurdan bû. Pişt re em rastî darên guz û çinaran hatin. Weke biheştê xuya dikirin. Daristana wî cihî bi hemû rengên daran, gul û çiçekan hatibû xemilandin. Bêhna van gul, sosin û sumbulan difûriya. Min li derdora xwe temaşe kir û min dît ku du ferişteyên Apoyî derketin pêşiya me. Dema hatin li gel me, silav dan û ji me pirsin ka emê ku ve biçin. Hema yekser min têbîniya heval Heqî radestî wan kir. Piştî ku têbîniyê xwendin, xêrhatina me kirn. Paşê bi awayek baş em hatin pêşwazîkirin. Me jî pirsa rewşa hevalan kir. Gotin; "heval gelek başin." Berdewam kirin û gotin; "kerem bikin werin em biçin gel hevalan." Ji ber ku di meşandina xebata rêxistinî de dîsîplîn xalek serekeye, di dema heval di perwerdeyê de çûnûhatin qedexeye. Lewma me qet nedixwest hevalan bêzar bikin. Lê dema min li derdora dibistanê nêrî, bi rihan, beybûn, sumbul û kulîlkan hatibû xemilandin. Dema mirov nêzîk dibû, bêhna wan xwe li pozê mirov dida.

Me xwe gihand cihê aşxaneyê, du hevalên jin xwarin çêdikirin. Navê wan hevalan heval Zaxo û heval Evîn bû. Dema em dîtin, hatin em pêşwazî kirin û bi dileke germ û bi coş gotin; "hûn bixêr hatin." Me jî keyfxweşi li wan hevalan da. Ji me re çay anîn, çaya wan pir bitam bû. Diyar bû ku heval xwarinek pir xweş çêdikin. Erkdarên rojê agahdarî dabûn heval Fuat. Wî jî gotibû, "piştî perwerdê emê hev bibînin." Dema navbera nîvro hat dayîn, heval ref bi ref ji aliyê dibistanê ve dihatin. Weke bilbilan û bazan bûn, mirov ji evîna wan têr nedibû, ew qas hêja û delal bûn. Xwarin li ser sifrê hatibû danîn. Xwarina wan ew qas tamxweş bû, min xwe negirt, kevçik hilda destê xwe û dest bi xwarînê kir.

Hevalan jî dest bi xwarinê kirin. Hingê xwarina hevalan xweş bû, min heta dawiyê bi wan re berdewam kir, zikê min nepixî lê ne di xema min de bû. Paşê heval Fuat banî min kir û ez çûm gel hevalan. Dema min dît, dikarim bêjim Zerdeşt bi xwe bû. Min destê mamoste girt, me keyfxweşi da hev. Pişt re li kêleka wî, li ser kevirekê rûniştim. Vê kêliyê coş û xurûşek bêhembpa bi min re çêkir. Heval Fuat jî diaxivî. Gotinên wî pir watedar, felsefî û giranbiha bûn. Bi qasî sê rojan li wir mam. Paşê wî jî ez neşkandim û daxwaza min paş de nezivirand.

**Mamosteyê Min**

Ez nexweşê dîtina mamosteyên xwe me
Ji nişka ve diyar bû dê herim li gel evîndar

Li pêşiya min derket şalûl bilbil teyrê baz
Ez hatim ji bo min bide dermanê nexwaşan

Sond dixwim bi navê şehîdan û Rêberê Kurdan
Agirê we pêxistî xwe gihande erd û ezmanan

Kurdistan biheşte lê dixwîne zarokên Ariyan
Dibistan we mizgîne pêxistine find û şemal

Ji bo xebatek wêjeyî min li gel heval Fuat (Alî Haydar Kaytan) ku yek ji avakerên PKK'ê ye, li ser bingehê nivîsandina jînameya wî hevdîtinek çêkir. Destpêkê, ji ber ku hevdîtinek, derfetek wisa ji min re naskir, ez jê re spas dikim. Dema min naveroka daxwaza xwe bi heval re parve kir, heval jî wisa dest bi vegotina jiyana xwe kir:

"Ez ji Dêrsimê me. Di nasnameyê de ji dayîkbûna min weke 26'ê Adara 1952 hatiye nivîsandin. Lê ev dîrokek ne sedî sede. Li gorî ku dayîka min digot, ez nêzîkî sersala 1951'an hatime cîhanê. Dayika min û bavê min piştî vegera ji surgûnê zewicîne. Gundê me destpêkê girêdayî navçeya Nazimiyeyê bû, lê ez hema wê yekê bibêjim, dayîk û bavê min dema ku ji surgûnê vegerêyan, ji ber gundê wan yê esasî di nav herêma qedexe de bû û ev qedexe hê jî berdewam dikir, nekarîn biçin gundê xwe. Gundeke girêdayî navendê bi navê Bîrman hebû, li wir bicih bibûn.

Ez li wir hatim cîhanê. Paşê biryara qedexeyê li ser herêma ku gundê me jî di nav de rabû û ew jî êdî diçin gundê xwe Hengirwanê. Hengirwan navek Ermenî ye, ez bawerim berê Ermenî tê de bicih bûne. Min ev mijar bi Hozan Aram re jî cure kiribû. Wî jî gotibû; 'Hengirwan tê wateya cihê kortik.' Jixwe gundê me jî li ser çiya ye, lê ciheke mîna kortikê ye. Yanî çêbûna rû erdê wê jî navê wê piştrast dike. Malbata min li wî gundî bicih dibe. Qasî ku tê bîra min, ez wisa dizanim ku cihê ez lê bûme û tê de mezin bûme, ew der e. Berê wê jiyana min ya li gundê Bîrman nayê bîra min."

Malbata min girêdayî eşîreta Heyderan e. Eşîret, di serhildana 37-38'an de yek ji eşîretên berxwedêr ên sereke ye û wisa jî tê naskirin. Navê dayîka min Gulîzar, navê bavê min Elî ye. Çar ji wan keç, sê jî kur bi giştî em heft xwîşk û bira ne. Malbat ji hêla aborî ve, malbateke mirov dikare bêje xizan bû. Jixwe di gund de malbatên ku asta xizantiyê derbas dikirin tunebûn. Serokê eşîreta me bixwe jî, ji hêla aborî ve ferqa wî û malbatên din yên eşîretê tutunebû. Dayîk û bavê min ji heman eşîretê û ji heman qebîleyê ne, yanî xizmên hev in. Bavê dayîka min, bi biraziya serokê eşîretê re pevjîn bibû, yanî dayîka min ji malbata serokê eşîretê tê. Bavê min hinek din jê dûr e. Malbateke bi rûnê xwe diqijire ye. Jixwe bavê min piştî ji surgûnê vegeriya, weke karkerê demsalî li Edene û cihên din kardikir. Pişt re bi giranî li Stenbolê xebitî. Debara malbatê bi karkirina bavê min pêkdihat. Dîsa malbatê bi xwedîkirina sewalan debara xwe dikir. Jixwe li gund biqasî ku têra gundiyan bike qut û zad ji çandiniyê dernediket. Yanî genim û zadên din hertim ji der ve dihatin kirîn. Ji vê hêlê ve pêkanîna debarê bi giranî bi xwedîkirina sewalan çêdibû. Gund bi malbatên weke em dizanin yên ku hejmareke zêde heywanan xwedî dikin pêknedihat. Mezrayên gund jî hene, bi mezrayên wê re nezîkî 30-35 mal bûn. Gund ji çend qebîleyên biçûk pêkdihat. Di 1938'an de, ji ber sedema tevkujiyê eşîreta me ji şêniyên xwe qismek mezin windakiribû. Jixwe niha eşîret zêde li holê nemaye. Gund belav bû, bi erdê re kirin yek, her malbatek bi derekê ve çû û derbeder bûn. Ji ber wê eşîret zêde li holê nema. Jixwe bi têkoşînê re girêyên eşîretê hema bêje heliyan.

Dayika min di dema têkoşîna 1937-38'an de şeş salî bûye. Bavê min hinek din mezin bû û derdorê 11-12 salî bûye. Dayîka min di dawiya sala 1938'an de ber bi payîzê ve bi dayîk û hinek kesûkarên xwe re di

serdegirtinekê de dîl ketibûn. Di komkujiyê de gelek kes hatibûn kuştin. Yên weke dîl dihatin girtin jî hejmarek kêm bû û piraniya wan hatibûn kuştin. Êrişên xwe bigiştî li pişt gundê me pêktînin. Wê demê Abdûlah Alpdoganê ku komkujî bi rêve dibir jî li wê herêmê bû. Bavê dayîka min, yanî bapîrê min wê demê nayê girtin. Ew, yek ji têkoşerên girîng ê eşîretê bû. Dema ku hevjîna wî û zarokên wî dîl dikevin, ew jî teslîm dibe. Alpdogan wî pêşwazî dike. Pişt re bi wî re hevdîtinan pêktîne. Li ser bingehê ku biçe apê xwe qanih bike û bîne teslîm bike, soz jê re dide ku ziyanê negihîne wan. Jixwe êdî wê demê biryara qirkirin û komkujiyê ji holê rabibû. Yên ku şûnde mabûn bermahiyên şûr bûn. Ji beriya hingê, yên ku hatibûn girtin hemû bi destê wî hatibûn kuştin. Bapîrê min soz digre ku neyê şopandin û bi yekî din re diçe cem apê xwe. Ji apê xwe re dibêje; 'biryara qirkirinê bidawî bûye, kuştin xilasbûne, ger teslîm bibin hûn wekî fizîkî ziyan nabînin, lê yên ku tevlî têkoşînê bûne wê bişînin surgûnê.' Kurapê wî jî li gel apê wî ye û wî li pêşiya apê wî bertek nîşan da û got; 'ji bo jina xwe tu çû û te xwe firot. Tu wê me jî bifîroşî dewleta Tirk?' û bidûvikê tifenga xwe derbeyekê li nava milên wî dixe û ew kesê ku bi bapîrê min re çûyî jî birîndar dike. Ew birîndar direve û xwe xilas dike. Bapîrê min dizivire gund û dibêje 'apê min teslîm nabe.' Lê pişt re ew jî tu rêyên din nabînin û di rojên dawî yên sala 1938'an de teslîm dibin.

Yên dîl hatin girtin, hemûyan qefîle bi qefîle dibin Elezîzê. Li Elezîzê wan hemûyan li cihekê kom dikin. Bêguman tiştên ku li wir tên kirin tam hovîtiye. Destpêkê li cihekê kom dikin û dixin qarantînayê. Cil û bergên wan ji wan dikin û dişewitînin. Por û rihê wan diqusînin. Tê zanîn, zilamên Elewî piranî simbêlên xwe jê nakin. Simbêlên piraniya wan jê dikin. Bapîrê min li simbêlên xwe dieliqe û nahêle jê kin. Pişt re wana her yekê li gorî qanûna Îskana Mecbûrî dişînin cihekê. Her malbatekê dişînin ciheke cuda. Tenê endamên malbatekê bi hev re dişînin heman cihî. Ez bawerim ji bapîrê min dipirsin, ka dixwaze biçe kû derê. Ew jî dibêje; 'ciheke bilind, hênik û sar be, wê baş be.' Wî dişînin quntara Erciyesê. Li gundeke girêdayî Tomarzê yê navçeya Kayseriyê digrin Mecbûrî Îskanê. Demeke dirêj li wir dimînin, jiyana wan bi êş derbas dibe. Gelê xwecihiyê wir ji bo yên ku hatine surgûnkirin ne xirab bûne. Nêzikatiyên wan hinek baş bûne. Lewma bêyî ku zehmetiyan bikişînin, dikarin xwe bi nasnameya xwe ya cuda bidin pejirandin. Tevî ku armanc

Tirk kirine jî, li rastî nêzîkatiyên wisa yên gundiyan nayên. Lê derketina derveyî cihê lê dijiyan girêdayî desturê bû. Heta destur negirtibana, nepêkanbû bikaribin derkevin ji derveyî herêmê ango gundê lê dijiyan. Buyereke bapîrê min behsê dikir hebû. Li wî gundî malbatek ji Hozatê yan jî ji Ovacikê jî dibe hatibû bicihkirin. Malbateke pir berxwedêr û têkoşer bû. Keseke navê wî Qop Axa ji ber bîhîstibû ku bapîrê min teslîm bibû, li hemberî bapîrê min gelek bi hêrs bû. Lê dîsa jî ji bapîrê min re digot; 'ezê birevim.' Du hevserên wî hebûn. Malê xwe, li ser malbatên wir yên Kurd belav dike û bi gelek zehmetiyan diçe Dêrsimê. Xwe di şkeftekê de bicih dikin. Esker dikevin pey wan û di şkeftê de tên dorpêçkirin. Teslîm nabin û li ber xwe didin. Piştî tên kuştin serê wan jê dikin û dibin Kayseriyê. Li wir nîşanî malbatên hatine surgûnkirin dikin û gef li wan dixwin û dibêjin; 'yên ku birevin, wê dawiya wan ev be.' Bi wî awayî gefê li wan dixwin.

Bi qasî heft heşt salan li surgûnê dimînin. Pişt re efû derdikeve, yên ku dixwazin êdî dikarin vegerin cihên jê hatine. Li surgûnê ji bo çandiniyê bikin ji her malbatekê re hinek erd hatibû dayîn. Ew erd bê tapû bûn. Ji ber wê yekê jî dema ku bizivirin, tu malê wan tutunebû ku bikaribin bi xwe re bibin. Pir kêm malbat dimînin, piraniya wan dizivirin Dêrsimê. Wê demê bavê dayîka min, yanî bapîrê min bi malbatê ve dizivirin Dêrsimê. Dema tên Dêrsimê, li Dêrsimê herêma Heyderan û çend herêmên din weke 'herêmên qedexe' hatibûn diyarkirin. Li wan deran bicihbûyîn hatibû qedexekirin. Ji ber wê endamên eşîreta me, li qadên nezîkî navenda Dêrsimê bi awayeke belave di nava eşîretên din de bicih bûn. Pişt re dema ew qedexe rabû, vegeriyan gundê xwe. Dema ku hatin, tu tiştê wan tunebû. Gundên wan hatibûn wêrankirin. Her der hatibû şewitandin û xirakirin. Hema bêje ji tutunebûnê, ji sifrê jiyaneke nû ava dikirin. Vegera li axa xwe ji bo wan çavkaniyeke pir mezin yê keyfxweşiyê bû. Vegera axa dayîkê, axa bav û kalan, ji bo wan wateyeke pir mezin raber dikir. Ji ber ku girêdaneke pir mezin ji axê re hebû. Ji zaroktiya min tê bîra min, li tu deran girêdayîna mirovan a ji bo axê heyî, bi qasî wir min nedîtiye. Wekî mînak; li Dêrsimê rewşa ku niha tê jiyîn tam berevajiyê wê yekê ye. Yanî hewayeke yên niha wisa heye; weke ku bixwazin xwe ji axeke lenetî xilasbikin, jê direvin. Ev jî datîne holê ku hestên bi komkujiyê hatine tepisandin bi rêbazên cuda çawa dikare bibe dijberê xwe.

Rewşa malbata bavê min hinek din cudatir bû. Bavê min di dema pêvçûnekê de ji qefîleya xwe qut dibe. Piştî qut dibe, dimeşe û xwe digihîne ciheke aliyê Pûlûmûrê. Li Pûlûmûrê diçe gundekê. Li Dêrsimê di derbarê hemû gundan de biryara qirkirinê tutunebû. Hinek eşîretan di dema serhildanê de biryara bê alîtiyê girtibûn. Ew biryara wan ji aliyê dewletê ve jî dihat zanîn û ji ber wê yekê jî ew eşîret li derveyî biryara qirkirinê hatibûn hiştin. Mînak; hinek cihên Nazimiyê, hinek cihên Mazgîrtê û dîsa di derbarê qismeke mezin yê Pûlûmûrê de biryara qirkirinê tutunebû. Biryara qirkirinê di derheqê eşîretên diyar de hatibû girtin. Ev jî eşîrên Heyderanî, Dêmananî, Ebbasanî, Bextiyaranî û hwd bûn. Dema bavê min diçe wî gundî, xwe dide naskirin û li wir malbatek lê xwedî derdikeve. Diçe daîreya nifûsê û ji xwe re nasnameyek ya şêniyê jî derdixe. Ji ber wê yekê jî paşnavê bavê min yê berê Yilmaz, dibe Alî Yilmaz. Piştî ku rewş asayî dibe, bavê min paşnavê xwe digihere û bi paşnavê birayê xwe re dike yek. Bavê min wê demê 13-14 salî bûye. Malbata wî êdî xeberê jê nagirin. Ew jî nikare xeberî ji malê bigire. Hay jê dibe ku malbat hatiye surgûnkirin, lê nizane şandine ku derê.

Di sala 1939-1940'an de rêya tirênê hat Mutuyê. Mutu tirivgeke ku rêya Erzingan, Erzirom û Pûlûmûrê lê dibe yek û rê ji wir diçe Erzingan û Erziromê. Ez bawerim bajarokeke girêdayî Erzinganê ye. Bavê min bi qaçaxî li tirênê siwar dibe û diçe Stenbolê. Piştî diçe Stenbolê di karên cuda de dixebite. Ciwaneke ku dixwaze di wî temenê xwe de xwe li ser linga bigre ye. Jiyanek wî ya pir balkêş çêdibe. Ciwaneke bi wî temenî bêyî ku ziman bizanibe û cihekê nasneke, bi serê xwe li bajareke weke Stenbolê bikaribe bijî û xwe li ser lingan bigire, rewşeke balkêşe. Ew dihêle ku bawerêya wî ya bixwe peşbikeve, di jiyanê de bipije û bixwe bawer be. Piştî demekê bavê min digrin eskeriyê. Dema digrin eskeriyê, li wir, li yên ji Dêrsimê digere û wan dipirse. Yek derdikeve û dibêje; "ez ji Dêrsimê me." Navê wî jî Xidir Kaplan e. Xidir Kaplan ji gundê bavê mine. Heta ji dûr ve dibe xizmê me. Bavê min wê demê malbatên gund û eşîretê pirs dike û cara yekemîn di derbarê wan de agahiyan digire. Hayîl dibe ku dayika wî û xwîşk û birayên wî ji tevkujiyê sax filitîne û ji Eskîşehîrê re hatine surgûnkirin.

(Dema min zanîngeh dixwand ez çûm Sîvrîhîsarê, gundê ku çûbûnê min ew dît; gundê Îstîklalbax. Apê min hê jî li wir bû. Navê wî Yûsûf e, li derdor weke Yûsûfê Kurd tê naskirin, lê tevî ku zarokên wî jî weke

zarokên Yûsûfê Kurd tên naskirin, tu eleqeya wan bi Kurdbûyînê re nemabû. Mesela devokê ku pê dipeyîvîn jî şibiyabû devoka wê derê; mînak şûna ku bêjin ‘bavo’, dibêjin ‘biba’)

Bavê min diçe wir, bi malbata xwe re tê cem hev û li wir dimînin. Piştî biryara surgûnê ango qanûna ‘Mecbûrî Îskan’ radibe, ew jî dizivirin Dêrsimê. Bi bapîrê min re di heman malê de dimînin. Piştî demekê bavê min û dayîka min pevjîn dibin û ez weke zarokê wan yê yekemîn têm Cîhanê. Bavê min miroveke balkêş bû, weke ku min got, di nava jiyanê de pijiya bû. Kesayeteke bikerb (bihêrs) bû. Leqebên cuda yên bavê min hebûn; yek ji leqebên wî toz raker (toz koparan) bû. Jê re digotin ‘dobraci’ (gotinlirû) jî. Mirovek vekirî bû, di hundirê wî de çi hebûya derdixist der ve, ji gotina xwe xwe ne dida paş. Wê yekê dihêla ku hem bê hezkirin û hem jî tirsek li hemberî wî hebe. Yanî mirov li hemberî wî du hest bi hev re dijiya. Lê dîsa jî kesayeteke wisa bû ku piranî dihat hezkirin û rêzdarî jê re dihat girtin.

Ji zaroktiya min tê bîra min, li gund dawet çêdibûn û em jî diçûn wan dawetan. Ji ber ku bavê min piranî ji der ve kar dikir, dema ne li gund ba, di dawetan de nedihiştin ez bi zarokan re xwarin bixwim û ez dibirim di cihê wî de didam rûnişkandin. Ji min re digotin; ‘wa cihê bevê te ye, tu wê li vir rûnî û xwarin bixwî.’ Piştî tevkujiyê jiyanek nû dihat afirandin. Wî jî di nava wê jiyanê de çavên xwe li cîhanê vekiribû.

Ji zarokatiya min ya ku tê bîra min, di jiyana rojane de li ser tevkujiyê pir nedihat axaftin. Xaniyên me yên yek qatî hebûn. Hinek jî dişibiyan van mangên me yên em li çiya çêdikin, wisa sade bûn. Heta mirov dikare bêje xwezayî bûn. Derfetên çêkirina xaniyên du qatî tutunebûn. Pir şûnde çêkirina xaniyên du qatî destpêkir û bi salan pişt re malbata min karî xaniyek du qatî çêbike. Jixwe di van xaniyên yek qatî de jiyîn zehmet bû. Ji ber ku pir berf dibariya, ew xaniyên yek qatî di bin berfê de diman. Enceq malên du qatî dikariyan li hember berfê xwe biparêzin. Min hîs dikir ku jiyanek nû tê avakirin. Nexasim di ciwanan de coş, heyecan, keyfxweşiya jiyanê û girêdayîna wan ji bo nirxên wan pir zêde bû. Lê dîsa jî ya herî zêde tê bîra min, keyfxweşiya wan a jiyanê bû. Her çiqas bandorên qirkirinê dewam dikirin jî, vegera axa bav û kalan mijara gotinê bû û li wir jiyanek nû dihat avakirin. Jiyaneke nû; çi dibe bila bibe jiyanê hê jî berdewam dikir. Ya herî baş jî ew bû ku jiyanê li ser axa me berdewam dikir. Ji ber ku kok li wir bû, her

çi qas qebrên wan tunebin jî, miriyên me li wir bûn. Yanî bi kokên xwe re, bi mekanên ku kokên wan lê bûn re ji nû ve dihatin gel hevdu. Hezkirina jiyanê ya wê demê û ya demên pey wê tên ez dixim ber hev, hezkirina wê demê zêdetir bû. Ew ferq pir watedar e. Kêmbûyîna hezkirina jiyanê bi "xerîbketin" û ji kokên xwe qutbuyînê ve girêdayî ye. Wan deman têkiliyên di navbera mirovan de germ bûn. Jixwe di nava eşîretê de, hema bêje herkes bi hev re xizmin. Herî kêm hestek bi vî awayî hebû. Têkiliyên yekser hebûn. Çawa ku li tevahiya gundan hebû, li gundê me jî jiyaneke komunal hebû. Di kar de bi hev re karkirin esas bû. Dîsa piştgirî, destekdayîna hev rêzik û pîvanek bingehîn a jiyanê bû.

Li gundê me pir berf dibariya. Navê gundê me bi Tirkî kirine Karagöl (gola reş). Ji ber li gundê me pir berf dibariya dema ku ez mezin bûm, min got navê gundê me şaş lê kirine, diviya bû navê gundê me kiribana "Kar gölü" (gola berfê). Bi qasî 8-10 metre berf dibariya. Ew rojên bi berf carna dibûn bahoz û bakurofe û te bi rojan nedikarî lingê xwe bavêjî ji der ve. Tu metreyekê derketiba ji der ve, te nedikarî şûnde vegerî û dûbare dîtina derî jî pir zehmet bû.

Ji ber ku bavê min her tim li xerîbiyê bû, ez tim li gel dayika xwe bûm. Me, hatina bavê xwe ya li malê bi keyfxweşiyeke mezin pêşwazî dikir. Hatina wî di heman demê de dihat wê wateyê ku rewşa malê ya aborî jî hinek sererast bibe. Dema bavê min cara yekemîn ji min re şalek kirîbû, tê bîra min. Dîsa solên lastîk yên rengê sipî hebûn, cotek ji wan solan û gogeke sor ji min re anîbû. Ew yekemîn xelatbûn ku min di jiyana xwe de girtibûn. Ew, bûyereke ku min di jiyana xwe de tu caran ji bîr nekirî ye. Dema ez dimeşiyam şal li hev diket û deng derdixist, ew deng hêjî di guhên min de ye. Bavê min neçûbû dibistanê, lê li eskeriyê fêrî xwendin û nivîsandinê bibû. Tê bîra min, dema bavê min dihat malê pirtûkên çîrokan bi xwe re tanîn. Çîrokên gelêrî yên weke Asli-Kerem, Ferhad-Şîrîn, Leyla-Mecnûn û hwd. Ji wan çîrokên bi xwe re tanî bi şevê li malê dixwendin. Dema ku bavê min dixwend, dayîka min jî digiriya.

Bavê min yekî bihêrs û xuliqteng bû. Ez niha rewşa wî ya bihêrs fêhm dikim. Nakokiyên di nava jiyanê de zû ferq dikir, lê ji bo çareserkirina wan zelal nedibû. Ew rageşî dibû sedem ku bavê min yeke hêrsokî be. Carna dema hêrs dibû, hêrsa xwe li serê diya min derdixist. Ji ber wê yekê, diya min ji bavê min ditirsiya. Lê dîsa jî, li ser bingehê

hezkirinê zewicîbûn. Ji ber wê yekê destpêkê germahî, hezkirin û sempatiyek hebû.

Demek şûn de, wexta ku dayîka min tundiya bavê min tîna bîra wî, çavên wî tejî dibûn û kela giriyê dikete qirika wî. Yanî jovaniya xwe bi wî şêweyî tanî ziman. Tevlîbûna min ya ji bo têkoşîna şoreşgerî li ser jiyana wî jî bandor kir û guhertin pê re çêkir. Rastî jî, bû kesayetek bêhtir demokrat. Bavê min miroveke pir kedkar bû. Şêweyek jiyanê ya pir balkêş a gundê me hebû. Dema tê gotin gund, kedkariya mirovan ya pir zêde tê bîra mirov. Mirovên gund sibehê demjimêr çar diçûn ser kar û dema roj diçû ava, bi awayekê westiyayî ji kar vedigeriyan. Jiyan ji dubareyek bi wî awayî pêk dihat. Ez ji pênc-şeş saliya xwe ve, di temeneke biçûk de tevlî pêvajoya kedê bûm. Bêhtir tevlêbûneke bitirsê bû, yanî ne ji dilxwaziyê bû.

Taybetmendiyeke bavê min yê balkêş hebû. Dema hêrs dibû, dixwest bi kesekê re şer bike. Ji bo ku ez ji xew rabim, bi dengek pir nizim banî min dikir. Dema ku du caran dubare dikir, ji ber ihtîmala ku li min bixe, ez weke eskerekê ji nav cih difiriyam û radibûm. Çi qas bi dengeke nizim banî kiriba bila bang bikira, bi dengê destpêkê ez ji xew radibûm. Tişta her tim digot ev bû; ‘ku em nexebitin, emê birçî bimînin. Di vê cîhanê de kesê ku ji me re bixebite nîne û em bi keda xwe jiyana xwe didebirînin.’ Min jî xwe amade dikir û ez pê re diçûm kar. Kar evbûn; giya dirûn, karên bax û baxçe, xwedîkirina heywanan û komkirina êzingan. Rastî jî me sibehê destpêdikir heta tarîtiya şevê, bêyî ku em bisekinin em dixebitîn. Em pir diwestiyan. Lê pêwîste ez vê yekê bi girîngî bêjim; pişt re min baş fêmkir ku di wê jiyanê de bêxîretî û tembeltî qet tutunebû. Bêxîretî û tembeltî ya koleya ne, kole bêxîretin. Mirovên azad rastî jî mirovên xebatkarin.

Di nava jiyana wir de kêm be jî azadiyek hebû. Mirov dikare ji jiyana wir re bêje ‘gundîtiya azad.’ Tu mudaxele ji der ve li ser jiyanê nedihatin kirin. Ji wê hêlê ve jî têgîna westiyanê rastî jî têgîneke biyanî ye. Piştî demekê şûn de tevlêbûna bitirs ya ji bo xebat û pêvajoya kedê, ji ber ku kar û xebat veguheriye fêrbûnê, mirov bi keyfxweşî û dilxwazî tevlî wan kar û xebatan dibûn. Piştî demekê bi wî awayî derbas bû, hema bêje ez û bavê xwe ji bo kar û xebatê diketin nav pêşbirkekê. Di gundê me de giyayek hebû, me jê re kerkol digot. Dema mirov wî giyayî jê dike, digire bin çengê xwe ji wî giyayî şîreke bi jehr diherikî. Ew şîr di milê mirov de

diherîkî heta digihişt bin milê mirov. Dema ku bi xuhê re dibû yek tevlî laşê mirov dibû û peqpeqokên avê komdikirin. Ev peqpeqok hema bêje biqasî liba tirî bûn. Lê tevî wê yekê, kesê nedigot ez naçim kar û xebatê. Lûksa tu kesî ya wisa tunebû û fikreke wisa nedihat aqlê tu kesî. Yanî kesê nedigot ez nexweşim, ezê îro biçim doxtor, baş bibim paşê biçim ser kar. Tiştek wisa tunebû. Piştî demekê ew peqpeqok diteqiyan û êdî laşê mirov fêrdibû. Jiyaneke balkêş bû. Esas dema ez wê jiyanê û wê kedê bi jiyana partiyê re didim ber hev, bi xemgînî ez dibînim ku em zêdetir bêxîretî û tembeltiyê dikin.

Ji ber ku ez zarokê destpêkê yê malbatê bûm, hinekî cudahî ji bo min hebûn. Zarokê kur yê destpêkê bûm. Piştî min du xwîşkên min çêbûn. Rastî jî di malbatê de, di navbera keç û xortan de tu cudahiyeke wisa zêde tunebû. Bi giştî ji bo zarokên keç jî hezkirinek hebû. Keç wisa weke "zarokên nayên xwestin" nedihatin îlankirin. Lê dîsa jî, ji ber ku di malbat û eşîrê de ji ber sedema çanda baviksalarî zarokên xort dihatin xwestin. Têkiliyên min bi dayîka min re hinek din cuda bûn. Dema ku em bûn heft zarok jî ji min re digot; "ew hemû li aliyekine, tu tenê li aliyekê yî." Li gel xwîşk û birayên min jî heman tişt digot.

Ez yeke pir bi tevger bûm. Rûyê min her tim li der ve bû. Carna min zirar dida malê gundiyan, min giyayê wan belav dikir. Ji ber wê jî min gelek caran lêdan dixwar. Bi taybet jî min ji bavê xwe lêdan dixwar. Carna diya min jî hewil dida ku li min bixe. Lê min bi zimaneke nerm ew dida sekinandin. Tevî ku dayîka min nedikarî şîdeta bavê min bide sekinandin û carna sîle jî li min dixist, têkiliyên min bi dayîka min re tu carî xirab nedibûn. Tevî ku ez di jiyana xwe de weke kesayetek bi hêrs dihatim naskirin jî, nayê bîra min di hemû jiyana xwe de min carekê jî dengê xwe li hemberî dayîka xwe bilind kiribe. Dema ez dipeyîvîm, min dengê xwe bilind nedikir. Ez hinek din ji bavê xwe ditirsiyam. Carna min îtîraz li bavê xwe dikir, lê tu caran min di îtîraza xwe de israr nedikir. Ji ber ku min dizanî encam nagire. Têkiliyên min bi xwîşk û birayên min re pir başbûn. Xwîşk û birayên min her tim ez dişopandim. Tiştên min digotin, dipejirandin. Lê bi xwîşka apê min re hertim nakokiyên me çêdibûn. Dema ku di navbera me de pirsgirêk çêdibûn, di cih de gazindên min li gel dayîka min dikir. Destlêdaneke minê herî sivik jî, weke ku lêdan xwariye nîşan dida. Ew jî dibû sedem ku ez jî lêdan bixwim. Ji ber wê yekê jî di navbera me de hertim tengezariyek hebû. Ez

bawerim di navbera her du xwîşk û birayên yekemîn û yê duwemîn de hertim pirsgirêkên bi vî awayî derdiketin. Xwîşk û birayên min yên din bêhtir eleqe nîşanî têkoşînê didan, lê ew xwîşka min bû mamoste. Dema li dibistana mamostetiyê bû, ew jî bi siyasetê re eleqeder bû. Li dibistana mamostehiya keçan a Ruhayê dixwend. Min bixwe bir wir û qeyda wê li wir çêkir. Pişt re ji dibistanê hat avêtin. Me serlêdan ji bo Şûraya Dewletê kir û Şûrayê ew biryar betal kir. Xwîşka min nekarî heta salekê biçe dibistanê. Pişt re dema ku biryar hat betalkirin, xwîşka min ne li Ruhayê, li Elezîzê dibistan berdewam kir. Pişt re jî mamostetî kir. Tenê ji bo ku li hemberî min bibe helwest, di salên xwandevaniyê de xwe weke sempatîzana çepên Tirk da nîşandan. Jixwe pir zêde têkiliyên me tunebûn, mamostetî dikir. Ez dizanim ku niha li Konyayê ye, lê ez bawer nakim bi siyasetê re têkildar be.

Ji bo xwîşk û birayên xwe yên din ez nikarim heman tiştan bibêjim. Birayeke min bi girêdayî çetecîtiya Ferhat- Botan, ya ku xwestin partiyê tasfiye bikin ji me qut bû û bi wan re tevger kir. Birayê min yê din niha di girtîgehê de ye. Sezayê hetahetayî lê hatiye birîn. Weke ku min got, xwîşk û birayên min bi piranî eleqeyeke nêzîk nîşanî min didan. Ev eleqe pişt re veguherî eleqeya ji bo tevgerê. Têkiliyên min bi wan re başbûn, rewşeke neyînî tunebû. Lê tu hewildanên min yên taybet ji bo wan tevlî têkoşînê bikim çênebûn. Vê yekê heta demekê rê li ber bêzariyên wan vekir. Dema ez li Almanyayê di girtîgehê de bûm, min nameyek ji wan re şand û bêhestiyartiya wan rexne kir. Wan jî di bersîva xwe de gotibûn; 'ma te çi daye me heta ku tu ji me bixwazî?' Rast digotin, mafê wan hebû. Jixwe pişt re min dengê xwe nekir. Îtîrazên wan di cih de bûn.

Xwîşkeke min niha gêrîla ye. Dema xwîşk û birayên min hê biçûk bûn, malbatê têkoşîn naskir. Ez bi Apocîtiyê tevlî jiyana siyasetê bûm û ketim nava qada siyasetê. Ji wê hêlê ve malbat her tim di nava siyaseta Kurdewariyê de bû û bi tevgera Apoyî re di nava têkiliyê de bû. Balkêşe, em wê demê li gundeke çiya diman. Mesela ji gruba destpêkê hevalên ku hatin mala me heval Kemal Pîr bû. Xwîşka min rêheval Kemal Pîr dîtiye. Dayîka min wan jî ew dîtine. Dîsa dayîka min Cûma Tak nasdikir. Her wiha hinek hevalên me yên din jî nasdikirin. Pêşketinên grubê yên li Enqerê, di nav de nebin jî, lê hevalên ku 1976'an li Dersîmê tevlî me bûn, bi wan endamên tevgerê re hev naskirin.

Gelek hêviyên malbata min, dayîka min, bavê min ji min hebûn. Dema ku ez çûm zanîngehê bavê min wisa xwe dihesiband ku gihiştiye hemû hêviyên xwe. Rastî jî yekane armanca bavê min ew bû ku zarokên xwe bide xwendin. Li gundê me dibistan tunebû. Min dibistana seretayî li gundê Hakîsê, bi navê Tirkî Buyukyurt, li cem malbateke ku koka wan xwe dispêre Ermeniyan xwend. Min dibistana seretayî li wir qedand. Pişt re ez tevlî ezmûnên dibistana şevînî bûm û dibistana navîn û amadeyî min li Erziromê xwend.

Min di sala 1971'an de ezmûnên çûyîna zankoyê qezenckirin. Di heman salê de ez çûm Fakulteya Zanistên Siyasî ya Enqerê. Bavê min li dijî wê yekê helwestek pir dijwar nîşan da. Şoreşgerên bi nav û deng yên wê demê Denîz Gezmîş û Mahîr Çayan bûn. Şoreşgerên ku di nava gel de navê wan herî zêde dihat bihîstin ew bûn. Ez salekê, du salan bi tevgera çep re di nava têkiliyê de bûm, min helwesta bavê xwe ya li hemberî wê yekê da ber çavê xwe û ez ji Enqerê neçûm. Ez di betlaneyan de jî qet nediçûm gund. Bavê min bi kesên ku dihatin Enqerê re xwe gihand min. Name nivîsandibû. Di nameya xwe de wisa gotibû; 'ez bavê te me, Denîz û Mahîr ne bavê te ne, şûna ku tu li pey wan biçî, pêwîste tu min guhdar bikî, min ked daye te, tu keda min vala derdixî, şûna tu dibistanê bixwînî, bi çepgerî û şoreşgeriyê tu keda min vala derdixî.' Yanî bi giştî naveroka nameyê di vê çarçovê de bû. Ji ber ku min xuy, xislet û taybetmendiyên bavê xwe dizanî, ez jî nediçûm gund. Yanî ez biçûma, me wê şer bikira, dibe ku destê xwe li min rakira. Êdî ez xwendekareke zanîngehê bûm û min nedixwest lêdanê bixwim. Pişt re bavê min mêze kir ez dest ji şoreşgeriyê bernadim, yanî di wê mijarê de bibiryarim û nikare min îqna bike, her wiha nikare tundiyê jî bi kar bîne, encam nagire û têkiliyên me wê bitemamî qut bibin. Lewma dest ji israra xwe berda. Ez bawerim wê demê hinek jî lêpirsîn kir. Mesela, ez di malbatê de li hember dayîk û bavê xwe her tim rêzdar bûm. Yanî min ji bo demekê tenê jî, ji rêzgirtinê qusûr nedikir. Wî jî dizanî. Wê demê vê yekê dibêje; 'ew zarok ne beredayî û serseriye, tu tişteke xirab jî nekiriye, ji me hezdike û girêdayî me ye jî, wê demê heger bi tişteke din ve hatibe girêdan, wateyeke wê heye, li wir jî nirxek heye û çûye bi wî nirxî ve hatiye girêdan.' Wê demê lêpirsîneke bi vî awayî dike. Jixwe pişt re vê bi eşkere îfade jî kir. Bavê min carna dihat bajêr, dema hinekan bavê min ji hev re didan naskirin, digotin; 'aha

bavê heval Fuad.' Bavê min digot; 'li vî dewir û zemanî binêre, berê kur bi bavên xwe dihatin naskirin, niha bav bi kurên xwe tên naskirin." Ji aliyekê ve jî ev rewş diçû xweşiya wî.

Bavê min bawer dikir ku em mafdar in. Di zanebûna eziyet û tengahiyên ku jiyankirin û zilma ku hatî kirin de bû. Dîsa dizanî ku em serî li hember neheqiyê radikin. Lê bawer nedikir ku emê ji wê dozê encam bigrin. Yanî bi bandora tirajediya ku jiyankirî, di wî de bêbaweriyek wisa hebû. Digot; 'ew qas tevkujî kirin, li hemberî wê yekê hûn tişteke baş dikin, lê hûn nikarin encam bigrin. Li hemberî we dewleteke ji berê qat bi qat bihêztir heye. Berê teyareyeke wan a pirpirokî dihat û digeriya, niha balafirên wan ên bi bombeyên bêhtir bi bandor barkirî, desteka wan a ji der ve, NATO û hwd. hene. Hûnê li hemberî wan çawa serbixin wê têkoşînê?' Di wê mijarê de, ev bê bawerêya xwe qet winda nekir.

Ez di sala 1980'yê de ji bavê xwe qut bûm. Weke îroj jî tê bîra min. 11'ê Mijdara 1980'yan bû. Ezê derketibama derveyî welat. Wê demê em demjimêrekê meşiyan û ez rêwî kirim. Dema herî dawiyê ezê jê qut bibama, min got; 'bavo, destê xwe bide min ez maç kim.' Got; 'dest maçîkirina çi, em hevalin. Ew li şûn de man.' Bi wî awayî ez rêwî kirim. Piştî ez jê qut bûm, bavê min hat girtin. Nozdeh rojan di hûcreyê de ma. Balkêşe, bavê min difikirî ku wê vebe û her tiştî biaxive. Ji ber vê yekê jî biryar digre ku zimanê xwe jê bike. Hingê li gel wî, mirovên wî yên ku wê bên tehliye kirin jî hebûn. Ji wan re dibêje; 'herin malê û bi malê re baxivin, bila ji min re cilan bişînin û di ciheke guncaw de jilêtekê veşêrin.' Dayîka min dibêje; 'wê tiraş bibe û rihê xwe jêke.' Lewma jilêtekê di nav cilan de vedişêre û didirû. Cil digihîjin destê bavê min. Roja nozdemîn ya girtina wî diçin ku bavê min bibin. Bavê min difikire ku gihiştiye sînorê dawiyê, pewîst dibîne ku plana xwe bêxe meriyetê. Dibêje; 'pênc deqîqe destur bidin min, ezê cilên xwe biguherim." Ew jî dibêjin; 'nepêwîste jixwe tuyê derkevî.' Bi wî awayî bavê min ji qutkirina zimanê xwe rizgar dibe. Ya rast, gelek tiştên ku bikaribe bêje jî tunebûn. Herî zêde dikarî cihê ku ez biçimê, bêje. Ew jî, ji ber ku sê roj bû ez di rê de bûm, her wiha cihê ku ez gihiştimê jî zêde zelal nebû weke agahî nedihatin nirxandin.

Kesayeteke bi wî awayî bû, nedixwest sirên xwe bide. Êşkenceyên wê demê yên 12'ê Îlonê bi rastî jî pir zêde bûn. Jixwe piştî wê girtinê

bavê min surgûn kirin. Ez bawerim yekemîn surgûna 12’ê îlonê bû. Surgûnî Afyonê kirin. Ew surgûn di jiyana wî de ya duyemîn bû. Li wir girtibûn bin îkameta mecbûrî û rojê sê caran diçû wajo dida. Bi tena serê xwe li wir dima. Pişt re dayîk, xwîşk û birayên min jî çûn wir. Zehmetiyên mezin jiyan kirin. Pişt re zavayê me li wan xwedî derketibû.

Piştî demekê derbasî Bursayê dibin û demeke pir dirêj li Bursayê dimînin. Bavê min di sala 1985’an de li Bursayê jiyana xwe ji dest dide. Bavê min dema ku li Afyonê bû, wesiyeta xwe ji dayîka min re dibêje; ‘ger ez li vir mirim, çi dibe bila bibe min li vir nehêlin. Dibe ku pereyê we ji bo mesrefa cenaze nebe, wê demê cendekê min bişewitînin û xweliya min bibin Dersîmê. Bila xweliya min teqez bigihîje Dersîmê.’ Wexta bavê min jiyana xwe ji dest dide, dibin Dersîmê û li wir dispêrin axê. Wê demê ji gel jî tevlîbûneke zêde çêdibe. Di mercên 1985’an de rewş rastî jî pir giran bû. Ez bi tesadûfî pê agahdar bûm. Ez bawerim sala 1986’an bû, rojekê rojnameya Serxwebûn hatibû. Serokatî rûniştibû, di destê wî de rojname hebû û pelên wê diqulipandin. Ez jî li pişt sekinî bûm û min jî rojnameya di destê wî de dixwend. Min mêze kir ku di rojnameyê de nivîseke bîranînê di derbarê bavê min de xuyakir. Di binî de jî nivîsandibû, ‘Gêrîlayên Dersîmê.’ Bi wî awayê tesadûfî ez agahdar bûm. Min hestek pir balkêş jiyan kir. Di Serxwebûnê de, di derbarê wî de derketina nivîsekê nîşaneyek bû ku berxwedêr bû. Min ew yek weke nîşaneyeke ku teslîmî dijmin nebûye bidest girt. Rastî jî ji êşê zêdetir min hesteke bi wî awayî jiyankir.

Dayîka min jinek cudatir bû. Berxwedaniya dayîka min belkî jî ji ya bavê min zêdetir bû. Ez vê gotina xwe ji bîranînek xwe derdixim. Ez zarokeke biçûk bûm, wê demê diçûm dibistana seretayî. Piştî ku bavê min bi bapîrê min re şer kir, me gundê xwe bi temamî berda. Em ji gund veqetiyan û çûn cihek din. Li Kutuderesiyê cihek bi navê Mirik hebû. Gundê ku Îbrahîm Kaypakkaya tê de hatibû girtin. Pêşberî wî gundî ciheke bi navê Çirtan hebû. Tenê malbatek tê de hebû. Em çûn û li cem wê malbatê bicih bûn. Ji salekê zêdetir li cem wê malbatê man. Li wir jî xwedîkirina heywanan hebû û giya dihat dirûn. Ji derveyî wê tiştek din nedihat kirin. Jixwe cihekî ku zevî tê de bê çandin tunebû. Giya li ciheke pir dûr dihat dirûn û bi pişt û bi hêstiran dihat anîn.

Li pişta bavê min barê giya, di pêşiyê de dimeşiya. Dayîka min jî bar li piştê bû, ew jî li dawiyê dimeşiya. Di navbera herduyan de hêstir

hebû. Dema ku hêstir evraz diçû, pehînan avêt. Wê demê bavê min banî dayîka min dike û jê re dibêje; 'kurêya wê bigre, tu kurêya wê bigrî hêstir pehînan navêje.' Dema ku dayîka min destê xwe dirêj dike û dixweze kurêya hêstirê bigre, hêstir pehînekê davêje. Ji ber ku serê dayîka min xare, pehîna hêstirê li çeneya dayîka min dikeve. Tam rastî devê dayîka min tê û hemû diranên wê dişkêne. Dîsa her du lêvên wê diqelişîne. Min destpêkê dayîka xwe di wê rewşa bi xwîn de dît û ez reviyam. Encex piştî bîst û çar demjimêran dayîka min gihişt doxtor. Wê demê li Dersîmê doxtoreke bi navê Enwer Sabuncuoglu hebû. Ew bixwe Tirk bû, ihtîmale ku miroveke demokrat be. Ji dayîka min dipirsiya; 'kê li te xistiye?' Dayîka min dibêje; 'kesê li min nexist, hêstirê pehîn avêt.' Doxtor weke ku dîn bibe, hêrs dibe û dibêje; 'hêstir li sînga mirov dixe, li lingê mirov dixe, ango li ciheke din, çawa tam li ser devê te xist?' Dayîka min çi dike doxtor bawer nake. Dema doxtor bersiva ku dixweze nagire, banî hemşîreyan dike û dibêje; 'milê wê bigrin.' Êdî birînê qalik girtibû û di nava lêvên qeliştokî de diranên dayîka min xuya dikirin. Dayîka min ji hemşîreyê re dibêje; 'hûn zehmet nekin, ezê destên we bigrim.' Doxtor bi neşterê birînê dikole. Nêzîkî bîst kêliyan davêjê û wan hemûyan bêyî ku benc bikar bîne, dike. Ji hêrsa xwe wisa tevdigere, hema bêje dîn bibû. Dayîka min di dirêjiya wê paqijkirin û dirûtina birînê de, carekê jî nabêje of ango ax û carekê jî dengê nalînê dernaxe. Dayîka min ji me re wisa digot.

Carna dayîka min bi henekî ji min re digot; 'lawê min, sirên xwe zêde ji bavê xwe re nebêje, bikeve destê polîsan, wê vebe û sirên te bide dest. Lê bi kelpetan ji laşê min goşt jêkin, diranên min û nînukên min bikişînin, dîsa jî ez yek sir nadim destê dijmin.' Esas di wê mijarê de cidî bû, yanî henek nedikir. Rastiyeke wê ya wisa hebû. Jixwe pişt re çend caran ket girtîgehê û her carê wisa baş jî li berxwe dida.

Girêdana dayîka min a ji bo têkoşînê hinek jî ji malbata wê dihat. Apê bavê wê ku di heman demê de serokê eşîreta me bû, li herêmê weke kesayeteke pir berxwedêr dihat naskirin. Jixwe yek ji kesayetên girîng yê berxwedaniya 1937-38'an bû. Li ser tirba wî nivîsek hebû. Wan deman çepgirî û şoregerî tunebû. Ji ber wê yekê ew nivîsa li ser tirba wî, hem bala me dikîşand hem jî heyraniya me. Tirba wî li quntara çiyayekê, li ser girekê bû. Dema mirov ji wê derê li derdor mêze dikir, silsila

çiyayan û rêze çiya xuya dikirin. Hevoka li ser tirba wî hatî nivîsandin wisa bû; ‘Demekê ev çiya di bin hukmê vî mirovî de bûn.’

Li herêma me gotinek balkêş heye. Kesayetên wek ‘bibext’ û ‘bêbext’ tên naskirin hene. Ew jî weke kesayeteke ‘bibext’ dihat naskirin. Yên ku xwe davêtin ber bextê wî, tu carî teslîmî dijmin nedikir, kî diba bila biba, yên ku ji bo dostaniyê dihatin cem wî, bi heman awayî pêşwazî dikir û tu carî îxanet li dostên xwe nedikir. Ji ber wê yekê, weke kesayeteke pir birûmet dihat naskirin û pir dihat hezkirin.

Di sala 1937’an de rayedarên dewleta Tirk yên li Elezîzê banî hemû serokên eşîretên Dersîmê dikin. Di rastiyê de bi navê hevdîtinê banî wan dikin. Seyîd Riza ew jî diçin wir. Hema bêje hemû serokên eşîretan bersîvek erênî didin wê vexwendinê û tevlî wê vexwendinê dibin. Hinek gumanên Seyîd Riza ji bo Elezîzê hebûn. Ji ber wê yekê jî ew dixwaze bi ser walîtiya Erzînganê re biçe. Dema ku diçe, li Mutuyê (ciheke di navbera Erzîngan û Pulûmûrê de ye) tê girtin. Dema ku tê girtin, ji wir dibin Erzînganê. Ji Erzînganê jî dibin Elezîzê. Ji beriya hingê, sozên ku jê re hatine dayîn hene. Dema ku ew soz nayên girtin Seyîd Riza dibêje; ‘hikumeta bê şeref û derewker.’ Yanî soz didinê, vedixwînin ji bo hevdîtinê, lê li wir tê girtin.

Du baskên eşîreta me hebûn û du jî serokên wan. Her du jî diçin, yek destpêkê diçe û tê girtin. Hemû serokên eşîretan yên ku diçin Elezîzê tên girtin. Serokê eşîreta me jî diçe, lê rastî jî zilameke zekî û hîşyar bû. Lîstok û hîleyên dewleta Tirk jî dizanî. Dema ku diçe Elezîzê dipirse, ka çi li serokên eşîretên din hatiye. Wê demê agahî digre ku hemû hatine girtin. Tavilê Elezîzê terk dike û bi veşartî xwe digihîne Dersîmê, qadên ku lê dijî. Yên din hemû hatin darvekirin. Yanî sih û neh kes hatin darvekirin. Serokê baskê din ê eşîreta me, Qamer Axa jî diçe Elezîzê û tê darvekirin. Wê demê yên ku li Elezîzê tên darvekirin, piraniya wan serokên eşîretan in. Bi xapandin û li ser bingehê hevdîtinan banî wan dikin, lê li wir digirin û sêdare dikin.

Hinek karekter û taybetmendiyên serokên eşîretan yên şerkirinê hene. Eşîret bixwe awayeke rêxistinî ya xweparastinê ye. Ji ber wê yekê aliyê eşîretê yê leşkerî jî heye û serokê eşîretê di heman demê de serokeke leşkeri ye jî. Dema ku wisa dibe, rastî jî bêhêz dikevin. Bê serok, bê rêber û bê pêşeng dimînin. Pêwîste mirov wê rewşê biçûk nebîne. Ew jî li gorî xwe û di nava pergala xwe de cureyeke serokatiyê

ye. Wan serokên eşîretan hemûyan tine dikin. Yek jî, di rastiyê de di sazûmaniya eşîretan ya li wir de aliyeke demokratîk heye. Heta di mercên wan rojan de li Dersîmê sîstemeke konfederalîst a ku nav lê ne hatiye kirin heye. Yanî konfederalîzma eşîretan heye. Hemû pirsgirêk bi hatina eşîretan ya li cem hev tên çareserkirin. Li mekanên guncav tên cem hev. Weke mînak; avzêmên Munzurê. Avzêmên Munzurê pîroz in. Mesela avêtina kevirekê ya li avê merasîma sond xwarinê ye. Ew tê wateya sond xwarinê û pirsgirêk bi wî awayî tên çareserkirin.

Serokê eşîretê yê esasî bapîrê dayîka min bû. Lê di pêvçûneke di navbera eşîretan de hatibû qetilkirin. Dema wisa dibe, birayê wî yê biçûk dibe serokê eşîretê. Bapîrê min, yanî bavê dayîka min bi apê xwe re hema bêje di temenekê de ne, lê apê wî dibe serokê eşîretê. Bapîrê min yeke şerker bû. Dayîka min taybetmendiyên xwe yên berxwedêrî hinek jî ji wir girtibûn. Karekterê wê berxwedaniyê rastî jî li cem dayîka min hebû.

Dema me li Dersîmê, li herêma xwe, li derdorê xwe ramanên şoreşgerî yên destpêkê tanîn ziman, hema bêje her kesê helwest nîşan dida. Helwest bi wî awayî bû; ‘wî gelî tevkujiyek jiyankir, hûn dixwazin dûbare bi vê tevkujiyê re rû bi rû bikin.’ Lê bapîrê min bi wê yekê şanazî jiyan dikir. Digot; ‘neviyê min wê doza me bidomînin.’ Yanî dozeke nivçe mayî heye û yên ku wê berdewam bikin derketine. Bi wê yekê şanaz dibû. Helwesta dayîka min li gorî ya bavê min kêmtir bû. Esas ew helwest ne asayî bûn. Pişt re malbat ji bo têkoşînê vebû. Derê malê ji bo hemû hevalan hat vekirin. Di heman demê de bûn xwedî sekneke ku temsîliyeta rêgezan bikin. Dem dem îlkeyên tevgerê tanîn bîra mirovan. Xwedî sekneke wisa bûn.

Hevaleke me yê hêja hebû, di nava têkoşînê de şehîd ket. Dema ku ez ji Dersîmê derketim, ew heval li ser xebatan radiwestiya. Li wir jinek dixwaze bi wî hevalî re bipeyîve. Ew jin li herêmê ji ber têkiliyên wê yên nebaş, nedihat pejirandin. Hevalê me bi qasî çar demjimêran pê re dipeyîve. Bavê min pir hêrs dibe. Dibêje; ‘çi pirsgirêkên wê hene, heta ku tu çar demjirmêran pê re cure bikî? Pirsgirêk çêdibin, pênc deqîqe, nîv demjimêr, herî zêde di demjimêrekê de tên çareserkirin. Tu şoreşgerî.’ Ev heval pir xemgîn dibe, hêrs dibe û digirî. Bi kelagirî ji bavê min re dibêje; ‘ezê guleyekê berdim serê te.’ Bavê min jê re dibêje; ‘tu dikarî min, tu şoreşgerî, dizanî şoreşger çawa jiyan dikin, tu baş dizanî.’

Birayên min dixwazin aram bikin, lê guhdar nake. Mirovê rastbêj bû. Rastî li ku bûya, wan rastiyan weke îlkeyên xwe dipejirand.

Sîstema bawermendiyê ya li gel me Elewîtî ye. Ji ber ku piştre min îslama sûnnî jî naskir, ez dikarim vê yekê bi asanî bêjim ku, birastî ji derveyî Ehlî Beyt û girêdayîna mezin ji bo mirovên Ehlî Beytê, eleqeyeke zêde ya Elewîtiyê bi îslamiyetê re nîne. Mesela Ezidîtî ji Elewîtiyê zêdetir nêzîkî îslamiyetê ye. Elewîtî rastî jî tişteke ji îslamê pir dûre. Di bingeh de tiştên din hene ku bi wan hundirê wê hatiye dagirtin. Ya di hundirê wê de tê jiyankirin, bi rastî jî cureyeke zimanê xwezayê, heta cureyeke anîmîzmê ye. Mesela li gel me, li gundeke bi navê Tewdaş ziyaretek heye. Ew jî ciheke pîroz yê eşîreta me ye. Sembola ziyaretê ‘marê reş’ e. Yanî marê reş ziyareteke, semboleke ku îbadet jê re tê kirin. Ango çavkaniyek, dareke qedîm û hwd. Pîroztiyên bi vî awayî hene. Pîroz û pîroztî bi giranî ji xwezayêne, piranî tiştên xwezayîne.

Ji rîtuelan re ‘cem’ tê gotin. Cem ji aliyê ‘Pîr’ ve tê meşandin. Pîr piranî ji eşîretekê tên. Eşîreteke bi navê ‘Kureyşan.’ Ne ji ber ku girêyên wan bi Qureyşiyan re hene, ev nav li wan hatiye kirin. Piştre ji aliyê dewletê ve ew yek hatiye manîpûlekirin. Ew hinek jî dişibin ‘Leviyên’ Yahûdîtiyê. Mesela di Yahûdîtiyê de Haham û Rahib her tim di nava wan de derdikevin. Pîrên Elewiyên Dersîmê jî her tim di nava heman eşîretê de derdikevin. Bi wan re eşîretekî din jî heye lê piranî Pîr ji nava wan derdikevin. Mesela her eşîret, her mirov nikare bibe Pîr. Ji derveyî wan eşîretan tu kes nikare Pîrtiyê bike. Pîr heye, Rehber heye û li jora wan jî Mûrşîd heye. Mûrşîd li jora Pîr e jî. Tê wateya ‘yê ku rê nîşan dide.’ Cem ne tenê rîtuelên dînîne. Rîtuelên dînî qismê wê yê destpêkê ye. Ya esasî kombuyîna civakê û niqaşkirina pirsgirêkane. Di wan ceman de herkes pirsgirêkên xwe tîne ziman. Pirsgirêk piranî yên exlaqî bûn, ne pirsgirêkên din bûn. Ji ber ku Pîr nedikarî pirsgirêkên aborî çareser bike. Jixwe ew ne erkê wî bû. Lê çareserkirina pirsgirêkên di nava civakê de dihatin jiyîn, Pîr dikarî çareser bike. Weke nimûne; ger kesekê derdor bêzar bikira, şer derxistibûya yan jî bi derdorê xwe re biketa nava pevçûn û tevilheviyan, ev dibû rojev û dihatin çareserkirin. Yê ku di derbarê wî/wê de gilî hebûya radibû ‘Dar’ ê. Rabûna ‘Dar’ ê cureyeke rabûna rexnedayînê ye. Em bêjin yê ku rabû Dar’ê, dikare bêje; ‘tiştên li ser min tên gotin nerastin’ û bi vî awayî di rewşa xwe de israr bike. Di wê rewşê de sezayê bihata dayîn, tecrîd bû. Pîr, li ser rewşa ku

derketiye holê dikare bêje; 'herkes bi wî/ê re bila têkiliyên xwe qut bike.' Tu kes heywanên xwe tevlî heywanê wî/ê nake, di karê wî de alîkariya wî nake, dema qurbanan serjêdikin, nadin wî û ji qurbanên wî par nagirin. Yanî cewherê wê, tecrîda civakî ye. Di aliyê din de Pîr diçû û li ber deriyê wî kevirek diçand. Enceq Pîr dikare were wî kevirî biqulipîne. Ger kevir hat qulipandin, ev tê wê wateyê ku tecrît qediya ye. Wekî afaroza demî ye. Yê ku di tecrîdê de ye, jixwe li hemberî wê rewşê li berxwe nade. Yanî di gundekê de zehmetiya malbatek bi tena serê xwe jiyan bike, herî kêm qasî zehmetiya mirovek tena bi serê xwe jiyan bike ye. Dûrketina ji civakê rewşeke wekî mirinê ye. Yê ku di tecrîdê de ye, di dawiyê de jovaniya xwe nîşan dida û pirsgirêk bi wî awayî çareser dibû.

Yek ji rêbazên balkêş, rêbaza seza ye. Mesela mirovê ku pirsgirêk jiyankirî dibe ku jê bê xwestin gayekê serjêke. Heger ew bêje; 'ez bi gayê xwe cot dikim, ga ji bo min pêwîste', wê demê wê bê gotin bila ne ga, lê sêvekê bibire û sezayê wî dadikeve sêvekê. Bi Zazakî ji sêvê re 'sa' dibêjin û gotina ji bo wê rewşê tê bikaranîn jî ev e; 'ha sa ha ga ferq nake.' Dibêjin, bila sêvekî bide bes e. Yanî wisa bi sêvekê pirsgirêk tê çareserkirin.

Ez wan qet jibîr nakim. Taybetmendiyeke bingehîn ê wan ceman ew e ku ji aliyê xwe yê rîtuelên dînî zêdetir, hewildan û xwesteka parastina exlaqê civakê ye. Yek ji texrîbatên herî mezin ên çepgeriyê kiriye ewe ku di bin navê paşverûtiyê de, li dijî Pîrtiyê şerkirin û hilweşandina wê bû. Mesela di nava civakê de neyîniyên heyî li ser wê bingehê pêşketin.

Pîrtî, cem, cemaet, birastî jî mirov dikare wan weke saziyên pir girîng yên di nava civakê de binirxîne. Ji derveyî wan saziyan ziyaret hene. Çûyîna ziyaretan bi giranî li rastî demsala palehiyê tê. Zevî tên dirûn, bênder tên rakirin û bi wî awayî pêdivî tên temamkirin. Pişt re hemû gund dicivin û bi awayeke qefîleyan diçin ziyaretan. Rastî jî tam hewayê eyd û cejnê derdikeve holê. Di bingeh de ew, berdewama şahiyên qedîm yên piştî dirûna debarê dihatin li darxistin bûn. Weke dayîna deynê xwe yê şikrê. Bi rastî jî di wan deman de pevgerîn û pevgirtin, coşa giyanî û hestên yekîtiyê digihe lûtkeya xwe. Lê mixabin niha tiştên wisa ji holê rabûne. Mesela niha malên 'cem' hene. Lê belê ciheke taybet weke 'mala cem' tuneye. Belkî jî, ji ber ku mezhebê

qedexeye her mal 'mala cem' bû. Wisa tê gotin. Weke mînak; dema ku Pîr tê, dikare biçe her malê. Mala ku diçiyê dibe mala cem. Çend rîtuel di taxên cuda de dikare were dûbarekirin. Di malekê de cem tê kirin, lê bê îstisna Pîr serî li hemû malan dixe. Yên di malê de tiştna didin pîr. Ew jî digre, bes lê mêze nake, dibe ku pere be, dibe ku qût û zad be. Ji wê re dibêjin Çiralik. Lê mixabin niha di bawermendiya Elewîtiyê de ji rê derketinek heye. Mirov dikare vê bawermendiyê weke cureyeke civaka xwezayî binirxîne. Mesela hestên wekheviyê bi awayeke pir kûr hene. Bawerêya ku xweza bi ruhberên zindî dagirtiye bi bandore. Di wê bawermendiyê de, bi wan ruhberan re bi ahengî jiyankirin hesteke xurte. Di heman demê de Ehlî Beyt jî pir tê hezkirin. Bi taybet navên weke Elî, Hûseyîn, Zeyneb, Fatma pir pîroz tên hesibandin. Ger mirov bêje ew navên Ereban in, ma di wan de çi heye? Mirov wê demê, wê derbeyeke mezin li Elewîtiyê bide. Mixabin Elewiyên ku wisa dikin jî hene. Ger mirov bêje eleqeya Elewîtiyê zêde bi Ehlî Beyt û Elîtiyê re nîne, ew yek ji bo Elewîtiyê wê bibe nêzîkatiyek ne bi tendurist.

Zilameke bi navê Haşim Kutlu hebû. Min ji wî re got; 'ger tu ji destê dayîka min Hûseyîn bigrî, ma wê ji Elewîtiya wê çi bimîne.' Dayîka min dema ji me hêrs dibû weke gazincekê û nifrînekê digot; 'Yezdan bikeve bin lingên we.' Lê yek rojê jî negot Elî, Hûseyîn ango Zeyneb bikeve bin lingê we. Yanî pîroztiya dida wan ji ya dide Yezdan zêdetir bû. Esas girêdayîna ji bo wan 'şênber'e. Elî kesayeteke jiyan dike ye. Elî, Huseyîn, Hesen, Fatma û Zeyneb kesayetên şênberin û rastî jî navên ku di Elewîtiyê de heta dawiyê pîroz in.

Weke ku min got, bavê min hertim dixwest zarokên xwe bide xwendin. Tevî ku dibistana seretayî li gundê me tunebû, bavê min em hemû dan xwendin. Xwîşka min Denîzê dibistana seretayî xwend. Yên din herî kêm amadeyî xwendin û piraniya wan jî çûn zanîngehê. Armanca bavê min ew bû ku me derxe ji derveyî jiyana xwe ya zehmet, ji bo em bikaribin jiyaneke vehêstir bijîn. Dîsa mirovê ronahîbûyî dizanî û dixwest em jî ronî bibin. Tu caran di navbera keç û xortan de cudakarî nedikir. Sedemê ku xwîşka min Denîzê piştî dibistana seretayî nexwend, nêzîkatiyên xwîşka min ya din bûn. Digot; 'serê wê naxebite.' Li gorî min ew nerast bû. Ya di nava me de serê wê herî zêde dixebitî xwîşka min Denîz bû. Yekî pir zekî bû. Dema ku pir biçûk bû jî, gotinên pir mezin

dikirin, weke mezinan dipeyivî. Ez her tim ji bo axiftinên wê heyran dimam.

Min dibistana seretayî li gundeke bi navê Hakîs xwend. Biqasî nîv rojê dûrî gundê me bû. Gundeke qedîm yê Ermeniyan bû. Min di mala miroveke pir hêja yê bi navê Mehmet Gundogdu de xwend. Weke malbata min ya duyemîn bû. Ez ew qas girêdayî wan bûm. Zarokeke kur û bi hejmarekê zêde keçên wan hebûn. Keçeke wan ji me mezintir bû. Weke etika me (xwîşka mezin) bû. Ez bi zarokeke din re hema bêje di heman temenî de bûm. Ew mirov, ji koka xwe Ermenî bûn. Di nava malbata wan de, endamê malbatê yê herî mezin yekî bi navê Mûsa bû. Di gund de tenê Mûsa Quran xwendibû. Jê re Mûsa yê Serkîs digotin. Serkîs navê bavê wî bû. Tê gotin ku nifşê ji berê wan hatibûn tunekirin. Pişt re dibin Elewî. Ji beriya wê, navê wan hemû navên Ermenî bûn. Navê gund bixwe jî naveke Ermenî ye. Hakîs. Navê dawiya wan bi –îs diqede, piraniya wan navên Ermenî ne. Min dibistana seretayî li wir xwend. Mamosteyên min piranî ji min hez dikirin. Mesela mamosteyeke min yê dibistana seretayî bi navê Elî Dagdevîren hebû. Di nezera min de miroveke pir hêja bû. Ne tenê ji ber ku mamosteyê min yê dibistana seretayî bû wisa ye. Wî jî pir ji min hez dikir. Ji ber ku ez di dersên xwe de hinek jî serkeftî bûm, ji min re digot; 'fîlozof.' Dema ku me dibistana seretayî qedand, ji bo ku em wêne bikîşînin em çûn bajêr. Jixwe min cara yekemin wê demê bajar dît. Pişt re ez ketim ezmûnên dibistana navîn û amadeyî û ezmûna dibistana mamostehiyê. Min ezmûna dibistana mamostehiyê qezenc nekir. Hê rastir ew bû ku, ez dizanim min hemû pirs çêkiribûn. Lê belkî jî ji ber wê yekê fikirîn ku min kopya kişandiye û ez nehilbijartim. Ez bi awayeke xiyal şikestî çûm bajêr. Cihek ku lê bimînin jî tunebû. Bavê min sed banqinot da min. Di bajêr de bi awayekê divê min debara xwe bikira. Ez ji bo xwendinê pir bi xwestek bûm. Ez çûm sûkê, min di sûkê de hevalên xwe yên dibistana seretayî dîtin. Ji min re gotin; 'te ezmûna dibistana navîn û amadeyî qezenc kiriye.' Destpêkê min bawer nekir. Bi lez û bez ez bi xwe re birim. Li ser deriyê qonaxa hikumetê lîsteyek daliqandi bûn. Navê destpêkê navê min bû. Wê demê bêyî ku li navên din mêze bikim, bi lez û bez vegeriyam gund. Bavê min jî wê salê dixwest biçe Elmanyayê. Ez bawer dikim sala 1964'an bû. Bavê min dixwest biçe Elmanyayê, minê jî dest bi

dibistana navîn bikira. Kurê serokê eşîreta me ez bi xwe re birim. Piştî me rApor girt, min qeyda xwe li dibistanê çêkir.

Dibistana şevînî ciheke pir cuda bû. Dîsîplîna wê pir zêde bû. Li dijî Tirk kirina li wir bêzariyên min çêbûn. Ji bo min xwe îfadekirina bi zimanê Tirkî pir zehmet bû; ji ber ku ders li ser bingehê vegotinê bûn. Min digot; 'xwezîka ew tiştên tên vegotin bi zimanê me bana, wê demê minê baştir xwe îfade bikira.' Ez xwedî wê hişmendiyê bûm. Heta wê demê rûyê min her tim li der ve bû, yanî danûstandinên min bi yên derveyî min re pir başbûn. Lê karekterê dibistanê di nava pêvajoyê de hişt ku ez bibim kesayeteke di hundirê xwe de girtî, hestiyar û her ku çû melankolîk bûm. Di nava pêvajoyê de rastî jî ez ber bi wê kesayetê ve çûm.

Dersên min başbûn. Bi giranî jî ez di dersên zanistên civakî de pir serkeftî bûm. Pileyên min hertim bilind bûn. Dîsa carnan min spasname jî digirt. Ji ber ku di ezmûnan de ez difikirîm û min wisa dinivîsand, ez bêhtir serkeftî dibûm. Bi taybet hinek mamosteyan ji min pir hezdikirin. Di waneya zimanê biyanî de her tim wisa bû. Dîsa di waneya wêjeyê de jî wisa bû. Di refa dawî ya dibistana navîn de mamosteyeke jin ku dihat waneya me ya Almanî, banî min kir. Got; 'hinek mamoste û xwendekar wê di dema betlaneyê de herin geştê, ez dixwazim tu jî tevlî wan bibî û ezê mezaxtinên te pêşwazî bikim.' Mamosteyeke ciwan bû. Ez wê demê 14-15 salî bûm. Min ne dikarî jê re bejim, 'na ez nayêm.' Ji ber wê yekê min jê re got; 'temam, ezê bêm.' Em xwendekar û mamoste bi hev re çûn Trabzonê. Min Trabzon'di refa dawî ya dibistana navîn de dît. Piştî Erziromê, duyemîn bajarê mezin yê ku min dîtî, Trabzon bû. Min Derbasgeha Zîgana û ew kendalên kûr wê demê dîtin.

Min carna helbest dinivîsandin. Piranî helbestên min dinivîsandin pişt re min tavêtin. Di dirêjiya dibistana navîn û amadeyî de hevaleke min yê nêz hebû. Navê wî Kemal Yûcel bû. Ew ji Artvînê bû. Ez şaş nebim yan ji Boçkayê yan jî ji Şapyapê bû. Ji ber ku dema ew dilîzin dibêjin; 'ha uşak', me jî navê wî kiribû 'ha uşak.' Hertim me wisa banî dikirê. Hevalê min yê herî zêde ez pê ve girêdayî, yê herî zêde min jê hez dikir û min hemû sirên xwe jê re vedikirin, ew bû. Min helbestên xwe bi wî didan xwendin. Wî carna helbestên min digirtin, yên ku hawêj dikir nedida min. Di heman demê de nûnerê refa me bû. Bi taybet dema waneya me ya wêjeyê dihat, berî mamoste bikeve hundir helbestên min

li ser texte dinivîsandin. Dema min dixwest ez reşbikim, nedihişt. Mamosteyeke me hebû navê wî nayê bira min. Paşnavê wî Kîrzîoglu bû. Xizmê Ordînaryos Profesor Fahrettîn Kîrzîoglu yê bi nav û deng bû. Dema ew dihat waneya me û digot; 'çi xweşike, kê ev helbest nivîsandiye?' Hevalê min digot; 'heval Elî Heyder nivîsandiye.' Min di waneyên wî yên weke wêje û darîştinê de her tim deh digirt. Lê tu armanca min ya bi taybet bikevim çavê mamosteyan tunebû. Ji bo wê yekê min xebatek taybet nedimeşand. Min di ezmûnan de pileyên bilind digirtin. Dîsa di waneya Kîmya de jî wisa bû. Di ezmûnên bi vegotinî de jî min bi formûlan bersivên rast didan. Ji ber ku ez di vê waneyê de serkeftî bûm, min pir bala mamosteyê vê waneyê kişandibû. Paşnavê wî Yavuz bû. Ji bo ceribandinekê banî me kir ji bo ku em biçin labaratuarê. Di labaratuarê de ji derveyî min, ji refên cuda gelek xwendekar hebûn. Bi giranî xwendekarên zekî hilbijartibûn. Yanî yên zekî, ji hêla civakî de bi nakok û hinek jî bi buhran û qeyran. Di bin navê tecrûbeyên kîmyewî de em dibirin û Rîsale-î Nur a Seîd-î Kurdî bi me didan xwendin. Rastî jî em bandor dikirin. Pişt re min mûqayeseyek kir; gundiyên me jî digotin em misilman in. Min mêze kir tu eleqeya gundiyên me bi misilmantiyê re nîne, ew rastî jî misilman in. Heger misilmantî be, wê demê pêwîste misilmantiya rast bê hilbijartin. Piştî wê demê min pêdiviyên rîtuelên dînî pêkanîn. Mesela min dest bi nimêjê kir. Pişt re min fêm kir ku mamosteyê min Nurcî bû. Ez çûm malan û tevlî civînan jî bûm. Rojên şemî û yekşemê destur didan me. Mamosteyê me, em digirtin û dibirin malan û li wir jî rîsale ji me re dixwend. Cure dihatin kirin, pişt re em dizivirîn dibistana xwe. Esas weke helwestek li dijî Tirk kirinê, min dîn himbêz dikir. Yanî di nava wê meseleyê de nerazîbûnek li dijî biyanîbûyînê hebû. Heta ku min amadeyî qedand, ez miroveke dîndar bûm. Weke ku min mezhep jî guhertibû. Heta min ji bo cemaetên biçûk yên xwendekaran melatî jî kiribû. Bavê min pişt re ferq kir. Bavê min ji min hêrs nedibû. Bêhtir henekê xwe li min dikir. Pê hesiya bû ku ez nimêj jî dikim. Digot; 'ka bêje dema tu diçî secdeyê çi tê mêjiyê te?' Dema min dest bi wê bawerêya nû ya îslamê kir, min wisa hîsdikir ku ez pir paqij bû me û weke çûkekê sivik bû me. Hesteke wisa bû; min dema xwestiba ezê bifirîyabama. Mirov wê hestê kêm car jiyan dike. Mesela dema ez di serdema gruba destpêkê ya PKK'ê de tevlî tevgerê bûm, min careke din heman hest jiyankiribû. Heman hest dema min destpêkê

dest bi nimêjê kir jî min jiyan kiribû. Bawerî diyardeyek pir girînge. Bi tiştekê bawerkirin û ew pêkanîn, ji hestên exlaqî û paqijbûyînê ne. Mesele ne tenê heqkirina biheştê ye. Rastî jî pir cudatir e. Piştî bavê min ji min re wisa got, dema ez diçûm secdeyê dîmenên min qet nedixwestin dihatin ber çavên min. Min dixwest ez wan dîmenan bi qewitînim. Piştî nimêj diqediya, min dua dikirin û min digot; ‘xwedêyo gûnehê min nîne, waye bavê min kir, bila hemû gûneh bibin yên wî.’ Heta demekê rastî jî dema ez diçûm secdeyê dîmenên wisa pir neyînî li ber çavên min re derbas dibûn. Yanî dema hûn tişteke neyînî naxwazin, hûn hatina wê ya di fikrên xwe de jî lanet dikin. Ji wê hêlê ve wateya dîn gelek e. Mirov bi temamî neyînî bibîne neraste û ne jî pêkane. Rastî hinek tişt neyînî ne, weke qedexeyan, lê pêwîste mirov li ser sedemên wê bi kurahî bihizire. Nefikirandin û xwe ji bo wê nefikirandinê naçar kirin; di wê wateyê de neyîniyên dîn hene. Yanî pêwîst dike ku mirov li şûna xwe dûrî ‘ji ya qedexe bigre û neyîne bira xwe’ li ser ‘qedexe çima hene û ewê çawa bên derbaskirin’ bihizire, ev wê erênîtir be.

Dema ez çûm zanîngehê, ez hê jî miroveke dîndar bûm. Esas ez destpêkê çûm Îzmîrê, minê qeyda xwe li zanîngeha Egeyê çêkiriba. Ez li bendê bûm ku wê pileya min têra muhendistiya madenê bike, lê têr nekir. Ez di otêlê de rastî hevaleke xwe yê ji amadeyiyê hatim. Ew jî ji Dêrsîmê bû. Wî qeyda xwe çêkiribû. Min wê demê wisa got; ‘Yezdan bike puanên min jî têr bike û ez jî bikarim qeyda xwe çêbikim, wê demê emê her du di malekê de bimînin.’ Dema min wisa got, wî jî zimanê xwe xira kir û dijûn ji Yezdan re kirin. Ez pir hêrs bûm û min jê re got; ‘rabe derkeve ji vir, eger tu neçî ezê biçim. Ez bi te re di heman odeyê de namînim.’ Ez ji odeya wî derketim û min ji xwe re odeyeke din girt. Ez girêdayî baweriyên xwe bûm, baweriyên min yên dînî di wê astê de kamil bûn.

Di amadeyî de tenê di refa duyemîn de du lewazên min hebûn. Ew jî li ser dehan çar bûn. Yanî min dikarî bi asanî wan jî derbas bikim. Hetama min ya herî bi qeyran jî ew hetam bû. Lewma min di refa duyemîn de waneyên xwe pir guhdar nedikirin. Ji derveyî wê, di karnameya min de tu lewazên min tunebûn. Di dibistana seretayî de puanên min her tim pir baş bûn.

Piştî min amadeyî qedand, ez ketim ezmûnên zanîngehê. Yek ji daxwazên min fakulteya hiqûqê ya zanîngeha Îstenbolê bû. Min ew der

qezenc kir. Ez çûm Îstenbolê û min tomara xwe çêkir. Pişt re pileyên Fakulteya Zanistên Siyasî Ya Enqerê daketin. Ez hatim wir û min qeyda xwe li wir çêkir. Dorhêleke ku ramanên çepgir tê de pir bûn. Bandora darbeya 12'ê Adarê bi kûrahî dihat hîskirin, lê di xwendekaran de ji bo li hemberî ramanên çepgir û îtîrafkirina çepgiriya xwe, xwe şûnde kişandinek tunebû. Ciwanên wê serdemê rastî jî di her hêlê de pir cuda bûn. Wê demê careke din min hemşehriyeke xwe naskir. Ez birim cem birayê xwe. Navê birayê wî M. Elî Polat bû. Yeke sendîkavan bû. Ez di mala wî de qasî du demjimêran rûniştim. Ji min pirsî; 'tu çepgirî yan rastgirî?' Min got; 'sempatiya min ji bo çepgiran heye.' Wê demê pirsî; 'temam, lê çepgiran jî rastgiran jî felsefeyeke xwe hene, tu felsefeya wan dizanî?' Min got; 'ez nizanim.' Ji min re qala îdealîzmê, materyalîzmê, metafîzîk û diyalektîkê kir û got; 'çepgir diyalektîkî, yên din metafîzîkîne; çepgir materyalîst, rastgir îdealîstin.' Îdealîzm û materyalîzm vekir. Bêhtir bi hebûn û tunebûna Yezdan îzah kir. Dema ku ji devê zilam gotina 'xweda nîne' derdiket, balyoz li serê min diketin. Min xwe bi xwe digot; 'ez çima wî guhdar dikim?' û ez ji xwe hêrs dibûm. Lê dîsa jî nakokiyên min hebûn. Tevî wê yekê ez fêrî tiştna dibûm. Gotina 'Yezdan nîne' ez dîn dikirim. Zilam navê hinek pirtûkan da min. Got; 'teqez wan pirtûkan bibîne û bixwîne.' Yek jê pirtûka George Polîtzer ya bi navê Rêgezên Esasî Yên Felsefê bû. Dema ez ji derî derketim mêjiyê min gurmênî dikir. Ez ji xwe hêrs dibûm û min digot; 'tu çawa vî zilamî guhdar dikî, te çawa tehemul kir, çawa guhên te zû bi zû fêrî gotina -Yezdan nîne- bû?' Tevî vê, ji bo pirtûka wî zilamî navê wê da bû min bibînim, ez roja din li hemû Enqerê geriyam. Ez li hemû pirtûkxaneyan geriyam lê min nedît. Dema ez şevê hatim cihê xwe, hevaleke min dît ku ez bêdengim û sedemê vê bêdengiya min pirsî. Min jî got; 'ez li pirtûkekê geriyam û min nedît'. Got; 'li cem min heye, ez bidim te.' Min girt û xwend. Di wê pirtûkê de cudahiya di navbera anarşîst û komûnîstan de danîbû holê; anarşîst îdealîstin, komûnîst materyalîst. Min naveroka îdealîzmê pir zêde nedizanî. Li gorî min îdealîstbûyîn dihat wateya Yezdan zanîn, Yezdan nasîn û berdewamkirina girêdayîna xwe ya ji bo Yezdan bû.

Di niqaşên me de ji min dihat pirsîn; 'biryara te çî ye? Anarşîst li dijî dewletê ne, dewletê hildiweşînin, lê di şûna wê de tiştekê danaynin. Komûnîst wê bê otorîtebûyîna wan red dikin, yanî bê otorîte nabe.'

Min digot; 'ya herî baş ewe ku ez bibim anarşîst. Tiştek nabe, em hilweşînin bila komûnîst ava bikin. Tevlîbûna hilweşandina dewletê tişteke başe.' Bi wî awayî heta pênc-şeş mehan min digot ezê bibim anarşîst. Pişt re min Serokatî û Tevgera Azadiyê naskir. Li cem Serok Apo, ramana Yezdan tu carî nebû pirsgirêk. Berevajî, nêzîkatiyeke pir pir cuda ji bo dîn hebû. Heta, ew yek bû hêmanek ku em ji tevgerên din cuda bibin. Sedemeke wê yekê yê din jî ew bû ku Serok Apo ji dibistana sereteyî heta mezûnbûna xwe bi ramanên dînî hatibû stirhan. Hem jî bi kûrahiyeke gelek zêde. Ya min seresere bû, bi giranî rîtuel bûn. Yanî baweriyeke min ya pir kûr tunebû. Lê di girêdayîna ji bo Yezdan, girêdayîna ji bo pêxember, Yezdan û qasî ku hêza min têrê dike pêkanîna wecîbeyên dîn de, baweriya min teqez bû. Ji wê demê û şûnde min di nava danûstandinên xwe yên bi gel re tu carî nêzîkatiyeke neyînî di derbarê Yezdan de pêş nexist. Di nava tevgera me de tiştên bi wî awayî tune ne.

Min Rêber Apo di sala 1972'an de naskir. Rêber Apo jî wê demê di Fakulteya Zanistên Siyasî de xwendekar bû. Me qeyda xwe heman salê çekiribû (1971). Em her du jî di heman refê de bûn. Rêber Apo bi sedema boykota ku li dijî qetilkirina Mahîr wan li FZS'yê hatibû lidarxistin, di 30'ê Adarê de hatibû girtin. Di hetama 12'ê Adarê de bi qasî heft mehan di girtîgeha Mamaka Leşkerî de ma. Piştî ji girtîgehê derket, ket ezmûnên payîzê. Di pêvajoya ezmûnan de ew hat û bi min re axivî. Ji min re qala ramanên xwe kir. Bi wî awayî min jî ew nas kir. Diyaloga me ya destpêkê jî wisa pêşket. Em di heman refê de bûn, em ji ezmûnê derketin. Hat cem min, silav da min û got; 'ez Abdûlah OCALAN im.' Min jî jê re got ku ez we ji dûr ve nasdikim û daxwaza derbasbûnê ji we re dikim. Got; 'em dikarin hinekê bi peyvin.' Min jî got; 'dibe, em dikarin.' Pişt re em ji Siyasalê derketin, ji Cebeciyê derbasî Kûrtulûşê bûn, ji Sihiyeyê fitilîn ber bi Kizilayê, ji Kizilayê dûbare vegeriyan Cebeciyê. Bi wî awayî nêzîkî sê demjimêr derbasbûn. Di nava wan sê demjimêran de ji min re bi awayeke pir sîstematîk ramanên xwe gotin. Weke destpêk, qala çîroka mirov çawa bû mirov kir. Têkiliyên mirov û civakbûyînê, dîroka civakan, kapîtalîzm, pêvajoya kapîtalîzmê, ya emperyalîzmê, Şoreşa Cotmehê, serdema nû ya bi Şoreşa Cotmehê destpê kirî, di bin ronahiya vê serdemê de rewşa Kurdistanê, parçebûyîna Kurdistanê, rewşa Bakurê Kurdistanê, pêvajoya

metîngehkirina Kurdistanê ya di navbera salên 1920-1940'an de, di Kurdistanê de rewşa heyî û pêwîstiya têkoşînê ya li dijî wê yekê; bi awayeke pir sîstematîk li ser wan mijaran axivî. Çarçoveya axaftinên wî bi giştî ev bû.

Ya ku herî zêde bandor li ser min kir, analîza wî ya di derbarê tevkujiya Dêrsîmê de bû. Berê wê min dizanî ku li Dêrsîmê tevkujiyek çêbibû; lê çima çêbû, sedemên wê çi bûn, dewlet çima di wê astê de bêrehm tevgeriya, çima di wê astê de qirkirin pêşxist? Min pir zêde ev nedizanîn. Bi vegotinên Serok Apo destpêkê ez di van mijaran de zelal bûm. Ji bo vê yekê min xurûşek pir mezin hîskir. Tişteke din jî hevoka wî ya "Kurdistan mêtîngehe" bû. Heta wê demê min tu hevokên wisa nebihîstibûn. Yek ji tiştên din yên xurûş da min ev bû. Wê demê, wexta ku ji min dihat pirsîn; 'tu ji ku yî?', min digot; 'ez ji Dêrsîmê me'. Dema dihat pirsîn; 'tu Kurdî?', min digot; 'erê ez Kurdim', lê ev tişteke wisa jixweber bû. Yanî tu naverokeke wê ya polîtîk tunebû. Di wê mijarê de israrkirin û înat pir zêde tunebû. Piştî van vegotinên Serokatiyê mirov di xwe de van xalan lêpirsîn dike; tu kî yî, nasnameya te çî ye? Nasnameya te ya welat, nasnameya te ya gel çî ye? Dîroka te, zimanê te, çanda te û rastiya te ya li beramberî van çî ye? Mîrov bi van re nasname qezenc dike. Bê nasnamebûyîn bi rastî jî tişteke weke tunebûnê ye. Ji ber vê yekê jî, ya ku destpêkê hat bîra min hesta şermê bû. Ez dikarim bêjim ku min şerm kir. Min ev yek piştî wê jî her tim weke nirxandinekê anî ziman. Ji bo mirov tê gotin; mirov hebûneke ku rûyê wî sor dibe ye. Dîsa tê gotin; mirovê bê ar, rûyê wî sor nabe. Yanî hesta min a destpêkê hesta şermkirinê bû.

Ji ber van mijarên ez tê de zelalbûyîm, min dilşahiyek jiyan dikir. Di mijarên din de min hê jî xemameke fikrî jiyandikir. Heyran mayîna min ji ber vê yekê bû; cara yekemîn min nirxandinek ya rewşa mirovahiyê bi awayeke pir sîstematîk û kamil dibihîst. Di ramanên mirovekê de ev sîstematîkbûyîn tişteke muhteşem bû. Beriya wê qasî salek bû ez di nava derdoreke ramanên çepgir de bûm. Me di mijarên curbecur de pirs ji mirovên derdora xwe û kekên xwe yên çepgir dipirsîn. Kit bi kit tiştna ji me re digotin. Bi giştî em bi hestên şukranê nêzîk dibûn. Fêrbûyîn tişteke pir başe, fêrkirin tişteke pir bi wate ye. Lê tu kesê ramanên xwe bi şeweyeke kamil û bi awayeke sîstematîk nedida me.

Cara yekemîn min ew li gel Serokatî dît. Taybetmendiya wî ya herî diyar jî ev bû.

Di zanîngehê de hevalên me yên Kurd hebûn. Serokatî heman ramanên xwe bi hinek hevalên me yên Kurd ên din re jî parvekirin. Berê tevlî civîna Çubukê bibin, sê kesên din jî hebûn ku Serokatî bi wan re axavîbû. Yekê navê wî Îsmaîl Bîngol ji Wartoyê bû, yê din navê wî MustafaAksakal ji Ruhayê bû û yê sêyemin jî navê wî Xelîl Arslan bû û ji Dersîmê bû, lê li Elezîzê rûdinişt. Weke din yekî bi navê Musa Erdogan hebû ku di Fakulteya Ziman Dîrok û Erdnîgariyê de dixwend. Ew jî ji Dêrsîmê bû. Yanî bi giştî pênc kes bûn. Serokatiyê dixwest grubeke Kurdistanî pêkbîne. Ji ber wê yekê jî heval Heqî û Kemal tevî ku bi ramanên Serokatî re yek bûn jî, hê di nava grubê de cih negirtibûn. Pêwîste ez vê yekê bi taybet bêjim ku ew hevalên Serokatî yên herî nêzîk bûn.

Serokatiyê banî me pênc kesan kir. Em li otobusê siwar bûn û derketin derveyî Enqerê. Piştre ez fêrbûm ku ew der Bendava Çubukê ye. Bendav bixwe nayê bîra min, lê daristana darên çamê hebûn. Ciheke daristan bû. Dibe ku ciheke seyrangehê be; ciheke ku mirov rojên şemî û yekşemê bên û bêhna xwe bidin. Serokatî li wir, em di bin darekê de dan rûnişkandin. Wê demê ji me re ramanên xwe vegotin. Jixwe berê wê me hemûyan guhdar kiribû. Lê vê carê cuda û bêhtir sîstematîk bû. Di dawiyê de got ku; ‘êdî em grubek in, ev raman, ramanên grubê ne, erka herkesî ewe ku yek bi yek kesayetên guncaw bibînin, wan ramanan ji wan re bêjin û wan qezenc bikin, di vê bingehê de pewîste herkes propaganda bike.’ Weke dîrok, dawiya Adarê û destpêka Nîsanê bû. Derdorê Newrozê bû. Bi rengê grub derketina holê pir girîng bû. Hevalên din pir zêde di nava têkoşînê de neman. Di navbera destpêka lêgerînên Serokatiyê yên ji bo pêkanîna grubê û civînê de, nêzîkî pênc şeş meh derbasbûn. Di encama xebatên di nava wê demê hatin meşandin de şeş kes hatibûn gel hev. Serokatî pênc kes anibûn gel hev û bi wan re bingehê gurubekê avêtibû. Ez dikarim bêjim ku bingehê PKK’ê wisa hat avêtin.

Ji bo min pêvajoya piştî wê di nava grubê de derbas bû. Min Kemal wan di sala 1972’an de naskirin. Piştî Serokatî ji girtîgehê derket bi wan re di heman malê de dima. Ez jî vexwendim malê, wê demê min heval Kemal û Heqî naskirin. Bi heval Kemal re hewayeke weke ku çil sale em

hev nas dikin çêbû. Kemalî pir bi asanî dikarî hewayek wisa çêbike. Bêguman ez bi heval Heqî re jî samîmî bûm. Lê hevaltiya min bi heval Kemal re pir cuda bû. Wan hevalan nêrînên Serok Apo ji me kûrtir fêmkiribûn û ji me baştir bi derdorên xwe re parvedikirin. Jixwe li ser vî bingehî kar dikirin. Hevalên ku bi awayeke herî bi bandor ew nêrîn diparastin bûn. Encex bi awayek fermî ne endamên grubê bûn. Tevlîbûna wan a ji bo grubê di dawiya sala 1975'an, di civîna Dîkmenê de çêbû. Beriya civînê Serok Apo bi wan re axivî. Dipirse ka wê çi bikin û çi nekin. Ji wan re pêşniyarên weke, 'hûn grubekê pêkbînin, ev hêz, kapasîte û feraseta we heye. Dîsa taybetmendiyên we yên serokatiyê hene. Heger ev jî nebe grubên nêzîkî me hene, mesela Kurtuluş bi me re heman ramanan dihewînin, hûn dikarin tevlî wan bibin. Hûn dikarin asta kêrhatina grubê zêde bikin û têkiliyên wan yên bi me re xurtir bikin.' Heval Kemal û Heqî her du pêşniyaran jî red dikin. Xwestekên xwe yên tevlîbûna civînê tînin ziman û dibêjin, 'em dixwazin di şoreşa Kurdistanê de cih bigrin û bi grubê re biçin Kurdistanê.' Serokatî hat, ev fikra wan hevalan bi hevalên din re parvekir û xwest raya hevalan bigire. Hevalan bi dilxwaşiyek mezin ew yek erê kirin. Heval Kemal û Heqî hatin û tevlî civînê bûn. Dema ku biryara vegera Kurdistanê hat girtin, wan her du hevalan ev biryar beriya herkesî pêkanîn.

Min piranî li Dêrsîmê kar kir. Min ji sala 1973'an ve di Dêrsîmê de xebat meşandin. Em grubek amator bûn. Ez diçûm û min di nava ciwanan de ramanên me belav dikirin. Bi rastî jî, di Dêrsîmê de tevlîbûnên destpêkê ji bo tevgerê hê di sala 1973'an de çêbûn. Mirov dikare bêje zemînê ku grubê lê qebîliyeta pêşketinê nîşan da, Dêrsîm bû. Li Dersîmê binesaziyeke ciwanan a pir zindî hebû. Beşeke zêde yê ciwanên xwendekar hebûn. Ji vê hêlê ve ciwan ji bo ramanên çepgir vekirî bûn. Ji bo ramanên me jî vekirî bûn.

Heta civîna sazûmaniya partiyê ez bi giranî li Dêrsîmê mam. Lê dîsa jî ez li cihên din jî geriyam. Mesela ez diçûm Bîngol, Elezîz û Karakoçanê. Dîsa gelek car diçûm Dîlokê. Min carna bi heval Kemal re kar dikir. Li Enqerê jî xebatên min çêbûn. Lê piranî dema min li Dêrsîmê derbas bû. Piştî Civîna Sazûmaniya Partiyê, wê carê rêvebiriya me ya hatî hilbijartin em erkdarkirin. Yanî ne li gorî keyfa me, ne li cihê ku dilê me dixwaze, em mecbûr bûn ku cihê partiyê em lê erkdar dikirin, bixebitin. Ji wî alî

ve qada min a destpêkê ya fermî ya xebatê Semsûr û Mereş bû. Ez di dawiya sala 1978’an de derbasî qada xwe ya xebatê bûm.

23 kes delegeyên kongreyê bûn. Heval Mehmet Karasûngûr jî delegeyê Kongrê bû. Lê ji ber berxwedaniya Sîwerekê tevlî Kongreyê nebû û li wir ma. Pişt re derbasî xebateke din bû. Wê demê di Kongreya me de navenda me du beş bû; Navenda Îdeolojîk û Navenda Pratîk. Wê demê di Navenda Îdeolojîk de min, heval Mazlûm, heval Ebas û Fatmayê cih digirt. Dema heval Ebas derbasî Navenda Pratîkî bû ez çûm cihê wî. Ez wê demê ji Semsûrê derketim. Li wir dema mayîna min demek pir kêm bû. Jixwe israrkirinên min ên ‘ez nikarim li vir bimînim’ jî di wê yekê de bi bandor bûn. Piştî heval Mazlûm hat girtin jixwe Navenda Îdeolojîk belav bû. Piştî wê Fatma derket derveyî welat. Hevaleke me bi navê Saîme Aşkin hebû. Di bin berpirsiyartiya wê de komek ji sê hevalên jin hebû. Wan bi navê “Bûlten” kovarek derxistibûn. Kovareke bi giranî nûçe-şîrove bû. Biqasî 5, 6 hejmar derxistibûn.

Ez derbasî Dersîmê bûm, ji ber ku li Dêrsîmê hatibûm erkdarkirin. Dêrsîm û Serhed wê demê yek eyalet bûn. “Berpirsiyartiya Eyaletê” hebû. Çûyîna min ya ji bo Dêrsîmê di rokeke sersalê de çêbû. Ez roja sersalê li otobêsê siwar bûm. Ez ji wir çûm Elezîzê, pişt re derbasî Dêrsîmê bûm. Hewayeke giran hebû. Hê derbeya eskerî çênebibû. Li Dêrsîmê têkoşîn pêş diket. Têkoşîna Sîwerek û Hîlwanê jî bi awayeke xwezayî bandora xwe li ser Dêrsîmê jî dikir. Li dijî faşîstan têkoşîn hebû. Bandoreke erênî di gel de dida jiyankirin. Lê ji ber ku potansiyela derket me baş rêxistin nekir û zextên giran yên dewletê jî hebûn, beşeke mezin yê ciwanan penaber bûn û derketin derveyî welat.

Di sala 1979’an de her eyaletek ji bo ku perwerdeyê bibînin, komeke hevalan şandibûn derveyî welat. Hevalên ku ji Dêrsîmê çûyîn, vegeriyan. Koma ku ji Elezîzê çûbû jî vegeriya Dêrsîmê. Ez wê demê çûm gel heval Delîl Dogan. Yek ji hevalên ji derveyî welat vegeriyabûn ew bû. Em biqasî heftiyekê bi hev re man. Şeva ku ez ji wî veqetiyam ez çûm gundeke din. Dema ez spêdê rabûm, darbeya 12’ê Îlonê çêbibû. Hê li ser darbeya 12’ê Îlonê re zêde dem derbas nebibû, ez bawer dikim 7’ê Cotmehê bû, heval Delîl Dogan hat şehîd xistin. Wê demê partiyê hêza xwe dikişand derveyî welat. Banî min jî kirin. Min cihê xwe di nava sê kesên ku pêwîst dikir ku zû derbiketibana de digirt.

Yekî navê xwe Dawûd hebû. Yek jî ji Darahênê bi navê Hîdayet Bozyîgît hebû. Pişt re îxanet kir û bû îtîrafkar. Ez şaş nebim di pêvçûneke mafyayê de mir. Di 3’yê Mijdarê de têbînî gihişt destê me. Ez jî 11’ê Cotmehê ji Dêrsîmê ketim ser rê. Em bi meş hatin, me li Nisêbînê sînor derbas kir. Heval M. Emîn Aslan em li Bagokê pêşwazî kirin (pişt re şehît ket). Hevalekê em ji wir girtin û em birin gundekê yê bi navê Marînê. Gundeke şkeftên wê hebûn, malên wan şkeft bûn, em çûn wî gundî. Em li wir man û pişt re em carek din ketin ser rê. Me sînor bi qaçaxçiyan re derbas kir. Piştî me sînor derbas kir, em hatin Tirbespiyê. Em li mala Hacoyan man. Roja din hevalan em girtin û birin Qamişlo. Li wir heval Ebas em pêşwazî kirin. Ji wir bi balafirê em birin Şamê. Ez di jiyana xwe de cara yekemîn wê demê li balafirê siwar bûm. Li Şamê hevalan em girtin û birin gel Serokatiyê. Ez çend rojan li gel Serokatî mam. Pişt re em derbasî Lubnanê bûn. Dema em çûn Lubnanê, di devê dola Bekaa’yê de qampeke bi navê Helwê hebû. Em çend rojan li wê qampê man. Pişt re ez derbasî Beyrûtê bûm. Qampa ez lê dimam, li taxa Sebra-Şatîla bû. Ew qampên ku Îsraîlê lê xist û tevkujî pêk tanîn li wir bûn. Em li wir, li qampeke Filistîniyan ya perwerdeyê diman. Hema bêje koma herî qerebalix a ku bi hev re diman, em bûn. Em nêzîkî bîst heval bûn. Filistîniyan nedihiştin ew qas heval bi hev re bimînin. Min perwerdeya xwe ya destpêkê li wir dît. Perwerdeya me pir hişk û tund bû. Perwerdeya komando bû. Gelek Filistînî diketin; yên ku devê wan di kefê de diman, yên ku ser hişê xwe ve diçûn û hwd. Lê di nava me de tu kes nediket. Tevî ku lingê min seqet bû, her çiqas yekemîn ne hatibama jî mîsoger duyemîn yan jî sêyemîn dihatim. Weke fîzîkî li hemberî zehmetiyên perwerdeyê min li ber xwe dida.

Pişt re partiyê ez ji qampê girtim û birim malan, hevalên din li qampê man. Sala 1981’an ez li Lûbnanê ji lingê xwe emeliyat bûm. Li Dersîmê birîndar bibûm. Pêwîst bu ez li ser lingê xwe yê bi gêç (alçi) herî kêm mehekê negeriyabama. Hê meha min tijî nebibû, ez tevli tetbîqatê bûm. Pişt re ew seqetî derbas nebû. Ez bi baldar tevgeriyabama, dibe ku ew siqetî derbas bibûya. Me li ber xwe nedida; yanî nepêkan bû tetbîqat çêbibe û em tevlî nebin. Ez bi lingê xwe yê bi gêç tevlî bûm. Ez bibûm segvan (suîkastçî) lê dîsa jî tevdigeriyam.

Piştî Konferansa Yekemîn ya di 1981’an de hat li darxistin, partiyê dixwest wê demê rojnameya Serxwebûnê ji nû ve derxe. Ez di sala

1981'an de bi komek hevalan re derbasî Swêd'ê bûm. Me îltîcaya Swêdê kir. Lê wê demê bi rastî jî Swêdê ji bo me hinek zehmetî derxistin. Piştî heşt mehan pasAport dan me. Di pêvajoya ku me pasAport girtin di heman pêvajoyê de dagirkeriya Îsraîlê ya li ser Lubnanê destpê kir. Di wê pêvajoya dagirkeriyê de hemû heval şûnde vegeriyan. Ezê jî vegeriyabama, lê çend çalakî hebûn, ji ber wan ez ne vegeriyam. Me biryara meşekê girtibû, em Kurd jî, emê tevlî vê meşê bibana. Ez tenê ji bo wê meşê venegeriyam. Heftiyekê piştî wan ez jî vegeriyam Lubnanê. Rojnameya Serxwebûn di meha Çileya 1982'an de derket û hê jî ew kevneşopî didome. Serxwebûn rojnameyek bu ku kelecaneke mezin diafirand. Bawerim di dîroka Kurdistan'ê de rojnameya herî demdirêj û bênavber weşan kirî, ew e. Bêguman ev tişteke bêhempaye. Tê bîra min, li Ewrûpayê welatparêzan bi serbilindîyeke mezin rojname digirtin destê xwe û dixwendin. Dema ku gihişt destê hevalên li qampên Filistînê, hevalan derketina Serxwebûnê bi teqandina 21 guleyan piroz kirin. Serxwebûn her tim bû rojnameyek ya Serokatiyê.

Em di pêvajoya Kongreya Duyemîn de gihiştin qampê. Ez tevlî Kongreya Duyemîn bûm. Jixwe piştî Kongreya Duyemîn hêzên me ber bi welat ve diçûn. Di dawiya sala 1982'an de tevgera 'Vegera Welat' hema bêje temam bibû. Hêzên me gihiştibûn Kurdistanê. Ez hê jî li qada ku Serokatî lê dima, li gel Serokatiyê bûm. Daxwaza min jî vegera welat bû. Lê Serokatiyê hinek jî bi zanebûn çûyîna min dida sekinandin. Di Adara 1983'an de, ji qada Serokatiyê veqetiyam û derbasî Rojhilatê Kurdistanê bûm. Bi balafirê hatim Tehranê, ji wir jî derbasî Ûrmiyê bûm. Min li wir heval Karasûngûr dît. Ezê bi heval Karasûngûr re bi rê biketama. Serokatî xwestibû ku em heta Newrozê bigihîjin gel hevalan, lê berfeke gelek zêde hebû û mercên zivistanê dest nedidan. Ji ber wê yekê, hinek jî bi ferzkirinan, dereng be jî em gihiştin qampên hevalan. Wê demê heval di civînê de bûn. Em jî beşdarî civînê bûn. Di dawiya civînê de vesazî çêbûn. Piranî heval ji Lolanê veqetiyan. Ez li gel pênc, şeş hevalan li biryargehê mam. Berpirsê biryargehê heval Ebas bû. Lê ji ber ku Heftanîn hinek din nêzikî sînor bû, derbasî Heftanînê bû.

Heta sala 1986'an li welat mam û bi armanca beşdarbûna Kongreya Sêyemîn dîsa derbasî qada Serokatiyê bûm. Yek ji hevalên ku di Kongreyê de herî zêde rexne li ser hatin, ez bûm. Piştî Kongreyê, di

zivistana 1986-87'an de Akademiya Mahsum Korkmaz hat avakirin. Min di nava xebatên avakirina akademiyê de cih girt û ez tevli perwerdeyê bûm.

Di sala 1987an de girêdayî vesaziyên hatî çêkirin, derbasî derveyî welat bûm û di 25'ê Adar'a sala 1988'an de hatim girtin. Heval Ebas jî piştî min bi mehekê hat girtin. Lê, hê di berê de operasyonek destpêkirî bû û Hesen Xeyrî Guler li gel hin hevalên din hatibûn girtin. 700 hezar mark û hinek jî zêr ketibûn destê wan ku hemû jî alîkariya gel ya ji hêla komîteyan ve hatibûn komkirin bû. Bi israra komîteyê û di encama çalakiyên gel de, polîsên Elman naçar man ku perêyên me şûnde bidin. Lê ya girîng belgeyên ku dest danîbûn li ser bûn. Ji bo girtina me biryar dabûn. Yanî hê di sala 1986'an de NATO'yê li hemberî PKK'ê helwest girtibû. Yê operasyon dabû destpêkirin Elmanya bû. Elmanyayê dixwest qilifeke hiquqî ji bo operasyonê bibîne. Ji bo wê yekê jî li belgeyan digeriyan. Jixwe, ji bo wan ya girîng belge bûn. Lewma belgeyên bi nivîskî, rApor, pirtûk û hwd kom dikirin. Heta di çarçoveya operasyonê de bînayeke nû ya dadgehê çêdikirin. Di bingehê xwe de, ew pêvajo bi bûyera Olof Palme re hatibû destpêkirin. Olof Palme di Sibata 1986'an de hatibû kuştin. Dema Olof Palme hat kuştin, em nêzî sih heval li gel heval Ebas li Rojhilatê Kurdistanê bûn. Heval Ebas li cihekê dima, ez li ciheke din dimam. Roja ku Olof Palme hat kuştin sibehê heval Ebas hat gel min û got; 'te dît, mirovê te hat kuştin.' Ez berê wê li Swêdê mabûm, ji ber wê yekê wisa digot. Bêguman min êşek mezin jiyan nekir, lê ez xemgîn bûm. Lê em tu caran ne fikirîn ku wê ewê bûyerê bixin ser me û di bin wê bûyerê de li şopa PKK'ê bigerin. Ti tekiliya vê bûyerê bi me re tunebû. Kujerî pişt re bûyer xist stuyê PKK'ê. Rastî jî di bin wê bûyerê de tiliya CIA'yê hebû. Kuştina Palme wisa bûyereke jixweber nebû. Wisa xuyabû, bi vê bûyerê dixwestin bi kevirekê li çend çûkan bixin. Weke dibêjin; 'heriyê bavêjê, ger negre jî wê şopa wê bimîne.' Bi vî awayî wê em weke rêxistinekê terorê bidana nîşandan. Wê ne tenê em kiribana armanca dewletan; di heman demê de metirsiya ji hêla gelan ve jî wisa bên naskirinê hebû. Tişta herî xirab û tirsnak jî ev bû ji bo me. Dema bûyer avêtin stuyê me, me di serî de zêde gûh nedayê. Lê Serokatî wisa nêzîk nebû û helwesteke pir tund û zelal raberkir.

Dema ez li Elmanyayê hatim girtin bi doza Palme jî hatim darizandin. Ji Swêdê desteyeke dadgehê hat Elmanyayê. Deste tam

rêkûpêk hatibû; dozger, dadger, meqamê îdîayê û katib, hemû hatibûn. Ez banî hola dadgehê kirim. Yek ji tawanbaran ez bûm û qaşo min jî di kuştina Palme de cih girtibû. Di heman demê de weke ku min ev kuştin daye kirin, dihatim darezandin. Ez weke kesayet, miroveke pir bi hûrmetim. Mînak; min tu caran ling ne avêtiye ser ling, lê cara yekemîn min di mehkemeyê de ling avêt ser ling. Parêzerê min digot; ‘Em dikarin bazar bikin. Bila ew belgeyên di destê xwe de yên girêdayî dozê bidin me, em jî wê demê dikarin îfade bidin.’ Min jî pejirand û min da xuyakirin ku; ‘ger dadgeh belgeyên di destê xwe de bide me, ez jî dikarim îfade bidim.’ Ji bo biryarê navber dan. Pişt re şûnde vegeriyan û xwesteka min hat red kirin. Min jî da xuyakirin ku; “ez îfade nadim.’ Piştî demekê doz ket. Jixwe dozeke şanoyî bû. Heta gihişt wê demê, şopa PKK’ê jê rabibû. Êdî li şopên din digeriyan.

Ez li Elmanyayê şeş salan girtî mam. Dadgehê piştî şeş salan biryara sezayê min yê heft salan erê kir. Piştî betalkirina saleke sezayê min, biryara serbest berdana me hate dayîn. Di roja 7’ê Adara 1994 an de em komek heval serbest man. Ez, ji 7'ê Adarê heta 17'ê Adarê li Ewrûpayê mam û ji wê dîrokê û şûnde çûm qada Serokatiyê. Ji wê pêvajoyê heta niha di nava têkoşînê de me. Di nav jiyana xwe ya têkoşînê de ku gihiştiye çil salan, bûyera herî zêde bandor li ser min çêkirî, bêguman komploya navdewletî ye. Di jiyana min de dema ku ez tu caran ji bîr nakim eve. Me egera ku ‘tiştek li Serokatî bê’ tu caran ne dixwest bifikirin. Dîlgirtina Serokatî û birina wî ya Tirkiyê tu caran di hizrên me re derbas nedibû. Rîsk û egereke wisa hebe jî, fikirandina wê weke fikirandina roja qiyametê bû ji bo me. Me nedixwest bînin bîra xwe. Pêvajoya derketina Serokatî ya ji bo Ewrûpayê ez jî li derveyî welat bûm. Ez bi fermî nehatibûm erkdar kirin, lê bi giranî bi qada çapameniyê re pêwendîdar dibûm.

Dema ku Serokatî derbasî Ewrûpayê bû, bi awayeke xwezayî berpirsiyartiyên min zêde bûn. Min dikarî pêşketinan rojane bişopînim. Derketina Serokatî ya ji bo Ewrûpayê encama ferzkirinên komplogeran bû. Lê Serokatî bi çûyîna xwe ya Romayê komplo vala derxist. Eger Serokatî li Romayê maba, wê hîma valaderxistina komployê xurtir biba. Dibe ku di sînoran de girtin çêbiba, lê dîsa jî wê ne weke girtina li Îmraliyê bûya. Ne dikarîn wî bi demdirêjî bigrin. Herî zêde dikaribûn di hepsa malê de bigirin.

Ji ber ku hiştin Serokatî mecbûr bimîne ji Îtalyayê veqete, ev yek bû sedem ku Serokatî bê dîlgirtin. Dema ku Serokatî hê li Romayê bû zêde têkiliyên min tunebûn. Serokatî pirsa min ji hevalan dikir. Bi taybet rê nîşanî ciwanan dikir û digot; 'Herin pê re biaxifin û guhdar bikin.' Lê rasterast bi min re têkilî nedanî. Wê pêwajoyê ji min xeyîdî bû. Lewma min ji bo Serokatî rApor nivîsand û da xuyakirin ku; 'mayîna min ya li Ewrûpa hem ji bo min hem jî ji bo rêxistinê ziyanê dide, pêwîst dike ku ez biçim çiyê, cihê min çiya ye.' Serokatiyê nepejirandibû. Kanî Yilmaz wê demê li Atînayê bû. Ji min re got; 'Serokatiyê pêşniyara te nepejirandiye û pêwîste tu bê Atînayê.' Li ser vê yekê min xwe gihand Atînayê û li wir bi Serokatî re axivîm. Got; 'Li welat kongre heye, pêwîste tu bigihîjî kongreyê.' Gelek erk danîn pêşiya min. Jixwe, ew weke belgeyên nivîskî hene. Em hatin kongreyê. Kongre sosret bû, belavbûyînek û bêserîbûnek hebû. Li meydanê komployek hebû, lê kadroyên me pir di haya wê yekê de nebûn. Bûyerek dirokî û pir balkêş heye û wisaye; 'dema ku artêşa Osmaniyan dikeve nava bircên Bîzansiyan, Rûm û Bîzansî di dêrê de dicivin û niqaş dikin ka melyaket zilamin an jî jin in.' Hewayê kongreyê vê yekê tanî bîra min. 16'ê Sibatê, dema hevalan li televîzyon temaşe dikirin, Ecevît daxuyaniyê dide û dibêje; 'Serokatî hatiye girtin û wê di demek kin de li Tirkiyê be.' Paşê heval li dîmenan jî temaşe dikin. Ez qet neçûm ber televîzyonê. Dîtina Serokatî ya di rewşeke çavên bi bandajkirî ne tiştek wisa bû ku ez bikaribim tehemul bikim. Min 6,7 mehan qet li televîzyonê temaşe nekir.

Weke min gotî, ew dem weke dema qiyametê bû, weke roja mehşerê bû. Hûn pêdihesin we tawanek kiriye û ev tewaneke wisa ye ku bexşandina wê û berterefkirina wê nepêkane. Hin tewan hene, dikarin bên bexşandin, lê ev, na... Pêwîste têkoşîn bimeşe, lê çawa? Tirsa me ya herî mezin ew bû. Ji bo wê yekê pêwîst bû beriya her tiştî rêveberiyeke me heba. Valahiya Serokatiyê nedikarî bê dagirtin, lê dîsa jî pêwîste rêveberiyeke me heba. Serokatî birastî jî bi tena serê xwe rêveberiyek bû. Rastiyeke din jî hebû ku çareserkirina pirsgirêka partibûyînê girêdayî çareserkirina pirsgirêka rêvebiriyê bû. Lê tevî bi dehan rexne, nirxandin û tehlîlan jî pirsgirêka ku nehatibû çareserkirin jî pirsgirêka rêveberiyê bû. Serokatî di kongreyê de wê yekê eşkere xistibû rojevê, heta nav dabûn û gotibû; 'hinek hevalên kevin, li şûna cihgirtina

di rêveberiyê de, bila weke endamên ERNK’ê xebat bikin.’ Vê ramanê, min wê demê eşkere bilêvkir. Serokatî vê di wateya ji der ve hiştinê de nedigot. Ew rêbazeke terbiyê bû. Dixwest pêşiya hevalên nû veke. Li holê pirsgirêkek wisa ya rêveberiyê hebû, pêwîst bû bihatiba çareser kirin. Wê demê ji ciwanan heta tevgera jinê jî, ew yek pir fêm nedikirin. Ma bêrêveberî partîbûyîn çêdibe? Serokatî tê wateya rêvebirinê; tê wateya perwerdekirin, rêvebirin û qontrol kirinê. Berdewamkirina rêxistinê girêdayî rastîya rêveberiyê ye. Hevalê Cuma wê demê di kongreyê de amade nebû. Jinek bi navê Peyman hebû. Got; ‘Ez û Kanî berpirsiyar in.’ Min ew yek nepejirand. Li Ewrûpayê berpirsiyartiya min tunebû. Heta ez hinek jî hatibûm tecrît kirin. Tu dikarî kadroyeke di rêzê de jî berpirsiyar bigrî, lê tu nikarî min berpirsiyar bigrî. Ez berpirsiyartiya xwe ya din dizanim, lê di wateyeke pratîkî de, berpirsiyartiya min tunebû. Serokatî çima hat, çawa hat, çi difikire? Min ew jî pir zêde nedizanîn. Rewş ji bo kadroyeke di nava erka fermî de cuda dihat gotin, ji bo min cuda dihat gotin. Jixwe Kanî îtîraza rexneyên ji bo min hatin kirin, anî ziman û got; ‘temam, ez bi raye bûm, berpirsyarê Ewrûpayê bûm, lê rewşa heval cudaye. Hûn nikarin wî berpirsiyar bigrin.” Tiştên herî giran ew bûn, yên ku piştî komployê hatin jiyankirin. Serokatî mûcîze pêkanî. Ez nabêjim min piştî komployê xwe heland. Lê taybetmendiyeke herêma me Dersîmê heye; şîn girtin. Pişt re min rihê xwe berdan. Rastî jî cureyeke şînê bû. Heta di wê pêwajoyê de hemû partiyê xwe ji bo çalakiyên fedayî kilît kiribû. Min destpêkê bi devkî pêşniyar kir. Min mêze kir, rêveberiya me zêde nagire cidiyê. Pişt re min rApor nivîsand. Min ji bo çalakiya fedayî xwe pêşniyar kir. Min got; ‘ji bo çalakiya fedayî xwe qurbankirina ciwanan têrê nake, pêwîstiya me ji bo berxên qurbanê nîne, ji bo beranên qurbanê heye.’ Weke min got, Serokatî mûcîze pêkanî. Pêvajoya Îmraliyê veguherand pêvajoyeke pir cihê. Li Tirkiyeyê mijara demokratîzebûyînê ya herî kilît, heta herî berbiçav rakirina darvekirinê bû. Jixwe tu nîşaneyên din jî nînin. Li Tirkiyê bi navê demokratîkbûyînê tenê gavek hatiye avêtin; ew jî rakirina darvekirinê bû. Ew jî bi sekin û helwesta Serokatiyê ve girêdayî bû. Serokatî ew mûcîze pêkanî. Pişt re pêvajoya Îmraliyê veguhert pêvajoya zayîneke nû. Di vê pêvajoyê de, bi rastî jî wateya jiyan û însan zelal bû. Ev, di heman demê de pêvajoya ji nû ve henase girtinê bû jî.

Mirov, bi qasî wê yekê fêm dike û serwext dibe, bêhtir dixwaze bi awayeke bi coş û xurûş di nava jiyanê de cih bigre.

Em di pêvajoyeke pir nazik re derbas dibin, pêvajoyek zehmete. Ev pêvajoya çareseriyê ye. Pêvajoyeke herî bi rîsk, lê di heman demê de derfetên çareseriyê jî herî zêde ne. Ez bi hêvî me ku ev pêvajo veguhere ber bi çareseriyê ve. Gelê Kurd xwedî hêza serxistina vê yekê ye. Ez niha şêst salî me. Ez weke hest û raman dibêjim; ez serdema jiyana xwe ya herî ronahîbûyî jiyan dikim. Bi xêra Serokatî ez hîs dikim ku ez hatime vê rewşê û ez nêzî çareserkirina sirên jiyanê bûme. PKK tê wateya binxistina zehmetiyan. Jixwe hebûna PKK'ê, bû ev yek. Ji derveyî zehmetiyan tiştek tunebû. Pirsa; 'we kîjan zehmetî jiyan kirin?' di heman demê de pirsa; 'we kîjan hêsanî jiyan kirin?' jî di xwe de dihewîne. Hêsaniyan her tim em ji rê derxistin. Meyla xwe ber bi hêsaniyan ve birin, her tim hat wê wateyê ku em dûrî şoreşgeriyê ketin. Lê tekoşîna li dijî zehmetiyan û binxistina zehmetiyan bû navê serkeftin û serfiraziyê. Ji niha û şûnde jî wê şoreşgerîya PKK'ê wisa pêk bê, ez dixwazim di xeta serfirazî û serkeftinê de şoreşgeriyekê pêk bînim. Beriya PKK'ê di nav civakekê de jiyaneke min ya diyar hebû. Piştî min rastiya Serokatî naskir, ez di wê baweriyê de me ku ji derveyî PKK'ê jiyan ji bo min bê wateye û di asteke zêde de jiyaneke min tuneye. Zehmetî ewin, yên PKK'ê derbaskirine. Min jî di nava wê de cih girt. Weke hûcreyeke di nav beden de. Ji ber wê jî, ya girîng jiyankirina hemû bedenê û berxwedaniya wê ye. Tekoşîna wê ya li dijî zehmetiyane. Hûcre, encex bi bedenê wate qezenc bike. Helbet hûcreya bi hêz tê wateya bedena bi tendurist. Ez dixwazim vê bilêv bikim ku ji niha û şûn de ji bo ku ez bibim hûcreyeke bi tendurist, ji bo civakbuyîna me ya nû çi ji destê min tê ezê pêkbînim."

(**Ev hevdîtin di dîroka 19/10/2010 de, li qada Xinêre, li ser daxwaza heval Mela Nûrê bi rêheval Fuat re hatiye çêkirin.)**

**Dîtina Heval Mûrad Karayilan**

Min xortek dît, xwedî bejin û balek li hev hatî, di rûyê wî de xalek hebû, wek stêrka gelavêjê geş dibû. Rûyê wî wek heyva çardehşevî li şevan ronahî dida, reng esmer bi rengê genim bû. Di pêşiya wî de du heval hebûn, li pey wan heval Remzî Kartal û Zubeyîr Aydar bi lez û bez diçûn. Cara yekem bû min dît. Li ber çavê min ketin piling û şêrên çiyayên Kurdistanê. Weke birûska erd û ezman bû. Di rûyê wî de henûnî hebû. Min got; “Ew heval kî ye?” Ez dam hizirandin, ji rûgeşiya sîmaya wî gul dibariyan. Li hevalê ku alîkariya min dikir zivirîm û min jê pirsî; “Ka ji min re bêje ev xortê ew qas bi heybet, şeng û şepal kî ye?” Got: “Birêz heval Cemal (Mûrat Karayilan) e.” Berbi heval ve çûm û min got; “Te çima berê ji min re ne got?”

Heval Cemal li gel hevalên ku pê re hat. Heval Cemal rojbaşek ji dil da. Di rûyê wî de ronahiyê xwe pêçabû. Dema me silav da hev, em çûn destê hev û me keyfxweşî da hev. Ev ji bo min serbilindî û şanaziyek mezin bû û ez bextewer kirim. Ji berê de min daxwaza dîtina heval Cemal kiribû û min dixwest pê re civatekê jî bikim. Lê hevalan digotin; “Tuyê rojekê bibînî.” Dema min heval Cemal dît, vê carê derfet çênebû pê re danûstandin û civatê bikim.

**Zanyarê Çiyayan**

We zanebûn û feraset hildaye ji Rojê
Hun gul û kulîlkên çiyayên Kurdistanê

Hûn weke bilbilan dixwînin bazê Zapê
Xweş exlaqe, nav şirîne bazên Araratê

Rihana devên çema, binevşa ava zê yî
Kawayê hesinkarî li dijminan dîxî

Hem heval, hem evîn û hem yara dilane
We pêşkêşî kir ji bo me tevane

Kurdistan yek ji welatên herî xweşe ku her çar demsal bi hev re lê tên jiyan kirin. Di biharan de hemû cureyên gulan, kulîlk, sosin, beybûn, nêrgiz û rihanan reng didin. Bi cureyên daran daristan hatibû xemilandin. Sala 2008'an êdî cihê xwe ji sala 2009'an re dihêla; dawiya werza payîzê bû. Serma û seqemê xwe dida pêş, her roja ku derbas dibû desthilatdariya xwe zêdetir dikir. Daristanên çiyayan pelên xwe zer dikirin û pelên xwe yên zer li derdora xwe diwerandin. Pelçimên wan daran li ser erdê kom dibûn. Di van daristanên çiyayan de hemû cureyên fêkiyan hebûn ku xwezayê wan afirandibû. Ji gûzan bigre heta hinar, sêv, hirmî, behîv, zerdele, hêjîr û bi hemû cureyên tirêyan çiya hatibû xemiladin. Ev bedewî di heman demê de nîşaneya afirîneriya xwezaya Kurdistanê bû. Bêguman Kurdistan biheşta Rojhilata Navîne û beheşta li ser rûyê cîhanê ye. Dewletên desthilatdar her tim çav bardane vê biheştê. Çem û kaniyên vê beheştê bi herikandina xwe dengê Feqiyê Teyran, Cigerxwîn û awazên bilbilan derdixistin. Bi taybet mêşên hingivê ku hingivê xwe di nava darên berûyan de çêdikirin, dema tava nîvro lê dida hingiv diheliya û dihate xwarê. Ma eger ev welat ne biheşt be, wê ji kîjan welatî re bê gotin biheşt? Li bin erdê welat kaniyên zêr û zîv, li ser erd jî çem û kanî diherikin. Lê mixabin desthilatdaran welatê bav û kalan di navbera xwe de parkirin. Ew qas bêmafî li Kurdan kirin, lê hê jî dilê wan rehet nebûye. Çem û kaniyên Kurdistanê ber bi Bexdayê ve diherikin. Kaniyên Batmanê ku zêr û zîvin, ber bi Ceyhanê ve diherikin. Lê xwediyê vê biheşta xweşik li Amarayê ji dayik bû. Rêber Apo, şehîd û rêhevalên wî şervanên azadiyê ku daxwaza wan aştî û biratî bû, xwedî li vê biheştê derketin.

Ez li cihê xwe bi tenê mabûm, ji ber hevalên li gel min diman çûbûn kar. Ew du roj bûn çûbûn lê hêj nezivirîbûn. Lê belê pêwiste her kesek bizanibe xwe biparêze. Tu bitenê bî ne bitenê bî, pêwiste tu bizanî xwe biparêzî. Her gêrîlayek neçare ku xwe biparêze. Ji ber nezivirîna hevalê Mustafa Cizîrî û hevalê Sînan Rojhilat xemgîniyekê di rûyê min de xwe dida der. Şilope dibariya. Bahoza ji ber sermayê zordariya xwe zêde dikir. Li serê Berbizinan, Şekîf, Karker û heta Sinînê berfê weke kumek sipî xwe dabû serê wan û serê wan spî kiribû. Li cihê ku em lê disekinîn daristanek gur hebû. Av gelek cemidî bû û her derê xwe radestî seqemê kiribû. Erd ew qas qerisî bû ku mirov ji ber sermayê diricifî. Li gel van zoriyan jî gelek keyfxweş bûm. Hêvî û daxwaza min ew bû ku biçim

serdana heval Cemal. Lê belê dîtina heval Cemal gelek zehmet bû. Min her dem dixwest serdana wî bikim û daxwazên xwe bi wî re parve bikim. Cihê ku em lê diman hema hema di binê erdê de bû. Heval herdem di nava kar de bûn, sekinandin tune bû. Sê seyên me yên bi navê rindê, berfo û reşo hebûn ku ji aliyê hevalan ve dihatin perwerdekirin. Hevalan bi cil û bergên wan nasdikirin. Ti caran bela sebeb deng dernedixistin, ji bo yên nas xwe hêrs nedikirin. Lê belê dema keseke biyanî bidîtibana, har dibûn. Hêdî hêdî şev tarî dibû, çavî çav nedidît. Hevalên ku ew qas min ji wan hezdikir hê nehatibûn. Birastî jî her ku diçû xemgîniyê xwe dikir kirasê bedena min. Lê belê min nedizanî ku ew hevalê ew qas min jê hezdikir û min dixwest biçim serdana wî, wê bibe mêhvanê cihê ku lê dimam. Di wê şeva tarî de felekê gulek ji baxçeyê biheştê da min. Demjimêr 2’yê şevê bû. Seyên me rindo, berfo û reşo deng dernexistin. Weke ku digotin; “em diçin, tu jî were” berê xwe dan jor û meşiyan. Çeka min di destê min de, min jî xwe nêzî wan kir. Lê nedihiştin ku heval xwe nêzî cihê me bikin. Derdora hevalan dorpêç kiribûn, nedihiştin yek ji wan jî gavekê ber bi pêş bavêje. Min xwe nêzî wan kir, bi dengek hişk û bilind gazî kir û pirsî; “Hûn kî ne?” Yek ji wan bi dengek bilind vegerand got: “Emin em, heval.” Min xwediyê deng naskir û got; “Ha, tu heval Mehmûd Mêrdînî yî.” Min êdî fêm kir ku ew ne biyanîne, hevalin. Min got; “Keremkin hevalno, hûn bixêr hatin.” Lê dîsa jî se bela xwe ji hevalan venedikirin. Min hêrsa xwe li wan seyan anî. Bi hêrsbûna min re xwe ji hevalan dûr kirin û ji dûr ve li me temaşe dikirin. Min heval bi keyfxweşî pêşwazî kirin. Derdora sih kesî hebûn ku min yek bi yek destên wan guvaşt û bi dilekê geş xêrhatina wan kir. Ji ber ku ronahî tunebû û agir pêxistin qedexebû, ji derveyî heval Mehmûd min nedizanî ka yên hatine kîjan hevalin. Lê min ji wan hemûyan pir hezkir. Li gel min ferqa tu hevalan nebû. Piştî hatina hevalan, hevalê Merwan listeya ewlekariyê derxist û navê hemû hevalan xwendin. Kîjan heval wê li kîjan cihî ewlekariyê bigre, hat diyarkirin. Heval jî li gorî vê belav bûn. Hevalên mabûn jî tiştên xwe girtin û çûn cihê razanê. Ji ber ku gelek wastiyabûn. Cihê ku heval lê diman gelek veşartî bû, lê dîsa jî hevalan parastina xwe bi awayeke herî bi hêz dikirin. Heval Merwan ji min re got; “Ez fermandarim, nabe ku razêm, divê li çeperên ewlekariyê bigerim. Tu keremke here razê, îro gelek westiyayî, hinek bêhna xwe veke.” Lê ez hinek din jî li gel wî mam. Piştî çend kêliyan bi rûkenî pirsî û

got; “Heval Hecî tu dizanî hevalên ku hatine kî ne?” Min jî weke wî bi rûkenî bersivand û got; “Na. Ji ber ku hûn şev hatin, min we nasnekir.” Lê bi rastî jî yên hatine kî ne gelo?” Heval Merwan got; “Heger ez ji te re bêjim tu wê çi bidî min?” Min wiha bersîvand; “Ezê ji bo şoreşgeran kar bikim.” Heval Merwan axaftina xwe bi keyfxweşî wiha domand; “Te tişteke giranbiha da min. Hevalên ku hatine vê derê, hevalê Cemal’e, heval Bozan Tekîn û heval Mizgîn Amed û gelek hevalên din jî hene.” Min got; "te çima di serî de ji min re negot dema ew heval hatin? Te ez xistim kêmasiyan. Bi ser de jî tu min dişînî ew cihê ku heval tê de xew dikin. Minê xwe dirêj bikira û xew bikira. Ev ji bo min dibû kêmaniyeke mezin.” Bi zimaneke gelekî tund bi ser heval Merwan de çûm û min ew teng kir û min berdewamkir; “Li ba gelê Kurd, li gel mezinê xwe xwe dirêjkirin bêrêziye.  Te nehişt ez moralekê ji hevalan bigrim, ew hesreta di dilê min de bi wan re parvebikim.” Rengê min hêdî hêdî zer bibû, di lêvên min de sorahî nemabû. Heval Merwan bersiv da û got; “Tu şaşî heval Hecî, hemû heval wekî hevin. Dîtina Apoyî ev e.  Hem jî heval gotiye bila Mam Hecî were manga me razê.” Min nedikarî axaftina heval Cemal bicih nekim.” Piştî çend kêliyan ez ji bo razanê çûm. Hêdî hêdî û bi bêdengî çûm ser cihê xwe. Min bi cil û pêlavê xwe ve xwe dirêj kir. Dihizirîm, sibehê zû rabim û ji hevalan re taştê amade bikim.

Em sibê zû ji xew rabûn û çûn dar komkirinê, ji bo ku em çayê ji hevalan re çêbikin. Piştî anîna daran me dest bi çay çêkirinê kir. Çay keliya, me dem kir, sifre jî hat amade kirin. Meznahiya mêza aşxaneya me bi qasî 2 metreyan bû, bi kevir û heriyê hatibû çêkirin û pir sade û xwezayî bû. Rûyê mêzê bi paçeke xweşik hatibû xemilandin. Li derdora sifra me deh kursiyên ku ji keviran hatibûn çêkirin hebûn. Li ser sifrê bacan, penîr, zeytunên reş û nanê sêlê hebû. Heval Merwan pirsî; “Rojên berê taştiya we çibû?” Min bersiv da got; “Çi amade bûya, me ew dixwar. Bibexşîne, min dixwest ji bo heval Cemal, Bozan û heval Mizgîn xwarinekê bidim çêkirin.” Heval Merwan got; “Rêber Apo wiha ferman kiriye û gotiye “Me bi ciwanî despêkir û emê bi ciwanî bi serbixin.” Ev yek rastiyeke. Lê belê ji bo kalan jî wiha ferman kiriye; “Di tevgera civaka demokratîk de pêngaveke ku di pêşengiya ciwanên wiha xwedî tecrûbe de were pêşxistin, di têkoşîna civaka demokratîk a giştî de garantiya serkeftinê ye. Şansê serkeftinê yê ji dinamîzma ciwanan bêpar bisînore. Tecrûbeya temendaran û dînamîzma ciwanan di her

qonaxa dîrokê de diyardeyeke ku xwe daye hîskirin. Di meşa kesên ku girêdana wan her duyan bi hev re çêdikin de derfetên serkeftinê her dem bilindin. Jiyan tenê ji ciwantiya cahil û xoyrat pêk nehatiye. Cîhaneke zarokan a xwser ku divê qet xiyanet lê neyê kirin, hertim rêz û hurmet jê re were nîşandan û pêdiviyên wê werin bicihanîn heye. Xiyaneta li vê cîhanê gelek tişt bi civakê dane windakirin. A temendaran jî cihaneke wan a bi zanatî ku di tecrûbeya jiyanê de derbas bûye, heye. Civakekê eger dersên vê cîhanê wernegirtibe, nepêkane ku bikaribe baş bifikire û bijî. Lewma zaroktî û temendarî ne cîhanên ku tine dikin, cîhanên hilberîner ên dewlemendin. Ev her du cîhan jî di şert û mercên civaka demokratîk de, li gorî asta cewhera wan li ser bingeha azadî û mafên wê ji nû ve were sazkirin û qezenckirin, erkeke jêneger ya şaristanîya moderne. Şaristaniya demokratîk di heman demê de serdemeke wiha ye ku zarok û temendar tê de bi hezkirin û rêzdarî tên bibîranîn. Ev zîhniyet û helwesta exlaqî bi civakê re dibe yek. Xizmetkirina pîremêrên Kurdistanê ya ji bo şoreşa Apoyî, ji bo pîran gêwilekê mezin û bextewariyeke bê dawiye. Dagirkeran em ji vê bextewariyê dûrxistin. Ew hesret di dilê hemû pîremêrên Kurdistanê de heye. Temenê me yê dirêj di xizmeta kedxwaran de derbazbûye, di berdêlê xizmeta me de jî Kurd dihatin kuştin û malên wan dihatin talan kirin. Ma qey ne gelek ji wan Apoyiyan ji bo mirovahiyê û netewa Kurdistan kar û xebat dikirin? We nehêla ez demjimêrekê xebat bikim. Mînakek heye dibêjin; 'yek baxê tirîyê dide yekê, yê din wûşiyek tirî ji wî baxî nedayê.' Merdanî di demarên Kurdan de heye." Heval Merwan li min nêrî û got; "mam Hecî em hemû ew kesin yên ku bi fereseta Rêber Apo bawer dikin, heta dilopa dawî ya xwîna xwe emê ji bo gelê xwe kar bikin. Di vê rêyê de pîr, kal, keç xort, jin û mêr ferq nake."

Heval Cemal bi çend hevalan re hat aşxaneyê û rojbaş li hevalan da. Hevalan jî bersiv dan û gotin; "Ji bo we jî roj baş." Heval hatin rûniştin û dest bi xwarinê kirin. Heval Cemal li aliyê rastê zivirî, keyfxweşî da hevalan û piştre ji min pirsî; "mam Hecî tu çawayî?" Min jî bersiv dayê; "gelekî başim, zor sipas, hêvî û daxwaza min selametiya we ye." Heval got; "Mam Hecî were bi me re xwarin bixwe." Min dixwest bi hevalan re bidim û bistînim, lê ew wêrekiya min a civakî kêm bû. Heval Cemal dixwest cesaretê bide min, ji bo ku pê re bipeyîvim. Nepeyvîna min domandina kevneşopiya gelerî bû ku min hê li ser xwe navêtîbû. Mînak;

mirovek têhn be, xwesteka wî vexwarina avê ye, germahiya laşê wî bi vê av vexwarinê dişkê. Ji bo vê, eger ez bi hevalan re bi peyivîbama, lerizandina di laşê min de jî wê nemaba. Heval hê li ser xwarinê bûn, hê serê min di ber min de bû û min ranedikir. Lê heval bi keyfxweşî bi min re dipeyîvîn. Dîsa her ku diçû guftugoya min li gel hevalan berfirehtir dibû, ev jî dibû sedem ku ez hinekê vebim. Min ji hevalan daxwaz kir ku bi min re bibin alîkar, ji bo ku ez daxwaz û hêviyên xwe ji heval Cemal, Bozan û Mizgîn Amed re ragîhînim. Heval Cemal got; "mam Hecî were gel min rûne, bêje daxwaz û hêviyên te çine? Emê jî guhdarêya te bikin." Vê axaftinê keyfxweşî da min. Min di wê demê de xwe weke çûkek ku difire dît. Min weke bilbilekê dest bi axaftina xwe kir. Min jê re got; "ez dixwazim tu ji min re dîroka xwe vekî da ku ez jî bi vê pênûsa xwe ya biçûk binivîsim." Heval Cemal got; "ev e daxwaza te? Başe hinek sebir bike, niha hinek karê min heye, piştî bêhnek din were ezê ji te re jiyana xwe vekim." Piştî du demjimêran heval Merwan got; "heval Cemal gazî te dike." Ez rabûm û çûm cihê heval lê rûniştîbû. Dema çûm wir, got; "mam Hecî keremke were rûne." Ew bi xwe li gel komek hevalan bi awayê çargoşe rûniştibûn û ez jî li kêleka wan rûniştim. Heval Cemal bi kenê xwe yê ew qas xweşik, bi zimanê xwe yê şirîn, bi wan çavên xweşik ku weke stêrkan geşbûn, ji bo nivîsa min gelek alîkarî kir. Piştî ku xatir ji me xwest û ket li ser rêya rêwîtiyeke nû, min bi hemû dilgeşiya xwe ji bo wî hevalî ev rêzik anîn ziman;

**Hêlîna Egîdan**

Qendî tu xweşikî, hêlîna Egîdanî
Wek bilbil dixwînî, awazên çiyanî

Sorgulê reng da gelan, tu daristanî
Evîna pir delalî, deng zelala Kurdanî

Dilrevîne ava çeman û kaniyên te
Qendîlê bibînin biheşta bi çavanî

Hêlina şervanan, ji bazan re evîndarî
Jiyana xweşikî, bêhna binevşanî

Şahidê gelek caranî, lê hîna tu dijî
Dîrokek girane, berxwedana şêranî

Pîremêr hawar û gazî dike bo bibînî
Ew weke zarokan digirî çima bêhalî?

Dilo neke loman û gazin tu wê bibînî
Hêvî heye tu wê birêz rêheval bibînî

Dema ku ez hatim çiyayê Qendîlê min dixwest ku serdana wî bikim. Lê belê, ji ber zêdebûna karê wî derfet çênebû. Lê dîsa jî min daxwaza xwe bi têbiniyekê ji heval re şand.

**Ji Bo Heval Cemal**

Heval Cemal, dîtina we ji min re bû hesret, ku dîtina we hesreta gelê Kurd û hemû kesên welatparêze. Ev keser hê jî ji dilê min derneketiye. Ez di ferqa girîngiya karê we de me. Mamosteyê min, temenê mirovan çi qasî pêşde diçe, hestiyarî jî ew qasî bi mirovan re zêde dibe û pêş dikeve. Ez jî ketime rewşeke bi vî awayî û gelek bihestiyar bûme. Lê belê, dixwazim karekê ji bo partiyê bikim. Min ji we dîroka we xwestibû ku ez bixim li ser rûpelên pirtûka xwe. We jî ev daxwaza min erê kir. Ez bi erêkirina we gelek şanaz û bextewer bibûm. Min gelek gêwil ji vê girtibû. Ezê hewl bidim ku pirsgirêk û kêmasiyên xwe çareser bikim. Yekem pirtûka ku we ji bo min şandibû,bi zimanê Tirkî bû û min jê fêm nedikir. Mamosteyê min, eger hûn hem di derbarê kurte dîroka xwe û hem jî navê mamê we yê di pirtûka we de derbas dibe jî binîvîsînin, ezê gelek bextewer û şad bibim. Ez cejna we û hemû şervanên azadiyê bi dil û can pîroz dikim.

**Silav rêzên şoreşgerî**
**Mam Hecî**
**28/11/2008**

## Ji Bo Mamosteyê Min ê Hêja Mustafa Karasu

Mamostayê min, ji bo ku hest û bêrîkirina xwe bînim ziman vê nameyê ji we re dinivîsînim. Bi coş û keyfxweşiyeke mezin lêborîna xwe ji we dixwazim. Lê ez wê jî baş dizanim, rexneyên mamosteyan ji bo daxwaza pêşketina şagirtên wan e. Kêmaniyên min gelek in, hewl didim ku wan kêmaniyên xwe ji holê rakim. Her çi qas temenê min mezin be jî, dixwazim xwedî lêgerînên çareseriyê bim. Weke ku Hz. Elî gotiye; "temenê xwendinê ji landikê destpê dike heta goristanê." Ezê hewil bidim ku pirtûka Rêber Apo ya bi felsefeya çawaniya jiyanê hatiye nivîsandin, bixwînim. Ez dixwazim xwe bi vê gotinê rave bikim; dibe ku ne li gorî rêbaz û fereseta Rêber Apo be, lê belê di çanda Îslamê de gotinek ya Hz. Elî heye û dibêje; "ger kesek tîpeke nivîsandinê nîşanî min bike, ezê çil salan xulamtiyê jê re bikim." Mamosteyê min, we ne peyvek, bi hezaran peyv nîşanî min dan. Ez li ser bingehê perwerdeya we li Xinêre dayî min dimeşim. Dibe weke tê xwestin nebe jî, lê belê dîsa jî paşve namînim. Ezê tu caran we ji bîrnekim.

Mamosteyê min, dema ku we silav bi nameyekê ji bo min şand, ez weke zarokekê qêriyam, ji keyfan firmêsk ji çavên min hatin xwarê. Dîsa perwerdeya ku me li çiyayê Xinêrê, li dibistana Şehîd Mazlûm Dogan dîtî, hat pêş çavên min. We riyeke zelal û ronî nîşanî me da. Bi vê keyfxweş dibûm. Min li wê derê bi leheng û egîdan re hevaltî kir. Hemû rojên min weke zarokan bi girî û qîreqîrê derbas dibin. Ji ber ku ew qehreman û şehîd tên bîra mirov. Mînakeke herî bi kul û xem, mamoste Viyan Sorane ku ew jî gihişt ser rêya şehîdan. Mamosteyê min, nirxandin û pêşniyarên min evin; niha di roja me ya îro de tê dîtin ku sîstema kapitalîst dixwaze hemû kesan û hemû tiştî bike malê xwe. Jixwe dema ku mirov li dîrokê dinêre, bi hatina Osmaniyan ya Rojhilata Navîn re qirkirin, talan û komkujî ketiye nava gelan. Roja îro jî dewleta Tirk kiryarên wan didomîne. Lê, ji niha û şûn ve dewleta Tirk wê nikaribe gelê Kurd bi qirkirin û komkûjiyan biqedîne. Ji ber ku gelê Kurd bi raman û felsefeya Rêber Apo hatiye pêşxistin. Baweriya gelê Kurd heta dawiyê bi Rêber Apo û PKK'ê heye. Ew girêdayî Rêberê xwe û Tevgera xwe ne. Wê raman û felsefeya Rêber Apo bibe ronahiya rêya hemû gelên cîhanê jî. Rêber Apo ew tekoşîn afirand û bû Rêberê wî gelî û wê aştî, azadî, aramî û wekheviyê jî bîne.

**Axîna Dilan Mamosteyê Min**

Axîna dilanî Mamosteyê min, werza bayê Qendîlanî
Mamoste jiyane, axîna bilbil û şalûlê Kurdanî

Şirîna mejiyê şagirtan, dengê dayîka awazên çiyanî
Hûnin berfa geliyê Zîlan, herikîna ava çem û kanî

Mamoste hûn daristana zanistên şagirtên Rêber in
Deşt û zozan bax û bostan we kiriye dibistana Ariyan

Hûnin helbesta li ser ziman, we zanist nîşa me dan
Kurd bi zanista Rêber xemilîn, zana derketin serê çiyayan

Şervan zanekirin, pratîka wan bo dijmin diyarkirin
Eger hebe min kêmanî şefqata we pir zêdeye

Silava we pir giranbiha, bi hezara bêjin ne bese
Hûn hem find hem çirane ji bo şervanên azadiyê

Dilo neke xemgînî, bi her du çavan şemalî dûr dibîne
We em fêrkirin bi zanîna felsefa Rêber Apo

Hûn zanane, wek Elîne, bi sebrin fikrên we deryane
Feqîrim, pîrim, xemgînim bi derdan hem jî nezane

Dixwazim carek din we bibinim, hejare kale nameşe
Rêya Mamoste nîşan da dilo bike qêrîn, ewe rêya raste.

**Ji Bo Heval Cuma**

Ez dixwazim daxwaziya dilê xwe bi hevalan re parve bikim, birastî jî ew her dem li ber çavên min in. Dîtina we min ciwan dike, lê belê pêwiste hezkirin ne tenê li ser gotin û ziman be. Bi rastî jî ez rastî sifreyeke raxistî hatim. Ez dixwazim para min jî di vê sifreyê de hebe. Eger mirov di nava vê rêxistinê de kar neke, mirov nikare bêje ji vê rêxistinê hez dike. Ger destura we hebe, ez dixwazim li ser şehîdan binivîsim. Lê belê hêza min ya xiyalkirinê kême û tiştа ku min nedîtibe nikarim bînim ziman. Hîmên min yên daxwazê ewin ku evîna min bigîhîne şehîdan û bi wan re jiyan bikim. Ez dixwazim li ser wan hîman nivîsandina xwe berdewam bikim. Nivîsandina li ser şehîdan tişta herî pîroze. Bila şaş neyê fêm kirin, bi sed hezaran pirtûkan jî li ser wan binivîsim, nikarim nirx û pîroziya wan bidim ravekirin. Lê dixwazim keda min jî hebe, difikirim ku wê başbe. Birastî jî daxwaziya min karkirine, karê mirovan nebe mirov bê hêz dibe. Ji ber cewherê mirovan kar e, mirov tenê bi karê xwe yê ku kirî dikare bê hezkirin. Min temenê xwe yê ciwan bêwate derbas kir, hem jî min di nava gemariyê de jiyan kir. Hewildidim bi dayîna kedeke baş û şayan, xwe bidim baxşandin. Ez dixwazim di vê temenê xwe yê kal de xwe ji vê gemariyê xilas bikim. Ez dixwazim bîranînên şehîd Adil û Kurtay binivîsim. Min her du heval li çiyayê Qendîlê, li Suredê dîtibûn. Eger mirov pênûsê hilde destê xwe ku hemû daristan jî bibin pênûs, deryaya Wanê jî bibe diwêt, dîsa jî têrnake ku mirov xweşikbûna şehîdan û Rêber Apo ji bo mirovahiyê dayî hûnandin binivîse. Ez bi vê keda xwe pir keyfxweşim. Ji ber ku we min fêrî xwendin û nivîsandinê kir. Di serî de birêz heval Cûma, mamosteyê min Mistafa Karasu. Heval Cuma ez şandim perwerdeyê, heval MustafaKarasu jî perwerde da min. Li ser vî bingehî heta ku hebim, deyndarê Rêber Apo, şehîdan û deyndarê van her du hevalan im.

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**
**Mam Hecî**

**Pîremêreke Dilciwan**

Pîremêreke bê hêzim, jarim
Dixwazim ji dilxwazan
Hêvî dikim bimînim gel yaran
Li gel evîndar, dermanê dilan
Dibarînim van lorikan
Bi hesreta dîtina hevalan
Qendîla biheşta xweşikan
Hêlîna yaran û şêr û egîdan
Hûn evînin, nazikê gêrîlayan
Sond dixwim bi xwîna şehîdan
Dûr nakevim ji stêrkan
Hîva rojhilatin, daxwaza gulan
Naçim ji van biheştan
Dûr nakevim ji şervanan
Ji dilrevînan û kedkaran
Hevalno! Destê min bigrin
Da neçim ji van deran
Li vê biheşta şehîdan
Dîtina hevalan, jîyana kalan
Giyana mirovan bi her aliyan

## Rêwiyên Azadiyê

Keçên rêhevalên rojê, bi xemla xwe ya herî delal û bedew, di temenê xwe yê herî ciwan de berê xwe didin rêwîtiya ber bi azadiyê. Ew keçên ciwan û delal bi biryarek mezin, dilek germ, bi vîn û hêzeke qewî tevlîbûna xwe ji refên gerilayan re dan çêkirin. Dema ku tevlêbûna xwe ji perwerdeya leşkeri û ramyari re dan çêkirin, gelek pêşketin. Ji bo rojek beriya rojekê dest bi xebata xwe bikin, ked û tekoşinek bê hempa didin. Tevahî demên xwe bi bernameyek dewlemend dimeşînin. Ji bo xwe di warê siyasî û leşkerî de pêşbixin, gelek giringiyê didin perwerdeya xwe ya leşkerî. Ji bo pêşketin, xwe zanakirin û rêxistinkirina civakê, xwe gelek têşînin û xebatek bêdawî dimeşînin. Ji bo bikaribin bibin xwedî hunerên rêveberî û fermandariyê, xwe bi taybet perwerde dikin û jiyana xwe ya ku di nava malbat û civakê de derbas kiribûn, dinirxînin. Jin zêdetir wateyê didin jiyanê. Di nava wan de hevaltiyek gelek pîroz û xwedî nirx heye. Xwe di ber hev de gelek têşinin, pir dilnizmin û ji hev hez dikin. Pir caran hevalên xwe yên ku di nava şer de birîndar bûyî rakirine. Dema hevalên wan di nava dorpêça dijmin de dimînin, ji bo wan rizgar bikin, rexmê ku dizanin wê şehid jî bikevin, lê cardin vê didin berçavên xwe û diçin. Gelek caran hevalê xwe xilaskirine û di wê fedekariya xwe de bi serketine. Xeta bîrdoziya rizgariya jinê ya ku Rêber Apo diyarkiriye, bi hezkirin û girêdanek mezin diparêzin û tekoşineke bê westan didin. Ji bo bilindkirin û bihêzkirina vê tekoşînê, gelek berdêlên giranbiha hatin dayîn û hina jî tên dayîn. Ji bo jinên Kurd bibin xwedî rûmet, bikaribin bibin xwedî vîneke azad, Rêber Apo bawerî û hîmek pir mezin yê tekoşinê avakir. Bi hezaran jin perwerde kirin. Daxwaza Rêber Apo, hevaltiya rast ya bi jinê re jiyan kirin bû. Heta, girêdana azadiya welat û jinê dikir yek û digot; “heta jin azad nebe welat jî azad nabe.” Beriya destpêkirina tekoşîna azadiyê jina Kurd di nava malbat û civakê de hatibû dorpêçkirin, li hember wê bawerî hatibû şikandin û weke mirov nedihat hesibandin. Her çendî nêzikatî wisan jî bû, lê jin bênavber bi şev û roj dixebitîn, lewra nedizanîn ka wextê wan çawa derbas dibe. Birastî Rêbertiyê jêhatîbûna jinê, fedekarêya wê ya ji dil dît, pê bawer kir, xwest rastiya jinê ya ku heyî û hatî berevajîkirin derbixe holê. Dema rewşa jinê ya ku beriya şoreşê radixe ber çavan, mirov gelek guhertin û pêşketinan dibîne. Çi di aliyê çandî, çi di aliyê civakî, çi jî di aliyê xwe

naskirin û parastinê de be, gelek pêşveçûn çêbûne. Jina Kurd êdî bûye xwedî hêzek leşkerî, birdozî, ramyarî û rêxistinî. Di nava cîhanê de bûye xwedî ciheke diyar û mezin. Di serhildan û berxwedanê de jî xwedî refên herî li pêşin. Di nava siyasetê de xwedî sekin û wêrekiyek mezin in. Di şerê xwe de bêdudilî diçin ser armancên xwe. Gelek hevalên ku bi çalakiyên xwe yên xwedî wate û berxwedana xwe ya bi heybet bûne pêşengên xeta azadiya jinê. Hevala Berîvan bi xebata xwe ya rêxistinkirina gel û jinan bû pêşenga serhildanên sala 1990'î yên li herema Botanê. Hevala Bêrîtan ji bo radestî xeta xiyanetê nebe, xwe ji çiyayan, li ser zinarên herî bilind avêt xwar û bû pêşenga xeta berxwedan û parastina xeta Rêber Apo. Heval Ronahî, Bêrîvan û Zekiye bi lihenanîna agir û bedenên xwe, bûn ronahiya Newrozê, Newroz hîn bêhtir watedar kirin û bi milyonan mirov li dora xwe komkirin. Hevalên weke Zîlan, Bermal, Rojbîn û Leyla bi çalakiyên xwe yên fedayane balkişandin ser plangeriya li dijî Rêber Apo, mejiyê dewleta Tirk û hevalbendên wî, bi çalakiyên xwe ser û bin kirin. Heval Meryem, Zinarîn, Sozdar û gelek hevalên din arteşbûna jinê bihêzkirin û pêşxistin. Heval Nûda, Viyan û gelek rêhevalên wan yên rast, ji dil xeta Rêber Apo parastin û ji bo ji nû ve avakirina PKK'ê gelek ked dan. Di van rojên dawiyê de jî heval Çîçek Kiçî piştî temenek bê rawestan yê tekoşînê gihişt karwanê şehîdan. Temenê xwe di nava şoreşê de derbas kiribû, yek ji fermandarên jin bû ku piranî şervanên wê hevalên xortbûn. Wê hevalê gelek keyfxweşî û zoriyên şoreşê dîtibûn û jiyan kiribû. Kedkariyê tu carî ew nediwestand. Ji ber coş û kelecana wê, mirov digot qey ev heval nû beşdarî nav refên tekoşînê bûye. Heval Çîçek ji bo pêşketinê gelek bi hêrs û hezkirin bû. Ew sembola kedê û fedakariyê, rêwiyê rêya dûr bû. Heval Rozerîn jî di nava gelek şert û mercên zor re derbas bibû. Ew bi hişyarî û wêrekiya xwe dihat naskirin. Belê gelek hevalên ku hê destana wan ya lehengiyê nehatiye nivîsandin hene. Roj wê bê, her yek ji wan wê bibin dîrok, felsefe û ezmûneke jiyanê. Her çendî em bixwazin qehremanî û jêhatîbûna wan binivîsînin jî, wê bidawî nebe. Ji ber wan rastiyan jiyana azad ya jinê avakirin û wê bidin jiyankirin jî. Wê her yek ji wan bibe stêrkek li asîman, wê bibin sembolên kedkarî û lehengiyê. Ewê di doza xwe ya mafdar de serbikevin û wê rastiyan rabixin ber çavên bêwijdanan. Wê qêrînên azadiyê hê zêdetir bilind bibin. Jixwe, bi sedan zarokên keç yên li pey wan çavên xwe li jiyanê vekirî, navên wan

perişteyên azadiyê rakirine. Dê ew bibin şagirtên şopdariya rêya Rêber Apo û azadiya jinê. Belê, ev tenê dilopekin ji wê deryayê...

**Rêhevalên Rojê**
Rêhevalên rojê
Stêrkên azadiyê
Hevalên pêşerojê

Leşkerên ronahiyê
Rûyên we yê nazîk
Çavên we yên reşbelek

Bejnên delal û xweşik
Keziyên sor û zer xelek
Hêviyên bi milyonan

Radipêçin rext û çekan
Şer dikin ew wek şêran
Qet natirsin ji neyaran

Neyar wek seyên harin
Dev bi xwîn û çav sorin
Dixwazin me xilas bikin

Em nahêlin serî rakin
Ew rabin dê me biqelînin
Ji rêyan derxînin

Dê tolê ji me hilînin
Rê nadin em azad bin
De rabin serî rakin.

Sembolên berxwedanê
Perişteyên azadiyê
Pêşengên biratiyê
Hêviyên azadiyê...

**Viyana Nemir**

Mamoste Viyanê di dibistanan de nirx û rûmeta şehîdan bi me dida zanîn. Ji me re digot; "naskirina şehîdan ne tişteke hêsane. Gelê Kurdistanê yê bindest û hejar, bi felsefeya Rêber Apo û xwîna wan şehîdan gihiştiye asta herî bilind ya serkeftinê. Ji ber ku şehîd weke ronahiya şevên tarî û ronahiya çavên mirovên korin."

Heval Viyan êdî hûn jî bûn şehîd, hûn jî çûn li gel hevalên xwe, we jî navê xwe hişt li pey xwe. We jî bi awayeke lehengî û qehremanî ji deryaya Rêber Apo ya zanînê para xwe girt. Hûn bûn sembola azadiya jinê û xwesteka we herdem azadiya jinê bû. We dixwest bibin pêşengek jin û cihê xwe di nava tevgera azadiyê de bigrin. Mamosteya min ya hêja û bi rûmet; we hezkirin û hevaltî bi me da nasîn. Mamosteya min, we rengê berxwedanê da jinên şoreşger. Hûn aşiqê dozê, evîndarê azadiyê bûn. We cudahî nedixist navbera keç û xortan. Ji ber wekhevî û rêzdarî ji bo we bingeh bû. Hûnê tu carî nemirin, hûnê herdem di dilê me de bijîn...

**Nûra Çavên Dayîkan**

Ji dil û can evîndarê te me, mamoste Viyan Soran
Nizanim bê we çawa jiyan bikim, gul rihana çiyayan
Viyan dihate xwarê ji Qendîlê û Xinêrê ber bi Botan

Yekser dengê wê diçû li ber guhên dijminê har
Keç û xortan bawerî bi hêza we anî baza çiya û newalan
Bi dengê nalîna we hejiya deşt, lê derketin ciwan

Gelê Kurd bi reng û dengê we hatin ba hev li Botan
We zanîn da me gelek kesan, mamosteya şervanan
Tu bûyî kaniya jiyanê, hevala Vîyan Soran

Di mêrxwasiya qada rûmetê de her bê hempa bû
Herdem ji bo her kesan serkêş û dildar bû
Hêvî û baweriya dilê me, nûra çavê dayîkan bû

**Sorxwîn Jiyan e**

Sorxwîn jiyane, giyane, mamosteya gelane
Mûrad, Firat diherikin, nalîna we digîhîne hevalane
Rihana li devê çeman, bêhna gula devê kaniyane
Tu binefşî, sumbulî, evîna dilê hevalanî
Sorxwîn jiyan avakir li çiyayan û deştan
Li Botanê bi wêrekî dengveda nava Kurdan
Şekîf, Xinêre bû warê we, rext û keleş xemla we
Gula Zaxros û Botanê, şopdara Zîlanê
Wek bazan difirin li Kurdistanê
Lehenga Kurdistanê gul çand li Botanê
Xwedavendin, sorgulê destên dayikanî

(Ji bo bîranîna hevala Sorxwîn)

**Şehîd Adil**

Şehîd Adil Bilikî, li gundê Bilika çavên xwe li jiyanê vekiriye. Gundê Bilika ku dikeve rojhelatê çiyayê Cudî, bi erdnîgariya xwe ya çiyayî gundeke ku dijmin bi asanî nikare bikevê ye. Rêyên gund heta tu bêjî asêne. Ji ber li ser xeta sînore û ji ber mercên xwe yên çiyayî, hem ji aliyê Bakûr, hem ji aliyê Başûrê Kurdistanê ve pir rêxistin di dema xwe de li derdora vî gundî bicih bûne. Ji ber sedema xurtbûna hestên Kurdewariyê xelkê gund gelek caran bi şêweyeke çalak alikarî dane van rêxistinan. Heval Adil jî di navendek wisa de çavên xwe li jiyanê vedike. Dibistana seretayî heta refa çaran di gund de dixwîne, refa pêncan jî ji ber sedema girtina dibistanê li gundê Bêspin, li gel xalê xwe dixwîne. Di van pêvajoyan de birayê wî yê mezin di pevçûnên PDK'ê û dewleta Iraqê de, di nava hêzên PDK'ê de şehîd dibe. Di heman demê de ji ber sedema xwîndariyê birayek wî salên dirêj di girtîgehê de dimîne. Çend birayên wî jî di heman demê de leşkeriya artêşa Tirk dikin. (Di wan deman de ji ber sedema bê rêkûpêktiya serjimêriyê çend kes ji heman malbatê bi hev re diçûn leşkertiyê) Malbata heval Adil jî weke malbatek Kurd bi awayeke ji hev parçebûyî û belave jiyan dike. Zarokê herî biçûk yê malê heval Adil e. Heval Adil di nava van zoriyan de hem li malbatê xwedî derdikeve hem jî di milê din de li himber ew dewleta ku ew qas

çewisandin li ser malbata wî pêktanî, her diçe hêrs û kîna xwe zêdetir dike. Ji ber van sedeman hezkirina wî ya li himber rêxistinên Kurd her diçû zêdetir dibû. Piştî darbeya 12’ê Îlonê gelek ji van rêxistinan di herêmê de bandorên xwe winda kiribûn. Belê piştî pêkhatina pêngava 15’ê Tebaxê di nava gel de dengê gêrila belavbû û hêviya gel ya ku di encama 12’ê Îlonê de şkestibû, bi 15’ê Tebaxê re careke din şînbû. Di wê demê de heval Adil ku li gel çar hevalên xwe li zozanan pez diçêrandin, bi qanûna neçarî gerîla pêk tanî, bi ‘qanûna eskerî’ tevlî refên gerîla tê kirin. Ji ber sedema xizaniyê helwest datîne û dibêje; “Yan hûnê min bikujin, yan ezê vegerim.” Dixwaze bizivire, belê hevalên ku vê wêrekiya wî dibînin, pê re diaxivin û îqna dikin. Bi vî awayî heval Adil ji dil biryara tevlêbûna tevgera azadîxwazan dide. Heval Adil ku di derfetên giran yên Cudî de mezin bûye, ji ber tecrûbeyên xwe yên jiyana çiyayan, nêzikatiyên wî ya çek û gêrilatiyê di demeke kin de di têkoşîna gerîla de dibe keseke jîr. Di demek kurt de erkê fermandariya herêmê hildigre û çendîn çalakiyên serkeftî li dar dixe. Di encama vê yekê de çewisandinên sistemê li ser herêm û malbata wî zêde dibin û navê wî li herêmê belav dibe. Temenê wî yê biçûk, belavbûna nav û dengê wî û peywendiya wî ya bi gel re bandor dikir. Piştî sala 1989’an di encama bandora hevalê Adil de mirovên gund têkiliyên xwe ji rêxistinên din qut kirin û bi giştî bûn alîgirên PKK'ê. Her wisa ji ber vê yeke, ji wî gundî gelek ciwan tevlî refên gêrîla bûn. Ew ji hêla ciwanên gund ve hertim weke mînak dihat dîtin. Piştî salên 1994’an di herêma Botanê de li Cûdî serfermandarê tabûrê bû. Bi wêrekî û şerkeriya xwe di nava gêrîlayan de weke mînakekê dihat dîtin.

Di sala 1994’an de tabûra ku ew li ser bû ji du yekîneyan pêkdihat. Heval Adil di heman demê de berpirsê yekîneya yekem jî bû. Di 94'an de yekîneyên xwe li Çiyareşkê bicih kirin. Her wisa di wê pêvajoyê de ji bo bîranîna şehîdên Çiyareşkê çalakiyên gelek serkeftî encam dan. Ev çalakî hem ji aliyê partiyê ve hatin xelat kirin û hem jî heval Adil di 5'emîn Kongreya PKK'ê de weke alikarê endamê komîteya navendî hat hilbijartin. Piştî vê pêvajoyê di sala 1997’an de derbasî gel Rêbertiyê dibe. Di wê demê de tasfiyekariya Zekî hebû. Zekî di wê demê de dixwest gerîlayan marjinal bike, ji şer dûr bixe û bîne rewşeke ku nikare şer bike. Heval Adil di sala 1996’an de li hember van meylên tasfiyekariyê gerilatî hin bêhtir xurt kiribû û pir çalakiyên xurt

pêkanîbûn. Di qada pratikê de bû bersiv û dîsa di qada Rêbertiyê de bi sekna xwe ya îdeolojîk a li hember tasfiyekariyê şerê xwe meşand. Li himber jiyan, xitabet û nêzikatiyên Zekî yên li dijî hevaltiyê û bi taybet li hember nêzikatiyên Zekî yên li dijî rastiya Serokatiyê tekoşineke giran meşand. Heval Adil ji sekin, jiyan û nêzîkatiyên Rêbertiyê pir bandor bibû. Di vê wateyê de pir girêdayî Rêbertiyê bû. Li hember pirsgirêkan perspektîfên çareseriyê yên Rêbertiyê esas digirt. Dema ji qada Rêbertiyê derket, got; "Ez weke cenazeyekê hatim vir, belê bi alîkariya Rêbertiyê da min û hêza min jê girtî, weke qehremanekê ku bikaribe di şoreşê de pêşengiyê bike, berê xwe didim qada têkoşînê." Bandora Rêbertiyê ya li ser xwe bi vî şêweyî bilêv dikir. Dema ji qadê qut bû, her çendî dixwest biçe herêmek din jî, Rêbertiyê ew dîsa weke berpirs şand herêma Heftanînê. Heval Adil di sala 1998'an de derbasî herêma Botanê bû û xebatên xwe li wir meşandin. Di pêvajoya 1999'an û 2000'î ya paşvekişandinê de dîsa ji bo Heftanînê hat erkdarkirin. Heval Adil ku gotinên Rêbertiyê di vir de jî bi jiyanî kir, ji dîl girtina Rêbertiyê pir bi bandor bibû û dida diyar kirin; "ji ber ku me erkên xwe pêkne anîn Rêbertî dîl hat girtin." Di sala 1999'an de, piştî paşvekişînê di pir kesan de belavî û şkestin hat dîtin, lê heval Adil karîbû çêkera xwe di hêla îdeolojîk û leşkerî de li ser piyan bigre û bi vî awayî karîbû xwedî li Rêbertî û şoreşê derbikeve. Di zivistana 2000'î de, li ser vî bingehî û perspektîfan nêzî rêxistinbûna perwerdeyê, çêkirina wargehan û xebatên rêveberiyê bû û ked da. Di bihara sala 2000'î de propagandeyek mezin ku dijmin wê bi hêzeke mezin hem li Bakûr û hem jî li Başûrê welat êrişî hêzên gêrîla bike, derket pêş. Heval Adil amedekariyên ku van nêzikatiyan vala derbixe dikir û dida diyarkirin ku ji bo vala derxistina van armancan pêwîstî bi asteke fedayiyane heye. Her wiha dida diyarkirin ku, radestbûn û bêwêrekî tu caran sernakeve û li ser vî bingehî hêz amede dikir.

Di meha Gulanê de dijminî li hember herêma Heftenînê operasyonek da destpêkirin. Di vê operasyonê de hem di aliyê me û hem jî di aliyê dijmin de pevçûn û çalakiyek giran rû neda. Roja sêyem heval Adil bangawazî li yekîne û hevalên derdorê kir û got; "ev operasyon weke ceribandinekê ye. Dixwazin hêza me ya rêxistinî, psîkolojiya me, asta me ya amadekariyê û bi xwe bawerbûna me biceribînin. Bersiva ku em bidin vê operasyonê wê nêzikatiya li hember

rêxistina me giştî bide diyarkirin. Vaye du rojin me çalakiyên giran lidarnexistin, lê pêwîste ji vir û pêde em çalakiyên giran lidarbixin û li ser vî bingehî pêwiste em bersiveke baş bidin dijmin." Jixwe di vî alî de perspektifên Rêbertiyê jî hebûn. Fermana ku ger dijmin bi ser gerîla de bê, pêwiste gerîla di wê rewşê de xwe biparêzin. Hevalan di cih de xwe li derdor belav kirin û li cihên ku dibe dijmin bixwaze bikevê kemîn danîn û biryar hat girtin ku ger dijmin neyê van cihan, divê bi şev êrîş li ser wan cihên ku dijmin lê bi cih bûye bên kirin. Roja piştî wê, danê spêdê dijmin hat hinek cihên ku kemîn lê hatibûn avêtin. Di encama pevçûnan de dijminî windahiyên giran dan. Pîştî wê hevalan hêzên xwe ji wan herêman kişandin. Hevalan coşek mezin ji vê çalakiyê girtin.

Heval Adil xwedî pêşdîtineke xurt ya leşkerî bû. Li gorî wî pêwîst bû ku di şeran de rîsk bên girtin û ger rîsk neyên girtin, serkeftin jî nayên bidestxistin. Ji ber vê sedemê ji xwe bawer dikir û diket şeran. Hertim digot; "bi rêbazek nû, bi fedaiyane êrîşkirina li ser dijmin wê serkeftinên mezin bi xwe re bîne." Nêzikatiyên wî yên şerê 2000'an bi vî rengî bûne. Heval Adil piştî şerê 2000'an yê Heftenînê, derbasî herêma Qendîlê dibe. Di sala 2004'an de dema pêngava 1'ê Hezîranê destpê dike heval Adil li herêma Zagrosan e. Di vê pêvajoyê de sekna hindek kesan ya "em çalakiyan nakin, di çalakiyan de şehadeta hevalan hemnirxê cinayetê ye" weke helwesteke tesfiyekariyê didît û dida diyar kirin ku; "me weke HPG'ê berpirsyartî girtiye, me soz daye Rêbertiyê û gelê xwe. Ev berpirsyarî bê şer bi cih nayê. Di şeran de dibe ku windayî çêbibin." Ev rewş bû sedem ku li hember pêvajoyê zelalbûnek derbikeve holê. Baweriya esasî ya heval Adil ew bû ku digot; "Wê ev şoreş serbikeve." Di her derfetê de bi sekin û nêzikatiya xwe ya ku 'emê sekeftinan bi dest bixin' bi me dida hîskirin. Bi taybet jî di derfetên pratikî û di şer de xetimîn û windakirin nedipejirand. Li hember dijmin wendakirinê tu carî qebûl nedikir. Di mercên herî zehmet de, ne tenê derbaskirina xetimîn û windakirinan, bidestxistina destkeftiyan jî esas digirt. Di pratîka gêrîlatiyê de ji heval şehîd Ezîz bandor bibû. Digot; "Heval Ezîz bandora ji Rêbertiyê girtî di sekna xwe de hertim dida diyarkirin. Dikarîbû derfetekî herî biçûk jî binirxîne û ji derfetên kêm serketinê biafirîne." Afirandina derfetan ji xwe re bingeh digirt û her wiha nedipejirand ku hevalên di çêkera wî de bi tengavsiyan re rû bi rû bibin. Dida diyar kirin û digot; "Divê serfermandarek çêkera xwe birçî û di nava bê derfetiyan

de nehêle." Ti carî ew westiyayî û ji hal ketî nedihat dîtin. Her çalakiya ku ketinê, her weke ku çalakiya yekeme bi coş û xurûş pêşwazî dikir û beşdar dibû. Çêker û rêveberiya xwe her dem ji bo şer amede dikir û di wan de daxwaziya şer pêşdixist. Di amadekirina çalakiyan de, li hember her wirdekariyekê bi baldarî tevdigerêya. Dîsa di keşfan de tiştên herî biçûk jî didît. Digot; "jêhatîbûna min ya kesî keşif kirine." Ti carî li hember hevalan bi hêrs nedibû. Car caran pirsgirêkên ku li hember hevalan jiyan dikir, mezin nedikir, nedidomand û li hemberî wan bikar netanî. Li hember kesên xwedî meyla tasfîyekariyê dibû xwedî hêrsek mezin. Tu caran bi wan re nedibû yek. Bi dudilî nêzîkî biryarên ku rêxistinê digirtin nedibû. Ger em îro hene, di saya van hevalên şehîd de ye.

**Çinara Heftenînê**

Axînên dil ji kûr tên şehîd û fermandarî
Xwîn ji cîger û dil herikî wek çem û kanî

Binefş rewşa Botanê nalîna şehîd tînî
Bersîv dane dijminên harin li nava dil danî

Heval şehîd Adilê Bilikî şalûlê gelanî
Ferasetan dizanî, sorgulî rihana nava dilanî

Hûn lehengên çiyayan, Kelhên Cizîra Botan in
Awazê Dicle û Ferat in, fermandarên Qendîlanin

Botan bi we serbilinde, bahozên çol û çiyan in
Ji bo gel hem şoreşger hem xwendevan in

Botan û Serhed bi têkoşîna we hat xemilandin
Şehîdê bar giranin, Kurd bi we serfirazin

Lorikên çavê dayikan, awazên xwîşk û birayanin
Botan bi we bûye bax û bostan û Kurdistan

Hûn navnişana Kurdistan, warê egîd û şêran
Germahiya dilê keç û xortên azadîxwazên gelan

Hûn bûn awazên li ser dev û zimanê Ariyan
Heval sterkên li ezmanan şewq daye erdan

Pênûsa destê Rêber Apo, sorgula dilê geşanin
Hûn şoreşgerin, heyva çardehan, şemala dilanin

Baweriya welatparêzan, bîranîna rêhevalan in
Çinara Hefteninê, roniya çav û dilan in

Şehîd Adil rêhevalê rêya jaranî
Baweriya Kurdan, cewherê jiyana mirovanî

**Şehîd Kurtay**

Dayê dike qêrîn û hewar, nalîn û axînê ji dil dikişîne
Wek bilbila dil şikestî bi hewar lorikan dibarîne
Dayê li nava çavê min biner, zana, zîrek û rûgeş be

Keç û xort dixwînin, zana û hêja dibin wê tolê hilînin
Keç û xortan feraset û zanabûn hildan ji evîndaran
Dayîka mezin Kurdistan li ser ceng û şere, dilgeşin

Xwîna şehîd Kurtay bû şîara li ser ziman
Xwin rijîya li nav çemê Hêzil, giyan da bindestan
Keda we bir pîroze bahoza Heftenîn, Kela Memê

Serî li dijmin dida êşandin fermandarê leheng
Şervanên Apoyî dijmin dane tirsandin bi mirinê
Dîtina şervanên Rêber, dilgeşiya xwîşk û birayan

Di xêyalên xwe de bi biryar û navdarên jiyan in
Kurtay bi çek û rextan xwe xemiland, bi gul û tîran
Rênase, pêşenge, fermandarê keç û xortên Kurdan

Bazê ezman li çiyayê Zaxros û Behdînan
Bîranîna gelan, baweriya dayîk û xwîşkan
Rihana cîhanê bêhn dide li Kurdistan

Waye bilbil dixwînin, bazê Mazlûman e
Egîdê Kurdan, evîndarê rêya Rêber Apo ye
Hûnin parêzvanê zarokên gelên bindestan

Hûnin ronahiya Kurdan, derya şoreşgeran
Bakûr, Başûr, Rojava û Rojhilat gula destan
Li gola Wanê gulên wê herdem şîn bimînin

Li Gebarê ba û bahoza li ser dijminên har in
Rondikên dayîkan li ser rûyê keç û xortan
Evîna Xecê û Siyabende evindarê Kurdan

**Şehîd Şervan**

Di van rojan de kurê birayê min mela Abdûlah yê bi nasnav Şervan, şehîd bibû. Birastî jî ez gelek xemgîn bûm. Ji ber ku li vê cîhanê ji nava refên pîroz xatir xwest û rêya zelal nîşanî me da. Di vê aliyê de keyfxweş dibûm, ji ber ku helwesta wî rast bû. Hevalên ku wî nasdikirin, ji ber ku rêhevalek xwe yê tekoşînê winda kiribûn, di rûyê wan de xemgînî hebû. Lê belê dîsa jî li beramberê hemû êş û xeman sond dixwarin ku rêya wî bişopînin. Hemû hevalan xemgîniya min parve dikirin û ji min re dibûn alîkar.

Heval Şervan ji malbetek welatparêze. Bavê hevalê Şervan xwedî gelek berhemên bi zimanê Kurdî ye; weke wergerandina Quranê bi Kurdî. Ji bo Partiyê her tişta ku jê re bihata gotin gav paşve nedavêt. Jixwe berendamtiya şaredariya Erdişê, namzetiya parlementeriya Sêrt û Semsûrê kiriye. Çi kar diket ser milê wî, pîroz didît û xwe paşve nedida. Di sala 1993'an de deriyê mala xwe ji şoreşgerên Rêber Apo re vekir û ew derî hertim vekirî ma. Li Serhedê keç û xortan ji bo şoreşa pîroz xwe amade dikirin. Kenê li ser lêvên wan kêm nedibûn. Coş û kelecana keç û xortan ji rûyê wan diyar dibû. Heval Şervan jî wê bibûya endameke

şoreşgerên Apoyî. Hê temenê wî negihiştibû 14'an. Ew evindarê şehîdan û Rêber Apo bû. Hertim dixwest cihê xwe di nava refên gêrîla de bigre. Rêya şehîdan, felsefeya Rêber Apo jê re bûbû evîn. Lewra biryar dabû ku tevlî govenda şoreşgeran bibe, tişta bikeve ser milê wî bi teori û piratîkî pêkbîne. Di nava partiye de nasnavê wî Şervan e, di malbatê de navê wî Zana Varli ye û li Enqerê tevlî nava refên gêrîla bibû.

Dîroka ji dayikbûnê ya heval Şervan 1975'e. Ji beriya tevlîbûna wî, bavê wî bi Kurdîtiyê hat gunehbarkirin û bi destê dewleta Tirk hat koçberkirin. Bi neçarî berê xwe da Enqerê. Heval Şervan li qadên pratîkî yên weke Zagros, Şehîdan, Îran û Qêndîlê maye. Di sala 2004'an, di dawiya meha Cotmehê de li gundê Lewcê tevlî karwanê nemiran bû. Lewcê gundeke giredayî Qendilê û nêzî Suredê ye.

Navê dayîka heval Şervan Xanim e, navê bavê wî Mela Abdûlah Varli ye û malbata wan bi navê mala Hacî Hokê tê naskirin. Ji eşîra Xanî ne. Mela Abdûlah ji gundeke Geliyê Zîlan e. Navê gundê wan Boynûzliya girêdayî navçeya Erdişê ya ser bi bajarê Wanê ye.

**Lawê Geliyê Zîlan**

Min bihîst rêheval Şervan bûye şehdîdê Kurdan
Lewcê xemilî bi xwîna Şervan, şopand rêya Viyanan

Dixwîne wek bilbilan, awazên rastîn dibêje bo gelan
Awazên wan bilind dibin li nava dol û geliyan

Hunin ronahiya Kurdan, emê bişopînin rêya Egîdan
Bişkivîna kûlîlkan deng vedan li çiyayên Kurdistan

Botan bûye hêlîna evîndaran, cih girtin bi deh hezaran
Şervan fermandarê şervanan, heland dil û cergê dijminan

Ararat bi xwînê xemilandin, deng da li bajar û gundan
Nalîna we ji çemê Zîlanê dibişkivîne gul û rihanan

Ew şirînahiya Şervan, ket nava karwanê şehîdan
Dengê we kete guhan, çi nalîneke kûr dihat ji dilan

Rêber Apo taca serê zarokên Ariyan, ew e jiyana gelan
Mîna şalûl dixwîne bi awazên xwe, nazdarê şoreşgeran

Evîndaran xwe şewitandin, natirsin ji hirç, gur û rûviyan
Ez heyranê dilê karkeran, we şopand rêya Ezimeyan

Lehengin li Qendîlê dimeşin wek bahoza li Serhedan
Dayê negrî, nebarîne lorikan, em şervanên Rêber in

Dayê keyfxweş be bi evîn, da ku neperçiqînin xwîşk û birayan
Ban dikim li xwîşk û birayan, werin rakin çeka heval û hogiran

**(Ji bo bîranîna Şehîd Şervan)**

**Malbata Hevala Ronahî**

Bapîrê heval Ronahî ji gundê Tewladirê ya ser bi navçeya Erdîşê ye. Di nava gel de weke Hecî Silêmanê Holî tê naskirin. Birayê Hecî Silêman di komkujiya Geliyê Zîlanê de hatibû qetilkirin. Piştî komkujiyê, li gundê Qerekeşîşê yê girêdayî bajarê Bidlîsê bicih dibin. Îsmet Erîşen ku bavê heval Ronahî ye, li vî gundî çavên xwe li jiyanê vedike. Îsmet di 19 - 20 saliya xwe de bi keçeke nave wê Ezîze re dizewice. Hê di temenê xwe yê ciwaniyê de rastiya bi êş ya komkujiya Geliyê Zîlanê hertim ji vegotinên bavê xwe bihîstiye û rastiya Geliyê Zîlan bandoreke gelek mezin li ser wî çêkiriye. Îsmet Erîşen bi destpêkirina têkoşîna aadiyê re li hember Apociyan bûye xwedî hezkirinek mezin. Tenê bi vê ve jî sînordar nemaye û bi salên 1990'î re cihê xwe di kar de girtiye. Di sala 1993'yê de li şaredariya Ercişê dest bi karê partiyê kiriye. Ev dîrok di heman demê de dibe dîroka qutbûna wî ya ji çepên Tirkan û ketina nav kar û xebatên rêxistinkirina partiyê. Dema Mela Abdûlah Varli bû berendamê şaredariya Erdîşê, Îsmetî herdem alîkarêya wî dikir. Bêguman wê demê zordariya dewleta Tirk li ser gel gelek zêde bû. Hema bêje hertim gel bi bê derfetiyan re rû bi rû dihiştin. Di zivistana heman salê de berfeke gelek zêde hatibû, ji ber sir û seqema zêde tirimpêlan kar nedikirin. Îsmet û Zeydîn Yilmaz di wê qiyametê de, bi armanca pêşwazîkirina Mela Abdûla Varli çûn Wanê. Piştî demekê Abdûlah Varli bi xwe re anîn. Ev yek di nava gel de bû sedema coş û xurûşeke mezin.

Min hersê keçên Îsmet yên bi navê Senem (Ronahî), Zozan(Amara) û Bêrîtan hê ji biçûkahiya wan nasdikirin. Senem li gel biçûkbûna temenê xwe jî keçeke jêhatî bû û di nava ciwanan de karê rêxistinî dimeşand. Carna her du xwîşkên xwe jî bi xwe re digerandin. Senemê di Îlona sala 2002'an de biryara xwe ya tevlîbûna refên gêrîla da. Di nava tevgera azadiyê de navê wê Ronahî Denîz bû. Min di sala 2003'an de heval Ronahî li Dola Kokê dît. Ronahiyeke zîrek û zana li pêşberî min bû. Di hevdîtina me ya yekem de got; "Ev der cihê rastiya sebrê ye. Ger hûn bikaribin vê yekê di xwe de pêşbixin, hûnê bikaribin di nava demeke kin de ji hêla hevalan ve bên hezkirin." Gotinên wê dilê min geş kiribûn. Ez gelek keyfxweş bûm ku piştî karkirina li herêmê, vê carê jî em her du li çiyayên azad bi hev re bûn. Got; "Rêbertî dibêje, tecrûbeyên kalan ji bo ciwanan rênîşandere. Lewra kesên kal di heman demê de rewşenbîrên

gelê xwe ne. Hevalê Hecî, ciwan bi hêza ku ji Rêber Apo û şehîdan wergirtine, wê bikaribin vê rêxistina pîroz bigîhînin serkeftinê û weke agireke gur li hemû cîhanê berbelav bikin. Wê demê aştî û aramî dikare li cîhanê pêkan be. Bi tenê em wê demê dikarin Rêberê xwe ji mercên dîlbûnê rizgar bikin. Tu jî here perwerdeyê bibîne, da kû bikaribî bi zîrekî beşdarî nava xebatê bibî.”

Di wê kêliyê de heval Cuma ji mangê derket ber derî, berê xwe da heval Ronahî û jê pirsî; “heval Hecî çiyê we ye?” Heval Ronahî bersivand û got; “Apê min e.” Heval Ronahî ji eşîreta Bekirane; keç û xortên vê eşîrê ji kesên temen mezin re dibên 'Apo.' Ev yek nîşaneya rêzdariyê ye. Di eslê xwe de em tenê cîranê hev bûn û tekîliyek me yên xizmaniyê tunebû. Piştî van axaftinan, heval Ronahî ji min û heval Cuma xatir xwest û çû cihê xwe yê xebatê.

Heval Ronahiyê li qadên weke Dola Kokê, Şehîd Harûn, Şehîdan û gelek deverên Rojhilatê Kurdistanê kar meşandiye. Hevala Ronahî di 29'ê Kanûna 2007'an de bi armanca tola hevalên xwe ku ji hêla hêzên rejîma Îranê ve hatibûn şehîdkirin, li dijî baregeheke pastaran ya li Makuyê çalakiya fedaiyane li darxist û di encama vê çalakiyê de gelek pastarên rejîma Îranê hatin kûştin.

**Ronahî**

Ronahî rêya we bi ronî
We hilda bi berxwedanî

Bi tilîliyan we tol hilda
Temaşe bikin hat keça Kurdan

Dayîkan îro bi tilîliyan
Darbesta we hildan ser milan

Bi hev re gotin berxwedan jiyan e
Hûn nayên ji bîrkirin keça Kurdan

## Serlêdana Heval Emer

Min dixwest serdana hevalan bikim. Hûn dizanin ez pîremêreke gerokim. Dema mirov ji ked û xebatan dûrket, tişta para mirov dikeve, ger e. Di destê kalên Kurdan yên wek min de tişta dimîne ev e. Min li cihekê heval Hemze Dêrtu dît. Heval Hemze ji Surûcê bû û Dêrtu navê gundê heval Hemze ye ku nêzî Amarayê ye. Heval Hemze rojekê hatibû cihê ku em lê diman. Xorteke ji serî heta lingan lihevhatî û simbêl reş bû. Ajokarê tirêmpêla heval Cuma bû. Min xêrhatina wan kir. Pişt re min çaydana çayê danî ser çarberê, keland û danî ber wan. Di wê kêliyê de min ji hevalan xwest ku silavên min bigîhînin heval Cûma û têbîniya min ji bo wî nivîsandî radestî wî bikin. Min di têbîniya xwe de ji heval Cuma destura çûyîna Arê xwestibû. Piştî çend rojan destura heval Cûma ya bi nivîskî ji hêla heval Mehmûdê Mêrdînî ve gihişt destê min. Li pey vê yekê, min berê xwe da biryargehê ku heval Xebat li wir dima. Bi keyfxweşî ez pêşwazî kirim û me bi hev re taştê xwar. Li ser sifrê penîr, zeytun, hingiv û gûz hebûn. Me dest bi xwarinê kir. Heval Xebat got; “Rêya hûn lê biçin dûre, hûn bi rê bikevin, ezê jî piştî qederekê xwe bigihînim we.” Me bi vî rengî berê xwe da Arê û em meşiyan. Rêwîtiya me pir xweş bû. Li her du aliyên rêya me daristan hebûn. Xakurkê rihê jînê dida mirovan. Mîna ku hemû daristan bi dengê teyr û tuyûran radibû û rûdiniştin. Dengê hin ajalan mirov ditirsandin. Dengê bazan ji latan dihat. Em her diçûn nêzî Ermûş û Arê dibûn. Jixwe ev demek bû ku baranê jî destpêkiribû. Dengê şivan û berxan ji kûrahiya dolan dihat û Xakurkê bi van dengan dixemilî. Dola em jê diborîn weke dola şehîd Dilşad dihat naskirin. Wê demê careke din hat bîra min ku her bihosteke xaka welatê me, bi xwîna şehîdan hatiye avdan. Piştî meşeke dirêj, tevî ku taqeta min nemabû jî, lê hêviya ku ezê heval Emer û hevalên li gel wî bibînim, hêz dida min û ez keyfxweş dikirim. Beriya bi rêketinê, dema min xatir ji heval Cuma xwest, daxwaziya wî ew bû ku ez bi aramî biçim û vegerim. Tişta herî balkêş ewe ku cihê ez biçimê di navbera tixubên sê dewletan de bû; ango sêgoşeya Îran, Iraq û Tirkiyê bû. Girîngiya vê derê ewe ku Serokatî ji bo vê derê dibêje “Sêgoşeya Zêrîn.” Di dîrokê de heta roja me ya îro, xiyala her kesan ewe ku vê sêgoşeyê bi dest bixin. Vê sêgoşeyê, em ji Îskender bigirin heta Selçûqî û Osmaniyan, her wisa ji Bîzansan heta Romayê, tu hêz nepejirandiye û nehiştiye ku ew tê re

derbas bibin. Ev Sêgoşeya Zêrîn bûye cihê bîrdoziya Serokatiyê. Yên ku vî cihî û vê bîrdoziyê parastin, şervanên azadiyê bûn. Ev cih, ew der bû ku bîrdoziya Serokatiyê ji tevahiya cîhane re jê belav bibe. Sêgoşeya Zêrîn di wê wesfê de bû ku ji tevahiya şaristaniyan re dergûşî kiribû. Ev gotina Serokatî di cih de ye û rastiyeke; "Elbet hemû zarokên ku ji vê dergûşê derketine wê rojekê şaristaniya destpêkê li vê derê bivejînin." Eger ez têbiniyekê ji Ehmedê Xanî jî bejim, wisa aniye ziman; "Me mezinan emel betalan, hêviya me bi zarokan!" Van zarokên ku vî hozanê mezin qala wan kirî, şervanên azadiyê yên Rêber Apo bûn. Heval Xebat ji dûr ve banî me kir. Dengê heval nedigihişt me, li girekê bû û bi xwe hat, xwe gihand me. Dema heval Xebat ez birim hevalekê jî du hêstir anîbûn pêşiya me û li benda me bû. Ez û heval Xebat li hêstiran siwar bûn û em ber bi heval Emer ve bi rê ketin. Em di nava daristanek gur de ber bi pêş ve diçûn. Ber bi newaleke nêzî hezar metre kûr ve serberjêr meşiyan. Bi ser pirekê re derbasbûn, min ji hevalê kêleka xwe pirsî ka çima ji vê pirê re dibêjin pirê Mam Gur. Got; "navê Mam Gur Brûske, ji ber gelek ji xwarina goşt hez dikir hevalan ev nav lê kirine." Paşê em li rastî pireke balkêş hatin. Pireke daliqandî bû ku hevalan ew li ser ava Lolanê çêkiribûn. Ji ber ku hêstir ji pirê ditirsiyan, nikarîbûn di ser re derbas bibin. Ji ber wê, me tevî hêstiran xwe li avê da û em derbasî aliyê din bûn. Min ji heval Xebat pirsî; "Gelo kê ev pir çêkirine?" Got; "Hevalan çêkirine. Pireke din jî heye, mîna vê ye." Livîna pelan bi hatina bayê li her du peravên avê, her wisa dengê çûkan û ya avê weke melodiyekê dihatin guhên me. Me bêhna gulên li qeraxa ava Lolanê bi sermestî dikişand hundirê xwe. Dema min serê xwe rakir û li derdora xwe mêze kir, ez têgihiştim ku ev der warê teyrên baz in. Xwediyên ebedî yên vê xweşiya xwezayê, şervanên azadiyê yên Rêber Apo bûn. Di rê de me li cihekê bêhna xwe da ku jê re tê gotin "Şelosê." Piştî ku me hêstirên xwe bi singekê ve girêdan û me berê xwe da cihê ku em bêhna xwe lê vedin, du hevalên bi navê Dêrsim Meletî û Abdûlah Rûs li ser kaniyê rûniştî bûn. Piştî ku me silav da hev du, me her yekê tasek av ji wê kaniyê vexwar. Dema em rûniştin û me dest bi suhbetê kir, heval Abdûlah ji çaydana reş çay ji bo me dem kir. Me bi heval Dêrsim re dest bi suhbeta hevnasînê kir. Jixwe min heval Abdûlah di rêwîtiyên xwe yên berê de naskiribû. Min li wê derê di dema suhbetê de fêm kir ku heval Xebat fermandarê Eyaleta Xakurkê ye û heval Dêrsim jî alîkarê wî ye. Ez

li vê derê careke din bûm şahidê wêrekî û dilnizmiya heval Xebat. Di vê navberê de me xwe gihand daristaneke bi heybet. Dema min serê xwe bilindkir, li pêşberî min biheştek hebû ku bi hemû rengên gulan hatibû xemilandin. Min bi rêya zanyariyên hevalan zanî ku ew der Goristana Şehîd Bêrîtan e. Em ji hêstiran peyabûn û ber bi goristanê ve meşiyan. Me bejna xwe li hember şehîdên xwe tewand û me bi deqîqeyekê rêzdarêya xwe ji bo şehîdên xwe nîşan da. Gorên şehîdan bi kevirên mermer hatibûn xemilandin. Min nedixwest ji vê biheştê dûr bikevim. Goristan ji ber darên fêkiyan reng bi reng xuya dikir. Hemû cureyên fêkiyên payîzê yên weke sêv, hirmî, tirî, şîlan, guhîj û wûşiyên wan li daran ba dibûn. Min hinek ji wan fêkiyan xwar. Heval Xebat got; "rabin hevalno, ji bo hûn zû bigîhîjin cihê xwe, emê bi rê bikevin." Di wê kêliyê de hin heval ji dûr ve xuya kirin, çek di destên wan de berbi me ve dihatin. Di nava koma hevalan de heval Aryen Berbihîv, heval Sema Ecem û heval Emer jî hebûn. Bi meşên xwe yên lez û bi disîplîna xwe ve ewlehî û bawerî didan dora xwe.

Dema min heval Emer dît, hem dilgeşî hem jî tirs di min de peyda bû. Di encam de ew xiyala min pêk hat, min û hevalê Emer destê xwe da hev. Hestên kûr yên coş û kelecanê ez rapêçandibûm. Eger ez hinekê qala heval Emer bikim; bejna wî ne pir bilind û hinekî qelew bû. Heta bêjî hevaleke rûbiken û dilnizim bû. Her çend heval Emer berpirsyarê Arê bû jî, hestê berpirsyariya xwezayî di hemû milîtanên PKK'ê de hebû. Ji ber ku di felsefe û bîrdoziya Rêber Apo de paye ne tiştek e teqez e; lê ya esas berpirsyariya xwezayî ye. Piştî ku me destê xwe da hev, heval Xebat ez spartim hevalê Emer û têbîniya min ku heval Cûma jê re nivîsandî me radestî wî kir, me xatir ji heval Xebat xwest û em ber bi baregehê ve birê ketin. Ji ber rewşa temenê min, heval di dema meşê de bi min re bûn alîkar. Hevalekê çenteyê min hilgirt, hevalê Serxwebûn jî da pêşiya me û em ber bi cihê biçin ve bi rê ketin û em gihiştin baregehê.

Heval Serxwebûn herêma Arê bi me dida nasîn. Ji me re wisa vedigot; "erdnîgariya Arê pir dijware, her wisa di nava berwar û qontarên çiyayan de ye. Evdilkofî û Xakurkê bi daristan in û li jêra wan jî zozan in. Daristanên wan gurin û bi gelemperî ji darên berû, mazî, çinar, gûz, spîndarê pêk tên. Her wisa darên fêkî yên weke tirî, sêv, hirmî, hejîr, heluk û guhîj jî hene. Her wiha em van fêkiyan hem dixwin û hem

jî wan hişk dikin ji bo zivistanê. Her sal em nêzî 80 torbe gûz kom dikin; a herî girîng jî salê herî kêm 10 teneke hingiv kom dikin. Her wiha xebatên çandiniyê jî dikin, ji ber ku axa Arê pir bi berekete. Zeviyeke ku me îsal jî ajotibû, dikarim weke mînak nîşanî we bidim. Her wisa diyare ku di zeviyên çandiniyê de firîngî, bacan, xiyar, îsot kundir, zebeş, qitik, gindor û dendikên gulan digihêjin û du tabûr ji vana sûd werdigrin. Gundiyên tên zozanan jî ji vana sûd werdigrin. Bi rastî jî, ji ber dewlemendî û bereketa di xwezayê de, eger ji der ve qût neyê jî, dîsa dikarin bi salan debara xwe bikin û jiyana xwe bidomînin. Zozanên Arê jî her sal dibin cih û warên geştiyarî û seyrana gundiyan. Zozan hênikin û ev jî pir bala gelê Başûr dikşîne. Ji ber ku giyayên van zozanan zêdene û avên wan sarin, hem ji bo gundiyan û hem jî ji bo lawiran cihên pir biber in. Mirov dikare li van deran her çar demasalan di rojekê de bijî. Ji bo mînak, li cihekê ku jê re Kaniya Pîr tê gotin, berfa sedî salan heye. Bilindiya vê berfê nêzî 15-20 metre ye. Em bi giştî ji pincarên zozanan sûd werdigirin. Ji rîwek û pincarên sereke ku heval wan dixwin evin; sîrik, cehtir, mendik, siyabo û bi taybetî jî kêvark. Em ji vê têdigihîjin bê ka têgîna 'Sêgoşeya Zêrîn' a Rêber Apo çiqas di cih de ye. Ji ber ku pêwendiyên me bi gelê Başûr yên ku tên zozanan re başin, her wisa têkoşîna me mafdare û dilsoziya wan bi Rêber Apo re heye, peywendiyeke mezin ji gêrîla re nîşan didin."

Min hem guhdariya heval Serxwebûn dikir û hem jî em ber bi baregehê ve pêş ve diçûn. Heval Serxwebûn qala avên sar yên Arê jî kir. Dema mirov qurtek ji avên zozanan ku li lûtkeyên çiyayan in vedixwe, di wê kêliyê de westana mirov diçe. Dema çavên min bi çiyayên Karker, Sîro û Endes ket, ji min re wisa xuya kir ku ev parêzvanên Sêgoşeya Zêrîn in. Di wê kêliyê de destê min di nava destê heval Emer de bû. Ez pir westiyabûm. Axîna ku min ji nava xwe kişand, derbirina xiyanetê bû ku min li ciwantiya xwe kiribû. Gelo hûn dizanin ez çend salî me? Ez niha 70 salî me. Tevî ku ez heftê salî me, ez bawer dikim ku eger ciwanên Kurd xiyanetê li ciwantiya xwe nekin, dikarin xweşikî, coş, kelecan û berxwedana çiyayên xwe yên azad hilkişînin lûtkeya herî bilind.

Dema ez di nava van hest û ramanan de bûm, heval Serxwebûn bîranîneke xwe ya li zozanan bi min re parve kir. Ez, hevalê Serxwebûn, Şehîd Hebûn û hevalên din em li ser kaniyeke ava wê pir sar rûniştibûn. Heval Serxwebûn got; "Tu hevalê/î di kelekela germa pûşperê de jî

nedikarî di yek bêhnê de tasek ava wê vexwara. Kesê ku ji vê kaniya sar di yek bêhnê de tasek av vexwara, tenê hevalê me Şehîd Hebûn bû. Heval Hebûn piştî mehekê şehîd ket. Piştî şehadeta wî, me navê Şehîd Hebûn li wê kaniyê danî. Heval Hebûn, tevî hevaleke xwe di havîna sala 2007'an de li Şemzînanê di encama kemîna dijmin de şehîd bû. Ji bilî şehîd Hebûn, hîn jî tu kes nikare ji vê kaniyê di yek bêhnê de tasek avê vexwe." Dema heval Serxwebûn gotinên xwe temam kirin em gihiştibûn baregehê.

Dema em gihiştin baregehê, nêzî heft hevalên din jî li wê derê bûn. Ji rabûn û rûniştina wan, ji awir û kenê wan, her wisa ji cil û bergên wan bigirin heta çek û rextên wan, helwesteke wan a gêrîlatiyê ya bi coş hebû. Her wisa di aliyê paqijiyê de jî mîna bazên ku danenibin erdê, paqij xuya dikirin. Hemûyan yek bi yek silav dan min. Hevalek bi navê Bêrîtan, bi destê min girt û min li ciheke ji keviran çêkirî da rûniştandin. Dema ez li cihê xwe rûniştim û min li derdora xwe nêrî, min dît ku mêzeyek pir serûber, ji keviran çêkirî li pêşiya min e. Tam li nîva mêzê jî cihek ji bo çandina gul û kulîlkan hebû. Eger şaş neyê bîra min, 25 cihên rûniştinê li derdora mêzê hebûn. Kanî tam li tenişta mêzê bû. Em tevî hevalan, di serî de heval Emer, rûniştibûn û me çaya xwe vedixwar. Min li milekê çaya xwe vedixwar û li milê din jî bala xwe dida hawirdora xwe. Li ser kaniyê sabûna kezwanan hebû. Di wê kêliyê de min ji bo hin pêdiviyan destur ji heval xwest. Mirov dikare paqijiya wan encex bi vê gotina Şehîd Kemal Pîr vebêje; "Em, bi qasî ku di oxira wê de bimirin ji jiyanê hez dikin." Ez encex dikarim fedakarî, xweşikî û duristiya wan bi vê gotinê vebêjim. Darên baregeha em lê bûn pir gur bûn. Gava ku dema razanê hat min tu kes nedît, ji bilî du nobedaran. Yek ji wan li ser gir û yê din jî li nava wargehê nobeta xwe digirt. Di demjimêr 4'ê spêdê de ez bi dengê rojbaş a nobedaran şiyar bûm. Dema ez rabûm û min li hawirdora xwe nêrî, her kes li ciheke cuda bû. Cihê lê bûn ne diyar bû. Min yek bi yek li hevalan mêze kir. Dest û rûyên xwe bi sabûnê dişuştin. Em hemû dîsa rûniştin li dora mêza ku nava wê bi kulîlkan xemilandî. Penîr, zeytun û hingivê ku ji dareke pir navdar derxistibûn ku dara berûyê ye, weke xwarina taştê danîn ber me. Ez di wê baweriyê de me ku kesek bi dirêjiya mehekê ji vî hingivî bixwe, wê temenê wî 3, 4 sal dirêj bibe. Tevahiya hevalan, ji bilî du kesan, çûn xebatê. Min ji heval Emer xwest ku qala dîroka xwe ya jiyanê ji min re bike û heval Emer dest bi axaftinê kir.

**Jînameya Heval Emer**

Heval Emer di 16'ê Adara 1975'an de li gundê Hestevînda ya bi ser navçeya Elbakê çavên xwe li cîhanê vekirine. Navê dayîka wî Meryem e û yê bavê wî Hecî ye. Heval Emer hîn di dema zarokatiya xwe de bi hevalan re dide û distîne. Hîn di temenê xwe yê 7, 8 saliyê de hevalan dibîne û ji wan hez dike. Bi wê rûkeniya xwe ya zarokatiyê, peywendiyeke heskirinê bi hevalan re danîbû. Ev pêwendiya heskirinê tim dom dike. Dema digihêje temenê xwe yê 9 saliyê, li gundê xwe dest bi dibistanê dike. Her çendî serê xwe datîne li ser çokên diya xwe, lê dîsa jî xewn û xiyalên wî li ser hevalan bûn. Nedizanî ka wê çawa di vî temenê xwe yê biçûk de tevlî hevalan bibe. Bi hevalên xwe yên zarokatiyê re diçû dibistanê û dihat, lê xewn û xiyalên di dil û mejiyê xwe de bi hevalên xwe re parve nedikir. Dema ji dibistanê vedigeriya, bi wê westan û birçîbûnê xwe tavêt paşila dayîka xwe û wê himbêz dikir. Hiş û aqilê wî tim li ser çûn û hatina hevalan bû. Êdî, hêdî hêdî mezin dibû. Her wisa bîr û ramanên wî jî mezin dibûn. Tevî ku pir ji dayîka xwe hes dikir, ramanên xwe pê re parve nedikirin. Xiyalên wî herdem bibûn tîrêjên rojê yên hêviyê. Dema bû 13, 14 salî baweriya wî bi wî zêde bû û ramana wî tenê ew bû ku dibistana xwe bi serkeftî temam bike. Tevî ku ev hêvî û bi xwe bawerî pê re hebû jî, hezkirina hevalan di dilê wî de zêdetir bû. Heval Emer axaftina li ser jiyana xwe wiha domand:

"Her çiqas min nedikarî ramanên xwe parve bikim jî, lê min pir dixwest ku wan pêtên hezkirinê bi hemû zarokên ji derdora xwe re vebêjim. Roja tevlêbûna min hat, ew roj ji bo min rojeke bi ronahiyê dagirtî bû. Ji dilgeşî û keyfxweşiyê min jibîr kiribû ku xatirê xwe ji dê û bavê xwe bixwazim. Bi min wisa dihat ku xwestina xatirê wê ez ji xiyalên min dûr bixistama, ji ber ku min nedixwest ew destê tijî hêvî yê heval Emîn ku dirêjî min kiribû winda bikim. Dema min bi destê heval Emîn girt, min di wî de jî hezkirina dayîkê dît û bêyî ku destê wî berdim ez li pey wî meşiyam. Êdî hemû bîr û ramanên min ew bûn ka minê kengê zarokên rojê bidîtana. Min bi berdewamî pirsan ji heval Emîn dikir; her wisa resenî û dilnizmiya wî û ji ber ku timî ji min re digot 'heval Emer' li min pir xweş dihat. Min jê pirsî; 'Heval, emê biçin kû derê?' Bi rûkenî bersivand û got; 'Emê biçin Feraşînê.' Dema em dimeşiyan, xiyal û daxwaziya min ew bû ku hemû keç û xortên gund jî tevlê bibin. Em çiqas

zêdebûna, emê ew qas zû biserketana. Bi vî rengî hest û ramanên min şêwe digirtin. Ev şoreşa ku Rêber Apo afirandiye, ji bo tevahiya zarokên Kurdan e. Her wisa ji bo hemû mirovên bindeste. Cîhaneke wekhev ji bo tevahiya mirovahiyê girînge.

Me xwe gihand Feraşînê. Feraşîn zozane. Her aliyên wê tijî girên biçûk ên keskin û avên kaniyên wê pir sarin. Min di berbanga spêdê de bêhna gulên wê, tevahiya zozanên wê hembêz kir û hemû xweşikiyên wê dît. Em tim bi şev dimeşiyan. Dema em gihiştin baregehê, heval Ekrem em pêşwazî kirin. Hejmara me hevalên nû zêde bû. Heval Azad jî li wê derê bû, em bi coş û hezkirineke mezin hembêz kirin. Peywendî, hezkirin û jidiliya ku di dema pêşwazîkirinê de van hevalan nîşanî me dan, ez zêdetir rehet kirim û dilsoziya min bi Rêber Apo û şehîdan re zêdetir bû. Em dane rûniştandin. Piştî ku me bêhna xwe da em rabûn ser xwe. Ez, heval Emîn, Ekrem û Azad me bi dileke germ henek bi hev re dikirin û di heman demê de em bi lez dimeşiyan. Di nava vê germahiyê de em çûn Tehte Reşê. Li wê derê xwestin ji me re çayê çêbikin. Di çaydaneke reş de çay çêkirin û dan me. Bi min ew qas xweş hatibû, tevî ku min du sê îskan jê vexwarin, dîsa jî dilê min dixwest ez hê vexwim. Paşê dema firavînê hat. Me di beroşeke mezin de meqerneya bi penîr xwar. Dema ez têr bûm, ji westanê xewa min dihat. Hîn wê demê ez têgihiştim ku fermiyet û cidiyeteke diyar heye. Lê em hemû rûken bûn. Heval Emîn ji me re got; 'emê ji bo perwerdeyê biçin Zapê.' Em pir keyfxweş bûn, lê me nedizanî ka wê kî me bibe. Heval Îsmaîl weke berpirsyarê me hat diyarkirin. Da pêşiya me û em bi rê ketin. Ji ber ku emê bibana şervan, em pir dilxweş bûn. Dema em ji Tehtê Reş bi rê ketin, em 35 heval bûn. Berpirsyarên me yên komê heval Îsmaîl û Fayîq bûn. Nîvê komê bê çek bûn. Ez niha jî pir xemgînim, ji ber ku ev her du heval jî pişt re şehîd bûn. Ez di vê rêyê de fêrî fedakarî û milîtaniya Apoyî bûm. Dema me xwe gihand Çiyayê Hênê, em rastî dorpêça dijmin hatin. Bi rastî jî dema min rûyê şervanên nû nêrî, min wêrekî, fedekarî û bawerî bi wan re didît. Fermandarî, milîtanî û fedakariya heval Fayîq em diparastin. Fedakariya heval Fayîq di tu şoreşan de nehatiye dîtin. Fedakariya heval Fayîq di tevgera Apoyî de kevneşopeke. Bi sedan şehîdên me yên qehreman ên mîna heval Fayîq hene ku vê kevneşopiyê didomînin. Fedakariya heval Fayîq em ji dorpêçê rizgar kirin. Pişt re me dîsa rêya xwe dewam kir. Cihê em

gihiştinê êdî Zap bû. Li wê derê em çûn wargeha şervanên nû. Li wir Şehîd Harûn em pêşwazî kirin. Navê wî yê rast Şêxmûs Yîgît bû. Em pir westiyayî bûn, ji ber ku em hîn nû ji şer derketibûn. Em bi şev gihiştibûn wargehê. Heval Harûn yek bi yek silav da me û em himbêz kirin. Dema ku bêxewî û westan di çavên me de dît ji me re got; 'em biçin bêhna xwe vedin.' Her wisa ji me pirsî ka em birçî ne yan na. Hevalan berê amadekarî kiribûn. Heval Îsmaîl bi navê grubê got ku; 'em ne birçîne' û em rabûn, me berê xwe da cihê razanê. Em çûn mangê û em raketin. Ev yekemîn şer bû ku min didît. Ev cara yekemîn bû ku min ew qas leşker didîtin. Min nêzî 250-300 leşker dîtin. Teknîk jî bi berdewamî hat bikaranîn. Helikopter û topbaranên hewanan qet ranediwestiyan. Di vê dorpêçê de bi saya fedakariyên heval Fayîq û Îsmaîl, bêyî ku dilopek xwîn ji pozên me jî were, em rizgar bûn. Min dît ku du mîlitanên Apoyî li hemberî artêşekê şer dikin. Wê demê min ji xwe re got; 'gelo ez jî dikarim bibim mîlitaneke Apoyî?' Hemû endamên grubê ji hev dipirsîn bê ka ji ku derê tê çavkaniya vê wêrekiyê. Di serî de bîrdoziya Rêbertiyê ku rêya şehîdan ronî dike, bûye çavkaniya vê wêrekiyê. Ji ber ku em di şer de pir westiyabûn, ji şevê heta roja din nîvro em razan. Heval Îsmaîl em şiyar kirin û bi rûkenî ji me re got; 'Rojbaş.' Em hemû bi hev re şiyar bûn. Piştî ku me xwe komî ser hev kir, me dest û rûyên xwe şuştin û me taştêya xwe xwar. Piştî xwarinê me çay vexwar. Em bi heval Îsmaîl re çûn ber ava Zapê. Me serê xwe şuşt û paşê me cilên leşkerî yên ku hevalan anîbûn li xwe kirin. Ev cilûberg ji şal, şapik, şûtik, êleg û solên meqabê pêk dihatin. Cil xwemaliyên Eyaleta Zagrosan bûn. Rengê wan zer bûn. Dema karê me temam bû, me ji heval Îsmaîl re got ku em amade ne. Me heval Îsmaîl wek mamosteyekê didît. Gotineke pêşiyên me heye ku dibêje; 'Kurdistan biheşte.' Bi rastî jî wisa ye. Dema em dimeşiyan, hinek ji me sêvan, hinekan tirî û hinekên din jî hinar dixwarin. Ev, fêkiyên xwezayî ne ku li Zapê digihîjin. Gelek cureyên fêkiyan li Zapê hene. Dema em gihiştin wargehê, heval Îsmaîl em teslîmê heval Harûn kirin. Heval Harûn sicîlên me girtin. Navê min yê kod danîn Emer û paşnavê min jî kirin Cîlo. Her çendî fizîka me lewaz jî bû, lê têkoşîna şehîdan û bîrdoziya Rêbertiya me hêz dida me. Vê carê dor hatibû li ser wergirtina çek û rextan. Me çek û rextên xwe wergirtin. Di wê kêliyê de hest û raman li min peyda bûn. Hin raman di min de afirîn: Gelo ev qas erzaq û çek ji kû derê dihatin. Paşê ez fêr bûm ku

gelê Kurd wan tiştan hemûyan dide. Ev jî tê wê wateyê ku gelê Kurd zarokên xwe dide şoreşê û ji bo vê xizmetê dike. Rêberê gelê Kurd Rêber Apo, şervanên wî, şehîdên şoreşê û gelê Kurd ji bo cîhaneke wekhev û azad têdikoşin. Dema min vana dît, min soz da Serokatî û Şehîdan ku ezê di vê rêyê de bimeşim. Her çendî kêmasiyên min hebûn jî, di min de bû îdîayek ku soza min dayî bi biryardarî pêkbînim.

Dîroka ku min dest bi perwerdeyê kir, meha Îlona sala 1989'an bû. Navê dewreya perwerdeya me Şehîd Fayîq bû û heval Harûn li ser wate û girîngiya perwerdeyê axaftinek kir. Wê demê derfet û merc ji bo perwerdeyê hindik bûn. Dewreya Perwerdeya Şehîd Fayîq çil rojan ajot. Me gelek agahî û zanyarî ji vê perwerdeyê girtin. Em têgihiştin ka bîrdoziya Rêber Apo li hemberî kapîtalizmê tê çi wateyê. Her wiha, me mêtingeriya li ser Kurdistanê derxist zanebûne. Em têgihiştin ka jin çawa kole ye. Em dîroka Kurdistanê fêr bûn. Her çiqas em di çerçoveyeke berfireh de tênegihiştin jî, lê herî kêm ji bo rêya me bû ronahiyek. Kêm be jî, ez fêr bûm ku jin li Kurdistanê di mercên wekhev de najîn. Di berê de, ji ber lewaziya fizîkî ya jinê min qet nedixwest ku pê re hevaltiyê bikim. Piştî ku min rastiya jinê di perwerdeyê de fêm kir, ez gihiştim wê encamê ku ez dikarim bi jinê re hevaltiyê bikim. Ji ber ku jin ji zilam zêdetir bindest bûye. Xwezaya jinê ya di nava şoreşê de reng dide şoreşê. Wateya vê ya herî eşkere heval Bêrîtan, heval Zîlan û heval Ronahî bûne. Piştî ku ez vana fêr bûm, êdî min dixwest ez soz bidim, ji ber ku ez ji bo pratîkê di nava kelecanê de bûm.

Mangeyên me ji şeş kesan pêkdihatin. Li ser mêza sondxwarinê wêneyên Serokatî û heval Egîd, ala ARGK'ê, pirtûkeke Serokatiyê û ala partiye hebûn. Me destê xwe danî ser vana û çekan, bi vî rengî me di hizûra van hemû nirxan de soz da Şehîdan û Rêbertiyê. Em di nava dilxweşî û xemgîniyê de man. Em dilxweş bûn, ji ber ku me wê li hemberî dijminê xwe şer bikira. Hinek ji me dikeniyan û hinekên me jî digiriyan. Ji ber ku di cîhanê de tu tiştek ji qutbûna rêhevaltiyê zortir tuneye, em hemû digiriyan. Em dilxweş bûn, ji ber ku em diçûn pratîkê. Tevî min, vesaziya şeş hevalan ji bo Xakurkê çêbû. Tişta ji bo me kêfxweşî ew bû ku fermandarê me heval Harûn jî bi me re dihat Xakurkê. Em ji Zapê ber bi Zagrosan ve meşiyan. Gêwilê her kesî di rê de pir baş bû, ji ber ku em diçûn pratîka şer. Zagrosa xweşik ku ji gelek şervanan re malovanî kiriye, germahiya dayîkê dida me. Zagrosan

rûkeniya xwe dida me, ji ber ku zarokên xwe himbêz dikir. Dijminên zarokên wê pir dihatin, lê yek ji wana nedihewand û dawî li piraniya wan anî. Bi berf û bahoza xwe tevahiya artêşên Îskender, her wiha yên Ereban û Tirkan fetisand. Zarokên wê yên Apoyî jî ew hembêz dikirin. Dema em derbasî Govendê bûn, bi me jî nîşan da ew dijwariya xwe ya ku ji herkesan re nîşan dida. Lê dijwariya wê germahî dida me. Em bawer bûn ku wê rojekê me biparêze. Serê Govendê bi tevahî zozanbûn, bi teht û zinarên asê dorpeçkirîbû û çar aliyên wê mîna keziyên keçan ber bi jêr ve xwe berdidan. Her çar hawirdorên wê daristanbûn. Min pir ji Govendê hezkir û xiyala min ew bû ku ez careke din wê bibînim. Dema em hatin Xakurkê demsal payîz bû. Çiyayê Zagrosê û serê Govendê bi berfê hatibûn xemilandin. Tevî ku hejmara me kêm bû, me ji rêhevalên xwe hêz digirt. Bivêjeke gelêrî heye; ‘Golikê malê ji gayê malê natirse.’ Em bi çeteyên Gerdiyan re rû bi rû man. Hejmara wan nezî 130 kesî bûn. Ew, Kurdên xiyanetkar bûn. Ber bi dawiya demsala payîzê bû. Me bi çeteyan re şer kir. Me nedixwest em Kurdan bikujin. Tevî ku xiyanetkar bûn, armanca me ne kûştina wan bû. Me dixwest ku em bîrdoziya Serokatiyê belav bikin. Le em neçar hiştin. Me bi armanca xweparastinê bi wan re şer kir.

Şer ji demjimêr 11'ê spêdê heta 19:30’ ê êvarê ajot. Di vî şerî de 14 çete mirin, lê mixabin şervaneke Apoyî yê bi navê Mazlûm bi guleyên Kurdên xiyanetkar şehîd bû. Tevî hemû mercên zor û dijwar, me hevalê xwe yê şehîd ji qada şer derxist û me ew spart axê. Me bi vî rengî xatirê xwe ji şehîdê xwe xwest; ‘Bila dilê te şad be rêheval Mazlûm. Te ronî da me û emê jî di vê rêya te ya ronî de bimeşin.’ Me meşa xwe ya ber bi Xakurkê ve dewam kir. Dema em hatin Xakurkê, şehîd Mahîr, her wiha heval Şukrî û Pîro em peşwazî kirin. Em hêdî hêdî diketin demsala zivistanê. Wê zivistana me bi perwerdeyê derbas bibûya. Vesaziya hevalan ji bo wargehan çêbû. Em heta biharê ketin pêvajoya perwerdeya bîrdozî û me perwerdeya xwe li ser vî bingehî temam kir. Fermandar Harûn vesaziya min ji bo eyaleta Erziromê çêkir. Ez gelek keyfxweş bûm ku vesaziya min ji bo Bakûrê Kurdistanê çêbû. Em bi dilgeşiya azadkirina gelê xwe yê bindest meşiyan. Weke ku gerîla her dem ber bi çiyayan ve dimeşe, em jî wisa meşiyan. Dema ez derbasî Bakûr jî bûm, rûkenî û dilxweşiya min bi her awayî li min diyar dibû. Ez hem keyfxweş bûm û hem jî min axînek kişand, ji ber ku ez pir dereng

mabûm. Wê demê ez pir ciwan bûm. Heger baskên min hebana, ezê niha jî bifiriyama û biçûma Erziromê.

Min li Eyaleta Erziromê di sala 1991'ê de dest bi pratîkê kir. Peywendiyên me bi gel re çêbûn. Jixwe çalakiyên me yên serkeftî jî di vê pêvajoyê de pêk hatin. Gel û gêrîla bi hev re bûn yek. Dema em çûn wê derê hejmara me hindik bû, lê paşê hejmara me bû du qat. Her ku diçû em pêş diketin. Çawa ku gul bi avê mezin dibe, azadî jî bi xwînê pêş dikeve. Weke berdêla vê yekê, hin şehîdên me çêbûn. Gelek hevalên mîna Karker Botan, Îhsan Bîngol, Sefkan Dêrik û Renas gihiştin şehadetê. Em bi van hevalan re ji Başûr derbasî Bakûr bibûn, ji ber şehadeta wan ez pir xemgîn bibûm. Min jî dixwest ez xwe bigihînim asta şehîdan ku van hevalan xwe gihandibû yê. Ji ber ku ez negihiştim vê astê, min xwe her dem kêm didît. Girîng bû ku ez li wê derê bimînim û meşa di rêya van hevalan de ji min re weke mîrasekê ma.

Pişt re ez derbasî Eyaleta Amedê bûm, ango ez çûm cihê ku dilê Kurdistanê li wir lê dida. Her cihê ku li Kurdistanê şervan tê de şer dikin pîroze, lê Amed dilê Kurdistanê ye. Bi taybetî rûmeta wê yekê heye ku mirov weke şervanê azadiyê li wê derê bimîne, ji ber ku paytexta Kurdistanê ye. Yê min jî, şansê min hebû ku ez li vê derê ji bo têkoşîna azadiyê şer bikim. Ez dilgerm û pir dilgeş bûm. Her dem xiyalên min ew bûn ku ez Rêber Apo li ser bedenên Sûra Amedê û li ber deriyên wê pêşwazî bikim. Ez wê demê miribama jî, ne xema min bû.

Wê demê miroveke bêrû derket peşiya min. Ew jî Şemo (Zekiyê Bêpêçî) bû; her cure gemariyê di rûyê wî de xuya dikir. Wê demê jî ez wisa dihizirîm ku wê van qirêjî û gemariyên di rûyê wî de derkevin holê. Ev jî bi hemû zelaliya xwe derket holê. Hin kesên din ên mîna vî jî hebûn, ew hemû jî di nava qirêjî û gemariyên xwe de winda bûn û çûn. Ev rastiyeke ku tu qirêjî û gemarî nikare di nava partiyek wisa pak û temîz de bimîne û divê nemîne jî. Dem, sala 1992 bû. Di heyama salên 1992-1993'yan de partiyê serkeftineke mezin bidest xist. Pêvajoyeke pir kûr a şer destpêkir. Eyaleta Amedê di vî şerê de rola xwe leyîst. Rêber Apo ji ber vê serkeftinê Eyalet pîroz kir. War û çiyayên Andok, Dorşîn, Îskender, Berbihîv, Serê Spî, Gorsê, Şelê, Hedik û derdorên wan ku girêdayî eyaleta Amedê ne, gerîlayan diparastin û li wan deran ji bo gêrîla û gel mertalê bingehîn e. Germahiya di navbera gel û gêrîla de bi berdewamî zêde dibû. Min li Amedê heta sala 1997'an têkoşîneke bi

rûmet meşand. Me hemû kêmasiyên xwe rexne dikirin. Dema ez xwe dinirxînim, ji bo ku ez bibim şayanê şehîdan û Rêber Apo, ez bi tevî hemû kêmasiyên xwe dikarim bêjim ku partiyê heta roja îro ji bo min ku derê xwestibe, ez her dem amade bûme ku li wê derê xebatê bidim meşandin. Ez heta niha jî ji xebatên partiyê têr nebûme. Ez bigihîjim asta şehadetê jî, wê ew neyê wateya ku ez têr bûme. Vesaziya min ji bo Xakurkê çêbû. Dema ku ez vegeriyam Xakurkê, ez çûm serdana wî cihê ku ez ji wê derê ber bi Bakûr ve bi rê ketibûm. Hemû hevalên min ên şehîd ji nû ve yek bi yek dihatin ber çavên min û hestên min weke fîlmekê ber bi paş ve birin. Li ser vî bingehî, rûmeteke mezin di min de peyda bû. Wê demê min xwe deyndarê şehîdan, Serokatiyê û Kurdistanê dît û ji xwe ez deyndarim jî. Ez bimirim jî ezê deyndarê vî gelî bim. Di nava PKK'ê de mafên xwezayî yên mirovan tên dayîn. Weke tê zanîn, herkes bi qencî û xirabiya xwe tê nasîn. Eger xirabiya kesan hebe, tên sezakirin.

Ev di bîrdoziya PKK'ê de jî heye. Ezê xwe weke mînak nîşan bidim. Navê Emer Cîlo li min danîbûn. Li vê derê, bêyî ferq û cewaziya çînî, herkes li gorî keda xwe tê nirxandin. Rêhevalên min tabûrek, ango rêveberiya Tabûra Şehîd Viyan raspartin min. Her çendî hêza min têrê neke jî, ez di nava hewldaneke mezin de bûm, ji bo ku ez bibim şayanê van nirxan. Ez soz didim tevahiya Şehîdên Azadiya Kurdistanê, Rêber Apo, hemû rêhevalên xwe û gelê Kurd ê bi rûmet ku ezê di vê rêyê de heta dilopa dawî ya xwîna xwe têbikoşim."

(Ev nivîs di dîroka 9'ê Nîsana 2009'an de li qada Ermûş a bi ser Xakurkê ye, di bin topbaranên dewleta Tirk de hatine nivîsandin.)

Dema min bi heval Emer û Sema re suhbet dikir, di wê kêliyê de heval Serxwebûn hat. Berê min ber bi rûyê heval Sema ve bû. Hevala ku temenê wê herî biçûk di nava tabûrê de heval Sema bû. Hevaleke ku bi esle xwe Eceme (Azerî ye). Ev jî nîşan dide ku ji her reng û nîjadan di nava vê şoreşê de hene. Min mafê axaftinê da heval Sema ji bo ku qala bîranîneke xwe bike. Heval Sema dest bi vegotina bîranîneke xwe ya li ser erka xwe ya dawî kir û got; "Rêveberiya tabûrê plansaziyek çêkiribû. Biryar dan ku wê sê hevalên xort û du hevalên jin di vî erkî de cih bigirin. Yek ji du hevalên jin ez bûm. Navê hevalên din ku li gel min tê de cih girtin heval Aryen, heval Devrîm bûn." Dema heval Sema qala bîranîna

xwe dikir, min li rûyê wê mêze dikir. Bi dengê xwe, her wiha bi rabûn û rûniştina xwe zarokek tanî bîra mirov. Lê baweriya wê baweriya dijmin dişkand. Heval Sema vegotina xwe domand; “Dema ez bi van hevalan re dimeşiyam, kelecan û coşa di min de tu astengî nas nedikir. Hem ji ber ku minê gelê Bakûr bidîta, hem jî coşa hevalên di erkê de coş û gêwilê min qat bi qat zêde dikirin. Dema em nêzî Ava Hecî Begê bûn, em gaveke din nêzî dijmin û gelê me yê welatparêz bûn. Yekane astengiya ji bo em bigihîjin gelê xwe, Çiyayê Gostê bû. Çiyayê Gostê hem asê û hem jî pir bilind bû. Lê coş û gêwilê hevalan wê astengiyê jî nas nedikir.” Dema min guhdariya bîranîna hevala Sema dikir xurûş, coş û baweriya di wê de ez gihandim ponijîn û hêza wateyeke kûr. Ez gihiştim wê baweriyê, ev vîna ku guhdariya tu temenî nake, encex dikare bibe felsefeya Serokatiyê. Tam di vê kêliyê de dengê kewan hat guhê min. Min ji heval Aryen pirsî bê ka wekî din kîjan lawir li vê derê hene. Heval Aryen got ku; “pezkovî, hirç, beraz, sîvorî, pisîka çiyayî û lawirên wekî vana hene.”

Wê gavê çavên min bi heval Bêrîtan ketin. Min jê pirsî bê ka armanca wê ya di nava partiyê de çi ye? Di bersîva xwe de got; “Ez hem ji bo azadiya xwe û hem jî ji bo azadiya gelê xwe li vê derê me. Ez hatim ji bo hem bi evîna Serokatiyê re û hem jî bi xwezaya Kurdistanê re bibim yek. Ez hatim ji bo azad bibim û bi azadî şer bikim, bi armanca rizgarkirina jinên bindest ên welatê me ku êş dikişînin. Ezê pîroziya ku Serokatî daye me weke milîtanekê biparêzim û heta dawiyê bibim şayanê Rêbertiyê, şehîdan û gelê xwe. Tevî ku ez şervaneke nû ya serokatiyê me, ez bi rûmet û serfirazim, ji ber ku ez di van çiyayên azad de bi rêhevalên xwe yên şoreşger re me.” Heval Bêrîtan bi vî rengî hest û ramanên xwe anîn ziman. Di rastiyê de hest û ramanên gelek ciwanên Kurd tanî ziman.

Di vê navberê de civîna du hefteyî ya tabûrê çêbû. Civîn, bi armanca nirxandina jiyana 15 rojan di bin pêşengiya heval Emer de hat li darxistin. Tevî ku hîn du roj bûn ez li vê derê bûm, hat xwestin ku ez jî beşdarî civînê bibim. Ji ber ku ev şêwaza jiyanê ya PKK'ê bû. Her hevalê/î di civînê de mafê axaftinê digirt û jiyanê dinirxand. Her taximê di civînê de di derbarê xebatên xwe de nirxandin dikirin. Wek mînak; qederek nanê hişk hatibû avêtin ku ev yek di civînê de hat rexnekirin. Hewildidan ku bi hevalan bidin fêmkirin ka ev nan ji kû derê, çawa û bi

kîjan zorî û zehmetiyan hatiye bidestxistin. Ji ber ku hemû nirx bi xwîna şehîdên me hatine bidestxistin. Ev nêzîkatiya ku derketî holê, nîşan dida ku felsefeya Rêber Apo bandoreke çawa li ser mirovan dihêle. Rêzgirtin û dilsoziyek mezin ji keda Serokatî, şehîdan û gel re hebû. Nêzîkatiya min li wê derê dît ew bû ku li hemberî hevdu zelalbûn û mirov digirtin navenda tevahiya nêzîkatiyên xwe. Dilê wan zarok bûn, lê xiyalên wan mezin bûn. Herkesê di civînê de hevdu rexne dikir, lê armanca ji van rexneyan bilindkirina rêhevalên xwe bû. Her kes bi vê zanebûnê tevdigeriya. Dilşadiya herî mezin ji bo wan ew bû ku xwe bigihînin zanebûna wateya jiyanê. Ji bo wan şahiya herî mezin ew bû ku wate bidin jiyanê û wê binirxînin. Di vê kêliyê de ez zivirîm û min li xwe nêrî. Ev cara yekemîn bû ku min tişteke wisa didît. Min ji xwe fedî kiribû. Hev du rexne dikirin, bi armanca ku karibin ji şehîdan, Serokatî û gel re zêdetir xizmetê bikin. Dema min li nava çavên Heval Emer û li yên Heval Serxwebûn, Zemanî, Aryen, Canda, Welat û Heval Sosin nêrî (ev di rêveberiyê de bûn), min dît ku pir bi baldarî guhdarî rexneyên hevalan dikin. Li hemberî hevdu zelal, xwerû û dilnizim bûn. Yek ji çanda herî mezin ya di PKK'ê de, çanda guhdarkirina hevdu ye. Tişta bi wan dide qezenckirin jî ev çande. Min pir heyf û mixabin li xwe tanî, ji ber ez bi wan re nejiyabûm û min tevkariya xwe pêşkêş nekiribû. Min niha xwe di rexnedaneke mezin de derbas dikir.

## Baya Li Axên Arê: Roza Semsûr

Rojekê ji rojan bayek diweziya li axên Arê. Bi hêvî û bendewariya ku baranê her der bi bêhna axê tijî dikir, rondikên veqetînê Arê şil dikin. Bi van yekan demên min yên gêrîlatiyê rûniştine li ber min. Mamê Hecî, bi porê xwe yê sipî ku ber bi dîrok kirina vî gelê pîroz ve li hemberî dîroka Kurd ku nekariye were nivîsandin, hewil, ked û fedakariyeke mezin nîşan dide. Dixwaze gerîla û jiyana tabûrekê bike dîrok. Bi hêviya bûyîna ciwaneke bi coş, xurûş û gêrîlatiyeke serwext di giyana xwe de diguhêzîne. Her ku dubare dibin gotinên wî yên 'ji bo ez werim Arê, ez mîna zarokekê bi pey heval Cuma ketim' daxwaz û xurûşa ku dem nikare wan kevinbike û biwestîne, di radeya metelî û matmayî de bandorê li mirov dikin û her ku mirov jê bandor dibe dewlemendî û pîroziya têkoşîna tê kirin digihîje lutkeya herî jor. Hizir û ramanên min dişemitin ser Heval Cuma, ku yek ji kedkarên çandina van gulên azadiyê ye. Naçin ji bîra min ew çavên wî yên dibiriqin bi çirûskên germ, dema ku min ew yekemîn car dîtî! Salên jiyayî ew gihandibû heybet û stêrkbûnê; mafdariyê di kesayetiya xwe de ispat kiribû li hemberî çav şkestîbûnê! Mamê me dipirse ka çi ye wateya çiya? Ez ji mamê me re dibêjim ku çiya her tişte; meskenê dîroka pênc hezar salî ya jinê ye ku hatiye windakirin. Mekanê xwedavendbûnê ye, cihê temambûna projeya (jina azad) ku Rêber Apo jê re dibêje, "projeya min ya ku nîvçe maye." Çiyayên rageş û asê jinên asî di sîngên xwe de dafirînin. Jina ku dibe asî, dikare xwedayên serwerên bi maske di jêpirsînê re derbas bikin; jina ku dikare di jêpirsînê re derbas bike, bi hêz û xurt dibe; her ku xurt dibe, dikare bêdengiya xwe veguherîne qêrîn û feryadan! Jina Kurd ya bi PKK'ê re dimeşe, pêşengiya feryadbûna gerdûnî û navneteweyî dike li lûtkeyên zelal ên çiyayan, bi jiyana xwe ya ku zorî û dijwarî wisa dikin ku mirov parve bike û bibe dadwer û keçên ciwan yên mîna min diherikin van çiyayan. Belê Mamo, dîrok bi gerîlatiya li Arê destanan ji pêşerojê re amade dike; her ku nivîs derbasî zanebûnê dibe, "mirovên azad" yên zana tên afirandin û dijîn! Oxira te ya xêre be; ez te bi rê dikim bi bayeke nerm, dagirtî û bi hezkirinên ez hêvî dikim li axên pîroz ên Mezopotamyayê pêl bide!

**Hevpeyvîna bi Canda Welat re/Tabûra Arê**

Zarokên Kurdistanê, hûn her dem ziravî û nazenîniyê tevlî hêviyên me dikin. Tevî ku hûn hebûnên herî hêja yên li ser rûyê erdê ne, hûn bê war û cih mezin bûn, hûn sêwî man û hûn bi rojan birçî man. We dilên xwe yên biçûk hîn tam fêm nekiribûn, lê hûn di wê zanebûnê de bûn ku hin tiştên kêm hene û we temenê xwe yê ciwan ê giranbiha valakir li ser wan hinarokên xwe yên sûf. We bi wan destên xwe yên biçûk keviran bi hêrs û kîn avêt wan kesên ku hûn xistine vê rewşê; heta we berê xwe da çiyayan, tevî ku hûn ew qas biçûk bûn ku we nedikarî çekan jî hilgirin. Hûn zarokên tolhildanê yên pêşerojê bûn. Hûn li Helebçeyê bêparastin man. Hinek ji we hîn dema we di hembêza dayîka xwe de şîr dimijand, çavên xwe li jiyanê girtin. Hinek ji we dema dilîstin hatin kuştin. Dema ku we jiyaneke biheştwarî hêvî dikir, ma we dê ji kû bizanîbuya? Hîn bêyî ku hûn tama temaşekirina filmekê bigrin, di nava pêt û agir de şewitîn. Dema hûn li ber mala xwe dileyistin, hûn bi 12 guleyan hatin kuştin. Ser û milên we bi hovîtî û xwînxwarî hatin şkandin. Em hûn bûn, hûn jî bûn em û me berê xwe da çiyayan. Tenê ev hersê peyv ji nava lêvên me dirijiyan; tolhildan, tolhildan, tolhildan. Serokatî wisa digot; "Min ti carî xiyanet li xiyalên xwe yên zaroktiyê nekir." Me sond xwar, em bêyî ku xiyanetê li xiyalên xwe yên zaroktiyê bikin, bi armanca ku bibin şayanî Rêbertiyê, emê bimeşin. Ji vê rêyê qet veger nabe, ta ku em ji bo we zarokên Kurdistanê jiyaneke azad û dorhêlekê azad ya leyistinê bafirînin. Wê bibe xiyaneteke mezin eger mirov rondikên we û êşên we ji bîr bike!

Cihê heval Emer lê rawestiyabû, eger ez şaş nebim girê Serhed bû. Dema mirov ji girê Serhed li Xakurkê mêze dike, erdnîgariyeke wê ya balkêş dibîne. Hevalan got ku; "ji girê Şehîd Sarya dîmeneke hîn xweşiktir heye." Ez û heval Zemanî ber bi wî girî birêketin. Derdora rêya em tê re dimeşiyan bi daristanê dorgirtî bû, lewma tu kesê em nedîtin, me jî kesek nedidît. Di dema meşê de tenê dengê çûkan dihat, mîna ku tu kes li van deran nejiyabe, ji ber ku xwedî daristaneke berfireh û gur bû. Min ji heval Zemanî pirsî; "Gelo zozanên Arê jî bi qasî van daristanan xweşik in?"

Çiyayek hebû ku tenê serê wî dixuya. Min jê pirsî ka navê vî çiyayî çi ye. Heval Zemanî got; "Navê vî çiyayî Evdil Kofî ye. Eger tu bixwazî, ez ji te re qala dîroka vî çiyayî bikim." Piştî erêkirina min ya bi mereq heval Zemanî got; "gelek navên vî çiyayî hene. Gelek navên wî yên mîna Evdil

Kovî, Evdalê Romî, Gilgê Benê, Girê Serçeman û hwd. hene û heta roja me ya îro hatine. Di rastiyê de navê wî Evdil Kovî ye. Gundê herî nezî vî çiyayî Hermûşe. Rojek ji rojan li gundê Hermûşê miroveke pir hejar hebûye. Debara xwe bi nêçîrvaniyê dike. Rojekê ji bo dîsa biçe nêçîrê hespê xwe, tifinga xwe ya nêçîrê, seyê xwe yê nêçîrê û kelûpelên xwe yên nêçîrê digire û ber bi Evdil Kofî ve dikeve rê. Hildikêşe serê çiyayê Evdil Kofî, lê careke din venagere û bi vî rengî navê Evdil Kovî li vî çiyayî hatiye kirin." Di dawiya van axaftinan de em gihiştibûn cihê ku heval Sarya lê şehîd bûyî. Ez li heval Zemanî zivirîm û min navê çiyayên dixuyan jê pirsî. Hevalî jî navên wan wiha rêz kirin; "Çiyayê Sîro bi dirêjiya sih rojan li hemberî dijmin li ber xwe daye, navê xwe ji vê derê girtiye. Di dîrokê de sih kesî bi dirêjiya sih rojan li hemberî dijmin li ber xwe dane, ji ber vê yekê navê wî bûye 'Sîro.' Pişt re çiyayên Karker û Dalamper tên. Dalamper navê xwe ji teyrê baz ê bibask digire. Piştî wî, Çiyayê Şehîd Şerîf tê." Dema min li van çiyayan mêze kir, ji quntarên van çiyan heta newala Xakurkê hemû daristan bûn. Dîmeneke wisa didan, mîna ku nexwazin zarokên biyanî bigirin nava xwe. Mînak, Îskenderê Mezin bi artêşa xwe ya deh hezaran kesî ji Makedonyayê ber bi van axan ve bi rê ketibû û heta Xakurkê hatibû. Dema van bedewî û xweşikiyên Xakurkê dît, nîşaneya xweşikiyê li Xakurkê kiriye. "Xakurk" di zimanê Yunanî de tê wateya biheştê. Tevî ku Îskender xwedî ew qas hêzê jî bû, van çiyayên ku Xakurkê dorpêç dikin, rê nedan wî. Ev çiya hîn jî diqêrin û dibêjin; "Em, ji bilî zarokên xwe tu kesî nagirin hembêza xwe!" Di van dar û daristanan de pezkovî, pisîkên çiyayî, hirç, beraz, çeqel, gur, rûvî û hwd. dijîn. Ev çiya dikarin van lawirên kovî û milîtanên Apoyî di nava xwe de bihewînin. Ji ber ku xaka niştiman ji bilî vana tu kesan napejirîne.

Min li derdora xwe nêrî, lê min tu kes nedît. Heval Zemanî ji min re got; "Eger tu bixwazî, ez te bibim ciheke pir xweşik." Min got; "başe." Piştî ku em bi hev re nêzî nîv demjimêrê meşiyan, em li rastî hevalên jin û xortên 18-19 salî hatin ku perwerde didîtin. Bi cil û bergên xwe, bi çekên xwe û bi şêwaza nêrînên xwe kelecan didan mirov. Fermandareke jin û yek jî xort di rêveberiya perwerdeyê de bûn. Ji ber ku rêsayên perwerdeyê hene, ji perwerdeyê nayê derketin û silav nayê dayîn. Wisa xuya dikir ku heval Adar, bi raya min, tevî ku 1i derdora 14-15 salî bû, berpirsyara 5 kesan bû. Hevalên jin, ji ber pir bi gurûrin, kêmasiyan

napejirînin. Li hemberî gurûra hevalên jin, hevalên din jî bi gurûr bûn. Her çendî armanca wan ya perwerdeyê heman tişte, lê her kesê dixwest ku di aliyê xwe de serkeftî be. Helbet çepik dihatin lêdan ji bo hevalên ku biserketana. Sezayê hevalên ku kêmasî bikira ew bû ku di nava 20 xulekan de biçûya girê Şehîd Sarya û vegeriya. Eger di nava 20 xulekan de vegeriyana, ji wan re jî çepik dihatin lêdan ji bo ku gêwil bidin wan. Piştî perwerdeyê çekên xwe bi gêwil hilgirtin û vegeriyan cihê xwe.

Êdî dema veqetîn û xatirxwestinê hatibû. Me firavîn bi hevalan re xwar. Firavîn ji fasûleyên şîn, birinc û cacixê ku xiyarên wê ji bexçeyên xwe anîbûn pêkdihat. Di dema çûyînê de hevalan ji bo min merasîm amade kiribûn. Min yek bi yek bi destê hevalan girt û xatirê xwe ji wan xwest. Heval Emer heta dawiya rêya wê derê li gel min hat û ez birêkirim. Du hevalan wê ez biribama li gel heval Xebat. Di heman rêya ku em tê re hatibûn, em ber bi heval Xebat ve bi rê ketin. Min xwe gihand biryargehê, wê êvarê li wir mam, spêdê rabûm hatim cihê ku hevalê Mehmûd lê dima. Qederekê mam û paşê hevalekê ji min re got; "xwe amade bikin, hûnê ber bi êvarê biçin Mexmûrê." Min di dilê xwe de digot; "ma çima ew qas zû min dişînin?" Min amadekariyên xwe kirin, dema bû êvar em ber bi Mexmûrê ve bi rê ketin. Eger ez ne şaşbim, ew kesê ku em birin Mexmûrê hevalê Birûsk yê ji Qamişloyê bû. Heval Birûsk, hevaleke gelek hêja û birûmete. Her tim min pirs ji xwe dikir ku ez çima hatime Mexmûrê. Xwezî dem tu caran derbas nebûya li çiyayan, yan jî min bikariba wan dem û rojan careke din jiyan bikim.

## Ji Bo Keça Min Gulderenê

Keça min a xweşik, hêja û delal; evîn weke stêrka li asîmanan, rihana devê çem û kaniyan bêhna xwe ji bo mirovahiyê dide werandin. Ew çavkaniyên hatine afirandin, weke ba û bahozê li hemû quncikên cîhanê belavbûne. Ev jî bi keda şehîdan û Rêber Apo hatine bidestxistin. Mamê we Mela Abdûlah ji vê herikandinê têr nedibû. Ji beriya her tiştî em serê xwe li ber şehîdên vê rêxistinê ditewînin û rêzdariya xwe diyar dikin. Emê li pey şopa wan biçin, serkeftina PKK'ê daxwaza dilê me hemûyane. Raste, min gelek bêriya we kiriye, di quncikê dilê min de ciheke taybet ji bo we heye. Dema min zanî birayê min nexweşe, agirê dilê min gur bû. Birayê min weke dê û bavekê dil birehm bû, li ku diba bila biba, li malê, li ber çeman, kaniyan, mêrgan, çîmenan, deştan, çiyayan û daristanan, her dem behsa mirovahiyê dikir. Hertim digot; "ev çanda şehîdan û Rêber Apo ji bo hemû cîhanê alternatîfeke." Hêza xwe ji vê rêxistinê, şehîdan û Rêber Apo girtibû. Li ser ew kursiyên ku bi giya hatibûn çêkirin rûdinişt. Bi giranî gotinên Rêber Apo yên bi zimanek nerm û şîrîn hatine nivîsîn ji gel re dixwend û di mejiyê her mirovekê/î de bicih dikir.

Keça min, her cara ku ez telefonê vedikim û pê re daxivim wiha dibêje; "mirov wek gulane, di bihara xwe de şîn dibe û coş dibe, di payîza xwe de jî diçilmise. Her tiştê zindî wisan in, her mirovek wek van gulan in. Mirov divê di gelê xwe û gelên cîhanê de hêviyê bafirîne. Ger mirov ji bo gelê xwe kar bike, bextwere, şanaze û di dîroka xwe de serfiraze." Evana gotinên kekê min Mela Abdûlah bûn. Dîsa ji min re wisa got; "serkeftina partiya şehîdan, daxwaza dilê min e." Bi dengek nizim wisa li gel min daxivî. Divê hûn ji min re bêjin ka nexweşiya kekê min çiye? Ev dengê wî yê wekî bilbilan çima lewaz ketiye? Ev yek di min de xem, keder û hesretê dide çêkirin, her ku diçe tevzek di dil û laşê min de diherike û rondik ji çavên min diherikin. Axîn ji nava dil û cîgera min diçe, min dide fikirandin û ew rojên wî yên borî tên bîra min ku dema axaftin weke ava çem û kaniyan ji devê wî diherikîn. Niha bi gotinek, du gotinan daxive û di rûyê wî de bêzarî xwe dide der, ji ber vê yekê jî lêdana dilê min her diçe leztir dibe. Tu nexweşiya kekê min ji min re bêjî, wê gelek başbe. Lê dîsa jî wê êş û kulên wî her cihê xwe di dilê min de bihêle. Hesreta wî, wê her di dilê min de bimîne. Tişta ku van

kederan ji dilê min derbixe, an jî bide ji bîrkirin, mirine. Ez bawerim we jî bêriya min kiriye, raste we bêriya bavê xwe Hecî kiriye. Ez bi germahiya dilê xwe we himbêz dikim û maç dikim. Ez ji hemû xwîşk û birayên we re ji germaya dilê xwe silavan dişînim, ji we hemûyan re dilşadî û serkeftinê dixwazim.

**Silav û Rêz…**
**Bavo Hecî**

## Ji Bo Heval Cuma

Mamosteyê min, bi rastî ev bi qasî pênc heyvin min di derbarê jiyan û xebata xwe de agahî nedaye we. Ez rexnedayîna xwe didim û lêborîna xwe dixwazim. Gotineke gelêrî heye, dibêje; "eger hebîb nebexşîne, mehbûbê bêçare çawa bike?" Ger birêz nebexişîne Heciyê bêçare çibike. Tenê dikare daxwaza bexşandina xwe bike. Mamosteyê min, herdem min dixwest pênûsa xwe hildim, eger du-sê peyvên kêm bin jî bi zimanê dayîka xwe binivîsim, ji we re rêbikim. Lê, gotina heval Şiyar dihat bîra min ku we jê re gotibû; "silavên min ji Hecî re bêjin, bila wê pirtûka xwe biqedîne." Ew peyvên we yên pîroz û giranbiha ji min re fermaneke. Ev sê salin paşvexistina van nivîsandinan ji kêmahî û lewaziyên min in. Dubare lêborîna xwe dixwazim. Lê ev pênc mehin min serê xwe li ser komputerê ranekiriye, min her dixwest binivîsim û sererast bikim. Her ku axaftina we ya ku we bi heval Şiyar re şandibû, cardin ew silavên we yên germ diketin bîra min, israra min ya li ser nivîsandinê û bi dawîkirina pirtûkê zêde dikir. Ev xwestek her di bîra min de bû û min digot; "heval karek daye pêşiya min, lê min soza xwe pêk ne aniye." Ez ji ber vê yekê herdem xemgîn bûm. Her heval, her mirov bi soz û karê xwe tê nasîn. Ev pêknanîn kêmahiyên min in, ji ber van kêmahiyan dest û lingên min dilerizîn û pênûsê xwe di destê min de nedigirt. Li gel tevahî kêmaniyên min, min tu caran hûn jibîr nekirin û hûn tu caran ji dilê min derneketin. Ez sond dixwim bi xwîna şehîdan, bi Rêber Apo, evîna we û bi nirxên piroz yên partiyê. Mamosteyê min, dûrketina ji we ji min re herdem hesret û kedere. Di van sal û mehên borî yên em tê de ne, gelek bûyer bi ser malbata min de hatin û hîna êşên wan derbas nebûne. Her wiha hevjîna min Xanim di Tebaxa sala 2011'an de çû ber dilovaniya Yezdan. Neviya min Çîmenê jî di meha 7'an ya sala 2011'ê de jiyana xwe ji dest da. Ev hemû êşên ku di vê salê de çêbûn, ji bo min êşên pir giranbûn. Her wiha kekê min yê bi navê Mela Abdûlah Varli ku bi nexweşiya pençeşêrê ketibû û di nava şereke bêdawî de bû. Lê mixabin ev nexweşî bû sedem ku kekê min jî jiyana xwe ji dest bide. Ez û ew ji dayik û bavekê bûn, em bi hev ve pir giriyabûn, keniyabûn, xweşî û nexweşî me bi hev re jiyan kiribûn. Weke xewn û xiyalan li ber çavê min derbas dibûn, ji bo min êşek gelek mezin bû ku jiyana min dixist tengasiyê. Ji ber ku dema kesên nezîkî mirov

jiyana xwe ji dest didin mirov zû bi zû bixwe nade bawerkirin. Kekê min di sala 1939’an de ji dayik bû û di Sibata sala 2012'an de çavên xwe li jiyanê girtin. Malbata min ji bo kekê min gelek xemgîn bû. Dayîka min Gurcî ji van bûyeran gelek bandor bû û roja piştî mirina kekê min, ew jî çû ser dilovaniya Yezdan. Van windahiyana ji bo min êşên gelek giran çêkirin, lê dûrketina ji we ji bo min girantir bû. Windakirina wan bi qasî saniyeyek dûrketina ji we li ser min bandor nekir. Ne ku ez bêrêziyê li hemberî malbatê dikim. Heta dawiyê ez li hemberî malbatê rêzdarim. Ez bawerim di van 40 rojan de ezê êdî dawî li nivisînên xwe bînim û bi alîkariya hinek hevalan ezê naveroka nivîsên xwe ji we re bişînim. Lê ev jî neyê jibîrkirin mamosteyê min; eger qereç ji parsê şerm bikin wê birçî bimînin. Ez jî wekî vê minakê herdem dixwazim wextê xwe bi kar derbas bikim.

**Dûrketina Ji Evîna Çiyayan**

Ez heyrana wê bejna te
Gul rihana li nava çiyan

Te reng daye, rengê rojê
Wek karxezalê Cudî yî

Bêhna we tê ji çiyayan
Weke misk û embaran

Heval Rizgar ne hêlandin
Bibînim evîn û eşqa dilan

Ne diliviya dest û lingên min
Min siwar kirin li tirimpêlan

Ez ji evîna çiyayan dûrxistim
Bi hezaran car ezê bimirim

Da min ji guran derxînin
Dê bêjim kanê evîna dilan

Şirînahiya van xet û xalan
Carek min bidîta bi van çavan

Bi berbanga sibeha hatina wan
Li gel sitêrka gelavêja rohniya dilan

Hêviyê li nava esman û stêrkan
Zarîfe, nazike reng cewherê Kurdan

Bidîta kewê nava gul û daristanan
Minê ramûsandiba her du destan

Minê jiyan bikira bi salan
Xem, xiyal bi min re nediman

Min dît evîn çendî zorin
Bi nalîn hesret û kederin

Mamosteyê min, di dema Hz. Mihemed de şeş pirtûkên (muslum, buxari, qutsiye û hwd) ku di nava gel de hatine berhevkirin, hene. Bi van re îslam belav bûye. Ez jî dixwazim bi zanînên dayîka xwe yên di derbarê Rêber Apo de û jiyana ku min di nava gelê Rojava de derbaskirî, berhev bikim. Hûn bi xwe jî dizanin ku gelê Rojavayê Kurdistanê hemû jiyana Rêber Apo dizanin û pê re jiyan kirine. Ez dixwazim bêjim ku berhevkirineke wisa pîroz û giranbihaye. Hûn giraniya vê yekê ji herkesî zêdetir dizanin. Ev yek bi peyvan nayê pîvan. Ger hûn destur bidin, dixwazim vî karî pêkbînim. Dixwazim di dawiya temenê xwe de vê yekê pêkbînim. Ev tişt ji bo min hem xweşî, hem jî keyfxweşiyeke pir mezine.

**Silav û rêzên şoreşgerî**
**Mam Hecî**

**Ji Bo Heval Mustafa Karasû**

Bayê çiyayan bêhna we diherikand ber bi min ve, misk û ember, gul û kulîlk pê şîn û geş dibûn. Te zanebûn hildigirtin û tu weke bilbil û şalûlan diaxivî. Evê zanebûnê xwestek dida herkesê û ji bo herkesê tu weke gula ber bi rojê ronahiyê didî. Xwezî zarok bûma û min bi destê we bigirta. Dîtina we ji bo min weke zarokê dayîk û bavê xwe dîtî, bi nalîn û hesretê dilê wî her dem dişewite ye. Ez jî bi hesreta dîtina we bi nalîn û axîn im. Hûn her dem di mejiyê min de ne. Di şev û rojê de hûn her dem wek çem û kaniyên Kurdistanê diherikin û li ber pozê min hûn bûne bêhna sosin û beybûnan. We jiyanek nû bi min da zanîn, heta jiyan bikim ezê deyndarê keda we bim û tu carî ji bîr nakim.

Rêheval Karasû, ji ber ku min ji we re ne nivîsandiye û weke mamosteyê xwe min we agehdar nekiriye li bermamberî we ketim rewşa kêmasiyê. Lê her çendî ji bo borandina li kêmasiyên min rehma bexşandina we bi hezaran qat ji kêmasiyên min mezintir jî be, dîsa jî bexşandina xwe ji we dixwazim. Ev çavên min ji pîrbûnê qurmiçîne û xêzikên pîrîniyê ketine li ser rûyê min ê temendar. Wê bi dîtina we ronahiya çavên min vebin û xêzikên li ser rûyê min tine bibin. Dengê we yê weke gulên biharê min şiyar dike, di guhê min de her dem zingînî dike û xwe dubare dike. Ez ji ber dûrbûna ji we bi axîn û nalîn im. Rewşa min dibe wek agirê dojehê û her dem têşim. Raste mamoste, meşa we li çiyayan û li ser tehtan dîrokek nivîsandiye û ev dîrok ji bo bindestan bû nîşana serkeftinê. Çendî bê hêz bûm, we wêrekî û hêz dida min, ev wêrekî rê û rêzikên şehîdan û Rêber Apo ne û me soz daye ramanên wan ku di nava gelan de ravebikin û belav bikin.

Ez di wê baweriye de me, wê di Rojhelata Navîn de fereseta Rêber Apo bê çandin û wê ji tovên wê gul û çîçek pişk bidin.

**Gula Kurdan**

Mamosteyê gul û rihana li çiyayan
Heyv û roka li erdû esmanan
Gula Kurdan şîn û geş bû li nava gelan
Ew qas bi nazî biriqandina cem kaniyan
We hilda barê giran bi evîna şehîdan

Ew qas delal û xweşikî min dît li dibistanan
Ew e bazê li Qendîlan, reng dide rêhevalan
Barana biharê şînkir welatê yarê
Rûgeşa welatî bi evîna Rêberî
Dûrketim, xerib mam ji dost û yaran
Çav digirî, rondik dibarandin bi hezaran
Min jê pirs kir ji halê wan
Got xerîb mam ji çiya û zozanan

**Silavê rêzên şoreşgerî**
**Mamê Hecî**
**20 / 05 / 2013**

**Heval Cuma**

Mamosteyê min ê birêz, li Kobanê karê xwe berdewam dikim, bi rastî jî Kobanê bi evîna şehîdan, Rêber Apo û rêhevalên wî hatiye neqişandin. Serboriyên ku me ji şopa şehîdan, ramanên Rêber Apo û cangoriyên rêhevalên wî girtin, rêya me dane ronîkirin li cîhanê. Min dixwest li kolanên Kobanê, mal û taxên wê bigerim, axaftinên ku ji Rêberê gelê Kurd Rêber Apo girtine kom bikim û nêrînên wan welatparêzan li ser pelên spî birijînim. Kolanên Kobanê bi evîna şehîdan, Rêber Apo û rêhevalên wî radibin û rûdinin û germahiya dilê wan rûgeşiyê dide min. Dema min pirs ji wan dikir, rûyê wan yê biken bi min re dikeniya. Li derdora min bi yek carî digotin; "ew Rêberê gelan e, em hemû pê bawerin, me bawerî pê aniye, em hemû jê hez dikin. Wî ferq û cudahî nexistiye navbera gelan û ji herkesê hezkiriye. Ew, li hember hemû ol û baweriyan rêzdar û xweşbîn bûye. Ji xwezaya ku dayîke, hez dike. Bi giştî gelên cîhanê vedixwîne hezkirina mirovahiyê." Bi rastî jî, hemû gelên herêmê rastiya bîrdoziya Rêbertiyê fêmkirine, ji ber vê yekê di vî alî de, ji aliyê gel ve ne rexne ne jî gazind nehatin arastekirin. Her kesê nêrînên xwe li ser pelan dinivîsandin didan min û digotin; "van nivîsandinan bibe, here gel hevalan radestî wan bike. Bila tu kes nebêje vegotin û nirxandinên me, Mam Hecî bixwe nivîsîne." Ji ber vê daxwaza wan, ezê nivîsandinên gel bigirim û bînim çiyê. Hem jî wê di arşîvên partiyê de bên bicihkirin û parastin. Welatparêz newelatparêz, min li deriyê her kesê da û hinek nivîs ji wan girtin. Wan jî ev yek bi xweşbînî

pêşwazî kirin. Di derbarê şehîdan, Rêber Apo û rêhevalên wî de nêrînan berhev dikim û vegotinên wan tendirustiya min baş kiriye. Karê ku pêktînim pîroze, daxwaz dikim layiqî wan bibim.

Mamoste; dema mirov li nexşeya Kobanê dinêre, hişk weke hesinê polaye ku şehîdan ev mejiyê ew qas hişk bi ideolojiya Rêber Apo dane afirandin. Wisa dibînim, felsefa Rêber Apo baş bicih kirine. Giraniya ramanên Rêber Apo û cangoriya hevalan di vê nexşeya hişk û berîn de evîna wan dibînim. Mînak; bostanê bêgul hatî avdan, bi xwîna şehîdan bûye bostanê gul û gulistanan. Dema xwe didim naskirin ku ji Qendîlê hatime, xurûşek cuda çêdibe. Ji ber ku Qendîl ji bo Kurdan bûye 'qible.' Lê mixabin ev hezkirina giranbiha ne ji bo min e. Hezkirina wan ya ew qas giranbiha ji vir dihat ku xwediyên Qendîlê şehîd, Rêber Apo û rêhevalên wî ne. Bi destura birêz, di derbarê aramî û xweşiya ku Rêber dayî destpêkirin ya ku pir pîroze bişibînim vê mînakê. Hz. Mihemed ku ji Medînê vedigere Mekehê, bi deh hezaran leşkerî Mekehê dorpêç dikin. Hz. Mihemed dibêje; "emê aramiyê bingeh bigirin." Ji ber wê jî peymanekê li gel Ebû Cehîl girêdidin û Hz. Mihemed dibêje; "ger em vê peymanê mohr bikin wê ji bo me gelek bisûd be û wê Kâbe bibe cihê şêwermendiya me." Hz. Ebû Bekir, Hz. Omer, Hz. Osman û Hz. Elî vê yekê erê nakin, lê dîsa li ser mukuriya Hz. Mihemed ku dibêje; "ger hûn erê bikin, wê Kâbe bibe cihê civîna we." ev aramî hat erêkirin û heta niha jî ew der bûye cihê civîna Misilmanan.

Ez bi xwe aramiya Rêber Apo wisa dibînim. Dema ev aramî weke ku Rêber Apo armanckirî pêk were, wê Rojhilata Navîn di felsefa Rêber Apo de şîn bibe, wê reng bide cîhanê û wê belav bibe li her derê cîhanê. Min di serî de dikara Kobanê kiriye, lê raste, ger gul neyên avdan wê biçilmisin. Ev jî rastiyeke ku ev barê giran li ser milê hevalan e. Rêhevalên Rêber Apo, wê hezkirina Rêbertiyê û felsefa wî di roniya rêya şehîdan de bidin hezkirin. Ev barê mezin, barê rêhevalên Rêbertiyê ye. Mînak; dema rastî û nerastî beramberî hev werin û rastî bi hêzeke zêde kar bike, ewê serkeftî be. Ev, bi xebata hevalan ve girêdayî ye. Jîrî û jêhatîbûna wan, wê serkeftinê bi xwe re bîne. Ji ber ku rastî li kû derê be gel li wir e. Ev yek wek mînaka mêşa hingivî ye. Şirînahî li kû derê be, mêşa hingivî li wir e. Dîsa weke mînaka olan û pêşengên wan; Hz. Mihemed, Hz. Mûsa û Hz. Îsa ji ber ku gelê wan nezan bûn, bi armanca gelê xwe şiyar bikin û rastiya xwe di nava wan de bidin têgihandin, gelek

zor û zehmetiyên mezin kişandine. Xwendina pirtûka Rêber Apo her diçe pêş dikeve û hezkirina pirtûkên Rêbertiyê bi gel re bilind dibe. Li ser vê hezkirinê meşîn, wê rastiya armancên feraseta Rêber Apo li cîhanê belav bike ku afirînerê jiyana rasteqîn ya gelên bindeste. Ger gelê Kurd şiyar û zana bûya, ji bo şiyarkirin û zanakirinê pêwîstî bi hatina Rêber Apo nedibû. Lê weke me berê niha jî anî ziman paşverûtî, nezanîn û bindestiya gel neçariya derketina pêşengek weke Rêber Apo derxist holê. Her wiha Rêber Apo ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo hemû gelên tên çewisandin û bindest bû hêvî û nîşaneya serkeftin û serfiraziyê. Em neçar û berpirsyarin li ber şiyarkirin û zanakirina gelê xwe. Ji ber ku me ji bo vê armancê sond xwariye. Mînaka vê ya herî şênber û balkêş ewe ku dema Hz. Mihemed li Medîneyê rastî ew qas kevir avêtinan hat, dîsa jî doza xwe bingeh girt û jê neveqetiya. Dîsa di pêvajoya şoreşa me de jî mînaka Mazlûm Dogan û hevalên wî dikare bên bibîranîn. Wan di rojên herî zehmet yên girtîgehê de, li beramber hemû cure êşkenceyan li ber xwe dan û di wan mercan de jî xeta şoreşa vejînê ji xwe re bingeh girtin. Lewma ew rêberên me ne. Çawa ku Rêber Apo gotiye; "şehîd rêberê me ne û ger ev nirx neyên parastin wê tune bibin", em jî mehkûmê parastina van nirxan in. Mînak; weke wan xezalên li serê çiyayan radizên, çavên wan her vekirîne û li benda derketina stêrka sibehêne. Hemû heval jî bi vî rengî jiyan dikin.

Ez dixwazim bi kamerayê gotinên wan yên ku Rêber Apo dîtine bînim. Dayîka Memo wêneyên te û yên Memo nîşanî min kirin. Min hûn nas nekirin ji dûr ve, paşê daxist û pê re min hûn naskirin ku tu bi çek û sîleh li kêleka şehîd Memo bûyî. Yadê got; "ezê bi zindî hinek gotinan li ser heval Memo û Cuma bêjim." Min jê re soz da, lê ew dayîk çû ber dilovaniya Yezdan û negihiştim vî karî bikim. Em îro çûn ew gundê ku Rêber Apo tê re derbasî Rojava bûyî. Ew kevirê ku li ser rûniştî, kevireke reşe û ew dara tûyê ku pala xwe dayê, ew odeya ku tê de rûniştî û bi gel re axiviyî min dîtin. Xwediyê malê gelek giriya û got; "ez di kamerayê de baxivim û ji rêhevalên me yên jorê re ragihînim, wê keyfxweşiyek mezin bide min."

Dema mirov li dilnimiziya Rêberê gelan Rêber Apo dinêre, serkeftinê dibîne. Lê xeta sor tu caran nayê ji bîr kirin. Mînak; Yezdan dibêje; "îne enzelînake." Di vir de nêrînek çêdibe, yanî me daxistiye. Ev jî dilnizmiya her mirovî bilind dike. Daxwaza min çûyîna Efirînê ye û ezê

biçim. Heval Mehsûm demek dirêj li Mexmûrê mabû û dema hat vir hinek ji van belgeyan xwendin, hawêj kir û pê razî bû.

Ez naxwazim li beramberî mamosteyê xwe şermezar bibim û naxwazim kêmasiyên min derbikevin. Ez silavên xwe yên germ ji bo we dişinim, rêzdariya xwe peşkeş dikim.

**Warê We Zagros Û Cudiye**

Zagros û Cûdî warê we ye
Pêşveçûn kar û xebata we ye

Sond û peymana min rêhevale
Amed paytexte, Wan hêviya te ye

Mamosteyê perwerdeyê tu yî
Şervanan zana û zîrek dikî tu yî

Wek pilingan dijmin dihejînî
Bi esilê xwe Hûrî û Arî yî

We gul çandin di nava dilan
Awirên we ez kuştim bi tîran

**Ji Bo Heval Cûma**

Dema li wargeha Şehîd Rûstem Cudî bûm, heval Cûma bi rêya heval Xwînrêj têbîniyek ji min re şandibû. Lewma hevalên rêveberiyê banî min kirin. Wê demê heval Ferman endamê rêveberiya wargehê bû. Wê kêliya ku min ew mizgînî bihîst li mêhvanxaneyê hinek mêhvanên me hebûn. Min destur ji wan xwest û berê xwe da cihê rêveberiya wargehê. Heta gihiyam wir bêhn li min çikiya. Min mîna nexweşan silav da rêhevalên li ber derî û wan jî gotin; "keremkin kalê hêja." Min got; "destura we hebe dixwazim serdana hevalê Ferman bikim." Dengek hat û got; "keremkin." Ji ber ku bi salan li gel heval Ferman mabûm, min dengê wî baş nas dikir. Min derî vekir û mîna dînan got; "kanê têbîniya heval Cûma ya ku ji min re şandî?" Heval Ferman got; "mam Hecî were rûne." Dema min bala xwe dayê rabû ser xwe û ez pêşwazî kirim û cihê rûniştinê nişanî min kir, keyfxweşiyek mezin bi min re çêbû. Min got; "ka têbîniya ku ji min re hatî ku ez li nava dilê xwe hilînim." Heval Ferman got; "mam Hecî ka were li kêleka min rûne, qehweyekê vexwe." Paşê dubare xêrhatina min kir û pirsa rewşa min kir. Dema mijara hatina têbîniyê nehat vekirin, min wiha got; "we ji bo xebatê banî min kiriye." Wî jî got; "nexêr, ji jor ji bo we têbîniyek hatiye. Hûn dizanin kî şandiye? Heval Cûma şandiye." Her wiha heval Ferman axaftina xwe bi vî awayî berdewam kir; "heval Cûma dibêje baweriya min mam Hecî heye ku çi karê bixwaze dikare bike. Ji ber wê ji me daxwaz kiriye ku em daxwazên te pêkbînin."

Heval Cûma ez şandibûm dibistana Mazlûm Dogan ku bi zimanê dayîkê fêrî xwendin û nivîsandinê bibim. Min li wir ji mamosteyên pir hêja û delal perwerdeyek pir xurt û biberhem dît. Wan kedek mezin ji bo min dan û gelek zor û zehmetî bi min re derbas kirin. Min baweriyek mezin dabû mamosteyên xwe û li beramaberî keda wan pir bi rêz û hezkirin bûm. Mamosteyên min yên hêja Şehîd Viyan Soran û heval MustafaKarasû bûn. Min sond û peyman da wan ku hizrandinek kûr û mezin di serê xwe de ava bikim.

Heval Ferman got; "pêşniyara min ji we re, hûn biçin û di nava gel de kar û xebatê bimeşînin." Min bersiv da û got; "ezê di derbarê Rêber Apo de nivîsandinekê binivîsim. Ezê evîna Rêber bi hezkirina dilê xwe bînim ziman. Ev yek ji bo me hemûyan remzê serkeftin û berxwedanê

ye." Paşê min ji heval pirsî ka ez kengê biçim. Heval jî got; "hûnê sibe biçin Rojava." Ew karê ku ji min re hatî dayîn pir giranbiha û pîroz bû. Ezê biçûma Rojavayê Kurdistanê û minê xebata xwe ya nivîsandinê bimeşandiba.

Ji ber ew e rêberê gelên bindest, roja bindestan û wî ronî kir her çar aliyên cîhanê. Bi feraseta Rêber Apo hemû cîhan bû pênûsa bireng ya zanista jiyan, berxwedan û azadiyê. Ew e fîlazofê cîhanê, çi qas bêjim nikarim weke tê xwestin wesfên wî bînim ziman. Xwedî felsefe, bîr û baweriyek ew qas mezine, nikarim bi çend rûpelan girîngî û mezinahiya wî bînim ziman. Lê min soz daye mamosteyên xwe ku bi meh û salan ji wan perwerdeyê fêrbibim. Her çendî ji bo vî karî wêrekî û xebat dihat xwestin jî lê bi saya alîkarî û hêzdayîna mamosteyên xwe, ezê vî karî bi ser bixim.

Çûyîna min ya Rojava fermana heval Cuma bû. Ev ji bo min şanseke mezin û binirx bû. Ezê ji vê yekê gav paşde neavêjim. Min, têbiniya ku heval Cuma ji bo min nivîsandî maçkir û danî ser serê xwe.

Min soz da heval Ferman ku ji xwe bawerim, ezê bikarim hemû gotinên welatparêzan li lênûsa xwe binivîsim. Li mêhvanxaneyê mêhvanên min hebûn û li benda min bûn. Lewma min destur ji heval Ferman xwest ku biçim. Heval Ferman jî bi xweşbînî pêşwazî kir û got; "li ser çavan biçin. Silavên min li mêhvanên xwe Ubeydula, Sunilah û Cegerxwîn bikin." Ez rabûm hêdî hêdî meşiyam û çûm mêhvanxaneyê. Hevalan pirsî ka çima hevdîtina min a li gel heval Ferman ew qas dirêj kir. Min rewşê ji hevalan re rave kir. Jixwe wan jî bihîstibûn ku ezê biçim Rojava. Ji ber vê yekê rûyê hevalan geş bû û keniyan. Heval Seyîdxan Ozalp dikara xwarinê kir û paşê banî heval Berxwedan Ozalp jî kirin. Ev heval gelek dihatin hezkirin. Her wiha li derdora me gelek mangeyên hevalan hebûn û ji wan mangeyan jî heval hatibûn gel me. Cihê mêhvanxaneyê gelek qerebalix bibû û demê me gelek xweş derbas dibû. Ubeydulah, Sunilah û Cegerxwîn gotin; "hîn çend demjimêr roj maye, em dixwazin ji bo şîva hevalan karikekê bikirin. Emê bi hev re bixwin û bila ji hevalan re bibe noş û can." Li ser vê gotina wan, heval jî pê re çûn û ji cîranan karikek kirîn. Sunilahî karik hildabû ser milê xwe. Paşê anîn mangê serjêkirin, kewilandin, ji hev kirin û danîn ser agir. Piştî xwarin çêbû, em bi hev re rûniştin ser sifrê û me bi hev re xwar. Heval Seyîdxan got; "vê bîranînê ji bîr nekin." Min got; "wê heta dawiya

temenê min heval û şoreşgerên têkoşînê li bîra min bin." Heval Seyîdxan got; "min wisa bihistiye heval Çeknasê Qersî du car daxwaz kiriye ku ji bo kar bê şandina, lê hîn daxwaza wî pêknehatiye. Niha jî wê mam Hecî biçe Rojava. Partiyê jê re cil û berg jî amade kiriye, hem jî mesrefa tê xwestin jî danê. Wê biçe malan û bibîne rûyê welatparêzên ku lingê xwe dirêj dikin û didin zirtan. Ger karkirin wisa be pîrka min jî dikare bike." Min got; "rexneya we giranbihaye. Heval Seyîdxan ez soz didim şehîdan û Rêber Apo, ezê li ser xeta wan bimeşim heta dilopa xwîna xwe ya dawî."

Demjimêr diborîn, derengiya şevê bû, di destê dayîkan de destegul hebûn, lê ne cejin bû ne jî eyd. Ubeydulah, Sunilah û Cegerxwînî hinek fêkiyên ku dayîkan anîbûn xistin lalîkan û danîn ber hevalan. Wan xwe pê mijûl dikirin û ken û civata xwe berdewam dikirin. Seyîdxan got; "ka dikara welat bikin. Em bi xweşî hatin û me goştê karikê jî xwar." Şev derbas dibû, rûyê hevalan mîna stêrka sibehê geş dibû û gotin; "destura we hebe emê rabin, sibe kar û xebatên me hene." Heval çûn. Li mangê heval Berxwedan Ozalp û Dogan Kerboran li gel min diman. Heval Berxwedan amojgarî li hevalan dikir. Heval Berxwedan xwedî seknek pir fedakâr bû, lewma ew fedekariya wî tu car ji bîr naçe. Her tim şîret û amojgarî dikir. Bi wan amojgariyan mirov ji ketina kêmasiyan rizgar dibû. Bes min nedizanî edî ez wî nabînim. Me, şevên gelek xweş bi wî re derbas kirin. Hevalan ji bo çûyînê destur xwestin, ji ber ku di nava kar û xebatê de bûn. Lê heval Berxwedan Ozalp û Dogan Kerboran mêhvanê me bûn û li gel min diman. Dem pir xweş derbas dibû. Heval Berxwedan her civat û amojgarî digerandin. Gotin û axaftinên wî hertim rênîşanker bûn ji bo me tevan. Birastî jî ez tu carî wan kesayetan ji bîr nakim û ezê heta mirinê rê û şopa wan bişopînim. Ezê li armancên ku wan dane pêşiya me, xwedî derbikevim.

Roj derketibû li ser çiyayê wargeha Şehîd Rûstem, dengê zarokan diçû esîman, ji dengê wan hezkirina şoreşê dihat. Ew zarokên Mexmûrê yên ku Rêber digot, "zarokên min in." Rojê tîrêjên xwe avêtibûn qelaya felekê, wargehê nalîn ji kezebê tanî, pîremêran tizbî dihejandin di destan de û dimeşiyan di kolanan de. Dengê berxikan dihat ji govên gundiyan, şagirtan pirtûkên xwe hildabûn û ber bi dibistanê ketibûn rê. Keçikan derê malên xwe direşandin û paqij dikirin. Bayek xweş ya sibehê dihat û darên di baxçeyên malan de hêdî hêdî dihejandin.

Heval Dogan taştê amade kiribû. Zeytûnên Rojava, penîrê Serhedê û çayek sor mîna xwînê. Em hinek dereng rabibûn û bi hev re rûniştin li ser sifrê. Êdî demê rêwîtiyê bû. Heval Dogan got; "hevalên ku rêwîne dereng mane, divê bi rê bikevin." Em meşiyan heta derê asayişê. Li wir Şahînê Gabarî û Abdûlayê Melê hebûn. Xêrhatina me kirin. Min destê hevalên li vir dîmînin girt, xatir ji wan xwest, lê hîn ji destpêkê ve xeribiyê ez girtim.

Em li tirimpêlê siwar bûn û ajovanî berê me da Hewlêrê û ji wir jî ber bi Qendîlê ve çû. Lê dûrketina ji wan nêrgizên baxan rondik xist her dû çavên min û diherikîn ser hinarokên rûyê min. Dema em çûn Qendîlê, min ji heval Leyla pirsî; "gelo ezê li kû derê bikaribim mamosteyê xwe heval Fûat bibînim?" Got, "erê mamo, ger biçî Garê dikarî bibînî." Heval Leyla perwerdekara perwerdeya şervanan bû. Ji Kaxizmanê bû. Ji wê derê koçberî Edenê bibûn. Paşê çûbûn Osmaniyê.

Demek paşê tirimpêl hat, em siwar bûn û ketin rê. Em rastî cihekê hatin. Min ji heval Leyla pirsî; "ev ku dere?" Bi bersîva heval Leyla min fêmkir ku em li Garê ne. Daristanên wê şîn bibûn. Ji xwezaya wê bêhna fêkiyan difûriya. Konek xuya kir, li derdora kon bîst û çar stun hatibûn danîn. Reng û bêhna şînatiyên wê reng dabûn xwezayê. Em di nava wan şînatiyan de gihiştin cihê asayîşa hevalan. Li wir du havalên xort û du hevalên jin hebûn. Wan hevalan em pêşwazî kirin. Paşê heval Leyla jî xatir xwest û çû. Piştî ku em rûniştin hevalan fêkî anîn û me bi hev re xwar. Pişt re min daxwaz kir ku heval Fûat bibînim. Hevalan jî gotin; "başe heval, lê hinekê rawestin, wê piştî nîv demjimêr din bê." Lê mixabin hîn heval Fûat nehatî tirimpêl hat û em bilez ketin rê. Ez negihiştim heval Fûat bibînim û dîsa dilê min bû cihê kul û kederan. Dîsa şansê min ê xirab feleka min çep zivirand.

Dema em li tirimpêlê siwar bûn li gel hevalê ajokar me civat gerand heta em gihiştin Sêdaran. Dema em gihiştin wir, ji dûr ve heval Jiyan a ji Şîtkanê û heval Cemîl Amed xuya bûn û wan em pêşwazî kirin. Bivêja "şêr bi cihê xwe tê naskirin" rastiya cihê heval lê diman diselimand, cihê wan ew qas xweş bû. Em birin hundir û li ser mehfûran dan rûnişkandin. Cihê hevalên jin bû. Gelek xweş û paqij bû. Dema em rûniştin, hevalan xêrhatina me kirin. Me jî bersiv da hevalan. Paşê qehwe ji me re anîn. Hevalan dest bi axaftinê kirin. Ew qas delal û bedew daxivîn, dil diheliya. Mîna awazên bilbilan li xweşiya guh diçû gotinên wan. Paşê xwarin

danîn ser kuçan. Şîva me savar bû, li gel wê dewê mastê mihan hebû. Wê gavê gotina Rêbertiyê hate bîra min, gotina "xwarina savarê û tasek dewê mastê mihê pir xweşe." Em wê şevê li wir razan. Sibehê zû rabûm ji xewê. Min pêşiya taştê xwest desturê ji hevalan bixwazim û biçim, lê hevalan gotin; "hinek temenê we boriye, hûn nikarin bi piyan bimeşin. Dema tirimpêl hat hûnê pêre biçin Rojava." Dema tirimpêl hat min ji şoreşgerên hêja heval Jiyan û Cemîl xatir xwest. Em derbasî Çiyayê Spî bûn. Li wir heval Harûn em pêşwazî kirin. Paşê heval li wir kombûn û xêrhatina me kirin. Qehwe ji me re anîn û me demekê suhbet kir. Dem hat, me xatir ji hevalan xwest û em ketin rê. Hinek bi tirimpêlê hinekê jî bi piyan em meşiyan. Paşê heval Harûn bilez gazî ajovan kir ku tirmpêlê bîne. Tirimpêl hat û em bilez û bez siwar kirin û ketin ser rê heta ber ava Çemê Mezin. Heval Harûn bi me re bû. Dema em çûn ber avê hevalan keştiyek biçûk li hev xistin û em li ser avê re derbas kirin. Piştî ku em derbasî aliyê din yê avê bûn me meşa xwe bi piyan berdewam kir. Heval Xemgîn û Xabûr bi me re bûn. Em bi qasî sê demjimêran meşiyan û gihan gundê Ziyaretê, mala Hesenê bavê Zînê. Wê êvarê em li mala wî man. Lê xew neket çavên min.

Heval sibehê zû rabibûn. Dema me taştê xwar, gundî pê hesiyabûn ku heval ji çiya hatine û hatin mala bavê Zînê. Pirsa rewşa hevalan kirin. Lê ez gelek westiyabûm û min nedikarî bersiva wan bidim. Ji ber gelek kes hatibûn û gelek pirs dikirin. Dema min nekarî bersîva wan bidim, rondik li ser hinarokên rûyê wan de dihatin xwarê. Bi qasî sê rojan li wir mam. Piştî sê rojan heval Birûsk Kobanê bi tirimpêla xwe ez birim Dêrika Hemko, li gel heval Xalîde Şêyan û Şahîn Cîlo. Wan bi rêzdarî ez pêşwazî kirim û xêrhatina min kirin. Min jî silavên çiyê ji wan re ragihandin. Heval rabûn ser piyan û silava hevalan vedan. Em bêhnekê rûniştin, lê heval Xalîde ferq kir ku pir westiyayî me. Ji ber ku rêyek pir dûr bi piyan hatibûm. Banî hevalan kir û got; "mam Hecî xwe li ser kursiyan nagire, werin bibin mala Wensa." Hevalan jî destê min girtin û ez birin wê malê. Dayîkê xêrhatina min kir û bi dilgermî pêşwazşkir. Tesadufî derket ku ew mal, mala xêzana Eliyê Dirêj e. Heval Elî şehîdê doza giran, taca serê me hemûyan e. Ew ji Til Şiranê bû. Lê navê gund guhertibûn û kiribûn Til Xinzir. Ez du rojan li mala dayîka Wesna mam. Min got; "ez bîranînên şehîdan dişopînim, doza wan hîn li gel mine." Du keç û du kurên wan hebûn, dema min ew gotin anîn ziman, şehîdên dozê hatin bîra wan.

Paşê min xatir ji dayîka Wesna xwest û çûm gel heval Şahîn. Min jê xwest ku tevlî kar bibim. Paşê wî ez şandim Qamişlo. Li wê derê heval Ceger berpirsyarê mêhvanxaneyê bû. Wî jî ez birim mala bavê Canê. Dayîka Canê bilez û bez çay anî. Min ji dayîka Canê pirsî; "we çend salan xwendiye?" Got; "min danzdeh sal li Şamê xwendiye." Dayîka Canê xebata rêxistinkirina jinan dikir. Piştî demekê xwarin danîn û me xwarin xwar. Hevalan jî her pirsa hevalên li çiya dikirin û bêriyên xwe tanîn ziman. Min jî silavên hevalên çiyê gihandin wan. Heval Ceger got; "heval li Dêrikê ne amadene. Dema hatin, ezê têbiniya te bidim wan."

Keça malê Canê diçû dibistanê û perwerde dida zarokan. Li wir heval Şiyar ji canê dipirse; "ma kes li malê nîne?" Canê jî jê re dibêje; "bi qasî du rojane hevalek li mala me ye, bes navê wî nizanim." Heval Şiyar Efrîn dibêje; "dikarim bêm serdana mala we." Canê dibêje; "belê kerembikin werin em bi hev re biçin û mêvanê me jî bibînin." Dema hatin malê û min ew dît, min xwe avêt himbêza wî. Ji ber ku me hev ji nêz ve nas dikir. Em li gel heval Şiyar rûniştin û Canê jî çay anî. Heval Şiyar ji bavê Canê destur xwest ku em biçin li gel wî. Her çendî bavê Canê nedixwest jî, lê li beramber israra heval Şiyar xwe ranegirtin û destur da. Heval Şiyar jî bi destê min girt, me xatir ji malbatê xwest û em çûn cihê wî. Çay anîn û me çaya xwe vexwar. Paşê min got; "we tiştek ji min re gotibû. Divê hûn xwedî li gotinên xwe derkevin. Ez dixwazim alîkariya hevalan bikim." Heval Şiyar got; "gotinên ku Rêber Apo anîne ziman hene. Divê ew axaftin bên berhevkirin û paşê jî bên nivîsandin. Ji bo ku ji zarokên Kurdan re bimîne." Min jî erêkir û got; "ji ber ji giyanê min jî zêdetir ji bo Rêbertî çi hebe ezê feda bikim. Bila dilê te aram be, ji bo vê ezê bibim alîkar." Em du roj li manga heval Şiyar man. Heval Şiyar got; "hevalek din bitemen heye. Bisalane rêxistinê nas dike û bi salan Rêbertî dîtiye. Ew jî wê ji bo we bibe alîkar. Hem jî wê li Qamişlo û gundan we bigerîne. Kesek tê naskirine. Hem jî temenê wî gihiştiye heştiyan. Ew jî her kesî dinase û bi şev û roj di nava gel de ye. Hema bêje hemû gelê herêma Cirzîrê nas dike. Tu wê ji vir biçî mala wan. Navê wî Yûsûf e. Hûn dikarin vî karî bi hev re bigirin ser xwe û pêşve bibin." Ez çûm mala Yûsûf. Xêrhatina min kirin. Min got; "ji bo zarokên mazlûman xêrê dixwazim." Got; "kê we şandiye?" Min got; "heval Cuma. Min silavên wî anîne ji bo gelê Rojava." Wî jî got; "mamo, bixêr hatî ji çiyayan."

## Kobanê

Rêbertiyê tovên jiyana azad li Kobanê çandibûn, şînbûn û reng dan gelan. Xemilandin Kobanê birengê sorgulan û bilind kirin ala Kurdan. Keç û xortan birin taqê ezmanan û li her kolaneke Kobanê dixwînin bazên çiyayan. Karê xwe didin meşandin bişemala dilan, tê şopandin rêya pakerewanan û Kobanê hatiye neqişandin bi pênûsa Rêberê Kurdan. Ramanên Rêber xwendin û ronîkirin bi feresata wî, şiyar bû tevahiya cîhan, navê şehîdan hertim li ser ziman. Keç û xort bi şev û rojan bîranînên xwe tînin ziman. Min jî dixwest li mal û tax û li kolanên Kobanê her bigerim û evîna van qehreman û evîndarên azadiyê li dil binivîsim. Rêbertî jî di demê xwe de bûye mêhvanê wan û li gotin û axaftinên Rêbertî guhdarî kirine. Ev yek nabe nesîbê her kesê. Lewra gotinên Rêbertî ji bo pêşeroja wan ronahî aniye û ew bi vîn û hezkirina azadiyê xelat kirine.

Hîn bermayên şer li her kuçe û kolanên Kobanê xwe dida der. Parêzvanên Kobanê digeriyan li kolanan û kuçeyan. Kolanan ji bermahiyên hovan pak dikirin. Bi navê misilmantiyê, bi hovîtî û tevkujiyek mezin bi ser gelê Kobanê de hatibûn. Zarokên wan qetil kiribûn. Jin, keç û bûkên Kurdan bi navê Yezdan difirotin Ereban. Lê gelê Kobanê bi ferasat, bawerî û vîna ji têkoşîn û Rêbertiyê girtiye, serî netewand li hember dijminê mirovatiyê. Digotin, "şervanên me şoreşgerên cîhanê ne. Heta dawiyê baweriya me bi van şoreşgeran heye û emê heta dawiyê ji wan hez bikin û wan birêzdarî bibîr bînin."

Ji ber ku Rêbertiyê ev derfet afirandine û di feraseta xwe de tu carî cudahî nexistiye di nava netew yan baweriyan de. Lewra Rêbertî ji aliyê Êzidî, Elewî, Ermenî, Asûrî, Kildanî, Ereb û her kesê ve tê hezkirin û hizir û ramanên wî tên hawêjkirin. Heta, wisa bawer dikin ku ji destpêka mirovahiyê heta niha rêberek weke wî nehatiye ser rûyê cîhanê. Feraseta Rêber şîn bû û reng da gelan.

Birastî jî gelê Kobanê bîrdoziya Rêber Apo fêmkiriye. Ji ber ku hizirandinên xwe ji perwerdeyên hevalan girtibûn. Girêdana gelê Kobanê ya bi Rêbertî ve nayê pîvan. Dîsa girêdana wan bi hevalên li çiyê pir zêde bû. Rêz û hezkirina xwe ji bo wan tanîn ziman û digotin; "ew in baweriya me û ew in parêzvanên xaka pîroz ya Rojava."

## Efrîna Zêrîn

Efrîna min a zêrîn, çi xweşik û delalî, tu jiyana dilê Kurdanî, biheşta Rojhilata Navînî. Tu hesreta dilê şoreşgeran, welatê Hurî û Ariyanî, evîn ket kolanan çi rojeke bi şer û cenge. Rêhevalan Efrîn xemilandin bi rihan û bi binefşan, kolan ronî bûn bi xwîna karkeran, dil êşiya bi qêrîn û zarînan, roj derket ji qolayê felekê, aqil û sewda di serê min de nemaye. Çeteyên DAIŞ û hevalbendên wî bi hezaran hatin, ew weke gur û hirçên harin û xwînxwarin, ne misilman in. Ew gelaş û xirabên cîhanê ne, wan helalkirin xwîna zarokên Kurdan bi navê Yezdan. Li hember wan derketin pîr û kal, jin û ciwan bi diruşma Kawayê hemdem, keç û xortên Efrînê gotin, "Berxwedan Jiyan e." Mesûd Barzanî li pey wî tê Nêçîrvan, xitim kir destê xwe, dest dan Artêşa Azad û li hev komkirin. Di serî de Amerîka, Tirk û dewletên Ereban wek wehşan. Birayê xayîn Mesûd Barzanî ji bîr kir Helepçe û Berzan û şehîdên Enfalê. Li pey meşiya Nêçîrvan, destê xwe dan destê DAIŞê, li hev kombûn û ji bîr kirin hemû şehîdên Kurdistanê bi yek car. Dadan deriyê Sêmalkan; Mesûd û Nêçîrvan ker û lalbûn, nedibihîstin qêrîna zarok, pîr û kalan û dengê dayîkan, nediçû guhê wan mirina keç û xortan, lê jin û zilaman gotin; "berxwedan bû jiyan." Birayê xayîn destê xwe xiste nava xwîna şeng û şepalan.

Hey Mezepotamyaya jêrin û jorîn! Çand, exlaq û jiyan we da afirandin, niha hûn di tarîtiyê de mane. We ronahî û xweşikbûn li her çar quncikên cîhanê da afirandin, bi ronahî û xweşikbûna we cîhan xemilî. Tembûra we afirandî maye bêdeng û bêgovend.

Ey tîrêjên rojê! Hûn bilindbûn li ser Rojhilata Navîn, roja we şemal da cîhanê. Hey Rojhilata Navîn! Bûka cîhanê, ew qas şeng û şepalî, xaka Horî û Ariyanî, lewra hemû dizên li cîhanê berhevbûne, tu dorpêçkirinî û dixwazin careke din te ji xwe re bidizin. Mamosteyê herî mezin afrînere û bi feraseta wî tuyê azad bibî. Wî bi hezaran şagirt gihandiye û şagirtên wî, wê we biparêzin. Mamosteyê min ê herî mezine, ew barana erd û ezmane, her dem dixwîne ji nava dilan, jiyana Kurdane, xudanê Kurdistane, bêhna misk û emberane û Zerdeştê Ariyane. Pêşwazî dikin gelê Kurd bi qevdên gulan, Rojhilata Navîn bejna xwe ditewîne ji bo Rêberê cîhanê. Bi fermana wî hildiweşînin kozikên neyaran, erd û esîman bi eşq û evîna wî biriqînê didin kolanên bajaran. Bi heybeta wî

deşt û çiya radibin û rûdinin, bi fermana wî cîhan ronîbû, bi hatina dengê wî keç û xort derketin serê çiyayan, welat hildan nava dilan, li hev civiyan bi navê şehîdan û Rêberê Kurdan, dane sond û peyman evîna dilê keç û xortan. Ew in hêza gelan, dişopînin rêya şehîdan, ew in diherikin bi ser neyaran, yên we biparêzin şagirtên rojê ne.

Hey Rojhilata Navîn! We xwe xemilandiye bi rengê bûkan, hûn li feraseteke nûjen û zavayeke nû digerin, hûnê bibin bûka Kurdan. Belê raste, ev keç û xortên Apoyî, ew in xazgîniyên te, weke şêr û pilingin, hûnê werin parastin, wê we bilind bikin û hildin li ser serê xwe. Qelenê we giranbihaye û bi xwîna keç û xortan, zarokên cotkar û karkeran hatiye beramber kirin. Hey nazikê nazenînê, poz bilinda qelengiran, bihayê dîrok û çîroka navdar û kevnar, wê we bi find û çira kin, wê we bidin ronîkirin, wê ronahiya we bide her quncikê cîhanê. Hûn bûne find û çira li ser cîhanê. Hevalan bi hev re gotin û bi berxwedan bersiv dan, hilweşandin û derxistin ji kozikan, neçar man û hiştin qilêş, top û tangan. Ew in şêr û pilingên Apoyî, ew in şagirtên rêberê Kurdan. Efrîniyan bi hev re gotin; "berxwedan jiyana gelane". Ewên xirap dişewitînin zarokan, pîr û kalan. Ew in xirabên mirovan, ew in dizê çarixan, mirovahî nebûye nesîbê van xwînxwarên talankar. Ew gur û hirçên harin.

Herdem aramî û aştî daxwaza Rêberê Kurdan e. Ev jiyana Rêberê Horî û Ariyane. Jiyan nemabû ji bo Kurdan, ji bilî hilgirtina çekan. Şehîd û heval Kemal û Xebat, bi navê şirîn bersiv dan Silav û Bêrîvan, bi diruşma Kawayê hemdem gotin; "jiyane berxwedan." Bilbilê, Raco û Şêrawa silav dan bi hev re, şopandin rêya şehîdan. Şera û Şiyê gotin; "çi jin çi mêr, îro roja qehremanan e." Mabata û Meydankê rabûne ser lingan, çi Sunî çi Elewî bi hev re dûman kirin kozikên neyaran. Dihejiyan û ditirsiyan ji berxwedana xwendekaran. Çiyayê Kurmênc paqij kirin ji wehşan, ew in zarokên Rêberê Kurdan. Haware! Ceng û şere li ser milê keç û xortan, hemû esmer û zerîne, li Rojava gul bişkivîne û xwe nîşandan li çiya.

**Ji Bo Heval Cuma**

Di serî de ji birêz daxwaza desturê dikim, ji bo ku ez bi karibim kêmahiyên xwe ji mamosteyê xwe yê hêja re bînim ziman. Min di van demên dawîyê de nameyek ji we re şandibû. Min di nameya xwe de rewşa xwe û rewşa pirtûka xwe anîbû ziman. Ez di wan vegotinên xwe yên borî de tînim ziman ku wê êdî dawî li redekteya pirtûkê were. Mixabin weke ku min ji bo we anî ziman derneket. Bi cih nebû, çewt derket. Ev ji bo min rûreşiyek bû ku min kir, ji bo vê rûreşiya xwe lêborîna xwe ji we dixwazim. Lê belê, lêborîna ku min ji we xwestî, bi deh qatan mezintire ji rûreşiya min kirî, lê hûn xwediyê nirxên giranbihane, ew nirxên giranbiha berjengên we ne. Mamoste her dem ji bo biçûkan dil henûnin, tika dikim ku hûn vê rûreşiya min bibexşînin. Kêmahîya min ya herî mezin, tiştek yan bûyerek hê tam temam nebûyî, min gihand birêz ku ew temam bûye. Divê tiştên bi vî awayî neyên gotin, ji ber ku rastiya wan nîne. Ez nû dikevim ferqa kêmahiya min kirî. Belkî dereng jî  bû, bi vî awayî nayê erêkirin. Lê girêdanên min bi heval û hogiran re heta dawiyê heye. Baweriya min heye ku tiştên min ji hevalan daxwaz kirî, wê erê bikin û pêk bînin. Wê kêmasiyên min çêbibin, ji ber ku mirovek nezanim. Ji we tika dikim da ku hûn min bibexşînin. Mirovên nezan her dem ji bo ketina kêmasiyan vekirîne. Soz didim bi şehîdan û Rêber Apo, ezê ji vir û şunde tişta nehatî bicihkirin, weke bi encambûyî nedim diyarkirin.

Çima dereng ma? Dixwazim hinekê dikara vê rewşê bikim. Min serdana heval Serxwebûnê Malazgirê û Mamoste Şoreş kir. Ji beriya dest bi redektê bê kirin, vesaziya van hevalan a çûyîna çiyê çêbû. Pişt re min serî li şagirtek yê zanîngehê da. Ji ber hinek rewşên nexweşiyê û zoriyên zanîngehê, wî jî nekarî bi min re bibe alîkar. Pirsgirêkên bi vî awayî heta dawiyê berdewam bûn. Bi vî awayî pirsgirêkên derdiketin pêşiya min dibûn asteng ku pirtûka min bidawî nebe. Rojên min vala vala derbas dibûn. Ev ji bo min êşek mezin bû. Ez nikarim tu gazindan ji tu hevalan bikim, ev jî şansê min bû. Weke ewreke reş xwe dabû ser serê min û rê li min dihatin birîn. Weke nimûne; li ser daxwaza min ku biçim saziya ziman, birêz ez şandim û çûm saziya ziman. Heval Sozdar Cizîrî li wir bû. Ji min re got; "ezê li ser daxwaza heval Cuma ji bo redekteya pirtûka we ji we re bibim alîkar." Birastî jî di zimanê Kurdî de

hêzeke wê ya mezin hebû, lê di wê demê de kar û xebatên saziyê gelekbûn û dest bi amadekariya civînekê kirin ku wê heta serê mehê bihata pêkanîn. Wê ji her çar parçeyên Kurdistanê Endamên Saziya Ziman bihatibana, ji ber wê hemû heval ji bo civînê ketibûn nava kar. Bi qedera 45 rojan li saziyê mam. Heval Sozdar Cizîrî digot, ezê alîkarî bidim lê ji bo amadekariyên civînê di nav kar û xebatek giran de bû û nivîs dinivîsîn. Bi rastî jî li wir xwedî li min derdiketin. Dîsa li ser daxwaza min birêz ez şandim Komîteya Zanist û Ronakbîriyê, hemû hevalên me yên li wir weke heval Xebat, heval Berxwedan, heval Sofî ji min re gotin; "em keyfxweşin ku ji bo pirtûkê ji we re bibin alîkar." Lê di vê navberê de tobbarana pasdaran despêkir. Bi erêkirina heval Cuma ez ji wargeha Ş. Rûstem Cudî re hatim şandim. Li wargehê min pênc mehan serê xwe li ser pîrtukê ranekir. Ev çênekirina redekteya pirtûkê di bîra min de hebû. Ez hertim ji aliyê hevalan ve dihatim rexnekirin. Min ev rexneyên wan yên pîroz erê dikir ku digotin; "çawa tu nikarî vê pirtûkê çêbikî?" Wiha digotin; "tu hêdî hêdî xwe ji aliyê rêxistinê û heval Cuma ve bêhêvî dihêlî ku hêviyên wan ji te bişkin." Min got; "ew qas nîne" û di rastiya xwe de rexneyên wan di cihê xwe de bûn. Ez li hemberî hevalan bi bawerim û bihêvîme.

Ew mînaka ku ezê li xwarê bînim ziman min xemgîn dike û hesretê bi min re dide çêkirin. Bi vî awayî xwe hîsdikim. Carekê şivanê gundekê hertim hewar dikir û digot; 'gurî ketiye nav pezan.' Li ser vê hemû gundî diçûn hawara şivan, lê tişteke wisa nedidîtin, gur nîne û pez hemû sax û selametin, paşê ew jî dizivirin malên xwe. Dema carek din şivan hawar dikir ku gurî ketiye nav pez, kes baweriya xwe pê nayne. Lê spêdê diyar bû ku gur ziyanek mezin daye pezê gundiyan. Di vê mînakê de dixwazim bidim diyarkirin ku çiqas hawar dikim jî, kes ji min bawer nake. Ev xwendin û nivîsandin we bi min da fêrkirin, hûn bi dayîna xwe bawerin. Ji bo min ev axaftin bes e. Mamoste Zeynebê li ser daxwaza min dest bi redekteya vê pirtûkê kir û dawi lê anî. Mamoste, ez bixwe ji redekteyê fêmnakim, lê bi qederekê kişand. Tevahiya pirtûkê ji 381 rûpelan pêktê. Yanî 381 rûpel hatine nîvîsandin û min ev nîvîsadinên xwe ji heval Xebat re şandin. Dema sibê radibim ji xewê, bi dîtina we şiyar dibim. Dema êvar tê, bi nedîtina we xemgîn dibim û radizêm. Herdem rewşa min wisa ye. Erê mamoste, geşbûna dilan, bêhna gul û nêrgizên dibistanan, we her tiştên ji bo min dihat xwestin bi min dan fêmkirin. Terbiye û

edeba rêxistinê we bi min da fêrkirin. Eger di rûyê min de şermek hebûya, wê weke xwesteka birêz bi meşiyama. Her min şaş agahdarî dan we, lewra ji we lêborîna xwe dixwazim.

Ez dixwazim îsal bi malika helbesta zanyarê Kurd Ehmedê Xanî wisa şîrove bikim.

Dişibin pêxemberan hemû kesên zanyar
Hemû pêkve welîne herçi kesên îbadetkar

Di pêşengtiya Rêber Apo de rêxistin hatiye hûnandin. Ew zanyarê gelê xwe ye. Bi xwîna şehîdan erdnîgariya Kurdistanê şemal da. Evîna rêxistina PKK'ê li her çar parçeyên Kurdistanê xistin nava dilê mirovan û liv û tevgera mirovan dane pêşxistin. Têkoşînê destpêkir bi gotina rewşenbîrên Kurdan, dîsa hat bîra min amojgariyên Ehmedê Xanî;

Min ji dinê pirsî bi hikmet
Qelenê te çiye, têkoşîn û xîret

**Vegotina Mam Hecî**

Min li wargeha Şehîd Rûstem Cudî bihîst ku Bîrgula dayîka heval Hebûn ji bo serdana keça xwe hatiye wargehê û li mala Mihemed Tosun bûne mêhvan. Min xwest serdana wê bikim. Ez çûm serdana dayê Bîrgulê. Ew ji Erdişê hatibû, hem cîranê me, hem jî xizmên me bûn. Pişt re min hatina wê jê pirsî. Wê jî got; "li ser banga hevalan hatime. Min serdana heval Hebûn jî kiriye. Ji hevalên ku ev derfet ji min re afirandine, spasiya xwe pêşkêşî dikim. Dema çûm gel heval Hebûn heval Bahoz Erdal jî hatibû wê derê, lewma di vê serdanê de dîtina heval jî bû nesîbê min. Min, ji ber piştî heft salan şansê dîtina Hebûnê ji min re afirandin, spasî û minetdariya xwe arasteyî wan kir." Paşê axaftina xwe wisa berdewam kir; "Min ji hevalan daxwaze din kir û got; ji kerama xwe, ez dixwazim bavê heval Hebûn jî bibînim. Ev bîst salin tevlî refên gêrîla bûye û min hêj nedîtiye. Ji kerema xwe, ger hûn bikin ku carekê bibînim wê pir baş be. Heval Bahoz daxivî. Min xwe negirt û ji çavên min rondik hatin xwarê. Min gelek şerm kir. Heval Bahoz ji min re got; "tu ji bo heval Hebûn digirî?" Min got; "Nexêr. Ez ji bo hevalê xwe giriyam. Me gelek dem bi hev re derbas kiriye û bi hev re jiyan kiriye. Min zarokên wî di nava refên gêrîla de dîtin, lewma ger ez bizanim jiyan dike an na, wê baş be. Ger şehîd ketibe, wê di dilê gelê Kurd de weke gulekê şîn bibe. Ez hevjîna wî me, dixwazim bibînim." Heval Bahoz Erdal got; "Herin wargeha Ş. Rûstem Cûdî, ji heval Pîroz pirs bikin û jê daxwaz bikin, wê bi we re bibe alîkar. Ger nekir jî, bila deynê stuyê min be ku ezê di demeke nêzîk de ji we re bersiveke zelal bidim."

Dema hat wargehê, ji min re got; "Mam Hecî, niha jî dixwazim tu min bibî manga heval Pîroz." Em bi hev re çûn serdana heval Pîroz. Bi dîtina hevalan gelek keyfxweş bû. Dema me xwe gihand devê derî, li wê derê hevalan em pêşwazî kirin. Em rûniştin û me keyfxweşî da hevalan. Bi qederekê şûn de çay anîn û danîn ber me. Bîrgul bi heval Pîroz re dipeyîvî, axiftina wan her berdewam kir. Di vê navberê de nirxandin hat ser şehîdan. Navê wî Mihmed Keser û nasnavê wî jî Subhan bû. Bîrgulê got; "sax yan şehîd, em aqûbeta wî bizanibin wê baş be." Wan hevalên li wir tev bi hev re erê kirin û pêşniyar kirin ku axaftina heval Bahoz Erdal zû were pêkanîn. Lewma ji bo biçim Balayan hatim pêşniyar kirin. Ji bo soza ku heval Bahoz dayî pêk were. Ji Saziya Malbatên Şehîdan bê

pirsîn, ger şehîd ketibe wê diyar bibe. Lê min dizanî şehîd bûye. Di sala 1992’an de milîseke partiyê bi navê Zeynel hebû. Wî ji min re gotibû heval Subhan şehîd ketiye. Heval Pîroz daxwaz kir ku ez biçim li pey vî karî bikevim. Lewma biryar hat dayîn. Heval Esma têbînî nivisî û da min. Paşê min ji heval Pîroz daxwazkir ku biçim Xinêrê, cihê ku lê dimam û li wir serdana hevalên xwe bikim. Wê jî got; “ji bo çûyîn û hatinê tenê dikarim pênc rojî bidim.” Min vê yekê bi keyfxweşî pêşwazî kir. Demek kurt piştî wê ez çûm Qendîlê û heman rojê bi tirimpêlê çûm Balayan. Dema ez çûm Balayan, çûm Saziya Malbatên Şehîdan û min serdana heval Rengîn kir. Min têbîniya heval Esma radestî wê kir. Piştî lêkolînê, wê jî têbîniyek nivîsî û da min. Êvar bû û tirimpêl tunebû. Ez ji wir çûm Saziya Ziman û wê êvarê li wir mam. Roja paştir ji bo heval Leyla Wan tirimpêl hat û ez jî li gel hevalan siwar bûm û hatim şaredariya Qendîlê. Sibehê em rabûn û ez çûm rêveberiya piratîk ji bo ku heval Heqî min rêbike Xinêrê. Ji ber min gelek bêriya hevalên xwe kiribû. Min heval Seyîdxan Ozalp li wir dît. Min got; “hûn bixêr hatin. We xêre, hûnê biçin perwerdeyê?” Wî jî got; “nexêr. Hatime serdana heval Demhat.” Min got; “hûn bi xêra xwîna şehîdan û Rêber Apo bikin, eger we dît bila gazî min jî bike. Min gelek bêriya wî kiriye, me bi hev re gelek roj derbas kirine. Ger bibînim, ezê gelek şanaz bibim.” Lewra min ji heval Zana re wisa got; “ji heval Heqî re bêje ez li şaredariyê me. Ger bibînim wê keyfxweş bibim.” Min xatir xwest û çûm şaredariyê. Qederekê runiştim, min nêrî heval Seyîdxan jî hat. Min jê pirskir; “tu çima ew qas zû hatî? We dê heval bidîta. We dît? Bersîva min da û got; “wê were vir.” Dilê min gelek geş bû. Ez û heval Seyîdxan runiştibûn, heval Zana ji devê derî re derket û got; “heval Demhat li ber derî li benda we ye.” Heval Seyîdxan rabû çû. Min di dilê xwe de digot; “pişt re wê gazî min bike.” Min xwarin nexwar û li benda gazîkirinê mam. Qederek şûnde heval Zana hat. Min jê pirsî; “heval Demhat kanê? Wê gazî min bikira.” Heval Zana got; “nexêr.” Weke ku ava sar bi ser min de birijînin li min hat. Recêfinê ez girtim. Min di dilê xwe de digot; “heval henek dike.” Dîsa min jê pirsî; “dikarim bibînim yan na?” Got; “na.” Dilê min şewitî, hêrsbûm bi nedîtina heval û ev mînak hat bîra min. Dema zarok ji dayîk dibe di nava qumaşekê de tê pêçan. Derdor hemû keyfxweş dibin û ji her rengan diyariyan jê re dibin. Cîhanek çi qas xirabe mamoste. Dema mirov pîr dibe her kes dibêje; “Yezdan kêmek ax bidê, li ser îmanê bila

bimire." Ev gotina dostane; "keda pîran nayê bîran." Çi cîhaneke xerîbe mamosteyê min. Diyariya pîran, ji derdorê wî mirinê jê re daxwaz dikin. Lê fermana Rêber Apo hat bîra min ku wisa dinirxîne; "Di tevgera ciwanên demokratîk de, pêngaveke ku di pêşengiya ciwanên wiha xwedî tecrûbe de were pêşxistin, di têkoşîna civaka demokratîk a giştî de garantiya serkeftinê ye. Şansê serkeftinê yê ji dinamîzma ciwanan bêpar bisînore. Tecrûbeya temendaran û dînamîzma ciwanan di her pêvajoya dîrokê de diyardeyeke ku xwe daye hîskirin. Di meşa kesên ku girêdana wan her duyan bi hev re çêdikin de, derfetên serkeftinê her dem bilindin. Jiyan tenê ji ciwantiya cahil û xoyrat pêknehatiye. Cîhaneke zarokan a xweser ku divê qet xiyanet lê neyê kririn, hertim rêz û hurmet jê re were nîşandan û pêdiviyên wê werin bicihanîn heye. Xiyaneta li vê cîhanê gelek tişt bi civakê dane windakirin. Ya temendaran jî, cîhaneke wan ya bi zanatî ku di tecrûbeya jiyanê de derbas bûye, heye. Civakek eger wane ji vê cîhanê wernegire, ne gengaze baş bifikire û bijî. Lewma zaroktî û kaltî cîhanê tine nakin, cîhanê dihilberînin û dewlemend dikin. Ev her du cîhan jî di şert û mercên civaka demokratîk de, li gorî asta cewhera wan, li ser bingehê azadî û mafên wê, ji nû ve were sazkirin û qezenckirin, wezîfeyeke jêneveger ya şaristaniya demokratik e. Şaristaniya demokratîk, di heman demê de serdemeke wihaye ku zarok û kal tê de bi hezkirin û hurmet tên bibîranîn û bi civakê re ev zîhniyet û helwesta exlaqî dibe yek."

Heval Heqî ez birim gel hevalan, min serdana hevalên xwe kir û şevekê li gel wan mam. Paşê hatim wergeha Ş. Rûstem Cûdî. Heval Cuma ez dabûm şiyar kirin û spas dikim ji bo şiyarkirina wî. Lê xemgînim û lêborîna xwe daxwaz dikim ku bûme sedemê êşandina birêz. Mesele hemû eve, şaş neyê fêmkirin, bersivdayin nîne.

Kêm be jî dixwazim qala xwendekarên wargeha Ş. Rûstem Cûdî bikim. Dibêjin zanist murşîde; raste, wateya zanistê rênîşankeriye. Eger zanist nebe cîhan nameşe. Ev xwendekarên vê wargehê û hemû zarokên Kurdan yên bi fereseta pîroz bawerî anîne, wê bibin pêşengên vê rêxistina pîroz ku afirînerên wê şehîd û Rêber Apo ye. Ew xwendekarên Kurd wê vê ala Kurdistanê hildin ser milên xwe, ew rastiyeke ku bibin layîqê şehîd û Rêber Apo. Ev ji wan tê xwastin. Nimûne; quran, nimêj, rojî di temenê biçûk de hatine ferzkirin. Mînak;

şitil di biçûkiya xwe de dibe şitil. Yanî evîna vê rêxistinê ya Rêber Apo dayî hûnandin, ger di temenê biçûk de were dayîn, wê zarokên Kurdan bi evîna şehîdan û Rêber Apo şîn bibin. Her weke dema ji bo çandina gulan ava jiyanê tê dayîn. Divê li kolanên wargeha Ş. Rûstem Cûdî xwendin bibe evîn. Li aliyê din, ez dibînim ku ref bi ref ji bo fêrbûna Quranê li melayan digerin. Bila şaş neyê nirxandin, ji ber ez ji her baweriyê re rêzdarim. Ez vê gotinê ne bi serê xwe dibêjim, belkî ev feraseta Rêber Apo ye. Lê ger zarokên Kurd pirtûkên Rêbertiyê nexwînin, wê çawa rêxistin û rastiya Rêbertiyê nasbikin. Wê di xeta jiyan û têkoşînê de zoriyan bikêşin. Di şoreşên olan de xwendina pirtûkên pêxemberan rêxistina wan li ser piyan hiştine û xwendina wan pirtûkan ew rêxistin heta roja îro dane meşandin. Mamosteyê min ê hêja, ger pirtûkên we nexwînim, rê û rêçikên we neşopînim, çiqas bêjim ji we hez dikim, vala ye. Lewra, ger mirov nexwîne, nede û nestîne, ne pêş dikeve ne jî çavên wî vedibe û weke mirovekê ji derdor qut danûstandinê bi kesê re nekî, ma wê çawa fêrî axaftin yan jî têgihandinê bibî? Lewma evîna bê axaftin nabe. Hz. Mihemed pêxembereke pir mezine. Di rojekê de pênc wext nimêj daye ferz kirin, di salalekê de mehekê rojî girtin daye ferz kirin. Di tevayî temenê mirovan de xwendina Quranê daye ferzkirin. Lewma Îslam bi wan nirxan û xwendinê hem nayê jibîrkirin hem jî tê berdewamkirin.

Ji bo zarokan ya yekem dibistana dayîkê tê, lê ya girîngtir hunerê Mamosteye. Ev şagirtên ku hunerê xwe ji mamoste digirin, weke şitlên ku tên çandin in. Şitilan avê dirêjin binê, ev jê re dibe ava jiyanê. Zanabûn, çand, exlaq, urf û edet û ferasat ji bo şagirtekê jiyanê diafirînin. Mamoste zanistê dide, ew zanist jî dibe jiyana şagirtan û li ser vî bîngehî jiyan dike. Zanista ku şagirt ji mamoste fêrbûyî, dibe hîmeke bingehîn ji bo wan û wê her xwe berdewam bikin. Eger wisa nebe, mirov dikare bêje wek daxwaza şehîdan û Rêber Apo zarokên Kurdan hatine perwerdekirin. Di bingeh de mamoste xebatkarên gelê xwe ne. Dixwazim vê rewşê bi vê mînakê ravebikim. Hozanek di derbarê Rêber Apo de dibêje; "hem hozane hem şervane û hem jî Rêbere." Keda mamosteyên wargehê nayê ji bîr kirin. Lê belê kêmasiyên wan yên divê bên derbaskirin jî hene.

**Ji Bo Rêhevalê Min Hecî Nûrî**

Demek dirêj beriya niha we têkildarî jiyana min, ji min nivîsek xwestibû. Bi rastî min nedixwest ez we bişkênim. Min dixwest ez zû binivîsim. Lê dema mijar jiyana mirov bi xwe be, nivîsandina wê ne hêsane. Bêguman mirov jiyana xwe hem hêsan dinivîse û hem jî bi zor. Dubendiyek wiha heye. Lê min her tim xwest ez ji we re vebêjim û daxwaza we dereng nehêlim. Ji ber vê yekê jî min çiqas hûn didîtin, min ji xwe şerm dikir. Herî dawiyê min biryara axaftinê da. Heval wê axaftina min werdigerînin Kurdî. Lê ezê çiqas bikaribim vebêjim û wê çiqas kêrî karê we bê, nizanim.

Ez di sala 1954'an de li navenda Sêwasê ji dayîk bûme. Wê demê malbata min li gund bû. Lê ji ber ku bavê diya min li Sêwasê dijiya, malbat tê Sêwasê û ez li vir têm cîhanê. Cardin malbat vedigere gund. Bawerim di sê saliya min de malbat cardin koçî Sêwasê dike. Bavê min li vir kar dibîne û dixebite. Karkeriyê dike. Pêşiyê di çêkirina rêya tirênê de dixebite. Pişt re jî li Sêwasê dayîreyek dewletê ya bi navê "komîsyona axê" heye, li wir weke hademe dest bi kar dike. Tê bîra min, bavê min di komîsyona axê de dixebitî.

Ez dixwazim gundê xwe jî bidim nasîn. Gundê me, gundê Karapinarê yê bi ser navçeya Guruna Sêwasê ye. Nîviya gund Kurd û nîvî jî Tirk bûn. Biqasî tê bîra min wiha bû. Gundek ku berê tenê Tirk lê dijiyan bû. Bapîrê min ji gundê Kurdan, ji bo karkerî û cotkirina zeviyên axayên Tirk hatiye vî gundî. Heta dawiya jiyana xwe jî li vî gundî dimîne. Li gundê me Kurd û Tirk bi hev re dijiyan. Em ji eşîra Sînemilî ne. Eşîra Sînemilî zêdetirîn li Elbistan û Pazarcixê hene. Pîçek be jî li çend gundên Gurunê hene. Nêzîkê gundê me gundek mezin yê Tirkan heye. Piraniya gundên din Kurd in.

Min li Sêwasê dest bi dibistana seretayî kir. Dibistan, bi navê Dibistana Seretayî ya Ziya Gokalp bû. Bavê min karker bû. Em ji malbatek xizan dihatin. Derdora me jî xizan bûn. Ji xwe li gund, tevahiya sewalên biçûk û mezin ên gundiyan ji hêla bavê min û mamên min vê dihatin çêrandin û şivanî dikirin. Çend zeviyên wan hebûn, lê qet berhemdar nebûn. Lê debara xwe dikirin. Heta ji ber ku zeviyan têrê nedikir, şivanî dikirin. Jixwe li gund sewal û zeviyên Tirkan zêde bûn. Piraniya Kurdan xizan bûn. Bapîrê min û bavê min kesên herî xizan ên

gund bûn. Jixwe bavê min jî, ji ber vê koçî Sêwasê kiribû û li wir kar peyda kiribû. Di ciwaniya xwe de jî, ji bo xebatê çûbû Edenê. Zêdetir ji bo hilkişandina kokan diçû Edenê. Bi karkerên nanozikî dixebitin re kar dikir.

Ji ber ez li gund mezin bibûm hînî Kurdî bibûm. Min qet Tirkî nedizanî. Piştî em hatin Sêwasê jî, di salên pêşiyê de min qet Tirkî nediaxivî. Piştî mezin bûnê, ez ketim nav zarokan û hînî Tirkî bûm. Pişt re di nav malbatê de jî û ji der ve jî êdî ez Kurdî neaxivîm. Dema min dest bi dibistana seretayî kir êdî min Kurdî neaxivî. Ji ber ku me li dibistanên Tirkan dixwend, dibistanan bi gotina; “Ez Tirkim, rastim û serkeftî me” dest pê dikir. Nîşanî me didin ku em Tirk in. Li mal jî axaftina, ‘em Tirk in yan jî Kurd in’ qet nedihat kirin. Dema em diçûn gund, ji ber ku şêniya gund tevlihev bû, Kurdbûna me dihat bîra me. Nas û xizmên me Kurdî daxivîn. Li gundên cîran metên min hebûn. Em diçûn gundên wan, kesê Tirkî nedizanî. Cardin li gund hin xizmên me hebûn, jinên pîr qet Tirkî nedizanîn. Her çiqas li dibistanê hînî me dikirin ku em Tirkin û li malê qet ji me re nedigotin ku em Kurdin jî, me dizanî ku em Kurd in. Jixwe dema em diçûn gund, ji Tirkan re digotin Tirk û ji me re jî digotin Kurd. Lê piştî ez mezin bûm, gotina; ‘Em di eslê xwe de Tirkin û ji Xorasanê hatine’ min dibihîst. Li aliyê din, li Sêwasê du metên min hebûn. Ew jî bi Elewiyên Tirk re zewicîbûn. Ji ber bandora vê yekê jî me gotina, “Em Tirk in û ji Xorosanê hatine” zêdetir dibihîst. Lê ev gotin her tim ji min re weke nakokiyekê dihat.

Bûyerek min di zarokatiya xwe de jiyayî, bandorek mezin li ser min kir. Bapirê min ji heftê saliyê borî bû, lê birin leşkeriyê. Tirkên li gund bi boneya bapîrê min leşkerî nekiriye, giliya wî kiribûn. Bi vî awayî biribûn leşkeriyê. Yên ne şandine leşkeriyê jî cardin ew bi xwe bûn. Ji ber ku bapîrê min ji wan re cotkarî dikir, nexwestibûn ku bapîrê min biçe leşkeriyê. Ji ber ku xizmeta wan dikir. Lê bi demê re bapîrê min êdî zeviyên xwe cot kirine, sewalên xwe xwedî kirine û kêm zêde xwe îdare kiriye. Ji ber ku bi vî awayî ji bin bandora wan xilas bûye, begên Tirkan giliyê bapîrê min kirine. Ez wê demê hêj zarok bûm û min hêj dest bi dibistanê nekiribû. Hema tê bîra min. Bapîrê min jixwe tu carî rihên xwe neditiraşî. Ji bo ku li leşkeriyê rihên wî leşker nebirin bi Pîrekê rihên xwe dabûn tiraşkirin. Digot; “bila ew rihên min netiraşin.” Bi vî awayî çû leşkeriyê. Leşkerî li Sêwasê kir. Gelek caran dihat malê. Jê re digotin;

"here mala kurê xwe." Sê mehên dawiyê leşkerî li Erziromê kir. Lê çek nedanê û kar pê nedidan kirin. Yanî gotin; "kale" û leşkerî bi wî awayî pê dan kirin. Talîm û tiştên din pê nedane kirin. Ev bûyer weke tiravmayekê ji min re hat û min qet ji bîr nekir. Pişt re dema ez carna diçûm gund, bapîrê min wiha digot: "Ev Tirk hene ev Tirk, di heftê saliyê de leşkerî bi min dan kirin." Vê yekê hêj di zarokatiya min de li hemberî wan hêrs û bertekek afirandibû. Bûyerek herî zêde li ser kesayet û zarokatiya min bandorkirî, ev bû.

Min dibistana seretayî li Sêwasê qedand. Cardin min li Sêwasê dest bi dibistana navîn kir. Ji ber ku ez zarokê malbatek xizan bûm, min digot; "ezê biçim dibistana hunerê, hunerekê hîn bibim û jiyana xwe xilas bikim." Xalê min jî Dibistana Hunerê ya Sêwasê xwendibû û pişt re jî çûbû dibistana bilind a teknîkê. Diyare xwestibûn ku ez jî biçim dibistana hunerê û di demek kin de bibim xwedî kar.

Bavê min di dayîreya komîsyona axê de dixebitî. Rêveber û hemû karmendên wir xwedî hişmendiya dewletî bûn. Ji ber ku dayîreyên dewletê diparastin. Cardin Kemalîzm di dayîreyên dewletê de bi bandortir bû. Ji ber van sedeman weke beşek mezin ya Elewiyan, bavê min jî digot; "Ataturk mirovek başe, rewşenbîre û hemdeme." Xwedî nêrînek wiha bû. Bêguman em malbatek xizan bûn. Bi mehaneyek gelek kêm dixebitî. Hademe bû, ango karê paqijiyê dikir. Havînan jî bi boneya dabeşkirin û reforma axê diçû gundan û pîvan dikir. Bi karên wiha re eleqedar dibû. Pişt re pêşiya çûyîna karkeran a Elmanyayê vebû. Bi taybet ji Sêwas û derdora wê, Meletî, Dêrsim û Erzincanê gelek kes weke karker çûn Elmanyayê. Bavê min jî di sala 1962'an de weke karker çû Elmanyayê. Dema min dibistana navîn dixwend, bavê min li Elmanyayê bû.

Ez dixwazim faktorek din a ku bûye wesîleya Apocîtiya min û tevlêbûna min a nava Tevgera Azadiyê bînim ziman. Hevserê meta min Tirk bû, tiyê meta min li derdora Berwarî-Şîrwana Sêrtê serbazî (çawiş) dikir. Pêşiyê serbaz bû û pişt re bû serpêl (çawişê pispor). Piraniya serpêlan jî li Kurdistanê wezîfedar dikirin. Em pişt re vê yekê hîn bûn. Ev kes çi cara dihat hewayek wisa dida xwe, te digot qey generale. Digot; "em li Sêrtê ne, em mûçeyê xwe qet xerc nakin, gundî ji me re mirîşkan tînin, pere ji me re tînin, ji bo karê wan çêbibe her tiştî tînin û bi vê boneyê pereyê me qet naçe." Yanî parastina gel a li wê herêmê vedigot.

Mêtingerî tanî ziman. Li aliyê din, di derbarê Kurdan de tiştên xirab digotin. Lê herî dawiyê ev jî digot: “Ev Kurd dê di dawiyê de jî di bin ala Tirkan de nemînin.” Ev gotina wî pir bala min dikişand. Li dibistana navîn van gotinan jî di hişê min de cihek mezin girt.

Li nêzikî gundê me gundên Camîlîyurt û Deveçiyir hebûn. Ev, gundên xizmên me bûn. Ez diçûm van gundan, xizmên me yên pîr û kal, bav û bapîrên me Tirkî nedizanîn. Gelek jî ji min hez dikirin. Ji ber ku em ji bajêr diçûn, gelek bi me re eleqedar dibûn. Lê wan Tirkî nedizanî û min jî Kurdî nedizanî. Me ji hev fêm nedikir. Lê min hezkirina wan a germ hîs dikir. Fêmnekirina wan, neaxaftina bi wan re di dilê min de dibû kul û nakokiyek mezin. Vê bûyerê jî bandorek mezin li ser jiyana min a pişt re kir û di tevlîbûna min a Tevgera Azadiya Kurd de bandorek mezin kir.

Bêguman di çepgirbûyîna min de jî bandora van heye. Malbata min û xizmên min xizan bûn, mamê min hemalî dikir, zarokên mamê bavê min xizan bûn. Vê yekê bandorek mezin li ser min dikir. Kurek mamê bavê min bi şelê pînekirî diçû dibistanê. Zarok bû, ji bavê xwe dixwest ku şalekê jê re bikire. Lê bavê wî xizan bû, toqatek li kurê xwe xist û got; “pere tineye, ezê ji ku peyda bikim.” Çend sal ji min biçûktir bû. Hingê ez li dibistana navîn û ew li ya seretayî bû. Li ser vê yekê întihar kir. Vê yekê bandorek mezin li jiyana min kir.

Min dibistana navîn qedand û ez derbasî amadeyiyê bûm. Min amadeyî li Sêwasê xwend, lê ez di refê de mam. Min li Stenbolê refa yekemîn ya amadeyî li Amadeyiya Maltepeyê xwend. Refa duyemîn û sêyemîn li Amadeyiya Haydarpaşayê xwend. Ji ber ku bavê min û diya min çûbûn Elmanyayê, ez jî çûm cem bapîrê xwe yê li Stenbolê. Li cem bapîr û xalê xwe min refa yekemîn xwend. Refa duyemîn û sêyemîn jî min li Amadeyiya Haydarpaşayê xwend. Di sala 1972’an de min amadeyî qedand.

Li amadeyiyê eleqeya min ji tevgera şoreşger- sosyalîst re hebû û min ew di şopandin. Min ji nêz ve Denîz Gezmîş dişopand. Min nûçeyên di derbarê wî de dixwendin. Dema min li Maltepeyê dixwend, mala Mahîr Çayan û Huseyîn Cevahîr hatibû dorpêçkirin. Pişt re Huseyîn Cevahîr li wir hat qetilkirin, Mahîr Çayan birîndar bû. Roja ew hatin dorpêçkirin, ez li Amadeyiya Heyderpaşayê bûm. Nexweşxaneya Heyderpaşayê li beramberî dibistana me bû. Ji ber dengê sîrenên

ambûlansan em jî çûbûn nexweşxaneyê. Jixwe di navbera me de riyek hebû. Ji ber ku li gel ambûlansan wesayîtên leşkerî jî hatin, mereqa me zêdetir bû. Dema em çûn nava nexweşxaneyê, ji ambûlansê peya kirin. Ji me re gotin; “ev anarşîstin û talûkene” û em dûr xistin. Mahîr Çayan û Huseyîn Cevahîr hingê anîbûn nexweşxaneyê. Huseyîn Cevahîr di rê de şehît ketibû. Mahîr Çayan jî birîndar bibû. Ez bi çavên xwe bûm şahidê vê bûyerê. Dema birîndar anîn nexweşxaneyê, min ew dîtin. Di çepgirbûna min de bandora vê yekê jî heye.

Faktorek din a li ser min bandor kirî ku ez bibim şoreşger ev e. Dema ez ji Sêwasê hatim Stenbolê, min dewlemendiya Stenbolê dît. Ferqek mezin di navberê de hebû. Sêwas xizan bû. Vê yekê li hemberî dewlemendan û wê derdorê bertekek li gel min çêkir. Tê bîra min, ez bi hevaleke xwe re çûbûm qiraxa gerdena Boxazîçiyê. Min li wir dewlemendî, vîla, jiyana luks û gelek tiştên sosret dîtin û ji ber van serê min ziviri. Li aliyekê xizaniya me û li aliyê din dewlemendiya wan. Piştre min ji nêrîna çepgir a li dijî dewlemendiyê hezkir. Heta li amadeyiyê li gel min dijminiya tiştên sembola dewlemendiyê pêş ket. Min wesayît xêz dikirin û camên wan dişkandin. Piştre min zanî ku çepgirî li gel gelek ciwanan wiha pêş dikeve. Bi taybetî di filmê “Arkadaş” yê Yilmaz Guney de ev bibû mijara senaryoya filmê jî.

Li amadeyiyê sempatiya min ji çepê re hebû. Ez çûm zanîngehê, li wir bandora çepgiriyê zêdetir bû. Ez li zanîngehê weke sempatîzaneke THKO’yê bûm. Eleqeya min li hemberî THKO’yê hebû. Bi hinek qadroyên THKO’yê re têkiliya min hebû. Ez birim mala hinek rêveberên THKO’yê. Heta, 1974’an îhtîmala çûyîna min a Filistînê jî hebû. Dihat gotin ku hinek THKO’yiyan dişînin Filistînê. Dixwestin min jî bişînin û min jî pejirandibû. Wê demê hinek qadroyên THKO’yê dema ji Filistînê dihatin Tirkiyê, hatibûn girtin. Ji ber vê yekê min nekarî ez biçim Filistînê. Ku ew girtin nebûna, daxwaza min a çûyînê hebû. Ku ez biçûma Filistînê û bihatama, bawerim êdî îhtîmala ku ez bibim Apocî tine bû. Dibû ku ez di nava wê tevgerê de bimabûma û li wir têbikoşiyam. Ev jî îhtîmalek wiha bû.

Ez di sala 1974’an de çûm Elmanyayê. Malbata min li wir bû. Bavê min, diya min, malbata min tev li Elmanyayê bûn. Ez çar mehan li wir mam. Ez li wir jî bi THKO’yiyan re ketim têkiliyê. Ez diçûm komelayên wan û dihatim. Weke sempatîzanek çepgir, têkiliya min bi wan re hebû.

Piştî çend mehan ez bûm Apocî. Hevalên min ên Dêrsimî hebûn. Bi hevalê Fûat re nasîbûna me hebû. Hevalên Dêrsimî behsa pirsgirêka Kurd û rewşa Kurdistanê dikirin. Behsa têkoşînek cuda û rêxistinek cuda dikirin. Digotin ku Kurdistan mêtingehe. Min ev rast didîtin. Lê min bi xwe re nedidît ku tevlî koma Apocî bibim. Çend mehan hevalan ji min re gotin; "Serokatî gazî te dike û dixwaze bi te re biaxive." Hevalên li derdora min rewşa min ji Serokatiyê re gotibûn. Serokatiyê jî gotibû, "bila bê em baxivin." Ez neçûm du sê randewiyan. Min nêzikî du mehan heval mijûlkirin. Pişt re hevalan ez birim cem Serokatî. Min nexwest ez biçim û min got; "ezê paşê bêm." Lê wan gotin; "na, were baxive û çi dixwazî bêje." Ji ber ku hevalan israr kirin, min jî ew neşikandin û ez çûm.

Serokatî li malek li Aşagi Ayranciyê ya li Enqereyê bi min re axivî. Zêde neaxivî. Pênc, deh deqeyan axivî û rewş ji min re vegot. Jixwe min nêrînên wî rast didîtin. Serokatiyê ji min re got; "Jixwe tu nêrînên me di cih de dibîni, tu jî ciwanek Kurdî, helwesta te çiye?" Di dawiyê de min got; "temam, ezê bi we re tevbigerim. Ez nêrînên we rast dibînim." Bi vî awayî ez di zivistana 1974/1975'an de (nayê bîra min kîjan meh bû, dibe ku dawiya 1974'an, an jî meha destpêkê ya 1975'an be) tevlî tevgera Apocî bûm.

Min li Fakulteya Zanistên Siyasî dixwend. Dema ez tevlî koma Apocî bûm, li refa duyemîn bûm. Ez êdî di nava têkiliyên koma Apoyî de bûm. Jixwe piştî tevlîbûna komê, dîsîplîn û têkiliyeke komê çêbû. Pîvan û rêgezên rêxistinî çêdibûn. Ango jiyan diguherî. Êdî weke berê nedihat jiyîn. Jixwe cudahiya bingehîn a koma Apoyî ji ya komên din ev bû. Piştî tevlîbûna koma Apoyî êdî dibistan, malbat, xiyalên pêşerojê yên kesî hemû li aliyekê dimînin. Tevahî armanc, meşandina têkoşina şoreşê ye. Jiyan, şêwaz, uslûb, helwest û seknek bi dîsîplîn a jiyanê derdiket holê. Jixwe heta du mehan ez difikirîm ka ezê çawa tempoya vê jiyanê bicih bînim. Ji ber vê, min tam biryar nedida. Gumanên min hebûn. Piştî ez tevlî komê bûm, ev gumanên min bi dawî bûn û ez bûm endamek yê komê. Pişt re jî jiyan, xebat û şêwazek li gorî pêwistiyên komê derket holê.

Êdî mîna berê em nediçûn dibistanê. Zêdetir me propagandaya xebatên rêxistinê dikir. Em tevlî çalakiyên rêxistinê dixwestin dibûn. Em tevlî civînên rêxistinî dibûn. Di civîna Dîkmenê (Ez ne şaşbim di meha

sibatê de bû) ya sala 1976'an de biryara vegera welat hatibû dayîn. Di vê çarçoveyê de heval yek yek, du du vedigeriyan welat. Ez jî di havîna 1976'an de, bi Şehîd Yasîn (Dogan Kiliçkaya) re, bi armanca xebatan çûm Dîlokê. Êdî me dest ji dibistanê berdabû. Bi tevahî ji bo Têkoşîna Azadiya Gelê Kurdistanê me dest bi xebatên şoreşgerî kiribû. Ev bû werçerxek nû ya jiyana min. Pişt re hemû têkiliyên me yên bi dibistanê re qut bûn. Heta bi malbatê re jî têkiliyên me qut bûn. Berê me name dişandin û name digirtin û ji ber ku ez xwendekar bûm pere dişandin. Lê ji sala 1976'an û şûn de hemû têkiliyên me qut bûn.

Dema ji bo xebatên şelandinê ez di sala 1977'an de çûm Stenbolê, min bihîst ku bavê min wê ji Ewrûpa vegere. Di payîz an jî zivistana 1977'an de bavê min ji Ewrûpa vegeriya. Ez jî çûm dîtina wî. Em axivîn. Min jê pirsî ka ji bo çi hatiye. Got ku; "ji bo te hatime." Fikirîbûn ku dema vegerin, wê min bigirin cem xwe, di kontrolê de bigirin û bi vî awayî ezê ji têkoşîna şoreşgerî veqetim. Ji bo vê ji Ewrûpa vegeriyabûn. Piştî demekê ez cardin bi bavê xwe re axivîm. Min ji bavê xwe re wiha got; "min biryara xwe daye. Êdî ez di nava têkoşînekê de me. Ezê têkoşîna azadiya gelê Kurdistanê bidim. Ezê di nava vê de bim. Li cîhanê hemû gel bi ziman û çanda xwe, bi nasnameya xwe, bi awayek birûmet dijîn. Lê rewşa gelê Kurd li holê ye. Wijdana min vê yekê qebûl nake. Ne pêkane ku ez vê têkoşînê berdim. Ev dê ji bo min bibe bêwijdaniyek û êdî jiyanek wiha ji bo min nepêkane." Gotinên wiha bûn. Piştî min helwest û armanca xwe bi zelalî got, êdî bavê min jî fêmkir ku nikare min ji têkoşînê vegerîne. Zêde deng dernexist. Bawerim hêvî dikir ku ezê rojekê vegerim. Tu caran tiştên neyînî yên hişk nekirin. Bi vî awayî têkiliyên min yên bi malbatê re jî diketin pêvajoyeke nû.

Min piraniya salên 1977, 78 û 79'an li navçeya Nizîpa Dîlokê derbas kir. Carna em diçûn hinek gundên Rihayê û dihatin. Ez cara pêşî di sala 1976'an de çûm Kurdistanê. Di sala 1977'an de, ji bo ku ji rexistinê re pere peyda bikim hatim peywirdarkirin. Li Stenbolê çend mehan min hinek şelandin kirin û cardin vegeriyam welat. Di dawiya sala 1978'an de ji bo ji rexistinê re pere bibînim cardin çûm Stenbolê. Piştî min çend şelandin kirin, di bihara 1979'an de ji Stenbolê vegeriyam. Di havîna 1979'an de ez demekê li Dîlokê mam. Demeke kin derbasî Rihayê bûm û pişt re ez şandim Amedê. Beriya çalakiya li Siwerekê ku li hemberi Celal Bucak pek hatibû, ez çûbûm Amedê. Ez li Amedê di Komîteya Partiyê ya

Amedê de mam. Ez berpirsyarê leşkerî yê Komîteya Partiyê ya Amedê bûm.

Di 1'ê Îlona 1979'an de, dema me nexweşxaneyek sewalan a li Amedê dişeland, em hatin girtin. Bi rastî piştî şelandinê em derketin der ve, em rastî hinek polîsên mehane tanîn ên cuda hatin. Derdora me dorpêçkirin û em bi vî awayî hatin girtin. Em 15 rojan di bin çavan de man. Pêşiyê em anîn Girtîgeha Îstîkam a Leşkerî. Em sê çar mehan li wir man. Piştî fîrara bê encam a heval Mazlûm, ez şandim Girtîgeha Hejmara Yek a Amedê. Heval Mazlûm beriya min hatibû sirgûnkirin. Heval Mazlûm hebû û pişt re heval Xeyrî jî hat girtin. Ew jî anîn girtîgeha leşkerî. Jixwe, ji dawiya sala 1979'an û pê ve, di tevahiya sala 1980'yan de, hêj darbeya 12'ê Îlonê pêknehatî heroj li qadên tevgera Apoyî lê heyî, cihên PKK lê bi cih bûyî bênavber operasyonên leşkerî dimeşandin. Bi taybet li qada Rihayê qadro û alîgirên PKK'ê dihatin girtin.

Di girtîgehê de jî ez tevlî xebatên rêxistinî bûm. Min her tim berpirsyarî digirt. Di dema derbeya 12'ê Îlonê de, ez li hejmara pêncemîn, an jî duyemîn a Tîpa E de, di kowuşa 22'emîn de bûm. Ev, kowuşek zêdetir kesên kal û welatparêz lê diman bû. Ji bo ez pê re eleqedar bibim, heval Mazlûm û Xeyrî kesên kal dişandin cem min. Cardin kalên ku divê di bin kontrolê de bên girtin dişandin cem min. Lê di nava kowuşan de ya me her tim a herî kêm bipirsgirêk bû. Kowuşek rihê têkoşîn û girêdayînê lê bilind bû. Jixwe piştî 12'ê Îlonê kowuşa yekemîn car car rastî êrîşê hatî bû. Di greva 15 rojan a di Çileya 1981'an de kowuş bi tevahî beşdarî girevê bûn û li gel hemû zordariyan heta dawiyê birin. Bi vê boneye hemû avêtin hucreyan. Li kowuşên din niviya kowuşan an jî ji sêyan du beş tavêtin hucreyan. Dihilbijartin, lê tevahiya kowuşa me dibirin kowuşa 35'an. Em li vir bi kalan re eleqedar dibûn, bi ciwanan re eleqedar dibûn û me hewil dida ku em hestên wan ên têkoşînê pêşbixin. Piştî 12'ê Îlonê jî me her tim hewilda ku em rihê têkoşînê yê hevalan pêşbixin. Em birin kowuşa 35'an û cardin jî em venegerandin kowuşan, heta ku em ji girtîgeha Amedê veqetiyan. Ji meha Sibat, Adar û Nîsanê ya sala 1988'an heta ez hatim sirgûnkirin ez li kowuşa 35'an a Girtîgeha Tîpa E ya Amedê mam. Em li kowuşa 35'an li gel heval Kemal, Xeyrî, Mazlûm, Mûzaffer û Celalettîn diman. Ez di hucreyek yek kesî de dimam. Di navbera salên 1981, 82, 83 û 84'an de, ji bilî çend mehan her tim ez di hucreyek yek kesî de mam. Di

berxwedan û grevên piştî 12'ê Îlonê yên li Zindana Amedê pêkhatin û di rojiya mirinê de min cih girt. Piştî şehadeta Mazlûm, Xeyrî û Kemal, min berpirsyariya girtîgehê girt. Ji bo rihê şoreşgerî yê hevalan bê parastin û li dijî dijmin têkoşîn bê meşandin û helwest li hemberî dijmin bê girtin min hewil dida. Bêguman piştî şehadeta hevalan, di dema berpirsyariya min de gelek nebesî û kêmasiyên min çêbûn. Bi sedema li zindanê berxwedan têrê dike, di aliyê pêşxistina kesayetê, bi rêya rexne û rexnedayînê ji holê rakirina kêmasiyên kesî de qelsiyên me çêbûn. Di encama derketî de, xuyaye ku di aliyê guherandina kesayetê de nebesî çêbûne.

Di sala 1988'an de ez sirgûnê Rihayê hatim kirim. Heta dawiya salê em li girtîgeha Rihayê man. Pişt re em sirgûnê girtîgeha Ceyhanê hatin kirin. Piştî du salan li girtîgeha Ceyhanê mam, ez di sala 1991'an de sirgûnê Girtîgeha Bursayê hatim kirin. Sedema sirgûna min a girtîgeha Bursayê, hewildana me ya firarê ya di sala 1990'an de li Ceyhanê pêkhatî bû. Bi rastî me bi rehetî dikarî birevin, lê di hinek aliyan de me baldarî nekir. Ji ber ku me baş plansazî nekir, dema em ji deriyê derve derketin, em hatin girtin. Ji ber vê ez hatim sirgûnkirin.

Hewildanek me ya revînê jî li Zindana Amedê çêbû. Me tunelek herî mezin a dîrokî û girîng li wir kola. Tunelê li qada çaran dest pê dikir. Bi tu awayî nedihat ferqkirin. Lê mixabin ev jî bê encam ma. Cara pêşî ji ber ku derketina tunelê rastî lambeyên girtîgehê dihat, me nekarî em derkevin. Ji ber vê me tunel dirêj kir. Vê carê jî, ji ber baranê tunel herifî. Pişt re ferqkirin û lêgeriyan, bes peyda nekirin. Ji ber vê, em sirgûnê Rihayê kirin. Li Rihayê jî hewildana me ya tunelê çêbû. Ew jî dîtin. Hewildanên me yên revînê her tim çêbûn, lê serkeftî nebûn.

Demeke kin li Girtîgeha Bursayê mam û pişt re ez sirgûnê Eskîşehîrê kirim. Em xistin hucreyên weke tabûtê tên nasîn. Em li wir bi giştî ketin greva birçîbûnê. Piştî rojiya mirinê ya mehekê domkir, cardin em vegerandin cihên em jê hatin û ez birim girtîgeha Bursayê.

Di 12'ê Îlona 1992'an de, piştî ez 13 sal û nîv girtî mam, hatim berdan. Me sezayê darvekirinê girtibû. Lê seza vegerandibûn muebetê. Jixwe bi giştî 15 sal dihat razan. Dema mayîna me li ber çavan girtin û sal û nîvekê em zû berdan. Ez û sê hevalên din bi vî awayî hatin berdan.

Piştî hatim berdan, ez bîst rojan li Tirkiyê mam. Ji van bîst rojan, ez sê rojan li Stenbolê li cem malbata xwe mam. Pişt re ez derbasî Enqerê

bûm. Hingê kongreya DEP’ê hebû. Min Mûsa Anter û diya Serokatiyê dayê Uveyş jî li wir dîtin. Li cem hev rûdiniştin. Min destê dayê Uveyş ramûsî. Piştî suhbetek kin a bi Mûsa Anter û dayê Uveyş re, ez veqetiyam. Jixwe du roj piştî hevdîtina me Mûsa Anter çû Amedê û li wir hat şehîdxistin. Ji bo nasnameyê jî ez du rojan çûm gund û li wir mam. Piştî bîst rojan, ez derbasî Pirsûsê bûm û ji wir jî derbasî Kobanê ango Rojava bûm. Di dema derbasbûna me de pevçûn derket. Quryeyê me û hevalek li gel me derketî birîndar bûn. Lê hevalan ewlekarî girtibûn. Ji ber vê yekê hevalan bi çekên girantir bersiv dan. Di encama bersivdayîna bi bandor a hevalan de, bêyî ku em windahî bidin, bi birîndarbûna du hevalan em derbasî Kobanê bûn.

Em şevekê li Kobanê man û pişt re derbasî Helebê bûn. Serokatî li Helebê bi xurûşek mezin li benda me bû. Du rojan li benda me rawesta bû. Ez çûm Helebê. Serokatî ez li ber derî pêşwazîkirim. Heftiyêkê ez li Helebê bi Serokatî re mam. Ez pişt re çûm Şamê. Sê meh û nîvan ez bi Serokatî re, di mala weke qata dehan tê zanîn de mam. Pêşiyê xwest min bişîne welat, lê pişt re ez şandim Ewrûpa. Di 20-25’ê Razbera 1994’an de ez vegeriyam Şamê. Li vir ez hefteyekê li cem Serok Apo mam. Serokatî ez û heval Ebas bi armanca amadekarî û pêkanîna Kongreya 5’emîn şandin welat. Ez bi coşek mezin çûm welat û tevlî Kongreya 5’emîn bûm.

Piştî 15 salan hevdîtina min a bi Serokatiyê re pir bicoş bû. Tevlîbûna min a Kongreya 5’emîn heman coşa mezin da min. Ji ber ku ez bi rêhevalên xwe yên bi salan min xiyal kirî ku ez bibînim re, bi gêrîla re û fermandarên gêrîla re hatim gel hev. Piştî kongreyê ez li Metîna hatim erkdarkirin. Pêşiyê ez bi heval Cuma re mam û pişt re çûm Zapê cem heval Ebas. Ez li Metîna mam û heval Cuma çû Îranê. Di sala 1996’an de Serokatiyê ez li Îranê erkdar kirim. Ez sal û nîvekê li Îranê mam û vegeriyam qadên Xakurkê û Xinêrê. Li qadên çiya ez zêdetir tevlî xebatên perwerdehî û rêxistinî bûm.

Di sala 2001’an de ez sal û nîvekê li Rojava û Mexmûrê mam. Di sala 2002’an de cardin vegeriyam welat. Ji wê demê heta niha ez di xebatên weke Zanist û Ronakbîrî, Çapemenî, Qada Navendî ya Îdeolojîk de dixebitim. Di dema têkoşîna çiya de min endamtiya Komîteya Navendî ya PKK’ê, endamtiya Konseya Serokatiyê, endamtiya Konseya Rêveberiyê kiriye. Min di rêveberiyan de berpirsyarî girtine. Lê ev

rêvebertiya me ji hêla Serokatiyê ve bi awayek cidî tê rexnekirin. Jixwe me nekarî em pêşiya tasfiykariyê bigirin. Di nava tevgerê de hinek dubendî çêbûn. Bêguman revîna hinekan ji bo rêxistinê baş bû. Di rêxistinê de paqijbûnek çêbû. Lê gelek kesên di bin bandora tasfiyekariyê de mabûn û veqetiyan jî hene. Ji ber vê, rêxisitinê ziyan dît. Me jî ev ziyan asteng nekir.

Serokatî ji bo em têkoşînê bigihînin encamê, me rexne dike. Di tevahiya têkoşînê de me hewilda em girêdayî şehîdan û Serok Apo bibin. Ji niha û pê ve jî emê li ser bingeha girêdayîna Serok Apo û şehîdan têbikoşin. Emê hewil bidin şayanê serokatî, şehîdan û bedelên hatin dayîn bibin. Ev partî, partiya Rêbertiyê ye. Partiya şehîdan e. Bi bedelên mezin û fedakariyên wan ên mezin li ser piyan dimîne. Tişta ji me tevan re dimîne jî şayanbûna Serok Apo û şehîdan e.

Heval Haci Nûrî, min ev tişt anîn ziman. Wê çiqas bersiv bide pêwistiyên te, nizanim. Bêguman kiteyên jiyana me hene. Keyfxweşiyên me yên mezin û êşên me yên mezin hene. Min dikarî ez zêdetir vebêjim. Lê ez dixwazim vê bêjim; heval Kemal Pîr, Mehmet Xeyrî Durmûş, Akîf Yilmaz û Elî Çiçek li ber çavên min şehîd ketin. Şayanbûna bi wan wê wezîfeya me ya bingehîn be. Jiyana me êdî jiyana wan e. Emê hewil bidin şayanê wan bin. Jixwe dema ez hatim cem Serok Apo ji min re wiha got: “Wan ji hevalan re baş vebêje, bila rêheval wan baş nasbikin, kar, xebat û wezîfeya herî mezin ew e.” Ji niha û pê ve jî ezê wan ji hevalan re vebêjim. Emê hewil bidin têkoşîna van rêhevalên şehîd ketine bînin ziman û girêdana xwe ya bi wan re bidin meşandin. Ezê hewil bidim bibim şayanê wan. Emê sekin, kesayet û giyanê wan yê şoreşger tevlî têkoşîna xwe bikin û têkoşîna wan a mezin di nava vê têkoşîna mezin a partiyê de bidin jiyankirin. Soza herî dawiyê ez bidim jî wê ev be. Min xwest ez van jî bînim ziman.

Weke dawî, ez di xebatên te de serkeftinê dixwazim. Ji ber ku min gelek dereng bersîv da û ji te re nebûm bersiv, lêborîna xwe dixwazim.

**Mustafa Karasu**

## Bavê Min

Her xeteke kûr ku li ser rûyê te mîna Firat û Dîcleyê xemên welatê min, xemgînî, keyfxweşî û stranên xwe ji nava dilê dîroka kevnar, dilê rêhevalên min bi hezkirina xwe ve li Amed, Hewlêr, Efrîn û Kobanê lê dide. Pîrê min, mamosteyê min, dost û bavê min… Ez van rojên xwe gelek caran dema te difikirim dibînim. Hestên min, bêrîkirinên min, tiştên hatine jiyankirin, yên nehatine jiyankirin û yên bêne jiyankirin… Pişt re ez bi te tijî dibim û serde dirijim. Di hişê min de, di çavên min de, di dengê min de bêhna axê ku pir jê hezdikim, weke ku vala bibe li ser re diçe. Dengê te weke demên derbasbûyî mala min tejî dike û hema pişt re bêhna Kurdî ji me tê… Bêrîkirinê, serê xwe girtiye û diçe. Ez destê te digirim, dîsa bi xewnên 12 saliya xwe ve dikevim rê. Em dikevin kolana xwe, tenê di destê te de ew pakêta piskewîtan, gofret û ava fêkî ku di xewna min de bû, hene. Weke her carê, hemû zarokên kolana me, çakêtê te ji her milekê ve girtine û ez ku gavekê ji te wê de me, bi zindî li pêş çavên mine... Piştî bêhneke din, di bin somya mala me ya hêsin de, di wî torbeyî de ku xewnên min dixemilînin, ez dîsa dibim şahidê wê ku tê de ji min re tiştek nemaye. Xembariyeke ecêp, ew qas jî gurûreke ecêp heye li ser rûyê min, ya din jî keneke zarokî... Ez dibêjim bavê min ew qas mezine, ew qas bihezkirinê tijiye ku tenê ne ji min re, têra hemû zarokên kolanê, heta têra zarokên bajarê me hemûyan jî dike. Ez ji xwe re dibêjim; dikare keyfxweş bike û dil şad bike. Dikene û pişt re gelek bi gurûr dibim.

Em tên bîra min, wek şelîtek ya filmê diherike li pêş çavên min hemû biranînên me. Mina îroya di demên kevin de, ew sibeh tê bîra min. Wisa ku min kevçiyê xwe da bin sêniya dimsê, hema mîna te. Reşo, Şakiro, Zahiro, Karapetê Xaço dema li pey hev kilaman dibêjin, dengê min bi dengê te re hevaltiyê dike. Ji milekê ve te hewil dida ku kevçikê tijî dims bixî nava devê min, Serhet û Berfîn, ji milê din ve jî dayîka min. Hatiye çêkirin, an jî hemû xweşikbûnên di demê xwe de mane, di nava keziyên pora xwe de dihûne dayîka min. Di turikê xwe de her tim tişteke girêdayî me vedişêre. Unlikên me yên Xanim Siltan dema bişkukên yaxa lê dide, eywana mala me ya biçûk, bi dengê Reşo yê ji teyîbê tê, vedijî dibo… Te dît dema dengê te bi yê Şakiro re dibû yek. Bêhna Kurdiyek

bilind jê dihat. Destên dayika min direcifîn dema dengê te bi dengê degbêj re hevaltî dikir.

Esmer eman eman eman
Dîlber eman, delalê yeman
Çi kulîlka dora çeman
Xelk zewicîn ez û tu man

Çiqas ciwan direcifîn tiliyên dayîka min, weke ku ji têlên tembûra bi heyranokan re hevaltiyê bikin. Deng ji dengê te, mala me ji hebûna me tejî dikir û wek rojê dibiriqîn çavên te yên temaşe dikirin. Dilê me yê ji te pir, xwe valayî dilê me dikir, paşê heta dawiyê bêhna Kurdî ji me dihat... Paşê em mezinbûn, her ku em mezin bûn, dengê me bi te tejî bû, rêya me û fikrê me… Em niha bi te re di tama şerbetê de bi kevçî dikin dimsê û Kurdiya te ya ku hundirê me germ dike. Em bi te dibihîsin dengê vebûna radyoyê û piştre kilamên Şakiro, Reşo, Evdalê Zeynikê gava xwe tavêjin eywana me. Hûn bi hev re rûdinin li ser eywana me, li ber siha dara gozê. Dengê we tevlî dengê hev dibin. Bi hev re bi gavên hêdî vedigerin li ber notayên kilaman, di navbera xetan de. Paşê ji çiyayên welatê min çîçeka nêrgizê bêhna xwe digerîne di nava dehlên me de. Dema ku qurtan li çaya şîlanê didî, me bi Kurdiya xwe ve pir bi şidahî himbêz dikî. Ji beriya ku li ber dengê lorikan bikevin suhbetê, bi Kurdî, weke ku çiyayên bilind derbas kiribe û hatibe, jixwe bi bêhn çikayî, cara duyem dîsa ji nû ve bê rawestan û westan em hev himbêz dikin bi te re, ji nû ve û hertim ji nû ve. Em di carekê de digerin di sînga hemû zarokan de. Em dikenin û dibeşişin, heybeta wê ji ya dara me ya gozê bilindtir, dilê te tejî dikin… Piştre gelek caran em bi dayika xwe re cure dikin, dema ku em porê Berfîn şeh dikin.

Gulê amedekariya çûyîna kar dikir, meta min li mitfaqê ye û dengê wê li ber serê me ye. Melîke li Urfayê di nava kelecana gavekê bipêş de birina têkoşînê de ye. Murad di nava lêgerînê de ye ku tunebûna te li bîra me neyne. Xwezayî di bin vî barî de ber bi dikanê ve dikeve rê. Meta min ango nîv dayika me, wê bêhneke din di deste wê de bi sêniya dimsê ve ku di taştêya me de ya herî bi qîmete, bê li ser sifra me û dîsa dengbêjek deng vedide ji teyîba me ya kevin. "Zembîlfiroş zembîlan tîne, delal zembîlan tîne." Mala me mîna te bêhna Kurdî jê tê. Hema wê

demê bêrîkirinên te weke ku serdest bibe, tejî dibe, di kavilek û derî de, di bixiriyê de, bi dehfdan di dile me de…

Belê, em bêrî dikin. Herî zêde jî dayika min, navê wê Xanime, jina egîd. Destên wê bi nasirin, dilê wê mîna Kurdistanê bi hêze, jinek bi vîn û ser bilinde. Ji nişka ve çavên wê tejî dibin, dema rondikên hûr dibarîne li ser ew qas êş û azaran de. Li dijî qederê şahidê keyfxweşiyên li ser rû ye. Wê serê xwe ku hertim bilind ragirtibû, ji milê me de diqulipîne û bêrîkirinên xwe vedişêre, rondikên çavê xwe ji me… Li gel tunebûna te ya li gel me, di xemgîniya dilê me de, gurûra te dayî me dide jiyankirin heta mejiyê li nava hestiyên me.

Weke te, di asta rast sekinandinê de, li nava çavên min temaşe dikir. Weke te destên xwe di paş de girêdide û dimeşe. Weke te, rojên paştir bi heysiyet jiyankirine. Rast jiyankirin, weke ku ji rast parvekirinê wêdetir ma çi heye? Bêjê, di ber xwe de daxivî, ji nişka ve sekinî, paşê me gavên cuda avêtin û em derbazbûn ji salên destpêkê heta ku salên em hatine cîhanê. Tengezariyên me jiyankirin, dengê kenê me yê bilind, bi ser de girtinên malên me yên bê dawî…. Paşê tu û çîrokên te yên bêhna Kurdî jê tên, tejî dibe zaroktiya me. Hundirê me germ dike û bi ser mala me de diçe ji derve… Em dîsa mezin dibin. Tu dibê ka me qet negot em bê bav mane. Me gelek caran ji beriya bavekê te weke hevalekê didît. Li hember Kurdistanê, zarokan, çiya û berên wê, dîrok û zimanê wê, li himberê her tişteke ku ayîdê wan bû, bi hişmendiya berpirsyar ve, bi mafdar, rast û di heman demê de me ji xwe re weke armanc didît. Ji ber vê ye ku ji me wêdetir sekna te ya pîroz hertim em serbilind kirin û di heman demê de em nêzî têkoşînê kirin û hişt ku armanca bilindbûnê pêş bikeve. Her parçeyekê mûmê ji bermahiyên şoreşê ku te ji mala xwe destpêkiribû, me digirt destê xwe. Li ku derê û li kîjan qadê, wê bi kîjan şêweyî dest pê bike, bêyî ku cudahiyê bikin. Peymana me ye ku emê bêrîkirin û bêriyên me yên kom dibin û hezkirinên xwe bizivirînin agirê Newrozê yê herî geş.

Çîrokên te yên ji quncikekê hişê min derdikevin, vegotinên wan dizivirin suhbetan û di hişê min de dizivirin û tên roja îro. Ji Kawayê Hesinkar destpê dike, rêya xwe li Bedirxan Beg dixe, bi Şêx Seît re dide naskirin û tên van rojan. Di her kêliyê de dikare rengê kesk bigire û geş bibe, lewma di çiqileke xwe de hemû xweşikbûnên mirov dihewîne. Qeziyên te yên biçûk yên ku kûr û dûr ji bo me danasîna PKK''ê ye, bûye dara çinareke mezin û tim bibîr tînim. Pişt re hinek din mezin dibim, çi qas mezin dibim ew qas te fêm dikim û qasî têdigihim jî hêj zêde bextewer

dibim. Ew çîrokên te em niha zêdetir fêm dikin ku ji bo me nirxên mirovî û ferdeke bilind, ango wek welatparêzekê dema ku te hewil da ji nû ve me ava bikî, çimentoya ku te di xercê de bikaraniyî, di dema vehûnandinê de kerpîçên ku te bikaranîne; rêhevalê min, pîrê min, mamoste û bavê min…

Dema laşê me ji dervey vîna me mezin dibû, ya ku di hundirê me de dibû sedema çirûskek ji agir, bi hebûna me ve mîna Firatê bi coş mezin dibû, her ku mezin dibû gur dibû, her ku gur dibû, dibû tu. Me dixwend û guhdar dikir, me fêm dikir û vedigot, her ku me fêm dikir, dengê te di nava me de belav dibû, wekhev dibû û pê re dibû yek. Gotinên me yên tu dibûyî sedem hêj zelal diyar dibûn. Mînak; meta min. Meta min Asya, nîv dayîka min, jina xweşik ya zaroktiya min, ya herî xweşik û çav tirs di şopa dengê te de çiqas salên dirêj meşiyane. Wisa xwe xistina nava çar dîwaran û ji jiyana parçeyên biçûk an jî pirîskeke pasîf mayî, nabînin. Jinîtî û seknandina xwe ya jinîtî, çawa ziviriye, guheriye û pêşketiye. Bejna wê ya dişibe rihanê, agirê gelê xwe yê hebûnê, bi çareseriyeke li gorî xwe, xwe tavêjê nava agir û agir gur dike. Bi hebûna xwe ji dengê gelê xwe re, bi şêweyê lêdana tililiyan hevaltî kir ku pêwîstbû te bidîta hevalê min, pîrê min, bavê min.

Îro û niha, em dizanin ku te û ser te re tevgera azadiya Kurdistanê ku em ji nû de afirandin, himbêz kirin. Tu çi qasî hewil didî bigihî armanca xwe, em jî ew qasî hewildidin bigihin te. Gelê te yê ku te di hundirê xwe de, di nava qumaşê ji hev hêjatir de pêçayî, ji dîroka wî û nîrxên wî yên hêja re te çi qas hevaltî kiribe, bi dayîna têkoşîna wî bilind kiribe û ber bi pêş ve biribe, ew qasî nêzî rastiya şoreşa malbatên xwe dibî ku te dixwest pêş bêxî. Emê jî ew qasî nêzik bibin û keda te piroz bikin.

Yê ku hiştî em bi vê hebûna fikrî bigihin van rojan, yê ku bûyî sedem em xwedî li çanda vî gelê kevnar, dîrok û nirxê wî derkevin û hişmendiya pêwîste têkoşîn bêdayîn li me da fêmkirin, yê nehiştî em tine bibin, ji ber van hemûyan em careke din ji te û doza ku tu pê re bûyî yek re spasî û minetdariyên xwe yên bêdawî pêşkêş dikin û vê weke deynê stuyê xwe dibînin. Weke rêhevalên te bi hezkirin te himbêz dikin. Li ser navê hemû zarokan, dost, rêheval û kurê te Firat.

**Silav û rêzên şoreşgerî**
**Mam Nurî(Firat VARLI)**
**2012-10-18**